

Citizens of the World: Modern Kurdish Literature and Heritagisation  
as a Means for Transforming and Revitalising The Kurdish Language  
and The Oral Tradition



# FRITILLARIA KURDICA

---

## BULLETIN OF KURDISH STUDIES

**Nº 21**

---

**10/2022**

ISSN 2353-4052

INSTITUTE OF ORIENTAL STUDIES, JAGIELLONIAN UNIVERSITY  
NATIONAL SCIENCE CENTRE  
KRAKÓW, OCTOBER 2022

**Fritillaria Kurdica.**  
**Bulletin of Kurdish Studies.**  
**No 21, 10.2022**  
**ISSN 2353-4052**

The e-zine was edited in the scope of the research project: *Citizens of The World: Modern Kurdish Literature and Heritagisation As A Means for Transforming and Revitalising The Kurdish Language and The Oral Tradition* approved for financing by the decision number DEC 2019/33/B/HS2/01476 of The National Science Centre of Poland

**Published by:**

Section of Kurdish Studies,  
Department of Iranian Studies  
Institute of Oriental Studies  
of Jagiellonian University  
ul. Mickiewicza 9, 33-332 Kraków

**Editors of the 21st issue:**

Dr hab. Joanna Bocheńska:  
[joanna.bochenska@kurdishstudies.pl](mailto:joanna.bochenska@kurdishstudies.pl)  
Dr Farangis Ghaderi  
[F.Ghaderi@exeter.ac.uk](mailto:F.Ghaderi@exeter.ac.uk)  
Bêrivan Matyar  
[brvnmatyar@gmail.com](mailto:brvnmatyar@gmail.com)

**Proof-reading:**

Kurmanji Kurdish: Bêrivan Matyar  
Zazaki Kurdish: Huseyin Rodî Keskin  
Badini Kurdish: Farangis Ghaderi  
English: Oxbridge Proofreading

**Layout, typesetting**

Tomasz Mieloch

Kraków, October 2022

[www.kurdishstudies.pl](http://www.kurdishstudies.pl)

W 21 numerze naszego czasopisma przedstawiamy wywiady ze zbieraczami folkloru kurdyjskiego z Bakuru (Kurdystan turecki), Baszuru (Kurdystan iracki) i Chorasaniu (Iran). Wywiady zostały przeprowadzone w latach 2020-2022 w różnych dialektach języka kurdyjskiego i tak też są prezentowane: w kurmandżi, zazaki i badini.

In the 21st issue of the bulletin we present interviews with Kurdish folklore collectors from Bakur (Kurdistan of Türkiye), Başûr (Iraqi Kurdistan) and Khorasan (Iran). The interviews were conducted and are presented in different dialects of Kurdish: Kurmanji, Zazaki and Badini.

Hejmara 21ê ya kovara me hevpeyvînan di gel berhevkarên folklorê kurdî ji Bakur û Başûrê Kurdistanê û herwiha ji Xorasanê pêşkêş dike. Qeyda hevpeyvînan bi zaravayên cuda yê kurdî ne û di kovara me da metnên kurmançî, zazakî û badinî cih digirin.

# Naverok

4	<b>Introduction</b>
6	<b>Pêşgotin</b>
15	Alî Çîçekî de roportaj
27	Hevpeyvîna bi Bahoz Baranî ra
48	Bahri Demirî de roportaj
56	Hevpeyvîna bi Bêrîvan Matyarê ra
76	Hevpeyvîna digel Cemil Şêlazi
101	Hevpeyvîna bi Evîndar Şevînê ra
113	Hevpeyvînek digel Hecî Ce'fer da
124	Hevpeyvîna bi Gulê Şadkamê ra
137	Hevpeyvîna bi Mehmet Gultekînî ra
152	Nadire Guntaş Aldatmazi de roportaj
162	Hevpeyvîna bi Nihat Onerî ra
176	Omer Farukî da reportaj
189	Hevpeyvîna bi Omitê Mistefê ra
205	Hevpeyvîna bi Roza Sierrayê ra
215	Hevpeyvîna bi Sadiq Ūskanî ra
249	Surya Humane de roportaj
259	Hevpeyvîna bi Xecê Petekkayayê ra
269	هه‌ڤه‌یئینه‌ک د‌گه‌ل ج‌ه‌میل شیلازی دا
289	هه‌ڤه‌یئینه‌ک د‌گه‌ل ج‌ه‌ج‌ی ج‌ه‌ع‌ف‌ه‌ر دا
298	هه‌ڤه‌یئینه‌ک د‌گه‌ل به‌هار د‌ۆس‌کی دا

# Introduction

*Fritillaria Kurdica: Bulletin of Kurdish Studies* was established as an e-journal and published between 2013 and 2018 within the scope of the research project *How to Make A Voice Audible: Continuity and Change of Kurdish Culture and Social Reality in Postcolonial Perspectives*, funded by the National Science Centre of Poland. It ceased to exist with the end of the project. The bulletin is reactivated with the current 21st issue as part of another research project entitled *Citizens of the World: Modern Kurdish Literature and Heritagisation as a Means for Transforming and Revitalising The Kurdish Language and The Oral Tradition*, funded as part of the Opus-17 grant programme of the National Science Centre of Poland. It presents the interviews with Kurdish folklore collectors conducted within the scope of the project from 2020 to 2022.

Kurdish folklore drew the attention of Kurdish classical poets such as Feqiyê Teyran (1590–1660), Ehmedê Xanî (1652–1707) and Elmas Xan Kendûleyî (1702–1776) and was recorded by the Armenian neighbours of the Kurds in the 18th century. Later it attracted the attention of Russian and German travellers and orientalists. At the turn of the 20th century, it inspired the emerging Kurdish nationalist movement. Today, collecting Kurdish folklore is seen as crucial for protecting Kurdish national heritage, revitalising the Kurdish language and establishing the basis for modern Kurdish knowledge and education. At the same time, it serves as an important source of inspiration for Kurdish poets, writers, musicians, theatre, and film directors. However, only very rarely has attention been paid to the collectors of Kurdish folklore, whose number has increased in recent years. In our project we conducted 33 interviews; seventeen of them were conducted in the Kurmanji dialect of the Kurdish language, five in the Zazaki dialect, eight in the Sorani dialect and three in the Badini dialect. As shown in our study, collecting folklore has become increasingly popular among young people, many of whom have established journals and networks and collect and publish oral traditions in a professional and technically advanced way.

The pandemic forced us to start our interviews online, using a network of existing contacts which we gradually expanded. Despite its challenges, we soon discovered that online communication offered new possibilities to the respondents and for our research. We prepared a set of questions in Kurmanji, Zazaki, Badini and Sorani and sent them to the collectors, inviting them to choose whether to write down their answers or to meet with us using online communication tools. The great majority of participants decided to write down their answers, which allowed them to work on them in their own time as well as to control, rethink, modify and develop their responses. This now gives us the opportunity to share most of the interviews in the special issue of our bulletin. The three Badini interviews were conducted in Iraqi Kurdistan and have been transcribed from the voice record.

We present ten interviews in Kurmanji, five in Zazaki and three in Badini; reaching different Kurdish dialects was also one of our priorities. We hope that this publication is only the beginning. We would still like to reach a wider group of collectors in different parts of Kurdistan; for example, we very much regret that Rojava is not represented in the current issue.

I would like to take this opportunity to thank all the members of our project: Dr Farangis Ghaderi, responsible for conducting interviews in the Sorani and Badini dialects (in Rojhilat and Başur), Esat Şanlı, responsible for conducting interviews in Zazaki, and Huseyin Rodî Keskin for editing the Zazaki interviews for this journal. I am very grateful to Bêrîvan Matyar for her support in reaching Kurmanji folklore collectors and for her fascinating guidance to the world of Bakuri oral tradition. Our deep thanks go to all the folklore collectors for their time and engagement and for sharing with us their experiences and thoughts. Finally, we would like to thank Wojciech Kaczor for assisting us in preparing the profiles of the folklore collectors.

# Pêşgotin

Hejmara kovara me ya 21ê hejmareka taybet e. Ew kovar wek parçeya projeya *Deng çawa dikare bê bihîstin. Berdewamî û guhartinên çand û realîteya civakê yên kurdî di perspekîfên postkolonyal da* (2013–2018) hat damezrandin. Lê piştî qedandina projeyê, di sala 2018an çapa wê hat sekinandin. Lêbelê niha, em kêfxweş in ku bibêjin hejmara nû ya 21ê wekî hejmareka taybet a projeyeka din hatîye amadekirin û dîsa li pêşberî we ye. Ev hejmar hevpeyvînên berhevkarên folklorê kurdî yên kurmançî, zazakî û badîni pêşkêş dîke. Wekî ku em hemû dizanin hejmara 21ê roja Newrozê ye jî, loma ji bo me hejmareka bextewar e; û em bi hevî ne ku ev hejmar derîyên nû ji bo lêkolînên li ser folklorê kurdî veke.

Projeya me ya bi navê *Hemwelatîyên Dinyayê: Wêjeya Kurdî ya Nûjên û Avakirina Mirasê Wek Rêbazên Guhartin û Zindikirina Zimanê Kurdî û Gelemperîya Devkî* (zazakî: *Miras Hemwelatijê Dinya: Edebîyatê Kurdkî yo Modern û Miras sey Wesîteyêkê Resnayîş û Xurtkerdişê Ziwanê Kurdkî û Kulturê êyê Fekkîyî, û soranî: Hawllatyanî Cîhan: Edebiyatî Modernî Kurdî û Miratsazî wekû Amrazî Gorran û Bûjanewey Zmanî Kurdî û Nerîtî Kultûrî Zarekî<sup>1</sup>*) di sibata 2020an bi piştgirîya bernameya Opus-17ê ya Navenda Zanistên Polonyayê (NCN) dest pê kir û di sibata 2023an da dê bi dawî bibe.

Hevpeyvînên berhevkarên folklorê kurdî jî parçeyeka lêkolîna projeya me bû, lê divê bibêjim ku parçeya herî nû, balkêş û pir bi heyecan bû. Berhevkarên folklorê kurdî, cara yekem, di sala 2019an bala min kişand. Bi saya Bêrîvan Matyarê ku wek xwendekara bernameya Erasmusê hat Zanîngeha Jagiellonianê, Krakovê (2019), bi saya heyecana wê ya komkirina çanda devkî û bi saya *Kovara Folklorê Me* ku wê ji min ra anîbû, min fam kir ku li Bakurê Kurdistanê tevgerê pir balkêş ava dibe. Ev tevger bi coş û fikrên nû yên cesûr giringî dide parastin û nasandina folklorê Kurdistanê. Heta wê rojê jî min dizanî ku berhevkarên cuda cuda hene lê bi tenê û serbixwe dişixulin. Bi saya Bêrîvanê û hevalên wê, bi saya rêxistinên

---

<sup>1</sup> هاوڵاتیانی جیهان: ئەدەبیاتی مۆدێرنی کوردی و میرات سازی وه کوو نامزای گۆران و بووژانهوهی زمانی کوردی و نهریتی کولتووری زارهکی

wekî Weqfa Mezopotamya û MED-DERê û bi saya Weşanxaneyên wekî Wardoz û Vateyê, min dît ku li Bakurê berhevkar zêde ne.

Herweha li parçeyên din ên Kurdistanê jî karên berhevkarîyê tên kirin. Li Rojhilatê, parastina mîrasiya kurdî bi saya gelek berhevkarên jêhatî û fedakar ji Kurdistanê heta Xorasanê cih digire. Li Başûrê, Komelley Kelepûrî Kurdî (Kurdish Heritage Institute) li bajarê Silêmanîyeyê, ji bo kurdên soranî û badînîaxe, navendeka taybet e ku xwedî armancên bi vî rengî ne; avakirina arşîveka dewlemend a kevneşopîyan û weşandina muzîk û ahengên kurdan û kemneteweyên din ku li ser axa Kurdistanê dijîn. Dema me dît ewqas berhevkarên folklorê kurdî zêde ne, loma daxwaza projeya me ev bû ku em xwe bigihînin berhevkarên folklorê kurdî û bi wan ra bi hemû zaravayên kurdî hevpeyvînan çêbikin, û bi vê projeyê balê bikşînin ser berhevkarên folklorê kurdî. Lê di çarçoveya projeyê da, bi qasî ku ji destê me hat (di navbera salên 2020 û 2021 da), li sê parçeyên Kurdistanê, bi sê zaravayan kurdî, bi giştî, bi 33 berhevkarên folklorê kurdî ra, me hevpeyvînen rûbirû û online çêkirin: 17 bi kurmancî, 8 bi soranî, 5 bi zazakî û 3 bi badînî. Lêbelê ji bo vê hejmarê, ji ber derfetên kêr (ji bo transkrîpsiyona wan, dem û îmkaniya madî tune bû, lê bi tenê sê hevpeyvînen badînî hatine transkrîpkirin), me cih dane hevpeyvînen ku bi rêya nivîskî hatine çêkirin. Bi gotineka din, di vê kovarê da, 10 hevpeyvînen kurmancî, 5 yên zazakî û 3 jî yên badînî hene (2 hevpeyvînen badînî hem bi versiyona latinî û hem bi ya erebî ye). Dr Farangîs Ghaderî (Zanîngeha Exeter û Zanîngeha Jagiellonianê) berpirsa lêkolînên li ser berhevkarîya folklorê soranî û badînî bû; Esat Şanlî (Zanîngeha Dîcleyê) berpirsê yên zazakî bû; Joanna Bocheńska jî berpirsa yên kurmancî bû. Û Huseyîn Rodî Keskîni (Zanîngeha Jagiellonianê) hevpeyvînen zazakî; Bêrîvan Matyarê jî yên kurmancî edît û redakte kirin.

Ji naveroka van hevpeyvînan tê famkirin ku miraza sereke ya berhevkarên jî ev e: avakirina arşîvên berfireh û parastina wan, li welatê ku bi sed salan bûye qurbana dagirkerî û mêtîngerîyê. Herweha li gor berhevkarên, ji bo çanda kurdî pirsgerêka mezin jî tunebûna arşîva neteweyî û dewletî ye. Lê ev bûye sebeb ku weşandina kovar û çapkirina pirtûkên folklorê wekî arşîvên taybet an jî populer tê dîtin. Ew arşîveka dînamîk e ku armanca wê ne tenê parastin e, lê herweha belavkirin û balkişandina fikrên li ser xebatên folklorê kurdî ye.

Komelley Kelepûrî Kurdî ya li Silêmanîyeyê di salên 1996 – 1998an da, bi soranî *Kovara Kelepûrî Kurd* diweşandin. *Asoy Folklore* (2000 – 2011) jî li Başûrê dihat weşandin. Li Bakurê jî cara yekem di salên 2015 – 2016an da *Kovara Folklorê Kurdan* hat weşandin, ji sala 2019an ve heta niha jî *Folklorê Me* tê weşandin. Ew mînakên baş ên kovarên folklorê ne, û ji bo parastin û belavkirina çanda devkî ya kurdî roleka wan a giring heye. Wekî me dît xebatên komkirina peyvên kurdî yên kêmnas û herêmî ku li gundan hatine komkirin di *Kovara Folklorê Me* da têne weşandin. Herwiha xebatên Sadiq Êşqanî yan jî Bahoz Baranî yên komkirina peyvên kurdî ne tenê ji bo terîf û danasîna mînakên folklorê kurdî ne, lê bi saya van xebatan, ev peyv dikevin jîyana modern û ji nû ve ew zindî dibin.

Wekî ku tê zanîn, mînakên yekem ên gotinên pêşîyan ên kurdî ji aliyê kurd û cîranên wan ên ermenî çend sed sal berê hatine qeydkirin. Di sedsala 19ê da kevneşopîya devkî ya kurdî bala orîyantalîst û rêwîyên ewropayî jî kişand, wekî parçeyeka taybet a lêkolînên xwe wan li ser ziman û wêjeya Rojhilatê (orient) xebitîn. Piştî di destpêka sedsala 20ê mîrasa devkî bû îlhamek ji bo tevgera neteweyî ya kurdî û ji bo daxwaza avakirina welatê serbixwe ya kurdan<sup>2</sup>. Loma ji mêj ve heta îro avakirina mîrasa neteweyî li ser bingeha folklorê bûye motîfeka sereke ji bo hewildan û karên cihêreng ên çanda kurdî ya nûjen.

Hemû kesên extîyar û ciwan ên ku roj bi roj ew bêhtir xuya dibin, ji zimanê kurdî û ji çanda ku bi vî zimanî tê îfadekirin pir hez dikin û naxwazin ew wînda bibe. Ji bilî vê, helwesta wan îro ne tenê ji ber îdeolojîyê ye (parastina mîrasa neteweyî) lê ya herî giring ew e ku bal û dîqata wan a taybet li ser hûrgilîyên herêmî û cihêreng ên wekî şiklê axaftina mirovan ên herêmî û şexsî ne ku heta îro gelek caran hatine piştguh kirin. Ew lêkolînên xwe li ser devok û axaftinên herêmî û şexsî jî dikin û wan diparêzin. Ji ber vê yekê jî em dikarin bibêjin, ev lêkolîna li ber destê we, ne tenê ji aliyê fikir û ramanên berhevkarên ve gelekî dewlemend e, herweha ew gelek babetên din ji bo lêkolînên kûr û pêşerojê nîşanî me dide.

Ji bilî vê jî, bi helwestên weşanxane û sazîyan, li ser xebatên folklorê kurdî di navbera parçeyên Kurdistanê da danûstendinê hêja çêdibin: Li Bakurê, weşanxaneyên ku xebatên Gulê Şadkamê ku ew li Xorasanê berhevkarîyê dike, çap dikin; herweha xebatên folklorê yên ji Rojhilatê, li Başûrê têne çapkirin. Bi vê

---

<sup>2</sup> Li ser vê babetê binêre Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Netewî (1898 – 1946)*, Avesta, Istanbul 2018 yan Nezat Keskin, *Roja Nû û Edebiyata Kurdî ya Gelerî*. Avesta, Istanbul 2018.



yekê kurd îro pirên mîrasa kurdî yên taybet ava dikin û vê mîrasê di nav xwe da didin nasîn.

Li vir ez dixwazim ji dil spasîyên xwe li hemû berhevkarên folklorê kurdî bikim ku ew beşdarî projeya me bûn, spasîyên xwe li sazî û rêxistinên kurdî jî bikim ku ji bo lekolîna me, wan alîkarî û rehberî kirin. Herweha ez spasîya xwe li hemû beşdarên projeya me: Farangis Ghaderi, Bêrîvan Matyar, Esat Şanlı û Huseyin Rodî Keskinî dikim. Ji bilî vê, spasîyên xwe li Wojciech Kaczorî jî dikim ku ew hevkarê wergera kurteyên kurmancî-înglîzî ye.

Hevpeyvînên ku hatine hiştin yên rûbirû, em ji bo wan cardin pirsan rê bikin, herweha ji ber ku me bi parçeya Rojavayê ra, hevpeyvîn çênekirine em poşman in. Lê em dizanin ku ji xeynî berhevkarên vê lêkolînê, gelek berhevkarên folklorê kurdî hene. Loma me biryar da ku ev kovar tenê destpêk e, û di pêşeroj da em ê hevpeyvînên xwe bidomînin û wek pirtûka dengên berhevkarên kurd amede bikin. Bi vî şeklî ev hejmar dibe destpêka projeyeka kûr û dirêj.

Joanna Bocheńska

Dîroka xebatên folklorê gelekî kevn e, digihîje heta sedsala 18an; li nava kurdan xebatên berhevkarîyê jî di çarçoveya xebatên folklorê da hatine kirin û wan jî ji dawîya sedsala 19an vir ve dest bi berhevkirina berhemên folklorê kirine. Di sedsala 20î da jî berhevkarîya folklorê hatîye kirin. Di vê qadê da ji bo destpêkê, em dikarin behsa xebata Mela Mehmûdê Bazîdî ya bi navê *Adat û Rusûmatnameê Ekradîyê û Camî'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî* yê bikin.<sup>3</sup> Lê ji sedsala 21ê vir ve giringîya folklorê bêhtir hatîye famkirin. Bi taybetî, li Bakurê, sazî û tezhêhên wekî weqif û komeleyên ku li ser ziman û çanda kurdî dixebitin, berê xwe dane folklorê kurdî û aniha bêhtir li serê radiwestin, hinek weşanxane jî hene ku bi piranî li ser folklorê kurdî dixebitin û berhemên folklorê çap dikin. Herweha

---

<sup>3</sup> Necat Keskin, *Folklor û Edebîyata Gelêrî*, Avesta, Stenbol, 2019, r. 80.

xebatên *Kovara Folklorâ Kurdan*<sup>4</sup> û *Folklorâ Me*<sup>5</sup> jî tesîrên mezin çêkirine, piştî van hewildan û eleqeyên li hemberî folklorê, van demên dawî “berhevkar”ên nû li berhevkarîya folklorâ kurdî zêde bûne, û her roj hejmara wan zêdetir dibe.<sup>6</sup>

Dema em bala xwe didin van berhevkarên em dikarin bibêjin ku ew curbicur in; hinek ji wan mamoste, bijîşk, nivîskar û hunermend in, hinek ji wan jî xwendekar, dayik, aktivîstên zimên in ku li ber pêşeyê xwe yê rojane berhevkarîyê dikin. Lê hinek ji wan jî tenê berhevkar in û berhevkarîyê dikin. Hinek ji wan xwedî tecrîbe ne, bi taybetî xwedî tecrîbeyên meydanî, hinek ji wan jî bi amatorî berhevkarîyê dikin. Heta aniha jî gelek xebatên hêja û giring ên meydanî kirine û keresteyên folklorâ kurdî çî serbixwe çî bi rêya sazî, weşanxane û kovaran weşandine. Loma keda wan ji bo folklorâ kurdî bêguman bêhempa ye. Lê berevajî vê, mixabin, heta aniha li ser “berhevkar”ên folklorâ kurdî tu xebat nehatine kirin; ji ber vê, li ber destê me, çavkanîyek li ser berhevkarên folklorâ kurdî tune ye. Û herwekî din, berhevkar bi xwe jî ji xeynî berhem û keresteyên ku berhev kirine û çap kirine, li ser xwe, li ser tecrîbe û zanînen xwe yê berhevkarîyê, kêma agahî parve kirine. Loma li ser “berhevkar”ên folklorâ kurdî, em ne xwedî agahîyên bi vî rengî ne: Ew kî ne, mîsyon û armancên wan ên berhevkarîyê çî ne, tesîra çî û kê li ser wan heye, rê û rêbazên wan ên berhevkarîyê çî ne, ji bo xebatên folklorâ kurdî tesbît, fikir, pêşniyaz û daxwazên wan çî ne.

Ev kêmanî ne tenê di qada berhevkarên da ye, herweha kêmanî li ser rêbazên berhevkarîya meydanî û li ser rêbazên deşîfrasyona berhemên folklorâ kurdî jî hene; li ser wan çavkanî, pirtûk û pirtûkçeyên rêbazan ên bi rêkûpêk tune ne. Ji bo folklorâ kurdî, ev kêmanîyên mezin in; divê li ber ew çavan bînin girtin û mirov li ser wan bixebite. Ji bo vê yekê helbet mirov dikare ji xebatên millet û civakên cuda sûde werbigire lê wekî ku Goldstein<sup>7</sup> jî dibêje, her millet û civak xwedî

---

<sup>4</sup> Kovara Folklorâ Kurdan, li Amedê, di navbera salên 2015–2016an da 7 hejmar derketin. Şaredarîya Mezin a Amedê ew fînanse dikir. Piştî qeyûm, çapa wê sekinî. Li Bakurê, yekemîn kovara folklorâ kurdan bû.

<sup>5</sup> Kovara Folklorâ Me: Li Amedê, di binê Weqfa Mezopotamyayê da, di sala 2019ê dest bi weşanê kir. Kovar gihîştîye hejmara xwe ya 12ê, aniha jî hejmara wê ya 13an tê amadekirin.

<sup>6</sup> Edîtorê Kovara Folklorâ Me, Eşref Keydanî, di hejmara 9ê ya kovara da, behsa berhevkarên nû dike (2021, r. 5.).

<sup>7</sup> Kenneth S. Goldstein, *Sahada Folklor Derleme Metotları*, Başbakanlık Basımevi, Enqere, 1983, r.119.

şewêzeka cuda ya vegotina folklorê ye; ew xwedî nirx û motîf; tevger, rabûn û rûniştinên cuda ne, herweha bi awayên cuda ji folklorê sûdê werdigirin. Loma herçiqas li ser folklor û berhevkarîyê rêbazeka tam û dirust hebe jî lê dibe ku ew ji bo hemû millet û civakan ne karîger be. Loma divê berhevkarên her milletî, wekî erkeka esas, tecrîbe û zanînen xwe, bi taybetî rêbazên xwe yê şexsî parve bikin. Ji ber ku kurd jî xwedî nirx û motîfên cuda ne, ew nirx û motîf li gor dever, herêm, navçe, bajar, gund û gundik, tewerê li gor şexsan jî diguherin, loma parvekirina tecrîbe û rêbazên berhevkarîyan ji bo folklorê kurdî bêhtir giring û bi qîmet e û ji bo avakirina rêbazên berhevkarîya folklorê, rêbaz û tecrîbeyên berhevkarîyan ên meydanî çavkanîyên bêhempa ne.

Di vê çarçoveyê da ez dixwazim li ser vê xebata li ber destê we jî çend gotinan bibêjim: Dema kordînatora projeyê, Prof Dr Joanna Bochenskayê, cara ewil havîna 2020an, ji min ra behsa vê projeyê kir û pirsên hevpeyvînê ji min ra şand, ez gelekî bi kelecânî bûm; min hewil da ez yek bi yek pirsên wê bibersivînim û behsa pêvajoyê û tecrîbeyên berhevkarîya xwe bikim. Herweha ji bo berhevkarîyan jî nêz ve nas bike û danûstendinên xurt çêbike, ew havîna 2021an hat Amedê jî. Wê demê, wê bi berhevkarîyan û sazîyên ku li ser folklorê kurdî dixebitin ra gelek hevdîtin çêkir. Ji xeynî hevalên xwe yê berhevkar<sup>8</sup>, min jî xwest berhevkarîyan din jî nêz ve nas bikim û li wan guhdar bikim, loma ez jî pê ra çûm hevdîtinan. Dema hevdîtinan, naskirina berhevkarîyan jî nêz ve gelek tesîr li min kir, lê min nizanibû vê yekê çawa pênasê bikim.

Piştî cardin<sup>9</sup>, sibata 2022an, dema ez hatim Zanîngeha Jagiellionanê min dest bi xwendina xebatên metodolojîya lêkolînên li ser gelên xwecihî (Indigenous) kir. Di van xebatan da behsa metodolojîya lêkolînên li ser gelên xwecihî dihat kirin; lêkolîner û vekolerên gelên xwecihî behsa armancên xwe dikirin. Li gor wan, metodolojîyên lêkolînên giştî yê akademîyên Rojavayê dinyayê, ji bo lêkolînên li ser gelên wan ne guncan in, loma ew hewil didin metodolojîyên

---

<sup>8</sup> Ji ber ku ez di desteya weşana *Kovara Folklorê Me* da me û ji me ra ji her devera Kurdistanê berhevkar nivîs diştin, loma ez kêma zêde navê berhevkarîyan dizanim lê ez ji nêz ve wan nas nakim, ji xeynî hevalên min ên berhevkar. Ji ber vê yekê, hevdîtinên bi berhevkarîyan ra ji min ra gelek balkêş û bi kêrhatî bû.

<sup>9</sup> Ez cara ewil di sala 2019an da bi rêya bernameya Erasmusê hatim Zanîngeha Jagiellionanê, û nêzî 7-8 mehan li vir mam. Ji bo cara duyem jî di sibata 2022an dîsa bi rêya bernameya Erasmusê hatim vê zanîngehê û aniha jî li vir im.

heyî cardin ji nû ve li gor dînamîk û kodên gelên xwe biguncîn an jî li gor gelên xwe metodolojîyên nû ava bikin, û di *avakirina zanistîya* gelên xwecihî da wekî vekoler û lêkolîner bibin xwedî rol.<sup>10</sup> Dema ez li wan xebatan hûr bibûm, ez jî wek vekoler û berhevkarêka folklorê kurdî, li ser metodolojîya lêkolînê li ser kurdan, bi taybetî li ser metodolojîya berhevkarîya folklorê kurdî difikirîm û min ew berawird dikir; loma pirsên min ên bi vî rengî çêbûn: Berhevkarên folklorê kurdî kî ne? Berhevkar xwedî rolên bi çî rengî ne? Metodolojîya berhevkarîya folklorê kurdî çawa ye? Rêbazên herî guncan kîjan in? Pirsên min her diçû zêdetir dibûn. Lê di wê navberê da, Prof Dr Joanna Bochenskayê hevpeyvînên ku bi berhevkarên ra çêkiribû (yên kurmancî) ji bo edîsyon û redaksîyonê radestî min kir. Di ber ra min dest bi xwendina wan jî kir, ji xeynî ya min, neh hevpeyvînên berhevkarên hebûn; bala min çû ser wan û pêvajoya berhevkarîya wan ku her yek ji wan çîroka xwe bi awayekî cuda gotîye. Wan bi berfirehî behsa motîvasyon û armancên xwe kirine. Dema ku min dît ku armancên me (yên min û yên hinek berhevkarên din ên wekî nivîskar Sadiq Êskanî) dişibin hev, ez gelekî kêfxweş bûm. Li ser meseleyê, li gor min û Sadiq Êskanî, folklorê kurdî çavkanîya epîstemolojîya kurdî ye. Avakirina epîstemolojîya kurdî ji folklorê kurdî derbas dibe. Dema min dît ku ez ne tenê me, berhevkarên din jî weha difikirin û bi vî armancê berhevkarîyê dikin, ez gelekî şad bûm. Ez dikarim bibêjim ku dema berhevkarên din jî pêvajoyê tecrîbeyên berhevkarên bixwînin, dê ew jî gelekî xwe şad hîs bikin. Herweha, ev xebat bi min kir ku ez bi çavekî din li mijara berhevkar û berhevkarîya folklorê kurdî binêrim. Bi gotineka din, min dît bersivên pirsên min ên ku min li jor bi rêz kirine, bi berhevkarên ra ye: Çawa ku berhemên berhevkarîyên folklorê ji bo xebatên akademîk û hwd çavkanîyên bi qîmet in, wisa jî parvekirina tecrîbe û rêbazên berhevkarên bi qîmet e û îtibara folklorê bilind dike, û dê berhevkarên folklorê kurdî jî ber bi profesyonelîyê ve bibe. Loma ez gelekî spasîyên xwe li Prof Dr Joanna Bochenskayê dikim ku wê *mijara berhevkarên* li ber çavan raxist. Herweha ez spasîyên xwe li van berhevkarên dikim ku bi dil û can parêzvanîya nîrxên neteweya xwe dikin, û ew di pêvajoya avakirina epîstemolojîya kurdî da xwedî rolên girîng in.

---

<sup>10</sup> Shawn Wilson, *Research is Ceremony: Indigenous Research Methods*, Fernwood Publishing, 2008.

Li vir ez dixwazim, bi çend hevokên kurt behsa van berhevkarên bikim. Li ser meseleyê, berhevkarên nivîskar, romannivîs û çîroknûsên kurdî yê wekî Bahoz Baran û Sadiq Êskanî ku ew ji bo berhemên xwe yê modern ji folklorê sûdê werdigirin; civaknas û folklorîstên wekî Evîndar Şevîn û Gulê Şadkamê jî bi tesîra hestên neteweyî û yê malbatên xwe berhevkarîya folklorê dikin, û herweha Evîndar Şevîn rewşa welatekî mêtîngê li ber çavan digere û bêhtir qîymetê dide berhemên folklor û çanda vî welatî; berhevkarên gelek xwedî tecrîbe yê wekî Mehmet Gultekin û Nîhat Onerî jî bi salan in ji alîyê folklorê kurdî ve li herêmên dewlemend ên wekî serhedê berhevkarîyê dikin ku li wir Nihad Oner êdî wekî berhevkar tî nasîn; zimannas û ferhengszazê kurdî Omitê Mistefê ku ew ji bo avakirina ferhengê li dû peyvên herêmî û kêmnas e; berhevkarê jî nifşa nû, Roza Sîerra jî bi kelecana berhevkarîyê dike û bi derfetên teknolojîyê, keresteyan li ser qanalên dijîtal diweşîne û wan digihîne nifşên nû; Xecê Petekkaya jî (ew bi xwe zaza ye lê bi wê ra hevpeyvîn bi kurmancî hatîye çêkirin loma li vir spasîyên taybet ji bo wê), wek vekolereka kurd li dû çîrokên pîra xwe çûye, û berê xwe daye gundê wê. Bi qasî ku min ji hevpeyvînan fam kir, bi qewlî Goldstein<sup>11</sup> ve, taybetîyeka giştî ya berhevkarên jî ev e: Ew ji mirovan (bêhtir ji kesên extîyar) pir hez dikin, ew dixwazin bi pîrsan (bi rêya dîyalogê) û bi behnfirehî tê kevin kûrahîya mirovan û li wan, li çîrokên wan û li peyvên devê wan guhdar bikin. Em dizanin ku ev pênase ne bes in, lê jixwe di hevpeyvînan da ew bi hûrgilî behsa xwe dikin, loma ev kovar cihê gotina wan e.

Ji bo vê xebata li ber destê we, ez dixwazim gotinên xwe weha bi dawî bikim: Ev tekana xebat e ku li ser berhevkarên folklorê kurdî radiweste, û li ser berhevkarîya folklorê kurdî me bi agahîyên hêja dihesîne ku em dikarin bibêjin ew agahî heta aniha bi tu awayî bi rêkûpêk û giştî nehatine weşandin û parvekirin. Ji ber vê yekê ev xebat jî têra xwe hêja ye. Em dizanin ku hejmara berhevkarên folklorê kurdî ne bi vê xebatê sînorkirî ye, ji xeynê wan gelek berhevkarên hêja hene. Bi hêvîya ku ev xebat bibe destpêk ji bo xebatên li ser berhevkarên folklorê kurdî.

Bêrîvan Matyar

---

<sup>11</sup> Kenneth S. Goldstein, *Sahada....* r.7.

Bi çerçewaya projeya ma de panc hebî roportajî bi ziwane Zazakî ameyê qeydkerdene. Nê roportajî ser o folklorê Zazayan de bî. Nuştoxê Zazayan ra kamcîn folklor ser o de alaqedar î, ma înan de re seba tecrubeya înan wareya folklorî de re cîya-cîya persî persayî. Inan zî goreyê tecrubeyanê xo ma re cewap dayî. Tecrubeya folklorîstanê ma seba wendekaranê ziwane ma û nuştoxanê amatoran ra muhîm a, çimke înan eşkenî tecrubeyanê nuştoxanê ma ra îstîfade bikerî. Tecrubeyanê wareyê folklorî de îstîfa de kerdene zaf muhîm o, merdim eşkeno xetayanê yan zî tecrubeyanê yewbînan ra bimuso û xo aver bero. Ez qayila biney zî behsa înan bikerî. Nadire Guntaş Aldatmaz cigêrayoxe, nuştox û mamosta ya, aya bi zafî nusteyanê akademîk û folklorê Zazayanê Elewîyan ser o gurîyena. Nuştox û açarnayox Alî Aydın Çiçek wareyê ziwane û folklorê Zazayan ser o alaqedar o, û alaqeya ey bi teyna yew mintiqa serî nêya, o her mitiqayan ra folklorê Zazayan are dano. Surya Human sey amatorê Zazakî serî de malzemeyê folklorîkan arî dana û nuşteyê aye rojnameyan de weşanîyenî. Aya Weqfa Mezopotamyaye de standardîzekerdişê ziwane û arşîvkerdişê folklor ser o xebityena. Omer Faruk û Bahrî Demir sey amatorê Zazakî ser o malzemeyê folklorîkan arê danî. Her dîyin zî bi xususî alaqeya xo danî ser o vateyê verînan û îdîyoman. Xebatê ser o ziwane ma de roj bi roj benî zaf û no zî seba averşîyayîş û pawetişê ziwane ma zaf elzem o.

Rodî Huseyin Keskin

# Alî Çîçekî de roportaj

Alî Aydın Çîçek is a writer and translator in the Zazaki language. He has been working in the field of the Zazaki language for around eleven years, and to date has written and published ten books in Zazaki. In 2009 he became interested in oral tradition; today, in his archive, there are twelve dossiers of tales from the towns of Gimgim, Erzingan, Erzurum, Dersim, Licê, Qoçgirî, and Çewlîg. He named his archive *Country Folklore*, and it contains tales, folk songs, anecdotes, stories, and interviews. He is collaborating with the Vate, Şewçila and Tiroj journals as well as with the DêrsimInfo and Zazaki.NET websites.

Alî Aydın Çîçek nustox û açarnayoxê ziwane Zazakî yo, û o nêzdîyê des yan zî yewendes serran ra ziwane zazakî reyde eleqedar o. Heta nika ey des hebî kîtabî bi ziwane zazakî nuştî û çap kerdî. 2009'î de o eleqeya xo da tradîsyonê fekkîyî ser o, ewro arşîva edebîyatê fekkîyî ey de Gimgim, Erzingan, Erzirom, Dêrsim, Licê, Qoçgirî, Çewlîg, Wêranşar, Sêwas ra diwês dosyayê estanikan estî. O arşîva xo bi sernameyî “*Folklorî Welatî*” name kerd, û arşîva ey de estanikî, deyîrî, fiqrayî, hêkatî, roportajî ca genî. Tekilîya ey bi Kovara Vateyî, Kovara Şewçila, Tîroj û DêrsimInfo, Zazaki.NETî de re esta û nuştîyê ey nê kovare û keyepelan de yenê weşanayene.

**Esat Şanlı:** Keremê xo ra name û peynameyê xo vacê û tayê xo bidê naskerdene (şîma ça/kotî ra yê, çend serre yê, çi karî kenê?)

**Alî Çîçek:** Nameyê mi Alî Aydın Çîçek o. Ez serra 1984 de şaristana Gimgim<sup>1</sup> de ameya dinya. Nezdîyê des-yewendes serrî ra ez Kurdî (bi taybetî Zazakî) reyde eleqedar bena. Heta nika şeş kitabê mi ameyê weşanayene. Ez keye de karê açarnayîşî kena û ge-ge zî karanê sey ‘Part Time’ de gurîyena.

---

<sup>1</sup> Bi Tirkî Vato.

**E.Ş:** Şima tradîsyonê fekkîyî ser o xebetîyayî. Şima eşkenê tayê qalê destpêka xebata xo bikerê, senî dest pêkerde û dima senî aver şîye?

**A.Ç:** Eleqeyê min ê tradîsyonê fekkîyî serra 2009'î de dest pêkerd. Verê cû zî eleqeyê mi bi kirmanckî bi, yanî hîkaye û şîrî nuştêne, labelê dima raporê UNESCOyî mi serheb ver çarna ra edebîyatê fekkî, yanî folklorî. Verê cû mi kesê ke der-dorê xo de nas kerdêne ez şîya leyê înan. Xora domanîye ra nat mi estanikan ra hes kerdêne, çunke keyeyê ma de kalikê mi tim ma rê estanikî vatêne. Mi kî kokimê ke der û dorê mi de estê game bi game înan ra estanikî, meseleyî, fiqrayî ûsb. girewtî û qeyd kerdî. Nê arêkerdeyan hem hetê zîwanî ra hem zî hetê edebîyatî ra zaf çî da mi. Bado zî bi pêşnîyaza çend embazan (bi taybetî Weşanxaneyê Vateyî) mi no kar 'karê arêdayîşî' sey xebatêka warî kerde xo ver.

**E.Ş:** Çira folklorê Kurdkî (bitaybetî yê Zazakî) bala şima anceno?

**A.Ç:** Her çî ra ver rewşa kirmanckî nê warî de mi ser o zaf tesîr kerd. Çunke rewşa zîwanî û rewşa kewanê ke bi nê zîwanî qîsey kenê qet rind nêbîye. Heme amacê mi nuqtayêk ra dest pêkeno. Ganî hîna kesê ke nê zîwanê de wayîrê zanayîşanê folklorîyê înan reyde desin de roportajî ûsb. bêrê kerdene. Çunke hetê edebîyatî ra zaf çimeyê ma hîşê înan de nîmîteyî yê. Yanî senî ke yeno zanayene kirmanckî sey zîwan û lehçeyanê bînan warê edebîyatê nuşteki de wayîrê bîngeyê de zîxmî nîyo û no semed ra folkler/edebîyatê fekkîyî seba ma muhîm o. Her çî ra ver derdê mi o bî ke nê nîmûne û çimeyî vîndî nêbê.

**E.Ş:** Şima key dest bi xebate kerde?

**A.Ç:** Mi serra 2009'î de dest kerd xebata arêdayîşî labelê sey profesyonel mi 2011 de mi dest bi nê karî kerd.

**E.Ş:** Şima ça/kotî û kamecîn mintiqeyan de motîfê edebîyatê fekkîyî arê dayî?

**A.Ç:** Mi tewr zaf Îstanbul de motîfê edebîyatê fekkîyî arê dayî. Çunke semedê tayê problemanê sîyasî ra ez nêşkaya verê Kurdîstanî zaf hîra rayîr bigêra. Labelê



teberê Îstanbulî de, Erzingan, Îzmîr, Kocellî mi xebatî kerdî. Labelê bitaybetî mi Îstanbul de zaf kesan reyde xebatê arêdayîşî kerdî. Çunke semedê polîtîkayanê dewlete ra zaf şarê ma dewê xo caverdê û ameyê nê şaristananê rojawanî. Mi Îstanbul û şaristanê bînan de çiqas kesî doz kerdî, bi yew şekil resta ci û mi ci ra qeydî girewtî. Ewro arşîvê mi de Gimgim, Erzingan, Erzirom, Dêrsim, Licê, Qoçgirî, Wêranşar, Sêwas û Çewlîg ra diwês dosyayê estanikan amade vinetîyê û reyna xeyle nimûneyê bînî.

**E.Ş:** Şima xebata xo ya folklorîke bi çi awayî fînanse kerde?

**A.Ç:** Mi heta ewro xebatanê xo yê folklorîkî de qet kesêk ra yan zî dezgehêk ra hetkarîye nêgirewte. Heme xebatê mi bi xo bi îmkân û hêzê xo fînanse kerdî.

**E.Ş:** Kovare/organîzasyon/keyepelê înternetî yê ke kultur û folklorê Kurdî (bitaybetî yê Zazakî) yê ke şima înan dir pîya xebetênê estê, yan zî têkilîyêka şima înan dir esta?

**A.Ç:** Kovare û keyepelê sey Kovara Vateyî, Kovara Şewçîla, Tîroj û DersimInfo, Zazakî.NETî reyde têkilîya mi esta. Yanî pîyaxebitîyayîşî ra teber teyna nuştayê mi nê kovare û keyepelan de yenê weşanayene.

**E.Ş:** Tradîsyono fekkî seba şima yeno çi mana? Şima ey senî pênase kenê?

**A.Ç:** Tradîsyono fekkî seba mi yeno manaya çemo/ro ke bi serran bêj bi bêj rayîran ra herikîyayo û bîyo dewlemend, bi dewlemendîya xo der û dorê xo keno rengin o. Birastî ez qet pênase ci ser o nêfikirîya. Labelê mi rê winî yeno ke tradîsyono fekkî sey dengizê zanayîşan o ke tim goreyê wext û cayan (mekanan) beno newe û gil dano û beno dewlemend o.

**E.Ş:** Bi şima kamcîn term seba xebatanê winasîyan hîna raşt o; tradîsyono fekkî, edebîyato fekkî yan folklor? Şima kamcîn şuxulnenê? Eke şima yewna term şuxulnenê keremê xo ra binûsê.

**A.Ç:** Ez termê edebîyato fekkî xebitnena. Mi no derheq de, yanî zî nê termî ser o cigêrayîşî nêkerdê labelê beno ke hem Gruba Xebate ya Vateyî û hem zî xebitanayîşê nê termî (folk zî) mi rê asan yeno coka nê termî tehrîc kena/weçînena.

**E.Ş:** Gama şima folklor arê danê bala şima hîna zaf çiyî ser o ya?

**A.Ç:** Wexto ke ez çiyêk arê dana yan zî gêna binê qeydî, tewr zaf bala mi rewşe û qaydeyê qiseykerdişê qiseykerdoxî/e anceno. Çünke zanayîş û çiyê ke ma reyde yenê parekerdene goreyê nê di çîyan qalîte û bingeşê xo gênê. Tabî no nêno a mana ke tewirê bînî kêm û şaş ê. Bêguman her kes nêşkeno nê çîyan asan û bi qaydeyê ci qisey û pare bikero. Yanî no zî cayêk de huner wazeno.

**E.Ş:** Kamcîn tewirê tradîsyonê fekkîyî hîna zaf bala şima ancenê? Nimûneyan bidê.

**A.Ç:** Tewr zaf estanikî bala mi ancenê. Bitaybetî estanika Şahê Maran. Labelê mi heme tewirê folklorî zî arêdayî û heme zî seb mi taybetî yê.

**E.Ş:** Eceba/Tirêman arêdayîş de şima versiyonanê orjînanal yê nêorjînanal ra cîya kenê?

**A.Ç:** Nê karî de, nimûneyanê versiyonan de sînor û pênasê orjînal û nêorjînanal çi yo gelo? Goreyê mi tradîsyonê fekkî de ma nêşkenê vajê na orjînal a, na zî nêorjînal a. Arşîve mi de cîya-cîya mintiqeyan ra eynî estanike ra çar-panc versiyonê estê, labelê ez nêşkena vaja ke na orjînal a. Yanî ma dest de yew belge yan zî çimeyêk esto ke ma binîme têver û vajê na orjînal a. Eynî estanike – yan zî sewbîna nimûneyêk- bo zî her versiyon goreyê qiseykerdoxî, bawerî û nîyadayîşê ci, goreyê ca û wextî vurîyena. Çünke çimeyê edebîyatê fekkî goreyê ca û wextî, kultur, şeklê ciwîyayîşî, bawerîye vurîyenê. Mi karê arêdayîşî de zaf varyantî arêdayî, heme zî eynî duşt de wayîrê senîniye. Bikilmî ez nimûneyanê arêdayîşî orjînal û nêorjînal cîya nêkena. Goreyê beşî xebatanê xo ca dana ci, yanî sey varyantan.

**E.Ş:** Şima qe berhemêko nêorjînal arşîvê xo ra red kerd û vet?

**A.Ç:** Ney. Mi çim de heme nimûneyê arêdayîşî hêca û taybetî yê. Cayê de ney cayê de wezîfeyê xo anê ca.

**E.Ş:** Bi ya şima tesîrê deyîr/kilam/deyîş û terzê cuya vatoxanê nînan tradîsyonê nûşteki/modernî ser o esto?

**A.Ç:** Qet îfîmal nêdana. Yanî çiyêko nîyanên tayê zor aseno.

**E.Ş:** Tirêma ê tekstê ke şima arê dayê seba cuya şima hetkariya înan qe virazîyena? Yanî çarçiwaya exlaqîye de paştî danê şima? Mesela gama cuya şima de çiyêko taybet (xusûsî) biqewimîyo ê xebatê şima kewenê şima vîrî yan zî şima înan anê xo vîrî? Nimûneyan bidê.

**A.Ç:** Tekstê mi arê dayê hetê teknîkî ra ney, labelê hetê hîskerdiş û vîrameyîşî ra, reyna seba xo û vîyarteyê xo naskerdişî de wayîrê giranîye. Hetê exlaqîye ra paştî nêdanê, beno ke zerar bira danê. Ney, mi ke yew xebate kerde teman, reyna zaf peyê ci de nêşona, xebatanê xo yê neweyan de nîyadana.

**E.Ş:** Şima berhemê tradîsyonê fekkîyî arê dayî (danê). Şima eşkenê na yewe tayê îzeh bikerê yanî şima bi çi hawayî na xebate kerde (kenê)? Metodê şima çi yê?

**A.Ç:** Ez verê cû kesan doz kena, goreyê ci zî yew program virazena. Xora hîna ke ê/a kesî/e de nêameya têhet derheqê ci de nasanê ci ra zanayîşan gêna. Yanî kamcîn babetan de hîna zaf wayîrê zanayîşê, kamcîn wextan û leyê kaman de hîna asan qisey kenê ûsb. Karê arêdayîşî rey de nêbeno, ti se bikerê zî tayê çiyî nêmcet manenê yan zî qiseykerdox a saete nîyano xo vîrî. No semed ra eynî kesî de wextanê cîyayan de çend reyî bînî reyna yena têhet. Beno ke zaf wextan eynî estanike yan zî nimûneyanê bînan çend reyî reyna gêna bîne qeydî. Goreyê qiseykerdoxî cîhazî zî vurîyenê. Zaf kesî kamera nêwazenê, şermayîne yan zî xo duştê kamera de rehet hîs nêkenê. Ez hîna zaf cîhazê qeydî xebitnena. Ez bi xo tim di cîhazan gêna leyê xo. Reyna çiqas mi dest ra ame ez yew nasî -tim ney- yan zî keso ke qiseyweş o ke qiseykerdox/e leyê ci de asan qisey kena gêna leyê xo. Xora verê cû -tabî no goreyê şertan vurîyeno- ez hemem dest nêkena qeydan, pêvînayîşê

verênî de teyna yewbînşinasnayîş û xoşebere kena. Pêvînayîşanê bînan de zî dest bi qeydan kena. Wextê pêvînayîşî de ez qetîyen mudaxeleyê qiseykerdoxî nêkena. Labelê bado çîyê ke yenê mi vîrî, mi not girewte ci ra persena; çîyê ke bado yenê vîrê qiseykerdoxî zî reyna şoma qeyd kena.

**E.Ş:** Tirê mî şîma merdim, kurs, zanîngeh yan zî sazîyêk ra nê warî de perwerde girewto? Kamca? Senî?

**A.Ç:** Mi cayêk ra perwerde nêgirewt labelê mi xo na babete de cigêrayîşî kerdî. Hîna zaf kitaban ra musaya. Yew kî, xebatê ke ameyê kerdene ser o zaf vindeta. Yanî teorîyê nê karî kitaban ra musaya labelê eslê ci de karî zereyê karî de musaya. Çünke teorî heta cayêk ti beno, pratîk çîyêko bîn o. Kes bi zanayîşêk kewena rayîr labelê rayîr, yanî pratîk zanayîşê to hîna keno xorîn.

**E.Ş:** Tirê mî rayîrê/metodê arêdayîşê folklorî yê şîma yê nikayênî yê verênan ra bîyê cîya? Senî?

**A.Ç:** Helbet mîyan de ferqêk esto. Ewro nê warî de îmkan û şertî hîna asan ê, cîhazê qeydî, nêzdîbîyayîşê merdîmanê bi nê çîyan sey verî nîyo. Verê cû teyb û yan zî goştarîye kerdêne û nuştene. Labelê nika winî nîyo. Hetê bînî ra şarê ma nê serranê peyênan de vera teberî hîna bî a. Des serrî verê cû ez şîyêne tayê keyeyan kokîman, înan tersê dewlete ra ziwanê xo de mi rê çîyê qisey nêkerdene, nika winî nîyo. Televîzyon, (bitaybetî zazakî), medyaya sosyale ûsb.. zaf çî bedilnayî. Êdî zaf kesî cîya-cîya cayan ra vîdeoyan yan zî vengyan qeyd kenê û kenê pare. Ewro ma eşkenê medyaya sosyale ser o zaf asan birese nimûneyanê fekkî. Tabî nê çîyan metod û arêdayîşê folklorî ser o tesîr kerd. Zaf reyan mi bi nê nimûneyan kesî doz kerdî û înan reyde ameya têhet. Ê reyna zaf kesan WhatsApp û medyaya sosyale ser o mi rê nimûneyê folklorî şawitî. Yanî ewro hem hetê teknîkî ra hem hetê qeydkerdiş-parekerdişî ra zaf çîyî sey verî nîyê, çünke hem teknîk hem însanî û psîkolojîyê ci vurîya.

**E.Ş:** Arşîv seba şîma yeno çî mana?

**A.Ç:** Arşîv seba yeno manaya vîrî.

**E.Ş:** Tirêm arşîvê şîma esto? Arşîvêko senên o? Ma vacê nûştayê destî, bandê teypî, kitab, dijîtal (komputer) yan zî keyepelê înternetî, keremê xo ra nimûne bidê.

**A.Ç:** Heya, arşîvêde mi esto, arşîvêde gird. Hîna zêde vengê ke mi bi cîhazan qeyd kerdê ca gênê. La mi tayê kesan ra bandê teyîban zî peyda kerdî. Arşîvê mi harddiskan de ca gêno. La şenik bê zî mi tayê çîyî youtube<sup>2</sup> de pare kerdê.

**E.Ş:** Arşîvê şîma senî yeno namkerdene (yanî nameyê qeydan/rekordan, dosyeyan, ûsb.). Tirêm sîstemêkê şîma yê tesnîfkerdişê xebatanê şîma esto?

**A.Ç:** Mi heme arşîvê xo bi sernameyî “*Folklorî Welatî*” name kerd, labelê zereyê ci de klasor bi klasor arêdayeyî cîya-cîya ameyê rêzekerdene; şaristan bi şaristan, mintiqa bi mintiqa, dewe bi dewe. Û reyna beş-beş estanikî, deyîrî, fiqrayî, hêkatî, roportajî...

**E.Ş:** Tirêm şîma qe xebatê xo yê folklorîkî sîstemê dijîtalî (komputerî) de zî qeyd kerdê yan zî xebatê ke şîma înternetî ser o pare kerdê estê?

**A.Ç:** Zaf nêbê zî mi xebatê xo yê folklorîkî sîstemê dijîtalî de zî qeyd kerdî. Nê xebatanê mi ra tayê nimûneyî înternetî ser o ameyê parekerdene.

**E.Ş:** Tirêm şîma arşîvê xo sey “arêdayîşê ercanê/qîmetanê madîyan” yan nê ra zîyadê sey “arêdayîşê ercanê nêmadîyan” yanî sey ercanê manewîyan vînenê?

**A.Ç:** Ez arşîvê xo sey “arêdayîşê ercanê nêmadîyan” vînena.

**E.Ş:** Tirêm şîma arşîvê xo bi rayîrêk muhafeze kenê/pawenê (mesela vindîbîyayîşî ra, tozî ra, polîsan ra, ûsn...)?

---

<sup>2</sup> [https://www.youtube.com/channel/UCe0TfPw11XHQRv44mUS9lqA/featured?view\\_as=subscriber](https://www.youtube.com/channel/UCe0TfPw11XHQRv44mUS9lqA/featured?view_as=subscriber)

**A.Ç:** Mi xebatê xo cîya-cîya harddîskan de arşîv kerdî. Nê harddîskan ra yew nika binê destê mi de yo, yê bînî welat de keyeyanê çend nasanê mi de yo. Mi semedê vindîbîyayîş û polîsan ra wina rayîrêk teqîp kerd.

**E.Ş:** Tirê m sazî/organîzasyon/kovare/keyepelê înternetî ke şima pîya şuxulênê xebatanê şima arşîv kenê? Tirê m aşrîvêkê înan bi xo esto?

**A.Ç:** Goreyê zanayîşê mi nêkenê. Eke kenê zî ez nêzanena, zanayîşê mi çin o.

**E.Ş:** Tirê m bi ya şima kovare yan zî keyepelê înternetî zî eşkenê rolê arşîvî kay bikerê?

**A.Ç:** Goreyê mi kovare yan zî keyepelê înternetî zî eşkenê rolê arşîvî kay bikerê. Hetê seveknayîş û resî ra ma eşkenê nînan sey alernatîf bivînê.

**E.Ş:** Tirê m çîyanê ke (berhemanê ke) şima arê danê, şima înan çap kenê yan zî weşanenê? Ça/kotî? Senî?

**A.Ç:** Heya, çîyê ke mi arêdayê weşanayî. Heta nika mi panc hebî kitabê estanikan dayî weşanayene. Nika zî hîrê kitabê mi (hîkaye, açarnayîş û estanike) seba çapkerdişî Weşanxaneyê Vateyî de vînetîyê. Teberê yew kitabî yê bînî mi xo dayî çapkerdene.

**E.Ş:** Şima ra gore kamcîn metodê weşanayîşî/çapkerdişî seba tradîsyonê fekkî yê Kurdkî (bitaybetî seba Zazakî) tewr rind ê û çira?

**A.Ç:** Heme zî seba ke hîna zaf biasayê, vila bibê û biresê şarê ma muhîm ê. Labelê televîzyon û medyaya sosyale na babete rindêr ê.

**E.Ş:** Wextê weşanayîşî/çapkerdişî de şima berhemanê folklorîkan senî weçînenê? Muhîmîye danê çiyî ser?

**A.Ç:** Ez hîna zaf hetê qalîte ra zaf ser o vindena. Nimûneyê ke destê mi de yê goreyê qalîte weçîna û kena rêze. Labelê miheqeq hemeyen xebitnena, tewr nêbo sey varyantan xebatan de ca dana ci.

**E.Ş:** Bi şima amacê çapkerdiş/vilakerdiş çi yo?

**A.Ç:** Amancê çapkerdişî, seveknayîş û resnayîşê eleqedar û wendoxan o.

**E.Ş:** Tirêma weşanayîşê kurdkî (bitaybetî ya Zazakî) yê berhemanê tradîsyonê fekkîyî goreyê serranê verênan nika vurîyeno (bedelêno)? Eke e, senî vurîyeno, şima eşkenê bi kilmekî îzeh bikerê?

**A.Ç:** Helbet goreyê serranê verî weşanayîş zî goreyê dem û teknîkî vurîyenê. Ewro her hetê ra îmkanî hîna zaf ê. Weşanxaneyî weşanxaneyê des-des û pancês verî nîyê. Reyna lehçeya zazakî/kirmanckî ser o herçiqas nuştox û cigêrayoxî têserê nêkerê zî, goreyê tarzê xo ziwani de aver şîyê. Eserê ke verê cû ameyê weşanayene de hama-hama her noştox goreyê tarz û qaydeyê xo nuştêne. Herçiqas tayê meselayan de têserê nêkerê zî reyna yewbînî ser o têsîr kenê. Çünke êdî yew sîweye esta, nê karî êdî restê sewîyêk. Cigêraxoxî, arêdayoxî eserê ke ameyê weşanayene eşkenê peyda bikerê, tehlîl û ci ra îstîfade bikerê û goreyê çi dest bi nêxebatanê xo bikerê. Ma ke tayê eseran ê tradîsyonê fekkîyî yê ke verê cû ameyê de nîyabidê vînenê ke nuştoxî goreyê xo ziwani/alfabe xebitnaya. Yanî ma eşkenê vajê hetê qalîte, ziwani, alfabe û dîsîplîne nê karî ra goreyê serranê verênan ferqêq esta.

**A.Ç:** Şima wazenê versiyono çapkerde yê xebata şima qey kamî bo, yanî kesê ke şima wazenê berhemê şima biresê înan kam ê, kamcîn dor ê?

**E.Ş:** Tirêma şima berhemanê folklorîkan yê çapkerdeyan rê vateyo verên yanî zî şîrove nûşt?

**A.Ç:** Ney, labelê mi redaksîyonê xeylê kitabani kerd.

**E.Ş:** Tirê m teberê çapkerdişî/weşanayîşî de şîma yan zî embazê şîma ro rayîranê cîyayan ê vilakerdişê tradîsyonê fekkî yê Kurdkiyî (bitaybetî yê Zazakî) gêrenê (mesela festîval, tîyatroyê, aktîvîteyê pêşkêşkerdişî yê cîya cîyayî ?) Ê çî yê?

**A.Ç:** Çend embazanê mi bi rayîrî tîyatroyî dest eşt nê karî. Reyna yew embazê min ê mûzîsîyenî tayê nimûneyî bi mûzîk pêkêşê şarê ma kerdî. Nê embazanan, fiqrayî, kayvateyî (vacvacokî) û çend estanikî xebatanê xo de xebitnayî.

**E.Ş:** Goreyê şîma înternet seba pawitişê edebîyatê fekkî yê Kurdki (bitaybetî yê Zazakî) eşkeno rolêko senên kay bikero? Seba platformê înternetî ser o pawitiş û averberdişê ziwanî pêşniyazî yan zî fikrê şîma estê?

**A.Ç:** Înternet çiqas nê berhemanê folklorîkan sevekneno û aver beno nêzanenê labelê seba vilakerdiş û resnayîşê şarê kurdî rayîrêko baş o. Ewro her kes goreyê keyfê xo înternetî ser o nimûneyan keno pare. Beno ke seba ziwan û berhemanê folklorîkan keyepelê taybetî bibê hîna baş beno. Yanî sey arşîv. Tabî nê karî zî ganî kesê ke nê warî de pisporê bikerê baş beno.

**E.Ş:** Şîma têkilîya mabêna edebîyatê fekkî û kulturê modernî senî vînenê?

**A.Ç:** Tabî goreyê wextan bedilîyayîşê tekilîya berardiş-serfî reyde şekl û hewcedarîya cuya însanan zî bedilîyena. Edebîyat, bitaybetî edebîyatê fekkî goreyê wextan şekl û binge gêno. Ewro têkilîya edebîyatê fekkî û kulturê modernî de mesafeyêko gird esto. Çunke kulturo modern “dîjîtal” o, yanî her çî binê qeyd de yo, verê çîman de yo. Zereyê çarçewayêk de sînorê ci kifş ê; êdî yew qalib girewto. Çiqas yewbînî ra cîya bibê zî, winî biasê zî cayêk de goreyê hewcedarîya pîyaseyî xetêk ser o eynî çîyêk rê xizmet kenê. Labelê edebîyatê fekkî winî nîyo, yew sînor ci çîn o, gandar o û herden bi bedilîyayîşan beno lete, beno xurt û her vîr, mekan, reng û vengî de xo rê seba neql û ciwîyayîşî binge vînenê.

Ewro ma kulturê modernî de rêçe û nimûneyanê edebîyatê fekkî eşkenê asan bivînenê labelê nînan formêko bîn girewto û seba çîyêde bînî xizmet kenê. Yew, yanî edebîyatê fekkî hîna zaf seba hewcedarîya merdîman esto û seba înan neqlkerdişê vîr, tarîx ûêb... o, labelê kulturê modernî çîyêko bîn o, o goreyê pîyaseyî şekl gêno



û cayêk de herçiqas cuya merdimî de wayîrê giranîye bo zî, merdim û hewcadariya ey a bingeyîne ra dûrî yo.

**E.Ş:** Şima kamcîn motîfanê folklorî kultur û edebîyatê modernî de peyda kenê, anê meydan?

**A.Ç:** Ez edebîyatê modernî de hîna zaf estanikan xebitnena.

**E.Ş:** Şima têkilîya mabêna motîfanê folklorî û kulturê modernî senî vînenê?

**A.Ç:** Ewro zî kulturo modern hîna motîfanê folklorî ra beno weye, îstîfade keno, yanî malzemeyanê xo uca ra gêno labelê newe ra şekl û reng dano ci. Bi ardim û nimûneyanê înan vîrê merdiman de ca dano xo û înan ser o têsîr keno. Labelê bi reng û şeklêko bîn. Eslê ci de kulturo modern nînan sey “malzemeyê serfî” vînenê û seba xurtbîyayîşê sîstemê serfî înan xebitneno. Winî aseno ke her çî, bi vatişêko bîn heme motîfê folklorî fekê sîstemê serfî de qiymetê xo ra kewenê.

**E.Ş:** Goreyê şima îhtîyacîyê tewr pîlî yê arêdayîşê tradîsyonê fekkîyî û viraştîşê arşîvê tradîsyonê fekkîyî çî yê? Û nê wareyî de problemê tewr pîlî çî yê?

**A.Ç:** Her çî ra ver piştîdayîş zaf muhîm o. Hem madî hem zî manewî. Çunke rasta zî no karêko zaf giran û bizehmet o. Nêzdîyê des-yewendes serrî yo ke ez bi hêz û îmkananê xo çiqas mi dest ra ame mi nimûneyê folklorî arêdayî, labelê eke wextêk de kesêk yan zî sazgehêk destek bidayêne mi beno ke nika arşîvê mi di-hîrê qat hîna dewlemend bi. Çunke no kar masa ser o nêbeno, ganî seba ke ti asan û hîra nê war de bixebitîye to rê desteko ekonomîk lazim o. Problemêko bîn zî, weşanayîşî nê xebatan o. Ewro hende karê arêdayîşî, weşanayîş zî problemêko gird o. Ez û kesê sey mi perse weşanayîşî de zehmet ancenê. No zî hem seba wendoxan û kulturê ma çîyêko baş nîyo. Oxra ke eke nê do biameyênene weşanayene eleqedar û wendoxî ci ra îstîfade bikerdêne.

**E.Ş:** Fikrê şima seba halkerdîşê nê probleman çî yo? Pêşnîyazîyê şima çî yê?

**A.Ç:** Na babete de seke mi vat, piştîdayîş zaf muhîm o. Nêke teyna kesî, heme weşanxane, komele, dezgeh û enstîtuyî ganî piştîdayîş bidê arêkerdox û xebatanê nê kesan ra wayîr bivejîyê. Gamêka winasîye seba kesanê ke wazenê nê warî de xebatan bikerê, hem înan teşwîq kena û hem zî seba kultur û edebîyatê ma beno netîceyêka dewlemende.

# Hevpeyvîna bi Bahoz Baranî ra

Bahoz Baran is a modern Kurdish story writer. He has authored four short story collections. In his works, he takes inspiration from folklore and folk language and focuses on very diverse topics. He published a book on Kurmanji grammar and taught Kurdish (Kurmanji) language in courses offered by various organisations. He also collects Kurdish folklore, and one of his books contains folk stories. He believes that, for the purpose of developing the modern language, the Kurds have to pay more attention to their roots and oral tradition and benefit from its richness. In his view, the role of folklore in revitalising the Kurdish language is indispensable.

Bahoz Baran çîroknûsekî edebîyata modern a kurdî ye. Baranî, çar pirtûkên çîrokên modern nîvisîne. Zimanê çîrokên wî, ji folklor û zimanê gelî feyz digire, mijarên çîrokên wî cuda û balkêş in. Herweha ew li ser rêzimana kurmancî xebitîye û pirtûkeka rêzimanê ya kurmancî amade kirîye. Bi salan li sazîyên zimanî dersa kurd-kurmancî daye. Bala wî li ser folklorê kurdî ye jî û ew xwedî pirtûkeka folklorê ye ku ji çîrokên gelêrî pêk tê. Baran giringîyê dide folklorê û keresteyên wê. Ew dîyar dike ku ji bo zimanê modern ê kurdî divê mirov berê xwe bide avahîya xwe, folklorê xwe, û têra xwe jê sûtê werbigire. Li gor wî, di vejandin û jinûvekirina zimanî da rola folklorê bêhempa ye.

**Joanna Bochenska:** Ji kerema xwe ra ji me ra behsa xwe bike. Nav û paşnavê te çi ye? Tu ji ku yî? Çend salî yî? Tu çi karî dikî?

**Bahoz Baran:** Navê min Bahoz Baran e, ez di sala 1982an da li Licê ji dayik bûm. Min heta lîseyê li Licê bi zimanê tirkî xwend, lê zimanê jîyana min tim bi kurdî-kurmancî bû. Di sala 2000î da min li Zanîngeha Dîcleyê beşa zimanê tirkî qezenc kir. Ji berê da têkilîya min û nivîsê hebû, lê ne xurt bû, li zanîngehê me kovareka bi navê Tîgrîsê<sup>1</sup> derxist, li wir min dest bi kurdî kir. Çîroknûs im, karê

<sup>1</sup> Kovara Tîgrîsê: Ji aliyên xwendekarên Zanîngeha Dîcleyê ve di destpêka salên 2000î da hat derxistin. Di sala 2003yan da kovarê zimanê xwe kir kurdî-tirkî. Heta sala 2015an jî kovar çalak bû.

min yê sereke ev e, heta niha min sê<sup>2</sup> pirtûkên çîrokan çap kirine. Ji bo debara xwe karê mamostetîyê jî dikim. Ji xeynî van karan, li ser zimanî dixebitim, min “Rêzimana Kurmancî” amade kir. Yek ji avakarên Weşanên Wardozê<sup>3</sup> me, edîtorî û redaktorîya wê dikim, bi qasî ku ji min tê berhevkarîyê dikim. Min heta niha şeş pirtûk çap kirine, yek jê *Rêzimana Kurmancî* ye, yek li ser bişaftinê ye, *Ferhenga Bişaftinê*, min ev pirtûk ji nîşeyên xwe yê 15 salan amade kirin, li ser bişaftinê min çî bidîta qeyd dikir. Pirtûkeka min çîrok û meselokên kalê min in ku min li gor mijaran ji hev veqetandine û navê wê *Motik* e. Sê pirtûkên min, *A Baş*, *Derb* û *Qîza Bavê Xwe* jî çîrokên modern in. Ez rêveberekî Weqfa Mezopotamyayê me û herweha endamê Komxebata Kurmancîyê<sup>4</sup> me, ez beşdarî amadekirina *Rêbera Rastnivîsînê*<sup>5</sup> jî bûm.

**J.B:** Tu li ser çanda dekvî dişixulî, tu dikarî behsa destpêka wê bikî? Çima folklorê kurdî bala te dikişîne?

**B.B:** Destpêk ji bo min peyv e, bîranîn e, jîyan e. Ez ne bajarî me. Gund û folklorê destbirak in. Ez di nava folklorê da bûm, me heywan xwedî kirîye, me erd ajotîye. Em bi kilaman mezin bûn. Li mala me hew teyb hebû ew jî ji bo kilaman bû. Ez wê çaxê ji dengbêjan aciz dibûm lê bavê min aşiqê wan bû. Lê çîrok, meselok, qewlêrk û dûrikan bala min dikişand. Kêfa min ji meşkê ra dihat, min bi saetan li tevnê û teşîyan dinêrt. Destpêk çî ye nizamim, min dîya xwe pirsî got min ji te ra lorî digotin, belkî destpêk ew be. Wextê ez ji bo xwendinê hatim bajarî (Diyarbekirê), min dît bajar rût e, tişteke tê da tune, axaftin û jîyana li bajarî bi min pir nexweş

---

<sup>2</sup> Nîşeya edîtorê: Dema vê hevpeyvînê, Bahoz Baranî li ser pirtûka xwe ya çîrokên modern a bi navê Rik'ê dixebitî. Lê aniha, di sala 2022an da, pirtûk (Rik) ji Weşanxaneyê Wardozê derketîye. Bi gotineka din, çar pirtûkên wî yê çîrokên modern hene.

<sup>3</sup> Weşanxaneya Wardozê: Li Bakurê Kurdistanê, li bajarê Diyarbekirê di sala 2017an da hatîye avakirin. Heta niha ji hêla weşanxaneyê ve 45 pirtûk hatine çapkirin û piraniya wan jî li ser folklorê kurdan e.

<sup>4</sup> Komxebata Kurmancîyê: Bi înisîyatîfa Weqfa Mezopotamyayê ava bûye. Di pêkanîna Komxebatê da hem nûnerîya çar parçeyên Kurdistanê û herweha ya dîasporayê jî heye. Endamên Komxebatê di warê zimanî da pîspor in û gelek xebatên wan li ser zimanî hene, ew jî hêla civakê tîn naskirin.

<sup>5</sup> Rêbera Rastnivîsînê: Pirtûka encama heft civînên (ji 14.03.2015an heta 12.07.2017an) Komxebata Kurmancîyê ye. Ew li ser rastnivîsîna kurmancîyê ye.

hat, hîn jî wisa ye, wekî ji eslê xwe, ji resenîya xwe dûr ketibin, hilberîn tune, mezaxtin heye. Eger mirov bi çand û kelepura xwe nezane, mirov vala ye. Mirov çî bixwîne, çî bike jî nikare bide ber hev. Nietzsche dibêje, “*Ji bo hûn bikarin bibin tişteke pêşî gerek hûn tişteke bin.*” Ji bo mirov bikare ya dinyayê ji ber neke, nas bike, divê mirov pêşî ya xwe bizane, di ser wê ra lê bike. Folklor ji bo milletên din belkî hêmayeka berteng û êdî dûr be. Ji bo kurdan ev ne wisa ye. Awayê jîyana wan e, li gund û waran ev hîn jî wisa ye. Avahîyek e folklor. Mîrateya kurdan a herî xurt e. Sînorê wê pir berfireh e. Hebûna wan temsîl dike. Çî ji derve çî hundir bala gelek kesan çûye ser folklorê kurdan a zengîn. Çima gelo? Çand û kelepura kurdan neketîye nava qeyd û bendan, di nava pergalekê da nefetîsîye, wekî wan hespên kovî yê çiyayan maye, azad e, beza ye. Mirov bi folklorê xwe, xwe nas dike. Ma dê şax doza nasîna dara xwe, koka xwe neke?

**J.B:** Te kînga dest bi vî karî kir?

**B.B:** Hevdeh sal berê, wextê me zimanê kovara xwe (Tîgrîsê) kir kurdî û min cara ewil gotinên pêşîyan û biwêjên kurdî xwendin, pir bala min çû ser wan. Her yek ji wan tecribeyên sed salan bûn. Ji aqilê giştî yê vî milletî dawerivîyabûn. Min ji xwe ra defterek stend û dest pê kir, çî ket ber min, min qeyd kir. Bala min bêhtir li ser zargotinê ye, nivîsê ye. Kêfa min ji gotinê ra, ji hunerên edebî ra tê.

**J.B:** Tu bi kîjan rêxistin (sazî) û kovaran ra dixebitî? Herweha pêwendîya te bi kîjanî ra heye?

**B.B:** Li zanîngehê kovara Tîgrîsê hebû, xwedî û xebatkarê wê bûm. Li Diyarbekirê, li Kurdî-Derê<sup>6</sup> xebitîm, endamê wê me.<sup>7</sup> Min li wir deh salan mamostetîya kurdî kir. Niha jî di rêvebirîya

---

<sup>6</sup> Kurdî-Der: Komeleya Lêkolîn û Pêşvebirina Zimanê Kurdî, di sala 2006an da li Diyarbekirê hat avakirin. Şaxên wê li piranîya navçe, bajarok û bajarên Bakurê Kurdistanê hebûn. Komele bi sedan xwendekar perwerde kirine. Li ser zimanê kurdî bi sedan panel û konferans li dar xistine. Ew di sala 2016an da ji hêla dewletê ve hat girtin.

<sup>7</sup> n.e: Lê li şûna Kurdî-Derê, di sala 2017an da li Diyarbekirê komeleyeka bi navê “*Komeleya Lêkolînê ya Ziman û Çandên Mezopotamyayê (Med-Der)*” hat avakirin. Li vir, Bahoz Baran behsa vê komeleyê dike.

Weqfa Mezopotamyayê<sup>8</sup> da me, endamê *Komxebeta Kurmancîyê* me. Yek ji xwedîyên Weşanxaneyê Wardozê me, û edîtorê wê me.

**J.B:** Tu karê xwe çawa fînanse dikî?

**B.B:** Ez mamostetîya dewletê dikim. Ez xwe wisa fînanse dikim. Wekî din hatineka min tune ye. Karê kurdî mirovan zêde fînanse nake, çunkî li Bakurê sih milyon kurd hebin jî, jê %0,1 xwendevan tune ne. Lê dîsa jî prensîp e ji bo min, ez hemû karê xwe yê nivîskî-jîyanî bi kurdî-kurmancî dikim. Weşanxaneyê me jî ji xeynî kurdî bi tu zimanên din ên serdestan pirtûkan çap nake. Gelek weşanxaneyên kurdan bi pirtûkên xwe yê bitirkî xwedî dibin. Em vî tiştê ku li gor me şaş e, nakin.

**J.B:** Kevneşopîya devkî ji bo te çî ye? Tu dikarî wê pênase bikî?

**B.B:** Gotineka me ya pêşîyan heye, “*Her gîya li ser koka xwe şîn tê.*” Mirov tu carî nikare zimanekî ji nû ve biafirîne, pêvajoya avakirina zimanan dûdirêj e û kolektîf e. Ziman, ked e, keda hezar salan e, mirov ku nede ser wê şopê, peyva xwe, gotina xwe nas neke, nikare wê derbas bike. Ziman, di nava devî da ye, di kurdan da ya herî çalak ew e. Dev, xwedî tecribeyeka zêde ye. Nemiçiqîye. Ew barhilgirê çand û hunerê ye.

---

<sup>8</sup> Weqfa Mezopotamyayê: Di sala 2013an da, li Dîyarbekirê bi mebesta avakirina zanîngeheka di serî da kurdî û pirzimanî hat avakirin. Vîzyona weqfê bi vî awayî ye: Pirzimanî û gerdûnî ku zimanê wê di serî da kurdî be. Azadîxwaz, demokratîk, rexneyî, afirîner, pirsyarker, wekhev, piştevan, paydar û xwedî etîk be. Xwedî vîzyoneka ekolojîk ku dewlemendîyên çandî û surîştî ji bo pêşketina herêmê bi kar tîne. Ji bo nûjenî û hevkarîyên akademîk amade be û piştgirîya danehava zanistî ya gerdûnî bike. Çand û zimanê kurdî di hemû qadên jîyanê da bi pêş bixe ku di qada gerdûnî, hemû dîsîplînên zanistî, perwerdehî, lêkolîn û çalakîyên weşangerîyê da bê bikaranîn. Herweha weqif li ser ziman û çanda kurdî xwedî gelek xebatên hêja ye. Xebatên wekî “Rêbera Rastnivîsînê,” “Termînolojîya Hiqûqê,” pirtûkên li ser zimanî yê wekî “Rahênanên Zimanê Kurdî,” “Keşana Karên Kurdî,” “Du Zimanî Zarok û Perwehî,” pirtûkên li ser berhemên çanda devkî yê wekî “Kûçîkê Daleqandî,” û “Meryemnîgarê.” Herweha weqf xwedî du kovarên folklorê ye ku navê wan “Folklorê Me” û “Folklor û Ziman” e. Niha jî Weqfa Mezopotamyayê çalak e û karên xwe yê li ser ziman û çanda kurdî dewam dike.

**J.B:** Dema tu keresteyên folklorê berhev dikî bala te bêhtir li ser çi ye yan jî li ser kîjan cureyê ye?

**B.B:** Bala min bêhtir li ser peyv û biwêj û meselokan e. Ev çar pênc sal in deng jî bala min dikişînin. Çima di zimanê me da deng ewqas pir in? Dengên heywanan, dengên xwezayê, dengên mirovan, dengên eşyayan. Bi hezaran deng.

**J.B:** Qesta te ya “deng”î çi ye? Tu dikarî ji me ra vê yekê zelal bikî?

**B.B:** Ji wan ra navedeng jî dibêjin. Li ser meseleyê, dengê gazîkirina mirîşkê “tû tû tû” ye, dengê gazîkirina çêlikên mirîşkê “cû cû cû” ye, dengê qewirandina mirîşkê “kiş kiş kiş” e, mirîşk wextê hêk dike, “qireqir”e. Sîstemeka dengên heye. Li ser meseleyê, mesela “pix” “pixîn” “pixîni” “pixpix” û “pixepix” ev bêhtir ji bo asta nizm a kenê însanan e, wextê dengê kenî bilind bibe, dibe “hîrehîr”, “tîqetîq”. Dengê hemû heywanan, eşyayan li bal me heye. Bi dehan dengên avê hene, wextê av li keviran dikeve “xuşxexuş” e, wextê av ji jor da tê dibe “şireşir,” wextê av dikele dibe “bilebil,” wextê av dilop dike dibe “çipeçip,” wextê lingê mirovan li avê dikeve dibe “çelpeçelp.” Min bi sedan deng top kirine.

**J.B:** Kîjancureyênçandadevkîbêhtirbalatedikişînin? Tu dikarînimûneyênwanbidî?

**B.B:** Gotinên pêşîyan û biwêj bala min dikişînin. Di kurdî da bi sed hezaran biwêj hene. Di gelek zimanan da ev hejmar kême. Min bi xwe di nava 10 salan da nêzî 10 hezar biwêj kom kirine. Ez wan jî li gor mijara (naveroke) wan kategorîze dikim: biwêjên li ser çikûzîyê, biwêjên li ser comerdîyê, biwêjên li ser derewçînan...

**J.B:** Gelo tu dikarî bêhtir behsa biwêjan bikî ku çi bala te dikişîne? Bi rastî jî van salên dawî gava ku min li ser wergera kurteçirokên Mehmet Dicleyî dixebitî biwêjan zehf bala min kişand. Ew gelek biwêj bi kar tîne, gelek caran dîmenan bi saya wan diafirîne. Min di dawîya pirtûkê da listeyeka biwêjan çêkir. Li gor te rola biwêjan ji bo edebiyata nûjen heye? Tu dikarî çend nimûneyên balkêş bidî?

**B.B:** Bikaranîna zêde ya biwêj û gotinên pêşîyan ne baş e. Divê mirov bikare wan bi metnê bide xwarin, bi wan ra bilîze, belheq bi kar neyîne. Tu hêmanên folklorê pir zêde bi kar bînî, şêwaza te şexsî dernakeve, afirînerîya te qels dibe, xwendevan ji metnê fam nake û forma te dibe anonîm. Talûke ye yanî. Folklor wekî xwê ye, zêde be şor dike, kêm be bê ekl dike. Li vir tiştêk bala min dikişîne, mesela kal û pîrên me wextê diaxivin nizanin ku biwêjan bi kar tînin, esil bi tu tiştî nizanin, nizanin hevoka wan lêkerî yan navdêrî ye, nizanin ku gotineka pêşîyan gotine, ew ji xwe ra tê da ne, em pir li derve ne. Ew di nava zimanê xwe da bûn, yê me, ziman di nava me da ye. Em dizanin, wextê em biwêjekê jî dibêjin haya me jê heye ku em biwêjekê dibêjin, ev tiştêkî nexweş e, min heta dereceyekê xwe ji vêya xelas kirîye. Ez dixwazim vê yekê di metnê da jî bibînim, yanî bila nivîskar bi min nede hîskirin ku biwêjek bi kar anîye.

**J.B:** Gelo tu versiyonên orijînal ji yên neorijînal cuda dikî?

**B.B:** Belê, eger cure nas be, min versiyon xwendibin, ji hev derdixim, wekî din jî ji zimanî fam dikim bê zarbêj çiqas serwext e di gotina xwe da.

**J.B:** Gelo te qet berhemeka neorijînal ji arşîva xwe derxist?

**B.B:** Belê, hinek xebroşk hebûn li alîyê Serhedê hatibûn qeydkirin, pir zêde peyvên tirkî ketibûn nava wê, hevoksazî xirab bûbû, hin beşên xebroşkê hatibûn jibîrkirin. Loma jî me qebûl nekir.

**J.B:** Gelo li gor te, tesîra çanda nivîskî û ya modern li ser gotin û tevgerên dengbêjan heye?

**B.B:** Helbet li ser wan heye. Gelek jê êdî kilamên xwe nikarin ji ber bikin û bibêjin, ji bo metnan li telefonên xwe dinêrin, mêjî wekî berê çalak nîne, hînî tiralîyê bûye. Ji ber ku gelek tiştên hazir hene, ew êdî bi xwe kilaman çênakin, gelek ji wan yên berê dubare dikin. Tesîra zimanên din jî li ser wan heye, gelek gotinên zimanên din dikevin nava zimanê wan. Ji ber ku gelek jê hatine ketine bajaran, ji mekan û warê xwe, ji atmosfera xwe derketine, mirov dibîne êdî ne organîk in. Li gor bernameyan



û derfetan distrên. Gelek jê bi şaredarîyan ve girêdayî ne û meaşî distînin. Yanî êdî wekî berê nikarin li gor dilê xwe bistrên. Kurdîya şikestî ya bajarîyan tesîr li wan kirîye, kilamên wan xweş in, lê axaftina wan a normal qels e.

**J.B:** Te behs kir ku tu keresteyên çanda devkî berhev dikî. Gelo tu dikarî behsa berhevkarîya xwe bikî? Tu vê yekê çawa dikî? Rê û rêbazên te çi ne?

**B.B:** Ji ber ku karê min ê esasî nivîskarî ye, min berhevkarîyê wekî kar nedaye pêşîya xwe. Kêfa min ji gotinê ra tê, ez hêmanên zargotinê yên derdora xwe qeyd dikim.

- Pêşî wextê dipirsim, an jî li rastî zarbêjekê/î tîm, pê ra dîyalogê, hevaltîyê çêdikim, qala giringîya vê meseleyê dikim. Bi pirsan dixwazim hîn bibim bê çi di tûrikê zarbêjê da heye.
- Paşê li gor destûrê, cîhazên xwe bi kar tînim, qeyd dikim.
- Qeydên xwe deşîfre dikim, gotin û hevokên ku ez nizanim, nas nakim, ji zarbêjê dipirsim.
- Hewce be ji wan ra ferhengokê çêdikim.
- Bi tu awayî dest nadim gotina wan, ji devê wan çawa derketibe wisa qeyd dikim.
- Di karê xwe da ecele nakim, xebata xwe tesnîf dikim.
- Li ser teorîyên folklorê pirtûkan dixwînim û dixwazim taybetîyên folklorê xwe bibînim, kêmanîyên xwe bibînim.

**J.B:** Tu dikarî çend mînakên wan pirtûkan bidî ku kîjan ji wan bêhtir balkêş û giring in ji bo te?

**B.B:** Nivîskarên wekî Vladimir Propp, Kenneth S. Goldstein, Pertev Naili Boratav, Richard M. Dorson, Joseph Campbell, Bedran Hîkmet û Ramazan Pertev. Pirtûkên wekî “Li Qadê Metodên Berhevkirina Folklorê (Kenneth S. Goldstein),” “Folklor û Edebîyat, di sed pirsan da edebîyata gelêrî (Pertev Naili Boratav),” “Folklor Teorî û Dîrok (Vladimir Propp),” “Awayê Morfolojîk yê Xebroşkan (Joseph Cambell),” “Rêwîtiya Sermedî ya Lehengan.” Wekî din ji ber ku mamoste me, li gundî (cihê ku lê mamostetîyê dikim) ji zarokan jî tiştan berhev dikim. Ez wan hîn dikim, ji min

ra tiştan qeyd dikin û tînin. Mesela carekê min spartek da wan, her yekê ji min ra 25 nifir anîn, min di polekê da 750 nifir top kirin.

**J.B:** Gelo lîstik, yanî cureyên taybet ên lîstikan hene? Kesên ku lîstikan berhev dikin hene?

**B.B:** Belê, li ser lîstikan hevalên me dixebitin. Yek ji avakarê Wardozê, hevalê me Mem Mukrîyanî ye, wî nêzî sed lîstik<sup>9</sup> qeyd kirine. Nûrettîn Vûral heye, ew jî bi taybetî li ser lîstikan dixebite. Yek ji hevalên ku me ew perwerde kir, Mûrad heye ew jî lîstikan top dike.

**J.B:** Gelo ji bo wê tu perwerde bûyî? Li ku derê? Ew perwerde çawa bû?

**B.B:** Li vir, li zanîngehan beşeka weha tune ye, min xwe perwerde kirîye, min gelek pirtûk li ser teorîya folklor û zargotinê xwendine, xudriste<sup>10</sup> me ez. Ev du sê sal in em li Weqfa Mezopotamyayê tevî hevalên li Zanîngeha Artûklûyê xwendekaran-berhevkarên perwerde dikin, bi wê perwerdeyê ra em xwe jî perwerde dikin.

**J.B:** Gelo aniha rê û rêbazên te yên berhevkarîyê li gor ên berê guherîne? Çawa?

**B.B:** Berê min kom dikir û belawela bû, aniha ez dixwazim wan li hev bînim, kategorîyan çêbikim, biwêj an gotinên pêşîyan û peyv bin maneyên wan bipirsim û rast qeyd bikim, gotinên hene mirov qeyd dike û paşê maneya wan nayê bîra mirovan. Serê ewil wextê min qeyd dikir, min peyv li gor xwe dinivîsîn, lê paşê min fam kir ku ji devê wan çawa derketibe divê wisa be. Wekî din, berê min zêde agahîyên li ser zarbêjan nedinivîsî, aniha ez hem fotoyên wan hildidim, hem vîdeo qeyd dikim û hem jî jîyana wan bi hûrgilî dinivîsim.

**J.B:** Arşîv ji bo te tê çi maneyê?

---

<sup>9</sup> Mem Mukrîyanî aniha xwedî pirtûkeka lîstikên gelêrî ye. Navê vê pirtûkê, “Lîstikên Gundê Tizyanê” ye, û ew 232 rûpel e, herweha di pirtûkê da 76 lîstikên gelêrî hene. Ew di sala 2020an da, li Diyarbekirê ji Weşanxaneyê Wardozê derket.

<sup>10</sup> Xudriste: Kesên ku bi xwe xwe perwerde dikin.

**B.B:** Arşîv, bîr e, îmkana gihandina bîrê ye. Pergalê tîne bîra min. Dinya, zanîn û çanda dinyayê wekî guloka aşîtê her ku diçe zêde dibe, mezin dibe li hev diherbile, ya miletan jî wisa ye. Ji bo vegera vê bîrê û serwextbûnê, ji bo parastina tiştên mêjûyî starek e arşîv. Arşîv bîra miletan e, miletên bêarşîv piçekî bêbîr in. Di nava kurdan da hişmendîya arşîvê çênebûye, gelek sebebên wê hene, tiştên qeydkirî kurd tim tirsandine, bûne seba darizandina wan, loma gelek tiştên xwe di hişê xwe da hewandine, hiş çalak bûye. Lê êdî em nikarin qala vê yekê bikin, şert û mercên dinyayê yên kurdan guherîne. Arşîv rêkûpêkîyê tîne, rê li ber xebat û lêkolînan vedike. Mirovan bîrkûr dike. Arşîv reh û rîçalên miletî-mirovî ne.

**J.B:** Gelo arşîva te heye? Ew arşîv çawa ye (nivîskî, teyb, kitêb, dijîtal)? Kerem bike hemû nimûneyan bide?

**B.B:** Ne pir zêde be jî heye. Arşîva min a dengan heye, her dengê ku min qeyd kirîye min tesnîf kirîye û parastîye. Ne pir mezin be jî ya fotoyan heye. Ya kitêb û kovaran heye lê bêhtir dijîtal e.

**J.B:** Gelo ew arşîv xwedî pergal e? Tu arşîva xwe çawa bi nav dikî? Bi rêya dosyeyan, cureyên keresteyan, hwd?

**B.B:** Ez li ser pergala arşîvê zêde ne serwext im, lê ya dijîtal û dosyeyên li ber destê min, li gor cure û mijaran ji hev cuda dikim. Bêhtir ji bo folklorê beş û binbeş hene, ez wan ji hev diqetînim, kategorîyan çêdikim.

**J.B:** Tu dikarî mînakên bidî?

**B.B:** Mesela min meselok berhev kirin, 200 meselok, min ew ji hev qetandin, meselokên li ser derewçînan, meselokên li ser çavbirçîyan, meselokên li ser ehmeqan, meselokên li ser baqilan... Dîsa wextê nifir û duayan berhev dikim, nifirên li ser nexweşîyê, nifirên li ser zirîyetê, nifirên li ser qeza û belayan, nifirên li ser rezîlbûnê. Deng, dengên heywanan, dengên eşyayan, dengên xwezayê, dengên mirovan, dengên zarokan.

**J.B:** Gelo tu arşîveka wisa wekî “komkirina tiştan (şênber)” an bêhtir wekî “komkirina nirxên ne madî (razber)” dibînî?

**B.B:** Li gor min her tiştê ku li vê dinyayê heye û xwedî cih e, çi bi awayê madî û çi bi awayê manewî be, giring e, nirx e. Qada tiştên li ber destê min bêhtir bi gotinê ra eleqedar e, li vir zêde hişmendî û derfeta parastina tiştên madî çênebûye, lê ji bo qada folklorê ev yek lazim e. Çunkî di warê folklorê da gelek navgîn hene lazim e mirov wan bibîne, biparêze. Li ser meseleyê cil û berg, îro roj gelek jê neyên lixwekirin jî gerek mirov wan nas bike.

**J.B:** Gelo tu arşîva xwe diparêzî (mesela ji windabûnê, ji tozê, ji polîsan, hwd.)?

**B.B:** Belê, tiştên min li du sê cihan qeydkirî ne. Diparêzim, li vir ji mecbûrî, ji ber ewlehîyê em diparêzin, çunkî wextê dibînin hema jixwe kurdî be dest didin ser û carna nema li mirovî vedigere.

**J.B:** Arşîva rexistin (sazî) û kovarên ku tu bi wan ra dixebitî heye? Ew karê te jî arşîv dîkin?

**B.B:** Ez li Weqfa Mezopotamyayê me, heta radeyekê arşîva wan heye, hinek projeyên wan jî hene li ser vê mijarê.

**J.B:** Gelo bi ya te kovar dikare bi rola arşîvê jî rabe?

**B.B:** Kovar, heta cihekî dikare bibe arşîv, lê bi giştî nikare bi vê rolê rabe.

**J.B:** Ji kerema xwe ra behsa Wardozê bike:

- Çima hatiye damezrandin?
- Armancên karên we çi ne?
- Çend kes li Wardozê dixebitin? Wekî edîtor û herweha wekî berhevkar (bi gotineka din, kesên ku folklorê berhev dîkin û bi piştîre çap dîkin)?
- Hûn çawa xwe fînanse dîkin?
- Gelo arşîva taybet a Wardozê heye?

**B.B:** Weşanxaneyên kurdan gelek jê keresteyên folklorê diguherînin, redakte dikin, çapa wan dereng dixin û di warê folklorê da pir serwext nînin. Me xwest em folklorê, gencîneya kurdî ya zengîn derxin pêş. Çunkî gelek tiştên kurdan ên dema modern ji alîyê zimanî ve qels in, derbxwarî ne. Me got her gîya li ser koka xwe şîn tê û me weşanxaneya xwe ava kir. Em bêhtir pirtûkên li ser folklorê çap dikin. Em dixwazin xwedîtîyê li vê mîrateyê bikin. Em sê heval avakarên wê ne. Karê me li ser milê me ye, ji xeynî matbaayê her tiştê xwe em bi destê xwe çêdikin. Pirtûkên kurdî zêde nayên firotin, heta niha me tu piştgirî ji tu cihekî nestendîye. Dewlet ji bo pirtûkên tirkî alîkarîyê dike, lê pirtûkên kurdî nabîne, naxwaze alîkarîya weşanxaneyên kurdan bike. Em bi îmkanên xwe bi pereyên xwe yê memûrtîyê xwe fînanse dikin. Pir hindik be jî pirtûkên firotin, heqê xwe derdixin. Arşîveka me ya taybet nîne, em hîn nû ne, em hêdî hêdî ji xwe ra arşîvekê çêdikin.

**J.B:** Eger dikarî ji kerema xwe ra behsa kovara ‘Folklor Me’ bike:

- Çima hatîye damezrandin?
- Armancên karên wê çi ne?
- Çend kes di kovarê da dixebitin? Wekî editor û herweha wekî berhevkar (bi gotineka din, kesên folklorê berhev dikin û bi piştire çap dikin)?
- Folklor Me çawa xwe fînanse dike?
- Gelo arşîva taybet a ‘Folklor Me’yê heye?

**B.B:** Ev çend sal in em li Weqfa Mezopotamyayê komxebatên folklorê çêdikin. Me li ser termînolojîya zargotinê sê komxebat çêkirin. Di wan komxebatan da me biryara derxistina du kovaran da, yek jê kovara berhevkarîyê ya folklorê bû ya din jî kovareka akademîk a folklorê bû. Berî ku em kovara xwe derxin me 20 kes perwerde kirin, ji wan bîst kesan, ev ên serkeftî me karê kovarê spart wan. Aniha 6 kes di lijneya wê da ne. Hevalek edîtor e, du heval redaktor in. Hemû hevalên me jî berhevkarîyê dikin. Kovar ji alîyê Weqfa Mezopotamyayê ve tê fînansekirin. Di bin banê weqfê da ji 3 mehan carekê tê çapkirin û aniha hejmara 6an<sup>11</sup> tê amadekirin. Em dixwazin karê berhevkarîyê bê kirin, bê teşwîqkirin, qîmeta folklorê bê zanîn û keresteyên me winda nebin. Herweha em dixwazin di warê akademîk da jî xebat

---

<sup>11</sup> n.e.: Dema vê heyvpeyvînê hejmara 6an a Kovara Folklor Me dihat amadekirin. Lê aniha hejmara 12ê ya kovarê jî hatîye çapkirin.

li ser folklorê hebin û ew kereste bên nirxandin. Loma kovara duyem a akademîk, “Folklor û Ziman”, jî îsal dest bi weşanê kir.

**J.B:** Hûn di dersan da bêhtir giringîyê didin çî? Hûn dixwazin bala xwendekar/berhevkaran bêhtir li ser çî be?

**B.B:** Derseka me li ser dîroka folklorê ye, hem a dinyayê hem a kurdan. Heta niha çî hatîye kirin? Derseka me li ser cureyên folklor-zargotinê ye. Dersek li ser fonolojîyê, li ser dangan, taybetîyên wan, alfabeyê, dersek li ser hazirîya ji bo karê berhevkarîyê ye, lazim e mirov çî bike, dersek li ser bikaranîna cîhazan e, dersek jî ji bo deşîfrasyona metnan e. Ev tev jî ji bo me giring in, lê em dibêjin wextê we deşîfre kir, gotina wan neguherînin, çawa gotibin wisa binivîsin, em li vê miqate ne.

**J.B:** Li gor te kîjan metodên weşanê/çapkirinê ji bo çanda devkî ya kurdî yên herî baş in û çima?

**B.B:** Lazim e mirov çî çawa bihîstibe wisa qeyd û deşîfre bike. Hinek hene ji me ra dosyeyan dişînin, em dibînin ku dest tê werdane, guhertine, em vê yekê qebûl nakin. Ji bo deşîfrasyona van xebatan du rêbaz hene. Yek jê rêbazeka akademîk e û dixwaze hemû dangan nîşan bide. Li vir divê alfabeyeka taybet a folklor-zargotinê bê çêkirin. Li dinyayê nimûneyên vê yekê hene, lê ji ber taybetîyên kurdî divê alfabeyeka nû bê amadekirin û li kurdî bigunce. Ev karekî zehmet e, hinek kes û derdor ji bo wan fonem û alofonan “apostrofê” bi kar tînin, lê ev jî ne rêbazeka rast e, çunkî hinek deng-tîp hene bi sê çar awayî ne. Di vê rêbazê da xwendin û têgihîştina metnê zehmet e, ev îmkân ancax ji bo kesên perwerdekirî pêkan e. Rêbaza din jî, rêbaza ku em bi kar tînin, bi alfabeya normal deşîfrasyonê dikan em, bi vî awayî bi rehetî tê xwendin, lê deng, dengên ku tîpên wan tune ne, bi tîpên din tîpên temsîlkin. Ji bo mirov bikare piçek be jî pêşî li vê bigire, heta ji mirovî tê gerek mirov wan *dengan* li ser pirtûkê bi awayekî teknîkî bide. Eger îmkân hebin mirov bikare vîdeoyan jî bide baş e, çunkî gelek refleks, jest û mimîk hene, heta mirov nebîne nikare fam bike.

**J.B:** Tu ji bo weşanê/çapê berhemana çawa hildibijêrî? Giringîyê didî çî?

**B.B:** Ji bo ên modern û yên folklorîk diguhere. Mesela yên folklorîk, ez mêze dikim, zarbêj çiqas serwext e, eger zimanê ku pê çîroka xwe dibêje xurt be ev pîvanek e. Mesela ji zimanê serdestan pir peyv ketibin zimanê zarbêjê ev jî tişteki ne baş e. Hinek pirtûk hebûn pir zêde peyv û qalibên tirkî ketibûnê, me ew qebûl nekirin. Hinek berhem jî mirov dizane û dibîne ku parçeyên wan kêm in, zarbêj pir serwext nînin. Evê jî em ji ku fam dikin, çunkî em êdî çavnas bûne, em bi gelek çîrok û xebroşk û destanan dizanin. Herweha eger xebat kategorîk be, plana wê hebe ev jî krîtereka baş e. Mesela em bibêjin gotinên pêşîyan an jî biwêj, eger nehatibin pênasekirin, ne alfabetîk bin, em qebûl nakin, hinek ji wan hatine kategorîkirin, em ên wisa giring dihesibînin. Ji bo ên modern, yek ji xala herî mihîm ziman e. Zimanê gelek kurdan qels e. Nifşê nû dinivîse, lê zimanê wan pir qels e. Fikir ji bo me mihîm e, metna ku di ser fikrekî ra hatibe avakirin, metna ku bikare hêmanên gerdûnî di xwe da bihewîne giring e. Di yên kurdî da problemeka giştî heye, gelek caran qala êş û coşa xwe ya berteng dikin. Nikarin bibin gerdûnî. Tecribeya nivîsê di nava kurdan da pir tune ye. Diaxivin, baş diaxivin, lê di nivîsê da dilikumin. Em li hûnaka metnê dinêrin, girêdanên nav beşan, helbet nirxandina helbest û romanê ne wekî hev e. Berhema ku ji me ra tişteki nû dibêje, berê me dide cihekî din, asoya me fireh dike tê çapkirin.

**J.B:** Ev gerdûnîbûna wêjeya kurdî ya ku tu behsa wê dikî zehf bala min dikişîne. Gelo dikarî bêhtir behsa vê yekê bikî? Gelo bi ya te ev taybetmendîya çanda nûjen a kurdî ye yan jî ya folklorê ye?

**B.B:** Însanên bindest, însanên ku tim qala êşa xwe dikin, însanên ku tim gazinokî ne û asîmanê wan teng e, bêhna mirovî teng dikin, nikarin edebîyata gerdûnî ava bikin. Wekî ku dinya nedîtibin, nexwendibin. Haya me ji edebîyata dinyayê heye, em dixwînin, sed mixabin em edebîyata dinyayê di ser zimanê serdestan ra, em bi tirkî dixwînin, ev jî derb li raman û xeyala me dixê, nahêle zimanê me di vî warî da çalak bibe, problema esil bi min ev e. Wextê em dinivîsin diyaloga me bi edebîyata dinyayê ra çênabe, hest û raman meyla wan diçe ser zimanê serdestan. Yanî wextê ez edebîyata dinyayê bi zimanê xwe bixwînim helbet, dê têkilîya min û gerdûnê di ser zimanê min ra bê avakirin û ez ê bêhtir gerdûnî bim, afirîner bim, xurt bim. Edebîyat, tesîrê li hevdu dikin, rûsan edebîyata xwe di ser danûstendina

ya Ewropayê ra bilind kir, lê bi zimanê xwe. Em xuya nakin, ne em dikarin tesîrê li edebîyata dinyayê bikin ne ew dikarin feyzê ji me bigirin. Li vir rola wergerê gelekî mihîm e. Tiştê ecêb kurdên xwenda, kurdên ku li zanîngehan in ji alîyê teorîyê ve xurt in, lê ne bi zimanê xwe, bi zimanê xelkê. Kurdên nexwenda jî ji alîyê zimanê xwe ve xurt in lê ji alîyê teorîyê ve qels in. Gerek mirov bikare her du hêlan jî di xwe da bihewîne. Tecrîbe û mîrîsa me ya folklorî jî hew li wir dimîne, li ser hev dimîne, naserife, nanizile û nabe tiştêkî din, nayê bikaranîn. Çanda rexneyê li nava me pir kême e, li ser pirtûkan rexne tune ne, edîtorîyeka baş tune ye. Kesên ku bi zimanê xwe nexwendine divê mirov li wan miqate be, alîkarîya wan bike, lê ev çand li nava me bi cih nebûye. Tu mecbûr dimînî xwe bi awayekî şexsî bi pêş ve bibî. Çanda wergerandina pirtûkên me jî tune ye, em nikarin an jî nizanin bi dinyayê ra têkilîyên xwe çêbikin ku ew pirtûkên me wergerînin zimanên xwe. Esil em bi xwe ra diaxivin, jixwe ra diaxivin, lê bi gerdûnê ra naaxivin, dinya nizane em çî dibêjin.

**J.B:** Tu ji bo çî berheman çap dikî? Armanca te ya çapkirin û belavkirinê çî ye?

**B.B:** Mirov dixwaze hebe, belav bibe. Nivîs tiştêkî şexsî ye, lê dibe gerdûnî. Tu dinyayê piçekî din jî ber bi başîyê ve diajoyî, xema gerdûnî hinekî din jî sivik dikî. Tu dixwazî ya nava xwe derxî, xwe ava bikî. Nivîs, çapkirin, belavkirin, awayê biparvekirin û pirkirina hebûnê ye. Gotineka pêşîyan heye, dibêje, “Dayîn, zayîn e.” Tu wextê didî esil tu zêde dibî. Em hene, em hedîbin û em bi rêya nivîsê vê çirûskê gur dikin. Ji bo awayê folklorê, armanc dibe xwe-nasîn, dibe parastina mîrateya netewî, tiştên ku qeyd dibin, tînen nivîsîn-çapkirin wînda nabin, tînen parastin, ev yek jî ji bo me giring e.

**J.B:** Yanî ev maneya parastinê ji bo te “guhertinan” jî dihewîne yan giring e ku bi formên orîjînal be û guhertin tê da tune be?

**B.B:** Na divê hemû forman bihewîne, çunkî me hîn gelek tişt nedane hev, em hîn bi hûrgilîyên zimanê xwe nizanin, em hîn li ser materyalên xwe hûr nebûne. Ya orîjînal tevî guhertoyên xwe divê bînen parastin. Wêneyê folklorê kurdan parçe parçe ye, ancax wextê hat cem hev em dikarin bizanin kîjan birra ye, kîjan kême e. Çunkî



çanda devkî êdî wekî berê nîne, kurd êdî li bajaran dijîn, asîmîle dibin, çanda wan li bajaran dewam nake. Ji bo kurd bikarin berhemên baş, di her warî da, çêbikin, pêşî divê çanda xwe pir baş nas bikin, îmkanên zimanê xwe, folklorê xwe bibînin.

**J.B:** Têvgerên weşanxane û cureyên weşanên kurdî, li gor salên berê li hember berhemên çanda devkî guherîne?

**B.B:** Belê, diguhere. Berê zêde kesî guh lê nedikir. Lê van salên dawîn qîmeta wê zêde ye. Gelek weşanxane berhemên çanda devkî çap dikin. Gelek mirov ji zimanê heyî yê roja me, ji zimanê medya û tiştên çapkirî aciz in.

**J.B:** Tu dixwazî versiyona çapkirî ji bo kê be?

**B.B:** Versiyona çapkirî bêhtir ji bo kesên xwende, ji bo xwendevanan e.

**J.B:** Tu kîjan cureyên xwendevanan tê da dibînî?

**B.B:** Bêhtir xwendekarên zanîngehan in. Çunkî li vir xwendekarên lîse û dibistanên navîn nizanin bi kurdî bixwînin.

**J.B:** Gelo tu ji bo berhemên çapkirî pêşgotin an şiroveyan dinivîsî? Çima û wan çawa diafirinî/dinivîsî?

**B.B:** Di gelek da pêşgotin heye. Çunkî divê xwendevan bizane ew xebat li gor kîjan rêbazê hatîye amadekirin û ku tesnîfek hebe, ew li gor çî ye. Wekî din jî em dixwazin xwendevan li ser wan cureyan xwedî agahî bin, pênaseya wan, kurtedîroka wan bizanin. Em li ser zarbêjan da û li ser berhevkarîya xebatê jî agahîyan didin, lê bêhtir li ser awayê metoda xebatê ye pêşgotin.

**J.B:** Gelo ji bilî çapê/weşanê tu/yan hevalên te bi rêyên cuda yê belavkirina çanda devkî digerin (mesela festîval, şano, pêşkêşên cuda û hwd.)? Çi ne ew? Tu dikarî çend nûmene bidî?

**B.B:** Çanda devkî, deng û dîmen û tevgeran dihewîne. Em dixwazin bi awayê dengî û dîmenî-tevgerî hebin. Em li ser hesabên xwe yên medyaya civatî vê yekê dikin, belav dikin. Me dixwest em pirtûkên bideng jî amade bikin lê aborîya me têra vê yekê nake. Hinek hene berhemên me dixwînin û dixwazin li ser wan şano û sînemeyan çêbikin, em destûr didin, dibin alîkar.

**J.B:** Tu dikarî mînakên van çalakîyan bidî?

**B.B:** Li ser medyayê em her cureyên zargotinê didin, mirovan pê dihesînin, carna em wênayan çêdikin ji wan ra, vîdeoyan çêdikin. Em qeydên xwe yên berhevkarîyê didin û mirovan teşwîq dikin. Mesela şanogerên Amedê dixwazin li ser “Ferhenga Bişaftinê” skeç û şanoyan çêbikin, em jî bi wan ra li senaryoyayan dinêrin, alîkarîya wan dikin. Hinekan xwestibû li ser pirtûka Celîlê Celîl, “Çima Deve Xeyîdî?”<sup>12</sup> şanoyekê çêbikin, pirtûkeka balkêş e, gelek çîrokên şîretê tê da hene ji bo kurdan.

**J.B:** Pêwîstîyên herî giring ji bo berhevkirina çanda devkî û avakirina arşîva çanda devkî çi ne? Problemên herî mezin çi ne?

**B.B:** Gelek kes vî karî bi awayê şexsî û berteng dikin. Wext li me teng e, çunkî folklor roj bi roj kêm dibe, êdî wekî berê kesên jêhatî nemane. Lazim e sazîyeka folklorê kurdan hebe, plan û plansazîya xwe çêbike, vî karî bi awayekî profesyonel bike. Berhevkar gelek jê karên din dikin, karê berhevkarîyê jî carna dikin, hobî ye ji bo wan, debara wan pê nabe, divê ev bê çareserkirin, mehaneya wan bê dayîn û gund bi gund li Kurdistanê bigerin û keresteyan qeyd bikin. Rewşa sîyasî û şerê heyî piçekî rê li ber vê yekê digire, çunkî wextê rewş aram e û aştî heye însan bi dilxwazî tiştên xwe dibêjin. Di rewşa aloz da mirov newêrin. Yek ji pirsgerêka mezin jî temsîlkirina dengên folklorê û alfabe ya wê ye. Belê, deng li bal me qeydkirî ne lê divê her pirtûka berhevkarîyê bi du awayan bê çapkirin, yek awayê akademîk e û bêhtir ji bo mamoste û xwendekarên akademîyan e, lêkolîneran e, yek jê jî ji

---

<sup>12</sup> n. e.: Şanoya Wanê ya bi navê Mencilê, ji bo listikeka xwe ji çîrokên gelêrî yên li ser pend û şîretan, sûd wergitine. Navê listikê “Zargotin Zêrgotin e (perdeyeka komedî ya bîmuzîk)” e. Şanoya Mencilê li bajar û bajarokên Bakurê Kurdistanê ew listik dan pêşandan (11-31.01.2020). Di vê listikê da hin mijar li ser pend û şîretan in ku em di çîrokên gelêrî da li rastî wan tên. Herweha yek ji wan çîrokan bi versiyoneka din di pirtûka “Gelo Deve Çima Xeyîdî?” da heye.

bo xwendevanên din e. Aniha ya ku tê kirin bêhtir ji bo xwendevanên din e li gor alfabeya heyî ye, lê ev alfabe hemû dangan temsîl nake. Wextê alfabeyeka nû ji bo folklorê bê amadekirin ev jî karê berhevkarên ji aliyê deşîfrasyonê da aloz dike, çunkî divê êdî perwerdeya vê yekê hebe. Nebûna beşa folklorê ya zanîngehan problem e. Belkî arşîvên şexsî hebin, lê talîya talî em qala miletekî dikin, divê arşîvên ku mirov bikare xwe bigihîne wan hebin. Gelek tiştên kurdan li welatên din di arşîvên xelkî da ne û mirov nikare xwe bigihîne wan. Hişmendîya li ser folklorê jî pirsgirêkek e. Gelek kes, bi qîmeta folklorê nizanin, li ser folklorê xwedî agahî nînin, rayedar û sîyasetmedarên me jî tê da.

**J.B:** Gelo bi ya te arşîveka dijîtal fikreka baş e?

**B.B:** Tenê dijîtal be ne baş e, lazim e wekî din jî mirov arşîvê çêbike. Dijîtal destûrê dide ku berbelav be, lê metirsîya têkçûna wê jî heye. Lê yê din jî ji bo kurdan talûkeya ku dewlet dest bide ser wan heye.

**J.B:** Fikrên te yê li ser çareserîya van probleman çi ne? Pêşnîyazên te hene?

**B.B:** Divê sazîya folklorê kurdî bê avakirin. Plan, plansazî û xebatkarên wê bîndîyarkirin. Ev kar bê fînanse nabe. Warê dokumantasyon û arşîvê, bîra kurdan bê çêkirin. Divê li zanîngehan beşa folklorê kurdî bê vekirin. Beşên zanîngehan ên kurdî divê li hev rûnin û alfabeya ku ji bo deşîfrasyonê alîkarîya me bike, amade bikin. Li ser giringîya folklorê film bîndîyarkirin, hişmendîya wê bê belavkirin. Xuya ye dê heta 15-20 salên din dê gelek tiştên me wînda bibin.

**J.B:** Wekî nivîskarekî, bi te maneya “berhevkirina folklorê” çi ye?

**B.B:** Li bajarên me zimanê serdest tirkî ye. Hûn kurdî zêde nabînin, dîyaloga kurdî-nûsan bi kurdî ra di ser pirtûkan ra çêdibe. Kurmancîya bajaran jî gelek caran xirabe ye. Ji eslê xwe dûr ketîye. Folklor wê îmkane dide min ku ez xwe perwerde bikim, peyva xwe, gotina xwe bêhtir nas bikim. Em bi zimanê xwe perwerde nebûne, civaka me hîn bi piranî bi xwendin û nivîsê nizane, ango her tişt devkî ye. Folklor, esil em bi giştî qala jîyana kurdan dikin, bi cure û mijar û hêmayên xwe ji

bo min dibistanek e. Ez bi komkirina folklorê, xwe perwerde dikim. Berhevkirina folklorê, miqatebûna li “bîr”ê ye.

**J.B:** Nivîsîna berhemên wêjeyî, berhemên nûjên, ji nivîsandina folklorê (berhemên devkî) çiqas cuda ye?

**B.B.:** Folklor an jî di nava folklorê da zargotin, hişê kolektîf ê civakê temsîl dike. Berhemdarîya giştî ye, gelek caran di nava qaliban da dimîne û mihafezekar e û piçekî teng e. Nivîsa berhemên wêjeyî bêhtir afirîner e, şexsî ye, lê helbet ew jî ji folklorê xweyî dibe, gerek jê xweyî bibe. Nivîsa modern wextê zêde ji folklorê dûr bikeve, xirab dibe, wextê zêde nêzî folklorê be jî zîrarê dide afirînerîya xwe.

**J.B:** Folklor, komkirin û nivîsîna wê, li ser nivîskarîya te tesîr dike yan na? Çawa?

**B.B:** Gelek berhemên heyî jixwe bi temamkirina xwe, bi peyama û naverok û hûnaka xwe îlhamê didin mirovan. Di nava folklorê kurdî da gelek tiştên enteresan hene, mesela carna hin çîrok hene, pir xurt in lê kurt in, ez wan vedikim, ji nû ve dirêsim. Ez bala xwe zêde zêde didim awayê gotinê. Gotin çawa li hev tên, peyv çawa tên çêkirin? Hunera edebî ya zargotinê bala min dikişîne. Awayê fikirîna vî mîletî.

**J.B:** Gelo tu motîfên folklorî, formên rêzimanê yên ji folklorê yan peyvên kevin ji bo nivîsên xwe bi kar tîni? Çawa? Tu dikarî hin nimûneyan bidî?

**B.B:** Helbet bi kar tînim, gelek caran hay jê tune me, ew tişt bi min ra ye, carna wextê nivîsên xwe sererast dikim, hinek qalib, hinek motîfên bîra min. Bala min pir li ser peyvên e, gelek peyvên me ne çalak in, peyva ku bi min ra dibe dost û têkilîya xwe çêdike dikeve nava nivîsa min jî.

**J.B:** Tu dikarî çend mînakên ji berhemên xwe bidî? Te ew çawa bi kar anîye?

**B.B:** Di pirtûka min a Derbê da çîrokek heye „Elîyê Xemxur” mijareka balkêş e, mirovek heye li ber her tiştî dikeve û jîyan lê dibe jehr. Meselok bû pir kurt bû, min ew ji nû ve hona. Çima bala min çû ser, ji ber ku em bi mîletî dilşewat in.

Mesela jineka enteresan hebû li Licê, “Xaltîya Eyşo,” “Eyşika Dîn” digotinê, lê pir baqil bû, gotinên wê meşhûr bûn, min ji nava xelkê berhev kirin û min li ser wê kurtebîyografi-çîrokek lê kir, di pirtûka min a “Qîza Bavê Xwe” da ye.

**J.B:** Gelo folklor û zimanê wê dikare zimanê kurdî yê modern zindî bike? Gelo rola folklorê ji bo vejandina/jinûvekirina (revitalisationa) zimanê kurdî çawa ye?

**B.B:** Ev pîrseka gelekî mihîm e. Ziman jî wekî marî hertim kirasê xwe diguherîne. Lê ev kiras kirasek nipînû nîne, di ser kirasê din ra tê çêkirin, qad û warê ku kurdî heya niha lê he bûye, gund bûye, çandinî û şivantî bûye, ev qadeka pir teng e û roj bi roj diguhere, lazim em di ser çand û folklorê xwe ra teşe bidin zimanê xwe. Gelek peyvên me ber nexwarine, berê wan teng e, me fikr û xeyaleka nû li wan bar nekirîye, lê ji xebatê ra misaîd in. Ji ber ku ziman di gelek waran da nehatîye xebitandin û qûçek nehatîye çêkirin ev karê mirovan zor dike, ji bo her warê nû pîrsa termînolojîyê heye, lê termînolojîya bêpratîk û ya li ser maseyan tê çêkirin û ji çavkanîya zimanî dûr e jî nikare temsîleka baş bike. Di çêkirina her peyvê da dîsa berê me li folklorê, li zargotinê, li awayê ramîn û çêkirina peyvê ye. Felsefe û feraseta miletekî di zimanê wî da ye.

**J.B:** Cih û rola jinan ji bo parastin û komkirina folklorê kurdî çawa dinirxînin?

**B.B:** Herçiqas civaka me feodal be jî, em wextê li dab û nerîtên xwe dinêrin, jin çalak e, mêr ne li malê be jî mêvanan dihewîne, tevî şêwrê dibe, distre, kilaman dibêje, tevî şeran dibe. Jin, bargirê çalak a folklorê ye. Têkilîya jinan û zarokan ji ya bav û zarokan xurttir e, zarok gelek tiştan ji dîya xwe digirin, min gelek tişt ji dîya xwe girtine. Di dengbêjîyê da bêhtir mêr li pêş in, lê dengbêjên esil jin in, jin ji zarokên xwe ra lorîyan dibêjin, mêr nabêjin. Di hinek waran da pêşî li jinan birîne.

**J.B:** Di berhemên folklorî da kîjan motîfên jinê yan jî lehengên jin zêde bala te dikişînin yan îlhamê didin te û li ser karê te bi tesîr in? Tu dikarî nimûneyan bidî û taybetmendîyên wan îzah bikî?

**B.B:** Mixabin di gelek da roleka wan a sereke nîne, kê m e. Zîn û Xecê heta dawîyê dilketîyê evandîyê xwe ne, her du jî ji xeynî wê eşqê jîyaneka din tercîh nakin, bi evandîyê xwe ra serê xwe datînin, lê ne li pêş in. Destana Stî û Ferxî jî ecêb e, Ferxik tim bi helbestkî diaxive, lê roja ku Stîyê jê ra tînin dev ji wê hunera xwe berdide û ji Stîyê ra dibêje, berî min, min bihîstîye dilê te û şivanekî hebûye di hev da, rast bibêje, wê qet tu maçî kirî, wî tu ramûsa?” Stî li ser vê yekê dixeyîde û diçe û êdî nema tê. Vê jinê bi wê helwesta xwe gelekî bala min kişand, lê destan li ser Ferxikî ye. Xatûna destana Zembilfiroşî jî enteresan e, li dû daxwaza xwe ya şabûnê çî bibêjî dike. Keftûlefta wê bala min dikişîne.

**J.B:** Bandoran kîjan dengbêjên jin yan jinên kurd ku girêdayî çand û zimanê xwe ne û ew parastine, li ser te heye? Eger hebe tu dikarî bibêjî çawa bandor li te kirine? Nimûneyan bide û taybetîyên wan îzah bike?

**B.B:** Meryemxan û Eyşeşan cihê wan cuda ye, ew jî bo huner û hunermendîya xwe her tiştî didin ber çavê xwe, yek jê dev ji mêrê xwe berdide ji bo hunera xwe ya din çiqas cewr û cefa hebe radyoyê bixebite, xwestîye hunera xwe li nava gelî bimeşîne, helbest hin sebebên din jî hebûne, lê dengê wê, sewta wê pirr tesîrê li ser gîyanê min dike. Ez êşa vî miletî di wî dengê da dibînim.

**J.B:** Gelo motîf/leheng/dengbêj/aktivîstên kurd ên jinan hene ku tu ji wan hez nakî û çalakiyên wan giring nabînin yan jî çalakiyên wan ji bo rewş/mafên jinan xetere dibînin?

**B.B:** Ji nîfşên nû hinek kes hene, naxwazim navên wan bidim, lê ji qirika kurdî, ji çand û kelepura xwe dûr in, bêhtir populîst in, jîyana wan ne bi kurdî ye, dixwazin hew li ber çavan bin, bi cil û bergan, bi reklaman, bi têkilîyên nas û dostan mirov nabe hunermend. Jixwe gelek caran ne afirîner in, di ser tiştên heyî ra dixwazin xwe he bikin, lê dubare dikin.

**J.B:** Li ser rewşa jinan nirxên çanda devkî çawa dibînin? Gelo li ser van nirxan tu pewîstî bi rexnekirinê yan jî guhartinê heye? Îzah bike û nimûneyan bide?

**B.B:** Herçiqas kurd bi piranî dîndar û patriarkal bin jî, wan ev avahî bi her tiştê xwe qebûl nekirine, qodên wan ên kevin ên berî wan avahîyan hîn jî çalak in. Em di govendan da dikevin milên hev, kar li nava erdan, bax û bostanan bi hev ra dikin. Fedî li nava civata me kême, argo zêde ye. Jin û mêr ferq nake li her civatê serbestî heye. Îro va ye tu dibînî keç û xortên kurdan bi hev ra ne şer dikin. Mêvanek bê malekê mêr li wir nebe jî jin wan qebûl dike. Gelek malbatên me bi navên jinan in, mesela malbata bavê min li ser navê pîra pîra min e. Em xwarinê bi hev ra dixwin. Dengbêjî, gotina kilaman ne li gor misilmantîyê ye, lê dayikên me dengbêj in, lorîyan ji me ra dibêjin. Astengî hene, kesên mihefezekar li ber wan rabûne, lê bi giştî ruhekî dînoke yê kurdan heye, jin mêr ferq nake ez vî ruhê dînoke dibînim û ev ji bo her tiştî, ji bo guherîn û veguherînê, ji bo serkeftinê hêvîyê dide min.

# Bahri Demirî de roportaj

Bahri Demir, 56 years old, is a Zazaki folklore collector. He was born in the county of Çêrmûg Axirmati, but he grew up in Sewreg (Siverek). He studied maths and is currently working for a construction company. He started collecting folklore in 2011 and focuses on Zazaki oral tradition. He has mainly collected proverbs and idioms from the towns of Sewreg, Çêrmûg, and Aldûş. He publishes his articles and folklore collections on the Internet.

Bahri Demir aredayox/folkloristê ziwane zazakî yo. O qezaya Çêrmûgî, dewa Axirmatî de ameyo dinîya, la Soyregî de bîyo pîl û o pancas û heşt serre yo. O unîversîte de mamostetîya matematîk serî de wendo, labelê mamostetî nêkerda şîkertê însaatî de ze rayober xebitîayo. Nika/keddar o. Ey serra 2011'î de xebataê xo yê wareyê ziwani destpeykerd û hem zî seba aredayîşê folklorê ziwane zazakî xebityeno. O bi xususî mintiqeyanê Soyreg<sup>1</sup>, Çêrmûg, Aldûş de motîfê edebîyatê fekkîyî arê dano. Vateyê verînan û îdîyomî zaf bala ey ancenî û exleb o nuşteyanê xo înternetî serî de çap keno.

**Esat Şanlı:** Keremê xo ra name û peynameyê xo vacê û tayê xo bidê naskerdene (şîma ça/kotî ra yê, çend serre yê, çi karî kenê?)

**Bahri Demir:** Ez dewa Çêrmûg Axirmat de ameya dinîa, Soyregê de bîya pîl, 58 serre ya, keddar a (Retired). Mi zanîngêh de matematik wend, labelê mi mamostetî nêkerda. Ez şîrketê însaatî de rayober bîyan.

**E.Ş:** Şîma tradîsyonê fekkîyî ser o xebetîyayî. Şîma eşkenê tayê qalê destpêka xebata xo bikerê, senî dest pêkerde û dima senî aver şîye? Çîra folklorê Kurdkî (bitaybetî yê Zazakî) bala şîma anceno?

**B.D:** Çîrê ke, ez Zaza ya(n).

---

<sup>1</sup> Siverek.



**E.Ş:** Şima key dest bi xebate kerde?

**B.D:** Mi serra 2011'î de dest pey kerd û ez hewna zî dewam kena(n)

**E.Ş:** Şima ça/kotî û kamcîn mintiqeyan de motîfê edebîyatê fekkîyî arê dayî?

**B.D:** Vêşane Soyreg, Çêrmûg, Aldûş û çend mi dest ra bêro mintiqanê bînan ra zî arêdana.

**E.Ş:** Şima xebata xo ya folklorîke bi çi awayî fînanse kerde?

**B.D:** Bi îmkananê xo ya.

**E.Ş:** Kovare/organîzasyon/keyepelê înternetî yê ke kultur û folklorê Kurdî (bitaybetî yê Zazakî) yê ke şima înan dir pîya xebetênê estê, yan zî têkilîyêka şima înan dir esta?

**B.D:** Nê, Ez tu kesana pîa nêxebitêna û têkilîya mi qe kesîya çinîa. Ez xoserî girweyena(n)

**E.Ş:** Tradîsyono fekkî seba şima yeno çi mana? Şima ey senî pênase kenê?

**B.D:** Edebîyato fekkî. Ziwan û kulturê ma sero xebatên nûstekî zaf kemî yê. Ay ra ke ziwan û

kulturê ma ra çîyo ke resayo ma pey edebîyatê fekîya resayo.

**E.Ş:** Bi şima kamcîn term seba xebatanê winasîyan hîna raşt o; tradîsyono fekkî, edebîyato fekkî yan folklor? Şima kamcîn şuxulnenê? Eke şima yewna term şuxulnenê keremê xo ra binûsê.

**B.D:** Ez ziwanî sero xebitêna. Gama ke eserêk sero xebate kena sere de ez ewnêna ci de çeku yan zî vatişêko balkêş esto yan nê. Muhtewa û hetê bînî qandê mi planê 2inî de yê.

**E.Ş:** Gama şima folklor arê danê bala şima hîna zaf çiyî ser o ya?

**B.D:** Tewr vêşî ziwani sero ya.

**E.Ş:** Kamcîn tewirê tradîsyonê fekkîyî hîna zaf bala şima ancenê? Nimûneyan bidê.

**B.D:** Vatêyên ke tenîa îdyoman mîan de mend ê û serranê peyênan de zaf kemî girweyneyenê yan zî tenîa yew (jew, zew) komvatî mîan de vajên ê.

Nimûne:

- Mijd = Kira, bedel, Ücret.
- Rêşt = Tavır, tutum, güdülen yol.

**E.Ş:** Eceba/Tirêm arêdayîş de şima versîyonanê orîjînalîyan yê nêorjînalîyan ra cîya kenê?

**B.D:** Hendo ke mikûn bibo orîjînalîyan gêna.

**E.Ş:** Şima qe berhemêko nêorjînalîyan arşîvê xo ra red kerd û vet?

**B.D:** Ez ewnêna kalîteya berhemî ra û berhemo ke mi çimde ercaye nêbo ez eleqedar nêbena. Çiyê ke mi sere nêkewno, bi destê nêzanayana (xeşîmana) virazîayo ci ra dûrî vindena.

**E.Ş:** Bi ya şima tesîrê deyîr/kilam/deyîş û terzê cuya vatoxanê nînan tradîsyonê nûşteki/modernî ser o esto?

**B.D:** Helbet beno Labelê, ez na dahka sero qe nêfikiryaya.

**E.Ş:** Tirêm ê tekstê ke şima arê dayê seba cuya şima hetkariya înan qe virazîyena? Yanî çarçiwaya exlaqîye de paştî danê şima? Mesela gama cuya şima de çiyêko taybet (xusûsî) biqewimîyo ê xebatê şima kewenê şima vîrî yan zî şima înan anê xo vîrî? Nimûneyan bidê.

**B.D:** Eya. Nimûnê:

- Vateyê verînan
- Idyomê Zazakî.

**E.Ş:** Şima berhemê tradîsyonê fekkîyî arê dayî (danê). Şima eşkenê na yewe tayê îzeh bikerê yanî şima bi çi hawayî na xebate kerde (kenê)? Metodê şima çi yê?

**B.D:** Verê heme çi goşdareya şarî kena(n). Çi wext ez vateyêno enteresan jewî fek ra aşnawena, ez kewna ê vatî dim û derheqê ci de pra geyrena. Ê didine îsanê ke meramê xo bi zazakî anê ziwan, jewna ziwan nêzanenê, ez goşdareya înan kena ke tayn çîyan senî îfade kenê. Her vatî sero cîa cîa vindena, ziwananê embirînan de (Farsî, Kurmancî, Soranî) eynî çî senî vajêno.

**E.Ş:** Tirê m şima merdim, kurs, zanîngeh yan zî sazîyêk ra nê warî de perwerde girewto? Kamca? Senî?

**B.D:** Nê, tenîa merdimê ke nê karî kenê, ez xebatanê înan ra çim çarnena.

**E.Ş:** Tirê m rayîrê/metodê arêdayîşê folklorî yê şima yê nikayênî yê verênan ra bîyê cîya? Senî?

**B.D:** Taynekê hewna vêşî tayn çîyan sero vindena.

**E.Ş:** Arşîv seba şima yeno çi mana?

**B.D:** Tenî jew kesî rê zî nahfê (fayde) xebata mi bibo, mi rê bes o.

**E.Ş:** Tirê m arşîvê şima esto? Arşîvêko senên o? Ma vacê nûştayê destî, bandê teypî, kitab, dijîtal (komputer) yan zî keyepelê înternetî, keremê xo ra nimûne bidê.

**B.D:** Komputer û keyepelî înternetî

**E.Ş:** Arşîvê şîma senî yeno namkerdene (yanî nameyê qeydan/rekordan, dosyeyan, ûsn.). Tirê m sîstemêkê şîma yê tesnîfkerdişê xebatanê şîma esto?

**B.D:** Mi deyî (mi gore) sîstemê mi esto, la nêzanena şîma rê senî tarîf bikera.

**E.Ş:** Tirê m şîma qe xebatê xo yê folklorîkî sîstemê dijîtalî (komputerî) de zî qeyd kerdê yan zî xebatê ke şîma înternetî ser o pare kerdê estê?

**B.D:** Hurdina cayan de zî estê.

**E.Ş:** Tirê m şîma arşîvê xo sey “arêdayîşê ercanê/qîmetanê madîyan” yan nê ra zîyadê sey “arêdayîşê ercanê nêmadîyan” yanî sey ercanê manewîyan vînenê?

**B.D:** Nê karan sey karanê manewîyan vînena.

**E.Ş:** Tirê m şîma arşîvê xo bi rayîrêk muhafeze kenê/pawenê (mesela vindîbîyayîşî ra, tozî ra, polîsan ra, ûsn...)?

**B.D:** Eya

**E.Ş:** Tirê m sazî/organîzasyon/kovare/keyepelê înternetî ke şîma pîya şuxulênê xebatanê şîma arşîv kenê? Tirê m arşîvêkê înan bi xo esto?

**B.D:** Ez kesî ya pîa nê şuxulêna.

**E.Ş:** Tirê m bi ya şîma kovare yan zî keyepelê înternetî zî eşkenê rolê arşîvî kay bikerê?

**B.D:** Kovarê nûşteki eşkenê. La keyepelê înternetî arşîwî rê rind niyê. Çîrê ke roja ke mijdê sorwirî (server) nêdeyo, keyepel werte ra wedarîyeno/gêrêno.

**E.Ş:** Tirê m çîyanê ke (berhemanê ke) şîma arê danê, şîma înan çap kenê yan zî weşanenê? Ça/kotî? Senî?

**B.D:** Keyepelê înternetî sero çap kena, Jû qopya zî xo de verdana.

**E.Ş:** Şima ra gore kamcîn metodê weşanayîşî/çapkerdişî seba tradîsyonê fekkî yê Kurdî (bitaybetî seba Zazakî) tewr rind ê û çira?

**B.D:** Raya înternetî tewr rind a. Çirê ke kes hinî (endî) kitab û rojname nêwaneno. Herkes ewnêno têlafûn ra.

**E.Ş:** Wextê weşanayîşî/çapkerdişî de şima berhemanê folklorîkan senî weçînenê? Muhîmîye danê çiyî ser?

**B.D:** Ziwane ma, folklorê ma heme çî rê veyşan o. Her çî çî yo ke vihaya (erca) ci ya edebî esta, çapkerdişî/weşanayîşî heq keno.

**E.Ş:** Bi şima amacê çapkerdişî/vilakerdişî çî yo?

**B.D:** Ziwane vinî (vindî) nêbo, Ravey şîro.

**E.Ş:** Tirêma weşanayîşê kurdî (bitaybetî ya Zazakî) yê berhemanê tradîsyonê fekkîyî goreyê serranê verênan nika vurîyeno (bedelêno)? Eke e, senî vurîyeno, şima eşkenê bi kilmekî îzeh bikerê?

**B.D:** Serranê verênan deyî (gore) weşan biyo, vêşî laberê xoya pîa persgirey zî ardê:

- Her kes xo deyî (gore) elifbê girweyneno (gurêno).
- Her kes ma û pî yê xo ziwanzan hesibneno.
- Çî yo ke înan ra nêaşnawito vanê no zazakî niyo.

**E.Ş:** Şima wazenê versîyono çapkerde yê xebata şima qey kamî bo, yanî kesê ke şima wazenê berhemê şima biresê înan kam ê, kamcîn dor ê?

**B.D:** Herkes, kam beno wa o bo.

**E.Ş:** Tirê m şîma berhemanê folklorîkan yê çapkerdeyan rê vateyo verên yan zî şîrove nûşt?

**B.D:** Nê.

**E.Ş:** Tirê m teberê çapkerdişî/weşanayîşî de şîma yan zî embazê şîma ro rayîranê cîyayan ê vilakerdişê tradîsyonê fekkî yê Kurdkîyî (bitaybetî yê Zazakî) gêrenê (mesela festîval, tîyatro, aktîvîteyê pêşkêşkerdişî yê cîya cîyayî?) Ê çî yê?

**B.D:** Nê.

**E.Ş:** Goreyê şîma înternet seba pawitişê edebîyatê fekkî yê Kurdkî (bitaybetî yê Zazakî) eşkeno rolêko senên kay bikero? Seba platformê înternetî ser o pawitiş û averberdişê zîwanî pêşniyazî yan zî fikrê şîma estê?

**B.D:** Înternet rayanê (rayîranê) bînan rindêrî o, La qîm (bes) nêkeno. Averşîyayîşê zîwanê rê 2 rayê muhîmî estê:

- Perwerde.
- Cuyo rojane de girweynayîş (gurênayîş).

**E.Ş:** Şîma têkilîya mabêna edebîyatê fekkî û kulturê modernî senî vînenê?

**B.D:** Pê ro nînê. mi rê ke Edebîyato fekkî yê Zazakî demê nikayînî rê cewab nêdano.

**E.Ş:** Goreyê şîma îhtîyacîyê tewr pîlî yê arêdayîşê tradîsyonê fekkîyî û viraştişê arşîvê tradîsyonê fekkîyî çî yê? Û nê wareyî de problemê tewr pîlî çî yê?

**B.D:** Ganî (gerek) merdim bi serrana dew bi dew, bajar bi bajar bigeyro, her çî qeyd kero. No zî karêno gengez (asan) niyo.

**E.Ş:** Fikrê şîma seba halkerdişê nê probleman çî yo? Pêşniyazîyê şîma çî yê?

**B.D:**

- Perwerde.
- Cuyo rojane de gurênayîş.
- TV (zazakî qanal).

Pêşnîyazê mi zafî ê, laberê pratik de mumkun niyê. Çirê ke dewleta asîmîlasyonkere ma vêşêrî girweyena, 100 serr o girweyena, îmkanê ci hezar bi ma yê.

# Hevpeyvîna bi Bêrîvan Matyarê ra

Bêrîvan Matyar is a researcher and collector of Kurdish folklore. She did her BA in Sociology and her MA in Kurdish studies. From 2017 onwards she has conducted field research and collected various examples of oral tradition. Her main collection is of songs, due to being inspired by her mother and many other family members who are singers. She believes that folklore is a valuable source of knowledge and thus she decided to write her MA about wedding traditions based on the study of the folk songs from the village of Çiçika. Bêrîvan is also a member of the editorial board of the journal *Folklor Me*.

Bêrîvan Matyar vekoler û berhevkarê folklorê kurdî ye. Wê lîsansa Civaknasî û mastira Kurdolojîyê xwendîye. Ew ji sala 2017an vir ve ye, diçe meydanê û berhevkarîya folklorê dike. Bala wê li ser her cure keresteyên folklorê ye, lê heta niha wê bêhtir stranên gelêrî berhev kirine. Matyar dibêje ku berhemên folklorê ji bo epîstemolojîya kurdan çavkanîyên resen in. Loma wê ji bo teza mastirê wekî çavkanîyên resen ji stranên gelêrî sîd wergirtîye. Matyar dîyar dike ku ji bo berhevkarîyê dîya wê tesîr lê kirîye û ji ber ku di malbata wê da stranbêj gelek bûne, loma bala wê çûye li ser stranên û xebatên xwe li ser wan dimeşîne. Herweha ew di desteya weşanê ya Kovara Folklor Me da ye.

**Joanna Bochenska:** Ji kerema xwe ra ji me ra behsa xwe bike. Nav û paşnavê te çi ye? Tu ji ku yî û çend salî yî? Tu çi karî dikî?

**Bêrîvan Matyar:** Navê min Bêrîvan e, paşnavê min jî Matyar e, ez bîst û heşt salî me. Ez li gundê Çiçikayê ya navçeya Farqînê hatime dinyayê. Lê ez li Amedê mezin bûme, ez li Amedê perwerde bûme. Ez heta 13 salîya xwe neçûme gundê xwe lê wayê nêzî 7 8 sal in ez tim diçim gundî. Ez niha li Zanîngeha Dîcleyê, mastira Beşa Kurdolojîyê dixwînim. Herweha berhevkar im. Min li heman zanîngehê civaknasî xwendîye. Li Amedê bi malbata xwe ra dijîm.



**J.B:** Tu li ser çanda dekvî dişixulî, tu dikarî behsa destpêka wê bikî?

**B.M:** Çanda devkî yan jî zargotin bi gotinê ve girêdayîye û bi zar û ziman der dibe. Di binê banê folklorê da ye. Folklor, zargotinê (çanda devkî) di xwe da dihewîne. Çunkî folklor hem ji keresteyên madî (şênber) hem jî ji yên manewî (razber) pêk tê. Ji ber vê, dema em bibêjin çanda devkî sînore wê teng dibe, lê folklor ji wê firehtir e. Folklor hemû nexşeyên jîyanê dihundurîne. Ez berhevkarîya keresteyên folklorê dikim û kêfa min ji vê yekê ra zaf tê. Weka ku li dû kokên xwe bim. Reng û rûçikên rihê min di deryaya folklorê da av dibe. Heyecan û çuşek mezin hîs dikim. Folklor, rihê milletê xwe av dide û dermale dike. Hest û ramanên milletê xwe xurt dike, şekil û rengî geş dike. Taybet zargotin, bi giştî folklor rihê hebûna milletê xwe ye. Dema ez stranek an jî çîrokek qeyd dikim, weka ku berê windabûyî me lê niha li ser axê cihê xwe dibînim û rehikên xwe bi erdê ve berdidim. Sankî li ser axê cihê min saxlem dibe û ihtîmala ku ez ê cardin winda bibim namîne. Folklor û zargotin bi min evana dide hîs kirin. Lewma hestên min ên netewî gur û geş dibin. Di lêgerîna *Hebûn'ê* da pirs û bersivên min di vê qadê da ne. Ê vê yekê baş dizanim. Folklor kok e û mirov li ser koka xwe şîn tê.

**J.B:** Çima folklorê kurdî bala te dikişîne?

**B.M:** Niha tu berhem, tekst û metnên me yên zanînê (epîsteme) bipergal û rêkûpêk tune ne. Pirtûk, ferheng, an jî tekstên felsefeyê, psîkolojîyê, civanaknasî, aborî, sîyaset, ednîgarî û matematîkê tune ne. Ferhengên me yên ku dilê mirovî rehet bikin jî tune ne. Ji ber vê, çavê me li van tekst, pirtûk û ferhenga digere lê em baş dizanin valahîyek heye. Ê ev valahî meseleyek pir cidî ye û tesîrek neyînî li ser jîyan û fikirandina me dike. Ew valahî mirovî ji peyvê, gotinê, ji axavtinê dixê. Dema vê kêmanîyê hîs dikim ku pîrî caran wisa li min tê, ferhenga gotinên pêşîyan dinêrim, ku carna wekî aforîzmayên felsefeyê ne, hin bawerîyên gelerî (superstition, old wise tale) dinêrim ji psîkolojîyê dinizê. Dia û nîfir jî referansî çanda olî dike, tevger û rabûn û rûniştandin, rîtuêlên civakê dike. Ez dibêjim qey, folklor kêmanîya qadên zanînê piçekî be jî dermale dike. Li ser meseleyê, (awayê epîstemeyî) ferhengê me yên li ser ajaldarî û çandinîyê, yên li ser demsalan tune ne û cih û xebatên akademîyan jî têra vêya nakin. Lê eger mirov civakeka ku debara

xwe bi çandinîyê dike binêre, li ser van lêkolîn bike ku folklor vê rêyê û derfetê dide mirovî, mirov dikare bibe xwedî agahî û zanîne. Eger mirov bi mînakên meseleyê şênber bike dê baştir be, ji ber vê yekê çend mînakên dia û nifiran dinivîsim:

Nifirên li ser kêr xistin û bêrûmetkirinê:

- Bi kuştinek bêşuştin herî!
- Bizina ko nanê te ji destê te bigire!
- Destê te bi terik be û li ser sîngê gewr negerin!
- Dev li te bibe qûn!
- Erd biqelişe û tu bikevîyê!
- Gor bi destê te nekeve!
- Rodîyê te li tekera bigere!<sup>1</sup>

Diayên ji bo bext û mirazan:

- Îqbala te nekeve kevir!
- Xwedê emrê te hezar salî bike!
- Xwedê meqsed û miradê te bibe serî!<sup>2</sup>

Mînakên hin bawerîyên gelêrî:

- Li ber derê kê jûjî bê dîtin di wê malê da bereket zêde ye!
- Kî ku zimanê pez û dewara bixwe, zimanê xelkê li ser wê/wî dirêj dibe!
- Ku çivîk tê keve malekê, mizgînîyek wê malê ra tê!
- Mirov bawer dikin ku qantir (hêştir) bizê dê dinya xera bibe!<sup>3</sup>

---

<sup>1</sup> Asmîn Uyanik, Nifir û Dua, Weşanên Wardozê, Stenbol, 2017.

<sup>2</sup> h.b.

<sup>3</sup> Nîhat Oner, Ji Bînbira Kurdan Bawerîyên Gelerî, Weşanên Wardozê, Stenbol, 2019.

Mînakek li ser demsalan:

“Biharê pez  
havînê werz<sup>4</sup>  
payîzê rez  
zavistanê ez”<sup>5</sup>

Dema mirov veke, veçirîne her gotineka pêşîyan aforîzmayek di xwe da dihewîne.  
Çend mînakan dinivîsim:

- “Gilyê pêşîyan, kevirê xanîyan.”
- “Jinê dil kirî dîwar qul kir.”
- “Dewlet sîya Xwedê ye.”
- “Dewlet her tîm bîst salî ye.”
- “Meriv bi hev ra meriv e.”<sup>6</sup>

**J.B:** Te kînga dest bi vî karî kir?

**B.M:** Di sala 2013an da, dema min dest bi perwerdeya zanîngehê kir, pê ra jî min dest bi Kurdî-Derê<sup>7</sup> kir ku li wir mirov hînê xwendin û nivîsandin, axaftina kurdî dibû. Di nava malbatê da, me bi zimanê xwe diaxivî lê min nizanibû, bi zimanê xwe bixwenda û binivîsîya, ji ber vê min jî dest bi dersên wir kirin. Piştî du salan û çend pêlên (level) dersan, di sala 2015an da, min ferq kir ku axaftina min a malê û ya vir ji hev cuda ye, li vir axaftin standard e û li gor nivîsê şekil digere. Axaftina me ya malbatê herêmî (local) e û rihekê wê heye. Paşê, carekî dema ku min li ser telefonê, bi dîya xwe ra axivî, mamosteyek ji wan ferq kir û di nava axaftina

---

<sup>4</sup> Werz: Bostan.

<sup>5</sup> Sadiq Êskan, Payîzxêr: Li Ser Salnameya Kurmancî Xebateka Folklorîk, Weşanên Wardozê, Stenbol, 2017.

<sup>6</sup> Min ew gotinên pêşîyan di salên navbera 2017an û 2019an li herêma Amedê qeyd kirine, lê ew nehatine çapkirin.

<sup>7</sup> Kurdî-Der: Komeleya Lêkolîn û Pêşvebirina Zimanê Kurdî, di sala 2006an da li Dîyarbekirê hat avakirin. Şaxên wê li piranîya navçe, bajarok û bajarên Bakurê Kurdistanê hebûn. Komele bi sedan xwendekar perwerde kirine. Li ser zimanê kurdî bi sedan panel û konferans li dar xistine. Ew di sala 2016an da ji hêla dewletê ve hat girtin.

me da biwêj pir in. Piştîre haya min jê çêkir û got; “Ji kerema xwe van biwêjan qeyd bike, binivîse.” Di sala 2016an da, êdî min dest bi qeydkirina wan kiribû lê ne tenê biwêj, herweha hem çîrok, xewroşk, stran hwd Di destpêka da, dîya min zarbêja min bû, dûra min dît, ew hem zarbêj e, hem stranbêj e, hem gotinbêj. Paşê, dîya min ferq kir ku ev tişt tîn qeyd kirin, xeberê da xwişkên xwe jî û li ber min xist û got; “Xatîyên te jî stran dibêjin û berê ew berbûrî bûne, govendgêr bûne, stranbêjên dawetan bûne.” Helbet ez çûm ba wan û min dest bi qeydkirina stranên gelêrî jî kir, bi wan ra çûm dawetên merivên xwe jî û li wir jî qeyd dikir. Lê asil her jinek û her kes zarbêj, gotinbêj, çîrokbêj, stranbêj û dengbêj e. Lê tiştên wan nehatine qeydkirin. Di sala 2017an da, li Amedê, Weqfa Mezopotamyayê<sup>8</sup> ku li ser ziman û çandê kurdî dixebiti, kursekê (perwerde) ji bo folklorê kurdan li dar xist û bi pêşniyazên hevalê xwe, ez jî ketim nava kursa wan a perwerdeya folklorê kurdan. Piştî wê perwerdeyê, ez baştir li berhevkarîyê sor bûm. Û niha bi awayekî aktîf berhevkarîyê dikim. Êdî mesele bi malbata min ne sînorkirî ye, xelega seha berhevkarîya min fireh bûye.

**J.B:** Tu bi kîjan rêxistin (sazî) û kovaran ra kar dikî? Herweha pêwendîya te bi kîjanî ra heye?

**B.M:** Li vê weqfê, dema perwerde xelas bû, bîryara derxistina kovareka folklorê hat dayîn. Dema perwerdeyê em bîst kes bûn, ji wan 6 7 kes, me komek ava kir û bû koma kovarê. Ez jî yek ji wan im. Nêzî salekê me amadekarîya kovarê kir

---

<sup>8</sup> Weqfa Mezopotamyayê: Di sala 2013an da, li Dîyarbekirê bi mebesta avakirina zanîngeha di serî da kurdî û pîrzimanî hat avakirin. Vîzyona weqfê bi vî awayî ye: Pîrzimanî û gerdûnî ku zimanê wê di serî da kurdî be. Azadîxwaz, demokratîk, rexneyî, afirîner, pîrsyarker, wekhev, piştevan, paydar û xwedî etîk be. Xwedî vîzyoneka ekolojîk ku dewlemendîyên çandî û surîştî ji bo pêşketina herêmê bi kar tîne. Ji bo nûjenî û hevkarîyên akademîk amade be û piştgirîya danehava zanistî ya gerdûnî bike. Çand û zimanê kurdî di hemû qadên jiyanê da bi pêş bixe ku di qada gerdûnî, hemû dîsîplînên zanistî, perwerdehî, lêkolîn û çalakîyên weşangerîyê da bê bikaranîn. Herweha weqif li ser ziman û çanda kurdî xwedî gelek xebatên hêja ye. Xebatên wekî “Rêbera Rastnivîsînê,” “Termînolojîya Hiqûqê,” pirtûkên li ser zimanî yên wekî “Rahênanên Zimanê Kurdî,” “Keşana Karên Kurdî,” “Du Zimanî Zarok û Perwehê,” pirtûkên li ser berhemên çanda devkî yên wekî “Kûçikê Daleqandî,” û “Meryemnîgarê.” Herweha weqf xwedî du kovarên folklorê ye ku navê wan “Folklorê Me” û “Folklorê Ziman” e. Niha jî Weqfa Mezopotamyayê çalak e û karên xwe yên li ser ziman û çanda kurdî dewam dike.

û paşê dest bi weşanê kir. Navê kovarê, *Folklor Me ye*, ji sê mehan carekê tê weşandin. Weqfa Mezopotamya wê fînanse dike û desteya weşana kovarê jî bi dildarî dixebite û kovarê ji bo çapê hazir dike. Niha li Bakurê welêt, tekane kovara folklorê ye. Di kovarê da, nivîsên berhevkarîyê û li ser folklorê her cure nivîs û gotar hene. Esil, kovar qadeka perwerdeyê bi xwe ye, bi xebatên kovarê têgihîştina min a folklorê firehtir û kûrtir bû. Her cure nivîs tên, em dixwînin û dinirxînin ev jî îmkana pêşketinê dide me.

**J.B:** Tu karê xwe çawa fînanse dikî?

**B.M:** Piştî perwerdeyê, di 2017an da, Weqfe Mezopotamyayê, ji me ra cîhaz stendin; kamera, denggir, sêpê (threepod) û harddisk. Lê hemû çûnûhatinê xwe ez bixwe fînanse dikim, li tu derê naxebitim û pereyan qezenc nakim. Malbata min alîkarîya min dike. Ji bo vî karî fon, burs û meaşek tune ye. Ez û malbata xwe baş dizanin ku di kar û xebatên kurdî da qezenckirina pereyan tune ye. Ji ber vê dema min dest bi berhevkarîyê kir, malbata min bi derfetên xwe alîkarîya min kir û niha jî ew fînanse dikin, çûnûhatina min a sehayê. Carna birayê min bi erebeya xwe min dibê cihê berhevkarîyê. Lê piranî ez bi xwe siwar erebeyên bajar û gundan dibim.

**J.B:** Kevneşopîya devkî ji bo te çî ye? Tu dikarî wê pênase bikî?

**B.M:** Ez dixwazim bi vê dirûşmê, “Zargotin Zêrgotin e, Zêrgotin Zargotin e.”<sup>9</sup> dest pê bikim. Zargotin dewlemendîyeka neteweyan e. Çîrok, efsane, serpehatî, destan, biwêj, gotinên pêşîyan, stran, zûgotinok, mamik hwd çavkanîyên zêrîn in. Zargotin, serborîya dîrokî, civakî, edebî, hunerî ye. Pêşketina zimên bi xwe ye û ew ji bo zimên gencîne ye.

**J.B:** Dema tu keresteyên folklorê berhev dikî bala te bêhtir li ser çî ye yan jî kîjan cureyî ye?

---

<sup>9</sup> “Zargotin Zêrgotin e, Zêrgotin Zargotin e.” Ev dirûşmeya *Kovara Folklor Kurdan* bû. Kovara Folklor Kurdan, li Bakurê, di navbera salên 2015 – 2016an da 7 hejmar derketin. Şaredarîya Mezin a Amedê ew fînanse dikir. Piştî qeyûm, çapa wê sekinî. Li Bakurê, yekemîn kovara folklorê kurdan bû.

**B.M:** Bala min li ser her cureyî ye. Livûtevgerên însanan, gotinên devê wan. Dema ku ez li sehayê bim û bi xisûsî ji bo berhevkarîyê biçim; dixwazim zarbêjan bidim axaftin, eger zarbêj zîrek be û lixeberdanê be, kêfa min tê. Lê carna hin zarbêj nikarin, xweş li hev bînin û qal bikin. Ji bo wê jî ez hewil didim, davêjim ber wan, li ser meselê eger stranbêj be, stranekê dibêjim; çîrokbêj be, çîrokekê dibêjim. Ew jî lê vedibin û di tûrikên wan da çi hebin derdixin û dibêjin. Carna jî qet nasekinin û çi bê bîra wan dibêjin. Dilê min ji bo axaftina wan lê dide. Her zarbêjek li gor isûla xwe diaxive, her yek xwedî stîlekê ye. Loma ez heyecan dibim, dema xeber didin peyv, gotin li diranê wan dikevin û ji devê wan dertin. Ji ber ku, her yek serborî û tecribeyên wan ji hev cuda ne, ev çalakî jî ji hev cuda dibe. Ez pirî caran bi vê tahayûl û meraqê me ku gotin çawa di nava devê wan da şekil digere, loma bala min li ser livûtevgerên wan axaftina wan e. Wekî din dema li berhevkarîyê bim, keresteyên madî jî berhev dikim; teşî, alet û amûrên tevnê, das û werîs, hwd, eger nexwazin bidin min, ez fotoyên wan dikşînim û navên amûran jî ji wan dipirsim û qeyd dikim. Çunkî her herêm navên cuda li heman amûrê dikin. Bi vê awayî versiyona navên amûran jî çêdibe. Ez fotoyên derîyên hewş, mal û axurên gundîyan jî dikşînim. Bala min li ser çêkirina derîyên kemn e.

**J.B:** Kîjancureyên çanda devkî bêtir balate dikîşînin? Tu dikarînimûneyên wan bidî?

**B.M:** Ji bo min ferq nake, çi li ber destê min bikeve qeyd dikim. Mamik (tiştanok), zûgotinok, qewlêrk, biwêj, gotinên pêşîyan, xewroşk, stran. Ez difikirim ku çi dibe bila bibe, em qeyd bikin, rewşa me, ne li gor standardên dinyayê ne. Ji ber vê, gerek haya me ji hebe û em qeyd bikin, bi nivîs bikin, berbiçav bikin, çunkî em miletek xwedî gotin in lê bê arşîv û paşxane ne. Ez pirî caran peyvan jî qeyd dikim, peyvên ku hatine jibîrkin, jihemdêxweketine û binaxbûne. A rast, balkêş e ku T.S.Eliotî jî li ser peyvan weha gotîye: “Pevy vedizelin, diderizin û carinan dişikin, di bin bar da, di bin behntengîyê da dişemitin, ji ber çavan winda dibin, dirizin bi sistbûna xwe ra li cihekî namînin, bêliv dimînin.” Dema ez li ser gotina Eliotî difikirim ez bêtir bala xwe didim peyvan. Min ji dê û bavê xwe bi sedan pevy qeyd kirine. Carna ev peyv lêker in jî. Lê heta aniha di nava keresteyên folklorê da min bêtir stran berhev kirine, ji ber ku di malbata me da, stranbêj zaf in. Lê kêfa min hem stranan ra hem jî ji dîlokên ra tê, bi taybetî dîlokên dilan ra tê. Li jêr çend mînakên ku min berhev kirine, hene:

“Haylo dilo hay dilo wî gûza pûç a bêkakilo  
Wele heya qenca ez xwistim xerava ez biro”<sup>10</sup>

“Lo lo lawko hewşa mal bavê m’ lo mermer e  
Ti yê solê derxe bi gorê were  
Êra sozê Xwidê pixembera gava gora delalê dilê min qetîya  
Wele ez j’ te ra çêkim bi hevrişmê sorûzer e”<sup>11</sup>

“Lo lo delalo dîno mi go ser xanîka mişmiş neke  
Êra qolseeta j’ keçkê xelkê ra şabaş neke  
Lo lo dîno heyra mi go wez a te me lo ti xwi şaş neke”<sup>12</sup>

“Lo lo kurê dîno were mala bavê m’ bi dizîka  
Êra ti yê derî veke bi tilîka’w bi piçîka  
Êra gava bav û birakê m’ gotin ew çi vû çi cirîya?  
Wele bivêm ew rovî vû lo hat mirîşka”<sup>13</sup>

“Çîya bilind e ez te nevînim  
Ka mektûvê bişîne ez bixunim  
Ez ê şûna mektûva te da  
Çotê memkêzer bişînim”<sup>14</sup>

“Êvar e ro l’ bû eşa  
Ava çem û kanîya li min û te bû qeşa  
Nava taximê sîng û berê min ji te ra  
Bû şorbe şîra ber nexweşa”<sup>15</sup>

---

<sup>10</sup> n.e.: Di vê beşê da du-sê zarbên hene, loma me jî agahîyên li ser zarbêjan li gor nav, paşnav û temenê zarbêjê/î, cihê berhevkarîyê û dema berhevkarîyê daye: Mecbûrya Matyar, 48, Gundê Çîçikayê, Amed, 2019.

<sup>11</sup> Wetha Matyar, 65, Gundê Çîçikayê, Amed, 2018.

<sup>12</sup> Heman kes.

<sup>13</sup> h.k.

<sup>14</sup> Fatma Yerlîkaya, 75, Badika, Amed, 2019.

<sup>15</sup> h.k.

**J.B:** Te behsa berhevkirina peyvay jî kir. Gelo piştî berhevkirina van peyvay, tu wan di axaftinê da yan jî di nivîsên xwe da bi kar tîni?

**B.M:** Belê. Dema ku ez wan bi kar tînim, ez kêfxweş dibim. Mesela wekî ku mirov tişteki xwe winda kiribe û mirov ji nû ve bibîni û dixwaze bike jîyana xwe, û bira ew tim bi mirovî ra bin. Ev jî tişteki wisa ye. Ez dixwazim tim wan bi xwe ra bigerînim, di nava axaftina xwe da û di nava nivîsên xwe da, wê çaxê axaftin jî dewlemed dibe, nivîs jî. Bi vî awayî mirov xwe dubare nake, xwe nû dike.

**J.B:** Gelo tu versiyonên orjînal ji yê neorjînal cuda dikî?

**B.M:** A rast, ji bo kesên ku nû dest bi berhevkirina keresteyên folklorê dikin, gelek car mirov nizane, kîjan versiyon a orjînal an jî neorjînal. Çîrokek li gor herêman diguhere, bi sedan versiyonên çîrokekê hene. Mirov baş tê dernaxe, kîjan a orjînal e. Îcar mirov her versiyonên wê qeyd dike, êdî kê zêde dizane ku ya orjînal kîjan e. Lê helbet serê ewil zehmet e. Lê dema ku ez pê bizanibim cureya neorjînal be, ez ji yê neorjînal cuda dikim.

**J.B:** Gelo te qet berhemeka neorjînal ji arşîva xwe derxist?

**B.M:** Eger ez bizanim ku ev ne gelêrî ye û hatibe çêkirin yanî neorjînal be, ez nakim nava arşîva xwe ya gelêrî lê dîsa jî qeyd dikim û ji bo wan arşîvek din çêdikim.

**J.B:** Gelo bi ya te, tesîra çanda nivîskî û ya modern li ser gotin û tevgerên dengbêjan heye?

**B.M:** Ji bo kurdan qada çanda nivîskî nû ye û ew hêdî hêdî derbasî vê qadê dibin. Lê helbet çanda nivîskî li ser çanda devkî ya kurdan bi bandor e. Bivênevê ev tesîrê li dengbêjan jî dike. Berê dengbêj rehet bûn, azad bûn, li çol û pesar û gundan bûn. Lê niha hem ji ber çanda modern û hem jî ji ber jîyana bajarî cih û mekanên wan guherîye. Ew jî tesîr li wan dike, bi gotineka din, tesîrên neyînî yê çanda nivîskî û modern li ser wan heye.



**J.B:** Gelo ji bo wê tu perwerde bûyî? Li ku derê? Ev perwerde çawa bû?

**B.M:** Belê. Di sala 2017an da, li Amedê, Weqfa Mezopotamyayê kurseka perwerdeya folklorê da, dersên vê kursê hem li ser teorîya folklorê û hem jî li ser pratîka berhevkarîyê bûn. Ew ders rûbirû bûn, mamosteyên dersan hem ji hêla teorîya folklorê hem jî ji hêla pratîka berhevkarîyê xwedî tecrîbe bûn. Ev yek jî ji bo xwendekaran zaf giring bû. Ew perwerde nêzî mehekî dewam kir. Ez jî beşdarî vê perwerdeyê bûm.

**J.B:** Te behs kir ku tu keresteyên çanda devkî berhev dikî. Gelo tu dikarî behsa berhevkarîya xwe bikî? Tu vê yekê çawa dikî? Rê û rêbazên te çi ne?

**B.M:** Sê rêbazên berhevkarîya min hene:

- Berîya berhevkarîyê
- Dema berhevkarîyê
- Piştî berhevkarîyê

Li gor min, ji bo berhevkarîyê du tiştên sereke hene. Yek jê dîyarkirina sehayê ye, ya din jî dîyarkirina kesan. Eger seha bê dîyarkirin, di nava sehayê da gerek kesên zarbêj bîn dîyarkirin. Lê heta niha, ez li gor zarbêjan çûm sehayê. Li ser referansan zarbêj dîyar dibin û ez xwe digihînim wan. Paşê ji wan ra giştî qala armanca xebata xwe dikim. Eger qane bibin, em qewl didin hev, roj û cihê berhevkarîyê dîyar dikin û ez diçim gel wan. Ev xelek serê ewil di malbata min da dest pê kir, paşê hevalên min hîn bûn, ez berhevkarîyê dikim. Dema ez ji wan ra behsa vî karî dikim, ew jî dibêjin, dîya min pir tişt dizane, pîra min heye, kalê min heye ku çîrokan dizane. Her diçe xelek fireh dibe. Carekê hevala min ji min ra got, “Meta min stranên dawetê dizane.” Ez bi rêya hevala xwe çûm û min nêzî 10 stran qeyd kirin. Lê wê çaxê, eger şertên me başbûna, bi gotineka din, ez demekê dirêj li wir bimama, min ê nêzî 50 heb stran qeydbikira. Loma dema berhevkarîyê jî tiştê herî giring wext e. Serê ewil gerek mirov hesabê demê bike, eger cihekî dûr be, belkî berhevkarî hefteyekî bajo. Loma divê berhevkar li gor wê hazirîya xwe bike, ji bo mayîne destûrê ji wan bixwaze. Eger nêz be, mirov dikare nemîne û di nava rojê da karê xwe biqedîne. Yan jî cardin biçe. Kesên ku tu ji bo berhevkarîyê diçî gel wan, pirî caran ji bo mirov xwarin, vexwarin hazir dikin, xizmetê dikin û wext li vêya jî diçe.

Gerek mirov di vê mijarê da jî miqate be û li ser vê bi wan ra xeber bide. Dema berhevkarîyê hin kes, kamera û denggir qebûl nakin. Pirî caran kamera ji bo wan fobî ye, jê ditirsin. Gerek mirov hesabê wan bike û wan netirsîne yan jî bi awayekî xweş wan qanî bike. Rojekê ez bi hevala xwe ra çûm Batmanê, daweta hevala wê bû û min sehayeka zêrîn kêfş kir ku li wir stranbêjên hêja hebûn û bi sedan stranên gelêrî yên dawetan dizanibûn. Gelek jê wan dawetê bi stranên digerlandin. Ez zaf şad bûm ku haya min jê vê sehayê çêbû. Piştî dawetê, min destûr ji wan xwest ku ez cardin ji bo qeykirina strana biçim wê sehayê. Ew qebûl kirin, lê bi tu awayî nehiştin ku ez bi kamerayê wan qeyd bikim. Herweha ji bo denggirê jî serê ewil destûr nedan lê dûra bi zimanekî şêrîn, min ew qane kir. Dibe ku berhevkar li rastî van tiştan jî bê. Lê ji ber ku, ew xwedî agahî û zanîna ne, ew van agahî zanîna neqil dikin, loma divê berhevkar li hemberî wan bi hurmet be, sînorên wan derbas neke. Rojeka din jî, hevaleka min got, kalê hevala min çîrokan dizane. Bi referansa wê, min xwe gihand kalo û malbata wî. Me cih û demê berhevkarîyê dîyar kir. Dema ez çûm ba kalo û min qala arşîv û qeyd û kamerayê kir zaf kêfxweş bû û qebûl kir ku ez bi kamerayê wî qeyd bikim. Her wext jî bi plan û pergala tevnegerim lê dîsa jî her wext denggirê bi xwe ra digêrinim. Ji nişkê ve, li civat, seyran, li şîna li rastî zarbêjan tîm û bi destûra wan tiştên wan qeyd dikim. Rojekê ez bi dîya xwe ra çûm hewarîyekê<sup>16</sup>, li wir li rastî zarbêjekê hatim û min ji wê nêzî 10 heb çîrok û meselek qeyd kirin. Carna jî bi taybetî diçim sehayê lê destvala jî vedigerim. Îhtîmala ku tişteke qeyd nekim jî heye. Lê dema ku biçim sahayê, bi destê xwe ra ji bo zarbêjê/dîyarî dibim da ku dilê wan xweş bibe. Îcar piştî berhevkarîyê tiştên ku min qeyd kirine, bi heyecan û coşek mezin derbasî arşîva xwe dikim û deşîfrasyona wan dikim.

**J.B:** Gelo aniha rê û rêbazên te yên berhevkarîyê li gor ên berê guherîne? Çawa?

**B.M:** Belê, dema ku min dest pê kir, xebata min bêpergal bû û haya min ji tecribeyên berhevkarên din tune bû. Piştî perwerdeya li weqfê, îmkana çêbû ku berhevkarên din hev binasin û tecribeyên xwe parve bikin. Ji ber vê yekê, bandoreka baş li ser rêbazên berhevkarîya min kir.

---

<sup>16</sup> Hewarî: tezîye, şîna.

**J.B:** Arşîv ji bo te tê çi mane ye?

**B.M:** Ez ji gotina ‘*Bîr*’ê zaf hez dikim. *Bîra* kesan û *Bîra* civakan an jî miletan hene. *Bîr* bi taybetî ji bo miletekî pir muhîm e. Hin kes an jî hinek millet hene ku bîrtûj in, hinek jî hene bîrko ne. Di vê maneyê da, arşîv jî *Bîr* e. Ji bo kurdan, tecribeya çêkirina arşîvê neketîye ser hev, zeyif e. Têra milletê kurda nake. Ji ber vê ez pir qîymetê didim, arşîvkirina tiştên derbarê kurdan ku ew jî bi kesan çêdibe. Bi qasî serê derzîyê jî tişt li ber çavê min bikevin, ez qeyd dikim û di arşîvê da bi cih dikim.

**J.B:** Gelo arşîva te heye? Ew arşîv çawa ye (nivîskî, teyb, kitêb, dijîtal)? Kerem bike hemû nimûneyan bide?

**B.M:** Belê, ji sala 2016an ve ye, vîdeo, deng, fotoyan qeyd dikim û di hardîskê da ne, gelek ji wan jî hatine nivîsîn. Dosyeyên dangan û dosyeyên vîdeoyan hene.

**J.B:** Gelo ew arşîv xwedî pergal e? Tu arşîva xwe çawa bi nav dikî? Bi rêya dosyeyan, cureyên keresteyan, hwd?

**B.M:** Ev arşîv ji dosyeyan pêk tê. Rêbaza ewil ev e ku arşîva min li gor dem û cihê tê kategorîzekirin. Dema ku ez ji berhevkarîyê vedigerim ji bo keresteyên nû, dosyeyên nû çêdikim. Dosyeya sereke helbet a folklorê kurdan e. Dosyeya folklorê kurdan jî wekî zargotin û keresteyên maddî hatîye kategorîzekirin. Dosyeyên zargotinê jî li gor isûlê tînan nivîsîn û dîsa dibin dosye. Dosyeyên ku tînan nivîsîn li gor cureyên wekî mamik, qewlêrk, zûgotinok, biwêj, gotinên pêşîyan, stran û kilam, çîrok, xewroşk, serpêhatî û destan tînan kategorîzekirin.

**J.B:** Gelo tu arşîveka wisa wekî “komkirina tiştan (şênber)” an bêhtir wekî “komkirina nîrxên ne madî (razber)” dibînî?

**B.M:** Helbet arşîv, xwe li ser dînamîkên nîrxên netewî ava dike. Ew dînamîk hem madî hem jî manewî ne, bi gotineka din arşîva keresteyên folklorê yê madî û manewî ye.

**J.B:** Gelo tu arşîva xwe diparêzî (mesela ji windabûnê, tozê, polîsê, hwd)?

**B.M:** Na, lê hewil didim da ku li derên din jî zêde (copy) bikim ku tiştek pê nebe.

**J.B:** Gelo rexistin (sazî) û kovarên ku tu bi wan ra dixebitî, karê te jî arşîv dike yan na? Gelo arşîva wan heye?

**B.M:** Belê, niha di desteya weşana Kovara Folklorê Me da me, û ev kovar ji sê mehan carekê derdikeve. Piştî min dest bi vê xebatê kir, nivîsên min ên berhevkarîyê li vir hatin weşandin/tên weşandin. Ji bo vê kovarê, monografiya gundê Çîçikayê hazir dikim. Ji bo her hejmareka wê, cureyekê monografiyê hat weşandin. Heta niha di pênc hejmaran da pênc nivîsên monografiyê yên li ser gundî hat weşandin. Bi vê xebata kovarê arşîva gundê Çîçikayê jî çêdibe. Navên wan nivîsan ew in:

- “Ji hebûkekî tirî ra mehsereyek lazim e.”
- “Navên zîyaretên gundê Çîçikayê.”
- “Navên kanîyên gundê Çîçikayê.”
- “Navên hin nexweşî û dermanên wan.”
- “Mînakên biwêjên gundê Çîçikayê.”

Arşîva kovarê heye; nivîs û gotar û wêneyên ku ji bo çapê tên ber destê me di vê arşîvê da ne. Li gor qeyd û isûlên kovarê hinek ji wan tên çap kirin, ên ku dimînin jî di arşîvê da ne. Ji kovarê ra, ji her çar perçeyên welêt, bi taybetî ji Bakurê, nivîs tên. Kovar vê derfetê dide mirovî ku qadek hebe ku nivîs û keresteyên folklorê li vir bên parastin.

**J.B:** Gelo bi ya te kovar dikare rola arşîvê jî bilîze?

**B.M:** Belê. Kovar bi xwe rêyeka arşîvkirina keresteyên folklorê ye.

**J.B:** Gelo tu keresteyên ku berhev dikî, çap dikî yan jî diweşîni? Li ku derê? Çawa?

**B.M:** Min li jor jî behs kir, bi rêya Kovara Folklorê Me, nivîsên min yê berhevkarîyê tîn weşandin.

**J.B:** Li gor te ji bo çanda devkî a kurdî kîjan metodên weşanê/çapkirinê baştir in? Çima?

**B.M:** Ji bo arşîvê, rêya herî baş helbet dijîtalkirin û çapkirin e. Lê niha şewaya belavbûna tiştan guherîye, ji ber ku zûtir belav dibin û xwe digihînin her derê û kesan, rê û torên medyayên civakî jî karîger in.

**J.B:** Tu ji bo weşanê yan jî çapê berhemana çawa hildibijêrî? Ji bo te ya giring çî ye?

**B.M:** A rast, mafê me yê hîlbijartinê tune ye. Standartên me ne li gor ên dinyayê ne. Ji ber vê em çî cure qeyd bikin an jî çap bikin baş e. Lê eger moriv li lezginîyê binêre, yê pedagojîk (çîrok, zûgotinok, mamik) muhîmtir e, qene be nîfşê nû bi wan perwerde bibin.

**J.B:** Tu ji bo çî berhemana çap/belav dikî? Armanca te ya çapkirin û belavkirinê çî ye?

**B.M:** Armanca min a ewil ew mesele berbiçav bibe û bira kurd bizanin ku folklor û zargotin çiqas giring e. Dixwazim ew kar berbiçav bibe, çûnkî ji hemû karan lezgîntir e: “*Eger em xwe nîghîninê, em ê qet negihîjinê.*” Tenê derengmayîn para me ketîye û gerek em vê derengmayînê hinkî be jî safî bikin. Ya duyem jî ev e ku kurd jî hay jê hebin, bixwînin, xwe xweş û baş hîs bikin. Rihê xwe tîr û tije hîs bikin. Çûnkî derb li rihê me jî ketîye.

**J.B:** Gelo li gor salên berê weşanên kurdî yê li ser berhemên çanda devkî guherîye? Eger guherîbe, ew guhertin çawa ye?

**B.M:** Em çiqas ji axê dûr dikevin, dikevin nava teşqeleya jîyanê (qeyd û bendên bajarîbûnê dikeve stûyê me) û rûbirû mayîna bi alet û amûrên teknolojî, em ewqas ji organîkbûna xwe, ji xwezayê dûr dikevin. Niha xwarinên me, di şertên fabrîkayan da tîn hazir kirin û ne dema wê be jî, em bi rehetî xwe digihînin xwarina ku em dixwazin, fabrîkasyon û bêtam. Îcar ziman bi xwe jî derbê ji vî alîyê ve dixwe.

Ji axê dûr, eynî wek malzemeya fabrîkasyonê û bêtam; zimanek çêkirî û plastîk helbet rihê ziman jî dimire. Îcar em li mêtîngehê dijîn, em nikarin bi pedagojîk û formasyona zimanê xwe perwerde bigirin. Bidestxistina îmkanên ku em zimanê biaxivin, hîs bikin, bijîn pir kê. Ji ber vê eger şertên ku min li jor gotin, li gor zimanên din xetere be; ji bo me du car, sê car heta çar car dibe xetere. Li vir fonksiyona folklorê helbet muhîm e, rihê zimên, rihê jîyanê av dide, û wan xurt dike.

**J.B:** Tu dixwazî versiyona çapkirî ji bo kê be?

**B.M:** Ez dixwazim ji bo nîfşên nû hebin, ji bo perwerdeyê em keresteyên xwe qeyd bikin ku winda nebe.

**J.B:** Gelo tu ji bo berhemên çapkirî pêşgotin an jî şirove dinivîsî? Çima û wan çawa diafirinî/dinivîsî?

**B.M:** Heta niha min pêşgotin amede nekirine. Lê derfetek wisa bi dest bixim, helbet ez ê îlhama xwe ji folklorê bistînim.

**J.B:** Gelo ji bilî çapê/weşanê tu/yan hevalên te bi rêyên cuda ji bo belavkirina çanda devkî ya kurdî digerin (mesela festival, şano, pêşkêşên cuda û hwd)? Eger hebin tu dikarî çend nimûneyan bidî?

**B.M:** Na, li gor şertên ku em niha tê da ne, derfetên me yên wisa tune ne. *Dewlet, di destê xwe her tim meqes, kêr û şûşin digerîne ji bo çavên me kor bike, rihê me qulqulî bike, û zimanê me jî jê bike.* Naxwaze û nahile, em bi kokê xwe ve bên girêdan. Niha derfeta me ya bilindkirina hestên netewî tune ye.

**J.B:** Pêwîstîyên herî giring ji bo komkirina çanda devkî û avakirina arşîvên çanda devkî çi ne? Problemên herî mezin çi ne?

**B.M:** Ji bo bakur, arşîveka bi rêûpêk tune ye. Hin sazî yan jî zango li gor xwe projeyên folklorê li dar xistine û hin xebat kirine. Lê ji bo folklorê ku zargotin jî di binê banê vê sazîyê da ye, sazîyeka giştî tune ye. Ev problemek giring e. Kê

kesên ku bi tecribeyên xwe yê şaxsî, keresteyên ku berhev dikin, kom dikin, qeyd dikin, dibin arşîvên şexsî, wek netew-sazî li cîyekî kom nabin.

**J.B:** Fikrên te yê li ser çareserîya van probleman çi ne? Pêşnîyazên te hene?

**B.M:** Di vê çarçovêyê da, pêwîstî bisazîyeka bi pergal û mezin û sistematîk heye. Gerek ev sazî hemû xebatên ku li ser folklorê hatine kirin, bigihîne hev, arşîvekê çêbike û wan jî dîjîtalîze bike, herweha propagandaya folklorê bike, bala mirovan bikişîne ser folklorê û berhevkarîyê keresteyên folklorê. Ji bo berhevkarîyê kursan amade bike, dersên teorîk û pratîk bide. Ji bo berhevkarîyê fînanse bike. Ji bo van kesên ku şexsî karê berhevkarîyê dikin, sîwanekî çêbike û di binê vê sîwanê wan bigihîne hev, ji bo arşîvên şexsî arşîveka giştî bike. Ev sazî, vê berpirsîyarîyê jî ne ji bo demekê bike, lê heta hetayê bidomîne. Avakirina vê sazîyê li bajarekî navendî be. Planeka berfireh ya berhevkarîyê bide ber xwe û berhevkarîyê bişîne berhevkarîyê. Ji bo deşîfrekirina keresteyan jî kesan perwerde bike û wan jî di vê avahîyê da îstîhdam bike.

**J.B:** Cih û rola jinan ji bo parastin û komkirina folklorê kurdî çawa dibînin?

**B.M:** Dema mirov li ser vê meseleyê lêkolînan dike, li rastî çalakkûna jinê tê. Jin çêkera keresteyên devkî yê folklorê ne, bi gotineka din jin bêhtir keresteyên devkî yê folklorê diafirînin û wan neqlî nifşên dahatûyê dike. Dema mirov danberhevdanekê dike, jin çalaktir dixûyin. Helbet sebebên wê yê sosyolojîk û antropolojîk hene. Rolên civakî yê jinê yê wekî dayik, evandî û evîndar, bûk û xwesîyê hene. Ji ber vê, jin di afirandin û îcrakirina keresteyên devkî yê folklorê da aktîf in. Dema dayik be heta zarokên xwe mezin dike, ji wan ra dilorîne, strîne, bi şîret û pendan wan perwerde dike. Dema zarokên xwe mezin dike, wan dizewicîne li ser wan distrîne. Danûstendina dê û zarokan xurt e. Dema evandî be yan jî evîndar be, dîsa ji bo hezkirîyê xwe dilorîne, ser, sing û sepetê xwe bexşî evîndarê xwe dike. Jin wekî xwişk ji bo birayên xwe qurban e. Ya ku saz dike, lihevtîne, qeyd dike (di bîra xwe da) û neqil dike jin bi xwe ye. Di warê folklorê da, jin xwedî bîreka tûj e. Jin *bîrtûj* in. Li jêr çend mînakên dîlokên hene. Ew dîlok ji hêla zarbêjeka jin ve hatine gotin. Dema em bala xwe didin naveroka van dîlokên em li rastî mijarên curbicur tînin, ew hem li ser xerîbîyê, koçkirina ji welêt,

hem li ser evînîyê, hem li ser bav û bira hem jî li ser netewebûn û polîtîkbûnê ne. Em li rastî rolên cuda yê zarbêjê tên. Li ser meseleyê, ew dayik e, evîndar e, ferdeka neteweya xwe ye, herweha ew qîza bavê xwe û xwişka birayê xwe ye. Dîlokên ewil li ser kurê xwe dibêje ku kurê wê ne li bal wê ye, li welatekî bîyanî ye<sup>17</sup>:

1.

“Dilê mi’ satila vê bêrîyê  
Min dî îsal zengê xwi berda ser kevîyê  
Dilê berxê mi’ reş ji bû malxwitîyê  
Êra berê xwi da welatê xerîvîyê”

2.

“Çîya bilind e berfê lê kir  
Qaz û quling tê da hêlîn çêkir  
Te berê xwi da welatê xerîv  
Te temînîya me l’ kê kir  
Te temenîya dayka xwi û xwişkê xwi l’ kê kir”

3.

“Mi go berxo çola Hewrê<sup>18</sup> çi mezin e  
Hemû cîyê av û hêstrê min e  
Şika tel û telefûnkî bike  
Bira bive qinyate dilê min e”

Naveroka dîlokên li jêr jî li ser evînîyê ye:

1.

“Lo lo kuro dîno ji te kilam ji min kilam  
Ji oda belek derket cotik zilam  
Min naz nekîr kîjan axa kîjan xulam”

---

<sup>17</sup> Hemû dîlokên ku ji bo vê pirsê wekî mînak hatine dayîn, tenê ji zarbêjekê di navbera salên 2018–2019an li navenda Amedê, hatine qeydkirin: Fatma Yerlîkaya, 75, Badika, 2018 – 2019.

<sup>18</sup> Hewrê: Gundekî girêdayî navçeya Farqînê ye.



2.

“Dengê min dengê şalûrê  
Olan daye berê kevir ber malê miqûrê  
Ez bivim gustîlkî zîvî na wele yekî zêrî  
Bikevim tilî û pîçîyê te l’ ser darê bilûrê”

Navoreka yên li jêr jî li ser zeyîtiyê ne. Li vir zarbêj wekî qîza bavê xwe dîlokan ji bo xwe dibêje:

1.

“Mi go zeyî hene çî zeynet in  
Mirina zeyîya l’ xerîva bê rûmet e  
Zeyî hatin goşê pirê goşa ş‘arê xwi kirin gozegirê  
Mirina zeyîya xwiş l’ mala bavê l’ rû birê”

Naveroka yên li jêr jî polîtîk in:

1.

“Ro derketî j’ alî Wanê  
Şewq û şemal daye Umranîyê ser zîndanê  
Ro hatîye Tirkîyê tav nexwanê”

2.

“Mi’ dî ro bû kerî kerî  
Şewq û şemal daye Umranîyê qefla derî  
Mala dewleta Tirko ne ava ve çawa nehişt  
Gêncê me bi serokê xwi ra meqseda xwi bivên serî”

3.

“Bejna gêncê me zirav e j’ tayê bîyê  
Hêşînîya xwi daye cezaevîyê  
Derî vedikim li wan dinêrim  
Rengê wan zer bîye mîna temezîyê”

4.

“Xuzka j’ xêra mala Xwidê ra  
Mizgînekî xêrê bata  
Gotna; derê zîndana vebûye  
Van gênc û t’er û cihana  
Her kes çûye ba dê û bava”

**J.B:** Di berhemên folklorî da kîjan motîfên jinê yan jî lehengên jin zêde bala te dikişînin yan îlhamê didin te û li ser karê te bi tesîr in? Tu dikarî nimûneyan bidî û taybetmendiyên wan îzah bikî?

**B.M:** Folklor eynikekî ye ku bûyer û qewimîni civak û netewî nîşanî me dide. Em bi keresteyên folklorê û zargotinê dikarin li ser civaka kurdan rawestin û analîzan bikin, karakter, leheng û motîfên kurdan binasin. Destan, çîrok, serpêhatî agahiyên giranbûha pêşkeşî me dikin. Li ser meseleyê, destana *Kela Dimdimê*, agahiyên berfireh ên li ser dîya Xanê Lepzêrînî, Lalîxan, dide me. Dîya Xanê Lepzêrînî şarezaya neteweya xwe ye û gelê xwe bi rê ve dibe. Tekoşîn û berxwedana Lalîxanê bi navûdeng e. Şîret û pendan li kurê xwe dike û bindestiyê qebûl nake ku weha dibêj: “Mirin xweştir e ji vê jînê.”<sup>19</sup> Di destana *Sîyabend û Xecê* da, Xecê ji bo evandiyê xwe malbata xwe terk dike û bi Sîyabendî ra diçe. Ji bo hêzkirina xwe, serî hildide. A rast, gelek jin bi armancên curbicur serî hildane û li ber xwe dane. Lê haya me ji wan tune ye, ji ber ku neketine nava rûpelên dîrokê.

**J.B:** Bandoran kîjan dengbêjên jin yan jinên kurd ku girêdayî çand û zimanê xwe ne û ew parastine, li ser te heye? Eger hebe tu dikarî bibêjî çawa bandor li te kirine? Nimûneyan bide û taybetiyên wan îzah bike?

**B.M:** Dengbêj Gulê, zext û zorên civakê dîtine, lê her tim li rex evandiyê xwe, Evdalê Zeynikê bûye. Her tim bi wî ra dengbêjî kirîye.<sup>20</sup> Meryemxan, Eyşeşan û Gulê; ev her sê dengbêj li gor dema xwe, têra xwe tehde û zehmetî kişandine. Ji

---

<sup>19</sup> Weysî AK, *Çil Kelatên Kurdistanê: Çîrok, Awaz, Stran, weş. Şaredariya Wanê, Enqere, 2016.*

<sup>20</sup> Ji bo agahiyên berfireh, li pirtûka *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* ya Mehmed Uzunî binêrin.

ber şert û mercên dema xwe, li gor dilê xwe nejîyane, lê tim li pey şopa dilê xwe bûne. Meryemxanê malîyên xwe terk kirîye û terkewelat bûye ji bo ya dilê xwe bibêje, bistire. Eyşeşanê jî feqîrîya dinyayê dîtîye û malbata wê, ew terk kirîye. Lê dîsa jî wê li ber xwe daye.

**J.B:** Gelo motîf, leheng, dengbêj an jî aktivîstên jinan ên kurd hene ku tu ji wan hez nakî û çalakiyên wan giring nabînî yan jî çalakiyên wan ji bo rewş û mafên jinan xetere dibînî?

**B.M:** Jinên kurd çalak in, aktîf in û pêşketîne, lê wekî problemeka me ya mezin, ew bi gelemperî di qada sîyasetê da weha ne. Giştî aktivîstên polîtîk in; an parlementer in an hevşaredar in an rojnameger in an jî endamên meclîsên partîyan in. Tiştê ku rexne dikim ev e, hişmendîyek bi vî rengî heye ku kar û xebatên kurdî tenê li qada polîtîk tîn meşandin. Bi ya min ev hişmedî dibe ku xetere ye. Qada polîtîk tiştên demî ne, derbas dibin. Lê qadên zanîne (epîsteme) bingehîn in û daîmî ne. Jinên kurd zû bi zû xwe li qada zanîne nagirin, lê bêhtir karên polîtîk didin ber xwe. Bi sedan jinên rojnameger hene. Lê akedemîsyênên jin kêr in. Hinek qadên wekî ziman, çand û folklor hene ku divê bi lez û bez mirov li ser wan bixebite.

**J.B:** Nirxên çanda devkî û rewşa jinan ku behsa çandê dike û wê pêşkêş dike çawa dibînî? Gelo tu pewîstî bi rexnekirinê yan guhartinê heye? Îzah bike û nimûneyan bide?

**B.M:** Niha hin bernameyên televîzyonê hene ku wek platform hem derfet çêdibin ku jin dengê xwe, çanda xwe pêşkeş bikin. Lê nebes e. Tevger, hewildan lazim in.

# Hevpeyvîna digel Cemîl Şêlazî

Cemîl Mihemed Enwer, known as Cemîl Şêlazî, was born in 1970 in the village of Şêlaza in Amêdî, Bahdînan, Iraqî Kurdistan. He began his studies in his village and attended technical college in Duhok. After receiving his BA, he was employed as a sociology teacher in Amêdî. Şêlazî began collecting and publishing on folklore in journals and newspapers as early as 1985. In 1992, he became a member of the Kurdish Writers' Union, Duhok branch, and joined the Journalists' Union in 2005. He has published over 30 books on various topics, mostly Kurdish folklore. He has presented his research at academic conferences, radio and TV programmes, and seminars.

Cemîl Mhemed Enwer bernîyase bi (Cemîl Şêlazî) ji daykbûyê sala (1970)ê gundê Şêlaza, devera Berwarî Bala, qeza Amêdîyê, li gundê Şêlaza dest bi xwandinê kirîye, paşî xwandina seretayî û navincî li Qedişê bi dwîmahî înyayê, û xwandina Amadeyî li Amadeya Pîşesazîya dihokê bi dwîmahî înyayê, piştî damezrandinê wek mamosta bekaluryos li Kulîja Perwerda Amêdîyê/ pişka Kumelayetî wergirtîye. destpêka wî digel Fulkilorî dizivrît bo sala (1985)ê, pîtir ji (750) babetên cura û cura di rojname û kovarên berî Serhldanê û pştî Serhldanêda belavkirîne, sala (1992)yê bûye endamê Êketîya Nivîseran/ tayê Dihokê, û li sala (2005)ê bûye endamê Sendîka Rojnamevanan/ tayê Dihokê, pîtir ji (10) simînanan li dûr Fulkilorî pêşkêşkirîne, û pîtir ji (10) bernameyên telefzyunanda pişkdarî kirîye, çendîn bernameyên radyuyan, pişkdarî di(5) Kunfiransên Zanstîyên Zanîngehên (Zaxo û Wanê û Hekarîya û Vîstevala Gelavêj)da pişkdarî kirîne, û heta niho pîtir ji (30) pertûkan çapkirîne, li dûr babetên cuda cuda, ku pirranîya wan li dûr Fulkilorî ne wek deq û vekolîn.

**Ferengîs Qadirî:** Gelek supas mamosta ku di firseteka husada qebûl kir min bi bînî, hendêk pirsyarim heye, eger leseretawe destpêbikeyn, hendêk li ser jiyana xo bi min re bêjî çewa bû û li ser jiyana xo û mezinbûna xo û çewa Fulkilor bala te kişand, û çewa te dest bi evê kar û pirojeyê kir?

**Cemîl Şêlazî:** Destpêkê supas bo evê delîvê, ez wek jiyana li sala (1970)yê li gundê Şêlaza devera Berwarî Bala, ser bi Qeza Amêdîyê jidayk bûyme, destpêka xwandina xo her li wêrê li sala (1976)ê destpêkirîye, li sala (1978)ê em hatîne gumelgeha Qedişê akincîbûyne, xwandina seretayî û navincî me li wêrê bidawî îname, paşî sala (1984 heta 1987)ê amadeya Pêşesazî li Dihokê me bidawî îname. Piştî hîngê destpêkê çewa me berê xo da Fulkilorî û hizra me di Fulkilorî û di komkirinê da hat, çî pê nevet her ji zarokîni li gunda, vegêrana çîrok û serhatîya ji bab û papîr û dapîra heza me li ser hebû, li sala (1984)ê li demê em qutabî li Amadeya Pêşesazî, mamosta Hecî Ce'ifer raport li ser Fulkilorî ji me xwastin û got ez hez dikem tiştên wek berhemên Fulkilorî bo me bînin, çî pê nevet her sala destpêkê heza min li ser hebû, her ji ber hindê min raportek (89) laperî bo îna, ji çîrok û heyranuk û serhatîyan, li vêrê pitir bo min bo palder, ku ez pitir girngîyê bi komkirinê bide, piştî hîngê berdewam bûm li ser komkirinê, li sala (1986)ê jî êkem babet heyranokek di rojnameya (Hawkarî)da me belavkir, ev belavkirne jî wek êkemîn babetê me êdî pitir bo palder.

Dimawê dinavbera (1984–1987) em li Dihokê bûyîn, pitirî rojan êvarî em di çûyn Êketîya Nivêskaran di gel wana pitir palder bo me peydabû, û pitir danûstandin û nvîsîn li dev me peydabû, eve bû destpêka min, min pitir bizav û hewildan ku ez tiştê Fulkilorî kombikem, çî pê nevet jimareka baş ya berhemên Fulkilorî hebû, çunkî em li gunda dijîyan delîve hebû bi taybet dapîra min ez dişem bêjim, gencîneka hera mezina Fulkilorî bûye lewra min berhemek zor komkir, li sala (1986)ê min vekolînek her li Êketîya Nivêskaran wek simînar pêşkêşkir li ser (demnasîn di gotinên mezinan da).

**FQ:** Li Êketîya Nivêskarên Dihokê?

**CŞ:** Belê li Dihokê, ev pêşkêşkirna simînarê jî pitir bo palder, ku berdewam li ser komkirina Fulkilorî, çî pê nevet destpêkê belavkirin wek pertûk karekê bî zehmet bû, lê di kovar û rojnamada tişteke baş me belavkir, her berî serhildanê û piştî serhildanê jî, piştî serhildanê berhemekê zorê nivêsi li cem me hebû yê komkirî, êkemîn pertûk piştî serhildanê çapkirî (Çîvanukên Kurdî) bûye li sala (2004)ê êkem berhemê me çap bû, ji layê dezgehê Mokiryani hat çapkirin, ev çapkirne, ji diwazde Çîvanukên Kurdî yê balkêş bûn, berdewam êdî me kar û xebata xo

pitir li ser komkirinê û nivêsnê jî da li şwîna bes em bi komkirinê rabwîn me dest bi vekolînê jî kir, anko em nebes li ser komkirina têkistê rawestyan, belku me gelek babetên rexney û vekolîn diberra me gelek berhem hebûyne, lewra her (2004)ê hêve heta niho me zêdetir ji (30) pertûkan çapkirî ne, ji wan şeş pertûk têkistên Fulkilorî ne, ew jî hemî çîrokin ewên dî cura û curin, me belgenamên destnivîsên hozanvana saxkirîne û me li ser babetên dîrokî şwînewarî jî nivîsayne û belavkrî ne, ji bilî wan (30) pertûkên çapkirî, niho (3) pertûk di berhevin ji bo çapkirinê, û ew babetên di kovar û rojnameyan da pitir ji (750) babetên cura û curêt rojnamevanî û vekolîn me belavekirîne, herwesa pitir ji deh simînarên cura û cur li herêma Kudistanê ez dişem bêjim ne bes li Behdînan belku heta dişem bêjim me beşdarî li vîstevala gelavêjda krîye li Silêmanîyê, û li salên (2016 û 2018) pişkdarî di çalakyên Weqfa Mîzpotamya li Diyarbêkrê da kirîye, her wesa pişkdarî di Kunfransên zanîngeha Zaxo salên (2018 û 2022) da kirîne, dîsan konfransê zanîngeha Wanê li bakorê Kurdistanê sala (2022)ê, ku me li bere pişkdarî Kunfransê zanîngeha Hekarîya jî bikeyn li (21 – 22/10/ 2022), ku hemî vekolînên me jî her li dûr babetên Fulkilorî ne, herwesa nêzikî deh bernameyên telefzyunî li ser Fulkilorî û ser ketwarê Kurdî û Fulkilorî hene, herwesa çendîn bername li radyuda ewên li herêmê me pêşkêşkirîne, çî wek mêhvandarî û heta bo mawê şeş heyvan min li radyuya (Metîn) li Amêdîyê bernamekek hebû bi navê (Serokanî) her hemî li ser Fulkilorî bûye, ji (24) xeleka li ser babetên Fulkilorî birêka radyuyê pêşkêşkirine, heta nuke peywendîyên me digel biraderên Bakurî bît yan Rojhelatî û Rojavay jî me peywendîyeka xurt hebûye, lewra biraderên li Behdînan jî pitirîya wan bi çavê hindê sehdiken min, ku ez ji wan kesên destpêkê bûyme, bes min ne tinê Fulkilor kumkirîye, belku di biwarê vekolînê da çendîn berhemên zanstî wek pertûkên vekolîn me hene, her bo nimûne (Remzê Marî Di Edebê Fulkilorê Devera Behdînan da) pertûkeke zor girînge, dîsan (Mêjûya Salnamê û Rojjimêra Kurdî) pertûkeke, her li ser (Dem Nasîn Di Gotinên Mezinan da) pertûkeka zor girînge, û (Helişkafîna Fulkilorî) pertûkeke ji heft vekolînên cura û cur têda hene, û pertûka çend vekolînek di çîrokên Fulkilorê Kurdî da, û dîsan di biwarê Fulkilorî da me çendîn vekolînên cuda cuda hene, bo nimûne me sê vekolîn li ser rêbaza probî û bikarînanana şirovekirna wê li ser çîvanoka Kurdî me bikarînaye, dwîmahîk pertûkên meyên berdest êk ji wana (Bihayên Civakî di dîtna Rojhelatnasan û Gotinên Mezinan da), ku niho li Enîstîtuya Kelepûrê Kurdî li jêr çapê ye, dîsan pertûka me

(Mamkên Devera Behdînan) ku pertûkeke wek ferhenga mamkên devera Behdînan ji layê kumpanîya Palo ve li welatê Îranê berîya çend rojekan çapbûye, û dwîmahîk pertûka me, berî heftîyekê (Bîblogirafîya Pertûkên Fulkilorî Li Devera Behdînan her ji sala 1970 heta sala 2020)yê bîblogirafîyeka gelek berfirehe hemî pertûkên Fulkilorî yên devera Behdînan wek bîblogirafî me berhevkirî ye, digel wê jî me pişkek wek paşbend wergirtî, ew pertûkên ji pîtên silavî yan ji zimanên dî hatîne wergêran li devera Behdînan her yê taybet bi Fulkilorî ewjî me kirî ye paşbendek di Bîblogirafîyê da, ku li paşerojê bibît jêderek bo qutabî û her vekolerekê hezket, bzanît çu pertûkên Fulkilorî li devera Behdînan çapbûyne, û ji bilî yên Kurdî ka me çî dî heye hatbîte veguhastin yan wergêran bo zimanê me yê Kurdî yê Behdînî, ez dişêm bêjim bi kurtî dibwarê rojnamevanî jî da me gelek karkirî ye, ne bitinê di biwarê Fulkilorî da, belku rîportaj û babetê rojnamevanî bo nimûne nêzîkî dû sala ez peyaminêrê Kovara (Asoy Fulkilorî) bûm, ewa li Hewlêrê derdikeft ji layê Wezaretê Roşinbîrî ve, ku li Dihokê ez peyaminêrê wan bûm, dîsan li sala (2005 ta 2007) berî liqê Enistîtûya Kelepûrê Kurdî li Dihokê bihête vekirin, ez nwînerê wan bûm li Dihokê bo Silêmanîyê, berhemên biraderan komdikirin min dibirine Silêmanîyê ji bo çapkirinê, peywendîyên me zor xurt bûn û wek peyaminêr me karkirî ye di gelek biyavan da, dîsan di kovara (Nojîn)da ku kovarek bû li Amêdîyê dihat derexistin, ji layê komeka gencan ve, ez wek endamê desteka nivêsera bûm, û li sala (1992)ê bûyme endamê Êketîya Nivêserên Kurd tayê Dihokê, dîsan li sala (2005)ê bûyme endamê Sendîka Rojnamevanan li Dihokê, di evan biwarên cuda cuda me berhemên cuda cuda henene, ne bes wek kumkirina têkistên Fulkilorî bitinê, wekî me gotî evê dawîyê me gelek giringî bi vekolînê daye, pirranîya berhemên me yên vekolînê bûyne pertûk.

Beşdarîya me di çendîn konfransên zanstî da, bo nimûne eva berî dû salan li Zankoya zaxo me peşdarî di dû konfransên zankoya Zaxo da beşdarî krî ye, dîsan her ev sale li (27)gulanê beşdarî konfransê Zankoya Wanê bûyn li ser ( Mîrasa Feqîyê Teyran), û heyva (10) jî li Zankoya Hekarîya dîsan her li ser Fulkilorî ye dê peşdar bîn, anko berhemên em şiyayn bi şewekê zanistî amade bikeyn, em dişên bêjîn eger bi kurtî behsê berhem û çalakyên xo bikeyn û me berhemên zor hene li ber dest (wek tu di bînê eve jimareka pertûkanin li berdest) ku pitirîya wan bi rêkên zanistî hatîne berhevkirin, çunke çendîn pertûkên me ji layê dezgehên ekadîmî wek (Enistîtûya Kelepûrê Kurdî û Ekadîmya Kurdî/ Hewlêr û Senterê bêşikî

zankoya Dihok û... htd hatîne çapkirin, anko dibîwarên cuda cuda me berhem hene û bişêwekê ekadîmî hatîne berhevkirin.<sup>1</sup>

<sup>1</sup> Hendek berhemên Cemîl Şêlazî:

- 1- Çîvanokêt Kurdî, folklor, çji weşanên Dezgehê Mukiryani, çapxana Xebat, (Dihok: 2001).
- 2- Puste, komele kurte çîrokên xumalî ne, çapxana Zana, (Dihok: 2004).
- 3- Kutrk û kurê pîrê (çîrokeka folklorî bo zarokan), ji weşanên Bîngê Rêxirawa Mafê Me-xenî Li Kurdistanê, çapxana Hawar, (Dihok: 2004).
- 4- Çend Vekolînek Di Çîrokên Folklorî da, ji weşanên Enistîtuya Kelepûrê Kurdî l slêmanyê, çapxana (şvan), (slêmanyê: 2004).
- 5- Hozanvanê mllî nadrê kanîsarkî (1872 1948 -) jyan û berhem, çapxana zana, Dihok: 2004).
- 6- Ji çîrokên mlyên kurdî, folklor j weşanên Enistîtuya Kelepûrê Kurdî, Silêmanîyê, çapxana Şivan, (Silêmanîyê: 2005).
- 7- Ji Çîrokên Folklorê Kurdî, folklor, ji weşanên Êketîya Nivîserên Kurd tayê Dihokê, çap-xana Hawar, (Dihok: 2005).
- 8- Çîvanoka Gayê Sor, çîrokek folklorîye, ji weşanên Êketîya Nvîserên Kurd tayê Dihokê, çapxana Hawar, (Dihok: 2006).
- 9- Mêjûya Salnamê û Deminasîn Di Gotnên Mezinan da, vekolîn, ji weşanên Enistîtuya Kelepûrê Kurdî, çapxana Hawar, (Dihok: 2007).
- 10- Saloxet Di Heyranokan da, vekolên, ji weşanên Êketîya Nivîserên Kurd tayê Dihokê, çap-xana Hawar, (Dihok: 2008).
- 11- Hindek Beytên Kurdî Di Destnivîsên Mela Mistefa Oremarî da, çapxana Hawar, (Dihok: 2010).
- 12- Helişkafîna Folklorî, çend vekolînek di folklorê kurdî da, ji weşanên Enistîtuya Kelepûrê Kurdî, çapa êkê, (Dihok: 2010).
- 13- Gondê Şêlaza Ji Layê (ciografi - dîrokî - aborî - civakî - ramyarî) ve, çapa êkê, çapxana Hawar, (Dihok: 2012).
- 14- Sê Beytên Kurdî Didestnivîsa Feq Mihemmedê Tixobî da, Enistîtuya Kelepûrê Kurdî - Dihok, çapa êkê, çapxana Kemal, (Silêmanîyê: 2012).
- 15- Çend Berperêk Veşartî Ji Dîroka Deverê, çapa êkê, çapxana Hawar, (Dihok: 2013).
- 16- Rêberê Bajêrvaniya Qedişê, çapa êkê, çapxana Hawar, (Dihok: 2014).
- 17- Ji Şwînewarên Devera Amêdiyê, (seredanên meydana û vekolîn), Senterê Bêşikçî Zankoya Dihok, çapa êkê, çapxana Hîvî, (Hewlêr: 2018).
- 18- Remzê Marî Di Edebê Folklorê Kurdî da (vekolîn) Enistîtuya Kelepûrê Kurdî - Dihok, çapa êkê, (Silêmanîyê: 2019).
- 19- Dîwana Mela Yuisf Kêstey (helbestên kilasîkî), çapa êkê, çapxana Hawar, (Dihok: 2019).
- 20- Rengvedana Amajeyên Dîrokî Di Mem û Zîna Xanî da, çapa êkem, çapxana Enistîtuya Kelepûrê Kurdî – Silêmanî, (Silêmanî: 2020).
- 21- Çîvanokêt Kurdî, çapa dûyê, ji weşanên pertûkxana gazî, (Dihok: 2021).
- 22- Bîbloyafya Pertûkên Folklorî Li Devera Behdînan (1972 2020 -), çapa êkê, Enistîtuya Kelepûrê Kurdî - Dihok, (Silêmanîyê: 2022).
- 23- Helişkafîna Baxê Kurda (çend vekolînek di hozanên Muxlisî da), çapa êkê, Hewlêr, Eka-dîmîya kurdî.
- 24- Mamkên devera Behdînan, çapa êkê, (Tehran - Îran: 2022).



**FQ:** gelek supas mamosta, armanca te li berhevkirina Fulkilorî û taybet Fulkilorê Kurdî çîye? anko pirojyên te bo nimûne li ser Ehmedê Nalbend?

**CŞ:** wek armanc eger wek pênaseka giştî ewa pitir vekolera daye Fulkilorî, wextê dibêjin (Fulkilor nasnameya millet ne), helbet me jî ev çenda he zanî ku komkirina Fulkilorî em yê nasnama milletê xo dideyne niyasîn û diparêzîn ji windabûn û berzebûnê, lewra bi evî têgehî me giringî da komkirina Fulkilorî û parastina wî, herwesa wekî berî niho min gotî: salên (1970 heta 2020) pitir ji (180) pertûkên cura û cur yên Fulkilorî li devera Behdînan çap bûyne, anko ez dişem bêjm rêjeka baş ya Fulkilorê Behdînan ku pîtir ji (80%)ê hatîye komkirin û erşîfkin, lê evro komkirin bitinê nebesî meye, evroke ev çend pêdvî bi komkirinê, em hind pêdvî bi vekolînê ne li ser Fulkilorî ji layê dezgehên ekadîmî ve bihêne vekolîn, belgejî ev konfransê Zankoya Zaxo ku pitir ji (84) vekolîn li ser Fulkilorî yên cura û cur hatîne nivîsîn, anku bûme diyar dibt, gelek erkê ketîye ser milêt me, êdî karê vekolînê jî li ser bikeyn, çunke vekolîn bixor jî pişkeka mêjûya milletê me evê burî hemyê diyar diket, her jîwarê milletê me bît û rabûrîyê wan bît, her tiştê rwydabît bi rêka evî Fulkilorê he demê em vekolînê li ser dikeyn diyar dibît, em jîwarê milletê xu û dîroka wî bideyn niyasîn, aya dewlemindîya wî çend bûye, ev Fulkilorê henê evroke hevber bikeyn, bo nimûne eger em bîn rêbaza morfolojîya Birobî bînîn li ser çîvanuka xo cêbecê bikeyn, wê gavê bo me diyar diket aya Fulkilorê me çendê dewlemende, em dişem berawird bikeyn digel yê cîhanê yan ne, helbet eve bo me diyar dibît, demê çendîn çîrok û çîvanuk me libin rêbaza Morfolojîya ya Birubî şirovekirîn, eve bi xo jî diyar diket çîroka me yan Fulkilorê me ji her milletekê kêmtir nîne eger baştir jî nebît, kengî ev çende diyar dibît, li demê gelek cara Fulkilorê xo digel yê biyanî hevber dikeyn, evca çî yê ‘Erebî yan yê Farisî bît yan Turkî bît, her welatekê dî bît, û gelek têkista em yê dibînîn, evroke me hevberkirina kirî, bo nimûne çîroka Zeng û Benga evroke li Kurdistanê dête vegêran, her li Elmanya heman têkist ya hey, anku me edebekê Fulkilorî yê hevpişk dinavbera me û cîhanê da yê hey, ev çenda hejî hemî kengî dê diyar bît, li demê vekolîn li ser dêt kirin, dîsan wextê Elikzander Kirap behsê çîvanokê diket dibêjît me dû curên çîvanokê yên heyn êk ya xo cihî ya xomalîya deverê ye, êk jî ya mşextkirî anko ji welatekî bo welatek dî mîşextkirî ye, lewra ev polînkirin û curê dayê, em dişem bêjîn edebê mejî ev edeb bûye, me gelek çîvanokên heyn xomalyên devera me ne,

anko Kurdî ne, çêdibît hindekên dî mişextkirî bin ji welatekê dî hatbine nav me, bû nimûne dipertûka min bi xuda ya (Çîvanokên Kurdî) me (Melîka Kiça Melîkî) ya hey yan çîroka (Silêman Pêxemberî) (s) her çende behsê Sîmerxê diket, lê wê gavê em dişên bêjîn dibît eve çîvanokeka mişextkirî bît, çunkî Silêman Pêxember ne dijiwarê meda bûye, em dişên bêjîn ya hatîye vekohastin, bi dehan nimûne me yêt heyn, anko çewa çîvanoka biyanî hatîye diyarkirin ya mişext bûy ji welatekî bo welatekî û ji deverekê bo deverekê ya hatîye dinav mejî da, heman tişt çêdibît berhemê mejî her mişextkirbît evejî gelek caran bêjîn derencamên evê çewa çêbûne? êk ji rêkên bazirganî, ku wextekî li ser astê cîhanî ku bazirganî dinavbera pitirîya welatanda hebûye hatin û çûna bazirganî kirî ye, yan heta bi rêka daneşwîya jinê û xizmanîyê dinavbera welatanda çêbûye, bibîte egerê gelek cara edeb hatbîte vekuhastin ji welatekî bo welatekî yan bi koçeratîyê ji welatekî bo welatekê dî, edeb û keltûrê digel xo veguhastî û înay û birî, eve hemî armancên mebûyne ku evroke em bişeyn parastina kiltûrê milletê xo yê zarekî hemîyê biparêzîn, ewê ku bi hizareha sala hatîye vegêran û heta nuke maye parastî û êdî erkê meye parêzîn û tumarbikeyn, çunkî her pîremêrek ya pîrejnek wexer biket çantkekê yan parzînekê vî edebê he, dê digel xo bin ax ketin, erkê me hemyaye û pêtivîye bi erkê xo bizanîn û kumkeyn û ji wan wergirîn berî ew wexer biken, em wan cantik û parzînkên wan bi emanet jê werbigrîn, û bi emanet em bişeyn bigehînîn berebabên xo, û bo wan bihêt parastinê, subehî milletê mejî û paşî berebabên mejî şanazîyê bi xo bet ku em jî milletekî xudan edebîn û xudan kiltûrîn û xudan şaristanyetîn, çunkî şaristanîyeta her milletekê bi çi têt niyasîn? bi edebyata wî dihêt niyasîn bi paşmawîyê wî dête niyasîn, evroke eger me cil û berg û xwarin û tiştên xoyên kevin nebît, me şaristanîyet nîne, eger me edebê xo yê zarekî nebt me şaristanîyet nîne, eger me dîroka xo ya tumarkirî nebît, em neşên bêjîn em xudan şaristanîyetîn, evroke boçî em dibêjîn şanazîyê dibeyn û dibêjîn Kurdistan landika şaristanîyetê ye, her paşmawê mirovê Niyandirtal li şkefta Şaneder û şkefta Hizar mêrd û gundê Çermo êkemîn gundê deramet lê hatîye çandin, evroke em wek Kurd şanazîyê pê dibeyn, çunkî eve berdestê meneba em nedişyaîyn şanazîyê bi xo beyn, belê eve hemî bûme şanazîye ku kiltûrekê zengîn û dewlemend û dîrokeka dewlemend û paşmayekê zengîn, paşbabên me yên bo me hêlayn, nuke em parastina wî bi erkê xo dizanîn, hilişkafîn û vekolînê li ser bikeyn, berawrdiyê li ser bikeyn, heger dişiyan da bît her çende evroke bi dehan berhemên me bèn wergêranê bû

zimanekê dî Elmanî bît yan Îngilîzî bît yan Ferensî bît, çewa berhemên wan bû me tîn wergêranê, berhemên mejî erke bihên wergêranê û da bizanin milletê Kurd çi heye, eger rojhelatnasa xizmeta edeb û kiltûrê me kirbît, evroke pêdivîye em jî xizmeta edeb û kiltûrê xo bikeyn, em bo wana vegohêzîn û em bo wana wergêrîn, evroke em bi evê rêkê bişên bêjîne evan milletan em jî xudan şaristanyet û edebîn û xudan kesên zana û şehrezayne, eve dê bi çi bît, eve me bi erkê xo zanî ye, lewra berdewam me bizav û xizmeta edeb û kiltûrê xo bikeyn.

**FQ:** Gelek sopas, piştevanê kar û pirojeyên te kîne, aya dezgehek beşekê hikomî wek piştevanîya aborî kirîye?

**CS:** Eger em wek piştevanî bêjîn, li herêma Kurdistanê, dibît Kurdistanê jî ne li herêma Kurdistanê belku her çar parçên Kurdistanê hemîyê pêkve, wek dergehekê jiyarê bît, ew her nîne, lê dibît hindêk dezgehên me li dwîv şiyânên xo gelek caran bo nimûne heşt pertûkên min Enistîtuya Kelepûrê Kurdî çapkirine, eve piştevanyeke, her dîsan bo nimûne pertûkeka min dezgehê Mukiryanî çapkrî ye, û Ekadîmya Kurdî dîsan pertûkek bo min çapkrî ye, anko hindêk dezgeh hene xo li berhemê me dîken xudan, bes em li vêre dibêjîn hêş rojekê berê me li hindê nîne dergehekê jiyarê bît bû me û dahatek bûme jê dihêt, bes berhemê em kumdikeyn bigehînîn destê xwandevanî û bihêt tumarkirin li dev me eve giringe, evça gelek cara me li ser hisaba xo jî tiştê xuyê çapkirî, û gelek cara jî dezgehên heyn, hindêk cara piştevanyeka hey her çinebît ya remzî jî bît xo li berhemên me gelek kirîye xudan û berhemên me çapkirîne, em hewil û bizavê dikeyn her tiştêkê me kumkirî bît û nivêsi bît, bi her rêkeka bît em bigehînîn destê xwandevanî û bihîte qeydkirinê û çapkirinê, heger wekî mamosta Hcî Ce'fer carekê gotî: eger êkê divêt di mala wîda kurîya mişkî bi ar nekevît, dê xo bi kumkirina Fulkilorî veket, anku ne dergehekê jiyarê ye, to bêjî ez dê evî karî kem dê bîte berhemek yan dahatek bo min, nexêr bes çî ye, diser hindê ra em dibêjîn bila çi dahat jî bo me pêve nehêtin, bes yagiring ewe em evî edebî û kiltûrî biparêzîn, lewra em gelek cara bizavê dikeyn, eger dezgehek yan hikomet bît yan heta dezgehekê yê ehlî bîtin, her cihekê bîtin, xo li berhemê me biket xudan em diçîn dikeyne didestî da, em dibêjîn tu çap bike, giring bihêt çapkirin û parastinê, eveye armanca me, eger çi dergehên jiyarê bû me pêve nahên, ez bawernakem êk li Kurdistanê bêjît ez dê pertûkekê amadekm,

belku gelek cara jiberîka xo sereray zehmetê û burandina demê xo hemîyê jî terxan ket bo hindê, bes yagiring ewe li dev me, em bişên bi parêzîn.

Armancên me hemî evene, evca dezgeh jî, eger em hevber bikeyn, min di pertûka xoya bîblogirafiyê da rewşa Fulkilorî li devera Behdînan ji sala (1970 heta 2020) me gelek ewjî behiskirîye, berî serhldanê rewşa bervkarê komkirinê çewa bûye, piştî sehldanê çewa bûye, ihtîmale eger ez bêjim te jilayekê ve piştevanî li berî serhldanê pitir piştevanî li berhevkarî di hatekirinê, bo nimûne li (Bexda) her pertûkeka nivêserî bo çap kirbaya li berî serhldanê, her pertûkek (2000 ta 3000) hizar dane çap dikirin, û hemî didane nivêserî û kojmekê parey jî didayê, anko hîngê (700 ta 800) dînara wek pare jî didayê, lê eger em hevberkirinê bikeyn digel vêgavê nexêr dibît pertûkekê çap biket gelek dê (50) daneyan dete nivîskarî yan berhevkarî, evên dî yên mayn jî bo dezgehî dimînin, eger hevberkirinê bikeyn ciyawazîyek zor niho dgel berî serhldanê da heye, di ser hindê jî ra em dibêjin qeydî naket, bo nimûne ev pertûka (hilşaftina Fulkilorî) êk ji wan pertûkane tinê (25) dane dgel kojmek parey remzî yê daye min, û gelek car jî meyên çapkrîn, tinê (10) dane jê nedayne me, me ya gotîyê bes çap bike û belavebît, çi beramberî wê jî me jê newergirtîye, anku rewş li Bakurê Kurdistanê yan Rojhelatê yan Rojavay yan Başorî bît rewş hemî wekî êke, rewşa darayî ya hind berfrehe em bêjîn spuserî ya piştevanîyeka ya daray baş li nivêskarî bihêtekirin, nahêtekirin, nivêskarê mejî em dibînîn xemxure û desta danahêlît, wek dahat bo bihêt yan nehêt kirin, bizavê diken li her çar parça û pêkve jî heta ji derve her bi rêkeka bît ku ev berhemê he bêt komkirin û tumarkirin yan çapkirin û belavekirinê.

**FQ:** Barapitir hewl û berhemên nivêskar şexsî ne?

**CŞ:** Belê, pitir kesayetî ye, tu bêjî dezgehekê taybetmend hebît, bo nimûne me li vêre li Başurê Kurdistanê “Enistîtûya Kelepûrê Kurdî” heye, ewê jî piştevanîyek yan gelek şiyar li ber dest nine û şiyar nînin, bo nimûne Weqfa Mîzuputamayê li Diyarbêkrê, eger parekê baş li berdestê wan bît, bawerim dê xizmeta baş ken, lê evejî gelek bi rêka hindek kesên dewlend û xudan şiyar dibît eve piştevanîyê lê biken, eger wek hikomet piştevanîya pêdvî nahête kirin, lewra bervkarî pitir karek kesayetî ye, çunkî evroke tu kesekê bi komkirina Fulkilorî rabî eger hikomet piştevanîya te biket, tu pêdvî bi kamîrê û pêdvî bi tiruombêlê bî û pêdvî bi parekê

baş bî li ber dest bît, eve hemî pêdvyên te heta bişêîy gund gund bajêr bajêr lê bigerî, helbet ev çende jî nîne, her berhevkarê take kesî li dwîv şîyanên xo bizavê diket ka dişê çî kum biket yan berhev biket.

**FQ:** Tu dikarî pîçekê behsa mîtudê xo bikey, nimûne te niha behsa gund bi gund dgerî, tu çewa têkistên Fulkilorî peydakey û tu çewa rîkurdikey, hindek behsê mîtudê xo bikey?

**CŞ:** eger em sehkeynê demê me komkirina wan fikir, pitir her ji me li herêma derdura dizanît ka kî kes filkilorî dizanît, bawerke hemî ji berîka xo bûye, her msecilê bikirî tu kamîrê bikirî, hatin û çûna tirumbêlê, ji berîka xo qest kene wan gunda û di çûyn dev wan kesa bitinê da bişyên hindek, babetan li nik wan vêca çî bi qeydkirina bi rêka kasêtî yan vîdîo kirin bin, heta gelek cara nivêsn bit, eger bixwazît, rêkên cuda cuda me bizavkrîye, lê evejî me got rêkên heyn gelek cara qeydkirin li ser kasêta, helbet nuke pitir bisanehî ketîye, demê me pitirya wan kumdikir bi kasêta qeydkirinê bûye, ji nwî ev kasête hemî em dihatîn mal careka dî vedguhast û dinivêsa, nivêsnê jî ji nwîka tu bizavê bikey kombikey û binvêsi û pêdaçûnê li ser bikey ve û bihêt parastinê, ya jiminve serkevîtîrîn rêk bo parastinê qeydkirine, wekî dibêjît bote dimînît, gelek cara eger biçî ew çîrokê bo te bêjît û tu guhdarî bikey, paşî tu li dwîv ew tiştê te jê guhlêbûy, li dwîv hizra xo binvîsi ve, bi emanet naêt parastinê, dê gelek peyvên nwî çin di navda, lê eger te tumarkir bi rêka kasêtekê piştî hînkê li dwîv dengî û gotina wî di çî, ka wî çewa gotîye dê wesa parêzî, û rêka zansitî jî ya parastinê jî ya zanistî divêt eve bît, lewra mîtudêt evêt komkirinê divêt eve bin, lewra eger dezgehek heba ku piştevanî lêkirba wek lijne çend kesk pêkve û kamîre van û tumarker û tirumbêl û piştevanîyeka daray heba misuger da tişt serkeftî tir bît, lê pitirîya me piştevanîyeka takekesî bi xu bûye bi evan rêka bûye, lewra mîtudên me jî me gelek cara me neşyaye kuntirrolê li ser deverê bikeyn, çunkî dwîr destî û neşezayîya li her gundekî ya her deverêkê kî şezayê, eve jî pîçek zehmete, lê dewruberî yan nêzîkî mirovî dibîtin li devera mirovî yan gundên dewruberên mirovî bizanît stiranbêj kî ye, çîrok bêj kî ye, evêt henê kesekê bizanî vêca wêgavê qesta dev wî kesî bikey, lê vêgavê pîçek ya bizehmet keftî, çunkî evroke biçîye dev pîremêrekî yan pîrejnekê bêjîyê ezê hatîm bo min çîroka yan strana bêjî, dê tumarkem, dê bêjît ew zeman nemaye, kî guhê xodidetê!!

hindeka jî gelek cara arîşe di wêrê da bû wextê diçûy nik, qebwîl nedikir tu dengê wî tomar bikey, evejî astengeg bû yan tu vîdyo key yan tu wêney bo bigirî, helbet evejî dinav çvakê meda gelek cara astengeka bizehmet bûye, hemî dema rê bi me nedihat danê tu biçî dengê wan tomarkey, min bi xo mamek hebû stiranbêjekê navdar bû li deverê, ez heftûyekê mame pêve bes dû stiranên gelek giring bo min bêjît, got: “bila dê bêjm bes tu tumarnakey”, û ev netumarkirina wî ji ber çî bû? Ji berku di salên şêstan da şivan bû, şivanetî dikir, (Şêxê Mayê) dihate gundê (Şêlaza), li çulê gul dengê wî bû li çîay li ber pezî dema stiran digotin, hindî dengê wî yê xoşbû, şêx hate gundî, şêxî gotê: “dengê te yê herame, nabî tu stirana bêjî!!”, piştî dengê wî heramkirî êdî stiran negotin! heker wî hindek stiran hebûn kesê nebûn û kesê gulê jî nebûn, bes bo mejî negotin, çunkî eve bibû bîr û bawer li dev, ji berku şêxî got herame herame, ez êdî nabêjim, lewra gelek cara kartêkirina dînî ser hebûye, meselen dema stiranbêjek bêjît: ez nabêjim herame yan tu tumarnakey! evejî gelek cara asteng bûye, lewra evroke tu neşeyî biçî her peyveka hey binvêsî. belê bi rêka qeydkirinê gelek başe, aya hemî dê rêkê den tu qeydbikey?! evejî astengeg bûye, û heta gelek caran astengên siyasî bû me çêbûyne, me bivêt yan ne vêt, nukejî me gelek tiştên dîrokî û gelek tiştên şwînewarî hene lê rewşa siyasî û êminahî rêkê nadet tu biçîye wê deverê yan wî cihî, lewra me gelek tişt vêgavê jî yê hey em yê ji dest dideyn jiber rewşa siyasî û ne aramîya li deverê, gelek caran rê nîne, di hemî biwaranda em dibînîn, bu nimûne: rewşa herêmê ji layê Îranê ve neya arame, ji layê Turkîya ve gelek deverên me aram nînin, navxoya me bi xo gelek cara. peydabûna girupekê tîroristî li deverê bi xo dibine eger, ev ne aramîya hey jî gelek cara dibîte asteng, me gelek tiştên heyn, lê em neşyên bi parêzîn, belê heta jinavçûna gelek şwînewarên me yên deverê yên jinav di çin, ji egerê evan şerên peydabûyn li deverê, anko xelkekê yan kesên xemxur qest bikete wêrê yan tumarbiken, ketîne dibin gefên şerî da, dê bîni gelek cihên şwînewarî û tiştên gelek giring li deverên me ji nav di çin ji ber evan egera.

**FQ:** Gelek supas, ew astengên tu wek berhevkar gelek giring behis lê bîkrêt, gava çîrokbêj û dengbêj nexwast tu qeydbikey, wî demî te çî dikir? Bo nimûne wekî mamê te?

**CŞ:** Min bi destî peyv peyv dinivêsi, herçende destnivêsa çîrokê jî dê karî, bes stiranê eger wekî stiranê li dwîv rîtm û kêşa dengê wê pêdivî ye bihêt qeydkirinê, çunkî dibît gelek cara stiranbêj ew wextî stiranê dibêjît tu nikarî wekî wê binivêsi. Lê eger te qeydkir û hat qeydkirinê, dê drust wekî awaza wê hête qeydkirinê, gelek cara eve dibû asteng, çunkî wextê ew dibêjît: tu qeydnakey tu neçarî binivêsi, helbet nivêsinê jî gelek wext pê divêt.

Dapîra min bo min çîrok û stiran gotin û min qeydkirin bi (miscil)ê, ez rojekê mam li dev ji nîvro heta demjmêrî (9)î şevê (6) kasê min qeydkirin, her êk ji wanjî demjmêr û nîv bûn, eger nivêsi na bi destî baye dibît wê rojê hemîyê, êk çîrok bo min negotbaye, ewjî çungî nivêsinê wext pê divîya, bes qeydkirinê tu di şeyî demekê kurt, gelek tiştî qeydbikey, paşî êdî veguhasitna wê ji qeydkirinê bo nivêsinê her demekê bît tu dikarî êdî bi keyfa xo binivêsi. Eger biçî dev kesekî û bêjî yê bo min hindêk stirana bêje, ew bêjît tu qeydnakey île nivêsin bît, te gelek dem pê divêt, dibît gelek cara ev demê henê gelek cara berhevkarî nebîtin û gelek wext pêve biçîtin, çunkî dibîtin her êk ji me wek dergehê jiyarê fermanber yan mamosta yan her karekê dî jî biketin, ew jî layekê karê xo yê pêdvî bikey û layekê karê kumkirin û qeydkirina Fulkilorî, gelek cara eve jî dibine asteng dirêka mirovî da, qeydkirina dengê stiranbêjan, nexasim jina Kurd, gelek deverên me bi sedan jin me hebûyne dengbêj bûyne yan stiranbêj bûyne, lê bihîç renekê berhevnebûye dengê wê bihêt qeydkirin, heta vêgavê jî wek çivakê me, wek rewîşt û tîtalên wî yên kevin gelek azadî nedabîtin hemî jinê bişêtin ev stirane ev hemî tiştên li dev bihêt qeydkirin û tumarkirin gelek bi zehmete heta vêgavê em bêjin sereray ev astengên kêmbûyn, lê nukejî yên mayîn, nukejî megelek kes hene stiranbêjên bi nav û dengin, lê rene berhevnebin, kes dengê wan qeyd biketin, eger vêgavê amwîrên pêşkeftîrên heyn dê bisanehîtir hêne qeydkirin, lê amadenîne biçî bişewekê wesa hemî bihêt qeydkirinê, heta nuke me astengên husa berdewam hene, serhindê jî ra divêt em bo xo astenga nekeyn rêgr dirêka xuda, û bi her rêkeka hebîtin bizav bête kirin bihêt komkirinê, evroke eger hate komkirinê û çapkirinê, ji wêve pitir dê bîte erkê vekolera û bi taybet zanîngehên me, vêgavê piştî dihêt çapkirin, zanîngehên me eger kunfransên husa zanistî yên berfreh li ser evî berhemê henê bihêne encamdan, dê berhemekê zianstî yê baştir jê êt berhemînan, evroke vekolîn li ser bihêne kirin, eger vekolerî yan komkerî û xebatkerê komkirinê berhemê xo hemî komkir û çapkir, erke êdî dezgehek bihêt xo lê biket xudan û vavartinê jî bo biket,

bo nimûne: dibît sîh hizar gotinên mezina hebin êdî eger hemî hatin komkirinê û hatine çapkirinê, dibîtin li nek ji çend kesan xebatekê biken jêkvavêrin û bihên jêkcudakirinê, çunkî hemî tiştên me yên Fulkilorî hey, em zanîn bi kêr hemî dema naêtin, her hindê bo demekê yê başe, lê giring ewe vekolîn li ser bêt kirin, tiştên me hey yê erênî ji yê nerênî bihête jêkcudakirin, çunkî hindê tiştê meyê bi kêr wextekê dihat, renga bikêr nuke nahêtin, her çende hindê tiştê hey ew bi xo bê em bêjîn namînt û hat qeydkirinê wek edebê me û dîroka me yê rojaneda bo nimûne: eger em behsê gotinên mezina bikeyn, dibîtin me sedan gotinên mezina yê heyn eger bo wextê xo dibaş bûn, dibîtin nuke bo rêkên perwerdeyî baş nebîtin, bes hate qeydkirinê, lewra wek qeydkirin hate qeydkirin û erşîfkirin, bes wekî dî evroke dijiyana rojaneda nahêt gotinê, ez bawernakem bo nimûne eger em bêjîn: “dar bi pêna, jin bi spêna” li vêre (bi pêna) anko ramana hindê perwerdeya jinê bi qotanê û bi çwîvî bîtin, eger bu qonaxekê dirust bîtin, belê evroke çênabîtin biqutî, lewra gotin hat parastinê wek edeb û kiltûr û dîroka milletî, her tişteke hatî wextê vekolîn jî li ser hat kirin divêt li dwîv wî jîwarî bîtin, erê rêkên perwerdî wî demî çawa bûyne, em nabêjîn her tişteke perwerdey yê wî demî yê xelet bûye, belku vêgavê ez dişem bêjim bi sedan tiştên perwerdey rêkên wane yên wî demî perwerdeya zarokî bît yan jinê yan mezinî bît ya her kî bîtin, bi rêka bîrûbawera bît yan gotinê bît ya bi rêka ev edebê Fulkilorî bîtin, rêkên perwerdey hindê hebûyne, bo nimûne: eger em behsê hindê kevne bawera bikeyn wek da bêjin: “eger nîrukên te gelek dirêj bûn, Şeytan dê nivêjê li ser ketin!!”, çêdbît hema li vêre nîrukên dirêj, qrêj û pîsatî bikevîte dibin ra, da bêjin: da Şeytan nivêjê li ser neket, anko divîya zarokî ji nîrukên dirêj parêzîtin, yan gelek caran wek rêzgirtin, ev xarin û fêqîyên em dixûyn da nekevît bin dest û pêya da bêjin: dindkeka dinav hinarê da hey dindika beheştêye, welê fikir da wenekey êk dindik bikevît, çunkî wextê hinarê vedkey dindikên wê bijale û belav dibin, yan wextê dibêjin: eger nanê sûtî bixuy dê zengîn bî, çêdbît egerê abûrî hebûye û kêr xarin hebûye, da ev nanê sûtî nehête ze’êkirin û havêtin, yan da bêjin: “bila bi şevê zarok nederkevin, dê ezman surk hênê!” yan “dê ecine hingêvin!”, herçende wekî em dizanîn li dev me ezmansurk her mirov bi xûne, bes bo zarokî ew nebûye, yan neçe ser cihekê bilind, eger Şeytan dê gopalkê xo kete pê te!!, eve hindê kevne bîrûbawerin jî, bes eger em bêjîn rêkên perwerdeyî yên wî demî bûyne, dê çewa zarokê xo ji hindê tiştê parêzî, bo wî demî dibît di baş bûn, lê evro wextê em tên vekolînê li ser dikeyn, naçêbît em bi



mêşkê evroke serederîyê digel wan bikeyn, wek jîwar eqlê hîngê eve bû, şîyanên hîngê ebebûn, rêkên wan yên perwerdey ebebûn, bo wî demî dibaş bûn, lê bo me dibaş nînin, çunkî nabît, evroke eger bi mêşkê xo yê evro berê xo deyne wana dibt gelek tişt ji wana bi kêmatî sehkeynê bes jîwarê her milletekî, ne li Kurdistanê bitinê, hemîyan ev tişte hebûyne, destpêkê rêkên perwerdey bi wî şewey bûyne, qotabxane û zanîngeh nebûyne, dibît hatin û çûn bi wî şiklî nebûye, her êkê li dwîv şîyanên xo hinde rêkên deynayn, perwerdekirina zarokî bîtin, û her tişteyê bîtin.

**FQ:** Wek berhevkarê pitir çî bala te dikşîne û pitir hez dikey çî berhev bikey û çî tîkstên Fulkilorî?

**CS:** Min gelek tişt komkir, lê tiştê pitir ez li ser rawestyam, ez li ser çîrokê rawestyam, berhemên min kumkirî, bê guman gotin û heyranok û stiran û gelek tişt kumkirin, bes ew min çap nekirin, min pitir xo bi çîrokê ve girt, Pênç Şeş pertûk hemî çîrok û çîvanok min kumkirin, jimin were berhevkar jî her êk di bwarekê da kar biket dê xebata wî serkeftî tir bîtin, anko ez çîrokê kum kem û êkê dî stiranê û êkê dî gotinên mezina û êkê dî heyranoka htd... eger eve hebaye baştir bû, bo nimûne: eger bêjim li devera Behdînan (Kamîran Hirorî û Şvan Hirorî) hemî tayên stirana Fulkilorî bixove grtî ne û bizav kirîne kumkrîne û her çeçek wek pertûkek berhevkrîne, anku dihemî biwarada wan li ser stiranê gelek xebatkirîye, lewra eger êkê dî bivêt li ser serhatîyê xebatê biket û êkê dî li ser gotinên mezina, dê karekê serkeftî tirbît, bawerim dê baştir bît, her çende hemî tişt girînge bêt kumkirin, min gelek tişt kumkir, lê min hemî belavnekir, belku min ew tiştê kumkirî dane hindê kesên ew ta û çeq kumkirîn, her bo nimûne: min stiran dane (Kamîran Hirorî û...) heyranok dane (Edîb ‘abdulla)yî û...htd, em dişeyn evî karî jî bikeyn, raste li her gundekî yan devereke gelek tiştê lê heyî, lê merc nîne tu hemîyê belavkey, sehkeyê kê dî ev tişte kirîye û ev kumxebate kirîye, wê gavê tu dişeyî bêjî ev gotin û stiran û heyranokên min kumkirîn dê deme te, bo nimûne: min nêzîkî (70) hebranoka hebûn, biraderekî pertûkek berhevkar taybet bi heyranokan ve, min hemî dane wî, çunkî ew dê pertûkek taybet bi heyranoka vebîtin, min dane wî, ya girîng ewe bêne çapkirin û belavekirinê, lewra dibîtin her kesek, çêdbît êkê heza wî her liser stiranê bîtin, anko kesekê dawetker bîtin û hez ji stiranê biket, misoger wextê ew diçît stiranê kumbiket, dê pitir serkeftî bîtin, êkê hey hej dîwanên çîrokbêja diketin, û

guhdarîya çîrokê diketin, ewê gohdana çîrokê hebîtin, wextê çîrokê kumdiketin, dê pitir di karê xuda serkeftî bîtin, evejî gelek cara li ser heza mirovî bixojî dimînîtin, ka pitir hez li ser çî heye? bes di ser vêjî ra naçêbît em bêjîn: (welle) ev tayê girnge û eve neyê girnge? her tiştekê hatbîte gotin û zardev bîtin parastina wî girnge, vêça tu parêzî û qeydbikey û bideye êkî dî, yagiring ewe bêtin kumkirinê.

**FQ:** le çîrok belkî le heyran û furmên din jî wisabit, çend vêrjin hene wek nimûne çîrokek li Zaxo bi şêwazekê û li Dihokê jî bi heman çîrok bi şêwazekê dî, tu çî dikî, tu hemîyê berhev dikî yan ne? yan bes yek virjin?

**CŞ:** helbet me li Behdînan dû sala pêdaçûn li ser pertûkên Enistîtûya Kelepûra Kurdî li Dihokê kir, wek şarezayek min pêdaçûn dikir, wekî te keremkirî me dîtin vêrjnên çîrokekê li zaxo bişêwazekê têt gotin, û li Amêdîyê bi şêwazekê têt gotin, û li devereka dî bi şêwazekê dî dihîtin gotin, ya siroştîye eve hemî bêne parastinê heta gotina mezina bîtin, min berhevkarya mamkên Kurdî yê devera Behdînan li ser neh pertûkên çapkirî, carek dî min lêkdaneka dî bo hemwîyan kireve, min divîya wek ferhengêkê lêkdem, gelek cara peyvek dimamkê da li zaxo bi şêwazekê ya gotî û li Amêdîyê bi şêwazekê ya gotî, min herdû wergirtineve, çunkî mana êk peyva cuda li deverekê ji deverekê ya girnge bimîntin, boçî? çunkî gelek cara eger em behsê yê xo li Behdînan bikeyn, li Zaxo (dibîtin, dîkit) bi kardînin, dê zanî ev deqe yê devera Zaxoye, lê devera Amêdîyê ye, (dibîtin, diket) bi kardînin, dê zanî eve ya devera Amêdîyê ye, anku şêwazê vegêrana devokê cudaye yan em bêjîn bo nimûne li vê devera Zaxo (rûvî, rûbar) bi kardînin, lê devera Berwarî Bala (rwîvî, rwîbar) bi kardînin, û devera Amêdîyê û nêrwe û Rêkan (rîvî, rîbar) bi kardînin, û hosan, ku li vêre sê şêwe zarên devera Behdînan hene, lewma kumkirina heman têkist ji hemî deveran zora girnge, ji ber ciyawazîya devoka wan, lewra vêgavê parastina her devokekê bila êk têkêst jî bît, bes madem ciyawazî têda heye, bila madem hindêk peyvên ciyawaz dinav wan têkstan da hene, divêt hemî bihête qeydkirin, wextê subehî vekolerek bihêt, vekolînî li ser biket, dê zanî ev têkist ya kîş deverê ye. û eve dê bîte dewlemendîya ferhenga zaravên Kurdî.

Herwesan renga gotineka mezina li çar devera her heman gotin dihête vegêran, lê dibîtin devokên ciyawaz yê her deverekê ji wan têda hebin, lewma kumkirina wan hemî têkstan zora girnge, ji bûy ferhenga zimanê me dewlend diketin, dibîtin êk

peyv em tiştekekê dibêjnê, li devereka dî ew tiştekekê dibêjnê, û navek dî her ew nave, bo nimûne: li devera me dibêjn “qolpik”, û l devera Zaxu dibêjnê “qaç”, sehkê her êk tişte lê dû devokên jêk ciyawaz dihête gotin, anko ev navên cuda cuda bo heman tişt, di têksta Fulkilorî da heye, lewra ferhenga zimanê me ya zardevkî di Fulkilorî da heye, her têkstekê bît û çewa bîtin, bila êk stiran bîtin, eger dû peyvên cuda têda hebin, bila herdû têkist bihêne wergirtinê, divêt em hemî vekoler û berhevkar bi evî şêwazê he serderîyê digel bikeyn, nebêjît: (welle) ev gotina li dev mejî ya hey peyvek tinê cudaye, ew peyva cuda dewlemendkirina ferhenga zimanê Kurdîye.

**FQ:** Bi baray te ew tiştên local, tiştên taybet bi nawçekê de bêt biparêzrêt?

**CŞ:** Divêt hemî bêt parastinê, çunkî parastina wî şêwazê dîroka wê deverê diyardiketin, devokek ji devokê cudaye, vegêrana wê cudaye, peyvên wê ne ji deverekê belku ji gundekî bo gundekî hindêk tiştê hey cudaye, ev gunde tiştekekê dibêjît, û gundek bi rexve tiştekekê dibêjît, parastina hemîyê gelek girîng, li sala (2016)ê dema ku em li kumxebateka Weqfa Mîzopotamya li Amedê (D.Remezan Pektîf) tiştekekê gelek ciwan got, got: dema ku babetên vekolînên derçûnê dideyn şagirdên xo yê zanîngehê, em li destpêkê çend semînara li dûr şêwaz û çawanîya kumkirina Fulkilorî dideyne wan, paşî jê dixwazîn, ku vekolînên xo li dur her tiştê Fulkilorî û dîrokî û kiltûrî yê gund yan devera xo ji bo me kumken, wek vekolîna derçûnê, eger zanîngehên me bixwazin her zanîngehekê her çi nebît salane hizar qutabî lê derdiçin, eger (10 yan 20) vekolînên husa salane hebin, dîroka hemî gunda dê hête qeydkirinê, çunkî her gundekî gencîneka dewlemenda dîrokî ya hey, lewra eger bêjte qutabyê wî gundî here vekolîna xo li ser dîroka gundê xo çi heye kum bike, wî demî zanîngehên me lijnên taybet pêkbînin, wan vekolînan hilşkaftin û vavartinê bo biketin, ez bawerim dê tiştê zurê girîng hête kemkirin û qeydkirin, û rêkeka bi sanehî ew hemî kelepûr û Fulkilor dê hête parastinê, her bo nimûne: min pertûka gundê Şêlaza berhevkar, ku ji (320) laperan pêkdihêtin û ev tewere têdane, layenê (dîrokî, civakî, aborî, siyasî) anku her tiştê peywendî bi gundî ve têda heye, ez bawerdikem her gundekê li deverê ne pertûkeka husa belku sê çiwar pertûkên husa bêne nivêsinê hemî tiştên gundî û deverê dê hête kemkirin û qeydkirin, lewra her gundekê gencîneka mezina tiştî ya têda hey, lewra layê vekolerî bîtin, layê

zanîngehê bîtin, layê berhevkarê bîtin, erke pêkve karekê hevbeş bêtekirin, û ev tiştên may bête kumkirinê û xem jê bête xarinê.

**FQ:** Çi cêwazî beyna deq, hinek berhevkar dibêjn deqê resen û hinek deqê Fulkilorî dibêjn ew hatîye gohartin, tiştekan yan nezeryek husa heye, tu çawa dibînî aya dibawerîya teda deqê resen û deqê gohartî heye, tu çewa di bînî?

**CŞ:** Ez bixorê dgel wê çendê nînim, hemî deqên me di resenin, bes me tiştekan di yê hey ewjî ew kesên ev deqên kumkirîn guhrîn û destkarî di hindek devokên wêda kirîne, ku ew kesên he emaneta zanistî ya parastinê li dev nebûye, belku hindek kes bûne, hindek peyv wan yê guhartîn, eger wan destkarî têda kirbît eve ji deqê xoyê resen derdikevîtin, evejî hindek li dema kumkirina Fulkilorî da ev çenda he kirîne û min bi xo hindek kes dîtîne ewên Fulkilor kumkrîn hemî peyvên biyanî dinav deqanda kuhartîne bi peyvên Kurdî, ku eve bi xo xiyaneteke diketin û êdî nabîte kesekê bawer pêkirî, min gelek nimûne jî hene (lê pêtvî rêzkirina navên wan nîne), lewma dema mirov dizanît xudanê (filan pertûkê) destkarî di devokên pertûkê da kirîne, êdî ew wek jêderê resen nahête hijmartin, lewma aha wêgavê dê ji deqekê resen û xomalî bîte deqekê guhirî. tinê dixwazim gotineka (D.'Ebdulrehman Mizurî) deraberey ew kesên bi kumkirina Fulkilorî radbin, dibêjît: "ez şîretê li hemî kumkerên Fulkilorî dikem hişyar bin hişyar bin, bi emanet peyvê wekî wê wergirin, û destkarîyê dipeyvekê jî da neken, hindî Fulkilorê meye kêş û serwaya wê mî di berra naçît". ku hindek biraderên me li devera Behdînan pertûkên Fulkilorî kumkrîne û çapkrîne, lê destkarî têda kirîne, lewma ez wan nahjmêrim ji jêderên edebê Fulkilorê me, madem deq hatîye guhrîn, heker bi çend peyvekên kê mî bin.

Layenê zansitî yê kumkirina Fulkilorî ewe, heker xo ewê fulkilorî vedgêrît jî yan stiranbêjê stirana Fulkilorî hindek peyv xo bi şaşî jî gotin û vegêran, nabîte kumker wan peyva rast veket dideqî da, belku didehmenanda dişet rohinkirinê bidet wan şaşîyên gotûyî, bêjît: çîrokbêjî yan stiranbêjî hosan gotîye, lê ya durist bi vî şêweye, ewjî didehmenî da nek dideqî da. Her bo nimûne, me mamka Kurdî ya hey, yahatî gotin: (ji vêrê heta mîska, hemî şaxê gîska), êkê dî ya wergirtî ya gotî: (ji vêrê heta mîseka, hemî şaxê gîska), ye'nî eger to sehkeyê, peyva (mîska) navê gundekê devera Berwarî Bala ye, û (mîseka) dîsan navê gundekê qeza (Şêxan)e,

belê êkser serwa (mîska) digel (gîska) hate guhartin û kêş û serwa herdû têkçûn û hemî kêş û serwa wê ya hatîye têgdan, evejî dibît hindek cara ji neşehrezaya wî kesî bîtin, ewê tiştî werdigrîtin hindek cara dibît bi şaşî bêt wergirtinê, hindek cara ev tiştê çêbûy navekê li dev wî gulê nebûye, çêdbît wî navekê dî yê gulêbûy bi wî şêwey, yan peyvek stiranbêjî yan çîrokbêjî wextê wergirtî bi evî şêwey yê gulêbûy û wergirtî, û çêdbît ya xelet bîtin, ez dibêjim heta li vêre vê xeletîyê jî di vêtin mirov wekî wê bi hêlît, bes dişet didehmenê da amajekê pê bikt û bêjît: ya dirust eveye. Eger em bi emanet behis bikeyn, divêt bi evî şêwazey bîtin, ema eger bi keyfa xo her peyva min bivêt çî şêwazê bît yan devoka wê bîtin, ez bighurim, eve nabît cihê emaneta parastina Fulkilorî di edebî da.

**FQ:** Pirsyarek esasye, divyaba min li destpêkê bikem, dab û nerîta çewa pênasedkey? li dev te çewaye, çî taybetmindîya edebê devkî yê Fulkilorî heye?

**CŞ:** Helbet, ew bi xo edebê serdevkî çendîn taya bi xove di grît, çî di stiranê da bîtin, di serhatîyê û çîrokê dabît, eger em sehkeynê, ew rewîşt û tîtalên me heyn, gelek cara ji deverekê bo deverekê dê bînî, rêz û serûberê bwîk veguhastinê ji deverekê bo devereka dî dibît gelek cara ciyawazbin, yan me geleg kevne bawerên heyn, kartêkirin li ser bîrûbawerên wan hemîya kirbît, ev edebê devkî dimînît ser jîwarê her deverekê, li her deverekê gelek tiştê hey yê taybete bi wê deverê ve, bo nimûne: çêdibît eger em sehkeynê xo rojhelatnasa jî gelek cara amajeya pêkirî, gelek cara li dev me wesabûye, naçêbît, kiça xo bideye êkê ji dervey ‘eşîra xo yan deverên dî, wextekî husa bûye, çêdibît hindek kartêkirinên hozayetî û mirovkanê û texayetî kartêkirin ya li ser edebê me yê devkî kirî, ev dab û nerîtên he kartêkirina kirî, her bo nimûne: dê bînî pêgohartî li deverên me zora berbelave bûye, ye’ nî dibît li wextekî pitiriya şwîkirina kiçên wan pêguhorkatî baye, lê dema nuke sehkeyê her pêguhorkatî nemaye, berê xo bidê ew dab û nerîtê demekê guncay bîtin, bo wî demî, lê bo demekê dî ne yê guncaye, yan bînî demekê kiç bi next didane şwî, belê vêgavê her next nemayne, yan revandin wextekî wek adetekî bû, lê niho êkcar nemaye, anku ew tiştên wextekî wek bîrûbawer yan rewîşt û tîtal evro nemayne, wek: next nema, pêguhorkatî nema, revandin nema, belku heta wek gotineka mezina li dûr revandin û berdanê heye dibêjît: “heft cara xo bide revandinê, carekê xo nede berdanê” sehkê dev çivakê me, berdan bi çavekê gelek mezin bû jin bête

berdanê, bes revandin ya rewa bû, bes vêgavê hema revandin nemaye, boçî şêwazê ev dab û nerîtên deverê ne, yê ‘eşîrê û hozayetî hebûyne û kartêkirina wan gelek li ser Fulkilorê me hebûyne, lê gelek ji vana ew bi xo berev nemanê diçîtin, çend pêşkeftin bêtin, çend kartêkirina azadîyê û rewşenbîrîya take kesî dinav çivakî da pitir lê bêtin, ev tiştên şaş û xelet ew bi xo namînin, û dihêne ladan, me gelek dab û nerîtên şaş û xelet hebûyne, lê vêgavê sehkeyê hêdî hêdî namînî, vêça di gelek tiştan da, bû nimûne: eger behsê tazîya bikeyn, behîyên me gelek cara heta berî salên nutan da, divîyaba her ji roja ew kes di mir heta êvara eynî, ziyaretê wî hatba girtin ji layê çend mela û quran xwînan ve, yan li tazîya ça hatba gêran, yan li ‘eydan hemî zelumên gundî piştî nivêja ‘eydê diçûn li dûr goristanê dizvrîn û fathe dixwandin û digutê dewra meqberê, û gelek dab û nerîtên bi vî rengî, me gelek tiştên heyn wek diyarde bibûne dab û nerît, bes dê sehkeyê pirranîya wan niho nemayne, ji berku diyardên xelet bûyne, dê bînî ew bi xo hêdî hêdî namînin, ji egerê karekê şaş û xelete, hêdî hêdî li deverê hertiştêkê şaş yan xelet bîtin, piştî rewşenbîryeta çivakî çend rewşenbîryeta çivakî baştir bîtin, ev tiştên şaş û kêr ew bi xo namînin, û yê di hêne ladanê, ewjî bi rêka hindêk bernamên telefzîyunî yan radyuyê û pêşkêşkirina smînanan û rêkxistina konfransan, helbet eve hemî dibine eger, ku gelek tiştên şaş hene û dab û nerîtên kevin dinav me da hene şaşin, dibîtin bo demî xoyê baş bîtin, belê bo demê meyê niho baş nîne, belê eve em yê dibînin dinav edebê meda, dinav Fulkilorê meda hêdî hêdî yê kêr dibin, ew bi xo jî namînin, dê hêne qeydkirin dinav laperên edebyata zardeva Fulkilorî û hête qeydkirinê, çunkî qeydkirina dîroka bûrîya milletî diyardiketin û jîwarê wî diyar diketin, çî bi rêka evî Fulkilorê zardevkî evê hatîye vegêranê, çî dab û nerît bin û rewîşt û tîtal bin yan cil û berg bin, evroke tu dê êkê Kurd bi çî niyasî bi cil û bergên wî, bû nimûne: şel û şepik û kalik û kiras û fîstan, evên wextekî reşpuşî bikardiinan eve hemî nasnama vî milletî diyardiketin û parastina wê çenda girînge û heker xo nehête bikarînan jî, lê parastina wê di mozexanan da çenda girînge hatîye parastinê, madem ew tiştê nasnama me bîtin, divêt hemî bihête parastinê çî di mozexanan da bîtin, heker kel û pel bin, di mozexana da bihête parastinê, heker edebê zardeva bihête nivêsinê û çapkirinê bi her rêkeka bîtin, gelek cara dibîtin me hindêk tiştê hey heta bi rêka vîstevala, bû nimûne: wek xwarnên Kurdewarî, di hindêk vîstevalên salane da bihêne bikarînan, da berebabên nwî tiştêkî ji wan xwarnên Kurdewarî bizanin û bihêne parastin, anko me gelek rêkên heyn, bi

rêka şêwazên vîstevala, konfransa, simînara, bernama, bi her şêwazekî û rêkekê tu dişêyî tiştêkî biparêzî.

**FQ:** Wekî belavekirina tiştê berhev dikey pitir çap dikin wisaye?

**CŞ:** Eger me ljnên taybet hebane, wek hikumet û dezgehên taybet hebane, gelek tişt hatba komkirinê bes hemî tişt nehatba çapkirinê tiştê hey bête parastinê û neçîte dinav destê xwandevanê nuke da, me got hindêk tişt bo demê xo yê baş bû, bo nuke yê baş nîne, lê dema ku ev berhemê Fulkilorî bi rêka take kesan dihête kumkirin, helbet her kesek ji wan bizavê diket wî berhemî li ser navê xo belaveketin, evejî bi rêkên zanistî nahête encamdan, lewma berhemê baş û xirab hemî dikevîte ber destê xwandevan, lê eger dezgehekê taybetmend bîtin û bi rêkên zanistî dê şet evî tiştî jêk vavêrît, û tiştên baş lêkdet û cuda ket, kete pertûk dabûnerît çap ket, yê dî jî bihête parastinê di erşîfanda, lê dibîtin heta rewşa siyasî hinda guncay nebîtin ev tişte bêtekirinê, lê eva hatîyekirinê jî em bi çavekê sivik jî nasehkeynê, xo eger tiştê me yê xirab jî hatbîte belavekirinê, yê hatîye parastinê, lê me got erkê kêye jêkcudaken, ewjî vekoler bi rêka zanînehên mebîtin, yan hindêk dezgehên taybetmend bin, ev kunfransên zanistî dihênegêran, her niha jî dişên gelek tiştê vevolîn li ser bêtekirin, paşî careka dî bihên jêkcudakirin, yan heta pertûkên me bi sedan pertûkên me hene, her bû nimûne li devera Behdînan pitir ji (12) pertûkan yên gotinên mezinan çap bûyne, dezgehên taybet dikarin lîjneyên şareza û bispor pêkbînin, wan hemî pertûkan bînin, careka dî jêkvavartin û jêkcudakirinê bo wan gotinan biken û yên baş dûbare bikene ferhengêk û çap ken û yên nebaş jî bihêne parastin di erşîfanda, wek paşmayê milletî, û em dişêyn pîtirîya edebê xo yê zardev ewê hatîye kumkirin û belavkirin careka dî jêkvavartnê bo bikeyn, bi rêkên lîjnên bispor û taybetmend û şareza ve.

**FQ:** Erşîvê teyê şexsî heye, anko licem te hebîtin û belavnekrî û çapnekrî bîtin?

**CŞ:** Min gelek tiştê may, min gote te min bizavakrî, ew tiştê berdestê min pîtirîya wan yê belavekirî, lê min hindêk jî belavnekrîye, ewjî eger min zanî bîtin, biraderekê tiştêkê hey û taybete bi wî tayê Fulkilorî ve, min yê xojî daye wan digel yê xo belaveken, lê di ser hindê jêra gelek tiştê li ber destê min may di bîtin

hindek cara demê ne guncay bîtin, em jêkvavêrin û berhevkeyn bo çapkirinê, bes yê ne belavkirî gelek nemaye li dev min, pitirîya wî me belavkirîye, û nuke ez pîtir girngîyê bi vekolînên zanistî didem li ser hemî ta û çiqên edebê Fulkilorî ji kumkirinê, lewma (8) pertûkên me hemî vekolînên zanistî ne li dûr babetên cuda cuda yên Fulkilorî.

**FQ:** Te amajekir pêştir bi kasê qeydikir, ew kasê niha likîvene?

**CŞ:** Min nêzîkî (12 heta 15) kasêta li cem min hebûn, ji stiran û beyt û çîrok û...htd, berîya demekî hemî ew kasê min dayne Enistîtûya kelepûrê Kurdî ofîsa Dihokê, wan li cem xo qeydikirîne ser (CD), û dîsan ew kasê li dev minjî diparastîne, anku her bû nimûne, heker ez careka dî bixwazim pertûkên xo yên çîrok û çîvanokan dúbare çap bikemeve, ez dikarim, wek deng liser (CD) jî digel pertûkan belavkem, bû nimûne: pertûka çîvanokên Kurdî, ku ji (12) çîvanokan pêkdhêtn, hemî jî ji vegêrana dapîra min (Mirarî Mûsa)ne, ku jîyê wê pîtir ji (90) salan bûn, dema ku min çîrok jê qeydikirîn, hemî bi deng liser kasêtan me qeydkirbûn, ez dikarim çapa dûyê (CD) jî digel belavkem.

**FQ:** Sîdî digel pertûkên din heye?

**CŞ:** Min nînin, menekirine digel, çunkî ew demê me çapkirîn wek pertûk hêsta qonaxa sîdyê li dev me ne ya belavebû, yela meşîyaye wek pertûk çap bikeyn, lê vêkavê gelek pertûkên têne çapkirin, bizavê diken dengê wan jî digeli dabîtin.

**FQ:** Anko beşek ji erşîvê te, dîcilaytiz bûye layê Enistîtûya kelepûrê Kurdî?

**CŞ:** Pitirîya wan, bi taybet ewên min li ser kasêta qeydikirîn, pitirîya wî min yê daye wan, berîya dî sê heyvekan wan yê li dev xo careka dî yê parastî, çunkî ew kasê bi xo jî yên kevin bûyn eve ji sala (1987)ê were hafîne qeydikirin, renga gelek ji wanjî ji kar bikevin, û hêdî hêdî amwîrê (misecil)ê jî berev nemanê diçît û kar pê nahête kirin.



**FQ:** Nizanim belkî hindek pirsyar heye belkî dûbare bêt, bibawerya te bo erşîvekê serkeftî pêdivîya erşîvekê ser keftî bi çi dibît, erşîvekê Fulkilorî serkeftî?

**CŞ:** Ji bûy ku erşîvekê serkeftî bîtin, divêt dezgehekê wekî Enistîtûya Kelepûrê Kurdî, bizavê biketin her tiştekê hatîye qeydkirin û kumkirin li dev xo erşîv biketin, bû nimûne: eger bêjim, stirana devera Behdînan bi xoşhalîve ji layê kesên wek (Kamîran Hirorî, Şvan Hirorî, Rêkêş Amêdî û ‘Ebdul’ezîz Xeyat), çendîn sala çavpêketin digel pitirîya stiranbêjên me kirîye, ez bawerim bes ew stiranên li cem (Kamîran Hirorî) bitinê hatîne qeydkirin, pitir ji (1000) hizar stirana bin, eger eve hemî li dezgehekê bihêne kumkirinê wek Enistîtûya Kelepûrê Kurdî, û wek elbûm bihêne çapkirin û belavekirin her wek elbûmên (Mihmd ‘Arifê Cizîrî, ‘Eysaşanê, Hesên ‘Elî Xencer, Kawîs Axa, Hesên Cizîrî û...htd) ku hemî stiranên wan hatîne kumkirin û dengên wan paqijkirîne û têkstên resentir û baştir jêgirtîne, eger evên hejî wek wan bihên erşîvkirin, êdî dikarin hêdî hêdî bi rêkên zanistî û tiştên resen û baş jê bigirin, eve dê erşîfekê serkeftî berhem inî û parêzît, ku eve hemî erkê li ser milên wezareta roşinbîrî û layenên peywendîdare, bi vî karî rabin, xo eger wek take kes jî ev kare kirbin, hikumet dişê wî berhemî ji wan bikirî û erşîf ketin û li cihekî bête parastinê, paşî hemî li wêrê jinwî kar wek lijneyên bispor karî li ser çapkirin û belavkirina wan biketin, ca eger stirane û eger çîroke û eger...htd, eger me erşîvê serkeftî bivêtin, divêt bi evî şêwazî bîtin, evça ev parastine çi bi rêka mozexana bîtin, yan dezgehekê taybetmend bîtin bi evî karî ve yan zanîngehan bîtin, ew bi xo me hindek tiştên heyn, erşîvê wê ne li cihekî bitinê bîtin, erşîvê wê li cihekî pîtir bihête parastin, heker rwîdaneka ne çaverêkirî li cihekî ji wan rwîdidetin û ew erşîf jinav jî biçît, da li cihekê dî bimînîte parastî. Ya jîminve erşîvê serkeftî dê bi vî şêwey bîtin, ye’nî gelek bizav bêtekirinê nukejî ew tiştê may û nehafîye kUmkirinê eger hindek kes pê bihêne raspardekirin, her tiştekê may kum nebibîtin ew bizavê biken wîjî kumken û bête erşîfkirinê, erşîfê serkeftî divêt yê hosa bît, eger her tiştekê min kumkir ma li dev min, her tiştekê te kumkir ma li dev te, wêgavê çêdbît parastin jî têda ya misoger nebîtin, lêknêzîkbûn jî dibît me ageh jê nebîtin, lê eger hemî li cihekî hat komkirinê dê agehî li ser hemî deqên wê hebîtin, her deverekê û her cihekî ka deqekê wekî vî heye nîne, wekî êkin yên cudane, eve eger hemî li cihekî kumkirî bin.

**FQ:** Hîç bîreweryeka xoş ya nexoş dikarê te da wek berhevkar wextê tu diçûy gund bi gund digerîay heye hez bikey vegêrî?

**CŞ:** Me hind xoşî jî yê dîtin û hind nexoşî jî, lê tiştê min divêt bêjm, carekê min (miscil) bir û ez çûme mala xalê xo, nik dapîra xo, da çîrok û stiran û beytan bo min bêjît û ez qeydbikem, demjmêr êkî piştî nîvro bû, min got: dapîr min miscila înay bo min çîroka bêje? got: bila, bawerke min şeş kasê bir bûn, her kasêtek ji wanjî (demjmêr û nîv) bûn, her ji piştî nîvro heta demjmêr (9)î şevê hemî kasêtê min xilas bûn, min gotê: dapîr welle kasêtên min neman bo qeydkirinê, wê gavê rabû stiraneka reqasê got û diberra reqisî jî!! îna jinxala min jî gotê: jirmam, eve demjmêr êkî piştî nîvro were tu stiran û çîrokan dibêjî û eve demjmêr (9)î şevê ye ma tu newestyayîye?!! piştî vê hemîyê jî dû û sê stiranekên reqasê gotin û diberra direqsî jî!! ku hind ya berhevbû bo gotina çîrok û stiran û beyt heta qesîdeyên dînî yê Melayê Cizîrî jî digotin, bawerke ez bi xo çî caran wê şevê wî dîmenî jibîrnakem, nexasme jîyê wê ji (90) salîyê burî bû, ye'nî keseka (90) salî derbas biketin nebes çîrok û beyt digotin, gelek cara wextê stiranên reqasê digotin, digel di reqsî jî, hesab bike digel dîmenê gotinê, ye'nî heke hîngê vîdîo hebaye û hatbane vîdîo kirin, çêdbît da tişteke gelek balkêş bîtin, eve bo min bi xo hindî min kar û xebatkirî, ez evê şevê çî cara ji bîrnakem.

**FQ:** Resmê dapîra teheye?

**CŞ:** Êkê li dev min hey bes gelekê safî nîne, çunke ew bi xo yê reş û spîye û yê wê rojêye dema ku min çîrok û stiranên wê qeydkrîn, (eve wênê wê rojê bû), û nebes tiştê Fulkilorî dizanî, belku bi dehan ş'rên Melayê Cizîrî jiber bûn, heta min rojekê çavpêketn jî ya digel kirî, min gotê: dapîr ev ş'rên Melayê Cizîrî zor bi zehmetin, te çawa jiber kirîne? got: wextê me dersên quranê bi dersînî werdigirtin, seydayê me diberra ew ş'r bo me dgotin me jî ji berdikirin.

**FQ:** Ew çîrok û çîvanok zêdetir dastanên çine?

**CŞ:** Çîvanok li devera me ya Behdînan, beramber (Xirafe) ya 'Erebî bikardînîn, anku dêw, «efrît, ejdeha, marên heft ser, sîmerx û...htd, wek kesayetyên xirabkar

û şerxwaz têda dihêne bikarînan, ku (Firdîş Fun Dîrlayn) jî pertûkek heye bi navê (Elhîkaye Elxirafiye) têda behsê dîroka peydabûna vî curê hîkayetê û kesayetyên wê diketin. Her wesan Elikzander Hîcraî jî her bi (Elhîkaye Elxirafîe) navkrîne, li destpêka gotina vî curê çîroka çîvanokî çîrokbêjên me da bêjin: (çîrokê çîvanokê, xte xetukê, xet vegêrê...), paşî da dest bi gotina wê ketin, û pertûka me ya bi navê (Çîvanokê Kurdî) ku ji diwanzde (Çîvanokan) pêkdihêtin û hemî jî ji gotina (dapîra minin).

**FQ:** Lê eve hemî gotina dapîra teye?

**CŞ:** Belê hemî gotina wêye, nebes ew, Sê Çar carên dî jî hindî vê stiran û gotin û heyranok, bes eve ewên pitir çîvanok bûne hemî min pêkve kumkirin.

**FQ:** Keseka binav û deng bû dapîra te? yan bes tu dizanî hebî?

**CŞ:** Ne, li gundî stiranbêja daweta bûye, nebes li gundê me, heta li dewrûberên gundê mejî, ew gundên dî gelek cara bo daweta daxaz dikre wêrê bo stirana û bo daweta, ye'nî stiranên narînkê hema li gundî eger dawetek çê bibaye serçemkê dîlana ew bû, lewra ya binav û deng bûye, gelek gund me hebûn hindêk stiranbêj bûn, taybet li demê daweta van daxaz dikirin, çunkî dengxuşê wan yan şehrezayê wan distiranê dabû, gelek caran daxaz dikirine gundên nêzîkî êk û dû daxaz dikirine wêrê bo vegêrana wana.

**FQ:** Niha jî heye?

**CŞ:** Nexêr bi wî şêwazî nemaye, bes hîngê hebûyne, me stiranbêj hebûyne li gunda û li devera, hemî dema ji gundên dî daxaz dikirin, wextê bo dawetek daxazdikirin, da bêjnê em hez dikeyn bihêye ser daweta mejî, jiber gotina stirana, çi zelum bît, çi jin bît, herdû jî daxaz dikirin.

**FQ:** Balkêşe gelek, gelek sopas, te ji bo pertûkên xo wek miqedme dinvêsîne wek destpêk dinvêsî? bo hemî pertûk wek destpêk dinvêsî? wek şirove?

**CŞ:** Min yên nivêsay, min pêşekîyek ya dayê eger yakurt jî bîtin li ser rewşa kumkirinê yan naveroka pertûkê me hemwîyan pêşgotineka kurt dayê.

**FQ:** Cige bi dapîra xo tu karî bi kesên denkbêj yan stiranbêjên jin avretên din qeyd bikey?

**CŞ:** Qeydkirin min kesên dî neqeydkirîye, zelama min yên qeydkirî, bes jina min kes ne qeydkirîye, bes min çavpêkeftin digel (Helala Berçî) kir, ewa berî heftîyekê wexerkirî, helbet Helala Berçî stiranbêjeka zora bi nav û deng bû, Enistîtûya Kelepûra Kurdî pertûkek jî bi navê wê çapkîye, pertûkek taybete li ser Helala Berçî, ez bêjim berî heftîyekê yan deh rojeka ya wexerkirî, stiranbêjeka devera Nihêlîlyaye, zora binav û deng bû, min kasêteka (1)êk demjmêrî wek çavpêkeftinekê digel kir bû, bo kovara Asoy Fulkilor, ewê jî gelek stiran û çendîn nimûnên stirana jî bo min gotbûn min hemî qeydkirin, bes min yên zelama, ji bilî dapîra min, min gelek yên zelama jî hene beyt û heyranokên gotîn, bes evên afreta bo min gotîn, hema min yên nvêsayn, taybet eger heyranok bin tiştên kurt bin, ewana digotin, çunkî ewana heta radekê rêk bi qeydkirinê nedidan, eger min yên heyn, yên zelama Sê Çar kasêtên li cem min yên heyn, bes yên afreta dapîra min û Helala Bherçî bitinê bûyne.

**FQ:** Gelek sopas, pirsyar min nema, eger tişteke hez bikî bêje?

**CŞ:** Sopas bo vê delîvê û danustandnê, sopasîya te dikeyn bo kar û xebata te jî?

**FQ:** Gelek sopas.

# Hevpeyvîna bi Evîndar Şevînê ra

Evîndar Şevîn studied Sociology at Ankara University. For some time, she worked in the Municipality of Savur but was fired as a result of central government oppression of local Kurdish authorities in recent years. She became interested in folklore in 2009. At first she was an amateur collector, but after a course on folklore collecting at the Mezopotamya Foundation, she started collecting folklore professionally. She believes she was inspired by both her family and her studies. She is mainly focusing on folk tales and has collected a large number; they were published under the title *Meryemîgarê* by the Mezopotamya Foundation publishing house. Şevîn is also a member of the editorial board of the journal *Folklor Me*.

Evîndar Şevîn li Zanîngeha Enqereyê beşa civaknasîyê xwendîye. Ew demekê li Şaredariya Stewrê xebitîye. Lê ji ber qeyûmî niha karê xwe nake. Şevîn di desteya weşana Kovara Folklor Me da ye. Di vê desteyê da hem karê redaksiyona kovarê dike hem jî wekî nûnerên din ên desteyê nivîsên kovarê dixwîne û dinirxîne. Herweha nivîsên wê yên nirxandinên li ser pirtûkên folklorê kurdî (kurmancî) di kovarê da tên weşandin. Bi gotineka din ew yek ji nivîskarên kovarê ye. Şevîn ji sala 2009an vir ve bi folklorê ra eleqedar e. Li gor dîyarkirina wê, di destpêkê da bi amatorî berhevkarî kirîye lê piştî perwerdeya folklorê ya Weqfa Mezopotamyayê ew êdî hewil dide bi awayekî profesyonel berhevkarîyê bike. Malbata wê û beşa ku xwendîye tesîr lê kirîye û berê wê daye folklorê. Di nava keresteyên folklorê da, bala wê bêhtir li ser çîrokên gelêrî ye û heta niha wê piranî çîrok berhev kirine. Çîrokên ku berhev kirine di “Meryemîgarê”<sup>1</sup> da hatine weşandin.

**Joanna Bochenska:** Ji kerema xwe ra ji me ra behsa xwe bike. Nav û paşnavê te çi ye? Tu ji ku yî? Çend salî yî? Tu çi karî dikî?

---

<sup>1</sup> n.e.: Ev pirtûk, di sala 2019an da ji weşanên Weqfa Mezopotamyayê derket. Pirtûk ji çîrokên gelêrî pêk tê û 175 rûpel e.

**Evîndar Şevîn:** Navê min Evîndar e. Di nasnameya Dewleta Tirkîyeyê da ku daye min, paşnavê min Oncu ye. Ji xeynî karên fermî ez vê paşnavê heta ji min tê bi kar nayînim. Ez Evîndar Şevîn im. Li gundekî bi ser Çinara Amedê ve, di sala 1986an da hatim dinyayê, navê gundî Bedurlî ye. Hem Mêrdînî me hem Amedî me, lê xwe bêhtir Amedî dibînim. Heta heft salîya xwe li gundê ku ez lê çêbûme jîyam. Pênc salên zanîngehê ku ez li Enqereyê mam û du salên ku ji bo kar li Stewrêya Mêrdînê mam ne tê da, heta niha li navçeya Qoserê ya Mêrdînê dijîm. Beşa ku min li zanîngehê xwend civaknasî bû, ji ber wê jî karê min li ser civaknasîyê bû. Di navbera salên 2015–2017an di Şaredariya Stewrê da xebitîm, bi pozîsyona civaknasî, di mijara jinê da xebitîm. Piştî ku qeyûm hat ser şaredariyê, ez nexebitîm. Piştî hîlbijartinên 2019an ez li karê xwe vegeşîyam, du sê mehên min neqedîyan dîsa qeyûm hat û dîsa ez bêkar mam. Niha xebatkareka Kovara Folklorê Me me. Rêveberêka sendîkaya xwe (TumBel-Sen)<sup>2</sup> me.

**J.B:** Tu li ser çanda dekvî dişûxulî. Dikarî piçekî behsa destpêka wê bikî?

- Çima folklorê kurdî bala te dikişîne?
- Te kînga dest bi vî karî kir?
- Tu bi kîjan rêxistin (sazî) û kovaran ra dixebitî? Herweha pêwendiyên te bi kîjanî ra hene?
- Tu karê xwe çawa finanse dikî?

**E.Ş:** Bandora malbata min li ser karê min ê çanda devkî, folklorê pir zêde ye. Di malbatên ku çanda xwendinê tê da kême yan jî tune ye, çanda devkî pêşketî ye, lê ew hay ji vê nînin. Di malbatên ku çanda xwendinê tê da heye jî çanda devkî kême e. Di malbata min da hem çanda devkî hem jî ya xwendinê heye û malbateka bi her hawî bi neteweya xwe ve girêdayî ye. Ji ber van taybetiyên malbata xwe ez dibêjim bandora wê zêde ye, helbet bandora beşa ku min xwend jî heye. Folklorê bi xwe ji bo min qadeka balkêş e ji bo lêkolînê û hînbûnê. Di dinyaya îroyîn da, ji zimanê ku kes pê dipeyivin heta bi awayê jîyana wan, bîyanîbûnek, bêwateyî û xavîyek berbiçav heye. Sedema vê rewşê bi dûrbûn û nezanîna kok, çand û folklorê ra têkildar dibînim. Ji ber ku welatê kurdan, Kurdistan jî dagirkirî ye û

---

<sup>2</sup> Tûm-Bel-Sen: Sendîkaya karmend û kedkarên şaredarî û rêveberiyên herêmî ye. Ew jî di bin banê Konfederasyona Sendîkayên Kedkarên Gel (KESK) da ye.

kurd bi qirkirineka çandî ve rûbirû ne û haya min jî ji vî tiştî heye û ez kurd im, folklorê welatê min bala min dikişîne. Eger ku qismê berhevkarîya xwe ya amatorî nexim navê, ew çaxa ku diçûm zanîngehê (2009–2013), min di sala 2017an bi perwerdeya berhevkarîyê dest bi xebatên folklorî kir. Pêwendîya min bi Weqfa Mezopotamyayê ra heye. “Kovara Folklorê Me” ku ez yek ji xebatkara wê me, di bin banê Weqfa Mezopotamyayê da derdikeve, weşanê dike. Rêvebera sendîkaya Tumbel-Sen’ê ya şaxa Mêrdînê me. Li gor derfetên xwe yê şexsî, ku hebin, ez kar dikim. Jixwe ji ber van sedeman, ku aniha bêkar im û tu hatineka min a madî tune ye, ez nikarim bi dilê xwe xebatên xwe bikim.

**J.B:** Kevneşopîya devkî ji bo te çî ye? Tu dikarî wê pênase bikî?

**E.Ş:** Herhal qesta te ji peyva ‘kevneşopîya devkî’ çanda devkî ye, ez ê li gor wê bersivê bidim. Kevneşopîya ku ji nivîsê ra xerîb e. Jîyana ku nivîs û qeydên bi rêya nivîsê tê da tune ye. Her tiştê heyî, madî û manewî, ku bi rêya neqilkirina gotin û kirinê xwe parastine û hiştine.

**J.B:** Dema tu keresteyên folklorê berhev dikî bala te bêhtir li ser çî ye yan jî li ser kîjan cureyî ye?

**E.Ş.:** Heta niha herî pir min çîrok kom kirine. Di çîrokan da jî bala min li ser dîyalogên însanan ên bi xwezayê ra ne. Û wekî din jî bala min li ser vê yekê ye: Îhtîmala ku ev çîrok çiqas ji resenîya xwe dûr ketine. Dipirsim: Eceb ev çîrok di çî qonaxan da bihurî, li ku gerîya, çend kesan ev got...?

**J.B:** Kîjan cureyên çanda devkî bêhtir balatedikişînin? Tu dikarî nimûneyên wan bidî?

**E.Ş:** Stran, kilam, çîrok, biwêj.

**J.B:** Gelo tu versiyonên orîjînal ji yê neorîjînal cuda dikî?

**E.Ş:** Ku li rastî yê orîjînal (versiyona orîjînal, ji bo min berheveka ku hîs bikim ku zêde deforme nebûye) bêm û piştrast bim ku orîjînal e, ez ê cuda bikim.

**J.B:** Gelo te qet berhemeka neorîjînal ji arşîva xwe derxist?

**E.Ş:** Na.

**J.B:** Gelo li gor te, tesîra çanda nivîskî û ya modern li ser gotin û tevgerên dengbêjan heye?

**E.Ş:** Bi min çanda nivîsê, bandora wê li ser zimanê civakê giştî heye. Zimanê civakê jî bandorê li tevgerên civakê dike. Ev bandor li ser dengbêjan jî heye, lê ne bi qasî temamî civakê, ji ber ku çavkanîyên dengbêjîyê ji çanda devkî ne û kilam in, bêhtir parastîne ji gotinên xerîb û çêkirî (di bin navê nivîsa kurdî da hewla çêkirina peyvên bi kurdî heye, gelek peyvên ne rast û ne di cihê xwe da di nava nivîsê da û bi rêya nivîsê belav bûne) ra. Ev tişt, mirov ji bo dengbêjan dikare bibêje, lê ji bo stranbêjan nikare bibêje. Gelek stranbêj hene ku mirov ji zimanê wan fam nake, ji gotinên stranên wan jî fam nake.

**J.B:** Gelo têgihîştina folklorê ya Kovara Folklorê Me heye? Çawa ye?

**E.Ş:** Helbet heye, karê wê jixwe folklor e. Kovar, bi tu awayî naxwaze midaxeleyî resenîya berhevan bike û nake jî. Dixwaze ji her cureyên folklorî di her hejmareka xwe da bihewîne û biweşîne.

**J.B:** Te behs kir ku keresteyên çanda devkî berhev dikî. Gelo tu dikarî behsa berhevkarîya xwe bikî? Tu vê yekê çawa dikî? Rê û rêbazên te çi ne?

**E.Ş:**

- Pêşî bi rêya pirsînê ez zarbêjan dibînim û bi wan ra dipeyivim.
- Piştî ku me li hev kir em roja civanê dîyar dikin. Bi piranî ez diçim cem wan, yanî li cihê ew bixwazin em hevdu dibînin.
- Di dema qeydkirinê da hem kamerayê hem jî denggirê bi kar tînim, dema lazim bike qelem û defterê jî bi kar tînim. Hewil didim ku wan aciz nekim, zorê li wan nakim.



- Piştî qeydên deng û kamerayê, ez wan qeydan li ser komputera xwe û di harddîska xwe da qeyd dikim, yanî di du sê cihan da.
- Piştî qeydê jî wan diseniffnim.
- Piştî vê jî dest bi deşîfrasyona wan dikim. Wan jî bi heman şiklî di du sê cihan da qeyd dikim.

**J.B:** Gelo ji bo wê tu perwerde bûyî? Li ku derê? Ew perwerde çawa bû?

**E.Ş:** Erê, min perwerde dîtîye, li Weqfa Mezopotamyayê, li Amedê. Perwerde bikêrhatî bû. Kesên di vê qadê da xwedî tecrîbe û lêkolîner em perwerde kirin. Ji destpêka vî karî heta xelaskirina karî, divê çawa were kirin gav bi gav hînî me kirin.

**J.B:** Gelo aniha rê û rêbazên te yê berhevkirinê li gor ên berê guherîne? Çawa?

**E.Ş:** Erê, guherîne. Berê min wexta tiştê qeyd bikira min li defterê dinivîsî. Paşê bi wan telefonên biçûk. Lê dema ez li zanîngehê bûm, ez bi denggiran hesîyam û cara ewil ez wê çaxê bûm xwedî denggîrekê, kêfa min pir hatibû. Ew denggira jî li gor ên niha ne zêde pratîk bûn, lê ji bo min wê çaxê nimet bû. Wexta ji hêla teknîkî ve kar pratîk dibe mirov bêhtir kar dike û jê aciz nabe. Berê ez bi amatorî tevdişîyam, niha baştir im. Wexta dixebitim zanim çî û çawa dikim.

**J.B:** Arşîv ji bo te tê çî maneyê?

**E.Ş:** Arşîv, hafizeyeka bipergal e û hilanîn e. Ji bo mirovan, gelan, neteweyan tişkî bivênevê ye. Rê li ber jibîrkirinê digire û nahêle tu belawela bibî.

**J.B:** Gelo arşîva te heye? Ew arşîv çawa ye (nivîskî, teyb, kitêb, dijîtal)? Kerem bike hemû nimûneyan bide?

**E.Ş:** Erê, arşîveka min heye. Arşîva tiştên ku min ew berhev kirine. Hem nivîskî hem jî qeydên dangan in.

**J.B:** Gelo ew arşîv xwedî pergal e? Tu arşîva xwe çawa bi nav dikî? Bi rêya dosyeyan, cureyên keresteyan, hwd?

**E.Ş:** Arşîva xwe ya folklorê bi senifandina cureyên folklorî dikim.

**J.B:** Gelo tu arşîveka wisa wekî “komkirina tiştan (şênber)” an bêhtir wekî “komkirina nîrxên ne madî (razber)” dibînî?

**E.Ş:** Tiştên hêjayî komkirinê bin û bîn komkirin helbet xwedî bi nîrx in. Herçiqas hêlên van tiştan ên manewî pir in jî nikarim wan tenê bi wî awayî binîrxînîm. Pirî caran ji hêla madî ve jî bikêrhatî ne û çalak in. Lê ji ber ku tîn komkirin û hilanîn, hêla wan a ne madî li pêştir e.

**J.B:** Gelo tu arşîva xwe diparêzî (mesela ji windabûnê, ji tozê, ji polîsan, hwd)?

**E.Ş.:** Helbet diparêzim. Di serî da ji ber windabûnê û ji ber polîsan. Em hertim mecbûr in wan veşêrin û hilînin. Tiştên min qeyd kirine ji bo pêşî li windabûna wan bigirim li çend cihan qeyd dikim.

**J.B:** Arşîva rexistin (sazî) û kovarên ku tu bi wan ra dixebitî heye? Ew karê te jî arşîv dikin?

**E.Ş:** Erê, arşîva weqfê heye. Min qeydên xwe bi xwe jî li wir qopî kirine.

**J.B:** Gelo bi ya te kovar dikare bi rola arşîvê jî rabe?

**E.Ş:** Bi min, kovar bi xwe jî dibin arşîv. Li ser meseleyê Kovara Folklorî Me ku kovareka folklorî ye, rola arşîveka baş dilîze. Hem nivîs û hem jî foto û dûmen tê da tîn arşîvkin.

**J.B:** Gelo arşîva Folklorî Me heye? Ew arşîv çawa ye?

**E.Ş:** Arşîva kovarê bi xwe ya lîteraturî, wekî pirtûk, kovar, gotar û hwd ên çapbûyî tune ye. Arşîva kovarê jî ew xebat in ku heta îro kirine. Mînak, raporên civînan, pdfyên kovarê yên berî çapê û piştî çapê, fotoyên ku ji bo kovarê tên ji fotokêşan, nivîsên ku ji me ra tên ji bo weşandinê.

**J.B:** Gelo keresteyên ku berhev dikî, wan çap dikî yan jî diweşîni? Li ku derê? Çawa?

**E.Ş:** Heta niha berhemeka min a berhevkarîyê hatîye çapkirin, ew jî weşanxaneyê Weqfa Mezopotamyayê çap kirîye.

**J.B:** Gelo tu dikarî behsa Kovara Folklorê Me bikî? Hûn kîjan cure nivîs çap dikin? Hûn çawa nivîsan dinirxînin û hildibijêrin? Herweha min dît ku hûn gelek fotoyan jî bi nivîsan ra didin. Armanca belavkirina fotoyan çi ye?

**E.Ş:** Jixwe kovar navê wê li ser e, ya folklorê ye. Armanca me em hemû beşên folklorê, wekî xwarinên gelêrî, zargotin, cilûberg, doktorîya (hekîmîya) gelêrî (dermanên kurmançî), cejn û şahî û bawerî yanî çi tiştên ku malê folklorê ne bi rêya nivîs û fotoyan, wan biweşînin. Helbet li bal nivîsê, di xebateka weha ya kovarî da, qiyametê fotoyan jî pir heye; ji ber ku foto bi xwe belge ne û carnan fotoyek ji nivîsê bêhtir dikare tiştan bibêje. Ji xeynî weşandina xebatên berhevkarîyê jî em dixwazin nivîs û gotarên li ser folklorê, yên analîzî jî biweşînin. Em pir guh didin nivîsên analîzan û em tim dixwazin di her hejmara me da ev cure nivîs hebin.

**J.B:** Li gor te kîjan metodên weşanê/çapkirinê ji bo çanda devkî ya kurdî yên herî baş in û çima?

**E.Ş:** Kovar metodeka baş e, lê di dinyaya îro meyla mirovan bêhtir li ser tiştên dîtbarî û guhdarîyê ye, loma jî dibe ku kovar bi tena xwe, yanî bi nivîsê û fotoyan qels bimîne. Bi min vîdeo ji bo weşandina çanda devkî baştir e. Tiştên ji vîdeoyê qest dikim, ew tiştên ku ji bo temaşekirinê ye. Yanî ew dibe ku belgefilm bin, vîdeoyên danasînê yên kinik bin, klîb bin. Hem ji bo famkirinê bêhtir feydeya wan heye hem jî zêde belav dibin, tên temaşekirin, tên meraqkirin.

**J.B:** Tu ji bo weşanê/çapê berheman çawa hildibijêrî? Giringîyê didî çî?

**E.Ş.:** Pêşî ka çiqas ji bo folklorê bikêrhatî ye (cuda ye, balkêş e, resen e) li wê dinêrim, paşê jî li rêkûpêkîya nivîsan dinêrim. Li zimanê wan, xwebaşxweîfadekirina wan û çavkanîya wan dinêrim.

**J.B:** Tu ji bo çî berheman çap dikî? Armanca te ya çapkirin û belavkirinê çî ye?

**E.Ş:** Ya sereke ev e ku ev berhem bigihîje kesan û ew karibin folklorê xwe nas bikin. Ya din jî bi rêya çapkirin û belavkirinê pêşî li windabûnê bigirin. Çapkirin ji hêlekê ve qeydkirin e. Wexta tiştêk tê qeydkirin pêşî li windabûna wê tê girtin, tê parastin.

**J.B:** Têvgerên weşanxane û cureyên weşanên kurdî, li gor salên berê li hember berhemên çanda devkî guherîne?

**E.Ş:** Diguhere, ew wekî her tiştên din bi demê ra diguhere. Qesta te ji berê eger 15-20 sal berê be, guherîn heye. Îro li gor wan deman bêhtir meyil li ser çanda devkî heye. Berê di kovareka wêjeyê da çend nivîsên folklorî dihatin weşandin, îro kovarek xwerû folklor e. Wekî ‘Kovara Folklorê Me’, berîya vê kovarê jî ‘Folklorê Kurdan (2015–2016)’<sup>3</sup> hebû. Wekî din jî bi rêya dokuman (belgefîlm), klîb û vîdeoyan li gor demên berê bêhtir weşanên çanda devkî tînin çêkirin. Dibe ku ji ber nîfşê ciwan be ku berhemên çanda devkî, folklorî êdî bala wan dikişînin.

**J.B:** Tu dixwazî versiyona çapkirî ji bo kê be?

**E.Ş:** Ji bo her kesê/î be, nexasim ji bo kesên ku di vê qadê da lêkolîn û analîzan dikin.

---

<sup>3</sup> n.e.: Kovara Folklorê Kurdan, li Bakurê, di navbera salên 2015–2016an da 7 hejmar derketin. Şaredarîya Mezin a Amedê ew fînanse dikir. Piştî qeyûm, çapa wê sekinî. Li Bakurê, yekemîn kovara folklorê kurdan bû.

**J.B:** Gelo tu ji bo berhemên çapkirî pêşgotin an şiroveyan dinivîsî? Çima û wan çawa diafirinî/dinivîsî?

**E.Ş:** Heta niha tenê min pêşgotinek nivîsîye, ew jî ji bo xebata min a berhevkarîyê bû. Di Kovara Folklorê Me da jî li ser xebatên çapkirî yê folklorî, bi piranî pirtûkên di vê mijarê da çapbûyî, danasîn û nirxandinan dinivîsim. Armanca min a danasînê ev e ku di pêşerojê da bîblografîyeka berhemên folklorî karibim çêkim. Ya nirxandinê jî ev e ku balê bikişînim ser kêmasî, xeletî yan jî başîyên weşandina berhemên folklorî.

**J.B:** Gelo ji bilî çapê/weşanê tu/yan hevalên te bi rêyên cuda yê belavkirina çanda devkî digerin (mesela festîval, şano, pêşkêşên cuda û hwd)? Çi ne ew? Tu dikarî çend nûmene bidî?

**E.Ş:** Na, heta niha me tiştekî weha nekirîye. Jixwe ev çend salên dawîyê li vî welatî kêr derfetên weha hene. Hema bibêje çalakîyên çand û hunerî pir kêr bûne.

**J.B:** Pêwîstîyên herî giring ji bo berhevkirina çanda devkî û avakirina arşîva çanda devkî çî ne? Problemên herî mezin çî ne?

**E.Ş:** Bi min problema herî mezin tunebûna budçeyekê ye ji bo van karan. Tu carî budçeyeka baş ji bo van xebatan nehatîye veqetandin. Ev kêmanî rê li ber profesyonelbûna xebatan jî digire. Kesên ku di van xebatan da dixwazin bixebitin û jê fam dikin gelek in, lê ji ber van sedemên madî kes bixwaze jî nikare bike. Weqfa Mezopotamyayê di vê mijarê da li ber xwe dide û zorê dide îmkanên xwe, lê ev jî îro pir hindik e ji bo van karan. Bi problema budçeyê ve jî eleqedar, di van xebatan da sazînebûyîn e problema mezin.

**J.B:** Fikrên te yê li ser çareserîya van probleman çî ne? Pêşnîyazên te hene?

**E.Ş:** Di serî da divê sazîya vî karî hebe. Bi her hêlên xwe ve, madî û manewî tu kêmasîyên wê tune bin. Yanî sazîyeka tam bicihbûyî hebe.

**J.B:** Li gor Kovara Folklorê Me problemên sereke çi ne?

**E.Ş:** Li gor kovara me jî sazîbûn e. Eger îro sazîyeka tenê ji bo van xebatan kar dike û serbixwe hebe, dê pêşîya problemên ku îro hene bigire.

**J.B:** Cih û rola jinan ji bo parastin û komkirina folklorê kurdî çawa dinirxîn?

**E.Ş:** Jinên kurd, nexasim ên ku mekteb nexwendine, bi awayekî xwezayî di parastin û komkirina folklorê kurdî da xwedî rol in. Tiştên ku ew pê mezin bûne, çand û kevneşopîyên ku ji pêşîyên xwe girtine, neqlî zarokên xwe kirine, bêtî ku zêde deforme bibin. Jinên ciwan jî yê ku vî tiştî dibînin, qîmet didin van nirxan û di hewla parastin û komkirinê da ne.

**J.B:** Di berhemên folklorî da kîjan motîfên jinê yan jî lehengên jin zêde bala te dikişînin yan îlhamê didin te û li ser karê te bi tesîr in? Tu dikarî nimûneyan bidî û taybetmendîyên wan îzah bikî?

**E.Ş:** Di berhemên folklorî da, bi piranî di zargotinê da, motîfa jinê û lehengên jin heyîyên pir lawaz in. Ji ber wê jî tesîreka neyînî li ser min dikan. Ev tesîr dike ku pirsan di serê min da zêde bike, ji vê hêlê ve baş e, lê xwezî jin ne lawaz û belengaz bûna. Hin leheng hene di serê çîrokan da pir bala min dikişînin, jêhatî ne, berxwedêr in, xwedî rêgez in, lê di dawîya çîrokê da tu dibîni ku mêrek hat, wî ew bir û çûn. Yan jî ew tim li benda hinekan in ku werin wan bibin. Piranî yê ku tahde li wan tê, neheqî li wan dibe jin in. Helbet dawîya çîrokan heqî bi heqîyê dikeve, lê jinê bi zewaca mêrê ku ew dixwaze ‘tacîdar’ dikan, mêrê ku bûye sedema tehdehîya lê hatîye. Ya ku herî pir jî tesîreka nebaş li min dike ev e ku mêrek diçe jinê ji bavê wê dixwaze û wê tîne mala xwe (di jîyana me ya civakî da hîna ev tişt heye.) Yanî jin herçiqas leheng be jî wekî alavekê ye, nikare biryarên xwe bide, jixwe kêman caran ew dildekeve mêrekî, tim mêr dildikevin wan.

**J.B:** Bandoran kîjan dengbêjên jin yan jinên kurd ku girêdayî çand û zimanê xwe ne û ew parastine, li ser te heye? Eger hebe tu dikarî bibêjî çawa bandor li te kirine? Nimûneyan bide û taybetîyên wan îzah bike?

**E.Ş:** Stranbêj Şehîd Mizgîn, jineka hem şoreşger û hem jî hunermend e, ji vê hêla xwe ve bandora wê li ser min heye. Di nava şerr da hunera xwe afirandîye û nirxên neteweya xwe bi awayekî estetîkî parastîye. Zulêyxa Xan, di derbarê jîyan û hunera wê da zêde agahî tune ne. Qeydên wê yên di temênê wê yî ciwanîyê da min nedîtine, min ew bi halê wê yî navsere nas kir. Jineka navsere ye ku li darbûkeyê dixê, bi coş e û pê ra dibêje, kême li nav me heye. Bê hemdê xwe mirov dikeve binê bandora wê û ji wê hez dike. Meyrem Xan jî yek ji wan jinan e ku xwedî bandoreka baş e. Hilbijartina wê ya di navbera hevjin û stranbêjîyê da ku dev ji hevjinê xwe berdide û stranbêjîyê hildibijêre balkêş û bi bandor e. Merzîye Rezaî, Rojan, Mizgîn Tahir, Xana Zazê her yek ji wan jinên hêja ne û xwedî bandorên erênî ne.

**J.B:** Gelo motîf/leheng/dengbêj/aktivîstên kurd ên jinan hene ku tu ji wan hez nakî û çalakiyên wan giring nabînî yan jî çalakiyên wan ji bo rewş/mafên jinan xetere dibînî?

**E.Ş:** Çawa ku yên ji wan hez dikim hene, yên ku ji wan hez nakim jî hene. Lê ev piranî yên li qadên herêmî dixebitin û zêde ne populer in. Di qada sîyasetê da gelek jin hene, ne ku xebatên wan bi xetere dibînim, lê pir qels dibînim û carna ev qelsî dibin xetere jî. Bawer nakim jinên kurd bi zanebûn bixwazin tiştên xetere bikin ji bo jinan, lê ji ber tenegehiştineka baş, mihtemel e ku piranîya wan xisarên mezin dabîna doza jinan. Li ser meseleyê, gelek jinên sîyasetmedar hene û qet nasekinin, tim di çalakî û xebatan da ne, lê tevgerên wan ne estetîk in û wekî zilaman (mêrên ku ji desthilatîyê hez dikin) tevdigerin. Ev tevger xisarê dide doza jinê û wê bi paş da dide, nahêle bi pêş bikeve. Jinên ku bi karên hunerî dadikevin jî gelek ji wan karên wan ne serkeftî ne; nexasim di jinên şanoger, stranbêj û sînemager da ev bêhtir xuyaye. Deng û qirikên wan ne li gor zimanê ku ew karên xwe bi wî dikin, yanî qirika wan ne ya kurdî ye, qirika wan sewta wan bişaftî ye. Ev xala han raçavkirina hevlekî bû di vê mijarê da, û ez jî bi vê tesbîtê ra me û hewce dibînim ku li vira bibêjim. Carna hin jinên bi hunerê dadikevin di wexta pêşkeşkirina karên xwe da mirov zû bi zû fam nake bi kîjan zimanî dibêjin. Rengê dengê wan û qirika wan bi mirovî xerîb tê. Ev bandoreka neyînî li wê hunerê û li wî zimanî jî dike. Mesela ez ji sewta Aynûr Doxanê hez nakim. Ji ber ku pir kes lê guhdarî dikin û wê

diecibînin ez ji xwe diketim gûmanan. Û min ji xwe dipirsî çima bi min weha tê? Rabû min li gelek stranên wê guhdarî kir, fikra min neguherî. Di wê çaxê da min dît waye bi tirkî jî distrê, min heta wê gavê nizanibû ku ew bi tirkî jî distrê. Rabû min li stranên wê yên ku bi tirkî jî gotine guhdarî kir û min ferq kir ku yên tirkî xweş dibêje. Sewta wê û qirika wê ne ya kurdî ye, bêhtir bi ser tirkî ve ye. Helbet bi min ev ne tiştekî xweş e, ev rewş ji bo stranbêjên nûhatî dibe modeleka nebaş.

**J.B:** Li ser rewşa jinan nirxên çanda devkî çawa dibîni? Gelo li ser van nirxan tu pewîstî bi rexnekirinê yan jî guhartinê heye? Îzah bike û nimûneyan bide?

**E.Ş:** Ez rast nabînim. Ji ber ku jina ku em wê di çanda devkî da dibînin û rewşa wan qet ne rewşeka xweş e. Ev rewş ji bandora zêde ya pergala pederşahîyê çêdibe. Em pir eşkere dibînin ku jin hew bi pesnê xweşikîya xwe û lawazbûnê tên qalkirin. Bi min hewce pir pê heye ku hin guhertin çêbibin. Çîrok baş werin analîzkirin û bi zimanekî nû ji serî da werin gotin. Nimûneyên wê pir zêde ne, hema di temamî çîrokan da ev rewş heye. Jin, keça bavê xwe ye; xwazgînîyên wê tên, bav bixwaze wê dide, nexwaze nade. Jixwe ev gotinên ‘xwazgînî’ û ‘dayîn’ ê bi xwe jî gotinên pir xetere ne, lê heta tu bibêjî bes ev di çanda devkî da heye.

**J.B:** Gelo Folklor Me giringîyê dide folklor bi destê jinan hatîye avakirin û komkirin?

**E.Ş:** Kesên ku bi folklor kurdan dadikevin nabe ku jinan paştguh bikin. Çanda kurdan, kevneşopîyên kurdan, berhemên folklor kurdan bi jinên kurd jiyîne û dijîn. Di parastina vê çandê da rola jinan zêde ye û Kovara Folklor Me jî bi vî tiştî zane. Nabe ku giringîyê nediyê. Herçiqas em cudahîyê nexin navbera xebatkarên vê qadê yên jin û mêran jî, lê em pêşîyê didin xebatên jinan û berhemên jinan ên folklorî.



# Hevpeyvînek digel Hecî Ce'fer da

Hecî Ce'fer Haris was born in 1951 in the village of Xurkê. After completing his primary education, he continued his studies in Mosul. He then studied Kurdish language and literature at Baghdad University. Hecî Ce'fer worked in primary schools, secondary schools, and colleges in Duhok until his retirement in 2014. His publications on Kurdish language and literature, literary criticism, Kurdish folklore, and translations have appeared in Kurdish periodicals. Many folklore collectors in Bahdînan refer to him as their teacher and the 'inspiration' for their work. He has published over 35 books, and more than twenty of them are on folklore. He has fifteen books of translation from German or Arabic into Kurdish. He has been a member of the Kurdish Writers' Union, Duhok branch, since 1982. He lived in Germany from 1996 to 2005.

Hecî Ce'fer Haris, ji daykbûyê sala (1951)ê li gundê Xurkê li nav Mizîrî Jêrîya hatîye ser vê xemgehê, xwandina sertayî her li gondê Xurkê destpêkirîye, paşî xwandina seretayî û navincî li mwîsilê bi dwîmahî înayne. Kulîja Edebyata li Zankoya Bexda li pişka Kurdî bi nimre baş bi dwîmahî înaye. Li çendîn qotabxaneyên seretayî û navnicî û amadeyî û Peymangeha Mamostayan û Peymangeha Werzişî li Dihokê wek mamosta wane gotîne. Li sala (1982)yê bûye endamê Êketya Nivîserêt Kurd/tayê Dihokê. Nihojî endamê Êketya Nivîserêt Cîhanîye, Pena Kurd. Dinavbera salên (1996 – 2005)ê li Elmanya jiyaye. Gotarêt edebî, zimanî, rexneyî, fulkilorî û wergêrayî li pîrrîya kovar û rojnamêt Kurdî belavkirîne. Li sala (2014)ê xanensîn bûye. Heta niho pîtir ji (35) pertûkên çapkirî hene, ji wana nêzikî (20) pertûkan yê Fulkilorê Kurdî ne û digel hindek vekolînan di bwarê edeb û Folklorê Kurdî da. Û pîtir ji (15) pertûkên wergêrayî ji zimanê Elmanî û 'Erebî jî hene.

**Ferengîs Qadirî:** Gelek sopas mamosta ku te roxset day em bên te li mal bibînim?

**Mamosta Hecî Ce'fer:** Bixêrhatin serçava.

**FQ:** Hindekê li ser jiyana xo behis bike û mezinbûn û xwandina xo?

**HC:** Kurtîyek ji jiyana min ezê li gunda buyîm, gundekî dibêjnê (xorkî) li devera Qeza Şêxan, min li wêrê seretayî xwand û paş em çuyne bajîrê mîsilê, min li wêrê seretayî bidîmahîk îna, navînçî li qutabxana (sanewîyet Elquş) min ya bi dîmahîk înay, ku nahyeka Mesîhîyane, li navbera salên (1970 – 1971) ezê çuyne Zankoya Bexda li pişka Kurdî, ezê mayme li wêrê bo mawê (5) sala, salekê ezê çuyim nav rîzên şoreşê da, digel (Enwer Mizîrî), û li sala (1975) min kulîje xilaskir, beşê zimanê Kurdî. li sala (1970 – 1975).

Piştî hîngê hatime damezrandin li qutabxaneyên seretayî, navnçî, amadeyî, peymangeh, Amadeya Pîşesazî li bajîrê Dihokê, Amadeya Çandinê li Sêmêlê, Amadeya Çandinê li Zaxo û Derkarê, û li gelek ciha em geryayn, li sala (2014)ê em xanenişin buyîn, wextê ez li Amadeya Pîşesazî li Dihokê, nuke jî to ya me dibînî.

Derbarey edebyata, edebyata Kurdî li sala (1977)ê êkemîn car min nivêsi, min di rojnameya (Hawkarî)da, li sala (1977)ê êkemîn gutar min ya nivêsi, êkemîn pertûka fulkilorî jî wek (gotinên mezinan li devera Behdînan) li sala (1984)ê ya çap buyî, dîmahîk pertûk jî komeka serhatîya (2021 yan 2022)ê bi dirustahî bîra min naêt.

**FQ:** Seyda her ji pertûkên te, ji bilî eva gotinên mezinan li Behdînan, eva sala (1984)ê te kumeka dî jî ya hey, anko tiştên kumkirîn, heku tu mamosta li Amadeya Pîşesazî, heke te hindek behsê wê kirba?

**HC:** Wextê ez gehîştîme Amadeya pîşesazî li Dihokê, (eve ye di vêrê da), qutabyên min mezin bûn, baliq bûn, hindek bi jin bûn, û di aqil jî bûn, wî wextî Kurdîni û hestê Kurdîniyê hebû, vêça hema te çî gotbayê bi Kurdî û ders bi Kurdî gotba, ya ji wanve nîştîmanperwerî bû, ji ber zulma hikometa êraqê û te' dadya dihatekirin, wel xelkekê dikir, hema peyveka Kurdî baxivî, bo te hisab dikir nîştîmanperwerî, li vêrê min li ser fulkilorê xelkê dixwand, bi taybet jî yê Misrî, me (Diktura Nebîle Îbrahîm) hebû, ya zîrek bû palpştîya me dikir, û (Ehmed Zekî) hebû yê Misrî bû, li ser fulkilorî dinivêsin, niza (çî? Şewket) hebû, evî jî can dinvêsi, eve min li ser wan dixwand ka wan çawa fulkilorê xo kumkrîye, wan kumdikir bi rêka qutabîya li Misrê, bo min jî hizir hat, ejî dê rabim dê evê bizavê kem ka dê serkevîm yan ne,

ew qutabîyên ez bo diçûm pola şeşê û pêncê û çarê hemî zelum bûn, xelkê Akrê, Amêdiyê û Zaxo bûn, manê pişka navxoyî li amadheya pîşesazî hebûn, min rêkek nîşa da, da bêjmê dê husa fulkilorî kumken, bi evî rengî heko diçine gunda li demê bihênvedanê bo raporta serê salê, em dê nimra li ser raportê deyn, vêça her çiyê raporta wî baştir bît, dê pitir nimra bet, bo nimûne (200 – 300) raport bo min di man, ez da çim wan hemîya vavêrim û berê xo demê baştirîn raport, baştirîn stiran û çîrok, baştirîn gotinên mezina ka çawa bûn, min di helbjartin, her çiya aqilê min jê dibrî, ku f'len eve fulkilorê, min digote wan ka we ji devê kê wergirtîye, navê wê jî binvêsin, vêgavê pertûkên min wisane, ev stirane ji zardevê filan kesî hatîye wergirtin, vêça bi evê rêkê em şiyayn êkemîn pertûk çap bikeyn, ew jî (gotinên mezinan li devera behdînan)bû, eve dû hizar û tişteke gotinên mezinane, eve hemî li dev min divêrê da, hindekên li ser banî, me dest pêkir, piştî hîngê me kitêbeka dî çap kireve (Stiran û Govendêt Kurdan), bes yê govendên Kurdan ûbn, husa berdewam bûyîn, ku berhemekê başê fulkilorî li wêrê bi rêya qotabîyan me kumkir, paşî ji wêrê hatim, vêça ez bi xo di geryam dev hevala, dev pîremêra, dev jinka û dev her kesekê tişteke bo min gotba fulkilor baye min dinvêsi li dev xo, heta vêkavê (12) pertûkên fulkilorî ji çîrok û serhatî û çîvanok û gotinên mezina stiranên şera û stiranên payzoka û stiranên evîndarî heyranok, anku bûne (12) pertûkên fulkilorî heta vêgavê em şiyayn çap bi keyn, eve rolê min yê fulkilorîye ku ez şiyaym evan tiştê kum bikem.

**FQ:** Seydayê Hecî te kom jî dikirin, hindek cara vekolîn jî li ser dikir?

**HC:** Belê min gelek vekolîn li ser kirin, ewên min vekolîn li ser kirîn, di govara (Roşinbîrî Nwê), govara (Karwan) û di govara (Beyan)da min belavkirîne wek vekolîn, eve hemî min komkirine ve, û wek pertûkek ew jî (Ekadîmya Zimanê Kurdî li Hewlêr)ê bo min çapkir, ew tiştên min belavekrîn û bi vekolînên fulkilorî ve hemî di wê perûkê da me kumkirîne ve çapkirîye, çêdbît ekadîmî nebin, ji berku kumkirina mejî ekadîmî nebû, ji berko wextê me kumdikir me berelayî kumdikir, me nexwand bû li peymangehê ku dê çewa fulkilorî kumkeyn, mane, tiştê wesa dê çewa li devereke kopî ken, nimûne ev sale dê çim fulkilorî ji gundekî wergirim, piştî deh- yan bîst salên dî biçîye wî gundî ve, berê xwe bi demê çî ghorîn bi ser wan têkistada hatîye yê min wergirtîn, ev tişte menebûn, hema da stiranek te gulê

bîtin, çîrokek da te golê bîtin, her tişteke fulkilorî te golê bîtin, tu binivêse li dev xo û navê wî kesî jî binivêse û bîne dê nimra bote danim, yan li dîmahîyê ew xo bi xo pê ra dibûn.

**FQ:** Seydayê Hecî tu bûye wek îlhamekê bo hindekên li dwîv tejî da hatin, anko destek dî jî pişt wera teqrîben hat, karker bûn bi te webken?

**HC:** Ew qutabên min gotiyê fulkilorî bînin, harî min biken hindek ji wan qutabîya bi xo bûne fulkilorvan (Cemîl Şêlazi) nuke ji min zîrktire qotabîyê min bû, nuke ezê hêlaym, (Ebdulrehman Bamernî û Mehdî Bamernî û Edîb ‘Ebdullh Nihêlî, Kîvî ‘Arf) eve hemî qotabîyên min bûn, min zewq bo çêkir û ew jî wekî me lêhatin, hindeka em hêlayn ji mezîrektirin, û hindekên dî jî bîra min nahêtin, em şiyayîn hez û hejêkirina fulkilorî bikeyne dilê hindekên dî jî da.

**FQ:** Me digot ew tiştên xwendekarên te berhev dikirin, te lê dinêrî û baştirîn te di helbjard, gava tu dibêjî baştirîn? çawa baştirîn pênase di key?

**HC:** Eha eve xoş pirsyare, sebarete me, ez mamostayê ziman û edebê Kurd bûm, ez bi xwejî ji gunda bîm heta jîyê min bûye (14) salî ez li gonda bûm, biçîkatî em diçûn dîwana û me guhê xo dida mezina, dema çîrok digotin, mala mejî bab û deyka min nedizanî bixwînî û binvêst, hema bes wan jî fulkilor bû, hemî malên Kurda hindeka fulkilor dizanî, çîrok dizanîn, serhatî û hemî tişt, min begrewendek hebû, min dizanî ev deq û têkista fulkilorîye yan fulkilorî nîne, yan şkestîye yan ya kême yan ya zêdeye.

**FQ:** Tiştê ko to handay çî bû?

**HC:** Handerê êkê min gote te, min nivêsinên nivîserên Misrî xwandin, ewan wesa diyarkir ku serê nivêsinê ji fulkilorî dest pê diket, anko nvêsinê baş fulkilorî dest pê diket, fulkilor hunereke ji hunerên nvêsinê, eve êk. ya duyê wî wextî (terhîl û t’rîb), anko Kurd ji cihê wan radkirin û dibirne Başorî yan jî da belavekin, ye’ nî halê Kurdan yê nexoş bû belavedibûn, li vêrê jî min got ev fulkilorê dê berzebîtin, bo min pêzanîn peydabûn ji nivêsinên Misrîya, ku fulkilor berzedbîtin, êkê gelek

şarezaye di fulkilorî da gelek çîroka, serhatîya û stiirana dizanît, bes dê mirîtn, wextê dimrîtn û tejê newergirtbîtin, ew berzebû, û bi hezarata yê berzebûyîn, li vêrê jî heybetekê nîştîmanî bo min çêbû, ku ez evî fulkilorî kum bikem, çunkî kelepûrê milletekî ye, hindî bişem û li dîv şyanên xo digel hevalên xo û digel qotabyên xo, min wisa hizir dikir ku Kurd bi dîmahî hatin, wesa kawdanên me di nexoş bûn, hindî hind bi serê me îna, peyva (kurdistan) qedexe bû, li vêrê rêveberê me navê wî ( Cibraîl Hesên) refîq bû, û Kurd bû.

**FQ:** Anko (be'sî) bû?

**HC:** Belê digel hindê hej kurda dikir, dihinavên xoda Kurd bû, bila be'sî bît, harî min dikir, wî nedgote min seyda qedexeye evan tiştta bikey, heta carekê (Mihemed 'Elî) hate bîra min (Mihemed 'Elî Etrîşî) sikirtêrê parêzgarî, qotabîyê min bû, kesek hebû navê wî (Zuhêr) bû hunermend bû, ewjî qutabîyê min bû, carekê (belavokek) çêkirin, bi latînî ew belavoke çêkir bû, û newroz û dû mar û niza çî? û zohak û ev tiştên hosa, wî demî (Dilşad Merîwanî) hatbû xendqandin sera pîtên latînî, ku nîşa qutabyan didan, hkumeta be's ew girtin û xendiqandin leşê wî nedyare heta vêgavê, xo di wî wextî da, ev belavoke çêkirin, û rêveberî pesendikirbû, ji berku divyaba wî înzakrba, ji nwî me belavoka xo bi dîwarî ve di helawîst, wî wextî me neradikir, dê bo me bîte arîşe, dê şik bo wan çêbîtin, dê bêjin boçî rakir? hema me wekî xo hêla, şansê mejî borî û çî bi serê me nehat, ev rêveberê me camêrî, xudê jê razî bît, gelek harîkarê mebû, jorek dabû min bes bo raporta biçime têve karê xo yê fulkilorî têda bikem, hindê gerim û piştevan bû bo harîkarîyê, eve ew xal bûn, ku ez paldaym, ez fulkilorî kum bikem.

**FQ:** Wî demî hikomet dibû rêgir ku hwîn li ser fulkilorî kar diken?

**HC:** Rêgirî wesa nebû, bo fulkilorî, hindî bû çîroka honerî û bû şîra hunerî hey, bû van sansoreka dijwar li ser bû.

**FQ:** Sansor gelek hebû li ser şîrê û tiştên dahênan, bes bo fulkilorî pîçek mecal hebû.

**HC:** Hema da bêjî fulkilore mecalê wê pitir hebû, gelek tiştê li dev min hey (meminu’i elteb’i) xitma lê day, anko her pertûkeka derketiba, divêt te pêşkêşî çavdêrîyê kirbaya li Bexda, bitinê li Bexda (Daîret Reqabet Elmetbu’at) hebû, ew da xitma xo lê den pesend ken, yan da xitma xo lê den pesend nedkirin, bes hindêk cara hindêk têkistên stiranana yan hindêk têkistên çîroka, da nvêsin (meminu’i eltb’i) pertûka min (Kevne Bawerêt Kurda) anko (m’teqdat Eiurdîye Elqedîme), anko berê xwe dê heyvê, Kurd bêjin boçî heyve xeyrî û têt guhartin, yan boçî nîve, yan wextê bîkê vedguhêzin naçêbît wextê pirça wê şedken pirça wê bikevîte wara pirça wê veşêrin, yan wextê mare diken, divêt hemî destên xo hulê bikene henê, neku sihrekê lê biken, ye’nî kevnebawerin, ew bi xo li dev Kurda rastî bo van nîne û kevne bawerin, bes li dev hikumeta ‘Îraqê wek rastîyekê bûn, lewma pertûka min ji layê sansorê ve ne hat qebîlkin ji bo çapkirinê.

Ehmedek hebû nuke ew jî mamostaye, xelkê Zêweya Şêx Pîramîse, ewî çîrokên ecina bo min di înan, li dev wî her çîrokeka ecina seda sed rastîne, û ev bîrûbawere di van çîroka da sansorê qebîl nedkirin, heta (Diktor Bedirxan Sindî) sala (1992 û 1993)ê, bo rêveberê belavkirin û çapkirina Kurdî li Bexda (Dar Elneşir welteb’i Elkrdîye Bexdad) wî çap kir, piştî ku min kaxezek bo nivêsi min gotê: “pertûkek husa ya li dev we ya refiz kirî, eger tu bişêyî çap bikey”, vêça wî çawa çapkir wî çabkir, ew jî vêgavê ya li vêrê.

**FQ:** Seyda te li destpêkê husa diyarkir ku new’e Kurdînyekê û miqawimekê bû? wextê tu peyva Kurdî kom bikey anko te ji wî minteliqî, ew jî êk ji egera bû?

**HC:** Min got, ew jî egerekê serekî bû, xelkî berê xwe da me, evên dinivêsin, xelkekê bi çavekê pîroz berê xwe dida me, anko mezin dîtin, em didîtin, newekî vêgavê bû, nivêser dikê bûn, gelek li deverê hema te çî nivêsiya tu diçavên xelkê da yê mezin buyî, vêça ewjî handerek bû, wextê xelkê harîkarîya tedikir û rêz li te digrt, hemî rexa her cihekê tu çûbayê te hest dikir tu newek van mirovay, yê bi çavek dî yê berê xwe didene te, ewjî handerek bo yê xelkê hemîyê.

**FQ:** Pştevanîyeka madî hebû bo karên te?

**HC:** belê eger piştevanîya madî neba, em nedişyayn, tişekî çap bikeyn.

**FQ:** her hikumeta, Êraqê bi xo bo wî demî?

**HC:** belê piştevanî hebû, nuke pertûkên min hemî li ser nivêstîye, eger li Bexda hatbît çapkirin (Dar Elneşir Elkrîye) ya li ser nivêstî ewan li ser hsaba xo çap dikir û made jî dida mirovî li dîv melzema bû, me digotinê (melzeme), niza her melzmek heft dînara bû bi çendê?

**FQ:** eve heta berî (1991)ê bû, piştî hîngê?

**HC:** belê hindî me tiştê çapkirbaya çî jî Emîndaretîya Giştîya Roşnîbîrî û Lawan Hewlêr bû, ewan bo me çap dikir li ser hisaba xo, piştî çap dikir, pare jî didan me. Vêgavê eger bo me çap jî biken, sed hîvîya jî jê bike, û çî parey jî nadeneme, her tiştê çap dikey bo wane, ez (wergêran)ê jî dikem, diktur dizanît (mebest pê diktur Yasir Hesene, ku digel diktore Ferengîs li dîwana Hecî Ce'ferî ye), wergêranê ji Elmanî dikem neh deh pertûk min wergêrane, pertûka (Bax Kwêsta Kîvî ra) (newazihe deqa 23:30) ji Elmanî min yê kirîn Kurdî, vêça ev pertûkên he nêzîkî (5) hizar laperane, li vêrê harîkarî ji layê maddî ve nîne, wextê hikometa û Sedamî harîkarî pitir hebû ji nuke, çunke wan yasaya çapkirinê hebû, lewra cudahiya yê Kurd û, Ereb û Turkîman nebû li dîv yasayê di çû, fulkilor bi hindêye, şî'r bi hindêye, çîroka fulkilorî bi hindêye, şano bi hindêye...htd, ewan rêveberîyeka taybet hebû palpiştîya hemîya dikir, li Kurdistanê me dû rêveberî hebûn, Emaneta Roşnîbîrî û Lawan li Hewlêrê wî wextî çap dikirin, û Rêveberîya Belavekirin û çapkirina Kurdî li Bexda, me li evan herdû cihan çap dikir, heta (Me'sum Mayî), êkem pertûk li salên heftîya çapkir, bi navê (,Îsê Dela), wezaretek hebû di gotinê (Wezaret Şiown Elşîmal), Wezaretê Karûbarê Bakorî, ewê wezaretê bo çapkir, yê niyas bû hêştî (Samî ,Ebdulrehman) wezîr bû, her cihekê bo te çapkirba ya dirust bû, bes wan pare nedida, (diktur Selah Se'dulla) hebû, ewê pertûka (Ewê Dîblumasî) pertûkek ji Îngilîzî wergêra Kurdî, (Mihemed Emîn) rêveberê roşnîbîrî û lawan bû, gotî: dikturî îna dev min eha hinde defterk înan li ser defterka bû, got: hal û mesele eveye li ser Kurdaye, ser Kurda jî ya têde, da bo min çap bi ken. Min gotê: bila dê bo te çap keyn, bes em çî para nadeyne te, çunkî eve geleka mezine. Gote min: bila. paşî piştî me pertûk çapkirî û xilas buyîn, me caba wî hinart û hat. Me gotê dê behra te deyne te, dû seda yan sê seda, li wî demî gelek çap di kirin, dû

hizar, sê hizar çap dikirin, behra mirovî dû sed sê sed dane didan mirovî. Min gotê: qewlê me ewe, me wisa îtfaqa kirî, ku çî para nedeyn te. Gotî: erê hema diriste. Min gotê: dê wêjî bo te serif keyn. Bo serfkir. wêgavê çine çine bo hizar dînarên wî wextî yêt bo serif kirîn.

**FQ:** Hizar dînarê hîngê, her dînarek beramber sê dulara bû. Anko nêzîkî sê hizar dulara bo yê serifikirî, ê gelek başe.

**HC:** Gendelî ya kê m bû, xelik ne diwêra gendelîyê biket, ye'nî wê gavê pitir piştewanî û palpiştî hebû ji vêgavê, bes vêgavê, çapxane û nivêser pitirên lê hatîn, û dezgayên belavkirinê pitirên lê hatîn û dezga pitirên lê hatîn.

**FQ:** Seydayê Hecî, eger vêgavê ew tiştê berê te kumkirî, ye'nî bo te çî cara şik li ser çênabît, weko hindêk tişt belku nedirust bin an ne jivê nahyê ve?

**HC:** Belê diktore çî pê nevêt, tu evro pertûkekê çap bikey, subehî bixwînî, dê bêjî xozî ev rêzke min rakirba, eve min îna, eve li vêrê dirustire, eve li vêrê xeleta hatî, ye'nî çî pê nevêt eve tiştêkê ,adî ye, erê çêdbît diktore, erê wellh eger li dîv şiyânê vêgavê bin, ez evan çap bikem, dê destkarîyê têda kem, bo nimûne gotneka mezina hey di bêjî: „hevrkê mîra mêrin, hevrikê maqwîla kirmancê têrin”, min çî nivêsi bû, bixudê niza ji bîra min çû!!! mihim min xeletîyeka divêrê da kirî, vêgavê ewa min gotî ya diruste, bes xelet'ya wê ez nizanim? eger bînim der dê zanim, eger dûbare pertûkê çap bikeme ve, dê wê xeletîyê rastvekem.

**FQ:** Çî beşekê fulkorî bala te kişand yan serinc rakêştire bo te?

**HC:** Bi Xodê tu dizanî, stiranê şeveroka û stiranê daweta û şera û heyranok, ev kevne bawere hemî me kumkirin, û hindêkên dî, li nik mirovî hemî dixişin ,ezîzin, bes pitir li dev min zewqê min diçû heyranoka, min dû bergên heyranoka yê heyn, stiranê kurtin û di xoşin û di sivikin, û stiranê evînîyê ne, wextê tu dixwînî pîçekê sîngê mirovî pê vedbît çünke di xoşin.

**FQ:** Mamosta wek erşîy, erşîvê te zêdetir li male?



**HC:** Erşîv min dane Enistîtûya Keleporê Kurdî bara pitirê, bes pertûkên min wek pertûk, ew (12) pertûk li malin, paş tu di şêyî bibînî, bes min gotî erşîv li Enistîtûyê dê pitir parêzîtin, min tiştê xo da wan.

**FQ:** Ew erşîvê te daye Enistîtûyê çîye? destnêse yan denge (kasête)?

**HC:** Destnêse jî ew gotarên min di wextê xoda di govar û rojnameyên Kurdî da belavkirîn.

**FQ:** Wek kasête û sîdî tiştê wisa hene?

**HC:** Kasête nexêr nînin, min nedayne kesê.

**FQ:** Kasête li cem te mayne?

**HC:** Welle kasête jî teqrîben min kêmen mayn, kasête jî min nemayne, çunkî em çuyîn û revîn û hatîn, wextê (1996)ê ez çuyîme Elmanya de'weyek bo min hat, ku ez smînarekê li Zankoya Birlînê pêşxêş bi kem li ser jina Kurd, (1996)ê bû, ez çûme wêdirê min li wêre de'wa licuyê kir, min licu wergirt, ez hatim mal „min zarok û ,eyalê xo hemî birin, mekteba xo min firote (Bingehê Laliş), vêça heta rojname û govar jî madê çî lê kem, çî ,erd nebûn bi hêlim, hema min frotine wan, em çuyîn me destên xo hejandin, li wêre jî em di şiyayn hindêk pertûka bo xo kUm keyn, bes her mane li wêre, wextê ez hatim vêre, ew jî mane li wêrî, vêça ev tiştê hey, tinê pertûkxana min eve ya li serbanî ewin yên ku piştî (2005)ê hêrve min kumkirîn, wextê ez hatim (2006)ê ji nwî ka min serî destpêkir ve, kitêbek ji vêre û vêra he, ye'nî ew kitêbên berê min kirîn ji heza xo, daçîne Silêmanîyê û da çîne Qeladizê û daçîne Bexda, bes kitêba kirîn, ew kitêb neman, min gote te hemî min frotin, ewên vêgavê hemî ne ewin ku min bîrhatin digel heyn, kitêbê mirovî bîrhatin ya digel hey, kitêbek min ya li Bexda kirî, heker maba vêgavê, salên heftê sebra te bi wê kitêbê dihêt, eve hemî yên (1195)ê û hêrvene.

**FQ:** Astengên kumkirin û berhevkirina fulkilorî yên te yên taybetî yên şexsî çî bûn? Di ezmûna teda?

**HC:** Çi pê nevêt, dê asteng hebin.

**FQ:** Wekî çî seyda?

**HC:** Ew astengên min dîtîn, di kumkirinê da, dê wextê te gelek pêve çîtin, tu pêtivî gelek demî bo wî karî, ye'nî wextekî min qotabxane hêla, ji layê diravî ve em sifir bûyîn, heta min xwandin hêla, min hemî tişt hêla, eve asteng bûn, li salên (92 û 93) ê em çûyne gunda em buyne cutyar, ezê bi 'eyal bûm, <eyalê minê hwîr bû, mûçe nebû û têra me nedikir, min hêlan em çûne gunda, wî wextî hema ez bi jîyanê ve mam, û zehmeta jîyanê, hema dû û sê sala ez ji fulkilorî dwîrbûm, kumkirinê û nivêsinê û filan û bêvan, ye'nî astengên jîyanê gelek hebûn, astengên jîyanê hindêk cara hebûn, negelek cara hebûn, da bêjn: boçî bitinê tu fulkilorî kum dikey? nisbet hikometê, boçî tiştên dî nakî, boçî tu fulkilorî kum dikey?! astengên dî hebûn carekê rêkanî da min qûtin, sera çî? stiranek min got li ser telefzyuna Kerkwîkê, stiranek got, navê şexsekî têda bû axayê Rêkanîya, min nezanî axaye.

Kurik dibêjîte kiçkê:

Tu bîye helawa elbikê da te tam nakem

Tu bîye gol te bêhinakem

Tu bîye kiça Tetokê Rêkanî te marnakem.

Ev Tetokê Rêkanî, eve min nezanî axaye û axayê wane, evê çîroka xo ya hey, (ez û Mizîrî û Kerîm Findî) çûyne dev axayê wan babo em yê xelet bûyn, me ,efu biken, me nezanî.

Carekê jî digel Duskîya, meseleka hey: (Pîromerî... diken, Germavî xo di êxne avê) vêça Germavî axane, gundê axaye, eve te'ne bo wan, wê he yê wê şolê diken, eve yê xo dêxin avê, eve te'n bû bo wa, dîsa eve jî dibin xo çûn, bes pertûk çap ne bi bû, bes vêgavê hema peyvên Germava yê têda wek ferhenguk Pîromera ya têda, bes metele me jê bir, em şiyaîn jê beyn, û heyanok jî ewê min gotîye te, ew jî wextê min pertûk çapkirî min rakir, husa gelek tiştên heyn, arîşên çivakî bo mirovî jê çê dibin.

**FQ:** Mamosta te cêwazî dinavbera deqê resen û deqê guhartî te didît? ew mesele li dev te çewabû?

**HC:** Bixudê deqê resen û guhartî hema li dev me êk bû, çunkî deqê resen me nedîtbû, kayê çewaye, hema serê wê bo medhat, serê wê wekî madeye, vêgavê tu dizanî wekî evroke nebû, vêgavê tu dişeyî, pertûkên çapbuyîn, heke têkistek bo tebêt, tu dê hevberkey digel filan pertûkê, yan bêvan pertûkê, dê şeyî, resenî û neresenî îni der, ya rast û dirust înye derê ya şaş dê înye derê, wê gavê ev ewdîye me nebû, herçiyê dihat madê xam bû, li dwîv şarezaya te tu da deqekê helbjêrî hindek cara dû sê têkist dihatin, her sê min dinivêsîn, min refiz nedkirin, min gotî ewê vekolînê biket, ew xema wî, heta gotnên mezina gelek tişt hatin ne gotnên mezina bûn, bes min dikirin pertûkê da, min got heker vekoler bêtin, dê hizir ket pa eve çîye? wek vê nimûneyê: „sufî sufîyên êtîtê keçkên wan tixarek diçîtê, her dibêjin çî naçîtê” negotinên meznaye, min kire têda, jiber çî? min got vekoler dê êt ji me şarezatirin, wekî Zankoya Zaxo wekî te dîtî pişka fulkilorî veken û vekolînê ekadmî têda bihêne vekolîn, dê bêjît pa bi xodê eve nependî pêşiyane, eve çîye? eve tayeke ji filan babetî û dê cihekê bo bînîtin û navekê bo danîtin, belê evejî meyêt kirîn têda.

**FQ:** Serûberê fulkilorî li Behdînan çewa dibînî, ye'nî geşbînî yan cêgire vêgavê?

**HC:** Vêgavê xirap nîne, gencên hatîn, me zanko jî yên heyn, zanko jî xemê jê di xun û ew gencên vêgavê jî û Enistîtût yên peydabîn, ye'nî di wextê meda çî tişt nebûn, çî zanko li Dihokê nebûn, çî dezgayên Enistîtût jî nebûn, hema her kesek şexsê xo bû, li dwîv dilsozîya xo şîyanên xo şol dikir, bes evroke gelekî, berê wek tiblên desta bûn, medizanî çend nivêser di Dihokê da hene, çend fulkilorî kum diken û çend çîrokê kum diken, û çend romanê dinivêsin, çend şîrê dinvêsin, hemî di aşkera bûn, bes nuke, maşella, êkî got me (22) zanko yê li Kurdistanê bitinê heyn, eve hemî hêz û paldereke bo kumkirina fulkilorî ezê geşbînim, heta ewê me kumkirî, ew dişên vavêrin, bêjin eve başe û eve nebaşe jê derbêxin, yan me stiranên şeveroka yê kumkirîn, çêdbît stiranek çû bît têda ne ya şeverokê bît, li wî demî bêjin: eve ne stirana şeverokane, jê bînin der, yan stiranên govenda û dîlana, dibît stiranek krbîte têda neya govenda û dîlana bît, evroke bên evan tiştê bînin der, ye'nî ji me zîrektirin, divêt zîrektirbin, çunkî dê bine vekoler, me madê bo komkirî, kumkirin ya berdewame, çêdbîtin (30%) me kum nekîrbîtin, divêt bizavê bikeyn yê may ne kumkrî jî, em kumkeyn, ye'nî li ser milên wan dimînt, ew kumkene ser êk.

**FQ:** Gelek sopas

# Hevpeyvîna bi Gulê Şadkamê ra

Gulê Şadkam was born in the city of Qoçan in Khorasan, Iran, and studied Physics and Sociology. She has discovered and recorded many examples of Kurdish oral tradition from her province. Since 2005 she has been collecting and archiving the folklore of Khorasan through the National Council of the Intangible Heritage of Iran, and for ten years she has been working with the Intangible Heritage of Khorasan Association. Şadkam was inspired by her grandmother who was a storyteller. While conducting her research, she visited Qoçan, Şîrwan, Bijnort, Aşxane, Esperayîn, Deregez, Kelat, Nêşabûr and Sevziwar in North Khorasan. She has prepared for publication and published four books on folklore.

Gulê Şadkam ji bajarê Qoçanê yê Xorasanê ye. Wê Beşa Fizîk û Civaknasî xwendîye. Lê ew 10 sal in li sazîyeka fermî ya bi navê Deftera Mîrata Manewî ya Xorasanê<sup>1</sup> kar dike. Karê wê nasandin û qeydkirina mijarên çanda kurdên Xorasanê ye û herweha ji sala 2005an vir ve, Şadkam keresteyên folklorê kurdî berhev dike, qeyd dike, arşîv dike û dişîne Konseya Netewî ya Mîrata Menewîya Îranê. Ew dîyar dike ku çîrokên pîra wê tesîreka mezin li ser wê kirîye. Şadkam ji bo berhevkarîyê heta niha çûye bajarên Bakurên Xorasanê yê wekî Qoçan, Şîrwan, Bijnort, Aşxane, Esperayîn, Deregez, Kelat, Nêşabûr û Sevziwarê. Şadkam xwedî çar pirtûkên folklorê ne.

**Joanna Bochenska:** Ji kerema xwe ra ji me ra behsa xwe bike. Nav û paşnavê te çi ye? Tu ji ku yî? Çend salî yî? Tu çi karî dikî?

**Gulê Şadkam:** Navê min Gulê Şadkam e. Ez xelkê Xorasanê, ji bajarê Qoçanê me û 47 salî me. Min fîzîk û civaknasî xwendîye. Ez 10 sal in li sazîyeka fermî

---

<sup>1</sup> Li Îranê sazîyeka bi navê *Mîrata Çandî* heye ku li her bajarî xwedî ofîsek e. Li vê sazîyê beşeka bi navê *Deftera Sebta Menewî* heye ku karê wê nasandina çanda menewî ya her bajar û herêmê ye. Ew ji bo her mijarê kategorîyêkê çêdikin û tekst, film û foto dişînin şoraya netewî, û paşê ew mijar, li ser meseleyê, govenda kurmancên Xorasanê, wekî mîrata menewîya Îranê tê pesendkirin.

ya bi navê Deftera Mîrateya Menewî ya Xorasanê kar dikim. Karê min nasandin û qeydkirina mijarên çanda kurdên Xorasanê ye. Ez her sal li ser lîstek ji çanda kurdên Xorasanê, wekî resmûrêce (adet), muzîk, folklor, huner, cilûberg, xwarin û hwd ku hîn li nav xelkê zînde ne, kar dikim. Ji wan ra faylekê çêdikim, deng, foto, film û hevpeyvîn ji wan ra amade dikim û paşê wan dişînim Konseya Netewî ya Mîrata Menewîya Îranê û ew wekî mîrata menewîya Îranê tên pesend kirin. Min heta niha nêzîkî 40 mijar ji çanda kurdên Xorasanê wekî mîrata menewî ya Îranê daye nasandin. Niha jî nêzîk bi 17 sal in ku ez li ser çand û folklorê kurdên Xorasanê dixebitim û ji çanda devkî her tişt mîna resmûrêce, edebîyata devkî, çîrok, huner, cilûberg, lîstik, muzîk, bawerî û hwd berhev dikim.

**J.B:** Tu li ser çanda dekvî dişixulî, tu dikarî behsa destpêka wê bikî? Çima folklorê kurdî bala te dikişîne?

**G.Ş:** Ez bawer dikim ku destêka wê xebatê ji zarokatîyê li mejoya min çêbû, gava ku di zarokatîyê da diçûm gund û dapîra min ji min ra çîrok digotin. Gava mezin bûm tim dilê min dixwest wan çîrokan dîsa carek din bibihîzim û berhev bikim. Lê ew tiştê ku bû sebeb ku ez bikevim nav wê xebatê, daxwazîya hevlekî malbata me bû ku li Kanadayê dijî, zimanê wî tirkî bû û ji ber ku ji kurdên koçer bîranînên xweş li bîra wî mabûn, dilê wî dixwest ku kurdîya Xorasanê fêr bibe. Ew her cara ku dihat Xorasanê, wî ji min dipirsî: “Gelo kitabek heye ku bi wê bikarim kurdî fêr bibim?” Û min bersiv dida: “Mixabin na!” û wî dîsa sala din ew pirsî ducare kir. Loma min biryar da ku çend rûpelan ji peyv û hevokên kurdî binivîsim û bidim wî. Gava hevalê me ew dît, ji min xwest ku wan berfirehtir bikim. Li destpêkê min tenê peyvên kurdî ku dizanibû dinivîsî, lê hêdî hêdî min dît ku li bajarên din peyvên din hene ku li nav me tunebûn. Loma çûm nav gund û bajarên din ku peyvên nû binivîsim. Paşê min dît tiştên din mîna çîrok, kilam, gotina pêşîyan, tiştanok, adet, bawerî, huner, û ... jî giring in û min ew jî hêdî hêdî berhev kirin.

**J.B:** Te kînga dest bi vî karî kir?

**G.Ş:** Min ji sala 2005an ve dest pê kir û hîn jî xebata min berdewam e. Lê pêşîya berhevkirina çanda devkî, min bi xwenga xwe ya mezin ve li ser cilûbergên kurdên Xorasanê dixebitî.

**J.B:** Tu li ku derê, li kîjan deveran zargotin kom dikî?

**G.Ş:** Ez heta niha çend caran çûme bajarên Bakurê Xorasanê yên wekî Çinaran, Qoçan, Şîrwan, Bijnort, Aşxane, Esperayîn, Deregez, Kelat, Nêşabûr û Sevziwarê. Û min ji xelkên gund û koçerên wan deran kom kirîye.

**J.B:** Tu bi kîjan rêxistin (sazî) û kovaran ra kar dikî? Herweha pêwendîya te bi kîjanî ra heye?

**G.Ş:** Mixabin min hîn bi tu kovarê ra pêwendî çênekirîye. Hevkarîya min jî tenê bi sazîyek nefermî da bi navê *Kanîya Dil* e ku me bi xwe di sala 2017an da li Meşhedê ava kirîye.

**J.B:** Tu çawa karê xwe finanse dikî? Tu çawa xwe finanse dikî?

**G.Ş:** Wan salan ji bo xebat û lêkolînan, min bi xwe pere daye. Lê carekê di sala 2016an da, komxebateka çandî ya kurdan li Meşhedê ji bo lêkolînê ez himayet kirim.

**J.B:** Niha li Xorasanê rewşa çand û zimanê kurdî çawa ye?

**G.Ş:** Li Xorasanê hîn hinek çand û adet mîna dawet, cilûberg, kilam, mûzîk û lîstik hene lê mixabin tiştên mîna çîrok, cejna Newrozê û ber Newrozê, hinek hunerên destî û zanînen kevn ji nav xelkê çûne yan jî pir kêmbûne. Lê tiştê ji hemûyan xirabtir ziman e. Mixabin niha li bajar û gundên Xorasanê, xelk piranî bi zarokên xwe ra kurdî napeyvin, û wê pêşeroja ziman û çanda kurdî li Xorasanê tarî kirîye.

**J.B:** Gelo li nav rewşenbîrên wir berhevkirina zargotinê populer e?

**G.Ş:** Mixabin berhevkirina zargotinê li nav rewşenbîrên me pir populer nîne. Ji ber ku kesa/ê ku bixwaze zargotinê berhev bike, jê ra dirav û himayet pêwîst e. Loma pir kes nikarin berhevkarîya xwe berfireh bikin, lê tenê dikarin li ser zargotina gund an jî êla xwe bixebitin.

**J.B:** Di “Du Gotin”a pirtûka “Sêxiştîyên Kurmancî: Xorasan”ê<sup>2</sup> da tu behsa Kelîmolla Tewehodî dikî ku ew yekem kes e ku wî “Sêxiştîyên Kurdî” çap kirine. Tu dikarî bêhtir behsa rola wî ya berhevkirina zargotina kurdî bikî? Gelo rast e ku li Xorasanê wî îlham daye gelek kesên ciwan ku çanda xwe binasin û berhev bikin?

**G.Ş:** Mamoste Kelîmolla Tewehodî yekem kes e ku li Xorasanê li ser çanda kurdan xebitîye û navê kurdan kirîye nav kitêb û kovaran. Karê wî yê herî giring dîroka kurdên Xorasanê ye. Wî ji emrê xwe pêncî sal zêdetir daye li ser vî karî û kitêba xwe ya navdar a “Koçberîya Dîrokî ya Kurdan bi Xorasanê” heft cild nivîsîne û çend kitêbên din ên dîrokî jî nivîsîne. Lê wî hinek kitêb li ser muzîk, çîrok û sêxiştî jî nivîsîne. Kitêba wî ya *Ferhenga Kurdî-Farisî* jî li ber çapê ye. Bi rastî, bandora wî li ser nifşên dû wî pir e, û dikarim bibêjim ku li Xorasanê wî navê kurdan zindî kirîye.

**J.B:** Di heman pirtûkê da tu û mamoste Celîlê Celîl, hûn sêxiştîyan wekî taybetîyeka zargotina Xorasanê pêşkêş dikin. Li Xorasanê, cure û şewazên din ên zargotina kurdî çi ne? Bi taybetî yên ku li wir belav bûne?

**G.Ş:** Hinek kitêb li ser çîrok, helbest, gotinên pêşîyan, tiştanok, cilûberg û muzîkê belav bûne û hinek jî li ber çapê ne. Du kitêbên min bi xwe jî li ber çapê ne: “Gotinên Pêşîyan” û “Civaknasîya Êl û Eşîrên Îranê”, herweha kitêbên du kesên din ên wekî “Ferhenga Kurdî-Farisî ya Peyv û Biwêjan”, “Cilûbergê Kurdên Xorasanê” jî li dest amadekirinê ye.

**J.B:** Di heman pirtûka da tu û mamoste Celîlê Celîl, hûn behsa guherîna jîyana civakî ya Xorasanê dikin, û behsa tesîra wê ya li ser çanda kurdî jî dikin. Ez fam

---

<sup>2</sup> Ew pirtûk cara yekem di sala 2012an da li Înstîtûya Vîyanayê, û cara duyem jî di sala 2018an da li Weşanxaneya Wardozê hatîye çapkirin.

dikim ku ji bo zargotinê ev tesîr neyînî ye. Lê gelo ev guharîn çanda nû (modern) ya kurdî jî nafirîne? Herweha gelo teknoloji ji bo karê komkirinê dikare bibe alîkar? Çawa?

**G.Ş:** Belê, teknoloji sewa komkirinê pir alîkarîya min dike. Mesela ez gava diçim nava gundan û koçeran, ez bi xwe ra kameraya dijîtal dibim û hemû tiştan qeyd dikim û paşê wan li ser komputerê çêdikim. Yan hinek dengbêj û muzîknas ji teknolojiyê pir sûdê digirin. Lê li wê derê behsa min ew e ku guherîna jîyanê bi awayekî çêbûye ku mixabin şûn li çand û zimanê kurdî teng kirîye. Beşa pir, tesîra hikûmeta îslamî ye ku dû înzilaba 1974an, hinek norm û nîrxên nû li civakê çêbûye ku bi çanda me ve cur naxwîne. Meselen sewa wê hikûmetê muzîk, kilam, govend û hwd balkêş nîne û ew zêde zêde li ser ola îslama şîyî radiwestin, an ku zimanê nefermî wek kurdî nayê hemilandin<sup>3</sup> û nahêlin li mekteb û zanîngehan ders bidin. Loma ew bandora sîyaset û ol û hêza hikûmetê, hêdî hêdî tesîra xwe danîye û hinek jîyana xelkê guhert, û bû sebeb ku xelk ji çand û zimanê xwe dûr kevin. Cureyek din a guherînê jî çêbûye, ku normal e, meselen koçer heta bîst sal berê bi deve û hespan koç dikirin û niha bi erebeyan. Yan jinan bi meşkê dew dikîyan û niha bi çerxa şîr û maşînan. Cilûberg ji nav jîyana rojane derketîye û tenê li dawetan û cejnan tê lixwekirin.

**J.B:** Gelo pêwendiyên we (rewşenbîrên Xorasanê) bi rewşenbîr, rêxistin, sazî û kovarên din ên Kurdistanê ra hene?

**G.Ş:** Mixabin ev pêwendî pir kêr in. Ji ber ku hikûmeta îslamî pir me kontrol dike. Meselen em nikarin bi rehetî herin semînerên Kurdîstana Bakurê, an em nikarin wan dawet bikin Xorasanê. Mixabin îstîxbarata Xorasanê qet hez nake di navbera me û kurdên din da pêwendî û hatinûçûyîn hebe. Her cara ku yek ji derve hatîye yan jî dema em çûne derve, wan gazî me kirine û heydarî dane me. Loma ez bi xwe, mixabin tercîh dikim ku karê xwe bikim, û heta derî ku dibe hatinûçûyîn tune be. Lê bi hevalên kurd ên li derve ra, hinek pêwendî bi whatsapp, înstagram û emailê ra heye.

---

<sup>3</sup> Hemilandin: tehemilkirin, qebûlkirin.



**J.B:** Kevneşopîya devkî ji bo te çi ye? Tu dikarî wê pênase bikî?

**G.Ş:** Bi dîtina min, ev bi vê maneyê ye ku em jîyana xelkê bibînin û her çi adet, bawerî, norm, folklor û hwd, ku wekî nimûneyên reftarî tên dîtin, qeyd bikin û paşê wan destebendî bikin. Mesela bibînin xelkê çi dixwe, çawa dixwe, li ser kîjan adet û bawerîyan dixwe.

**J.B:** Li gor te kîjan bêje, kevneşopîya devkî, zargotin, folklor, a herî di cih da ye? Tu kîjan bi kar tîni? Hebe bêjeyeka din?

**G.Ş:** Ez bi piranî „folklor”ê bi kar tînim.

**J.B:** Dema tu keresteyên folklorê berhev dikî bala te bêhtir li ser çi ye yan jî kîjan cureyî ye?

**G.Ş:** Her tişt ku li bareya jîyana kurdên Xorasanê be ji min ra balkêş e. Lê gava bi kesekê/î ra hevpeyvînê çêdikim, li destpêkê hinek ji jîyana berê û resmûrêcên berê mîna dawet, koç û karê rojane dipirsim ku hinek mejoya wê/wî amade bibe. Paşê jê dipirsim gelo çîrokan dizane, eger ew çîrokan nizanebe yan ji bîr kiribe, jê tiştanokan dipirsim, paşê kilam û stranên. Eger kesek yek ji wan nizanibe, tenê ji rewşa jîyana berê û niha dipirsim, herweha karê wan jî dipirsim. Gava dibînim ku kesek pir zana ye, belkî heta bîst caran jî herim ba wê/wî û hemû tiştan, peyv û biwêj û çîrok û kilam û huner ji wan dipirsim.

**J.B:** Kîjancureyên çanda devkî bêhtir balatedikişînin? Tu dikarî nimûneyên wan bidî?

**G.Ş:** Ez bi piranî ji cureyên ku bibe ji alê civaknasî û saykolojîya civakîya xelkê, hez dikim û dixwazim li ser wan lêkolîn bikim, mîna: çîrok, kilam, tiştanok, gotina pêşîyan, bawerî û biwêj.

**J.B:** Gelo tu versiyonên orîjînal ji yên neorîjînal cuda dikî?

**G.Ş:** Belê ez wan ji hev cuda dikim.

**J.B:** Gelo te qet berhemeka neorîjînal ji arşîva xwe derxist?

**G.Ş:** Na, min hîn ev kar nekirîye.

**J.B:** Gelo li gor te, tesîra çanda nivîskî û ya modern li ser gotin û tevgerên dengbêjan heye?

**G.Ş:** Li Xorasanê çanda modern hîn pir bihêz nîne. Tenê helbestên nû hene ku hinek dengbêj wan dixwînin. Lê çend şano jî çêbûne.

**J.B:** Berhemên ku te kom kirine, di jîyana te da ji te ra dibin alîkar? Bi gotineka din, di çarçoveya exlaqî da piştgirîya te dikin? Mesela dema di jiyana te da tişteki taybet diqewime tu wan bi bîr tinî?

**G.Ş:** Ez dikarim tesîra gîştî ya vî karî li ser jîyana xwe bibêjim ku bi rastî ji min ra pir bihêz bûye. Min bi vî karî maneyek herî giring daye jîyana xwe û jîyana xwe ji nav da zengîn kirîye. Lê nikarim mînakek bidim ku mesela dema dijarîyeka fikrî yan exlaqî, gotinek pêşîyan an jî çîrokek ji min ra bûye alîkar. Ez tesîra wan bi piranî li ser kesayet û hevpêwendîya civakî dibînim.

**J.B:** Te behs kir ku keresteyên çanda devkî berhev dikî. Gelo tu dikarî behsa berhevkarîya xwe bikî? Tu vê yekê çawa dikî? Rê û rêbazên te çi ne?

**G.Ş:** Ez gava diçim gundan û nav koçeran hewil didim ku hem wekî bînerê li wan binêrim û hem yeka ji wan bim. Dikarim bibêjim ku ez bi sê rêyan çanda devkî kom dikim:

- Dîtin û qeydkirina rê û rewşa jîyana kurdên Xorasanê û adet û normên wan. Mesela pirî caran tenê li axaftina xelkê guh dadigirim, û peyv, biwêj, gotina pêşîyan û bawerîyên wan qeyd dikim.
- Hevpeyvînên kûr û dirêj ku bikarim li ser her tiştî agahîyên pir û hûr bi dest bixim. Mesela li ser resma dawetê, cejna Newrozê, cilûberg yan jî karên rojane, ji her kesê/î dipirsim. Paşê bi kesek din ra ku ji tayfeyeka

yan ji gundekî din e jî dipirsim li filan derê vî karî dikin, hûn çî dikin. Agahyên ku ew jî didin lê zêde dikim.

- Li ser tiştên mîna biwêj, gotina pêşyan, tiştanok û hwd, li destpêkê hinek tiştên ku min ji dayik û bavê xwe bihîstibû nivîsîn û paşê ez gava diçim ba kesekê/î ji gundekî yan tayfeyekî din, wan yek yek dixwînim û dipirsim hûn çî dibêjin û hêdî hêdî li wan zêde dikim.

**J.B:** Gelo ji bo wê tu perwerde bûyî? Li ku derê? Çawa?

**G.Ş:** Na, min qet perwerde nedîtîye. Min bi işq û elaqeyeka pir dest bi vî karî kirîye, lê hêdî hêdî tecribeya min zêde bû. Paşê di sala 2017an da min civaknasî xwend ku bikarim bi awayekî akademik û ilmî li ser pêdîdên civakî ên kurdan lêkolîn bikim.

**J.B:** Gelo aniha rê û rêbazên te yên berhevkirinê li gor ên berê guherîne? Çawa?

**G.Ş:** Belê hinek guherîne û tecribeya min pirtir bûye. Ez gava kesekê/î dibînim li ser rêya komkirina folkloran agahîya zanistî heye, jê dipirsim ku çawa ew berhevkarî dike ku ez jî karê xwe rindtir bikim. Hinek amûrên min yên teknolojîkî jî baştir bûne, mesela min li destpêkê tenê dinivîsî, başê min deng digirt, lê ji 10 sal berê ez film jî digirim.

**J.B:** Arşîv ji bo te tê çî mane ye?

**G.Ş:** Arşîv, yanî her tişt ku min jê destnivîs, film, foto û deng girtîye. Ez paşê wan deng û filman li ser komputerê teyb û destebendî dikim.

**J.B:** Gelo arşîva te heye? Ew arşîv çawa ye (nivîskî, teyb, kitêb, dijîtal)? Kerem bike hemû nimûneyan bide?

**G.Ş:** Belê, arşîva min heye: film, deng, foto, destnivîs, teyb.

**J.B:** Gelo ew arşîv xwedî pergal e? Tu arşîva xwe çawa bi nav dikî? Bi rêya dosyeyan, cureyên keresteyan, hwd?

**G.Ş:** Na, sîstema min tune ye. Ez tenê wan destebendî dikim. Meselen film, foto û deng li ser tarîx, bajar û gundên ku min lê qeyd kirîye, destebendî dikim û li her faylê cuda datînim. Mesela: Qoçan, bihara 1398î (2019). Paşê ku li deng û filman guhdarî dikim û her tiştî li desteya xwe dinivîsim û teyb dikim. Mesela peyvan li fayla peyvan dinivîsim û teyb dikim, gotina pêşîyan li ya xwe, tiştanokan li ya xwe, kilaman li ya xwe û hwd.

**J.B:** Gelo tu arşîveka wisa wekî “komkirina tiştan (şênber)” yan bêhtir wek “komkirina nîrxên ne maddî (razber)” dibînî?

**G.Ş:** Belê.

**J.B:** Gelo tu arşîva xwe bi awayekî diparêzî (mesela ji windabûnê, tozê, polîsê, hwd)?

**G.Ş:** Belê, ez ji bo her faylê yeka din jî çêdikim. Mesela ji bo filman yek din jî kopî dikim. Yan fayla mijarên destebendî ya teybê kopî dikim û li hardîska din dadigirim.

**J.B:** Arşîva rexistin (sazî) û kovarên ku tu bi wan ra dixebitî heye? Ew karê te jî arşîv dîkin?

**G.Ş:** Mixabin, ez bi tu kovarê ra naxebitim.

**J.B:** Gelo bi ya te kovar dikare rola arşîvê bilîze jî?

**G.Ş:** Belê dikare, lê bi dîtina min eger sazîyeka kurdî hebe ku hemû berhemên me berhev bike û arşîv bike, ji hemû tiştî rindtir e.

**J.B:** Gelo tu berhemên ku tu kom dikî, wan çap dikî/diweşînî? Li ku? Çawa?

**G.Ş:** Berhema min a yekem “Sêxistîyên Kurmancî” bi alîkarîya mamoste Celîlê Celîl li Vîyanayê (2012) çap bûye û li Dîyarbekirê jî weşanxaneyê Wardozê (2018)

dîsa çap kirîye. Berhema diduyan, “Gotina Pêşîyan” jî li sala 2021 çap bûye. Yê din jî li ber destê min in ku amade dikim.

**J.B:** Li gor te ji bo çanda devkî ya kurdî kîjan metodên weşanê/çapkirinê baştir in? Çima?

**G.Ş:** Li ser vê pirsê pisporîya min tune ye.

**J.B:** Tu ji bo weşanê/çapê çawa berheman hildibijêrî? Giringîyê didî çî?

**G.Ş:** Ji min ra kalîteya çapê giring e û sîstema durist a belavkirina kitêban.

**J.B:** Armanca te ya çapkirinê/belavkirinê çi ye?

**G.Ş:**

- Yekem armanca min, parastina ziman, çand û folkloran e. Ji ber ku ew heta niha nehatine nivîsînê û tenê devkî ji berê hatine dagirtin, loma ji min ra çapkirina wan pir giring e.
- Armanca min a diduyan ew e ku xelk bibînin ku çanda wan hatîye çapkirin û belavkirin û bi wê nasnameya wan bihêz bibe.
- Armanca min a sisêyan ew e ku nifşa nû çanda xwe nas bikin û ji kurdayetîya xwe cuda nekevin.
- Amadekirina berhemek ji bo lêkolînerên çandî, civakî û hwd.

**J.B:** Tevgerên weşanxane û cureyên weşanên kurdî, li gor salên berê li hember berhemên çanda devkî guherîne?

**G.Ş:** Belê guherîye, mesela li Xorasanê, hinek kesên ku 15-20 sal berê berhemên biçûk çap dikirin, ji wan ra alfabeya kurdî pir giring nebûye û bi alfabeya farisî dinivîsîn. Ê wan pir li ser rêzkirina zanistî û dîzayna pirtûkên xwe ranediwestîyan. Niha hem kalîteya çapê çûye bilind bûye hem jî alfabeya kurdî cihê xwe vekirîye û hinekî kar jî zanistîtir bûye.

**J.B:** Tu dixwazî versiyona çapkirî ji bo kê be?

**G.Ş:** Ji bo xelkê û lêkolîneran.

**J.B:** Gelo tu ji bo berhemên çapkirî pêşgotin yan jî şirove dinivîsî? Çima? Wan çawa diafirinî/dinivîsî?

**G.Ş:** Belê, li kitabên ku derve Xorasanê çap dibe, ji ber ku hinek devok û çanda kurdên Xorasanê ji kurdên din ra xerîb e, loma ez gerek dibînim ku hem li pêşgotinê û hem li tekstê, hinek şirove bikim. Ji bo kitebên vir jî, ji ber ku nifşên nû, hinek ji ziman û çanda kurdî cuda ketîye, ez gerek dibînim ku pêşgotin û şirove hebe.

**J.B:** Gelo ji bilî çapê/weşanê tu/yan hevalên te bi rêyên cuda yên belavkirina çanda devkî ya kurdî digerin (mesela festival, şano, pêşkêşên cuda û hwd)? Çi ne ew? Tu dikarî çend nûmeneyan bidî?

**G.Ş:** Li Xorasanê mixabin hîn pir îmkan tune ye ku em cureyên din ên belavkirinê ji xelkê ra bi kar bînin, loma ez bi xwe tenê berhemên xwe bi weşandinê belav dikim.

**J.B:** Mamostê Celîlê Celîl di pêşgotina pirtûka *Sêxiştîyan* da behsa helbestvanên nûjên yên Xorasanê dike û dibêje: “Ew forma sêxiştîyan di helbestên xwe yên nû da bi kar tînin.” Gelo di çanda modern a li Xorasanê da mînakên din jî hene ji bo bikaranîna form û motîfên zargotinê? Eger hebin, ji kerema xwe ra mînakan bide?

**G.Ş:** Ev mijar ji min ra pir balkêş e. Ji bilî helbestvanan, dikarim navê hunermendên muzîk, şano, wênegêrîyê, û karên destî bibêjim.

**J.B:** Pêwîstîyên herî giring ji bo komkirina çanda devkî û avakirina arşivên çanda devkî çi ne?

**G.Ş:** Mesela ji min ra ku pêwendîya min bi folkora kurdî ve pir e, pêwîstîya herî giring dirav e. Ji ber ku dewlet wan karan himayet nake û meriv gerek bi xwe kar bike, loma kar pir sext û dirêj dibe û paşê dibîni ku wext û hinek derfet zêde ji destî

çûne. Ji bilî dirav, li vir pisporî li ser wan karan kême e. Belkî hinek kes bixwazin folklorê kom bikin lê mixabin ji ber kêmbûna dirav û pisporîya wan di destpêka rê da ew dilsar dibin. Li zanîngehên Xorasanê kurdnasî, mirovnasî, folklornasî û hwd tune ye, loma kes li wan rişteyan perwerde nabe û eger jî kesek li bajarekî din an welatekî din perwerde bibe, kar jê ra kême e.

**J.B:** Problemên herî mezin çi ne ?

**G.Ş:** Bi dîtina min, ji me ra ji hemû tiştan girîngtir û bibandortir dijarîyên siyasetî ne. Mesela reftara hikûmetê bi taybetî ji bo beşên asayî ku girûpên qewmî (ethnic groups) ji xwe ra wekî xetereyekî dibînin û wan kontrol dikin û zordestî li wan dikin, û pir derfet nadin wan ku ew li ser ziman û çanda xwe bixebitin. Bi wê awayî hikûmet nahêle ku zarokên me bi ziman û çanda xwe li mekteban perwerde bibin, û ew her roj pirtir ji kûrbûna xwe dûr dikevin.

**J.B:** Fikrên te ji bo çareserîya van probleman çi ne? Pêşniyazên te?

**G.Ş:** Ji ber ku bi bawerîya min, em nikarin reftara hikûmetê biguherînin, ez baştir dizanim ku em, kurdên Xorasanê, li nava xwe sazîyekê çêbikin û bi xwe ji karên çandî himayet bikin. Me di sala 2017an da sazîyek li Meşhedê ava kir lê mixabin pir bihêz nîne...

**J.B:** Cih û rola jinan ji bo parastin û komkirina folklorê kurdî çawa dibînin?

**G.Ş:** Ez dikarim li Xorasanê vê rolê ji du alîyan bibînim:

- Piranîya folklorê bi destê jinan hatîye parastin. Tiştên mîna zargotin (çîrok, tiştanok, kilam û hwd) resmûrêce (zayîn, dawet, mirin, cenja Newroz û hwd) hunerên destî (cilûberg û serzînet, tewn, kon û hwd) zanistîyên xwe-cihî (rengkirina rêsan, çêkirina meşkan, bijîşkîya sinetî û hwd)
- Lê berhevkarin û komkirina li Xorasanê hem jinan û hem mêran kar kirine. Hejmara jinên xebatkar li vir kême e lê bandora wan zêde ye. Ji ber ku dîqat û baldarîya jinan pir e, û ew bêhtir dikarin bi xelkê ra bi taybetî, bi kal û pîran ra têkilîyê çêbikin, loma bi dîtina min, rola jinan di berhevkarîya zargotinê da pir girîng e.

**J.B:** Di berhemên folklorî da kîjan motîfên jinan û lehengên jin zêde bala te dikişînin yan îlhamê didin te û li ser karê te bi tesîr in? Tu dikarî nimûneyan bidî û taybetmendîyên wan îzah bikî?

**G.Ş:** Di piranîya çîrokên me da, rola jinan wek zanayek mezin e, ew hemû bersivan dizanin û ji mêran rênûmatîyê dikin.

**J.B:** Bandoran kîjan dengbêjên jin yan jinên kurd ku girêdayî çand û zimanê xwe ne û ew parastine, li ser te heye? Eger hebe tu dikarî bibêjî çawa bandor li te kirine? Nimûneyan bide û taybetîyên wan îzah bike?

**G.Ş:** Ji min ra bi piranî jinên koçer giring in. Zargotin û bi taybetî kilamên wan pir zengîn û resen in. Lê di hemû hunerên din da jî jinên koçer pêşdatir in.

**J.B:** Gelo motîf/leheng/dengbêj/aktivîstên jinan ên kurd hene ku tu ji wan hez nakî û çalakiyên wan giring nabînin yan jî çalakiyên ji bo rewş/mafên jinan xetere dibînin?

**G.Ş:** Na, min tiştêk wisa nedîtîye.

**J.B:** Nirxên çanda devkî û rewşa jinan ku behsa çandê dike û wê pêşkêş dike çawa dibînin? Gelo tu pewîstî bi rexnekirinê yan guhartinê heye? Îzah bike û nimûneyan bide?

**G.Ş:** Îro bi taybetî li nav nifşên nû mixabin têkilîya wan û çanda devkî pir lawaz bûye. Li Xorasanê jin bi piranî bi zarokên xwe ra bi kurdî napeyvin û çanda kurdî ji jîyana xwe ra giring nabînin. Ev rewş pir min xemgîn dike, gava diçim gundan û dibînim dê û bav li şûna kurdî, bi zarokên xwe ra bi farisî dipeyvin û tiştên ji çanda devkî û hunerên kevn ên xwe, nadin zarokên xwe. Bi dîtina min, du tiştan ev rewş ji me ra çêkirîye: sîstema perwerdeya giştî û televîzyona dewletê, ku her du di bin bandora rejîma îslamî da ne. Bi dîtina min, eger ew her du çênebin û li şûna wan cihekî sewa ziman û çanda kurdî venebe, jin jî nikarin têkilîya xwe û zarokên xwe bi çanda kurdî bi hêz dagirin.



# Hevpeyvîna bi Mehmet Gultekînî ra

Mehmet Gultekîn was born in the city of Bazîd (Doğubayazıt) in the region of Agirî (Ağrı) and lived there for eighteen years. After finishing high school, he moved to Frankfurt in Germany. There he studied German Philology and Oriental Studies at Johann Wolfgang Goethe University. Now he lives there and works as a translator in the high courts. Since 1979 Gultekin has collected the songs of *dengbêjs*, focusing mostly on those from Serhed. Apart from songs he has also collected their knowledge of history, ethnography and geography. Gultekin has published two books on folklore; his works on oral culture were published in several journals.

Mehmet Gultekîn li herêma Araratê li bajarê Bazîdê hatîye dinyayê û heta 18 salîya xwe li wir jîyaye. Piştî xelaskirina lîseyê, ji bo zanîngehê koçî bajarê Frankfurta Almanayê kirîye. Di Zanîngeha Johann Wolfgang Goetheyî da Beşa Fîlolojîya Almanî û Rojhilatnasîyê xwendîye. Ew niha li wir dijî û di dadgehên bilind da karê wergêrê dike. Gultekîn di sala 1979an da dest bi berhevkirina kilam dengbêjan kirîye. Wî bi piranî kilamên dengbêjên Serhedê berhev kirine û li ser wan xebitîye. Gultekîn tenê ji dengbêjan kilam berhev nekirine, herweha wî ji dengbêjan, agahî û daneyên devkî yên dîrokî, etnolojî, erdnîgarîyê jî berhev kirine. Gultekîn xwedî du pirtûkan e. Nivîs û gotarên wî yên li ser zargotinê di kovaran da hatine.

**Joanna Bochenska:** Ji kerema xwe ra ji me ra behsa xwe bike. Nav û paşnavê te çi ye? Tu ji ku yî û çend salî yî? Tu çi karî dikî?

**Mehmet Gultekîn:** Navê min Mehmet Gultekîn e, niha pêncî û neh salî me. Ez li herêma Araratê li bajarê Bazîdê hatime dinyayê û heta 18 salîya xwe li wir mezin bûme. Min li wir lîse xwend. Piştra ji bo xwendina zanîngehê hatim Almanayê. Min li bajarê Frankfurtê di Zanîngeha Johann Wolfgang Goetheyî da Beşa Fîlolojîya Almanî û Rojhilatnasîyê xwend û masterê qedand. Ez niha jî li vir dijîm û di dadgehên bilind da wekî wergêr kar dikim.

**J.B:** Tu li ser çanda dekvî dişixulî, tu dikarî behsa destpêka wê bikî? Çima folklorê kurdî bala te dikişîne?

**M.G:** Hemû beşên zargotina kurdî bala min dikişîne, lêbelê min bi piranî stranên dengbêjên Serhedê berhev kirin û min li ser wan xebat meşandin. Kilam û destanên epîk ên dengbêjên Serhedê ji aliyê hunera stranbêjiyê ve û têkilîya bûyerên wan ên bi dîroka Kurdistan ve bala min dikişînin. Herweha naveroka wan ji aliyê ziman, wêje, mînakên etnolojîk û psîkolojîk ve jî gelek dewlemend e. Ev taybetîyên wan di lêkolînên min da cihekî giring digirin. Min di sala 1979an da dest bi berhevkirina nimûyên berhemên dengbêjan kir. Ji bilî du-sê kesan min ew dengbêj hemû bi xwe dîtî û bi wan ra axivîm. Fînanseya xebatên min tenê ji kîsê min e. Ji nîvê sala 1980yî pê ve min dest pê kir û ew weşandin. Xêbatên min ên li ser nimûneyên zargotinê di kovarên wekî *Roja Nû*, *Basnûçe*, *Nûbihar* û *Zendê* da herweha di çend ên din da jî hatine çapkirin.

**J.B:** Kevneşopîya devkî ji bo te çî ye? Tu dikarî wê pênase bikî?

**M.G:** Tecribeyên civakekê yê ku xwe di hemû beşên zargotinê da dîyar dikin ji aliyê mirovên wê ve hatine ecibandin û di nav wan da bûne çandeka hevbeş. Hemû mirov û civak hewcedarê zanîna û agahiyên nû ne ku ew ji bo jiyanê bi kêrhatî ne. Neqilkirin û danûstandina tecribeyan berê, bi piranî, bi zargotinê dimeşîya, ew pîrî caran bi fantazîyan û xemilandî dihatin pêşkêş kirin. Kenveşopîya devkî di nav civaka Kurdistan da heta niha bi du rêyan meşîyaye, yek folklor e ku xwedîyên berhemên wê beşê ne diyar in, ango anonîm in, ya din jî wêjeya zargotinê ye, ango berhemên ku xwedîyê wan hene. Di beşa yekê da em li rastî çîrok, fabl, efsane, kilamên govendan, gotinên pêşîyan, tiştanok, qewlik û dilokan tên. Ya diduyan jî ji helbestan û kilamên dengbêjan pêk tê. Gelek helbestên Feqiyê Teyran hene ku ew tenê bi devkî gihîştine roja me. Herweha gelek stran hene ku em dizanin kîjan dengbêj ew bi gotin, meqam û melodî afirandine.

**J.B:** Dema tu keresteyên folklorê berhev dikî bala te bêhtir li ser çî ye yan jî kîjan cureyî ye?

**M.G:** Dema min dest bi berhevkirinê kir, di demeka kurt da min lîsteyeka dengbêjên ku li Serhedê jîyan dikirin amade kir. Çend kasetên wan di destê min da hebûn, lêbelê ji bo min giring bû ku ez wan bi xwe bibînim, bi wan ra biaxivim û pirsan ji wan bikim. Piştra ji ber ku bala min di derca yekê de li ser berhemên dengbêjên profesyonel bû, ango ew ên ku xwedî repertûwareka ne kêmi du sed kilaman û pê ra ne kêmi bîst-sî destanên epîk bûn. Di salên 1980yê da dora deh-pazdeh dengbêjên wisa li Serhedê hîn hebûn. Wan, hemûyan, debara xwe ji vê hunera xwe peyda dikirin. Lê niha herî zêde du-sê kes ji wan mane û temenê wan jî êdî ji heftê û pênc salî zêdetir e. Di derca diduyan da jî min berhemên derwêşan berhev kir ku ew jî li Bakurê Kurdistanê ber bi windabûnê diçe. Ji bilî qeydkirina stranên, ez bi dengbêjan ra derbarê têkilîyên dîrokî, etnolojîk û erdnîgarî yê wan berheman da diaxivim.

**J.B:** Kîjancureyên çanda devkî bêtir balatedikişînin? Tu dikarî nimûneyên wan bidî?

**M.G:** Wekî min got, di serî da stranên dengbêjên Serhedê yê ku min bi rêk û pêk berhev kirine û ev koleksiyona min hem ji alîyê pîrbûna navên dengbêjan û hem jî ji alîyê kilam û destanên wan ên epîk ve gelek dewlemed e. Herweha li gel gotinên pêşîyan, kilamên şînê, fabl û kilamên govendan, lê zêdetir jî çîrokên kevnare yê ji berîya zayînê bala min dikişandin, ên wekî derbarê Rostemê Zal, Gilgamêş, Şahmeran û Îskenderî. Lê min bixwe evana bi sistematîk berhev nekirin, ev beşa çîrokan jî di nav kurdan da gelek dewlemend e. Min ev yek ji çend lêkolerên din ên Serhedê ra pêşnîyaz kir ku ew li ser van beşan, xebatên berhevkarîyê bikin ku ev yek jî dora deh sal in ku tê meşandin û hinek pirtûk di vî warî da hatine weşandin, çend ên din jî tî amadekirin.

**J.B:** Gelo te versiyonên orîjînal ji yê neorîjînal cuda dikî?

**M.G:** Ev karekî gelek dijwar e. Min hewil da ku ez berheman ji dengbêjên herî zana û navdar berhev bikim, pê ra min ji dengbêjan dipirsî ku gelo ev kilam a wî ye yan jî ev kilam ji kê hînbûye û li gor zanîna wî gelo kê ev kilam afirandîye. Dema li herêmekê bûyere diqewimî, dengbêj diçû wê herêmekê derbarê wê bûyerê da pirsîyar û lêkolîn dikir, piştra kilam diafirand. Bûyerên ku bi kilaman tî strî bi

piranî qewimînên dîrokî ne, ango meriv ku baş lêkolînan bike, dikare şopa wan di kitêbên dîrokî da jî bibîne. Mirov dibîne ku lehengên kilaman kesayetîyên dîrokî ne û bûyer bi rastî jî qewimîne ku bi awayekî di rûpelên dîrokî da cih girtine, ev yek di xebata berhevkarîyê da gelek hêz dide mirovan.

**J.B:** Gelo te qet berhemeka neorîjînal ji arşîva xwe derxist?

**M.G:** Na, ez hemûyan diparêzim, lêbelê di weşandinê da hemû varyantan nadim, ji ber ku kitêb girantir dibe û weşanxane jî vêya naxwazin. Lê parastina wan dikare di paşerojê da bi kêrhatî be.

**J.B:** Gelo li gor te, tesîra çanda nivîskî û ya modern li ser gotin û tevgerên dengbêjan heye?

**M.G:** Ev hebe jî gelek kême. Piranîya dengbêjan xwendin û nivîsandin nizanibûn. Di sedsalên berê da hin destanên epîk ên wekî “Mem û Zîn” û “Zembilfiroş”î bi nivîskî hebûn û melayên ji kevneşopîya medreseyan, ew dixwendin. Ev heman mela helbet bi dengbêjan ra jî dihatin cem hevdu. Lê dîsa jî di destê me da nimûneyek tune ye ku em bikaribin bibêjin, dengbêj di bin tesîra çanda nivîskî da mane. Çanda nivîskî ji dawîya sedsala 20an pê ve kême be jî êdî ket nava Kurdistanê, jixwe dengbêjî wekî ekoleka klasîk êdî gelek kême bûbû. Ji ber astengîyên asîmilasyonê û tunebûna derfetan ev kevneşopî nikaribû cihê xwe yê di nav civakê da biparêze û xwe li gor şertên nû bi pêş ve bibe. Dorhêla vê hunerê ji ber sedemên siyasî di nav civakê da êdî qels bû.

**J.B:** Te behs kir ku keresteyên çanda devkî berhev dikî. Gelo tu dikarî behsa berhevkarîya xwe bikî? Tu vê yekê çawa dikî? Rê û rêbazên te çi ne?

**M.G:** Di salên 1980yî da li herêma Serhedê dengbêjên navdar hebûn, li Qers, Bazîd, Agirî, Patnos, Wan, Mûş, Karliova, Qereyaziyê û li çend cihên din. Ez bi xwe jî çûm cem wan dengbêjan, lê ew jî dihatin Bazîdê. Teyîbeka min a baş hebû, min bi wê dengê wan qeyd dikir û derbarê kilam û jîyana wan da pirsîyar ji wan dikir. Min ew berhem gelek caran guhdarî dikir û li ser wan lêkolîn dimeşand. Pirî

caran min ew dengbêj salekê şûnda dîsa didît û pirsên ku di çarçoveya xebatên min da nû peyda dibûn, min ji wan pirs dikir. Herweha ez li pişporên civak û eşîran digerîyam û min ji wan jî derbarê bûyerên ku mijara kilaman bûn pirsîyar dikir.

**J.B:** Gelo ji bo wê tu perwerde bûyî? Li ku derê? Ev perwerde çawa bû?

**M.G:** Di heman salan da, ango salên 1980yî da, min li Zanîngeha Frankfurtê da filolojî dixwend. Di vê beşê da semînerên derheqa folklor û zargotinê jî hebûn û ez jî beşdarî wan dibûm. Pirtûk û nivîsên derbarê vê mijarê da hebûn, me ew dixwendin û li ser wan referat amade dikirin.

**J.B:** Gelo aniha rê û rêbazên te yê berhevkarîyê li gor ên berê guherîne? Çawa?

**M.G:** Helbet niha jî gelek hunermend kilamên dengbêjan distirên, lêbelê ew bi xwe ne dengbêj in, ew hunermendên dewra nû ne. Ew li gor çarçova muzîkê ya vê demê û li gor dengê xwe di kilamên berê da guherînan jî çêdikin. Lê ez vana berhev nakim û nanivîsim, ew jixwe bi nivîskî li bal wan hene. Lêbelê carinan di înternetê da kilameka dengbêjekî berê dibînim û tespît dikim ku herçiqas min berê kilamên wî raste rast ji dengê wî qeyd kiribe jî lê ev kilam ne di nav da ye, wê demê ez wê kilamê jî qeyd dikim. Ez bi alîkarîya medyaya civakî mirovên herêmên cuda nas dikim û ji wan pirsîyaran dikim, wek mînak ev çandeka kurdên ji herêma Makû-Urmîye/Îranê pirs dikim ku gelo dengbêjên wan jî derbarê *Serhildana Agirîyê* (1926 – 1930) da kilaman sêwirandine û niha hîn distirên. Car caran jî ji mirovên herêmên cuda pirsê navê lehengan û cihwaran dikim ên ku di kilam û destanên epîk da derbas dibin. Ango danûstandinên min ên berê rû bi rû çêdibûn, lê niha bi rêya medyaya sosyal jî dimeşe.

**J.B:** Arşîv ji bo te tê çî maneyê?

**M.G:** Arşîv ew cih e ku tê da tecribeyên mirovahîyê yê nivîskî hene û herweha ew ji sed û pêncî salên dawîn ve bi awayê qeydkirina deng û dîmenan jî tîst parastin. Yek ji pirsê mirovahîyê ya sereke ew e: “Em ji ku tîst, koka me ji ku tîst û peşeyên me kî ne?” Tenê bi alîkarîya arşîvan em dikarin hewil bidin ku bersiva vê pirsê

bibînin. Herweha pêşketina mirovahîyê jî li ser bingeha tecribeyan dimeşe yê ku di arşîvan da parastî ne û em her wext dikarin serî li wan çavkanîyan bidin.

**J.B:** Gelo arşîva te heye? Ew arşîv çawa ye (nivîskî, teyb, kitêb, dijîtal)? Kerem bike hemû nimûneyan bide?

**M.G:** Arşîva min bi piranî ji kasetên teyban pêk tê, lê ev demek e ku ez wan dijîtal jî qeyd dikim. Parek ji wan hatine nivîsandin, lê parek mezin jî nehatine nivîsandin ku ez li ser wan xebat dikim. Li gel vê arşîveka min jî heye ku ew ji agahîyên derbarê dengbêjan, dîroka kilaman, derbarê kesayetî û cihwarên ku di kilaman da derbas dibin, pêk tê.

**J.B:** Gelo ew arşîv xwedî sîstem e? Tu arşîva xwe çawa bi nav dikî? Bi rêya dosyeyan, cureyên keresteyan, hwd?

**M.G:** Sîstema min a nimûneyên di kasetên dangan da bi du awayî hatîye amadekirin, yek li gor navên dengbêjan û ya din jî li gor navê kilaman.

**J.B:** Gelo tu arşîva xwe bi awayekî diparêzî (mesela ji windabûnê, tozê, polîsê, hwd)?

**M.G:** Belê, bi wî awayî ku ez wan dijîtalîze dikim û bi çend kopîyan wan li cihên cuda diparêzim. Lê kasetên eslî dê heta kînga bikaribin bîn parastin, ez baş nizanim. Kasetên gelek kevn jî li cem min hene, lê min bi xwe ji sala 1979î pê ve û her sal di mehên havînê da kilam li ser kasetan qeyd dikir. Ew hemû jî hîn dikarin baş bîn bikaranîn û guhdarîkirin.

**J.B:** Gelo rexistin (sazî) û kovarên ku tu bi wan ra dixebitî, karê te arşîv dike yan na? Gelo arşîva wan heye?

**M.G:** Ez bawer nakim ku arşîveka bi disîplîn a kovar û dezgehên têkildar hebe. Gelek caran nivîsên ku mirov di kovaran da çap dike, piştî demekê winda dibin, ev ji bo malperên înternetê jî wisa ye û kovarên çapkirî jî. Hin kovarên çapkirî jî mirov piştî çend salan êdî nikare peyda bike. Wek mînak, min di rojnameyeka

hefteyî da ji salên 2014an heta 2016an nêzîkî sî nivîs weşandin, ew dihatin çapkirin û di înternetê da jî di malpera heman rojnameyê da derdiketin. Ew rojname niha li Bakurê, êdî nayê çapkirin lê di înternetê da gelek çalak e, lê dîsa jî ez piranîya wan nivîsan tê da nabînim. Ev yek ne tenê derbarê nivîsên min da lê yên gelek nivîskaran da jî wisa ye. Hin dezgeh hene ku navê wan wekî enstîtu yan jî akademî ne, lêbelê hundirê wan vala ye yan jî piştî demekê tên girtin, ew ne bi armanceka bizanîn tê kirin lê bi armanceka siyasî tê kirin, qaşo ji bo dagirtina valahiyên di vê beşê da tên damezrandin. Ev rewş li Başûr û Rojavayê çawa ye, ez pê nizanîm.

**J.B:** Gelo bi ya te kovar dikare bi rola arşîvê jî rabe?

**M.G:** Helbet her kovar dikare arşîveka xwe saz bike. Lêbelê ev sîstem li bal me kurdan peyda nebûye, çî ji bêderfetîyê û çî jî ji ber nezaniya giringîya arşîvan. Me hîn fam nekirîye ku arşîv çî ye û çawa tê avakirin. Her kesê ku li mala xwe, xwedî pêncî- sed heb kitêb, nivîs an jî fotoyan in ew di nivîsên xwe û medyaya civakî da wekî çavkanî dinivîsin, ji arşîva min. Kêm kovar ên wekî *Riya Teze* hene ku weşana wan demeka dîrûdirêj berdewam kirîye, û ji bo avakirina arşîveka rojnameyê li welatên Sovyetê derfet hebûn. Wekî ez têgihîştîm, arşîveka wê rojnameyê hebû.

**J.B:** Gelo tu keresteyên ku berhev dikî, wan çap dikî yan jî diweşîni? Li ku derê? Çawa?

**M.G:** Min kitêbek ku ji kilam û destanên epîk ên dîrokî pêk tê û derbarê serhildanên civakî da bû çap kir. Ez niha çar pirtûkên ji nimûneyên berhevoka xwe ya ji zargotinê pêkhatî amade dikim. Ez bawer im dê heta dawîya vê salê biqedin û sala pêşîya me jî bîn çapkirin. Min gelek caran di kovaran da lêkolînên mijarên wekî dîrok, kesayetî û cihwarên hin kilaman weşandin.

**J.B:** Li gor te ji bo çanda devkî ya kurdî kîjan metodên weşanê/çapkirinê baştir in? Çima?

**M.G:** Ya ewil baştir e ku nimûneyên zargotinê pêşîyê wekî kitêbên serbixwe û akademîk bîn çapkirin. Ya diduyan jî mirov dikare di kovarên taybet da li ser

zargotinê, pirsên bingehîn, taybetîyên kilam û destanan hwd lêkolînan biweşîne û pê ra ji yên orîjînal nimûneyan jî bide.

**J.B:** Tu ji bo weşanê yan jî çapê berheman çawa hildibijêrî? Ji bo te ya giring çî ye?

**M.G:** Min di pirtûka xwe ya “Zargotina Kurdên Serhedê (Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildana)” da kilam û destanên epîk li gor dîroka mijarên wan hilbijart. Di lîsteya berhemên pirtûkê da, kilamên ji sedsala 11 û 12an dest pê dike heta kilamên dawîn ên berxwedana Araratê, hene. Bi vî awayî em dikarin cihê kilamê di dîrokê da destnîşan bikin û li gor wê jî lêkolînan li ser mijara wê, alîyê wê yê edebî bikin û dengbêjên wê kilamê dîyar bikin. Wekî mînak, destana epîk a “Hemê Mûsikê”yê li hemû herêmên kurmancîaxêv navdar e. Mijara wê egîdîya li ser du birayan e, Hemê û Gelhê ku ew ji eşîra Berazî<sup>1</sup> ne, ew û xwişka xwe, Zeyneb, li dijî dewleta osmanîyan e. Em di çavkanîyên osmanîyan da jî li rastî agahîyên wan bûyeran tên û tê da dibînin ku Hemê di sala 1845yan da ji alîyê dewletê ve hatîye dervekirin. Kilameka bi navê “Gulê Dêran” heye ku heta niha jî piranîya dengbêjan wê distirên. Mijara wê şerekî navxweyî ya malmezinên Eşîra Hesenan li zozanên Milazgirê ye. Ez di pirtûka C. F. Lehman Haupt, ‘*Armenien Einst und Jetzt*’<sup>2</sup> ji sala 1910an (rûpel 357) li rast hatim ku wî di sala 1899an da li Botanê ev kilam ji dengbêjekî guhdarî kirîye û nivîsandîye. Balkêş e ku piştî sed salan jî di naveroka kilamê û navên kesayetî û cihwarên tê da ne neguherîne.

**J.B:** Armanca te ya çapkirinê/belavkirinê çî ye?

**M.G:** Armanca min a sereke ew e ku xebateka zanyarî pêk bînim û ji bo vêya jî mijara dengbêjan bi min gelek balkêş tê. Berê kurdan jîyana xwe bi ziman û çanda xwe dimeşandin. Zimanê dengbêjan gelek xurt e û agahîyên dîrokî yên di berhemên wan da jî pir balkêş in, ew raste rast girêdayî dîroka kurdan in. Dê ev berhem ji bo civakê, bi taybetî jî bo zimanzan, etnolog û dîrokzanan wekî çavkanî

<sup>1</sup> Berazî, konfederasyoneka ku ji gelek tayfeyan pêk tê, bi piranî li herêmên wekî Pîrsûs û Kobanê da cihwar in.

<sup>2</sup> Carl Friedrich Lehman-Haupt (1938–1961) profesorekî alman ê rojhilatnasîyê bû. Wî di salên 1898-99 an da li Bakurê Kurdistanê û Ermenistanê rêwîtiyek ji bo lêkolînan derbarê urartû, kurdan û ermenîyan pêk anî, û wekî encama wê rêwîtiyê ev pirtûk weşand.



û materyal gelek bi kêrhatî bin. Hunermendên hemdemîn dê jê sûdê bigirin, gelek ji van destanên epîk dê di paşerojê da bibin film, şano û opera. Di van pênc-şeş salên dawî da dora pîst û pêc-sî xwendekarên zanîngehê ku ji bo dîploma yan jî masterê, mijarên zargotinê amade dikirin bi min ra ketin têkiliyê û wan alîkarî xwest. Ev danûstandineka gelek xweş e, mirov pir tiştan ji hevdu hîn dibe.

**J.B:** Tevgerên weşanxane û cureyên weşanên kurdî, li gor salên berê li hember berhemên çanda devkî guherîne?

**M.G:** Sed- sed û pêncî sal berê, hin zanyarên bîyanî nimûyên çanda devkî ya kurdî weşandibûn. Li Kafkasyaya Başûr, berhevkirin û weşandina wê ya bisîstematîk piştî salên 1930î li Sovyeta berê hat meşadin, bi keda Heciyê Cindî, Nûra Cewarî, Ordîxan, Celîl û Cemîla Celîl bi deh hezaran nimûneyên zargotinê hatin çapkirin. Wan ji derfetên disîplîna zanîngeh û dezgehên welatê Sovyetê feyde girtibûn. Ev yek mînaka herî balkêş bû ji bo xebatên di vê beşê da. Li Bakurê Kurdistanê, di van dehsalên dawî da hinek berhevokên kilam û çîrokan hatin weşandin. Lê mixabin bîngeha wan ne li gor pîvanên zanyarîyê ye. Wekî mînak, ez bi dengbêjên wekî Kerem, Şakiro û gelekên din ra rûniştîme û min kilamên wan qeyd kirine, piştra jî ew çap kirine. Niha yekî din jî radibe heman kilamê ji Youtubeê digire û çap dike. Di navbera wan da cudahîyek tune ye. Lêkolerên niha divê biçin li dengbêjan an jî bêjerên (zarbêj) din ên beşên cuda bibînin, bi wan ra rûnên û qeydan bigirin. Hîn jî gelek materyalên neberhevkirî di bin xetereya windabûnê da ne. Divê em bifikirin ku zanyarên wekî Heciyê Cindî, Nûra Cewarî, Ordîxan, Celîl û Cemîla Celîl tenê di nav sî-çil hezar kurdên Sovyetê da bi ser hev qasî bîst û penc-sî hezar rûpel nimûneyên zargotinê berhev kirine. Ango li Bakurê, ew beşa ku bi milyonan kurd lê dijîn, ku mirov bi sîstematîk û akademîk xebat bike, dikare deh car zêdetir nimûneyan bibîne û berhev bike.

**J.B:** Tu dixwazî versiyona çapkirî ji bo kê be?

**M.G:** Helbet di serî da ji bo akademîsyenan, herwisa wek çavkanî jî ji bo nivîskarên wêjeyê, stranbêjan û hemû dilxwazên kilam û destanan.

**J.B:** Gelo tu ji bo berhemên çapkirî pêşgotin an jî şirove dinivîsî? Çima û wan çawa diafirinî/dinivîsî?

**M.G:** Ger mirov di çapa berhevokên zargotinê da derbarê xebata xwe û materyalên berhevkirî da agahîyan nede, famkirina wan ji bo xwendevanan dijwar dibe. Min di kitêba xwe da şiroveyek bi qasî sê rûpel weşand. Ji ber ku ekola dengbêjîyê gelek kevn e, çiqas ji destê min dihat, min hewil dida xwe bigihînim agahiyên ji kûrahîya dîrokê. Ya din jî ji bo min pîrsa herî giring ew bû ku em ê vê ekolê çawa binirxînin, cihê wê di nav stranbêjî û muzîka dinyayê da çawa destnîşan bikin. Ji bo bersiv û şiroveya van nivîsên zanyar û gerokên heyamên berê yên li Kurdistanê gelek bi kêrhatî bûn, min li ser wan lêkolîn kir. Mijara din jî şopandina bûyeran, leheng û cihwarên kilam û destanên epîk di nav rûpelên dîroka nivîsandî da bû. Di van hemû babetan da, bi fikra min gelek encamên balkêş peyda bûn.

**J.B:** Gelo ji bilî çapê/weşanê tu/yan hevalên te bi rêyên cuda ji bo belavkirina çanda devkî ya kurdî digerin (mesela festival, şano, pêşkêşên cuda û hwd)? Eger hebin tu dikarî çend nimûneyan bidî?

**M.G:** Herçiqas berîya çand salan di vî warî da kêmbê jî hin derfet hebûn, lê niha êdî qet tune ye. Heta niha tenê Zanîngeha Artuklûyê carekê di Nîsana 2019an da li ser çanda dengbêjîyê sempozyûmek li dar xist. Salê carekê jî hin lêkolêr dikarin di pêşangehên pirtûkan ên Amedê da gotaran pêşkêş bikin.

**J.B:** Pêwîstîyên herî giring ji bo komkirina çanda devkî û avakirina arşîvên çanda devkî çi ne? Problemên herî mezin çi ne?

**M.G:** Ez dikarim bi kurtasî tenê qala rewşa li Bakurê bikim. Heta niha berhevkirineka zargotina kurdî li wir pêk nehatîye, ji bilî çend nimûneyên gelek kêmbê. Pareka mezin ji vê çandê ji salên 1990î pê ve winda bû, bêjerên wan mirin û ew berhem nehatin komkirin. Ji wê pê ve civaka kurd hat îdeolojîzekirin, ji alîkî ve dewletê bi partî, cemaet û dezgehên xwe û ji aliyê din ve jî rêxistinên polîtîk ên kurd bi çarçoveka teng a îdolojîk ve civak dorpêç kirin. Bingeheka gelek xurt a çandî li bal kurdan hebû ku ew ji kûrahîya dîrokeka dîrûdirêj pêk hatibû û li dijî asîmîlasyonê

baş li ber xwe dabû. Ev bingeh hat guhertin, axaftina kurdî, çîrokbêjî, dengbêjî hwd nikaribûn bi awayekî hemdemîn berdewam bikin, li dewsa wan ayînên olî û kilamên ku pesnê îdolojîyan didan, derketin pêş. Herçiqaş bi hewildana pareka ronakbîrên dilxwaz çend dezgeh hatin damezrandin jî, derfetên wan tunebûn û nikaribûn xebatên ampîrîk organîze bikin û bidin meşandin. Jixwe dewlet jî gavên wisa dişopîne û dema xebatên rêkûpêk ji bo parastina çanda kurdî dest pê dikan, wan qels dike yan jî difetisîne. Çend dezgehên ku bi armanca lêkolîna ziman, çand û wêjeya kurdî hatin avakirin jî ji ber astegîyên îdeolojîk naveroka wan vala bû yan jî hatin girtin.

**J.B:** Fikrên te ji bo çareserîya van probleman çi ne? Pêşnîyazên te hene?

**M.G:** Niha derfetên ji bo komkirina zargotina kurdî gelek hindik in. Dewlet alîkarîya van xebatan nake, bi ser da wan asteng dike. Helbet di van mercên dijwar da jî kesên ku dixwazin li Bakurê, vê xebatê bimeşînin hene, lê divê Başûr, Rojava û şirketên şexsî alîkarîya wan bikin.

**J.B:** Cih û rola jinan ji bo parastin û komkirina folklorê kurdî çawa dibînin?

**M.G:** Di demên borî da rola jinan di parastina zargotinê da sereke bû, ew di warên wekî ziman, çîrok, dilok, kilamên şînê da û herweha di dengbêjiyê da gelek çalak bûn. Di warê komkirina nimûneyên zargotinê da tenê çend nav derdikevin pêş, wekî Nûra Cewarî û Cemîla Celîl ku wan xebatên rêkûpêk amade kirin û weşandin. Bi bawerîya min, jinên lêkoler dikarin xwe baştir bigihînin bêjerên zargotinê yê ku niha bi piranî jin in û li gundan dijîn.

**J.B:** Di berhemên folklorî da kîjan motîfên jinê yan jî lehengên jin zêde bala te dikişînin yan îlhamê didin te û li ser karê te bi tesîr in? Tu dikarî nimûneyan bidî û taybetmendiyên wan îzah bikî?

**M.G:** Di dereca pêşîn da Wardê ya dîya “*Kerr û Kulik*” an bala min kişand. Wardê wekî pêlwanekî xurt e, di gulaşeka bi şivanê axayî ra bi ser dikeve û pê ra dizewice. Du kurên wê çêdibin, mêrê wê dimire, bi tena serê xwe wan mezin dike. Ev her du

lawên wê, gelek meceraperest in, serê wan dikeve gelek qal û belayan, Wardê jî tim li pey wan digere, wan vedigerîne, şîretan li wan dike. Dixwaze ku ew bi xîret bin, lê neheqîyê jî tu car qebûl nekin. Motîfeka xurt a di civaka kurdan da heye: Jina bixîret. Ji dema berxwedana Araratê kilam li ser Zeynoyê hatine sêwirandin, ew û mêrê xwe Reşoyê Silo rêvebirên desteyeka ji şerkaran in. Di dawîyê da Reşo tê girtin, lê Zeyno tekoşîna xwe berdewam dike. Leşger Reşo dibin nêzîkî şikefta ku Zeyno tê da ye û ew bang li Zeynoyê dikan. Bi vî awayî her du jî tînen kuştin. Serê Reşoyî û Zeynoyê jê dikan, li ser piştê hespan li gund û bajaran digerin. Di kilaman da tê sêwirandin ku porê wê ji ser piştê hespê ber bi jêr daliqîyabû û bi meşa hespê ra dihejîya. Di rastiye da jî şahidên wê demê hebûn û ev bûyer dîtibûn. Xurtîya jinê, bi motîfa serwextbûn, hûmor û fantezîya wê jî diyar dibe. Ev yek di gelek çirok û qewlikan da jî diyar dibe.

**J.B:** Kîjan dengbêjên jin yan jinên kurd ku girêdayî çand û zimanê xwe ne û ew parastine, bandoran wan li ser te heye? Eger hebe tu dikarî bibêjî çawa bandor li te kirine? Nimûneyan bide û taybetmendiyên wan îzah bike?

**M.G:** Li Serhedê di dawîya sedsala 19an da dengbêjeka bi navê Pero, bi her du çavan kor hebûye. Ew demekê li herêma Milazgirê dima, piştê çûye herêma Ebexê û bûye dengbêja koşka Evla Begê<sup>3</sup>. Min çend kilamên wê ji dengbêjên cuda berhev kirin. Ji heman sedsalê min stanbêjeka ji herêma Sinendajê di kitêbeka gerokekî da tespît kir, mixabin navê wê nehatîye nivîsîn, lê du fotoyên wê te da hene. Fotoyek portreya wê ye, ya din da jî ew tev koma xwe diyar dibe. Ev hunermend bi min gelek balkêş hat, ez hin jî derbarê wê da lêkolînê dikim. Herweha Meryam Xan gelek bala min dikişîne. Ew tenê çil û pênc salan jîyaye. Ji gundekî herêma Şirnexê çûye Başûr û Bexdayê. Ji sala 1936an pê ve li bal şirketên dengtomarkirinê stranên xwe qeyd kirîye û plak weşandîye. Di radyoya Bexdayê da bûye yek ji hunermendên sereke, dengê wê li hemû Kurdistanê belav bûye. Taybetîyeka wê ya gelek balkêş jî ew e ku wê dora du sel kilam berhev kirîye, li ser wan xebat kirîye û ew bi dengê xwe qeyd kirîye. Meryem Xan weke jin, stranbêja pêşîn e ku bi wêrekî xwe gihandîye derfetên hemdemîn û bidisîplîn, bi rêkûpêk û serfirazî wê hunera xwe meşandîye.

---

<sup>3</sup> Li gor gotina dengbêjî, Evla Beg yek ji torinên eşîra Heyderan bû, û li Ebexê (Çaldêranê) qesra wî hebû ku bi navê *Koşka Evla Begê* navdar bû.

**J.B:** Nirxên çanda devkî û rewşa jinan ku behsa çandê dike û wê pêşkêş dike çawa dibînî? Gelo tu pewîstî bi rexnekirinê yan guhartinê heye? Îzah bike û nimûneyan bide?

**M.G:** Ji ber ku jîyana civaka kurdan berê bi piranî li ser bingeha eşîrî û nîvkoçerî dimeşîya, karê wan ê sereke xwedîkirina ajalan bû, û ev kar ji alîyê mêr û jinê ve bi hev ra dihat meşandin, bandora vêya li ser têkilî û jiyana wan a civakî çêbû. Hurmeta jinê li hember civakên cînar li bal kurdan zêdetir bû. Jinên kurd xwe venedîşartin, ew li nava gund û zozanan azad dimeşîyan, beşdarî civatan dibûn, hejmara wan kêm be jî carinan wekî seroka eşîran derketine pêş. Di afirandin û pêşkêşkirina zargotinê da, ew jî gelek çalak bûn, di kilaman da dikaribûn hestên xwe bêasteng bînin ziman. Di zargotinê da nihêrîna li hember jinê li ser esasê dualîzmê avabûye, ango peyvên wekî: *jina çê û neçê, jina biesil û ya bêesil, jina ku mêrê xwe rezîl dike û jina ku wî ezîz dike*, pir tîn dubare kirin. Helbet ev nêrîn li hember mêran jî kêm zêde wisa ye, lê di derbarê jinê da zêdetir derdikeve pêş.

**J.B:** Tu kilam û destanan çawa ji hev cuda dikî?

**M.G:** Taybetîyeka hevpar a her du cureyan jî ev e ku ew li ser kafiyyeyan avabûne, lêbelê rêzên wan bêpîvan in, wekî helbestên hemdemîn azad in. Cudahîya pêşîn di forma wan da ye, piranîya kilaman ji sê heta şeş bendan pêk tînin, her bendeka wan li ser kafiyyeyeka cuda ava dibe. Lêbelê çarçoveya destanên epîk gelek firehtir e û her yek ji wan ji serî heta dawîyê bi piranî li ser tenê kafiyyeyekê dimeşe. Wekî mînak, dema mirov wan dinivîse, kilamek ji rûpelekê yan jî ji du rûpelan pêk tê, lêbelê destanek epîk herî kurt (wekî Hiso û Nazê) ji pênc rûpelan heta sed û bîst rûpelan (wekî Mem û Zînê) pêk tê. Cudahîya di navbera wan da ji naverokê jî dîyar dibe. Mijara kilamê tenê yek bûyer e, di yên evînî da momentek e û di yên dîrokî da bi piranî danek an jî rojek e. Di kilamê da dengbêj raste rast dikeve nav bûyera ku mijara wê kilamê ye, şerek qewimîye, mirovek hatîye kuştin, ev moment tê şirovekirin, tê da tenê navê çend mirov û cihwaran dîyar dibin. Di destanên epîk da şiroveya dem û wextî gelek firehtir tê meşandin, pirî caran hemû jiyana qehremanê wê dîyar dibe, em tê da hemû ferdên malbata wî, navên gelek cihwaran nas dikin û tê da gelek bûyer diqewimin. Wekî em di destanên mîna *Mem û Zînê* ya zargotinî

da jî dibînin, di destpêkê da cihwarê bûyeran wekî bajarê Mixrib/Muxurzeminê tê şirovekirin, piştra qesr, dem û dezgehên qehremanan (Mem û Zînê). Bûyer piştî vê destpêkê li pey hev diqewimin. Dengbêj di destanên epîk da pirî caran guhdaran ji cihên wan radike, wan datîne ser baskên perîyên wek Tavbano, Hîvbano, Stêrbano û wisa wan difirîne dinyayeka xeyalî, piştra jî wan gav bi gav peya dike ser cihwarên rasteqîn ên qewimandinên destanê. Destana epîk a bi navê *Hamê Mûsikê* jî dişibîne, romanên klasîk. Perspektîfa dengbêj wek zûma kamerayekî ji nêrîneka berfireh gav bi gav, lê bi bêhnekê ve xwe digihîne deqa herî piçûk; dinyaya rengîn, berîya jêrîn, li berîyê komek konên vegirtî, konek ji konan, kulavekî raxistî, li ser kulavê Hamê, di rex da birayê wî Gelhê, di guhên wî da guharê zêrîn, di destê wî de gopalê zîvîn û fikrên ku serê wî pê mijûl e.

**J.B:** Di rûpela sî û yekî da, tu behsa “destaneka zargotinê ya edebî” dikî, li vir qesta te ya “edebî” çi ye? Qesta te tradîsyonel an jî wêje ye?

**M.G:** Di kilam û destanên epîk da şiroveyên wêjeyî gelek balê dikşînin, mirov dikare gelek ji wan wekî helbestên lîrîk ên bidevkî binirxîne. Dema dengbêj ji bûyereke haydar dibû û dixwest li ser wê kilamekê bisêwirîne, ew diçû cihwarê bûyerê, bi mirovên têkildarî bûyerê û yên li derdore pirsîyar dikir, ango lêkolînek li dar dixist. Piştra jî li gor sîstema ku ew tê da perwerde bûbû, kilam çêdikir. Herweha zimanê ku dengbêj bi kar tîne gelek bilind e, ew pir caran bi metaforan şiroveyan dikin. Wekî mînak, dema ew di kilameka şerî da dibêje, “îro sîwaran sîwar didan bêrîyê”, divê ez fam bikim ku komek ji şervanên bihêz di nav tevgera êrişê da ne. Dengbêj ev moment şibandîye bêrîvanîyê, mîyên ku guhanên wan tije şîr bûne ber bi bêrîvanê ve dicedînin ku zûtir guhanên xwe vala bikin. Heman moment di şiroveya di destaneka epîk da zêdetir bi metaforan û bi dûr û dirêj tê meşandin, di wê da bihêzbûna şervanan bi şiroveyeka dirêj a xurtbûn û çalakbûna hespên wan tê destnîşan kirin.

**J.B:** Kurdên Ermenistanê navê *Entabê* bi kar tînin û Ahmet Aras jî di pirtûka xwe ya *Evdalê Zeynikê* da navê herêmeka *Entabê* bi kar anîye. Ez cara yekem e dibihîzim ku Entab çi ye û ferma wê di gel Serhedê çi ye?

**M.G:** Ev herêm îro bajarê Tutak/Dutax û derdora wê ye û girêdayî wîlayeta Agirîyê ye. Di sedsala 19an da navê wê herêmê bi kurdî *Entab/Entaw* û di nivîsên osmanî da jî *Ayîntab* bû. Ew wê demê wekî qezayekî girêdayî sancaxa *Bazîdê* bû. Şênîyên wê herêmê bi piranî ji eşîra Sîpkan in, herweha parek jî ji eşîrên Mankî û Xelesinî ne.

**J.B:** Li gor te tesîra zargotinê ji bo çanda nûjen a kurdî çawa ye yan jî divê çawa be?

**M.G:** Di jiyana çandî ya kurdan da, zargotinê cihekî sereke digirt. Piştî sîyaseta asîmilasyonê, li Bakurê, ev kevneşopî jî li rastî astengîyan hat, her çû lawaztir bû. Ger asîmilasyon nebûya, zargotinê jî wê di dema nûjen da xwe bi meşeka (sêyr) azad biguherta û bibûya çavkanîyek gelek giring ji bo çand û wêjeya nûjen. Lê dîsa jî em dibînin ku bandoreka wê ya gelek xurt li ser wêje û muzîka kurdî ya nûjen heye. Leheng û mijarên zargotinê wekî *Kela Dimdimê*, *Evdalê Zeynikê*, *Dewrêşê Evdî*, *Zembilfiroş* hwd bûne qerekerên sereke yê romanana. Zêdetir jî têkilî û tesîra wê li ser muzîka kurdî heye. Hunermendên hemdemîn dizanin ku di kevneşopîya hunera stranbêjîya kurdî da têkiliyeka xurt bi qewimandinên civakî ve heye. Loma jî wekî mînak, di dema bûyerên li Şengal û Kobanî da hema di nava çend mehan da hunermendan dora pênc sed vîdeokilîp amade kirin û weşandin. Hetanî berîya pênc-şeş salan, li Bakurê, weşanxaneyên kurdî nedixwestin berhemên zargotinê biweşînin. Lê niha baldarîyek peyda bû û di vî warî da jî pêşketin çêdibe. Pirtûkên zarokan jî tînan weşandin, hinek ji wan berhevok bin jî, dem bi dem ên wekî berhemên nivîskaran jî ronahî dibînin ku mirov di wan da jî bandoreka eşkere ya zargotinê dibîne.

# Nadire Guntaş Aldatmaze de roportaj

Nadire Guntaş Aldatmaz is a writer, folklorist, and Zazaki language teacher. She wrote her thesis on Kirmanc/Zazaki folklore at Mardin Artuklu University. Her primary focus in this thesis was Dersim folklore and beliefs. According to Nadire, folklore has an important place in the Alevi system of beliefs; in Dersim, the religious tradition was never based on a book but passed orally from generation to generation, and some religious figures have changed over time. She has written several books and is a member of the Vate group and their editorial board.

Nadire Guntaş Aldatmaz cigêrayoxe, nuştoxê û mamosta ya. Aye Unîversîteya Artuklu de qîsmê zîwan û edebîyatê kurdî de folklorê kirmancan ser o yew xebata tezê masterî hadre kerde. Merkezê xebata aye folklor û bawerîya Dêrsimî bî. Goreyê Nadire, folklor de bawerîye cayêko muhîm gêna. Bawerîya kirmancanê (zazayanê) Dêrsimî girêdayîyê yew kitabî nîya û tayê cayan de tayê çî bedilyayî, no ridra aye giranîya xebata xo da folklorê kirmancanê Dêrsimî ser. Aye çend kîtabî bi zîwanê zazakî de nuştî û a nika endama Gruba Xebate ya Vateyî<sup>1</sup> ya û çend serrî yo zî a redaksîyonê grube de ca gêna.

**Esat Şanlı:** Keremê xo ra name û peynameyê xo vacê û tayê xo bidê naskerdene (şîma ça/kotî ra yê, çend serre yê, çî karî kenê?)

**Nadire Guntaş Aldatmaz:** Ez Dêrsim ra ya. Çar serrî ra na het ez malimîye ra teqawit bîya û na linge de tena bi kirmancî eleqedar a.

**E.Ş:** Şîma tradîsyonê fekkîyî ser o xebetîyayî. Şîma eşkenê tayê qalê destpêka xebata xo bikerê, senî dest pêkerde û dima senî aver şîye?

---

<sup>1</sup> Grûba Xebate ya Vateyî, yew gruba ke standardîzasyonê zazakî ser o xebityena. Serra 1996 de hetê yew grubê zazayan ra Swêd de ameya ronayîş. Ronayoxê na grûbe rewşenbîr, ziwannas, cigêrayox û nuştoxê kirmancan ra yenê pê.



**N.G:** Destpêkê xebata mi tena hîssî bî. Yanî ez girêdayîyê domanînya xo bîya. Pîrika mi, kalikê mi heme dinyaya domanînya mi de zaf muhîmî bîy. Mi vatêne qey mi ke sanikê înan xo vîrî ra kerdî, ê mirenê. Coka mi sanîkî qeyd kerdî çike o wext nuştêna kirmanckî ra xebera mi çin bîye.

**E.Ş:** Çira folklorê Kurdkî (bitaybetî yê Zazakî) bala şima anceno?

**N.G:** Seke mî cor de zî va ez kesa ke teber ra baldarê folklorê kurdan a, a nîya. Ez bixoy kurd a û tirkî mekteb de musa. Yanî ez zereyê tradîsyonê komele de bîya pîl û mi nêwaşt ke nê tore û adetê ma vîndî bibê.

**E.Ş:** Şima key dest bi xebate kerde?

**N.G:** Wexto ke Unîversîteya Artuklu de qismê kultur û edebîyatê kurdkî a bî o wext mi dest bi xebata nuşteki kerd. Folklorê kirmancan ser o mi xebatêki sey tezê masterî amade kerde.

**E.Ş:** Şima ça/kotî û kamecîn mintiqeyan de motîfê edebîyatê fekkîyî arê dayî?

**N.G:** Merkezê xebata mi Dêrsim bî. Çike folklor de bawerîye cayode muhîm der a. Bawerîya kirmancanê Dêrsimî girêdayîyê yew kitabî nîya û tayê cayan de tayê çî vurînê, coka bi giranîye mi folklorê kirmancanê Dêrsimî nuşt. Ney ra teber tayê materyalê folklorî zî mi der û dorê Dîyarbekir û Sêwregî ra dayî arê.

**E.Ş:** Şima xebata xo ya folklorîke bi çî awayî fînanse kerde?

**N.G:** Fînanzmanê xebeta xo mi bixoy kerde.

**E.Ş:** Kovare/organîzasyon/keyepelê înternetî yê ke kultur û folklorê Kurdkî (bitaybetî yê Zazakî) yê ke şima înan dir pîya xebetênê estê, yan zî têkilîyêka şima înan dir esta?

**N.G:** O wext, wexto ke mi dest bi nê karî kerd, tekilîya mi bi kesî çin bîye. Pede pede mi tayê rojname û kovaran rê nuşt. Dima zî ez bîya endama Gruba Xebate ya Vateyî û çend serrî ra tepîya zî ez nika redaksîyonê grube de ca gêna.

**E.Ş:** Tradîsyono fekkî seba şima yeno çî mana? Şima ey senî pênase kenê?

**N.G:** Tradîsyono fekkî seba mi heme heyatê komele yo. Qanun û qeydeyê ciwîyayîşê komele yo. Kirmancan de çîyo nuşteki çin o. Heme perwerdeyê domanan û organîzasyonê heyatê rojaneyî bi tradîsyonan beno. No zî generasyon bi generasyon (az bi az) bi fek yeno kirişnayene û çîyo ke taybetmendîya yew komele belî keno zî no yo.

**E.Ş:** Bi şima kamcîn term seba xebatanê winasîyan hîna raşt o; tradîsyono fekkî, edebîyato fekkî yan folklor? Şima kamcîn şuxulnenê? Eke şima yewna term şuxulnenê keremê xo ra binûsê.

**N.G:** Ez çekuya folklorî hîna munasîp vîna. Çike qepsemê folklorî hîna hîra yo. Merdim eşkeno hem edebîyato fekkî hem tradîsyonan zereyê folklorî de bihesebno.

**E.Ş:** Gama şima folklor arê danê bala şima hîna zaf çiyî ser o ya?

**N.G:** Ez hem sanikan de hem zî organîzasyonê heyatê rojaneyî de eleqedar a. Ma vajîme, maya xo ra bîyayîşî ra bigê heta toreyê cenaza senên o, ez nînan ser o vindena. Sanikî zî zaf muhîm ê çike kulturê komele teder o.

**E.Ş:** Kamcîn tewirê tradîsyonê fekkîyî hîna zaf bala şima ancenê? Nimûneyan bidê.

**N.G:** Tradîsyonê bawerîye zaf baldar ê. Serê dinya de ke çend dînî û încanê nasî estê merdim eşkeno tey bivîno. Sanikî zî zaf muhîm ê, sanikan de cuya şarî, bawerî, qanûn û qeydeyê ciwîyayîşî zî est ê.

**E.Ş:** Eceba/Tirêm arêdayîş de şima versîyonanê orjînal an yê nêorjînal an ra cîya kenê?

**N.G:** Heta nika mi tena kalan ra pers kerdo û çîyo ke înan mi rê qisey kerdo o yo. Yanî mi gore orîjînal ê. Tabî ke ez sey yew profesyonele nêzana kamcîn versiyon orîjînal o. Ez vana tespîtkerdîşê nînan yew hunerode bîn o. Keso ke temamen eleqedarê folklorî yo belkî o bizano. Çike seba tespîtkerdîşê materyalanê orîjînanan gerek merdim heme mintiqayan ra numuneyan arêbido û şeklê ciwîyayîşê kurdan o tewr kan bizano. Yanî hîna ke tesîrê dînan, hîna ke tesîrê Îslamî çîn bîyo, ciwîyayîş û tradîsyonê ê wextî bigêro. Ez vana qey materyalê tewr orîjînalî hetê Dêrsimî der ê. Çike tesîrê Îslamî tewr senik Dêrsim de bîyo.

**E.Ş:** Şima qe berhemêko nêorjînal arşîvê xo ra red kerd û vet?

**N.G:** Tayê sanikê ma çarnê re tirkî ser, ez înan qet hesab nêkena. Çike tîya de ziwane çiyode bingeyîn o.

**E.Ş:** Bi şima tesîrê deyîr/kilam/deyîş û terzê cuya vatoxanê nînan tradîsyonê nûşteki/modernî ser o esto?

**N.G:** Mi gore esto. Heme kulturen de edebîyato fekkî daîma bîyo bingeyê edebîyatê modernî, uca ra bîyo weyî. Hem edebîyatê dinya de hem yê tirkan de hem zî yê ma de tesîrê edebîyatê fekkî zaf o. Seke yeno zanayene roman yew tarz o modern o la zafê motîfê ci tesîrê edebîyatê fekkî de mendê. Nê romanên modernan de zaf efsaneyi, sanikî û motîfê sey nînan est ê.

**E.Ş:** Tirêma ê tekstê ke şima arê dayê seba cuya şima hetkariya înan qe virazîyena? Yanî çarçiwaya exlaqîye de paştî danê şima? Mesela gama cuya şima de çiyêko taybet (xusûsî) biqewimîyo ê xebatê şima kewenê şima vîrî yan zî şima înan anê xo vîrî? Nimûneyan bidê.

**N.G:** Hetê psîkolojîkî ra hetkarîya mi kenê. Seke ez bi arêdayîşê nê materyalan hîna zaf ez a. Ez ciwîyayîşê kulturê ma de xo mesul vînena, ez ke teba nêkerî, sey zaf kesî xo vîrî ra bikerî bena qetîl. Coka xebata kirmanckî mi rê sey terapî ya.

**E.Ş:** Şima berhemê tradîsyonê fekkîyî arê dayî (danê). Şima eşkenê na yewe tayê îzeh bikerê yanî şima bi çi hawayî na xebate kerde (kenê)? Metodê şima çi yê?

**N.G:** Ez bi aparatê qeydkerdîşî xebetîyaya. Mi şar da qiseykerdene û qeyd kerd. Aparatê qeydkerdîşî de mi numre da be qisman, kamcîn qisim de kam esto mi numre kerdî û dima transkrîbe kerdî. Mi tek bi tek goşdayî û nuştî. Taye çi kî mi not kerdî.

**E.Ş:** Tirê m şima merdim, kurs, zanîngeh yan zî sazîyêk ra nê warî de perwerde girewto? Kamca? Senî?

**N.G:** Mi seba arêdayîşê folklorî caye ra kurs nêgirewto û ez na mewzû de perwerde nêbîya. La mi folklor û arêdayîşê folklorî ser o kitabî wendî û mi methodê înan ra îstîfade kerd.

**E.Ş:** Tirê m rayîrê/metodê arêdayîşê folklorî yê şima yê nikayênî yê verênan ra bîyê cîya? Senî?

**N.G:** Verî ra tena fekkî bî û qismê zî qeydkerde bî. Nika merdim şîkîno hem qeyd bikero hem binuso hem zî sayeya înternetî de vila bikero. Problemê ma teknîkê arêdayîşî ra zêde îmkanê arêdayîşî yê. Yanî hem finansman çin o hem zî atmosfero sîyasî zaf musaît nîyo.

**E.Ş:** Arşîv seba şima yeno çi mana?

**N.G:** Rojê ke qiseykerdîş, nuştîş û perwerdeyê kirmanckî serbest bo û bi îtîbar bo ci rê çîmey lazim benê, arşîv ci rê beno çime. Arşîv hafîza ya. Çike pede pede kokimî mîrenê û keso ke bîyaro vîra xo nêmaneno. Coka arşîv eynî wext de karê kokiman, karê hafîzaya ganî zî keno.

**E.Ş:** Tirê m arşîvê şima esto? Arşîvêko senên o? Ma vacê nûştayê destî, bandê teypî, kitab, dijîtal (komputer) yan zî keyepelê înternetî, keremê xo ra nimûne bidê.

**N.G:** Yê mi tena bantê teyîbî estê. Henî arşîvode profesyonel nîyo. Ez hêvîdara ke rojê muzeya materyalanê folklorî abo û ez çîyo ke destê mi der o teslîmê muzeya folklorê kirmancan bikerî.

**E.Ş:** Arşîvê şima senî yeno namkerdene (yanî nameyê qeydan/rekordan, dosyeyan, ûsn.). Tirê m sîstemêkê şima yê tesnîfkerdişê xebatanê şima esto?

**N.G:** Seke mi va tena bantê teyîbî destê mi de yê.

**E.Ş:** Tirê m şima qe xebatê xo yê folklorîkî sîstemê dijîtalî (komputerî) de zî qeyd kerdê yan zî xebatê ke şima înternetî ser o pare kerdê estê?

**N.G:** Sanikê ke mi dayî arê kompîtur de qeydkerde yê.

**E.Ş:** Tirê m şima arşîvê xo sey “arêdayîşê ercanê/qîmetanê madîyan” yan nê ra zîyadê sey “arêdayîşê ercanê nêmadîyan” yanî sey ercanê manewîyan vînenê?

**N.G:** Arşîvê mino de girs çîn o la sanikan, adet û toreyan ra teber çîyê maddî zî estê. Ma vajîme kincî, cacim ûsn. Helbet materyalê nêmadî zêder ê.

**E.Ş:** Tirê m şima arşîvê xo bi rayîrêk muhafeze kenê/pawenê (mesela vindîbîyayîşî ra, tozî ra, polîsan ra, ûsn...)?

**N.G:** Odaya gurey de (xebatî de) vinderte yê. Ez çîyode taybet nêkena seba pawitiş. Çike heme çî qeydkerde yo, yan zî mi çap kerdê û vila kerdê.

**E.Ş:** Tirê m sazî/organîzasyon/kovare/keyepelê înternetî ke şima pîya şuxulênê xebatanê şima arşîv kenê? Tirê m aşîvêkê înan bi xo esto?

**N.G:** Çîyo ke tayê rojnameyan de çap bîyo xora arşîvkerde yo. Kovarî zî winî yê.

**E.Ş:** Tirê m bi şima kovare yan zî keyepelê înternetî zî eşkenê rolê arşîvî kay bikerê?

**N.G:** Ez nêzana keyepelê înternetî ke amey girewtene se beno. O arşîv beno vîndî yan nê la kovarî manenê. Coka kovarê kulturî ê ke çap bîyê sey yew arşîvî muhîm ê.

**E.Ş:** Tirêman çîyanê ke (berhemanê ke) şîma arê danê, şîma înan çap kenê yan zî weşanenê? Ça/kotî? Senî?

**N.G:** Çîyê ke mi heta nika dayê arê hama hama pêro mi çap kerdê. Ge sey kitabî, ge rojnameyan de, ge ge zî kovaran de çap bîyî.

**E.Ş:** Şîma ra gore kamcîn metodê weşanayîşî/çapkerdişî seba tradîsyonê fekkî yê Kurdî (bitaybetî seba Zazakî) tewr rind ê û çîra?

**N.G:** Seba ke dahîna zor benê vîndî û emrê xo dahîna derg o materyalê nuşteki rind ê. Çîyode bîn kî qeydê vengano. Bi no tore zî vatişo orîjînal maneno. Tabî ma hesabê xo vîndbîyayîşê zîwan ser o kenîme. Eke vîndî mebo her tewir materyal zî muhîm o û pêro zî ma rê sey çimey lazim ê.

**E.Ş:** Wextê weşanayîş/çapkerdişî de şîma berhemanê folklorîkan senî weçînenê? Muhîmîye danê çiyî ser?

**N.G:** Seba komele bîyayîş heme materyal zî muhîm ê. Wexto ke ma biwazîme yew komele bîyîme gerek folklorê xo az bi az bikirişnîme. Her çiqas ke mîyanê materyalan de çîyo ke dahîna muhîm nîyo çin o û heme çî zî lazim ê, ancîya zî xebetnayîşê zîwanî her çî ra ver yeno. Eserê edebîye fekkî hem seba komel bîyayîşî hem zî seba zîwanî zaf muhîm ê. Ez çî ke rast ame dana arê, ez mabêne nê çîyan ra yew nêçînena we. Çike weçînitayîş luks o seba ma. Ma hîna nêameyme a merhale.

**E.Ş:** Bi şîma amacê çapkerdiş/vilakerdişî çî yo?

**N.G:** Tabî ke bi no tore heyatê materyalan qismen beno garantî. Êdî hal be hal vîndî nêbenê. Bêşik rojê ke kirmanckî vîndî bibo şero, manaya nê çîyan zî nêmanena. Hêvî tim esto û ma goreyê ey qisey kenîme.

**E.Ş:** Tirê m weşanayîşê kurdkî (bitaybetî ya Zazakî) yê berhemanê tradîsyonê fekkîyî goreyê serranê verênan nika vurîyeno (bedelêno)? Eke e, senî vurîyeno, şima eşkenê bi kilmekî îzeh bikerê?

**N.G:** Serranê verênan de kurdkî ser o xebityayîş dahîna çetin bî. Qesta mi, da vîstî serrî ra aver o. Dima mabênê serranê 2003 û 2015 de xebatkarê kurdkî bi taybetî kirmanckî zêdiyayî, kare zaf muhîmî kerdî. Belkî tenena aver şî û musay. Nika mabênê gencan de unîversîteyan de kesê eleqadarî zaf ê. Êdî nê karî sey xebatê akademîkî kenê. Merdim şîkîno vajo serranê verênan gore cigêrayîş û arêdayîşê folklorî dahîna bi zanayîş beno.

**E.Ş:** Şima wazenê versîyono çapkerde yê xebata şima qey kamî bo, yanî kesê ke şima wazenê berhemê şima biresê înan kam ê, kancîn dor ê?

**N.G:** Tewr zêde domanî muhîm ê. Vanê nabzê zıwanî domanan de erzeno. Gerek domanî sanikanê ma bi zıwanê ma pêhesîye, bimusê û qisey bikerê.

**E.Ş:** Tirê m şima berhemanê folklorîkan yê çapkerdeyan rê vateyo verên yan zî şîrove nûşt?

**N.G:** Malesef nê. Ez hîna o merhale de nîya. Ez hasbelqeder bi hîssanê xo hereket kena. Yanî ez arêdayoxa profesyonele nîya.

**E.Ş:** Tirê m teberê çapkerdişî/weşanayîşî de şima yan zî embazê şima ro rayîranê cîyayan ê vilakerdişê tradîsyonê fekkî yê Kurdkîyî (bitaybetî yê Zazakî) gêrenê (mesela festîval, tîyatroyê, aktîvîteyê pêşkêşkerdişî yê cîya cîyayî.?)? Ê çî yê?

**N.G:** Falîyetêde mino nîyanen çin o la ez zana Dêrsim de yew gruba tîyatroyî esta (Areyê Kayî) û çîyanê winasîyan kena. Ma vajî roşanê Gaxandî de tradîsyonan anê ca. Kaykerdoxê eynî grube kincanê dradîsyonelan gênê pira.

**E.Ş:** Goreyê şima înternet seba pawitişê edebîyatê fekkî yê Kurdkî (bitaybetî yê Zazakî) eşkeno rolêko senên kay bikero? Seba platformê înternetî ser o pawitiş û averberdişê zıwanî pêşniyazî yan zî fikrê şima estê?

**N.G:** Platformê înternetî mecrayade zaf muhîm a. Gencê na zemanî tim bi înternet eleqedar ê. Merdîm şîkîno na mecra de bi înan tekilîye kewo û bala înan bianco folklorê kirmancan ser. Merdim şîkîno materyalanê folklorî pare bikero û şîkîno dahîna rehet înan reso.

**E.Ş:** Şima têkilîya mabênê edebîyatê fekkî û kulturê modernî senî vînenê?

**N.G:** Na tekilîye ti biewazê nêwazê zî bena. Hîkayeya moderne de miheqeq motîfê folklorîkî benê yan kî uca ra bena weye. Temelê edebîyatê modernî de edebîyato fekkî esto. Edebîyato fekkî zereyê kulrurê modernî de vurîno helbet la çîn nêbeno, xo adapteyê kulturê neweyî keno.

**E.Ş:** Şima kamcîn motîfanê folklorî kultur û edebîyatê modernî de peyda kenê, anê meydan?

**N.G:** Ez bahsê romanê xo bikerî, mesela Pîltane yew romano modern o la tede motîfê folklorîkî zaf ê. Bi taybetî bawerî û şeklê ciwîyayîşê şarî her qismê romanî de ca gêno.

**E.Ş:** Goreyê şima îhtîyacîyê tewr pîlî yê arêdayîşê tradîsyonê fekkîyî û viraştîşê arşîvê tradîsyonê fekkîyî çî yê? Û nê wareyî de problemê tewr pîlî çî yê?

**N.G:** Îhtîyaco tewr pîlî gereke şarê ma yan zî gencê ma biwazê. Çike dewlete teşwik xora nêkena. Dewlete wazena ke wa kes eleqedar mebo. Coka waştene zaf muhîm a. O diyîn finansman o. Eke kes nê xebatan fînanse bikero zaf çî beno. Zaf kes wazeno ke bixebitîyo la îmkan çîn o. Heto bîn ra ters esto. Şarê ma bi nê xebatan zaf mesafeyin o. Çike dewlete tim ters do be şarî. Gerek merdim serbest bo û şar zî bizano ke eke qisey kerd teba nîno sereyê înan ser. Eke nîya bo ancî îmkanê arêdayîşî benê. Yanî xebata kurdkî hende zî rehet nîya.

**E.Ş:** Fikrê şima seba halkerdîşê nê probleman çî yo? Pêşnîyazîyê şima çî yê?



**N.G:** Verê coy gerek qanunê demokratîk bivejîyê û şar bêters bixebitîyo. Dima gerek dewlete bixor nê xebatan fînanse bikero. Ma vajîme yew muzeya folklorî akeroy. Kesê ke eserên folklorîkî arêdayî gerek mukafatê ci bibo. Înan muze de sey mamurî/e bixebetno. Dewlete û şar gerek qiyet bido zîwan û kulturî. Îtîbarê zîwan û kulturî bîjedno. Gerek şarê mayo dewletî, wendox, zanayox heme qiyet bidê nê karî ke îtîbarê kulturê ma zî mîyanê komele de bizêdîyo.

# Hevpeyvîna bi Nîhat Onerî ra

Nîhat Oner was born in the village of Qazî in Agirî (Ağrı). After leaving high school, he took up his studies on Kurdish language and oral tradition, and since 2000 has been collecting Kurdish folklore. For some time, Oner worked as Kurmanji language teacher in the Association for the Study and Development of the Kurdish Language, and in the Bazîd (Doğubayazıt) Municipality. He is interested in all types of Kurdish oral tradition and is widely known in his community as a devoted collector. To date, Oner has published four books on folklore and his new collections are waiting to be published.

Nîhat Oner, li gundê Qazîyê yê Agirîyê hatîye dinyayê. Piştî lîseyê dev ji xwendinê berdaye û dest bi xebatên kurdî kirîye. Onerî ji bo demekê, li Kurdî-Der û Şaredariya Bazîdê mamostetîya zimanê kurdî (kurmancî) kirîye. Oner ji 2000î vir ve, berhevkarîya folklorê kurdan dike. Bala wî li ser her cure keresteyên folklorê ye. Li derûdora xwe wekî berhevkarek jîrek tê nasîn. Heta aniha, Oner çar pirtûkên folklorê çap kirine, û gelek xebatên wî jî ji çapê ra amade ne.

**Joanna Bochenska:** Ji kerema xwe ra ji me ra behsa xwe bike. Nav û paşnavê te çi ye? Tu ji ku yî? Çend salî yî? Tu çi karî dikî?

**Nîhat Oner:** Navê min Nîhat Oner e. Ez di sala 1985an da (di nasnameyê da 1986an) li Agirîyê gundê Qazîyê ji dayik bûm. Li ser folklorê kurdan dixebitim. Niha li navenda Agirîyê dijîm. Min dibistana seretayî li gundê xwe, dibistana navendî salekê li gundê Mengeserê ku gundê azerîyan e, du salan jî li Agirîyê xwend. Demeka kurt çûm lîseyê, lê min dev ji lîseyê berda<sup>1</sup> û xebatên xwe yê bi kurdî pêş da bir. Min ji bo demekê li *Kurdî-Dera*<sup>2</sup> Bazîdê cih girt, lê ew hat girtin. Herwisa min li Bazîdê di pêşdibistana şaredariyê da mamostetî kir. Zewicîme

<sup>1</sup> n.e: Wî lîse paşê ji derve ve xwendîye û xelas kirîye.

<sup>2</sup> Kurdî-Der: Komeleya Lêkolîn û Pêşvebirina Zimanê Kurdî, di sala 2006an da li Dîyarbekirê hat avakirin. Şaxên wê li piraniya navçe, bajarok û bajarên Bakurê Kurdistanê hebûn. Komele bi

û bavê du zarokan im. Ji xeynî pirtûkên min ên çapbûyî, xebateka min li ser Serhildana Agirîyê heye û herweha xebatên min ên wekî kilam, destan, metelok û efsaneyên kurdan hene.

Berhemên min ev in:

- Mîrza Mihemed (Weşanên Avestayê, Çîrok, 2016)
- Dendo (Weşanên Wardozê, Çîrok, 2018)
- Ji Binbîra Kurdan Bawerîyên Gelêrî (Weşanên Wardozê, Mîtolojî û Bawerîyên Pelepûç, 2019)
- Tivinga Kurda ya Çillûle (Weşanên Wardozê, Metelok-Pêkenok, 2020)

**J.B:** Tu li ser çanda dekvî dişixulî, tu dikarî behsa destpêka wê bikî?

**N.O:** Kîjan sal bû baş nayê bîra min, ji malbata Celîlan yek hatibû mîhrîcaneka ku Şaredarîya Bazîdê li dar xistibû, wî li wê derê got, “Serhed, çavkanîya çanda kurdan a devkî ye. Li vê derê xezîneya miletê kurd heye. Eger ev neyên nivîsîn, dê hemû winda bibin.” Vê gotinê gelekî bala min kişand. Ez gelekî li ser fikirîm û min ji xwe pirsî, li Agirîyê bi hezaran welatparêz hene. Lê gelo çend kes ji wan berhavkariyê dikin? Çend kes ji wan tiştêkî dinivîsin. Min dît ku valahîyeka mezin heye. Welatparêz pir in, lê kesekî ku xezîneya devkî ya kurdan berhev bike, binivîse tune ye. Ji ber wê, min ji bo xwe ew wek erkekî dît ku ez çî bibihîsim, gerek binivîsim. Min wisa dest pê kir.

**J.B:** Çima folklorê kurdî bala te dikişîne?

**N.O:** Ez wek kurdekî, hez dikim ku tiştên kurdan ên folklorîk winda nebin. Armanca min a herî mezin ev e. Ya duyem jî ev e ku ez bi vê folklorê mezin bûm, lê di dema me da, bi devkî ew nifş bi nifş derbas dibû. Lê aniha êdî ne wisa ye, mirovên zana roj bi roj kêr dibin. Ez dixwazim ew zarokatîya me ya xweş ya ku me jîya, bila nifşên nû jî bijîn. Ji bo vê yekê jî divê em her tiştên xwe qey bikin, binivîsin.

**J.B:** Te kînga dest bi vî karî kir?

---

sedan xwendekar perwerde kirine. Li ser zimanê kurdî bi sedan panel û konferans li dar xistine. Ew di sala 2016an da ji hêla dewletê ve hat girtin.

**N.O:** Ez ne şaş bim, destpêka salên 2000î bû.

**J.B:** Tu bi kîjan rêxistin (sazî) û kovaran ra dixebitî? Herweha pêwendîya te bi kîjanî ra heye?

**N.O:** Bi tu kesê/î ra pêwendîya min tune ye. Ez wek kesayetekî serbixwe xebatên xwe dimeşînim. Jixwe sazîyeka kurdan a ku li me xwedî derkeve, xebatên me fînanse bike jî tune ye. Çend caran li vê derê kurdan şaredarî bi dest xistin, wan jî kar didan kesên ku ji vê qadê fam nakin. Lê encama vê yekê neyînî bû ku tu xebatek li ser folklorê nehat kirin. Ew hatin û çûn, tu tiştêkî nivîskî nehiştin. Lê li Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê ne wisa bû, wan piştgirî didan berhevkarên folklorê. Encamê vê yekê jî ev bû ku li wir, bi dehan berhemên nivîskî hatin çapkirin. Lê me bi xwe, bi derfetên xwe her tişt kir. Eger sazî yan dezgeheka ku piştgirî bidaya me hebûya, me yê îro deh qat zêdetir berhevkarîyê bikira.

**J.B:** Tu karê xwe çawa fînanse dikî?

**N.O:** Wekî min bersiva jor da jî got, ez bi derfetên xwe dixebitim. Derfetên min ewqas jî ne zêde ye. Carinan ez kalekî yan jî pîrekî dibînim, ez ê herim gundê wan, ez çend rojan pereyan berhev dikim, an jî deyn dikim, û diçim. Gelek caran piştî vegera ji berhevkarîyê, ez çend rojan bêpere mame. Hin caran jî min mirovên zana didîtin, lê ji ber kêmbûna derfetên aborî, ez nikaribûm biçim gundê wan. Lewma wekî min li jor jî got, eger sazîyek piştgirîya me bikira, heta niha me keresteyek berhev kiribe, wê çaxê me yê deh kereste berhev bikira.

**J.B:** Li gor te di navbera zargotina kurdî û lêkolîna te ya bi navê “Îsyana bin Çîyayê Agirîyê<sup>3</sup> da têkilîyek heye?

**N.O:** Serhildana Agirîyê bûye sedem ku ez xwe nas bikim, ji kurdbûna xwe zêdetir hez bikim. Ji alîyê dayîka min ve, yek ji şervanên Serhildana Agirîyê, Edoyê Azîzî, xizmê min e. Ji alîyê bavê min ve jî Ûsivê Redkî, Ahmedê Hecî Biro (Îhsan Nûrî

---

<sup>3</sup> Ev xebat ji sedema aborîyê hê nehatiye çapkirin.

Paşa di pirtûka xwe<sup>4</sup> da qala wî dike) û çend şervanên din, xizmên min in. Herwisa Biroyê Hesikê Têlî, xizmê pîrika (dîya dîya min) min e. Ji ber Biroyî, navê birayekî pîrika min danîne Biro. Di nava malbatê da hertim qala serpehatîyên wan dihat kirin. Em bi çîrokên wan mezin bûn û me xwe û dîroka xwe nas kir, ji miletê xwe hez kir. Ev jî encamek e ku eger me xwe nas nekira, min ê ji folklorê kurdan jî hez nekira û karê berhevkarîyê nekira.

**J.B:** Kevneşopîya devkî ji bo te çî ye? Tu dikarî wê pênase bikî?

**N.O:** Kevneşopîya devkî, ruhên dîroka herî kevn e ku heta îro hatine. Gelekî giring e. Em zarok bûn, dîya cîraneka me ji Bazîdê hatibû, temenê wê gelekî mezin bû. Wê carekê got, eskerên Romê li Grîdaxê<sup>5</sup> milet kuşt, emrê Xwedê hemû hatin, di nava sazan<sup>6</sup> da xeniqîn. Dema ku wê wisa got, me li çavên hevdu nihêrî û me got, eva çî dibêje. Min nizanibû qala Serhildana Agirîyê dike. Ew mir, sal derbas bûn, min pirtûka Garo Sasûnî<sup>7</sup> kirî. Ew beşa ku qala Serhildana Agirîyê dikiş, wiha digot, “Eskerên ku li hemberê miletî komkujî pêk anî, li jêra Çîyayê Agirîyê, di lîlan<sup>8</sup> da xeniqîn.” Çawa ku min ew xwend, gotinên wê jinekê hatin bîra min. Ev çî ye? Garo Sasûnî gotinên wê jinekê di hişê min da piştrast kir, wê jinikê jî gotinên Garo Sasûnîyî. Ez wê rojê baştir hîn bûm ku kevneşopîya devkî, gelekî giring e. Agahîyeka gelekî kurt a devkî, her tişt derxist holê. Ev gotinên min ji bo dîrokê bû. Folklorê jî te dibe demên gelekî dûr, te dibe kûrahîya dîrokê. Gelek agahî û zanîn ji dîroka mirovahîyê, ji mîtolojîya kurdan tên. Em ê berhev bikin, wan bikin malê arşîva kurdî. Dê roj bê, hinek jî bi wan çavkanîyan, li ser kokên xwe lêkolînan bikin.

**J.B:** Dema tu keresteyên folklorê berhev dikî bala te bêhtir li ser çî ye yan jî li ser kîjan cureyî ye?

---

<sup>4</sup> Îhsan Nûrî Paşa, Ağrı Dağı İsyası, Pêri Yayınları, 1992

<sup>5</sup> Grîdax, navekî din ê herêmkî ye çîyayê Agirî ye.

<sup>6</sup> Saz, ew cihên avî yên ku di nav da gelek qamûş hêşîn dibin.

<sup>7</sup> Navê pirtûka wî ev e: Kürt Ulusal Hareketleri ve 15 yy’dan Günümüze Ermeni Kürt İlişkileri, di sala 1992yan da ji weşanên Pêriyê derketiye.

<sup>8</sup> Lîl, cihên wekî celbik, çirax, çirav ra tê gotin.

**N.O:** Bala min li ser çîrok, mîtolojî, efsane û bawerîyên pelepûç<sup>9</sup> e. Ev hemû jî di nava hevdu da ne. Mînakek yek ji bawerîyên pelepûç wisa ye; “Avê di ser agir da neke guneh e!” Tu fam dikî ku ev ji dîroka kurdan a ku dema agir hebandinê tê. Dema tu bala xwe didî çîrokekê, tu dibînî ev tiştekî rast e, ji dîroka kurdan tê, mînaka çîroka Xanê Lepzêrîn. Ji ber wê berhavkarî tenê xizmetê ji folklorê ra nake, herwisa xizmetê ji mîtolojî û dîrokê ra jî dike. Eger kurdan bizanibûna ku karê berhavkarîyê ji bo wan çiqas giring e, aniha, her kesê/î amûreka qeydê hildida û dest bi berhevkarîyê dikir.

**J.B:** Gelo te versiyonên orîjînal ji yên neorîjînal cuda dikî?

**N.O:** Em nizanin kîjan orîjînal e, kîjan neorîjînal e. Ji ber vê, kê çi gotibe, ez orîjînala wê, çawa ku ji devê wê/î derketîye, dinivîsim û li hêvîya xwendevanan dihêlim ku ew biryar bidin kîjan orîjînal e. Mînakekê bidim, min çîroka *Mîrze Mehemedî* li Serhedê zêdetir wekî *Mîrze Mihemed* bihîstîye. Lê ez bala xwe didimê, ew di pirtûkên Hecîyê Cindîyî û Malbata Celîlan da wekî *Mîrze Memûd* derbas dibe. Gelo kîjan orîjînal e; *Mîrze Mihemed* yan jî *Mîrze Memûd*? Li herêmekê cuda li herêmekê din cudatir tê gotin. Divê li ser orîjînalbûnê jî lêkolîn bîn kirin ku meriv bikaribe bibêje ev orîjînaltir e. Mînakek din; di hin çîrokên pirtûkên Hecîyê Cindîyî da Çîyayê Agirîyê wekî *Agirîdax* derbas dibe, lê em li vir dibêjin *Grîdax*. Gelo kîjan orîjînal û kevntir e? Divê li serê lêkolîn bê kirin.

**J.B:** Gelo li gor te tesîra çanda nivîskî û ya modern li ser gotin û tevgerên dengbêjan heye?

**N.O:** Tesîra çanda devkî li ser dengbêjîyê pir e. Lê tesîra nivîsa modern li ser dengbêjîyê tune ye. Berevajî wê, tesîra dengbêjîyê li ser nivîsa modern heye. Jixwe tesîra çanda devkî û dengbêjîyê li ser nivîsa modern hebe, ew zêdetir kurdewar dibe, zêdetir li kurdan tê.

**J.B:** Ez dibînim ku tu zargotina kurdî wekî tiştekî zindî dibînî û giringîyê jî didî metelok û meseleyên kurdî yên li bajêr tînin gotin. Li gor te, rewşa zargotina kurdî ya li bajaran çawa ye?

---

<sup>9</sup> n.e.: Bawerîyên pelepûç, bawerîyên gelêrî yan jî yên batil in.

**N.O:** Mixabin ku li bajaran zargotina kurdan gelekî qels e. Eger ku zargotin li hêvîya bajaran bimîne, em bizanibin ku zargotin mirî ye. Çunkî li bajaran ziman û çanda tirkan serdest e, kurdî û çanda kurdan vê gavê li bajaran li ser pîyan nasekine. Kî mala xwe bar dike bajaran, zarokên wan zimanê kurdî hîn bibin jî ji alîyê zargotinê ve gelekî qels dimînin. Di pêşerojê da eger kurd mafên xwe bi dest bixin, zimanê kurdan, dîroka kurdan, çanda wan bikeve sazîyên dewletê, wê çaxê mirov dê bikaribe li bajaran qala zargotinê bike.

**J.B:** Te behs kir ku keresteyên çanda devkî berhev dikî. Gelo tu dikarî behsa berhevkarîya xwe bikî? Tu vê yekê çawa dikî? Rê û rêbazên te çi ne?

**N.O:**

- Li derûdora min her kes dizane ku ez berhevkarîya folklorê dikim. Hevalên min, nasên min dema ku kal yan jî pîreka zana bibînin, ji min ra dibêjin.
- Ez diçim, dibêjim ez dixwazim ji te hin tiştan tomar bikim. Eger qebûl bikin, dibêjin û ez jî tomar dikim.
- Dema ku dengê wan qeyd dikim, tîm malê vê carê jî dangan deşîfre dikim. Ango li wan guhdarî dikim û dinivîsînim.
- Eger di nava jîyana rojane da jî gotineka pêşiyane be, metelokeka kurt be, biwêjek be, yan agahîyek be, wan jî di cih da, di telefona xwe da dinivîsînim. Hin caran hinek diaxivin, ez telefona xwe derdixim, dikenin û dibêjin, “Ez bawer im tu dîsa qeyd dikî.” Êdî berhevkarî bûye parçeyeka jîyana min.

**J.B:** Gelo ji bo wê tu perwerde bûyî? Li ku derê? Ew perwerde çawa bû?

**N.O:** Na, li ba me, li bajarê me kesekî ku ji vê qadê fam dikir tunebû ku ez li cem wan perwerde bibim. Min bi xwe xwe perwerde kir. Çawa? Min pirtûkên berhevkarîyê xwendin, herî zêde jî yên Hecîyê Cindîyî. Min gelekî bala xwe dida wan pirtûkan, ka wî çi û çawa nivîsîne. Pirtûkên Hecîyê Cindîyî yên li ser folklorê, mamosteyên min in. Ez wî bi rêzdarî bi bîr tînim, keda wî ji bo me zehf e.

**J.B:** Gelo aniha rê û rêbazên te yên berhevkirinê li gor ên berê guherîne? Çawa?

**N.O:** Berîya ku pirtûkên min çap nebûbûn, her kesî ji min ra tişt nedigotin. Digotin ez ê bibêjim, nanivîse, westandina min dê here badilhewa. Ji ber wê, min zêdetir li derûdora xwe, li cem malbata xwe, nasên xwe berhevkarî dikir. Lê piştî ku pirtûk derketin, êdî her kes dizane ku ew tiştê ku min ra bibêje, dê bên nivîsandin û dê bên çapkirin. Ji ber vê, bi dil û can, çî were bîra wan dibêjin.

**J.B:** Arşîv ji bo te tê çî maneyê?

**N.O:** Arşîv, bîra miletan e. Herwisa koka miletan e jî. Dema ku arşîva miletekî hebe, ji kokên xwe naqete. Mînakekê bidim, Enstîtûya Kurdan a Parîsê, gelek pirtûk wekî pdfyê barî rûpela xwe kirine. Ev arşîv ji bo me bûye xêra Xwedê. Dema ku tu di mijarekê da lêkolînekê dikî, serî li wê arşîvê didî û bi saya wê, xebata xwe digîhîni encamê. Lê arşîveka wisa tunebe, pêwîstîya mirovî bi çavkaniyekê hebe û mirov wê çavkanîyê nebîne, ew xebat dê nivîco bimîne. Ev tenê mînakek bû. Îsal li Japonyayê darên mêweyan zû bişkivîbûn, Japonan digot: “Ev heştêsal in tiştêkî wiha neqewimîye.” Ew ji ku derê dizanin heştêsal in tiştêkî wiha neqewimîye. Çunkî her tiştên xwe sal bi sal nivîsîne û ji xwe ra kirine arşîv. Lewma min got, arşîv bîr û koka miletan e.

**J.B:** Gelo arşîva te heye? Ew arşîv çawa ye (nivîskî, teyb, kitêb, dijîtal)? Kerem bike hemû nimûneyan bide?

**N.O:** Belê arşîva min heye. Min bi sedan kasêtên dengbêjan berhev kirine ku mirov nikare wan li ser înternetê bibîne. Min bi qasî şeşsed kilam (stran) li youtubeê bar kiribûn. Min dît ku şîrketên muzîkan, kilamên min didizin, di ser da jî min ra telîfê dişînin. Ji ber qanalê wan ên youtubeê yên fermî ne, ew şîrket in, youtubeê jî vîdeoyên min jê dibir, di ser da jî qanala min ra ceza dişand. Min bi xwe ji youtubeê reklam hilnedabû, min lê bar kiribû ku bila gel jê sûtê werbigire, bila winda nebin. Lê min dît ku ev şîrket ji xwe ra li ser keda min pereyan qezenc dikin, min jî hemû jê birin. Wekî din li ser *Serhildana Agirîyê*, min bi gelek kesan ra hevpeyvîn çêkirine, li ser folklorê, li ser dîrokê, hemû di komputera min da ne.



Min hinek xebatên xwe di çar pirtûkan da weşandin. Lê di arşîva min da, têra gelek pirtûkan materyal hene.

**J.B:** Gelo ew arşîv xwedî pergal e? Tu arşîva xwe çawa bi nav dikî? Bi rêya dosyeyan, cureyên keresteyan, hwd?

**N.O:** Min arşîva xwe wekî mijar senifandîye: Serhildana Agirîyê, jîyana dengbêjan, dîrok, kilam, gotinên pêşîyan, çîrok, metelok, bawerî, efsane û hwd.

**J.B:** Gelo tu arşîveka wisa wekî “komkirina tiştan (şênber)” an bêhtir wekî “komkirina nirxên ne madî (razber)” dibînî?

**N.O:** Ez wekî komkirina nirx, gencîne û malên gelî dibînim. Ev mîrateyek e, mîrata bav û kalan. Eger em li vê mîrateya xwe xwedî dernekevin, dê winda bibe.

**J.B:** Gelo tu arşîva xwe diparêzî (mesela ji windabûnê, ji tozê, ji polîsan, hwd)?

**N.O:** Hin caran polîs davên ser malan, komputerên wan dibin û êdî li wan venagerînin. Li hember vê îhtîmalê min her tişt hem ji emaila xwe ra şandibû û hem jî ew li dîskên onlîne bar kiribûn. Jixwe ev demeka dirêj e ku komputera min xirab bûye. Eger min ew li dîskan bar nekira, min aniha nikaribû li serê bixebitîyam.

**J.B:** Arşîva rexistin (sazî) û kovarên ku tu bi wan ra dixebitî heye? Ew karê te jî arşîv dikin?

**N.O:** Ez bi kesekî ra naxebitim. Lê bi qasî ku ez dizanim di kurdan da hişmendîya arşîvkirinê tune ye. Kes zêde arşîvan çênake. Xwezî çêbikirina.

**J.B:** Gelo li gor te kovar dikare bi rola arşîvê jî rabe?

**N.O:** Belê, em îro dikarin bibêjin ku hejmarên Kovara Nûbiharê arşîvek e. Ev bîst sal in ku derbarê her mijarê da, bi hezaran gotar hatine nivîsandin. Ev arşîveka mezin e ji bo kurdan. Belê eger bîst parastin, kovar jî rojname jî televîzyon jî

her yek bi serê xwe dibin arşîv. Lê mixabin ku kurd wan neparêzin. Li ser vê meseleyê mînakek: Arşîva Med TV'yê ka nê? Li wir, di bernameyekê da bapîrê min derketibû. Bi salan in ez digirim, arşîv tune ye. Çunkî neparastine. Kurd bi destê xwe keda xwe diavêjin. Bi salan ewqas weşan çêbûn, bi hezaran bernameyên dengbêjan, şevbihêrk çêbûn. Ka ew arşîv? Tune.

**J.B:** Gelo tu arşîva Malbata Celîlan dizanî? Di nava çîrokên wan da gelek hikayeyên li ser Mirza Mahmûdî hene?

**N.O:** Belê min ew arşîv bihîstîye. Lê xwezî hemû kurdan bikaribûya ji wê arşîvê sûd werbigirta. Wekî dijîtal bihata weşandin, hemû kurd û dostên wan kînga bixwesta li serê lêkolînan bikira, dê baştir bibûya.

**J.B:** Gelo keresteyên ku berhev dikî, wan çap dikî yan jî diweşînin? Li ku derê? Çawa?

**N.O:** Min pirtûka xwe ya yekemîn Mirza Mihemedî li cem Weşanxaneyê Avestayê çap kir. Mixabin Avestayê mafê telîfê neda min, hezar heb pirtûk çap kir, sed heb da min û yê mayî yê wan in. Eger ji nû ve çap bibe, ji bo her çapê sed heb dê bidin min. Piştî Mirza Mihemedî, sê pirtûkên min ên din jî çap bûn. Min ew li cem Weşanxaneyê Wardozê çap kirin. Wardozê mafê telîfê da min, her pirtûkekê hezar heb çap dika û sed heb dide min. Ez pereyan nadim, her tiştî ew didin. Lê ji her pirtûkê sed heban didin min. Ji xeynî wan sed heban eger ez bixwazim ji xwe ra pirtûkên xwe bikirim, ji sedî pêncî (%50) dadixin. Mînak bihayê pirtûkê sed lîra be, ew bi pêncî lîrayê didin xwedîya/ê pirtûkê. Lê hevalên Wardozê, mirovên zana ne, ew midaxeleyî li zimanê tiştên ku hatine berhevkerin, nakin. Ew li ser vî karî perwerde bûne; dizanin çî, çî ye. Lewma ez wek berhevkarekî pirtûkên xwe li cem wan çap dikim. Çunkî te çî nivîsî be, destên xwe nadinê, nabêjin ev peyva nayê zanîn, ev peyva nebûye, filan û bêvan.

**J.B:** Gelo ji bilî berhemên te yê wekî “Mirza Mihemed” û “Tivinga Kurda ya Çillûle”yê keresteyên ku te berhev kirine hatine çapkirin? Çima sernavê yek ji berhemên te *Tivinga Kurda ya Çillûle* ye? Ew kurteçiroka bi navê “Ta” ya Mehmet Dicleyî anî bîra min. Te ew xwendîye?

**N.O:** Ji bilî Mîrza Mihemedî û Tivinga Kurda ya Çillûleyê, du pirtûkên min ên din ên bi navê “Dendo” û “Ji Binbîra Kurdan Bawerîyên Gelêrî” hene. Pirtûka ji Binbîra Kurdan Bawerîyên Gelêrî, li ser bawerîyên kurdan ên pelepûç û mîtolojîk in. Yê din, Mîrza Mihemed û Dendo, jî ji çîrokên gelerî pêk tên. Pirtûka Tivinga Kurda ya Çillûle jî ji metelok û pêkenokan pêk tên. Min îsal jî pirtûkek li ser efsaneyên kurdan amade kir û ji weşanxaneyê ra şand. Lê mixabin, weşanxaneyê got îsal pereyên me tune ye ku em çap bikin. Ji ber vê, nexweşîya koronayê, hinekî rewşa wan a aborîyê jî nebaş e. Jixwe pereyên min jî tunebû ez çap bikim, loma ew xebat aniha bêçap, wisa maye. Heta saleka din, rewşa me dê çawa be. Navê Tivinga Kurda ya Çillûle ji ku hat? Dema ku di salên 1915an û 1918an da dewleta rûsan êrîşê tîne ser Agirîyê. Li vê derê eskerên dewletê, filan û bêvan tunebûne. Gel mecbûr maye ku xwe bi xwe biparêze. Sîlahên gel jî tunebûne, bi daran, gêziyan, tevir û bêran xwe parastine. Eşîreka kurdan jî bi gêziyeka ku ji şivikan çêdibe (em wê ra dibêjin sqavêl) êrîşî rûsan dikin. Wexta ku eskerên rûsan wê gêziyê dibînin, hew zanin ew sîlah e. Ji hev ra dibêjin, “Birevin, kurdan sîlahêka wisa çêkirine ku çil lûleyên wê hene. Eger agir bikin, dê di carekê da çil eskeran bikujin.” Ji ber vê meseleyê, me ew nav li pirtûkê kir. Di pirtûkê da ew jî heye.

**J.B:** Li gor te kîjan metodên weşanê/çapkirinê ji bo çanda devkî ya kurdî yê herî baş in û çima?

**N.O:** Metoda herî baş, divê destên xwe nedin orîjînalîya wan. Çawa çîrok tên gotin divê wisa jî bîn nivîsîn. Divê weşanxane dest tê wernedin, neguherînin û nebêjin ev herêmi ye, herêmen din fam nekin, em weha nekin, hemû kurd naxwînin, em weha nekin, nayê firotin. Divê orîjînala wan bê çapkirin ku di pêşerojê da lêkolîner bixwaze li ser wan lêkolînan bike, bila orîjînala wan bibîne. Dibe ku yek bibêje ez ê li ser çîrokên çapbûyî lêkolînekê bikim, lêkolînekê weha: Kurdan heta kîjan salan di nava axaftina xwe da peyvên bi tirkî bi kar anîne? Dema ku mirov wan berheman xwend, divê wisa be ku mirov hew bizanibe çîrokbêjekê/î ji gundekî Agirîyê ji te ra çîrokê dibêje.

**J.B:** Tu ji bo weşanê/çapê berheman çawa hildibijêrî? Giringîyê didî çî?

**N.O:** Di destê min da, li ser her mijara zargotinê kereste hene. Ez ji weşanxayê ra dibêjim, ez îsal pirtûkê li ser çî amade bikim. Wan kîjan mijar gotibe, ez wê amade dikim. Aniha pênc-şeş pirtûkên min ên çîrokan amade ne, lê ji ber aboriyê hê nehatine çapkirin. Heta ku derfet çêdibe, em ê çap dikin.

**J.B:** Tu ji bo çî berheman çap dikî? Armanca te ya çapkirin û belavkirinê çî ye?

**N.O:** Ji bo min, armanca çapkirinê ew e ku tu êdî wê xebatê dikî malê gelî. Wexta ku ew dibe pirtûk, êdî dilê min rehet dibe. Ez dibêjim, edî ew ket nav arşîva kurdî, êdî winda nabe. Bi kurtasî, çapkirin parastin e, ku çap bû êdî winda nabe.

**J.B:** Tevgerên weşanxane û cureyên weşanên kurdî, li gor salên berê li hember berhemên çanda devkî guherîne?

**N.O:** Weşanxaneyên ku nizanin berhevkarî çî ye, berhevkarî çawa tê kirin û kereste çawa tê nivîsîn, berheman diguherînin. Çunkî ew tiştên folklorîk ên ku hatine berhevkirin, dema çapê ew wekî romanekê midaxele li van berheman dikin. Lê weşanxaneyên ku dizanin berhevkarî çî ye, midaxele lê nakin. Tenê em bibêjin tiştêk te çewt nivîsîbe yan jî te xal û bêhnok kêm danîbe, ji te dipirsin, paşê sererast dikin. Wardoz, wisa ye. Te çî amade kiribe, ji serî heta binî dixwînin, notên xwe dinivîsin û ji te dipirsin, paşê eger çewtîyek an jî xeletîyek hebe, em bi hev ra sererast dike.

**J.B:** Tu dixwazî versiyona çapkirî ji bo kê be?

**N.O:** Ji bo gelî, ji bo mirovahîyê. Herwisa ji bo kesên ku bixwazin li ser çand û kultura kurdan lêkolînan bikin.

**J.B:** Gelo tu ji bo berhemên çapkirî pêşgotin an şiroveyan dinivîsî? Çima û wan çawa diafirinî/dinivîsî?

**N.O:** Belê, di pêşgotinan da ez bi kurtasî qala wê xebatê dikim. Di naverokê da jî hin tiştan, bi jêrenotan şirove dikim. Hin tişt, hin peyv hene ku ez difikirim ku li herêmên din nayên zanîn, wan bi jêrenotan rave dikim.

**J.B:** Gelo ji bilî çapê/weşanê tu/yan hevalên te bi rêyên cuda li çanda devkî digerin (mesela festîval, şano, pêşkêşên cuda û hwd)? Çi ne ew? Tu dikarî çend nûmeneyan bidî?

**N.O:** Dema ku ez di bernameyên televîzyon û radyoyan da yan jî di gotareka da li rastî hin tiştên ku mijarên min bin tîm, wan jî li cem xwe dinivîsim. Mînakekê bidim; yek bibêje ev kilam (stran) li ser filan tiştî yan jî kesî ye, ez wê li cem xwe dinivîsim û li ser wê lêkolînan dikim.

**J.B:** Tu li ser Weşanxaneya Avesta û Wardozê û li ser karên wan ên folklorê çî difikirî?

**N.O:** Avesta weşanxaneyeka kevn e. Gelekî hatîye nasîn. Ji ber wê jî pirtûkên wan gelekî tîn firotin. Lê bi ya min, Wardoz di her hêlê da gelekî profesyonel e. Wekî din li wir, mafên nivîskar û berhevkarên hene, ew guh didin nivîskar û berhevkarên xwe. Ez dikarim bibêjim ku Wardoz weşanxaneya kurdan a herî baş e.

**J.B:** Pêwîstîyên herî girîng ji bo berhevkirina çanda devkî û avakirina arşîva çanda devkî çî ne? Problemên herî mezin çî ne?

**N.O:** Pêwîstî bi sazî û dezgehên ku piştgirî bidin berhevkarên, hene. Pêwîst e ku aborîya berhevkarên hebe ku karibin bixebitin. Problema herî mezin, aborî ye, ku problema aborîyê tune be, dê gelek tişt bînin kirin. Weqfa Îsmâîl Beşîkçî vebû û wan kamera, denggir, komputer dabûn çend berhevkarên. Min jî ji hevlekî xwe yê li Amedê ra got, ji wan ra bibêje, komputera min tune ye, ez nikarim tiştên ku min berhev kirine, binivîsim, û kamerayeka min a baş jî tune ye, yeka min a kevn heye, ew jî êdî şarja wê zû xelas dibe, ez nikarim wê bibim gundan. Gotibûn, me dane çend heban, êdî ew derfeta me nema ku em bidine wî jî. Pirsgirêk ew e ku kurd dibêjin, “Berhev bike!” Lê nabêjin, çawa û bi çî?

**J.B:** Cih û rola jinan ji bo parastin û komkirina folklorê kurdî çawa dibînî?

**N.O:** Her jinek, bi serê xwe bi sedan pirtûk e. Rola jinan, di parastina folklorê kurdan da gelekî mezin e. Ez li ser dayîka xwe bibêjim, herî kêr min keresteyên pênc pirtûkên xwe ji wê berhev kirine. Dema ku jin dil bikin, û ji te ra bibêjin, tu dibînî ku her jinek behreka folklorê ye.

**J.B:** Di berhemên folklorî da kîjan motîfên jinê yan jî lehengên jin zêde bala te dikişînin yan îlhamê didin te û li ser karê te bi tesîr in? Tu dikarî nimûneyan bidî û taybetmendiyên wan îzah bikî?

**N.O:** Keçelokê pîrê, ew jinek e. Lê dizane ku wek jin nikare li ser pêyan bisekine. Çunkî jinbûn zehmet e. Postê pezekê dikişîne serê xwe, xwe dixê qilixê mêrekî. Her tiştî dike, bi pelewanan ra şer dike, zora wan dibe, çî bibêjî bi tena serê xwe dike. Bi aqilê xwe, çî pîrsgirêk hebe çareser dike. Di dawiyê da bi ser dikeve û dibêje ez ne mêr im, jin im. Ango dixwaze bibêje min wek jinekê ew hemû kirin, lê wexta ku min bi jinbûna xwe bikira, gelî dê ji min ra astengî derxista. Lewma ez ketime qilixê mêran.

**J.B:** Kîjan dengbêjên jin an jinên kurd ku girêdayî çand û zimanê xwe ne û ew parastine, bandoran wan li ser te heye? Eger hebe tu dikarî behs bikî ku çawa bandor li te kirine? Nimûneyan bide û taybetmendiyên wan îzah bike?

**N.O:** Zêdetir Eysêşan. Malbata wê nexwestîye ew bistre, pê ra şer kirine, çî zext bibêjî lê hatîye kirin. Lê dîsa jî ew li ser xwe sekinîye, wê guh nedaye tu kesî û stranên xwe gotîye. Wisa bûye ku stranên wê di radyoya Rewan, Tehran û Bexdayê da derketine. Hemû kurdan ew nas kirîye, stranên wê li hemû dinyayê belav bûne. Eysêşan bi ser ketîye, lê wê gelekî êş û azar kişandîye. Ez gelekî di bin bandora jîyana wê da mame. Wê bi rêzdarî bi bîr tînim.

**J.B:** Gelo motîf/leheng/dengbêj/aktivîstên kurd ên jinan hene ku tu ji wan hez nakî û çalakîyên wan giring nabînî yan jî çalakîyên wan ji bo rewş/mafên jinan xetere dibînî?

**N.O:** Na, tune ne. Jin çî bikin, rind dîkin. Destê jinan li çî bikeve, ew tişt bedew dibe. Berê li Agirîyê karê partîyê tim mêran dîkir. Van salên dawî, gelek jin hatine partîyê û xebatên siyasî dîkin. Dema ku jin dikevin taxan û xebatên siyasî dîkin, tu dinêrî roj bi roj girseyên mîtingên kurdan zêdetir dibin. Jin bereket in, destê wan li çî bikeve, jin tiştan baştir, xweştir dîkin. Li ser mijara folklorê jî min li jor qala jinan kiribû. Folklorê kurdan bi destê jinan, bi zar û zimanê wan heta îro hatîye.

**J.B:** Li ser rewşa jinan nîrxên çanda devkî çawa dibîni? Gelo li ser van nîrxan tu pewîstî bi rexnekirinê yan jî guhartinê heye? Îzah bike û nimûneyan bide?

**N.O:** Di folklorê kurdan da, di çanda devkî da tim bi awayekî baş qala jinê tê kirinê. Jin pîroz tê dîtin. Jixwe wisa ye; jin nebûna ka dê dinya çawa bibûya? Di dinyayê da çiqas însan hebin, hemû jî zarokê jinê ne, jinê ew anîne dinyayê. Bawerîyeka kurdan heye dibêjin, “Wexta dinya hatîye afirandin, sifreya nanî pêşîyê hatîye pêşîya jinan.”

# Omer Farukî da reportaj

Omer Faruk was born in the village of Çilkani in Çewlîg (Bingöl). He finished high school in Çewlîg and continued his education in Izmir where he studied law. After graduation, he lived in Germany for a while but returned to Çewlîg and practiced law there. For political reasons, he was deprived of his right to be a lawyer, and in 2019 he moved back to Germany where he currently lives. He started learning and writing in his native language when he was 35 years old. Since 2015 he has been collecting materials on Zazaki folklore as an amateur folklore collector. In particular, he is interested in sayings and idioms. His folklore collection has been published in the Kovara Kurdan journal and on the Zazaki.NET website.

Omer Faruk, dewa Çilkanî ya Çewlîgî de ameyo dinya. Mektebo verên, mîyanên û lîse Çewlîgî de waneno. Dima Izmir de dest bi wendişê unîversîte kerd û uca de beşê Huquqî de weneno. Mezuniyetê xo ra dima o demêk Almanya de cuyeno, la dima ageyreno Çewlîg û uca de Avuqatî keno. Semedê sîyasî ra heqa avuqatîya ey destê ra ame girewtiş. 2019 de o reyna bar kerd şîyo Almanya û nika uca de cuyeno. O *hîrêş çar serreyê xo de dest bi nuştişê Zazakî kerd*. 2018'î ra nat sey amatorê zazakî ser o malzemeyê folklorîkan arê dano. Bi zafî vateyê verînan û îdiyomî alaqeya ey ancenî. Arêdayîşê û nuştayê aye kovara Folklorî Kurdan û keyê pelê Zazakî Net de weşanîyayî.

**Esat Şanlı:** Keremê xo ra name û peynameyê xo vacê û tayê xo bidê naskerdene (şima ça/kotî ra yê, çend serre yê, çi karî kenê?)

**Omer Faruk:** Ez serra 1977 de dewa Çewlîgî Çilkanî de dadîya xo ra bîyo. Mi mekteba berze de perwerdeyê huquqî dî, dima ra bîya memûr, la cuya memûratî mi rê teng ameye, coka îstîfa kerd. Ez demêk şîya Almanya, 2005 de agêraya Çewlîg û dest bi avûkatî kerde. Semedê sebebê sîyasî ra kewta hepis û hewt serrî zindan de menda. Heqê min ê avûkatî destê mi ra ame girewtiş. 2019 de min reyna bar kerd şîya Almanya û nika uca ya.



**E.Ş:** Şima tradîsyonê fekkîyî ser o xebetîyayî. Şima eşkenê tayê qalê destpêka xebata xo bikerê, senî dest pêkerde û dima senî aver şîye?

**O.F:** Ez zî sey her şarê Kîrd û Zazay mekteb de rastê zîwanê Tirkan ameya. Mase sînî ke awki ra bivejî tengnefes beno ma pêroyê qickêkanê mektebî Sey bo masey bî. Ma kuyey bî torê mekteb a. Ma xo ge nata denenê ge weta denenê. Mamosteyanê mektebî çim de ma “ aptal Kürt çocukları” bî. Ey zî ma çima mê’lemo xidar û zalîm. Tirkî vatîn ma fehm nêkerdîn. Heqaret bînenê ma. No zî xûyê ma ardîn. Binatêyê ma de û mektebê tirkan de yew serdinê roneynê. Ma her qalê xo sînîtenê xo gan. Bînatêyê xo de eştînenê Zazakî. Mamosteyan taway fehm nêkerdînenê. Mi çimi de ma wînaya kowtînenê ser. Înan ke zîwanê ma fehm nêkerdînenê weşê ma ya şînenê. Wina ya roj bi roj ferqê xo û tirkan, ferqê zîwanê xo û zîwanê tirkan ma po vetînenê.

**E.Ş:** Çira folklorê Kurdkî (bitaybetî yê Zazakî) bala şima anceno?

**O.F:** Dewê ma welatperest bî. Aşiqê zîwanê xo bî. Hem sey şêx Medîne Özsoy (wayîrê kitabê Dîwanî) hem zî sey Ehmedê Dirîhî (wayîrê kîrabê Nameyê Nebatan) dewê ma ra bi. Mallay ma zî edîb û nûktedan bîy. Înan yew yew rindîyê û eşqê zîwan visto ma gan. Ez zî wina ya, verba polîtîqayê helîyayîş û helînayîş verard şîya zîwanê xo ra.

**E.Ş:** Şima key dest bi xebate kerde?, Şima ça/kotî û kamcîn mintiqeyan de motîfê edebîyatê fekkîyî arê dayî?

**O.F:** Hama hîrêş çar serreyê xo de mi dest niştîşê zazakî kerd. Mi goş na qalanê dewê ma ser. Winî yew dewlemedendîyê zîwan mi de ardo pêser. Nîka zî ez ha deynê xo dana. Mi çi eşnawit gena nisena. Wazeno birasnî qicanê sibay, û belka wînaya ma bi zîwanê qedîm xelisnenê.

**E.Ş:** Şima xebata xo ya folklorîke bi çi awayî fînanse kerde?

**O.F:** Verba xebatê zîwan de yew vero/ astengîya hend pîl zî no yo. Ti zêrr milletê xo û zîwanê xo rê vêşnenê ti qayîl nêbenê in reng û zîwan bihelîyo. Ti qey ineya dej ancenê, zehmet vînenê, areqê çarey esterênê, nûrê çîman rişnenê, nisenî?. La şarê to wende nîya nêwnene. Wendeyê şarê to bîy “qûtwerê milletê xo hakkêrê şar!”, xo dê nêdenen nêvêşenê. Merdim ke xo rê nêdejena û nêveysa ha ci rê biqehrî ha ci rê biqehrî ‘pûş û polax’, ewro tikî cehdkar çîn bî ez eşkena vajî milletê ma xo nawo yew hewnê mergî ser. Hewnê mergî weş o. Ti çend recefnenê qayîl nêbenî aya bî. Tahmê hewn ci rê weş û şîrîn yeno. Ha vaje ha vaje! Rey rey ez xo bi xo vana; ma munenê dîyko bêwext û erey menden. Ma verê tijî perrenê ûrrenî pere nêkena, ma tijî dima warzenê pelan danî xo rê pere nêkena. In hala in dej û sewdayê zîwan ho ma pistana. Yew qirikê dîykan ma mil a. Se bikerî ma hey ûrrenî. Dîykan ra lomê çey beno? Nêbeno! Kilmê gurey çew eşkeno bivajo ke bêwaharê şarê û milê ma go keno çewt. Derd û îdareyê dînya zî go verê ma birnen. Liganê ma keno yew sol a û ma di lingî yew sola hey wazenê cehde şiyere.

**E.Ş:** Kovare/organîzasyon/keyepelê înternetî yê ke kultur û folklorê Kurdî (bitaybetî yê Zazakî) yê ke şima înan dir pîya xebetênê estê, yan zî têkilîyêka şima înan dir esta?

**O.F:** Ez gîredayeyê yew ca û kovaran nîya. Labelê ez nîzdîyê hewt û heşt serran pey beran de bîya. Ûca ra çendiko ma bieşken ma bi nişteyê xoya paşt denenê kovaran.

**E.Ş:** Tradîsyono fekkî seba şima yeno çî mana? Şima ey senî pênase kenê?

**O.F:** Mi ra bipersî ez xo vana beden rê gan çîyo tradîsyonê fekkî zî ma rê û ganîyan rê o yo. Yanê rindîyê rîtmê ahengîyê xweza yo. Heqîqet û senfinîyê heyat o. Dîk senî ke ûreno, manga senî ke bittend, ga senî ke wirren, pisinge senî ke mîyawena, mar senî ke rissen, kutîk senî ke laweno, verg senî ke zûrreno, ma senî ke înan cîya cîya eşnawen û goş nanî ser. Tradîsyonê fekkî zî wîna yo. Nasmame wo, xo bîyîş, xo sînayîş û xo ginayîş o. Yanê ez cûmle xo de fîr bîyayîş o.

**E.Ş:** Bi şîma kamcîn term seba xebatanê winasîyan hîna raşt o; tradîsyono fekkî, edebîyato fekkî yan folklor? Şîma kamcîn şuxulnenê? Eke şîma yewna term şuxulnenê keremê xo ra binûsê.

**O.F:** Her yeni cayê xo de giran û rind o. Qey netewîyeya yew feka niştîş, qey mahallîyêya fekkî, qey folklor a fehm bîyayîş. Her yeni cayê xo gore rîndî. Wa yew kerra ronîyo û dêsê/ dîyêsê ma bivawîyo de, kam çî kerra nano pa û kam çî xîç keno bînate ra qebulê ma ya. Hacê ma her qal û her vate esta. Verba vîndîbîyayîş dest û qol xo kerdişê hewce keno. Ez bi xo ca ca gore ling erzeno. Giredayê yew tarz û ûsûlê nîyo. La Bineyna hetê tradîsyonê fekkî ya meyl keno.

**E.Ş:** Gama şîma folklor arê danê bala şîma hîna zaf çiyî ser o ya?

**O.F:** Ez hîna zaf goş nano çîyanê tarîxî ser. *Îdyoman û vateyê vêrênan sera ez heme recefîyena. Mi gore rûhê û laşeyê ziwan vateyê vêrênan û îdyomî. Ey esasê şarê ma, ristimê tarîxê ma, mijulê pîr û kalanê ma ramojnênê. Coka ez înan sera xeylî vendena û nişteyanê xo de ez înan şuxulnena.*

**E.Ş:** Kamcîn tewirê tradîsyonê fekkîyî hîna zaf bala şîma ancenê? Nimûneyan bidê.

**O.F:** Mintîqayê ma de tradîsyonê fekkî dewê mîyalûn o û pakûnîyîjan weşê mina şîno. Mesela şarê mîyalun herfê ‘k’ kenî ‘ç’ vanî. Nengê înan zewtê înan ez ridyena. Mesela “ dadî/ diyet/ deyk vera vanî ‘deyç’ pîrîkê xo ra vanî deyçê, deyçê mi, wînayên yew orjîneyê telafûzê înan esta. Ez eşkena vajî ke her yew dew bi yew vate wa cêra benê. Mesela dewê pûlî çîyêk bivajî vanî ‘o qûr’ û ‘o Qûr’ûn’ vateyê wînaya şedînenê. Ancî dewanê xalûn ma yew nêngan ke biçîno peynîyê nêngê xo bi çekûyê, mi hi ya giredano. Wînaya heme ey nênganê xo giredanî û şedînenê.

**E.Ş:** Eceba/Tirêm arêdayîş de şîma versîyonanê orjînalîyan yê nêorjînalîyan ra cîya kenê?

**O.F:** Rey rey hendeyê vîr û vînayê xo ez rastê vatey çîya esas û binge gena. Mesela dor û ciwarê ma de dewê Win esta. Ma de yew qalê înan menşûr a. Ma derheqê

înan de vanî; ‘winîj vato ez xûyê herrê xo zana’ û gore mi na qal patentê na dewe ho piridaye. La ca-ca gore na qalê înan, merdimî vato; ez xûyê herrê xo zano bena. Mi ra bipersî çekûyê merdimî vera çekûyê Winîjî ez evas gena. Wînaya eya qal ca ra perra û vajîya bellî beno. Ez nişteyanê xo de wînaya qalan esas û binge gena.

**E.Ş:** Şima qe berhemêko nêorjînal arşîvê xo ra red kerd û vet?

**O.F:** Cewabê no pers lewe de esto. Çîya ke ez xelet vînena ez nênisena. Ez qayîl nîya yewna yew laylî/lêlê bierzî mîyanê zîwan. Mesela yew yew bi tesîrê Tirkana vano; Her kerra cayê xwû di girun a, û bi Tirkî na qal ‘Her taş Yerde ağdır’. La ma de ‘Her kerra cayê xo de rind a’ vajîyeno. Gore mantiqê mi zî qalê ma bingeya, yanê ‘her kerra cayê xwû di rind a’. Mantiqê gore zî wînyo. Giranê her ca di eynîya. La Cayê xo gore rind bîyayîş hîna mi şîrîn yeno. Wînyên çîyan de ez mudaxele kena.

**E.Ş:** Bi ya şima tesîrê deyîr/kilam/deyîş û terzê cuya vatoxanê nînan tradîsyonê nûşteki/modernî ser o esto?

**O.F:** Mutleqa esto, ez aşkena vajî ke zaf qal û vateyê ma açaryê zîwanê Tirkî. Ma lawikan ra bigire heta vateyê vêrînan û îdoman yew dizdê zîwanê ma ra bîya. Hegayo bêwahar! Mesela ma vanî; ‘lûw kenî şûne/ şîwaneyê koxî, lûw nîyena rî berkan’a’. Vana ez çîmin xwu da bawer niken o, na qal Tirkî de bîya; ‘tilkiye demişler pişik tavuk sever misin, tilki oturmuş gülmüş’. Mesela; ‘Tilki salkıma yetişmemiş korkutur demiş’. Ma de; ‘luw nêrasa terne vato hûma ti çi pîsî’. Mi da bipersî tahm û lezzet ho vateyanê ma de. Ma çiqas bieşke qalanê bigire binê qeyd ma hend eşkenê ke bivaje esîl wînyo. Binge ma yê, wîna nêbo bêwaharê vera dewlemendîyê zîwanê ma helîyeno beni vîni. Verba vînbîyayîş û esterbîyayîşê zîwan gera ma destun û qolan bifeşelnê. Heq nêheq cêra biveje.

**E.Ş:** Tirêma ê tekstê ke şima arê dayê seba cuya şima hetkariya înan qe virazîyena? Yanî çarçîwaya exlaqîye de paştî danê şima? Mesela gama cuya şima de çîyêko taybet (xusûsî) biqewimîyo ê xebatê şima kewenê şima vîrî yan zî şima înan anê xo vîrî? Nimûneyan bidê.

**O.F:** Ez eşkena bivajî her yew gure ke qewîmîyeno yew qal û vate pişyeno mi xeyale. Mesela, derheqê bêtalîhê de ma vanî; sekûr şî dizdê tîj û aşm pîya vecîya. Mesela; derheqê xîrabî de ma vanê; qinê kutîk ra bîya weş nêna, yan zî ma vanî; Çim kor ra hesir war nêna, yan zî ma vanê; Fek mebere çije wo kor. Ancî derheqê şarê xo nêzanay de ma vanî; qutqerê ma wo, hakkêrê şar o. Wînasîyên qal yew ver û vînaye danî ma. Ez zî cuya xo de nîna esas gena. Rey rey zaf qal gerek çîn a. Qîrçînê bi qalê; gîy xo nêkeno vano ez beno veyşun a, û kîr ra gîy keno ya. Bi îdyoma zî despişte, wa ma îfade kenî. Ma di qal zaf derg nêbena. Qal ma de sey yew gûlê wa. Kama yew qal û îdyom gerek kena eya vajîyena. Wînaya qal û vate xitum beno. No çîy mi gore xorînîyê û hîrayîyê zîwanê ma dana teber. Tek ma sera bifikire bixebite û xo û zîwanê xo bizikire.”

**E.Ş:** Şima berhemê tradîsyonê fekkîyî arê dayî (danê). Şima eşkenê na yewe tayê îzeh bikerê yanî şima bi çi hawayî na xebate kerde (kenê)? Metodê şima çi yê?

**O.F:** Senî ke dewrê pexemberî de qalê pexemberan bi nameyê hedîsa bi destê eshabana qeyd bîy, ez zî extîyaranê dewanê ma ra wînaya mi fayde dîyo. Mi goş nawo fekê nînan ser. Çîyo antîqe mi girewto binê qeyd. Xususen vateyê mala rûşdîyê tûnstî, Mala Ehmedê Xeyluni, Mala Xeyrîyê duwali, Mala dirbas û Mala sidiqê tunsti, Mala nustafayê pûli, Mala Ehmedê Ziveri, Şêx Medîn û Pîrik û pîrîkanê xo ra mi xeylî îstîfade kerdo.

**E.Ş:** Eceba şima merdim, kurs, zanîngeh yan zî sazîyêk ra nê warî de perwerde girewto? Kamca? Senî?

**O.F:** Tesîrê mallayanê dewê mi mi sera bîya. Nameyê nîna ho nêwe de. Bêxeyreyê mala sidiq û mala Mustefayî eybînan dînyayê xo bedelna. Homa nînan bigero binê pelanê xo rehm. Weş mendeyan rê zî ez sihhet û quwet wazena. Homa destun û lîngan ra nêfîno. Her yewê Tarîyê mi rê bîyo yew raşnî û çîmayêk. Keyeyê nînan awan bibo.

**E.Ş:** Eceba rayîrê/metodê arêdayîşê folklorî yê şima yê nikayênî yê verênan ra bîyê cîya? Senî?

**O.F:** Kar û xebatê bînan ez nêzana. La dewê mi çenen dewê palî ra saz bîya. Mi qicê xo dewe de vîyarna. mi dersê xo bi zîwanê xo mallayanê medereseyê dewê xo ra girewt a. Welatperest yew dew û xane de ez bîya pîl. Bêney heps de ez mensa. Bi serrana mi serekîyê bajarê Çewlîgi kerde. Nay çîy bîy avantaj mi, bê înan mi ûnîversîteyê tirkan wend o. Herheta yew bîngêyê mi de esta. No zî avantajêko pîl o.

**E.Ş:** Arşîv seba şîma yeno çî mana?

**O.F:** Arşîv mûhîm o. Vanî ke wextê eshaban de demê harbun de hafîzê Qûr'an kî kişîyenê bi tersê vîndîbîyayîşê Qûr'ana xelîfeyê pexemberî yew şura/ komel nanî rî. Ey kîtab genî binê qeyd. Eke o mihal kîtab nêgîryenê binê qeyd nê Qûr'an mendînenê nê dîne îslumê. No hal û tahlukê derheqê ma de zî esto. Çend extîyar ma hey dînyayê xo bedelnenê. Darê zîwanê ma hend ha bena huşki. Çareyê ney zî qeyd o.

**E.Ş:** Eceba arşîvê şîma esto? Arşîvêko senên o? Ma vacê nûşteyê destî, bandê teypî, kitab, dijîtal (komputer) yan zî keyepelê înternetî, keremê xo ra nimûne bidê.

**O.F:** Qeydê nuştey mi de esto. Verê Almanya ameyîşê xo mi teslîmê yew embazo wedinas kerdî. Tay zî hey keyeyê mi de. Binê destê mi de.

**E.Ş:** Eceba şîma qe xebatê xo yê folklorîkî sîstemê dijîtalî (komputerî) de zî qeyd kerdê yan zî xebatê ke şîma înternetî ser o pare kerdê estê?

**O.F:** Qismêk bi computûra qeyd bîy. Qismêk zî nêxêr.

**E.Ş:** Eceba şîma arşîvê xo sey “arêdayîşê ercanê/qîmetanê madîyan” yan nê ra zîyadêr sey “arêdayîşê ercanê nêmadîyan” yanî sey ercanê manewîyan vînenê?

**O.F:** Ez deynê Heqî, deynê baw û kalan, deynê şehîdanê welat deynê qicanê sibay vînena. Yanê manevîyat mi de ver û esas o.

**E.Ş:** Eceba şima arşîvê xo bi rayîrêk muhafeze kenê/pawenê (mesela vindîbîyayîşî ra, tozî ra, polîsan ra, ûsn...)?

**O.F:** Qismêk hukmatî dest na ser. Qismêk bîy vinî. Qismêk hey yew hewalê mi de.. Qismêk zî hey mi de.

**E.Ş:** Eceba sazî/organîzasyon/kovare/keyepelê înternetî ke şima pîya şuxulênê xebatanê şima arşîv kenê? Tirêma aşîvêkê înan bi xo esto?

**O.F:** Mutleqa est o. Roşan Lezgîn qedr dano zîwan, keyepelê ci esto. Ez wina zano.

**E.Ş:** Eceba bi ya şima kovare yan zî keyepelê înternetî zî eşkenê rolê arşîvî kay bikerê?

**O.F:** Nêxêr, binateyê mi û computer hend zêd çîn o.

**E.Ş:** Çîyanê ke (berhemanê ke) şima arê danê, şima înan çap kenê yan zî weşanenê? Ça/kotî? Senî?

**O.F:** Ez kena kîtab. Teslîmê hevalan kena. Ey sera xebat kenê. Heta ewro çend kovaran de û çend çapxanayan de niştey mi çap bîy.

**E.Ş:** Şima ra gore kamcîn metodê weşanayîşî/çapkerdişî seba tradîsyonê fekkî yê Kurdkî (bitaybetî seba Zazakî) tewr rind ê û çira?

**O.F:** Mi gore zîwanê ma xetê Çewlîg û Palû de nerê mayê hîna cêra bîya. La fekê Dersîm û mintiqayê hetê Hênîyijan de zî qisêkerdiş û çekûyê zîwanê ma hîna zelal ê.

**E.Ş:** Wextê weşanayîşî/çapkerdişî de şima berhemanê folklorîkan senî weçînenê? Muhîmîye danê çiyî ser?

**O.F:** Mi hêvêrna zî vate, îdyoman û qalê vêrênan rê hîna zêd pîsê ci vêşnena... Ez qayîla nînan bidî şuxulnayîş.

**E.Ş:** Bi şima amacê çapkerdiş/vilakerdişî çî yo?

**O.F:** Ma de yew vateyê esto. Ma vanê; ‘zerreyê qicî de qal estî, la nêşkeno bido teber’. Heta ewro milletê ma halê xo ma eşkenî bivaje ke ‘dindan estî nihey çîn î, nihey estî dindan çîn î’, la no demano peyênan de hêdî hêdî îmkan ho kuweno dest. Ey ke hey ziwanê xo rê hey dejen û pîze ci veynenê roj bi roj hey zêdîyenê. Tahlukê xeylî pîl o. Verba perwerdeyê ziwanê Tirkî û Tv ziwanê ma go beno vîni. Bi qolê pîremerd a: ‘ma hey Kîrd kuwenî ra, Tirk, Ereb û Acem hey dîyen pay’. No rid ra qey sibayana hewce keno ke her qislê ma bêro binê qeyd. Pey hewt berana bêro qeflikkerdiş. Gera ma xo vîr ra nêkere ke qal vîr ra şina, nişte vîr ra nêşîno. Ney kîtabo qedîm zî vanê; ‘hêvêrî qal bî, qal bi homaya bî’. Ma gera ney xo vîr ra nêkere, û kîtabê ma zî vano; ‘biuwne’ la heta ewro ma wendiş sera kowtî. Yew millet wendiş ra bikuro her çîcra kuwena. Qey her çîyê xo vînnêkerdişê wendiş gerek keno. No zî xo ra bi qeyda beno.

**E.Ş:** Eceba weşanayîşê kurdkî (bitaybetî ya Zazakî) yê berhemanê tradîsyonê fekkîyî goreyê serranê verênan nika vurîyeno (bedelêno)? Eke e, senî vurîyeno, şima eşkenê bi kilmekî îzeh bikerê?

**O.F:** Mutleqa ziwan bedelêno. Ziwan ganî yo. Çîyo ganî hem xo keno hîna. Hem zî xo xerepreno. Çimeyê sêrên ra awki senî bêro xetê binî de awki ewtir yena. Çime laylîn bo awki zî bena laylîn, selam bo awki zî bena zelal. Ziwanê ma sera malesef çemelê bîni hey zor kenî. Tirkî, erebî û kurmanckî ha zor dana zelalîyê ziwanê ma. Ey bi çekuyanê xoya der û dorê ziwanê ma de bîy telîyêk. Hey nêverdenî ziwanê ma xo abide. Ziwanê tirkî bi hukmê dewleta, ziwanê erebkî bi hukmê dîn a, ziwanê kurmanckî zî bi hukmê sîyaset û partîyanê Kurdîstana xo aver berdo. Ziwanê ma binê tesîrê înan de mendo. Coka hewce keno ke ma weşîyenî sera nê neweşan sera birecefe. Eke ma darê xo awk nêde darê ziwanê ma bena huşki, yew zî bi niştîşa ez eşkeno vajî ke orjînê ziwanê fekkî zî ho beno vîn. Herheta yew tahlukê ho sare wedarneno. La ziwan ganî yo. Sey virrê marî ho tolê erzeno. Ez bawermenda ke ziwanê ma xo mergi ra xelisneno.



**E.Ş:** Şima wazenê versîyono çapkerde yê xebata şima qey kamî bo, yanî kesê ke şima wazenê berhemê şima biresê înan kam ê, kamcîn dor ê?

**O.F:** Ez qayîla versî bidî şarê xo ser. Hewt ra hewtay, cinî ra camerd o ke Zaza wo ez qayîla xo birasnî ey. Ey birecefnî û bidî pay.

**E.Ş:** Eceba şima berhemanê folklorîkan yê çapkerdeyan rê vateyo verên yanî zî şîrove nûşt?

**O.F:** Mi kîtabanê xo de vateyo verên nişto. Tikî kovaran de mi şîrove nişt bi. La sebi çap bi nêbi ez nêzana. Hewt serr ez pey beran de bîya. Çi bi çi nêbi ez tira hayîdar nîya.

**E.Ş:** Eceba teberê çapkerdişî/weşanayîşî de şima yanî zî embazê şima ro rayîranê cîyayan ê vilakerdişê tradîsyonê fekkî yê Kurdkîyî (bitaybetî yê Zazakî) gêrenê (mesela festîval, tîyatro, aktîvîteyê pêşkêşkerdişî yê cîya cîyayî...?)? Ê çi yê?

**O.F:** Ez Facebook sera, pelanê înternet sera nişteyê xo bar kena. Ez qayîla çîyêk birasnî milletê xo. Yew qal ez birasnî înan ez xo zerrewêş manena. Pasê quwwetê xo ez cehd ha ramojnena. Mi ra yew çengê xelley erd eştiş. Bak û bereket tahmçû lezzet homay ra.

**E.Ş:** Goreyê şima înternet seba pawitişê edebîyatê fekkî yê Kurdkî (bitaybetî yê Zazakî) eşkeno rolêko senên kay bikero? Seba platformê înternetî ser o pawitiş û averberdişê zîwanî pêşniyazî yanî zî fikrê şima estê?

**O.F:** Faydeyê xo mutleqa esto. La ez uwnena herkes ho xebatê xo kaşkeno hetê fikr û armancê xo, yanî zîwan kenî alet. No gal mi qehirneno, adir kowto welat û zîwanê ma, la ma hama hey pûş û çîsil de kay kenê. No gal zerar dano xebat no embazan . Ez nînan xax û kavêk vînena. Zîwanê xo kenî qûrbanê sîyasetê xo, no xeletî pîl o. Zîwan gera ser bigirîyo, zîwan çîn bo aw bîn pûş û polaxî. Coka zîwan kultur û edebîyat sera gera ma bibe yew, la wini hama nêbîy, hewcê keno ke ma bi

yew. Ez hêvî kena ke ma bînatê xo ra na cîyayê danî dûr. Binê gilû pêlanê zîwanê xo de benî yew û dîyenê pêser.

**E.Ş:** Şima têkilîya mabêna edebîyatê fekkî û kulturê modernî senî vînenê?

**O.F:** Eysaye gore ez eşkeno vajî ke edebîyata fekkî hama seyîna ra yew naqîl kûltûro modern bîya. Edebîyato fekkî sey behr o. No behr ra hama yew patik ya giryo yan zî nêgîryo lînenê kûltûro modern. Xebat esta la kêma. Hama zaf şuxul xebat û qeyd wazena.

**E.Ş:** Şima eşkenê bi kilmekî qalê xebata xo ya “Bi Mesel û Mîsalan Destanê Memê Alan” bikerê. Şima çira nûşt, kamcîn şertan de û seba çî?

**O.F:** Mi Memê Alan hêverî şêx Medîn Ozsoy ra goştarî kerdbi. Ey bi xo sê beyit niştîbî. Zazakî niştîbî. Zaf weşê mi şî bi niştêyê ey. Ey ra pey Apê Musa Anter yew filmê înan de ca girowt bî. Ey bi xo bi vengê xo zelala gan û nefes dabi ci. Cuwa pey mi xeylî no destan cerebna. 2011 de ez kowta hepsî. Kurmancî û zazakî çî açarnaye bi ez sera mujulîya. No nuştêyan de mi xo gore kême dîy. Ez qayîl bîya ke newe ra bî zîwanê Zazakîya newe ra binisî. Ey ra pey mi dest kerdo pey. Cîyayê eşq û cîyayê welat mi çîmi de yew çîme ra bî. Ez zî mehkumê no eşyan bîya. Wîmaya zerreyê mi de nalîyê eşq û welat herikîya. Mi goş na no vengê zerreyî ser, mi dest berdo qelem û mi nişt. Ez bawera ke yew xizmeto pîli mi kerd. Çendiko ez eşka bi qafîye wa mi nişti. Bi mesel û bi mîsalan mi alawiti. Paynî de no nişte peyda bi. Belka ebîyatê ma de gama vêrêna. Ez wazena ke şaîr û edebîyatkar ma wîmaya eseran bizêdnî. Yew kûllîyato hîna gereka ronîyo. Encax wîmaya ma eşkenê xo û zîwanê xo bipawe.

**E.Ş:** Şima eserê xo bi terzê mesnewî nûşt, seke ma zanê nê dewrî de hendî bi nê terzî eserê nûştişî epey kemî yê. Eceba şima çira no terz teqîb kerd?

**O.F:** Mi xeylî edebîyata dîwan wendî. Melayê cizîrî ra feqîyê teyran, Ehmedê xanî ra Elîyê tahîrî û Baba tahîrê urbane; Mewlana ra Hafîz şîrazî, Molla camî û

Ferididdûnê Attar. Inan no terz de qelem kay da. Ez qayîl nêbîya serbest binisî. Coka mi terzê no seydayan ra îstîfade kerd. Wînaya yew nuşte peyda bi.

**E.Ş:** Têkiliya nê eserî ke Ehmedê Xanî verî bi Kurmancî nûştî û ewroyî ser o xeylî çiyî ameyî vatene û nûştene. Gama şima eserê xo ercnenê (îzah kenê) têkilîya ê û dewrê modernî ser o şima eşkenê se vajê?

**O.F:** Tikî çiy netewîyê kenî. Eşq, hes welat, xap, îxanet her timi eynî yo, hesretî eynîya. Belka zeman bidelîyo la waşte û xacê însanan nêbedilyayî. Mi gore terzê vêrên de heyat est o. Ma heta xo heta rostig anêşune ma aver nêşinî. Yew bingey ronênîyo yew ameyene peyda nêbeno. No rid ra wînasî xebat ma rê şert û ferz ê.

**E.Ş:** Tesîrê nûştişê terzê klasîkî do seba xurtkerdişê Zazakî tesîrêko senî bikero? Kîtleya ke şima xîtabê ci kenê kamcîn het ê?

**O.F:** Ez hîna zaf yew bingey xo de peydaketdeyan rê xirab kena. Avam nê havasan esas gena. Yew areq çarey û nurê çiman mi rişna wo, ez wazena ke wînanan merdimî nişteyê mi biewnî, wa ti ra tahm û lezzet bigirî.

**E.Ş:** Şima kamcîn motîfanê folklorî edebîyatê modernî de peyda kenê, anê meydan?

**O.F:** Heme-heme zafiyê motîfanê folklorîkan mi dest kerdo ci şuxulnawo. Ez kam yew name bikerî ez nêzana. No pers yew cerebo xorî wazenî. No zî wa paweyê cigêroxan bo.

**E.Ş:** Şima têkilîya mabêna motîfanê folklorî û kulturê modernî senî vînenê?

**O.F:** Ez zeîf û kêmi vînena. Sey Behr ra çend dalpa/ dilope vînena, xabata pîli lazim a.

**E.Ş:** Goreyê şima îhtiyacîyê tewr pîli yê arêdayîşê tradîsyonê fekkîyî û viraştişê arşîvê tradîsyonê fekkîyî çi yê? Ê nê wareyî de problemê tewr pîli çi yê?

**O.F:** Problemo pîlêk esto. Bi vateyê Îsayê Mesîhî ez bivajî; ‘renc zêd a, rencbêr kêm ê’ îmkan kêm o. Paşdayey û wayîr vicyayey kêm ê.

**E.Ş:** Fikrê şima seba halkerdişê nê probleman çî yo? Pêşniyazîyê şima çî yê?

**O.F:** Yewbîyayîşê û yew ima ewnîyayîşê lazim a. Ziwane ma û şare ma ho ganan ver de, darû û derman wazeno. Eysaye her kes bîyo yew mallayê ho we‘zan dano, ho paweyê telqîn. Ma gereka xo aye mergî nêvînê. Mi gereka çim bidarne weşîy, warze pay. Verên vanê; ‘her çûmir de bimano çew hendey wahar metîn nîyo’ hal ma ho verê çiman de. Wahar zî ma yê.

# Hevpeyvîna bi Omitê Mistefê ra

Omitê Mistefê comes from the village of Noreşîn in the district of Bazîd (Turkish: Doğubayazıt). Apart from his mother tongue, Kurmanjî Kurdish, he knows several different languages, such as Arabic, Turkish, English, Russian and Persian. He sees collecting folklore as a national mission for intellectuals because, according to him, folklore constitutes the core of Kurdish life. He believes that the oral heritage of the ancestors should be protected and passed on to future generations. Mistefê has published various works on the Kurdish language, for example, the *Pocket Dictionary Of Kurdish*. He has also translated five books about the Kurdish language, literature and culture into Kurdish, Turkish and Arabic.

Omitê Mistefê ji gundê Noreşînê yê navçeya Bazîdê ye. Karê wî yê sereke kurdnasî ye. Ji bilî zimanê xwe yê zikmakî yê kurdî çend zimanên din ên wekî erebî, tirkî, ingilîzî, rûsî û farisî dizane. Ew qîmeteka mezin dide folklorê kurdî, û berhevkarîya folklorê wekî erkeka netewî û rewşenbîrîyê dibîne. Herweha ew folklorê kurdan wekî çavkanîya jîyana kurdan dibîne. Li gor wî, ew mîrate ji bav û kalên wî maye û divê mirov xwedî li vê mîrateyê derkeve û veguhezîne nifşên li pey xwe. Li ser zimanê kurdî, xebatên wî yê curbicur hene; xebata wî ya yekem “Ferhenga Destî” ye.<sup>1</sup> Mistefê çar pênc pirtûkên li ser ziman, wêje û çanda kurdî wergerandine kurdî, tirkî û erebî.

**Joanna Bochenska:** Ji kerema xwe ra ji me ra behsa xwe bike. Nav û paşnavê te çi ye? Tu ji ku yî û çend salî yî? Tu çi karî dikî?

**Omitê Mistefê:** Navê min ê li gor nasnameya tirkan Umit Demirhan e; lê navê min ê kurdî Omitê Mistefê ye. Ez 47 salî me û ji gundê Noreşînê yê Bazîdê me. Karê min ê sereke kurdnasî ye ku bêyî berjewendîyekê dikim. Ji bo aborîya xwe jî bi piranî karên wergerê dikim. Ji bilî zimanê xwe yê zikmakî yê kurdî çend

---

<sup>1</sup> Ew xebat wekî ferheng di sala 2006an da çap bûye.

zimanên din ên wekî erebî, tirkî, inglîzî, rûsî û farisî jî dizanim. Min li ser zimanê rûsî mastera xwe daye û sala 2020î ji Zanîngeha Agirîyê bawername wergirtîye.

**J.B:** Tu li ser çanda dekvî dişixulî, tu dikarî behsa destpêka wê bikî? Çima folklorê kurdî bala te dikişîne?

**O.M:** Ji ber ku ev erkeka netewî û rewşenbîrîyê ye. Bav û kalên me ev ziman û folklor bi awayekî devkî û carinan jî bi nivîskî veguhastine nifşa me. Em jî rewşenbîr û xwendî ne; lewra divê em vê emanetê bi dîtbarî, devkî û nivîskî biguhezin nifşên li pey xwe. Ji aliyê din ve ev erkeka mirovahîyê ye jî. Ji ber ku zimanê kurdî ne fermî ye, rastî jenosîdeka zimanî ya desthilatdaran hatîye û divê bê parastin. Çavkanîya folklorê kurdî gelê kurd ê resen e, parastina folklorê beşeka parastina gelê kurd e jî. Ji aliyê derûnî ve jî xebata li ser folklorê mirovî azad û serbixwe dike. Ji ber ku resenîya zimanê kurdî li gund û çolteran zindîtir e û pêwendîyên wan ên bi bîyanîyan ra kêmtir e, lewra pêwendîya mirovî ya bi kelepora kurdî wî azad û serbixwe dike.

**J.B:** Te kînga dest bi vî karî kir?

**O.M:** Min di zarokatiya xwe da mereqa çîrokan û zimanê wan ê herikbar dikir. Hema hema heta bîst salîya xwe li gundî bûm, diçûm ber berx û pezên bavê xwe, ji dawîya biharê heta nivê havînê li zozanan dimam, li wan deran em dibûn cîranên eşîrên din û min zimanê xwe xurt dikir. Di bîst salîya xwe da ji bo xwendinê çûm Misir û Sûdanê. Piştî vegera xwe, dîsa li gundê xwe mam û min dest bi amadekirina ferhengokeka bi kurdî kir; lê kêmasîyên min ên zimannasîyê hebûn û pêwîstîya min bi rêzimanê hebû. Min di sala 2004an da dest bi kurseka mamostetîya zimanê kurdî kir û piştî kursê ez êdî bi awayekî domdar bi karê berhevkarî û nûjenkirina zimanê kurdî ra mijûl bûm. Min di sala 2006an da xebata xwe ya yekem “Ferhenga Destî” ya kurdî weşand û piştî du salan jî çapa wê ya duyem a berfirehkirî derket. Min her du xebat jî ji kîsê xwe dan çapkirin û neketim bin mineta kesî. Bi qasî du sê salan min di dersxaneyê Orhan Doganî ya Şaredarîya Bazîdê da mamostetîya zimanê kurdî kir. Ji sala 2012an û vir ve min bi qasî deh-panzdeh pirtûkên kurdî yên nivîskarên cuda sererast kirin, û ew di weşanxaneyên cuda da hatine weşandin.

Min çar-pênc pirtûkên li ser ziman, wêje û çanda kurdî wergerandin kurdî, tirkî û erebî. Gelek gotarên zanistî yên kurdî amade kirin an jî wergerandin kurdî. Dîsa bi dehan gotarên zanistî sererast kirin û ew hatin weşandin. Beşdarî gelek panel û konferansên kurdî bûm. Min bi xwe jî romanek û pirtûkeka çîrokan nivîsandin. Ji bilî zaravayê kurmançî ez bi hemû zarava, devok û bindevokên kurdî ra eleqedar dibim. Xebatên min ên li ser kurmançîya celalîyan, goyîyan û xoresanîyan hatine weşandin; herweha lêkolînên min ên li ser zaravayên kelhurî, hewramî, lekî û feylî jî hene.

**J.B:** Tu bi kîjan rêxistin (sazî) û kovaran ra kar dikî? Herweha pêwendîya te bi kîjanî ra heye?

**O.M:** Min ji sala 2008an ve ji malperên kurdî ra nivîsî û bûm seredîtorê malperêka bi navê *yekbun.com* ku aniha girtî ye. Bi domana demê ra kovarên Peyam, Nûbihar, Zend, Kurmançî û Fritillaria Kurdicayê xebat û lêkolînên min weşandin. Min demekê ji malpera *beroj.org* û *beroj.com*ê ra jî nivîsî. Bi tu kovar û rêxistinê ra pêwendîyeka min a organîk tune ye; lê lêkolînerekî serbixwe yê malpera *kurdishstudies.pl* me, endamekî mêvan ê *Koma Kurmançî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê* me, nivîskarekî nefermî yê malpera *riataza.com*ê me. Ez çendekê endamê desteya weşana kovara *Zendê* jî bûm ku ew aydê *Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê* ye.

**J.B:** Tu îşê xwe çawa finanse dikî?

**O.M:** Hemû xebatên xwe yên kurdnasîyê ji kîsê xwe û li ser hesabê xwe dikim. Ez vî karî wekî erkeka netewî û rewşenbîrîyê dimeşînim. Ji bo van xebatên xwe ji tu alîyî alîkarîya aborî wernagirim da ku bandora wan li ser xebat û ramanên min çênebe. Lewra karên giran ên demdirêj nakim û tenê bi qasî hêza xwe xebatan dimeşînim.

**J.B:** Kevneşopîya devkî ji bo te çî ye? Tu dikarî wê pênase bikî?

**O.M:** Zimanên fermî yên dewletan li bajaran xurttir in, ji ber ku navendên zanistî yên wan dewletan her roj bi dehan xebatan dimeşînin; herweha li wan welatan

zimanê gund û bajarokan qels bûye. Lêbelê ji bo kurdî rewş berevajî vê ye; zimanê kurdî yê zindî li dûrî bajarokan e, li wan cihên ku piyên bîyanîyan lê neketîye û gelê herêmê di nava aramî û jîngeha xwe ya xwezayî da dijî. Li gund û bajarokan dengnasîya zimên xera nabe, fonetîk û stresa li ser peyvên resen e; herweha ji alîyê peyv û biwêjan ve jî xurttir e, stran, destan, çîrok mîna çemekî dikişin. Bi kurt û kurmancî kevneşopîya devkî zimanê fermî yê kurdan e.

**J.B:** Dema tu keresteyên folklorê berhev dikî bala te bêhtir li ser çî ye yan jî kîjan cureyî ye? Kîjan cureyên çanda devkî bêhtir bala te dikişînin? Tu dikarî nimûneyên wan bidî?

**O.M:** Bi rastî ez nabêjim ev hûr e yan jî gir e, giring e yan jî kêmnirx e. Folklor ji ber bêdewletbûna kurdan zimanê fermî yê kurdan e. Ji ber ku ez zimannas im, ez pîranî li ser fonetîk, morfolojî û sentaksa kurmancî dixebitim û vî zaravayî bi zaravayên din ra berawird dikim. Lêbelê van dawîyan bi wêjeyê ra jî eleqedar bûm ku divê ji gotinên pêşîyan dest bi xwendin û guhdarîkirina materyalên folklorê bikim. Folklor çavkanîya yekem a ziman, çand, wêje, erdnîgarî û dîroka kurdan e. Kurdan her ramana xwe bi folklorê ragihandîye nifşên nû.

**J.B:** Kîjancureyên çanda devkî bêhtir balatedikişînin? Tu dikarî nimûneyên wan bidî?

**O.M:** Ji ber ku ez ferhengsaz im, ez zêdetir li peyvên kêmnas ên ku min nebihîstine digirim. Wekî nimûne, her kurd rengdêra “spî”yê dizane; lê gava ez bibihîzim ku li hinek deveran rengdêrên “çîl” û “sîs” jî tên bikaranîn, ez dipirsim bê ka dikarim bibêjim “berf sîs e”, helbet ew dê bibêjin “Na, sîs tenê ji bo rengê pez û dewaran e, gava rengê wan tam spî be û qet xalek ji rengên cuda tê da tunebe wê hingê sîs e, ji bo berfê çîlspî tê gotin”. Nimûneyeka din gava ez bibihîzim ku ji bo bêjeya “paştû”yê “katar” jî dibêjin, ez dipirsim bê ka zayenda navdêrê çî ye; gelo wekî “katara min” tê tewandin yan wekî “katarê min”. Ez wê hingê hîn dibim ku dibêjin “katara min”, wisan e ev navdêreka mê ye, ji ber ku bi qertafa /-a/yê tewîyaye.

**J.B:** Gelo te versiyonên orîjînal ji yên neorîjînal cuda dikî?



**O.M:** Ez versiyonên devera xwe ji çend kesên din jî dipirsim û rastîya wan derdixim holê. Peyvên xwerû jixwe her kes an jî beşeka civakê dizane; lê hinek peyvên pêkhatî û hevdudanî hene ku ji afirînerîya kesan e, tenê ew bi kar tînin, û li nava civaka wan a nêzik belav dibin. Piranîya van gotinên yekane bi navê xwedîyê xwe tên nasîn: “bi qewlê apê filankes an jî meta filankes, hey pişîka feraqalês a devmalêz!” (Pişîka ku amanan dadilêse û devê wê bigilêz e).

**J.B:** Gelo te qet berhemeka neorîjînal ji arşîva xwe derxist?

**O.M:** Gelek caran ev hatîye serê min. Carekê kesekî bêcirmanî (ji herêma Torê-Êlih) ji min ra got ku li bal wan ji dêla “erê”yê ve dibêjin “dorê.” Di destpêkê da ji min ra gelekî balkêş hat, lê min bikaranîna wê jê xwest, piştî çend hevokan hîn bûm ku gava weha bipirsî “bavê te li malê ye?” nabêjin “dorê”; gava yek bibêje “ez ê îro herim sûkê”, û tu jî bibêjî “vaye baran dibare, bisekine, bila baran dayne, paşê here!” ew jî ji bo piştrastkirinê dibêje “aha dorê, ez paşê biçim” ku ew jî peyva “dogru”ya tirkî ye ku bi awayekî xirabûyî ketîye nava zimên. Li alîyê me jî hinek peyv hene ku di eslê xwe da ne kurdî ne, wekî “qatix (katik)”a tirkî bi wateya “mast” ketîye nava devoka serhedîyan û peyva kurdî ya “mast” jî wateyeka taybet girtîye ku bûye “mastê bi to” ye.

**J.B:** Gelo li gor te, tesîra çanda nivîskî û ya modern li ser gotin û tevgerên dengbêjan heye?

**O.M:** Du alîyên vê mijarê hene. Yek, stranên gelêrî yên kevn bi awayekî kevneşopî tên veguhastin. Çi stranên govendê çi stranên dengbêjî yên ku em jê ra dibêjin “kilamên rûniştî” bêtî guhertin tên vegotin. Pirsgirêka vê beşê ew e ku hosteyên stranbêj û dengbêj her roj kêmbin. A diduyan, bandora wêjeya modern, bîrdozî, sîyaset û populîzmê li ser gotinên dengbêjan û tevgera wan heye. Gelek stranên nû teqlîda hinek muzîkên bîyanî ne, gotinên wan bêwate ne û dûrî fonetîka kurdî ya resen in. Dikarim bibêjim ku gelek stranbêjên nû hene ku ne li bajarekî kurdan rûdinin, ne kurdîyeka baş dizanin, ne jî haya wan ji hunerê heye. Ev kes deng, rû, fîzîk, navdarîya xwe, handan û sponsorîya hinek alîyan bi kar tînin; stranên pêşkêşkirî û amadekirî dixwînin. Li vir pirsgirêkê dijwar jî heye ku hunermendên

dewletên serdest newayên kurdî didizin û bi awazên xwe dikin malê xwe. Bi vî awayî bandoreka dizîyê ya neyînî jî li ser tevgera hunera dengbêjîyê heye. Heta ku sazîyeka kurdî ya parastina awaz û newayên muzîka kurdî tunebe, qaçaxçîyên<sup>2</sup> çandî dê malê kurdan bidizin û patenta bîyanîyan lê xin. Lêkolînera kanadayî Christina Houghê li ser vê dizî û qaçaxçîtîya çandî gotareka giring nivîsîbû, min ew ji ingilîzî wergerand kurdî û di kovara Zendê da hat weşandin.

**J.B:** Te behs kir ku keresteyên çanda devkî berhev dikî. Gelo tu dikarî behsa berhevkarîya xwe bikî? Tu vê yekê çawa dikî? Rê û rêbazên te çi ne?

**O.M:** Bi rastî çanda kurdî ya devkî deryayeka bêserûbin e; ne ez ne jî kesekî din dikare tevahîya çanda kurdî ya devkî berhev bike. Heke em zaravayên din ên kurdî jî bidine ser, îcar ev keleporekê bêtir zêde dibe. Ez bi piranî li ser devoka celalîyan a Bazîdê dixebitim û li ser alîyê wê yê zimannasîyê radiwestim. Dema ku min ferhenga xwe amade dikir, min ji ferhengên çapbûyî jî sûd werdigirt. Îcar heke hinek peyv li alîyê me tunebûna yan jî bi şeweyekî din bihatana gotin, min peyvên me yên herêmî jî tê da bi cih dikirin. Ez carinan li rastî hinek peyvyan dihatim ku min ne bihîstine û ne jî di çanda devkî da xwendîye, wê hingê min hewil dida ku pêşîyê hîn bibim bê ka ev peyv li kîjan deverê hatîye bikaranîn, û min ew peyda dikir. Piştra heke min peyva devera xwe bizanibûya, di ferhengê da bi cih dikir; lê heke nizanibûya jî min ji doralîya xwe dipirsî û peyda dikir. Ji ber ku ez li Bazîdê dijîm û di nava gelê kurd da me, gava pêwîstîya min bi peyvekê çêdibe raste rast ji devê gel hîn dibim.

**J.B:** Gelo ji bo wê tu perwerde bûyî? Li ku derê? Ev perwerde çawa bû?

**O.M:** Min di kurseka ji bo mamosteyên kurdî da perwerdeya hîndekarîyê dîtîye û bawernameya min jî heye. Ev kurs di navbera salên 2005 û 2006an da, li Stenbolê hate dayîn û ez jî beşdar bûm. Ji bilî vê yekê ez endamekî Koma Kurmancî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê me û ji sala 2012an ve li ser berhevkirina peyvên herêmî dixebitim, xebatên xwe pêşkêşî civînê dikim û lêkolînên min ji alîyên zimanzanên kurd ên naskirî ve tên nîqaşkirin. Piştî tomarkirina peyvê û dîyarkirina

---

<sup>2</sup> Qaçaxçî: kesên ku dizîyê dikin.

taybetmendîyên wê yên zimanî yên wekî cureyê peyvê, zayend, tewang, gerguhêzî û hwd, ev xebat di kovara enstîtuyê da tîrî weşandin. Di civînê da carinan pêwendîya zindî bi kal û pîran ra tîrî danîn û wateya peyvê ya herêmî bi wan ra tîrî nîqaşkirin. Ji bilî vê yekê min demekê li Misirê di Zanîngeha El-Ezherê da beşa ziman û edebiyata erebî xwend, herweha min mastera xwe li ser zimannasîya rûsî tamam kirîye. Sertîfîkayeka min a mamostetîya zimanê ingilîzî jî heye ku xebateka hevpar a Zanîngeha Anadolûyê û Zanîngeha Cambridgeê ye.

**J.B:** Gelo aniha rê û rêbazên te yên berhevkarîyê li gor ên berê guherîne? Çawa?

**O.M:** Belê, min di destpêkê da bi heweskarî û li ser bingeha zanyarîyên xwe yên zimanê erebî û tirkî dest pê kir. Piştra min dît ku zimanê kurdî yê ji koma hind-ewropî ji zimanê erebî yê ji koma zimanên samî û zimanê tirkî yê ji koma zimanên ûral-altayî ji gelekî cudatir e. Lewra min giringî da zimanên koma xwe, hînî farisî û zaravayên kurdî yên din jî bûm. Piştî ku min ferhenga xwe amade kir, min gelek rexneyên bikêrhatî wergirtin û kêmasiyên xwe telafî kirin. Ji bo vê yekê jî min sertîfîkayên zimanê ingilîzî û rûsî bi dest xistin, min bi zanyarên naskirî ra têkilî danîn û ji teknolojîya ragihandinê û civakî sûd wergirt. Berê ez li peyvyan digerîyam, diçûm cem merivan û gundan, min peyv li lînûskan tomar dikir û li kafeyên înternetê derbasî komputerê dikir; paşê min komputerê jî xwe ra stand û berhevokên xwe li ba xwe kom kirin. Piştî belavbûna telefon û înternetê karê berhevkarîyê hêsantir û leztir bû, êdî min daxwazên xwe zûtir bi dest xistin.

**J.B:** Arşîv ji bo te tîrî çî mane ye?

**O.M:** Gelê kurd û bîra wan arşîva min e û ez jî di nava wan da dijîm. Kînga bixwazim ji mezin û pisporan dipirsim û hîn dibim. Mixabin ez nikarim bi rojan bigerim, gotinan bi deng û dîmenan tomar bikim, ne berê ne jî niha; jixwe ji bo karê min ev ne pêwîst e jî; lê ji bo veguhastina kevneşopîya devkî li ser teknolojîya modern divê xebatên meydanî werin kirin. Ji bo vê yekê jî derfetên aborî û ewlehîyê yên baş pêwîst in. Arşîv ji bo min maleka şexsî ya ewle, jûreka taybet, pirtûkxaneyeka fireh û dewlemend, amûrên tomarkirinê yên pêşketî ye; lê mixabin ji wan gişan bêpar im. Di mala xelqê da rûdinim; ji jûra taybet, pirtûkxane û amûran bêpar im

û hêvîdar im ku rojekê aborîya min baş be û bigihîjim miraz û daxwazên xwe. Dibe ku bi qasî min kesekî ji vê rewşa hejarîyê nekişandibe. Ji bo şirovekirina vê mijarê tenê nimûneyeka bidim: Di destpêka tomarkirina peyvnan da min lênûsk bi kar dianî û min ji komputerê baş fam nedikir. Rojekê min deftera xwe da ber xwe û hemû peyvên xwe di rûpeleka wordê da tomar kir. Heta êvarê min tevahîya peyvnan derbasî ser komputerê kir, û ji kêfan deftera xwe avêt sobeya vêketî. Dema ku ji bo xwarina şîvê rabûm, min xwest ku rûpela wordê bigirim, fişa komputerê bikişînim û herim xwarinê; lêbelê min rûpela wordê “save (qeydkirin)” nekiribû û neparastibû. Dema ku komputerê got ku tu yê nivîsa xwe tomar bikî, min bi şaşîti li ser “na”yê tikand û piranîya wê xebata min nehat tomarkirin, defter jî şewitîbû û ez çend rojan ji qehran bêkêf bûm. Piştî wê bûyerê min arşîvên xwe yê dijîtal baş parastin.

**J.B:** Gelo arşîva te heye? Ew arşîv çawa ye (nivîskî, teyb, kitêb, dijîtal)? Kerem bike hemû nimûneyan bide?

**O.M:** Wekî ku min got, gelê min arşîva min e; ji bo wê divê gelê xwe biparêzim da ku arşîva min zindî û ewle bimîne. Demekê hinek hevalan berhevkarî dikir û min edîtorîya xebatên wan dikir; ev xebat li ser navê wan derdiket. Piştî ku hevalekî me yê bi navê Nîhat Gultekîn hat gulebarankirin û bi birîndarî ji vê bûyerê filitî, min pêwîstî bi berhevkarîya şexsî dît. Berê, min bi amûrên hevalan berhev dikir û demildest diweşand. Piştî derfetên min çêbûn û min jî bi telefona xwe tomar kir. Ez gava li ser projeyekê bixebitim, derdikevim nava gel û peyvnan berhev dikim. Paşê ev xebat li ser malperan û di kovaran de tê weşandin. Hemû arşîva min tiştên weşandî ne, û êdî bûne malê gel. Çawa ku min ji gel stendîye, min dîsa radestî gelî kirîye. Divê wê jî bibêjim ku min carekê pirtûkxaneya xwe û carekê jî harddîska xwe şewitandin ku nekevin destê polîsên dewletê. Tirsî min ew tirs bû ku zîyan bigihîje kesên ku bi min ra axivîne. Ji bo vê yekê jî ez çî berhev bikim, demildest diweşînim ku wînda nebin û nekevin talûkeyê. Piştî şewitandina pirtûkxaneya xwe min êdî pirtûk nestandin, ji yê hevalan, ji yê ku wekî diyarî dane min û ji yê pirtûkxaneyan sîd wergirt. Ji ber ku gava pirtûkên min zêde dibin malbata min dikeve nava tirsê. Herweha piştî şewitandina harddîska xwe êdî dosyeyan ji bo demeka dirêj li bal xwe nagirim. Piştî weşandinê, wê dosyeyê ji komputera xwe

diavêjim. Bi rastî pirsgirekeka din heye ku komputera min ne aydê min tenê ye; zarokên min jî tê da spartekên xwe çêdikin, dersên dibistanê dişopînin û ez jî tê da nivîsên xwe dinivîsim.

**J.B:** Gelo ew arşîv xwedî pergal e? Tu arşîva xwe çawa bi nav dikî? Bi rêya dosyeyan, cureyên keresteyan, hwd?

**O.M:** Belê pergaleka min a têkûz hebû, “hebû” dibêjim ji ber ku piştî şewatê êdî arşîvê nagirim. Wê hingê min dikaribû dosyeyên dengî weha bi nav bikira: Pêşîyê min ê navek lê bikira (wekî ferheng, gotinên pêşîyan, çîrok, mamik, lîstikên zarokan...), piştî min ê çend dosye di hundirê dosyeya “ferheng”ê da vekira; wekî “ferhenga celalîyan”, “ferhengên çapkîr”, “ferhengsazî”. Di dosyeya “ferhenga celalîyan” da dîsa dosyeyên wekî “gundê Noreşîn û Bazîdê”, “gundên bereka Agirîyê” “gundên Îdirê”, “gundên bereka Golemasîyê”, “gundên bereka Tendûrekê”, “gundên Makûyê”. Heçî ku naveroka dosyeyên wordê ne, min di destpêkê da li ber peyvê weha dinivîsiye: “şene” tr. dirgen (Noreşîn, Bazîd, Makû) “dirgan (Agirî, gundê ...)” Piştî min ew dabeş dikirin: amûrên malê, amûrên çandinîyê, amûrên şivanîyê, biwêj, gotinên pêşîyan, peyvên kêmnas, peyvên hevpar...

**J.B:** Gelo tu arşîva xwe bi awayekî diparêzî (mesela ji windabûnê, tozê, polîsê, hwd)?

**O.M:** Berî şewitandina arşîva xwe ez ketibûm bin bandora Mele Mehmûdê Bazîdî û difikirîm ku divê nimûneyên çanda kurdî bigihînim arşîvên cîhanê da ku wan ji windabûnê biparêzim lêbelê van dawîyan gihiştim wê qinaetê ku divê “mirovê kurd” biparêzim. Ji ber ku êdî hîn bûm ku dezgehên cîhanê di çarçoveya sîyaset û berjewendîya xwe ya netewî da miameleya zimanê kurdî dikin. Wekî nimûne, beşên kurdnasîyê sertîfîkayê didin nimûneyên çanda kurdî; herweha beşên îrannasî, tirknasî, ermenînasî, azerînasî û erebînasîyê jî sertîfîkayê didin hinek kesên ku qaçaxçîtîya çanda kurdan, dikin. Ez nikarim bibêjim hemû xebatên wan malê dizîyê ne, lê gava dizîyê dikin û patenta dizîya xwe ji dezgehên cîhanê werdigirin êdî mijar dibe “pirsgirêkeka hiqûqî” û ji bo vê yekê jî pêwîstîya kurdan bi dewletekê heye ku bikaribin parastina mafên xwe bikin. Lewra herçiqas bi awayekî çalak sîyaset û mafparêzîya kurdan nekim jî, li ser vê qinaetê me: divê

dam û dezgehên kurdan ên netewî hebin ku bikaribin kelopora kurdî biparêzin. Gelên xwedandewlet ji tirsê girtin û zîndanê arşîvên xwe naşewitînin, kelepora wan ne şexsên dilxwaz diparêzin, lê sazîyên peywirdar tînin parastin, zimanê wan jî ne zimannasên heweskar, lê sazîyên zimên bi pêş ve dibin. Bi kurt û kurmancî dewleta gelên xwedandewlet her tiştî jî windabûnê diparêzin û divê kurd jî bigihîjin wê têgihîştinê.

**J.B:** Gelo rexistin (sazî) û kovarên ku tu bi wan ra dixebitî, karê te arşîv dike yan na? Gelo arşîva wan heye?

**O.M:** Belê arşîvên wan hene. Wekî nimûne, arşîvên Enstîtuyên Kurdî yê Stenbol û Parîsê hene, lê arşîva Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di bin gefê da ye û carinan bi awayekî fermî tê talankirin jî. Nimûneyeka din, databaseên malperan hene lê gava malper hatin girtin ew agahî giştî jî holê radibin, yê hinek zanîngehan jî hene, lê gava ew beşa kurdnasîyê hat girtin, hemû zanyarî dikevin kuncikên tarî û gihiştina wan gelekî dijwar dibe.

**J.B:** Gelo bi ya te kovar dikare bi rola arşîvê rabe?

**O.M:** Helbet dikare. Lê gava kovar hate girtin, nimûneyên wê nayên peyda kirin. Ji ber ku pirtûkxaneyeka kurdî ya netewî tune ku xebatên çapkirî biparêze, lêkolîner herê, û jê sûdê werbigire. Lewra divê li ser yekparçeyîya axa kurdan sazîyên kurdan ên netewî hebin.

**J.B:** Gelo tu keresteyên ku berhev dikî, wan çap dikî yan jî diweşîni? Li ku derê? Çawa?

**O.M:** Min heta niha sê-çar pirtûkên xwe li weşanxaneyên kurdan ên li Stenbolê çap kirin. Lê piştî poşman bûm. Ji ber ku pirtûk kêmtînin firotin, em nikarin mafê telîfê ji weşanxaneyan bistînin. Îcar xebatên me ji wan ra dibin pere û qezenc, ji me ra jî dibin navdarî û keder. Ez êdî pirtûkên xwe bi awayekî dijîtal amade dikim û bi şewazê pdfyê belav dikim û gava dezgehên kurdan ên netewî ava bibin, hêvîdar im ez jî bi mafên xwe berhemên xwe bidim çapkirin.

**J.B:** Li gor te ji bo çanda devkî ya kurdî kîjan metodên weşanê/çapkirinê baştir in? Çima?

**O.M:** Divê ev xebat ji aliyê zanîngehên kurdî yên netewî ve werin weşandin, parastin û bipêşvebirin. Enstîtuyên têkildar ên vî karî bê navber û bi awayekî zanîstî bimeşînin. Îcar aniha ne dewleta kurdan a serbixwe heye ne jî sazîyên kurdî yên fermî hene. Heke pergala navnetewî li ser tune kirina kurdan nehatibe avakirin, divê Neteweyên Yekbûyî, Yekîtiya Ewropayê û dewletên hêzdar bingeha vî mafê kurdan amade bikin heta ku dewleta wan ava dibe. Nexwe zimanê kurdî dê bibe mîna zimanê latînî yê mirî. Lewra divê civaka kurdan were parastin ku çanda wan a devkî jî mîna çemekî biherike.

**J.B:** Tu ji bo weşanê yan jî çapê berheman çawa hildibijêrî? Ji bo te ya giring çi ye?

**O.M:** Ji ber tunebûna ferhengê kurdî, min cara pêşîn bi kurdî ferhenga xwe amade kir, ji ber tunebûna pirtûkên ayîna îslamê yên bi kurdî cara pêşîn min çavkaniyeka ayînî û hinek tekst wergerandin kurdî, ji ber tunebûna zaravanasî û devoknasîyê cara pêşîn min hinek xebatên destpêkî meşandin. Bi kurtasî ez xebatê li ser kêmasîyên çand û zimanê kurdî dikim.

**J.B:** Armanca te ya çapkirinê/belavkirinê çi ye?

**O.M:** Bi rastî ev karên ku dikim ne karên şexsan e; yên sazîyên gelemperî yên netewî ne. Lê çi bikim? Ji ber bêdewletbûnê ez didim destpêkirin û hêvî dikim ku bala nifşa xwe bikişînim ser van mijaran. Ez di mijarê da gihiştim serkeftinê jî, lêbelê pergala cîhanê ya “nemirovdost” û “nezanistî” astengîyan datîne pêşîya me.<sup>3</sup> Di vir da lîstikeka kurdan a bi navê “Topa Dara” yan jî “Topa Garanê” heye. Ji navê wê xuyaye ku ev lîstikeka kurdan e, lê di kovara zanistî ya Zanîngeha Agirîyê da wekî lîstikeka tirkan hatîye pêşkêşkirin. Nivîskarên vê derewê dê herin Erasmusê, li welatekî Ewropayê bixwin, vexwin, derewa xwe mor bikin û werin, bibin doktor, profesor. Ev tenê derewek e ku ez pê hesîyame. Îcar bi hezaran derewên weha û qaçaxçîfî û dizîya çandî pêk tên. Mirovek an jî komeleyek nikare bersiva van

<sup>3</sup> Wekînumûne, livêlînkêbinêrin: <https://dergipark.org.tr/en/pub/aicusbed/issue/44953/507554>

derewan bide, divê sazîyên navdewletî jî bawernameyên van zanîngehan rakin û wan rexne bikin. Êdî em ji xweparastinê nikarin tiştêkî ji gelê xwe ra bikin. Îcar em ê başîyên xwe derxin holê yan xirabîyên cînanan paqij bikin? Mixabin cîhana zanistî gelekî bê însaf e. Ji ber ku dewletên wan hene, qaçaxçî û dizên çandî her derewê vedigerînin meqaman û kurd jî ji tirsê polîsan, girtin û kuştinê nikarin çanda xwe biparêzin. Cîhana zanîngehan hevparê vê zilmê ye. Ji ber ku gava kredîyê nedin vê zilmê, ew dê nikaribin bidizin. Ew diz erebeya me didizin, parçe bi parçe difiroşin cîhanê û kesek nabêje te ev ji ku anîye?

**J.B:** Tevgerên weşanxane û cureyên weşanên kurdî, li gor salên berê li hember berhemên çanda devkî guherîne?

**O.M:** Helbet diguhere. Piştî weşana ferhenga min, sê çar ferhengên kurdî, bi kurdî derketin. Herweha piştî weşandina pirtûkeka ayînê bi dehan pirtûk derketin. Piştî gotara min a li ser kurmançîya Xoresanê û Goyî tezên akademîk hatin nivîsandin.

**J.B:** Tu dixwazî versiyona çapkirî ji bo kê be?

**O.M:** Helbet dixwazim ku guhertoya çapkirî ya xebatên min aydê min be û ji min derbasî binemala min be, lê heke weşanxaneyên baş derfetên baş pêşkêş bikin meriv dikare bifiroşe wan jî. Lê bijardeya îdeal ew e ku bikaribim xebatên baş amade bikim, li ser navê min weqfek an jî enstîtuyek were damezrandin û li ser bingeha xebatên min karên zanyarî werin meşandin.

**J.B:** Gelo tu ji bo berhemên çapkirî pêşgotin an jî şirove dinivîsî? Çima û wan çawa diafirinî/dinivîsî?

**O.M:** Belê, hem di gotarên xwe de “pêşek”ekê dinivîsim hem jî “pêşgotinek”ê li pirtûkên xwe zêde dikim. Di pêşekan da bi kurtasî qala naveroka gotara xwe û giringîya wan zanyarîyan dikim. Di pêşgotinan da jî sedema afirandina berhemê, metodên bikarhatî, naveroka beşên wê û serencama wê xebatê nîşan didim.



**J.B:** Gelo ji bilî çapê/weşanê tu/yan hevalên te bi rêyên cuda ji bo belavkirina çanda devkî ya kurdî digerin (mesela festival, şano, pêşkêşên cuda û hwd)? Eger hebin tu dikarî çend nimûneyan bidî?

**O.M:** Bi rastî hinek hevalên min bi gelek cureyan beşdarî belavkirina berhemên xwe dibin. Wekî nimûne, di heyama afirandina berhemên xwe da hinek hevokên hîlbijartî ji xebata xwe didine ser medyaya civakî û qala xebata xwe ya paşerojê dikin. Dema ku diqedînin dîsa dibêjin “qedîya û çû.” Piştî weşandinê fotoyê xebatê parve dikin, gava pêşangehên pirtûkan vedibin gazî xwendevanên xwe dikin ku filan rojê li filan platformê pirtûkên xwe îmza dikin, bi wan xebatan beşdarî panel û semîneran dibin, ji wan xebatên xwe gotaran derdixin û balê dikişînin ser xebata xwe, gava sponsorekî bibînin wan xebatan dikin senaryo û pêşkêşî civaka dîtbar dikin. Ez bi xwe ji van danasînan zêdetir li ser xurtkirina naveroka xebatên van hevalan dikim, tekstên wan bêpere sererast dikim, bi pêşnîyazên xwe kêmasîyan tamam dikim û hwd. Bi awayekî ji wan ra rêberî, hostatî û mamostetîyê dikim.

**J.B:** Pêwîstîyên herî giring ji bo komkirina çanda devkî û avakirina arşîvên çanda devkî çi ne? Problemên herî mezin çi ne?

**O.M:** Problema herî giring ev e: dewletên ku li serê kurdan hikum dikin her gav dikarin van xebatan talan bikin, dest bidin serê, xwedîyên wan bikujin, biavêjin zindanê û sirgûn bikin. Ji ber ku wan desthilatdarîya xwe li ser tunekirina çanda welatîyên xwe yê ne ji nijada xwe ava kirine. Lewra pêwîstîya herî pêşîn damezrandina dewleteka serbixwe ya bi pîvanên modern e. Ji bo ku mijar baş bê famkirin, dikarim wiha bibêjim: Gava ku mirîşk dikeve kurkê li ser hêkên xwe dimelise û daxwaza derxistina cûcikan dike. Xwedîyên mirîşkê pêşîyê cihekî ewle û hêlîneka çêkirî jê ra peyda dikin, li gor qewareya mirîşkê ji 11 hêkan heta 23an didin bin wê, genim û ava wê didin nêzîkê wê, û li benda cûcîkderxistinê disekinin. Di vê navberê da divê lîsa mirîşkê dûrî pisîk, qulikên mar û mişkan be ku ziyane nebîne. Ev ji bo avakirina arşîveka çanda devkî jî wisa ye; pêşîya pêşîn dorhêleka ewle, materyalên komkirinê, beşdarên xebatê pêwîst dikin. Ji heyama Mela Mehmûd û Jabayî heta îroyîn bi awayekî dilxwaz nimûneyên çand û zimanê kurdî tî berhevkin û parastin, lê sûda wê ya karîger ji bo astengkirina

asîmîlasyonê ewqas ne xurt e. Heke kurdan li ser damezrandina dewleta xwe zêdetir xebat bikirana aniha pêwîstî bi xebatên min ên şexsî tunebû; dibistan, zanîngeh û enstîtuyan dê ev kar bikira û ez ê jî di hunerekê da bibûma pisporekî fermî. Bi kin û kurt dibêjim, li Efrîqayê kişandina diranên filan û bêderman hiştina wan heta ku bimirin çawa be, berhevkirina çanda devkî ya kurdî jî tiştêkî wisa ye. Gava hinek kes diçin ji kal û pîran gotinan berhev dikin, ev kes rastî teşqeleyan tên. Divê ewlehîya kesê ku diaxive were garantîkirin, û paşê ew dest bi komkirinê bikin.

**J.B:** Fikrên te ji bo çareserîya van probleman çi ne? Pêşnîyazên te?

**O.M:** Wekî ku min got, ji bo yekparçeyîya xaka Kurdistanê, ziman, çand û dîroka kurdan gefa tunekirinê heye. Bi gotineka din, li ser piştta “mirovê kurd” agir tê vêxistin. Binêrin, li alîyekî desthilatdarên bîyanî yên li ser welatê kurdan dikarin tevahîya hebûna wan talan bikin, dikarin bajarê Heskîfê yê qedîm biguhêzin cihekî din û li alîyê din kurd nikarin îskanek ava vexwarinê bidin xwişk û birayên xwe yên li kêleka xwe. Ev tişt gişt li pêşberî çav û kamerayên cîhana, qaşo azad, tên kirin. Meriv car caran dikeve şikê, gelo cîhana azad wekî gladyatoran li kurdan dinêre û bi zilma li ser kurdan kêfxweş dibe? Kurdekî kolber li gor qanûnên desthilatdaran bi guleyekê tê kuştin û dewletêka desthilatdar dikare bajarekî ji şûna wê rake û ji wan kesek nayê cezakirin. Ev paradokseka navnetewî ye. Çareserî ew e ku cîhan bi erka xwe ya mirovahîyê rabe û mafê kurdan ê jîyanê û jîyandina çanda wan teslîmî kurdan bike. Di van du sed salên dawî da kurdan hemû hewlên xwe dan ku bigihîjin mafên xwe, lê platformên navnetewî mafên wan dane koledarên wan. Li ser yekparçeyîya xaka Kurdistanê agirek heye û her kes temaşevan e. Ji ber ku kurdan çî bikin jî nikarin ji vê pergala navnetewî ya li ser kurdan ferzîkirî derbas bibin, îcar yan divê cîhan bi erka xwe ya mirovahîyê rabe û vî agirî çareser bike ku zîyanek negihîje hebûna kurdan; an jî divê agir bi cîhanê bikeve û her kes têkeve heyra canê xwe ku kurd bikaribin bi bêhneka fireh dewlet û sazîyên xwe ava bikin. Heke çareserîyeka din hebe ku zîyan negihîje kurdan, destkeftî û serweta wan a şaristanî fermo hûn pêşkêş bikin. Dema ku devera Balkanê ji pişt perdeya hesinî ya sosyalîzmê derket, pergala navnetewî hanzûka ji wan ra dewlet, sînor, artêş û pêwîstîyên dewletbûnê teslîm kir. Ev nêzîkî du sed sal in kurd doza mafên xwe dikin û pergala navnetewî mafan dide destê dijminên wan ên bêmerhemet.

**J.B:** Cih û rola jinan ji bo parastin û komkirina folklorê kurdî çawa dibînî?

**O.M:** Jin û zarok ji hev nayên cudakirin. Zarok wekî cûcîkên çivîkan di bin perikên makên xwe da bi firê dikevin. Di civaka me da jin zêdetir karên nava malê û bajêr dikin û mêr jî karên li nava bajar û welatan dikin. Pergala cîhanê ya ku maf nade kurdan, jinên wan di malan da hatine zîndankirin, û nahêle ku ew jî edetên dinyayê, nîmetên dinyayê tam bikin. Lewra jin bûne fabrîkeyên çanda kurdî ya devkî, lê serdestan dest avêtîye vê qadê jî û nahêlin ku jinên kurd berhemên xwe yên kurdî di nava ewlehîyê da pêşkêşî cîhana mirovahîyê bikin. Ji bilî kal û pîrên ku hejmara wan her roj kêmtir dibe piraniya jinan êdî folklorê kurdî naporêzin. Dibistanên desthilatdarê yên fermî her roj jin û zarokan ji çanda kurdî qut dikin, desthilatdarên dibistanan vê zilma xwe bi piştgirîya dewletên pêşketî pêk tînin. Jin êdî newêrin nimûneyên çanda kurdî bi pêş ve bibin, cil û bergên kurdî li xwe bikin û biguhêzin nifşên nû. Di nava vê aloziyê da endamên civakê yên herî qels jin û zarok in û ewlehîya wan tune ye. Cîhana pêşketî bi alîkarîya serdestên bîyanî yên li ser xak û yekparçetiya kurdan agir berdidin jin û zarokên kurdan. Tirsê zîndanê, heqaret, tecawiz, kuştin û firotinê ya wekî li Şengalê, xebatên komkirin û pêşvebirina çanda kurdî ji devê jinan têk birîye, mixabin.

**J.B:** Di berhemên folklorîk da kîjan motîfên jinê yan jî lehengên jin zêde bala te dikişînin yan îlhamê didin te û li ser karê te bi tesîr in? Tu dikarî nimûneyan bidî û taybetiyên wan îzah bikî?

**O.M:** Bi rastî jina kurd di her qada jiyanê da mor li dîrok û folklorê kurdî xistîye. Ji evîniyê bigire heta serwerîyê, ji çandîyarîyê bigire heta fermanîyê. Ji alîyekî din ve ez wek mîrekî di her bûyereka folklorîk da li parçeyê xwe yê jinbûnê digirim, divê di her karekî baş da jinekê jî bibînim û gava nebînim wê bûyerê nivîşkan dibînim. Di çîroka *Memê Alanî* da jina evîndar, di çîroka *Kerr û Kulikî* da jina dayîk, di çîroka *Mihemedê Kurdî* da jina hevser, di çîroka *Sîyabend û Xecê yêd* a jina dilsoz... Di her bûyereka folklorîk da jin beşek e û rola wê diguhere, lê hemû jî pêwîst in û tunebûna wan naverokê vala dike.

**J.B:** Kîjan dengbêjên jin yan jinên kurd ku girêdayî çand û zimanê xwe ne û ew parastine, bandoran wan li ser te heye? Eger hebe tu dikarî bibêjî çawa bandor li te kirine? Nimûneyan bide û taybetmendîyên wan îzah bike?

**O.M:** Bi rastî Şehrîbana Kurdî ya modern û hemî stranbêjên klasîk ên radyoya Rewan û Bexdayê bandor li ser min kirine. Lê ji ber ku Şehrîban ji nifşa min e dikarim weha bibêjim, gava hunermendên mêr strana “Gênc Xelîl” dibêjin hemû fantazîyên xwe yê pornografîk li ser zimanê jinan vedibêjin, xwe di piştperdeya jinekê da vedişêrin, fantazîyên xwe didin ser ekranê û destdirêjîyeka muzîkal rewa dikin; lê gava Şehrîban heman stranê dibêje ev fantazî ji holê radibin, xîreta mirovî li hemberî jinan xurt dibe û mirov rûmetê dide jinan.

**J.B:** Nirxên çanda devkî û rewşa jinan ku behsa çandê dike û wê pêşkêş dike çawa dibînî? Gelo tu pewîstî bi rexnekirinê yan guhartinê heye? Îzah bike û nimûneyan bide?

**O.M:** Ji bo kurdan çanda devkî, materyalên perwerdeyê yê fermî ne; bi piranî tê da filozofî, hîndekarî û zimannasîyeka bilind heye. Nirxên civakî yê kevneşopî bi vegotina jinan baştir tînin parastin. Jin rola mamosteyên pêşdibistan û heyama dibistanê pêk tînin. Piştî zarok derbasî zanîngeha mêran û jiyanê dibin. Jin hîmê nirxên civakî diavêjin û mêr jî li ser wî hîmî ava dikin. Helbet naverokên hinek berhemên folklorîk negatîf in; di cîhana modern da dibe ku bandoreka neyînî li ser derûnîyê bikin. Lewra rojanekirina naverokan pêwîst e, ev yek jî bi perwerdebûyina jinan tê çareserkirin; lêbelê divê ev perwerde bi kurdî be ku alîkarîya parastina nirxên çanda devkî bike.

# Hevpeyvîna bi Roza Sîerrayê ra

Roza Sîerra was born in 1992, in Diyarbakir. In 2019 she graduated from the Kurdish Language and Literature Department of the Mardin Artuklu University. Now she is an MA student at the same university. She has worked as a volunteer in many associations, engaging in cultural and social activities. For nearly two years, she has also worked as a communications coordinator in the Mesopotamia Foundation. She has been collecting folklore for four years and focuses mainly on fairy tales; she shares the oral tradition that she collects on digital platforms such as YouTube.

Roza Sîerra di sala 1992an da li Diyarbekirê hatîye dinyayê. Wê di sala 2019an da li Zanîngeha Artûklû ya Mêrdînê beşa wêje û zimanê kurdî xelas kirîye. Ew niha li heman zanîngehê mastira kurdî dixwîne. Di gelek sazîyên sivîl da bi dilxwazî beşdarî gelek çalakîyan bûye. Herweha Sîerra li Weqfa Mezopotamyayê<sup>1</sup> nêzî du salan karê koordînatorîya ragihandinê kirîye. Wê li zanîngehê dersên folklorê hilgirtîye û ew li ser rê û rêbazên berhevkarîyê perwerde bûye. Sîerra nêzî 4 sal in berhevkarîya folklorê dike. Hemû cureyên keresteyên folklorê berhev dike, lê bi taybetî bala wê li ser çîrokên e. Ew bi derfetên xwe berhevkarîyê dike û berhemên ku berhev dike li ser qanalên dijîtal ên wekî youtubeê û hwd belav dike.

<sup>1</sup> Weqfa Mezopotamyayê: Di sala 2013an da, li Diyarbekirê bi mebesta avakirina zanîngeheka di serî da kurdî û pirzimanî hat avakirin. Vîzyona weqfê bi vî awayî ye: Pirzimanî û gerdûnî ku zimanê wê di serî da kurdî be. Azadîxwaz, demokratîk, rexneyî, afirîner, pirsyarker, wekhev, piştevan, paydar û xwedî etîk be. Xwedî vîzyoneka ekolojîk ku dewlemendîyên çandî û surîştî ji bo pêşketina herêmê bi kar tîne. Ji bo nûjenî û hevkarîyên akademîk amade be û piştgirîya danehava zanistî ya gerdûnî bike. Çand û zimanê kurdî di hemû qadên jîyanê da bi pêş bixe ku di qada gerdûnî, hemû dîsîplînên zanistî, perwerdehî, lêkolîn û çalakîyên weşangerîyê da bê bikaranîn. Herweha weqif li ser ziman û çanda kurdî xwedî gelek xebatên hêja ye. Xebatên wekî “Rêbera Rastnivîsînê,” “Termînolojîya Hiqûqê,” pirtûkên li ser zimanî yên wekî “Rahênanên Zimanê Kurdî,” “Keşana Karên Kurdî,” “Du Zimanî Zarok û Perwehê,” pirtûkên li ser berhemên çanda devkî yên wekî “Kûçikê Daleqandî,” û “Meryemnîgarê.” Herweha weqf xwedî du kovarên folklorê ye ku navê wan “Folklorê Me” û “Folklor û Ziman” e. Niha jî Weqfa Mezopotamyayê çalak e û karên xwe yên li ser ziman û çanda kurdî dewam dike.

**Joanna Bochenska:** Ji kerema xwe ra ji me ra behsa xwe bike. Nav û paşnavê te çi ye? Tu ji ku yî û çend salî yî? Tu çi karî dikî?

**Roza Sîerra:** Ez Roza Sîerra, di sala 1992an da li Diyarbekirê hatime dinyayê. Min di sala 2019an da li Zanîngeha Artûklû ya Mêrdînê beşa wêje û zimanê kurdî xelas kir, ez ê îsal (2020) di Enstitûya Zimanên Zindî ya Mêrdînê da di beşa kurdî da dest bi masterê bikim.

**J.B:** Tu li ser çanda dekvî dişûxulî. Tu dikarî piçekî behsa destpêka wê bikî? Çima folklorê kurdî bala te dikişîne?

**R.S:** Rengînî û dewlemendîya folklorê kurdî li ber çavan e. Mirov nikare tenê folklorê wek çend berhemên hunerî bihesibîne. Folklor serborîya civatekê ya dîrokî, civakî û hunerî ye. Folklor pêşketina zimanê wê milletê nîşan dide. Ev hemû di nav folklorê de gihiştine hev, di nav hev da hatine honandin û di dawiyê da bûne çavkanîyên xurt. Lewma jî mirov dixwaze xwe bi her awayî bispêre folklorê û çavkanîyên wê.

**J.B:** Te kînga dest bi vî karî kir?

**R.S:** Nêzî çar sal in.

**J.B:** Tu bi kîjan rêxistin (sazî) û kovaran ra kar dikî? Herweha pêwendîya te bi kîjanî ra heye?

**R.S:** Demekî bi Weqfa Mezopotamyayê ra xebitîm. Pêwendîyên min bi Weqfa Mezopotamyayê ra heye û bi kovara Folklorê Me ra heye.

**J.B:** Tu çawa karê xwe fînanse dikî?

**R.S:** Ez xwe bi xwe fînanse dikim, bi bursa xwe ya xwendekarîyê karê xwe fînanse dikim.

**J.B:** Kevneşopîya devkî ji bo te çî ye? Tu dikarî wê pênase bikî?

**R.S:** Kevneşopîya devkî di navbera jiyana îroyîn û ya berê da pirek e. Rabûrdûyeka zindî ye.

**J.B:** Dema tu keresteyên folklorê berhev dikî bala te bêhtir li ser çî ye yan jî kîjan cureyî ye?

**R.S:** Çî hebe berhev dikim.

**J.B:** Kîjan cureyên çanda devkî bêhtir balatedikişînin? Tu dikarî nimûneyên wan bidî?

**R.S:** Çî hebe berhev dikim lê bandora çîrokên li ser min zêdetir e. Ji ber ku çîrok ji alîyekî ve hînker in, ji alîyekî ve şîretkar in û ew ji alîyekî ve jî mirovan didin fikirandin.

**J.B:** Gelo tu versiyonên orîjînal ji yên neorîjînal cuda dikî?

**R.S:** Ji bo min cudakirina versiyonên orîjînal û neorîjînal zehmet e, bes ez dikarim li gor varyantan kategorîze bikim.

**J.B:** Gelo te qet berhemeka neorîjînal ji arşîva xwe derxist?

**R.S:** Na, min çî berhev kiribe, di arşîva xwe da diparêzim.

**J.B:** Gelo li gor te, tesîra çanda nivîskî û ya modern li ser gotin û tevgerên dengbêjan heye?

**R.S:** Helbet heye, çanda nivîskî rê li ber windabûna çanda devkî digire û bi rêya nivîsê gotinên dengbêjan û hwd tînin parastin.

**J.B:** Te behs kir ku keresteyên çanda devkî berhev dikî. Gelo tu dikarî behsa berhevkarîya xwe bikî? Tu vê yekê çawa dikî? Rê û rêbazên te çî ne?

**R.S:**

- Ez berîya derketina qadê plansazî û amadekarîyê dikim.
- Piştra li qadê dest bi berhevkarîyê dikim.
- Piştî berhevkirina keresteyan dest bi tesnîf û deşîfrasyonê dikim.

**J.B:** Gelo ji bo wê tu perwerde bûyî? Li ku derê? Ev perwerde çawa bû?

**R.S:** Di zanîngehê da dersa me ya folklorê hebû di wê dersê da, em li ser rê û rêbazên berhevkarîyê perwerde bûn. Wekî din ez tevlî kargeha berhevkarîyê<sup>2</sup> ya Weqfa Mezopotamyayê bûm li wir me mehekî dersên teorîk dîtin piştra me nêzî salekî jî xebatên sehayî kirin.

**J.B:** Gelo aniha rê û rêbazên te yê berhevkarîyê li gor ên berê guherîne? Çawa?

**R.S:** Tecribeyên sehayî çiqas zêde bin rêyên komkirina folklorê baştir dibe. Piştî tecribeyên min ên sehayî zêde bûn, di warê tesnîfkirin û deşîfrasyonê da guherînên baş çêbûn.

**J.B:** Arşîv ji bo te tê çi mane ye?

**R.S:** Perspektîfek e ji bo pêşerojê.

**J.B:** Gelo arşîva te heye? Ew arşîv çawa ye (nivîskî, teyb, kitêb, dijîtal)? Kerem bike hemû nimûneyan bide?

**R.S:** Arşîva min heye; ew nivîskî û dijîtal e.

**J.B:** Gelo ew arşîv xwedî pergala e? Tu arşîva xwe çawa bi nav dikî? Bi rêya dosyeyan, cureyên keresteyan, hwd?

**R.S:** Min arşîva xwe tesnîf kiriye; wekî çîrok, pêkenok, meselok, zêmar, destan û hwd

---

<sup>2</sup> n.e.: Roza Sierra jî yek ji kursiyerên ewil a perwerdeya folklorê ya Weqfa Mezopotamyayê ye.



**J.B:** Gelo tu arşîveka wisa wekî “komkirina tiştan (şênber)” yan bêhtir wek “komkirina nirxên ne maddî (razber)” dibînî?

**R.S:** Na, çî hebe baş e û avantaj e.

**J.B:** Gelo tu arşîva xwe bi awayekî diparêzî (mesela ji windabûnê, tozê, polîsê, hwd)?

**R.S:** Arşîva xwe li cihên cuda diparêzim ( hardîsk, flasbelek, computer)

**J.B:** Gelo rexistin (sazî) û kovarên ku tu bi wan ra dixebitî, karê te arşîv dike yan na? Gelo arşîva wan heye?

**R.S:** Na. Ez arşîva xwe li cem xwe diparêzim.

**J.B:** Gelo bi ya te kovar dikare bi rola arşîvê rabe?

**R.S:** Kovar ji bo arşîvê dikare bibe çavkanîyek.

**J.B:** Gelo keresteyên ku berhev dikî, tu wan çap dikî yan jî diweşînî? Li ku derê? Çawa?

**R.S:** Min dosyeyek ji bo çîrok û meselokan amade kiriye ev dosye ji aliyê Weqfa Mezopotamyayê ve dê wekî pirtûk bê çapkirin.

**J.B:** Li gor te ji bo çanda devkî ya kurdî kîjan metodên weşanê/çapkirinê baştir in? Çima?

**R.S:** Divê mirov bi tu awayî midaxeleya keresteyên folklorê neke çî çawa hatibe gotin divê wisa bê nivîsîn, bi ya min ev metoda herî giring e. Ew kesên ku edîtorîya berhemên çanda devkî dikin divê pêşî vê metodê bi kar bînin.

**J.B:** Tu ji bo weşanê yan jî çapê berheman çawa hildibijêrî? Ji bo te ya giring çî ye?

**R.S:** Giringîyê didim varyantan û mijarên spesîfk.

**J.B:** Armanca te ya çapkirinê/belavkirinê çi ye?

**R.S:** Armanc xwendin û belavkirina keresteyên folklorê kurdî ye.

**J.B:** Têvgerên weşanxane û cureyên weşanên kurdî, li gor salên berê li hember berhemên çanda devkî guherîne?

**R.S:** Bi giştî li ser folklorê kurdî xebatên giring hatine kirin. Lê ev xebat li gor şert û mercên siyasî diguherin, derfet çiqas zêde bin xebat jî ewqas zêde dibin. Piştî ku di zanîngehan da beşên kurdî vebûn xebatên kurdî ket nav lîteratûra akademîyê û herweha li ser çanda devkî jî xebatên zanistî hat kirin.

**J.B:** Tu dixwazî versiyona çapkirî ji bo kê be?

**R.S:** Ji bo ciwanan be.

**J.B:** Gelo tu ji bo berhemên çapkirî pêşgotin an jî şirove dinivîsî? Çima û wan çawa diafirinî/dinivîsî?

**R.S:** Bi ya min pêşgotin ji bo berhemê hewce ye. Bi xêra pêşgotinan em armanc, rê û rêbaza wê xebatê dinasin.

**J.B:** Gelo ji bilî çapê/weşanê tu yan jî hevalên te bi rêyên cuda ji bo belavkirina çanda devkî ya kurdî digerin (mesela festival, şano, pêşkêşên cuda û hwd)? Eger hebin tu dikarî çend nimûneyan bidî?

**R.S:** Ez ji bo belavkirina çanda kurdî hewil didim lê vê yekê bi derfetên xwe dikim. Xebatên ku min li ser çanda kurdî ya devkî kirine hin ji wan li ser kanala xwe ya youtubeê li ser bloga xwe û li ser platforma *Podcastkurdîyê* parve dikim.<sup>3</sup>

---

<sup>3</sup> Navnîşanên wan qenalên min ev in:

[https://www.youtube.com/channel/UC\\_sTxO-sxharFbPPeWb3AaA?view\\_as=subscriber](https://www.youtube.com/channel/UC_sTxO-sxharFbPPeWb3AaA?view_as=subscriber)

**J.B:** Pêwîstîyên herî giring ji bo komkirina çanda devkî û avakirina arşîvên çanda devkî çi ne? Problemên herî mezin çi ne?

**R.S:** Divê sazî û dezgehên folklorê bên avakirin û ev kar bi awayekî zanistî bê kirin.

**J.B:** Fikrên te yê li ser çareserîya van probleman çi ne? Pêşnîyazên te hene?

**R.S:** Kesên ku karê berhevkarîyê dikin pîranîya wan bi derfetên xwe dikin bi derfetên xwe arşîvên xwe diparêzin divê ji bo folklorê kurdî sazî û dezgehên fermî bên avakirin û ew kesên ku karê berhevkarîyê dikin bên finansekirin. Dema dezgehên fermî hebin komkirin parastin û arşîvkirina çanda devkî wê hêsantir û giringtir bibe.

**J.B:** Cih û rola jinan ji bo parastin û komkirina folklorê kurdî çawa dinirxînin?

**R.S:** Di hilgirtina mîrata çandî da rola sereke ya jinê ya. Pîranîya berhemên çandî li ser jinan in. Jin, di nava gelek helbest, çîrok û stranên da temaya bingeşên in û gelek berhemên folklorî ji hêla jinan ve hatine çêkirin. Mesela, di jiyana rojane da bi tenê jin lorî û zêmaran (şînîyan) dibêjin. Ev cure bi tenê malê jinan in. Jin van cureyan diafirînin û dibêjin. Mêr ne vana diafirînin ne jî dibêjin. Lê jin ji bilî van cureyan kilaman jî dibêjin. Di nava kurdan da hema bibêje hemû jinên ku dengên wan xweş û xwedî qabiliyet in di şevên hinê, dawetan, şîn û dîwanan da distirên. Lê bi gelemperî ev dorhêlên jinan in. Lê astengîya zexta civakî û dîne îslamê destûr nedaye ku jin li her derî bi awayekî azad hunera xwe îcra bikin. Mesela, di dîne îslamê da bihîstina dengê jinê haram e. Dixwazim di vî warî de mînakek bidim, Fatma Îsa jina misilman a ewil e ku di radyoya Rewanê da bûye dengbêj. Lê Îsa encax piştî temenekê dikare dengbêjîya xwe li ser radyoyê îcra bike. Ji ber ku ciwanîya wê derbas bûye, pîr bûye û seksûalîteya xwe wînda kirîye. Piştî menapozê, jinbûna wê jê nayê pirsîn, êdî tu astengî nemaye ku dengê xwe li ser radyoyê belav bike û mêr dengê wê bibihîzin.

---

<https://rozasierra.blogspot.com/>

<http://www.podcastkurdî.com/category/roza-sierra-turik/>

**J.B:** Di berhemên folklorî da kîjan motîfên jinê yan jî lehengên jin zêde bala te dikişînin yan îlhamê didin te û li ser karê te bi tesîr in? Tu dikarî nimûneyan bidî û taybetmendiyên wan îzah bikî?

**R.S:** Di destana Zembîlfiroşî da lehenga Gulxatûn zêde bala min dikişîne. Di vê destanê da behsa çîroka mêrikê Zembîlfiroşê ku debara xwe bi firotina zembîlan (selikan) dike, tê kirin. Bi navê Gulxatûnê jineka dewlemend a zewicandî dil dikeve Zembîlfiroşî û dixwaze ku Zembîlfiroş jî bersiva evîna wê bide. Lê Zembîlfiroş mirovekî xwedî zar û zêç e. Naxwaze tiştêkî wiha bike û Xwedê aciz bike, xwe ji vê gunehê diparêze û jê direve. Zembîlfiroş dinêre ku ji destê Xatûnê xelas nabe, çarekî difikire, ya rast, dibêje: “Mirin ji kirina zinayê çêtir e.” Û bi hinceta destnimêjirtinê, qesta banê kelehê dike. Zembîlfiroş dilê wî da Rebbê Cebbar xwe ji kelehê davêje xwarê. Eve tam wî çaxî mûcîzeyek çêdibe. Bi emrê Xwedê, Cebrailî li hewayê bi Zembîlfiroş digere û datîne erdê. Ji ber ku Zembîlfiroş lawikekî feqîr û qeşeng e û ew li hember Gulxatûna dewlemend a zewicandî namûsa xwe diparêze û parastina xwe ji heramîyê dike. Lê di vê destanê da fokus zêdetir li ser eşq û wêrekîya jina Mîrî, “Gulxatûn”ê, ye. Ev destan li ser zarê gel, bi hezaran sal hatîye veguhastin û li dîwanên şêx û axayan û li dîwanên gelî hatîye gotin. Kesî Gulxatûn bi minasebeta namûsê nekuştîye. Bileqs, eşq û wêrekîya wê li ser zarê gelî bûye bi destan, klam û stranên. Naskirina min a vê destanê û pê ve, min fam kir ku xwendina bi çavê jinê, dikare jinê di jiyane da bêhtir bide xuyakirin.

**J.B:** Bandoran kîjan dengbêjên jin yan jinên kurd ku girêdayî çand û zimanê xwe ne û ew parastine, li ser te heye? Eger hebe tu dikarî bibêjî çawa bandor li te kirine? Nimûneyan bide û taybetiyên wan îzah bike?

**R.S:** Bi dîtina min, hemû dengbêjên jin (kurd) girêdayî çanda xwe bûne û zimanê xwe parastine û heta hunera xwe îcra kirine rastî gelek zor û zehmetîyan hatine. Mesela, Eyşeşan di sala 1963an da cara pêşî li Tirkîyê, bi zimanê kurdî yê qedexe, li ser pîlaqan stranên xwe qeyd kirîye. Tevî ku li ser dikê wê dane ber kêran jî, heta strana xwe temam nekirîye jê daneketîye. Eyşeşan ne bi tenê jineka xwedî dengê xweşê e, ew herweha jineka bedew e. Hîn di salên 1950î da, serdema ku jin wekî temînata namûsa feodalîzmê dihate dîtin, wê hewîtî red kiribû, Bi hunerê,

xwe ji nûve ve afrandibû. Eyşe Şan wekî jineka hunermend a bibiryar û pêşeng li dîrokê hat nivîsandin. Yek ji têkoşerên mezin jî Meryem Xan e. Meyrem Xan, ji ber ku dixwest li dîwanan dengbêjîyê bike, lê hevser û malbata wê destûr nedidan. Tevî ku ducanî bû di salên 1925an da ji gundekî bajarê Sêrtê direve û diçe Heleb, Şam, Mûsil, Bexda û heta Kahîreyê. Û li ser radyo û pîlaqan stranên xwe dibêje û beşdarî şevbihêrk û dîwanan dibe. Ya rast berxwedana jîyana gelek jinên hunermend ên wekî Meyrem Xan, Elmas Muhamed, Nesrîn Şêrwan, Dayîka Cemalî, Sûsika Simo, Îran Xan, Zadîna Şakir, Fatma Îsa, Belga Kado, Kubara Xido, Aslîka Kadir, Xana Zazê, Fatoya Kor, Ayşo Baco, Adlê Xanim û gelekên din, û berhemên wan hêjayî nivîsandinê ne.

**J.B:** Gelo motîf, leheng, dengbêj an jî aktivîstên jinan ên kurd hene ku tu ji wan hez nakî û çalakiyên wan giring nabînî yan jî çalakiyên wan ji bo rewş û mafên jinan xetere dibînî?

**R.S:** Di folklorê kurdî da civatê herçiqas cihekî birûmet dabe jinê jî di navbera jina baş û nebaş da sînorek jî danîye. Bi vî awayî jina baş kirîye rûspî, jina xirab jî rûreş kirîye. Motîfa jina xirab, bi taybetî jina xebergerok, virvirî, bilebil û keçanî, herweha şerê bûk û xesûyan û namûsa jina ew tev di nav kategorîya jinên xirab da cih digirin. Di çîrokan da pirî caran em li rastî van motîfan tên. Bi ya min ev motîf mafê jinan dixê bin xetereyê.

**J.B:** Nirxên çanda devkî û rewşa jinan ku behsa çandê dike û wê pêşkêş dike çawa dibînî? Gelo tu pewîstî bi rexnekirinê yan guhartinê heye? Îzah bike û nimûneyan bide?

**R.S:** Li ser vê mijarê dixwazim li ser guherîna dengbêjîya jinê minakan bidim. Mesela, Cara ewil li radyoya Rewan, Bexda û Urmîyeyê dengbêjên jin dengbêjîya profesyonel îcra kirine. Jin ji ber bawerîyên dînî, rewşa feodal, şerê cihanê yê yekem û duyem û ji ber polîtîkayên li dijî çandê kurdî di îcrakirina dengbêjîyê da rastî gelek tengasîyan hatine. Jinan ji ber ku wekî mêran nikaribûne gund bi gund bigerin, dengbêjîya xwe di qadêka teng da îcra kirine. Vê yekê bandor li perwerdeya jinan jî kirîye, li ber radyoyan an jî ji kesên malbata xwe hînî dengbêjîyê bûne. Di

serdema dengbêjîya modern da ji ber komele û malên dengbêjan îmkanên îcrakirin û perwerdeya dengbêjîyê zêde bûne. Rola ku civakê li jinê kirîye bûye asteng ku jin bi hêsanî dengbêjîya xwe îcra bikin. Dîsa lorî û zêmar berhemên jinan in, bi tenê jin van berhemên diafirînin û dibêjin. Hat dîtî ku dengbêjên jin jî wekî dengbêjên mêr navek hildane, di vê hêlê da tu cudahî di navbera jin û mêran da tune ye. Lê îro ji ber guherîna şert û mercên civakî jin bi rehetî dikarin dengbêjîya xwe îcra bikin, heta ji mêran zêdetir rêz ji bo jinan tê girtin.

# Hevpeyvîna bi Sadiq Êskanî ra

Sadiq Êskan is a novelist. He studied Philosophy at Çukurova University. During his studies he became interested in folklore, so he returned to his home village to learn traditional knowledge and agricultural practices from his parents. The results of his studies were published as a book on the Kurdish Kurmanjî calendar. His parents have been his main informers and partners in the collection of oral tradition. In his view, folklore should be considered the main source for Kurdish epistemology and the development of modern Kurdish literature.

Sadiq Êskan romanûsekî edebîyata kurdî ye. Wî li Zanîngeha Çûkûrovayê Beşa Koma Fîlozofiyê xwendîye. Piştî ku dest bi vê beşê dike, bala wî diçe ser folklorê û li dê û bavê xwe, li jîyana wan a otantîk vedigere. Bi gotineka din, êdî bala xwe dide folklorê kurdî. Piştî demekê bi dê û bavê xwe ra pirtûkeka salnameya kurmancî<sup>1</sup> amade dike. Çawa ku dê û bavê wî bûne çavkanîyên vê pirtûkê, li gor wî, çavkanîya epîstemolojîya kurdan jî folklor e. Ew giringîyê dide folklorê û me pê dihisîne ku folklor bi awayekî ontîk û ontolojîk li ser kesayetîyê karîger e. Êskan balê dikişîne ser têkilîya edebîyata modern û folklorê jî û li gor wî, edebîyat û çîroka kurdî ya modern heta folklorê xwe nemiçiqînînin dê bi ser nekevin.

**Joanna Bochenska:** Ji kerema xwe ra ji me ra behsa xwe bike. Nav û paşnavê te çi ye? Tu ji ku yî? Çend salî yî? Tu çi karî dikî?

**Sadiq Êskan:** Navê min Sadiq Êskan e. Ez ji Qoserê me. 39 salî me. Nivîskar im.

**J.B:** Tu li ser çanda dekvî dişixulî, tu dikarî behsa destpêka xebatên xwe yê folklorîk bikî?

**S.Ê:** Bavê min 53 salan şivantî kiribû. Dîya min hema hema bi qasî şivantîya bavê min, bêrîvantî û helebîtî kiribû. Piştî ku min li zanîngehê dest bi xwendina

<sup>1</sup> n.e: Navê vê pirtûkê “Payîzxêr Li Ser Salnameya Kurmancî Xebateka Folklorîk” e, û pirtûk di sala 2017an da ji Weşanên Wardozê derket.

Beşa Fîlozofîyê kir, folklor pir bala min kişand. Belkî jî Martin Heidegger neçûya Todtnaubergê, bala min ewqas nediket ser folklorê. Wê çaxê min sê sal û nîv beşa fîlozofîyê xwendibû. Û ez rabûm çûm li dê û bavê xwe vegeŕiyam. Min bi wan ra li folklorê kurdî kola. Min çîrok û serpehatîyên wan qeyd kirin. Piştî van lêkolînan, ez pê hisiyam ku bavê min astrolog e. Bêhenek! Stêrk giş dinasî. Dem û demsal bi gîy a û hatinûçûna çûk û balindeyan dizanî. Bi qasî şamanekî tişt dizanî. Lê min qet heta wê roja ku me dest bi xebata xwe kir, tiştên weha jê nepirsibû. Piştî ku ez û wî, em bi hev ra xebitîn, ez pê hisiyam ku bavê min astrolog e. Dibêjin, “Zanîna astrologên Babîlan ji şivanên kurdan ra ma ye.” Bavê min jî yek ji wan şivanan bû. Dîya min hê ji bavê min jî balkêştir bû. Di sî salîya wê da, wextê ku wê ji bo şîva êvarê kartolên kelandî diqeşart, birûskê lê xistibû, tiştêk pê nehatibû, lê kûçik û pisîka wê miribû. Yek ji wan jinên bermayîyên wekî Kîbele, Îştar û Nînhûrsag bû. Doktora zarokan û jînekolog bû, lê haya wê jê tune bû ku doktora kurmancî ye. Zarokên gundî giş derman dikirin, wextê ku jinên bihemle dizan doktorî dikir. Lê taybetîya wê ya herî ku kêfa min jê ra tê: wextê ku alavek an jî tiştêk winda dibû û kesekî nedikarî bibîne, ew diçû û wekî ku wê ew tişt veşartibe, didît. Dê û bavê min du însanên ji min û ji te zanatir in. Û qet xwendin û nivîsandina wan tune ye. Dê û bavê min du însanên pir hêja ne. Bi saya serê wan her duyan li dê û bavê xwe û ew dinyaya wan a ku kesekî jê fam nedikir, ez li wan û folklorê vegeŕiyam. Saet bi kar nedianîn, tinazên xwe bi tiştên modern dikirin. Folklor bû ew mifteya ku karibim pê tê kevim dinyaya wan.

**J.B:** Çima folklorê kurdî bala te dikişîne?

**S.Û:** Kurd miletekî cotkar û şivan in. Sosyolazîsyona wan jî li gor wê teşe girtîye û îroj welatê wan mêtîngeh e. Edebîyata wan devkî bû. Wekî *Walter J. Ong* di pirtûka xwe ya “*Orality and Literacy, the Technologizing of the Word*” da jî qal dike, formên kurdan ên ramîn û fikrê li gor wê teşe girtîye. Kurdên mîna dê û bavê min tiştên ku pê nedijîyan, ne lazim bû ku wî bizanibin. Û kurd miletekî kevnar ê rojhilatanavîn e. Tu li kîjan rîtuêlên wan dinêrî (ku îroj bûne hêmanên folklorîk) tiştêkî pîroz ji bin wê derdikeve. Hîn jî li gelek mizgeftên Kurdistanê motîfên Zerdeştî û Êzdîtîyê hene. Li ser gelek mîmberên mizgeftên Bakurên Kurdistanê sembolên Melekî Tawîsî hene. Mirov ji bo ku kurdan nas bike divê bi



wan ra biaxive. Bi wan ra bikene, bi wan ra xwarinê bixwe. Kurd miletekî dînoke ne. Jiyana wan weke filmên *Emir Kusturica* ye. Wekî ku *Basil Nikitin* jî dibêje, “Folklorê kurdan, wekî okyanûsekê ye.” Mirov çiqas jî li vê folklorê bikole wekî ku dê neqede. Folklor û çanda kurdan wijdanê vê dinyayê ne. Belkî kene te bi min were, lê însan wextê ku li folklorê kurdan dikole derdê xwe ji bîr dike. Folklorê kurdan ruhê mirovî nazik dike û wî hinekî din nêzî xwe û xwebûna wî dike. Jixwe kesê ku hatibe ketibe nava kurdan û folklorê wan, ew bêhtir dibe însan. Belkî hatibe sere te jî. Ez bi saya folklorê kurdan pê hisîyam ku biharê hebên baranê girs in, çûkên mîna têtî û serçe nameşin, çindikan didin xwe. Xweza jî şahidîyê li morivî dike û divê moriv ji daran jî fedî bike. Piştî ku li folklorê kurdan û têkilîya wan a bi xwezayê ra kola, min ji *Spinozayî* û *Pandeizma* wî fam kir. Ji ber ku kurd wekî qewmê Awatar in. Li gor bawerîyeka kurdan, ku tu zirarê bidî xwezayê tu yê kor bibî. Ê ji van tiştan gişan wêdetir, bi awayekî ontîk û ontolojîk, bi saya folklorê kesayetîya min bêhtir nêzîkî “xwe”yê bû. “Ez”a min bû “xwe.” Çavkanîya epîstemolojîya kurdan, folklorê kurdan e.

**J.B:** Te kînga dest bi vî karî kir?

**S.Û:** Ji ber dê û bavê min û jiyana min a pastoral a gund, jixwe di nava folklorê da mezin bûm. Lê bi awayê profesyonel, di sala 2004an da, min dest bi xebatên folklorê kir.

**J.B:** Tu bi kîjan rêxistin (sazî) û kovaran ra dixebitî? Herweha pêwendîya te bi kîjanî ra heye?

**S.Û:** Piştî ku li Tirkîyeyê darbeya leşkerî ya 2016an çêbû, pir kovar û rojname hatin girtin. Aniha hew bi Weşanxaneya Wardozê ra dixebitim.

**J.B:** Tu karê xwe çawa finanse dikî?

**S.Û:** Ez bi îmkanên xwe van xebatan dikim. Gotinek pêşîyan a kurdî heye, dibêjin; “*Gîhayê hewşê tehl e.*” Di nava kurdan da ji ber şertên ku Kurdistan kolonî ye pir

qîmeta xebatên folklorê tune ye. Koleksîyonerên folklorîst ên kurd bi îmkanên xwe xebatên folklorê dikin. Lê ez ne koleksîyoner im.

**J.B:** Kevneşopîya devkî ji bo te çi ye? Tu dikarî wê pênase bikî?

**S.Û:** Miletin hene dereng hînî xwendin û nivîsînê bûne, yanê yên ku çanda wan a devkî ji ya nivîskî xurtir e, yanê miletên wekî kurdan, taybetîyek wan heye. Taybetîya wan jî ew e ku meriv dibêje qey hîn jî lingên wan heta çokê di axê da ne. Wekî darekê. Dikarin telepatîyê bi xwezayê ra bikin. Dîya min xezalên birîndar rehet dikir û dûra ew berra xwezayê dida.

**J.B:** Dema tu keresteyên folklorê berhev dikî bala te bêhtir li ser çi ye yan jî li ser kîjan cureyê ye?

**S.Û:** Bala min li refleks, liv û tevgerên însanan e, lê peyv û têgehên nû bêhtir kêfa min jê ra tê. Li ser meseleyê, peyva “*Porkurê*.” Peyva *Porkurê* rengdêr e. Wateya wê ev e; jinek wextê ku ji yekî pir hez bike û ew kes bimire, ew jin gulîkên porê xwe (porê honandî) jê dike û dibe datîne ser gora wî. Jina ku gulîkên porê xwe jê kiribe navê wê dibe “*porkurê*.” Her ku peyveka nû hîn dibim, ruhê min naziktir dibe. Lê bêhtir li ser têkilîya însanan û xwezayê dixebitim.

**J.B:** Kîjan cureyên çanda devkî bêhtir balate dikişînin? Tu dikarî nimûneyên wan bidî?

**S.Û:** Herî pir têkilîya însanan û xwezayê bala min dikişîne. Di Xidir Elyasî da qîz li hev dicivin, nanê şor li tenûrê dixin, wê dixwin û li serê radikevin. Xwedêgiravî, dê qîz tî bibin û xortên ku dê bi wan ra bizewicin, dê di xewna wan da, bi kulmên xwe avê ji çêmbidin wan. Qîz di xewna xwe da ji destê kîjan xortî avê vexwin, dê bi wî ra bizewicin. Qîzên ku meraq dikin bê ka dê bi xortekî çawa ra bizewicin, çavê wan li rêya roja Xidir Elyasî ye. Jixwe dilê kîjan qîzê di kîjan xortî da be, ew xortê xewna wan û ji çêmbi, bi kulma xwe avê dide wan. Wê rojê, xewnên qîzan, wekî fala qereçîyan, li hev derdikevin. Bi Xidir Elyasî ra, zivistan diqede, bihar dest pê dike. Xidir Elyas xelasoka zivistanê ye: “Xidir Elyas, zivistan xelas!” Havînê, gêrgêrik genimî dikişînin morîstanên xwe û mişk jî genimî dikişînin

qulmişkên xwe û biharê, li ser van morîstan û qulmişkan, kumirên genimî şîn tên. Kumirên genimî komikên zad in û bi destpêka biharê ra di nava zadan da şîn dikin. Wextê ku sê-çar roj ji meha adarê dere, bayê kumirî dest pê dike. Bi vê perengê ra, sermaya zivistanê dişikê. Ba, êdî sermayê bi xwe ra nayîne. Bayê kumirî, bayekî bişid e, lê hênik e. Di serê adarê da, kumirên genimî bi bayê kumirî ra, li ba dibin. Bayê kumirî, nîşana ketina bizota ewil e. Cebla avê, nîşana ketina bizota diduyan e. Deh-dozyeh roj ji meha adarê dere, bizot li avê dikeve. Di vê heyamê da, av di cihê xwe da şîregerm dibe. Êdî ava hewdikên ser tehtikan, wekî berê nacemide. Di heyama cebla avê da, av dest bi kevgirtinê dike. Bi heyama cebla avê ra, cemedava avê dişikê û qurqurkên nava wê, dest pê dikin, diqurînin:

“Qurqurkan qurand  
çirçirkan çirand  
biharê zivistan qedand.”

Nîşana ketina bizota sisêyan, koza erdê ye. Bizota sisêyan, di Newrozê da tê li axê dikeve. Bi heyama koza erdê ra, serma hewayê yekcarî dişike. Êdî serma, nema dikare zirarê bide canê mirovan:

“Newroza sultanî  
lehendika savarê bibe ser xênî  
nema tu êş digihîjin laşên xwêdanî.”

Hênikahîya biharê, ewilî sermaya hewayê, bi dûra sermaya avê û bi dûra jî sermaya axê dişikîne. Bi heyama koza erdê ra, bizir di binê erdê da namînin, giş zîl didin. Wextê ku bizot li axê dikeve, erd disincire, dinepîxe û bizirên di binê erdê da, dest pê dikin, zîl didin. Zarok bi tilîkan, qalikên erdê diqêşêrin û gîyayê zer ji bin wê derdixin. Di vê heyamê da, ji her derê welêt, bêhna axê difûre. Vê bêhna ha, mirovan serxweş dike. Rojekî jinek diwelide û zebeşkî bûkanî tîne dinyayê. Zebeş mezin dibe, tê ber zewacê. Dê û bavê wî jê ra çavê xwe li qîzekê digerînin. Piştî keçik û zebeşê wan hevdu dicibînin, daweta wan çêdikin. Dibe êvar, zebeş digindirînin oda bûkê û derî li ser wan digirin. Ji nişka ve, zebeş dibê, “gurim!” û diteqe û xortekî mîna fîtekî ji hundirê wî derdikeve. Xort xwe şilfitazî li ser livîna

dirêj dike û bang li bûkê dike, dibê, “Çavê xwe tê xe navika min û lê binere. Tu yê heta niha çî tiştê li dinyayê qewimîye û dê biqewime, bibînî.” Bûk çavê xwe dixê navika wî û bi tiştê dinyayê gişan dihise. Li gor hesabên hesabdarên, Stêrka Qurixê, ango Stêrka Gelawêjê, di serê tebaxê da hiltê. Bi hilhatina Qurixê ra, heyama çilê havînê ber bi qedandinê ve dere. Dinya hêdî hêdî hênik dibe, lemên bostanan serê xwe radikin û cardin dest bi şixulandinê dikin. Di vê heyamê da, di bostanan da zebeşên kal namînin. Heta xirtikên bîstên jî sor dibin. Dinya ewqas hênik dibe ku mirov dikare cehnîyên hespan ji şîr veke. Êdî rêwîtiya serê sibehan xweş dibe. Dewkil, serê sibehê, bi hilhatina Stêrka Qurixê ra, dewê xwe dikilên. Qurix, stêrka jinên jêhatî ye. Jina ku ji xwe ra dibêje, “Ez dewkil im.” Divê serê sibehê, bi hilhatina Qurixê ra, dew vala kiribe meşkê û dest bi kilandinê kiribe. Navê Stêrka Qurixê ya din, Stêrka Dewkila e. Qurix, di serê meha kanûna pêşîn da dere ava. Ev nîşana destpêka zivistanê ye.

**J.B:** Gelo tu versiyonên orijînal ji yê neorijînal cuda dikî?

**S.Û:** Ji bo vêya divê varyant giş li ber destê mirovî hebin. Arşîveka min a weha tune ye.

**J.B:** Gelo te qet berhemeka neorijînal ji arşîva xwe derxist?

**S.Û:** Na.

**J.B:** Gelo li gor te, tesîra çanda nivîskî û ya modern li ser gotin û tevgerên dengbêjan heye?

**S.Û:** Kurd ji ber sedemên şer û sosyoekonomîk ji gundan bar dikin, tîn bajaran. Wextê ku ji gundan bar dikin û tîn bajaran gelek alavên xwe yê ontîk û egzotîk li dû wan dimîne. Stranên dengbêjan hîn jî orijînal in lê wextê ku dipeyivin mirov dibîne ku ji ber bandora asîmîlasyonê, tevger û axaftina wan hînekî guherî ye.

**J.B:** Te behs kir ku tu keresteyên çanda devkî berhev dikî. Gelo tu dikarî behsa berhevkarîya xwe bikî? Tu vê yekê çawa dikî? Rê û rêbazên te çî ne?

**S.Û:** S. Freûd wextê ku nexweşên wî li ser dîwana wî rûdinişt û wî dest bi psîkoterapîyê dikir, nexweşên wî xwe dicivandin ser hev û ji ber wê jî armanca Freûdî nediçû serî. Ji ber wê jî wextê ku xebatên xwe yê folklorê dikim, atmosfereka natûrel ava dikim. Mirov wekî ku roportajekê bike bi însanan ra bide û bistîne, ruhiyeteka wekî ku mirov li mahkemeyê li ber destê hakim sekinîbe tev digere û ji ber wê jî gelek tiştan ji mirovî ra nabêje, ya jî tiştên ku kêfa mirovî tîne dibêje. Ji ber wê, ez bi wan kesên qalbêj-gotox ra hevaltîyê dikim. Heta gelek caran hew bi tenê li wan guhdarî dikim û tîm malê qeyd û tomar dikim. Lê ya baş mirov di nava wan da bijî. Li wan bibe mêvan û bi wan ra hevaltîyê bike. Kamera û dengir û hwd gelek tiştan baypas dike, civatê xera dike. Yê ku dipeyivin xwezayî-natûrel tev nagerin. Ez bêhtir li wan guhdarî dikim carna jî bi qasî ku civatê xera neke, tiştên ku ew dibêjin li kaxizekê dinivîsim. Ji bo ku mirov xebatên folklorê kurdan bike divê kurdan û civaka wan baş nas kiribe. Di derheqê folklorê wan da hin tişt zanibe. Ku haya mirovî ji folklorê û civaka kurdan tune be mirov nikare peyvê veke civatekê saz bike. Divê mirov zanibe ku li çî digere.

**J.B:** Gelo ji bo wê tu perwerde bûyî? Li ku derê? Ew perwerde çawa bû?

**S.Û:** Erê, min perwerdeya wê dîtîye. Weqfa Mezopotamyayê di sala 2017an da li Amedê, ji bo folklorîstan kursek li dar xist. Lê jixwe min berîya wê kursê, bi 13 salan karê folklorê dikir.

**J.B:** Gelo aniha rê û rêbazên te yê berhevkerinê li gor ên berê guherîne? Çawa?

**S.Û:** Zêde neguherîne. Ez diçim cem kal û pîrekê û hinekî bi wan ra diaxivim. Binêre, ez pirsan ji wan nakim, ez bi wan ra diaxivim. Sohbetê dikim. Ku tu bipirsî tu yê gelek tiştan wînda bikî!

**J.B:** Arşîv ji bo te tê çî maneyê?

**S.Û:** Ez ne koleksîyoner im. Xebatên min ên folklorê pragmatîk in. Tiştên ku ji bo senaryo, roman û çîrokên min ji min ra lazim in, ez xebatan dikim û wan

xebatên folklorîk di berhemên xwe da bi kar tînim. Ji bo wê hûn dikarin li romana min a Şampazî<sup>2</sup> binêrin. Ev roman bi hêmayên folklorîk hatîye nivîsîn.

**J.B:** Gelo arşîva te heye? Ew arşîv çawa ye (nivîskî, teyb, kitêb, dijîtal)? Kerem bike hemû nimûneyan bide?

**S.Û:** Arşîva min texrîb bû. Polîsan di sala 2016an da girtin ser mala min û arşîva min hinekî texrîb bû. Ji ber vê rewşa polîtîk, dema ku tiştêk dikeve ber destê min, ji bo ku wînda nebe ez dikim pirtûk û didim çapkirin.

**J.B:** Gelo ew arşîv xwedî pergal? Tu arşîva xwe çawa bi nav dikî? Bi rêya dosyeyan, cureyên keresteyan, hwd?

**S.Û:** Wekî ku min got ez ne koleksiyoner im. Tiştên ku didim hevdu ji bo xebatên xwe yê wêjeyî bi kar tînim.

**J.B:** Gelo tu arşîva xwe diparêzî (mesela ji windabûnê, ji tozê, ji polîsan, hwd)?

**S.Û:** Xebatên xwe yê folklorê di nava wêjeya xwe da (roman, senaryo, hwd) bi kar tînim û mayînde dikim.

**J.B:** Arşîva rexistin (sazî) û kovarên ku tu bi wan ra dixebitî heye? Ew karê te jî arşîv dikin?

**S.Û:** Weşanxaneya ku pê ra dixebitim, Weşanxaneya Wardozê, dema ku pirtûka min çap dike rewşa pirtûkê ya xwerû arşîv dike.

**J.B:** Gelo bi ya te kovar dikare bi rola arşîvê jî rabe?

**S.Û:** Erê, dikare bi rola arşîvê rabe. Ji bo ku mayînde bibe tiştê herî baş li derekê bê weşandin an jî çapkirin.

---

<sup>2</sup> n.e: “Şampaz”, romana Sadiq Êskanî ye, di sala 2019an da ji Weşanên Wardozê derket.

**J.B:** Gelo keresteyên ku berhev dikî, wan çap dikî yan jî diweşînî? Li ku derê? Çawa?

**S.Û:** Berhemên xwe li Weşanxaneyê Wardozê didim weşandin. Jixwe pirtûkên kurdî zêde nayên frotin û nivîskar jî pereyan an jî tiştêkî madî ji weşanxaneyan naxwazin.

**J.B:** Li gor te kîjan metodên weşanê/çapkirinê ji bo çanda devkî ya kurdî yê herî baş in û çima?

**S.Û:** Ez nivîskar im û ji ber wê jî dema ku xebatên folklorê dikim jixwe di serê xwe da berhema xwe ava dikim. Carna hin tiştan qeyd jî nakim. Dema ku ez atmosfera civatek folklorîk dijîm têra min dike. Ez xebatên xwe didim çapkirin. Lê ji bo karên folklorê û arşîva wê divê vîdeo bê bikaranîn. Ji ber ku hin refleks hene ku hew bi vîdeoyan tê tomarkirin. Dema ku kal û pîrek ji morivî ra biaxive mirov bi vîdeoyê tomar bike, rewş û alavên mala wan jî pê ra tê tomarkirin ew jî dibe bonûsa xebat û vîdeoyê.

**J.B:** Tu ji bo weşanê/çapê berhemên çawa hildibijêrî? Giringîyê didî çî?

**S.Û:** Têkilîya kurdan û xwezayê bêhtir bala min dikişîne. Di roman û çîrokê da jî bêhtir van hêmayan bi kar tînim. Lê ez dibêjim, di binê van tiştan gişan da *ethîk* heye.

**J.B:** Ji kerema xwe ra behsa Payîzxêrê bike. Maneya vê peyvê çî ye? Navên mehan bi kurdî ji mêj ve bala min dikişînin: Li ser mehên kurdî navên curbicur hene, û gelek sîstem hene ku hinek cuda ne û tevlihev in?

**S.Û:** Xwezî te Payîzxêr xwendibûya! Jixwe ji mêj ve bersivên ku didim pirsên te giş di çarçoveya pirtûka Payîzxêrê da ye. Wateya Payîzxêrê ya yekem (1); baranên ewilî yê ku di demsala payîzê dibarin. Maneya Payîzxêrê ya duyem; (2) gîyayên ku piştî baranên payîzxêran şîn tînin. Ev xebat min û dê û bavê min, me bi hev ra kirîye û jixwe min pirtûk jî dîyarî wan kirîye. Navê wan Mamo û Fatê ye. Du salan bi dê û bavê xwe ra xebitîm û zêdeyî du salan jî bi tena serê xebitîm. Ji bilî dê û bavê min, ez bi çend kesên din ra jî xebitîm. Lê bi giranî bi dê û bavê xwe

ra xebitîm. Kurd dîroka ku hatine dinyayê rast nezanin. Ji ber wê jî rojbûnên xwe di rojên şaş da pîroz dikin. Ez jî ji bo ku vê şaşîyê ji holê rakim, min rojekê ji dîya xwe ra got, “Yadê, ez kengî hatime dinyayê?” Dîya min jî got, “Dema ku bizina me ya kol cotek karik anîbû tu hatî dinyayê.” Ji ber wê jî ez û wê, em ketin nava hesabên salnameyan û min lê nihêrî ku dîya min salnameyek pir ecêp bi kar tîne. Welhasil û kelam, Payîzxêr weha dest pê kir. Di xebata Payîzxêrê da min navên mehan giş bi referans rave kirîye. Hinek hesabên stêrkan jî tê da hene. Li ser meseleyê, meha havînê ya diduyan, tîrmeh, navê xwe ji birca tîrê girtîye. Di meha tîrmehê da roj dikeve birca tîrê. Stêrka Dewkîlan, yanê stêrka jinên ku serê sibehan meşkê dikilên. Ev stêrk li ber dilê min, stêrka dîya min e.

**J.B:** Tu ji bo çî berhemana çap dikî? Armanca te ya çapkirin û belavkirinê çî ye?

**S.Û:** Ji bo min armanc ew e ku xebata mirovî bê tomarkirin û wînda nebe. Jixwe her nivîskar dixwaze pirtûkên wî pir bîn xwendin. Ji qewla Dostoyevskî be, nizanim ji bo çî berhemana çap û belav dikim.

**J.B:** Tevgerên weşanxane û cureyên weşanên kurdî, li gor salên berê li hember berhemên çanda devkî guherîne?

**S.Û:** Weşanxaneyên Wardozê sistemek xweş bi kar tîne. Hin xebatan rewşa wan a orîjînal çap dike. Di xebatên wêjeyî da yên wekî roman û çîrok, zimanekî standart bi kar tîne. Gramer mîna doşeka Proktûstes e.

**J.B:** Tu dixwazî versiyona çapkirî ji bo kê be?

**S.Û:** Ez dixwazim nûjen be, kesê ku bixwîne çêjeka wêjeyî jê bigire. Lê divê orîjînalên wan jî bîn mihafezekirin.

**J.B:** Gelo tu ji bo berhemên çapkirî pêşgotin an şiroveyan dinivîsî? Çima û wan çawa diafirinî/dinivîsî?



**S.Û:** Na! Xebatên weha nakim. Jixwe di weşangerîya kurdî da adeteka weha hîn pir rûnenîştîye.

**J.B:** Gelo ji bilî çapê/weşanê tu/yan hevalên te bi rêyên cuda yên belavkirina çanda devkî digerin (mesela festîval, şano, pêşkêşên cuda û hwd)? Çi ne ew? Tu dikarî çend nûmeneyan bidî?

**S.Û:** Ez xebatên weha nakim, lê hevalên ku xebatên weha dikin hene. Hem bi rêya şanoyê û hem jî bi panel û fûarên pirtûkan. Van salên dawî, folklorê kurdî populer bûye.

**J.B:** Tu behsa rêzefilm û kartonfilmê dikî. Ev ji bo min zaf balkêş e. Gelo tu dikarî piçekî zêde behsa wan bikî? Te kîjan motîfên folklorîk bi kar anîne û çawa?

**S.Û:** Min di kartonfilmê Pînikê da lehengekî tirse, Sîngestar<sup>3</sup> bi kar anî. Dijberî Sîngestar jî min mirîşka kurmancî<sup>4</sup>,

---

<sup>3</sup> Motîfeka tirsê ya alîyê mintiqeya Çewlikê ye. Zarok wextê ku xwe bêtore dikin an jî bi şev naxwazin rakevin, pê tînsîn. Wextê ku zarok ranakevin dayika wan, ji bo ku wan bitirsînin weha bangî Sîngestari dîke: “Sîngestaaar! Sîngestaaar, di pixêrî re pêçîyê xo bîk waaar, qijûn bûnc dîyaaar (bi zazakî ye.)” Di kartonfilmê Pînikê da navê wî Sîngesatar e.

<sup>4</sup> Mirîşka kurmancî, bi ser motika xwe da direhile. Ji bo ku mirîşka kurmancî hêka xwe bike, divê motika wê hebe. Hêk tune be ku mirov tê bike binê wê, mirov pîvazeka spî jê ra dîke motik û dîke bin wê. Mirîşka ku bê motik bimîne, dîn û har dibe û belayekê tîne serê xwe. (n.e.: li vir ev jêderê e, lê nivîskar dîyar nekirîye ku ji ku derê girtîye): “Modik ma+du+ik>maduyik>modik, hemen hemen bi tevayî mirîşk, ji bo ku hêka xwe dayîne li hêkekî digere ku li ser wê rûne, hinkî mirîşk jî hene bi rojan hêka xo di xo de dihêlin. Ji ber vê îrada mirîşkê, dema kû kevanî hêkan ji koxê bînin, ew hêkekî tê da dihêlin, ji bo ku mirîşk li ser wê rûnin. Ez dibêjim ‘moda’ û ‘model’ ji wî ketine nava zimanên rojava.” “Motik, semyotîka zindîhiştina bal û bîra afirînê e.”

Wextê hêka mirîşka kurmancî tê, dibêje, “Qid qid qid qid qid qidêkêê!” û li motika xwe digere. Wê keliyê zarok li dora wê hebin ew jî jê ra dibêjin, “Qûna te li ser hêkê!” Mirîşk digere, tê li ser motika xwe rûdine û hêka xwe dîke. Piştî hêka xwe dîke, vê carê jî dibêje, “Qa qa qa qa qirêkê!” zarokên dora wê jî jê ra dibêjin, “Te qûna xwe rakir ji ser hêkêêê!” Mirîşkên kurmancî, ji serê sibehê heta êvarê, sergoyan vedidin, zibil bi ser serê xwe dixin û beskurkên xwe bi kurmik û kêzik û zîroyan tijî dikin heta ber dev. Rengê hêkên mirîşkên kurmancî, di rengê kevirên herêma wan da ye. Ji ber ku her mirîşka azad, ne yên ku di wan çiftlikên wekî hefsan da mezin dibin, zixurên welatê xwe bera beskurka xwe didin. Rengê hêka mirîşka herêma Qerejdx û Nisêbînê ne wekî hev e. Çawa cil û bergên herêman ne wekî hev in, rengê hêkên her herêmê jî ne wekî hev e. Rengê hêka mirîşka ziraetê li her derê dinyayê yek e. Zerdik û spîka hêkên ziraetê li her

## dîkê kurmancî<sup>5</sup>, elok<sup>6</sup>,

derê dinyayê ji hev e. Ma hêkên kurmancî weha ne!? Kebanîya malê mirîşka kurmancî ji pînikê bera derva nede, mirîşk di pînikê da dîn û har dibe. Bi nikulan, hêkên xwe bi ser hev da dişikîne. Havînê, li berîya Mêrdînê, bi xwedîyên xwe ra derdikeve ser text û banan. Malbat li ser text û banan radikevin û ew jî ji xwe ra li ser pîyê dîwarekî yan jî şaxek dara tûyê dilûse. Li gundan, bi hêkên kurmancî, bazara alav û tiştikan tê kirin. Wextê etar tên gundan, kebanî kitanên xwe tijî hêk dikin û li etêr dicivin. Kebanî xwe di ber hev ra radikin û ji etêr dipirsin ku filan û bêvan tişt bi çend hêkan e? Wextê hêk û tiştikên ku kebanî ji etêr dikirin, miqabilî hev dernekevin, ango hêk li kebanîyê kêmbikevin, deyn dibe hêk û dikeve stûyê wê. Wê çaxê jî heta ku careka din etar vege-re gundî, kebanî divê hêkên wî bide ser hevdu. Zilamên gundan bi hebên tizbîyan, jinên gundan bi hêkên mirîşkan, dibin xwedîyê hesabê hesabdarên. Ji bo mirîşkên kurmancî kurk bikevin û li ser hêkan rûnin, divê dîkek tê keve nava wan. Kebanî ji bo ku kurkên xwe dayînin, dîkekî bera nava pînikê didin. Mirîşkên dîk bi wan da fis neke, hêkên wan ji kurkan ra nabin. Dîk bi mirîşkê da fis dike û mirîşk jî bi ser hêkên xwe da hêk dike. Piştî ku hêkên mirîşkê têra kurkêtinê wê dikevin ser hev, kebanî hêkên wê tenî dike û pêncşemekê, wê li ser datîne. Piştî sê pêncşeman kurmancîkên wê ji hêkên xwe derdikevin. Mirîşka Kurmancî ya sere, li ser 15-18 hêkan kurk dikeve. Fêrîka mirîşka kurmancî li ser 12-13 hêkan kurk dikeve. Mirov ji kurk û kurmancîkên wê ra li nava gîyê, holikekê çêdike û wê li bin holika wê girê dide. Carna jî mirov kevirekî biqul bi lingê kurka xwe ve girê dide û wê bera binê holika wê dide. Wextê kurmancîkên kurka kurmancî li dora wê dikin wîwêwî, kes nikare bi dora wê bikeve. Mirîşka kurmancî li dora holika xwe kê zeft bike, berepax dike. Ji bavê kê zêde ye ku nêzîkî kurmancîkên wê bibe! Di kartonfilmê Pînikê da navê wê Nequr e.

<sup>5</sup> Dîkê kurmancî, rojê sê danan (caran) dibêje, “Qî qî qîî!” azan dide. Hinek ji van dîkên kurmancî salê carekê hêkekî dikin û xwedîyê xwe di nava dost û hevalan da dihetikînin. Dost û hevalên mirovî vêya minasib nabînin. Wextê dîkê mirovî hêk dike, mirov ji fedîyan nema dikare ji mala xwe derkeve. Ev sosreta giran, di nava gundî da dibe wekî Deqnenosê. Li ser meseleyê, di nava gelî da li ser hêkkirina dîkan gotinên bi vî rengî hene: “Wextê dîkê mala filankesî, hêk kirîye, ez ji dîya xwe çêbûme. Wextê dîkê mala bêvankesî, hêk kirîye kalikê min çûye rehetê. Wextê dîkê...” Mêrga dîkan xweş e, lê finêsên wan mirovî rezîl dikin. Li gor bawerîyên kurdan ên batilî, misîbetek tê serê mala ku dîkê wê hêk kirîye. Divê wê gavê serê wî dîkî bê firandin ku xwedîyê dîkî ji misîbetê xelas bibe. Di kartonfilmê Pînikê da navê wî Qoqo ye.

<sup>6</sup> Elok, heywaneka bibask e, lê nikare bifire. Gir e, lê tirsonek e. Salê du caran kurk dikeve. Elok carekê di sibatê da, carekê jî di hezîranê da kurk dikeve. Elok, hêkên ku dê li ser kurk bikeve, di dawîya heyama sibatoka dînik da dike. Wextê ku hêkên wê digihîjin 14 15 heban, li ser wan kurk dikeve. Kurka elokê, çar pêncşeman li ser hêkên xwe rûdine. Pêncşema çaran hêkên wê diderizin û çêlik jê derdikevin. Elok di adarê da, ji ser hêkên xwe radibin, ango çêlikên wê di adarê da ji hêkên xwe derdikevin.

Elok carna hêkên xwe temam nakin, lê cardin jî li ser wan kurk dikevin. Ji bo kurkêtinê eloka mirovî ewente nere, piştî pêncşemekê, mirov hêkên kurmancî dike bin wê. Ji hêkên elokan, çêlikên elokan û ji hêkên kurmancî, kurmancîk derdikevin. Kurmancîk pir no ne û ji ber vê, îmana çêlikên elokan teneke dikin. Kurmancîk her roj bi nikulên xwe, serê çêlikên elokan berepax dikin.

---

Çêlikên elokan qûngiran in, lê kurmançik wekî zîbeqê ne. Çêlikên elokan, berî ku dest bi êmî bikin, şivanê wan, ji wan ra hêkan dikelîne û dide wan. Çêlikên elokan, bi saya hêkên kelandî, bi rojan tîn, dibin wekî kulîlkan. Piştî bi ser xwe ve tîn, şivanê wan dahnê mehîrê di avê da diner-mijîne û dide wan. Çêlikên elokan, bi saya dahnê mehîrê, bi rojan çêdibin, dibin wekî betiman. Roj derin, çêlikên elokan hebekî mezin dibin. Şivanê wan, serê sibehê çêlik û maka wan li malê êm dike û bi dû ra bera çolê dide. Mirov ji mak û çêlikên wê ra, li nava çêra gundî, holikekê çêdike. Kurka elokê, nîvro çêlikên xwe dide dû xwe û dere bin holika xwe. Şivanê elokan, singê kurkê li bin holikê dikute û korma wan datîne ber wan. Carna jî ji dêvila ku mirov singê wê li bin holikê bikute, mirov şekalekê bi lingê wê ve girê dide. Maka çêlikan, ji ber kosteka lingê xwe nikare zêde ji malê dûr bikeve. Bi saya vî singî û vê şekalê, zêde bi çolê nakeve, wenda nabe û heywan meywan, wê naxwin. Carna, holik jî bi kêrî elok û çêlikên wan nayên û teyr dadidin wan. Heta çêlik dibin elok, wekî emrê Xwedê, çend heb ji wan dibin nêçira teyr û tilûran. Teyr, wekî sîsalkan, li ser serê wan digerin, heta firsenda dadanê bi dest dixin. Wextê firsend dikeve destê teyran, avê lê venaxwin. Kurka elokê xwe li ber teyran dinepixinê, lê belasebeb e. Heta şivanê elokan bi wan dihise, teyr derba xwe li çêlikan dixin. Jixwe, teyran derba xwe lê xist û pê va nema kesek dikare tiştêkî bi wan bike. Belkî şivanê elokan, çend kevkanîyan biavêjê, lê bê feyde ye. Bi roj teyr û bi şev jî rovî li dora çêlikên elokan çireftkan diavêjin. Rovî, bi şev dikeve pînikan û çî elok û çêlikên bi ber devê wî bikevin, dixeniqîne û berata yekê jî li dû xwe dikişkişîne, dibe dixwe qula xwe û li wir dixwe. Ji ber van teşqeleyan, xwedîkirina çêlikên elokan dibe canezabî. Çêlikên elokan merezî ne. Bêxwedîyan, pir nazik in. Eloka di adarê da kurk dikeve û çêlikên xwe derdixe, nema hêkan dike heta pale dikevin nava geniman. Elok, havînê kurk nakevin, li ser hêkan dipernixin û hêkên xwe dipernixin. Ji ber ku havînê, hêkên xwe dipernixin, xwedîyê wan, nahêlin ew li ser hêkan rûnin. Kî çî dike bila bike, kurka elokê bi ser hêkên xwe da direhile. Eloka ku kurk dikeve, dibe wekî serxweşan. Ji ber vê, mirov eloka ku havînê kurk dikeve, sere wê di tasa avê da dadike. Ji bo eloka mirovî bi ser xwe ve were û li ser hêkan nepernixe, mirov wan dixwe çem û golan, lê eloka ku xezeba hêkan bi ser wê da barîyaye, tu tişt nikare wê ji kurkê wê bi dûr bixe. Kurka elokê, dawîya dawî, dere li nava pirêzeyekê, hêkên xwe dike û li ser rûdine. Carna, heywanek wê di ser hêkên wê da zêft dike û wê dixwe. Canikê, carna garanek çêlik dide dû xwe û tê malê û rûyê xwedîyê xwe reş dike. Wextê ku mirov ji yekî hêrs dibe û bi ser da dere, di ber ra jî dibêje, “Ez ê te bi felca elokê xim!” Li gor bawerîya gelî, felca herî giran, felca elokê ye. Wextê felc li elokê dixwe kêr nagihîje ser. Di kartonfilmê Pînikê da navê wî Elo ye.

kurmancîk<sup>7</sup> û qazek<sup>8</sup> bi kar anî.<sup>9</sup>

Rêzekartontîlmê Pîyayê ji bo zarokên pêşdibistanê, yanê ji bo zarokên 4-6 salîyan hat çêkirin. Toposa Pîya Dêrsimê û newala çemê Minzûrê ye. Min di “Pîya”yê da rengên hela Dêrsimê û hevaltî û xwezaparêzî rêyî zarokan da. Alavên ku êdî hatine ji bîr kirin tê da bi kar anîne.

Çavîyên ku ava Minzûrê jê derdikeve dişibînîn pêşîrên xwedawenda Anahitîyê û ava Minzûrê jî dişibînin şîrê wê. Serlehenga vî kartontîlmî kosîyek bû û navê wê jî Zinka bû. Koka peyva Zinka digihîje Yerzinka. Îroj jê ra dibêjin Erzîncan. Navê bajarekî Serheda Kurdistanê ye. Warê Ermenîyan bû zemanekî.<sup>10</sup>

Senaryoyên ev her du kartontîlman û leheng û hêma pir serkeftî bûn û ji tereffî Zarok Tvê jî hat ecîbandin û weşandin. Dûra, ez ji Zarok Tvê veqetîyam, lê hin hevalên din wî karî dewam dikin. Min senaryoya Pînikê bi taybetî bi felsefeya Kûantûmê nivîsî bû. Di vî kartontîlmî da her tişt mimkin bû. Min digot, ez ê kartontîlmekî kult ji kurdan ra çêbikim.

**J.B:** Romana te heye. Tu kurteçîrokan jî dinivîsî. Li gor te pêwendîya folklor û edebiyata nûjen çawa ye?

**S.Û:** Edebîyat û çîroka kurdî heta folklorê xwe nemiçiqînînin dê tu caran bi ser nekevin. Folklorê kurmancî wekî erdekî beyar e. Kesekî zêde tiştêk lê neçandîye. Jixwe tu dizanî roman wekî ku *Mihaîl Bahtîn* jî qal dike her tiştî di xwe da dihewîne. Yanê roman, çîrok, zargotin û hwd gişî dixwe. Cihê ku roman lê şîn bê tu gîyayên

---

<sup>7</sup> Çêlikên mirîşkên ziraetê û elokan gêj in, lê kurmancîk pir jîr in. Guhên kurmancîkan dilivin. Kurmancîk minetê ji tu tiştî hilnayînin. Ji ber ku bê tore ne, mirov wan bi çêlikên elok û yên ziraetê ra êm nakin. Mirov ji çêlikên elokên ra hêkan dikelîne û dide wan. Çêlikên ziraetê bi yemlik tî xwedîkirin. Kurmancîk, bi guncûrên zîroyan digirin, ji zikê erdê dikişkişînin û bera beskurka xwe didin. Çêlikên maran, dûvpişk, kulî, gêgêrik hema çi tê keve ber wan, efû nakin. Wextê pezek an jî mirîşkek tê şerjêkirin, kurmancîk xwe di ber mirovan ra radike û nikulên xwe li xwîne dixwe. Kurmancîkan, mû ji zarokên Kurdên Kurmanc bernedane. Zarokên Kurmancan lingê xwe rakirine, kurmancîkan li dewesê danîne. Di kartontîlmê Pînikê da navê wî Lîço ye

<sup>8</sup> Qaz ji ber meş û bedewî ya wê motîfeke stranên dengbêzan e. Di stranên dengbêjan da qîza bedew dişibînin qazê. Li gor dengbêjan meşa qîza bedew weke ya qazan e. Di kartontîlmê Pînikê da navê wê Qazê ye.

<sup>9</sup> Hûn dikarin bi vê linkê lê temaşe bikin: <https://www.youtube.com/watch?v=-QlScDybDdA>

<sup>10</sup> Hûn dikarin bi vê linkê lê temaşe bikin: <https://www.youtube.com/watch?v=chCG637WNAI>

din lê şîn nayê. Ji ber wê jî wextê ku min romana xwe nivisî, min folklorê kurmancî tê da baş bi kar anî. Lê edebîyata kurmancî ya nûjen îro têkilîya wê pir bi folklorê kurmancî ra tune ye. Lê berê wê li folklorê ye. Hêdî hêdî ber bi wê da dihere. Di helbesta kurmancî da kesên mîna Rênas Jiyanî folklorê di helbestên xwe da bi kar tînin. Helbestên wî di edebîyata kurmancî ya nûjen da yên herî serkeftî ne. Çîrokên min hîn ji gundî nehatînin bajêr. Belkî rojekê werin bajêr. Kronotoposa çîrokên min zemanê berê û li gund e. Wekî nimûne, ez ji te ra çîroka “*Bizirê Kullî*” dişînim. Çîrokeka li ser xelayê ye. Lehengê çîrokê, Mihemedelî, kalikê min e:

## BIZIRÊ KULLÎ<sup>11</sup>

### Paşîv

“Nan!”

Şivanê gund Mihemedelî, yê di nava pez de li ser kevîrêkê rûniştibû, li xwe zîvirî.

“Jibo xwedê pariyek nê!”

Mihemedelî serê xwe ji nava pez bel kir. Ev çi deng bû li vî qilaçî? Îns bû an cins bû?

“Tiliyek nê!”

Şivanî rahişt şiva xwe û bi xof ber bi deng ve çû. Gava li guherê zîvirî, dît ku qîzîkek li erdê dirêj buye. Wexta ku deng carde got “nê!” şivanî, nema xwe girt û çû li ber serê qîzêkê li ser kabû nîvekê rûnişt û şiva xwe li ber wê dirêj kir.

Agir bi mala merivî keve çavkê wê yê bizorê dikutkutî bûbû mûristana gêrgêrîka. Çi qîz bû çi qîz, lê hew hestî û çerm mabû. Rebenê bi zikişkê hatibû heya peravên vê guherê. Cilên li wê, zîval zîvalî bûbû.

Mihemedelî destmala xwe ji serê xwe kir û bi pê, bêxwediyê gêrgêrîka ji ser çavkê wê da alî. Heqîba wî mişt pîvong, kereng û dobelan<sup>12</sup> bû. Bihara pîştî xelê

---

<sup>11</sup> n.e.: Sadiq Êskanî bi islûba xwe ev çîrok nivîsiye û di hejmarê 12an a Kovara “Çîrûsk”ê da bi vî awayî weşandîye (2011, Amed). Herweha wî ji bo nimûne, di vê hevpeyvînê da bi me ra jî parve kir, û wî ji me rîca kir ku di çîrokê da tu destwerdana redaksiyon û hwd nekin, loma ev çîrok di kovara çîrûskê da çawa hatibe weşandin, me jî weha weşand. Ev ji bo *jêrenota 27an* jî wisa ye. Me bi daxwaza nivîskarî, tu destwerdan di çîroka ku di *jêrenota 27an* da ye jî nekir.

<sup>12</sup> Dobelan: Di dinyayê da tiştê ku çêja wê herî xweş e, kuvarkên kurdan e. Ji ber ku dişibînin dûvê beranan jê ra gotine dûvberan, dûra ew deforme bûye, bûye dobelan. Navekî entuke-antîka ye.

erd ser û bin har bûbû. Ji wê re kerengek qeşart û bir ber devkê wê; lêvka wê riciffî lê nikarîbû bixwara. Çû miya hesûdî ji nava kulekan girt û anî nîgekî miyê danî viyalî serkê wê nigê wê yê din danî wiyalî serkê wê. Bi destekî bi serê miyê bi destê din bi guhanê miyê girt û bi ser devkê wê de dot. Çirrên şîr ga diketin devkê wê ga diketîn ser çavkê wê. Rebenê zimankê xwe li dora devkê xwe dibir û dianî lê çi fêde...

Mihemedeliyê ku qet peyvek ji devê wî derneket, piştika keçikê sipart şikêrekî, rahişt şîva xwe û xwe li konê heft sitûn girt. Ji mala axê re got: “Yeka çakûçê wê li hev e. Hêjayî welateki ye. Meriv fedî dike ku li wê binehere. Ku xwedî li wê dernekeve hûn dikarin li lawê xwe jî mahr bikin. Lawê we jî di benga xwe de ye. Rebenê dike ji birçîna bimire” Axayê li ser kulêv rûniştî: “Di vê sîratelmisteqînê de dê weledê xwe davêje Elo! Ez ketime etra nanê yetamê xwe; îja ez li yê xelk û alemê jî xwedî derkevim e wên çend rojên din yetamê min ji birçîna kîrê hevdû bimijin.” Got û rû ji ber şivanî da alî. Mihemedeliyê bêkes û belengaz rahişt şîva xwe û kelogirî berê xwe da guherê.

Mihemedelî li xirbakî<sup>13</sup> Qezê<sup>14</sup> hatibû dinyê. Hîn çar-pênc salî bû pezê eşîrek ereba ji bin xetê hatibû, ketibû bîstanê gûndê wan, gûndiyan jî rabibû kullek dabûn ber xwe û bera hewşa xwe dabûn di berdêla bîstanê xwe de. Piştî çend roja wê eşîra ereba girtibû ser wan. Wê wextê bavê Mihemedelî ku nandirûnekî<sup>15</sup> yeman bû, bi roj û pê de bendera xwe li ba kiribû, şîva xwe li ser benderê xwaribû û gotibû: “Hema litêmka<sup>16</sup> min li ser benderê deynin.”

Feqîro şîva xwe xwaribû, li mêja xwe ya eşa kiribû, ketibû nava lêtêmka xwe û serê xwe danîbû. Erebên li dûv miradê xwe digeriyan hatibûn li ser wî sekinîbûn û yekî ji wan, gurzê xwe li zikê wî xistibû û çend ker û çêlekên gund dabûn ber xwe û xwe li hesin<sup>17</sup> xistibûn. Serê sibehê dîtî ku rêvikên bavê Mihemedelî erînekê<sup>18</sup> li

---

<sup>13</sup> Herêma Xirba, di navbera gundên Qoserê-Hêşerîyê û gundên Serêkanîyê-Ensîrêçkê da ye. Ji “Xirba” ra xirabsemt jî tê gotin. Li gundên “Xirba” bîrên ku ji çaxa Babîlan mane, hene. Gundên vê heremê ji bo ava van bîra li ser xirabeyên ji çaxa Babîlan mane, hatine avakirin. Mînak: Çelbîra, Dubîrka.

<sup>14</sup> n.e.: Ji navçeya Qoserê ya Mêrdînê ra “Qezê” jî tê gotin.

<sup>15</sup> Nandirûn: Kesên ku bi dasê paletîya geniman dike.

<sup>16</sup> Livînên kevn ên ji hev da ketî.

<sup>17</sup> Hesinê trêne yê di hidûdê serxet û binxetê ra derbas dibe.

<sup>18</sup> Dirêjehîya destê mirovî ji stû heta serê tilîyan. Zemanê berê li dewsa metreyê bi kar dianîn.

dûv wî rêz bûye. Ereba heyfa xwe hilanîbûn. Piştî nan û avê bavê Mihemedelî, di ber talanê gund de, ji dinyayê hilat, mervê wan, ji bo diya wî li apê wî mahr bikin li dora apê wî çûn û hatin lê apê wî got: "Dilê min li nivîna birê min venabe." Çend seva kezab li hev reş kirin lê tiştê nexistin serê hevdû. Lê mêze kirin ku nabe, rahiştin kevirekî û danîn serê.

Piştî bavê wî konê xwe ji dinyayê rakir, bi diya xwe re çend salê bi feqîrî û kersîrî buhurand. Rojekê zilamekî çîyayî daket beriyê û mewîj û bastêqa xwe li gundê wan firot. Zilamê çîyayî û diya wî hevdû teqirandin, dûv re jî hevdû girtin û çûn. Diya wî jî bi dûv xelkê ketibû û ew jî ketibû ber hutikê ap û amojinê. Bîr biribû û pê ve jî hema giyaştibû kê li diya xwe pirsîbû heya rojekê hecaciyan gundê wan ji hecê vegeriyan û ji wî re gotin ku li hecê li mêrikê diya wî bi dûv ketibû rast hatine. Ji hecaciyan gundê xwe, gundê ku ciya wî bi zilamê çîyayî re lê dima hîn bûbû û wextê mahsera çûbû wê dera. Li ser mahsera ew û diya xwe li hev banîyabûn. Êdî şûr simbelê wî nedibirrî. Heya vegeyabû malê, wek yekî cûh ketibe zika, ha mewîj ha bastêq, devê wî nesekinîbû.

Rojekê dewletê hat bi qirpika sutuyê zilamê çîyayî girt ku wî bibe leşkeriyê. Ji ber leşkeriya dewletê nan li zilamê çîyayî lêherimî û hema şevê rabû mala xwe li lokekî<sup>19</sup> bar kir, berî da bin xetê û rez û pezê xwe li dûv xwe hişt. Mihemedelî jî li serxetê bi zikekî têr bi dehê birçî ji nanotirî heya nanotirî şivantiya pezê gund kir. Aneha jî bi nanozikê buye şivanê mala axê.

Mihemedelî bi rê de li pêşiya pezê xwe yê di koyê<sup>20</sup> de zîvirî, da ber xwe û berê wan da guherê. Gava bi kelek tuje hat û çav li keçîka reben ket ku sitûkê wê, li wê xeliyaye kelawî<sup>21</sup> di ser re çû, bû qûr qûra wî û giriya. Piştî kela dilê xwe, li ser qeçîka sutûkê wê lê xeliya yî şikenand, rahişt xilçanê xwe û ji wê re gorek li çongekê kola. Wê xweşik tê de veşart, kevîrê şîkar li ser gorka wê kom kir, çend fatîhe li ser mezêlê wê xwend û pezê xwe rakir.

Wexta bû roja din û hat ser gorka keçîkê, dît ku por û potikê qurmiçiyê li der û dora gorka wê bela wela bûye. Jan pê ketê kûçîka, heya hestîkê wê kuvaştibûn.

\* \* \*

<sup>19</sup> Deveyên nêr ên ku tam bûye deve, mezin bûye.

<sup>20</sup> Dema ku dinya germ dibe mîh serê xwe dixin bin hevdu, ji bo xwe ji germahîya rojê biparêzin, jê ve ra jî "koy"ê tê gotin.

<sup>21</sup> Berîya ku mirov dest bi girî bike, ew şewata dil a ku wî bi girî vedike.

## Taşî

Tu salî simirmir van çaxana nehatibû welêt. Hînê tû li dara neketibû. Her sal simirmir wexta tuya tihat welêt û li ser darê tuya dibû şîrçe şîrça wan; lê îsal simirmir bi ser wan de bariyabû. Ji her seriyekî peyvek derdiket. Hineka digot: “Careke din jî simirmir bi ser me de bariya.” Hineka digot: “Veya nîşana bereketê ye.” Hinekî dinê xwe di ber wan re radikir û digot: “Ew qas çûk belasebep nayê welêt.” Ji xwe hineka jî digot: “Min çend roja berê di xewna xwe de dîtibû.” Yekî peyv ji devê yekî girt, heya her kesî nanê xwe li tenûrê xist.

Hinek ji zaroka li bin kulîna li feqê xwe digeriya hineka ji wan jî çeqelastîkê xwe li hev diediland. Xort û şivana dest bi hûnandina kevkanîya kiribû. Heya zîlamên nabosere bêeyb û bêfedî dahfîk li ber simirmira vedida. Ne sekn û ne jî tebat mabû. Zarokên ku hinek rûnê nivîşk dixistin nava nanê xwe yê tîrê, bi çindik, ji malê derdiketin û nedihatî malê heya evarî. Li vir û li wir li dûv qûna simirmira digeriyan. Nan ji baniya av ji kaniya.

Simirmir hatibû welêt û sola kab û xara di taqê re avêtibû. Kesekî nema li wan kab û xarê hinekirî ho vedida. Êdî li oda, civatê seyda simirmira dihat gerandin. Ên ku wê rojê ji seyde destvala vegariyabana malê, li odê li nava şekala rudiniştin û deng ji xwe nedianîn. Ên, xwedê giravî dahfîkê wan ne tu tahfîkbû jî xwe li ciyê xwe fisgenîkî dikirin.

Roja îniyê mele heya cimiet dida ser hev ku xwudba xwe bikin çavê wî derdiket. Tewlê îniya ewil ji ber ku cimeet nehatibû ser hev xudbe nebûbû. Çend îniya çûbûn ji gundê avatir çend zîlam dabûn ber xwe û ajotibûn mizgefta gundê xwe da ku bibin çil zîlam û xudba xwe bikin. Îniyekê-du îniya mele dengê xwe nekir lêbelê lê mêze kir ku her îni ev kuçikantî nayê kişandin; hema ji nişka ve çavê çû nava serê wî. Rabû li ser hukmê hewê di cîh de fitwak li ser goştê simirmir derxist û hikişiya ser mizgeftê û du-sê caran ilam kir ku goştê simirmir necayîze meriv bixwe, jî belka guhê kesekî xwîn nebû.

Jina, li ser tenûra di ber hilkirina girikan re serê xwe dihejandin û ji hev re pesnê seydvaniya law û mêrê xwe didan. Navê Simaîlê Devlalûte ku ji wî re digotin “Simopivo” bûbû agir û bi rebenê va simirmira ketibû, bûbû Simirmir. Bi hatina simirmira re gundiya nan bi guha xwaribû.



Wan rojana Mihemedelî bi roj diçû elêncê<sup>22</sup> û bişevê jî diçû odê. E wê piştî şîva ew û çend xortê gund li odê li ber destê mezina bisuxuriyana. Wê çay û qahwe li odê bigerandana, pêlavên li ber deriyê odê yên bela wela bûyî bi ser hevdana û bikirana wek porê şehkirî. Wê pêlava, zîlamê ji bo çûna malê raba ser xwe, ji nava sola bineqandana û jibo lingê wî li ber deriyê odê amade bikirana. Carna jî wê camêrna sola camêr nî din bi serê lingê xwe vekira û wenda biba heya şeveke dinê.

Firsenda Mihemedelî ji karê odê çêbiba, xwe li qiraxeke odê dida ser tutukê xwe û li odê guhdar dikir. Êdî wan sohpetê bi qaçaxçîyan re yên derengê şevê dadigeriyan odê, wê hirboqiya bi mitriba re nemabû. Kesekî nema wêrîbû bi gota tirt! Hema wê yek rabaya bigota:”Te got, simirmir?” û li ser simirmira di tûrikê kê de çî heba e wê vala bikira.

Êdî çîrok û çîvanokên simirmira dihatin gotin:“Hebû tunebû serçak û simirmirek hebû. Rojekê serçe tê cem simirmir û dibêjê:

– ‘Law min çî heba genim dîtiye, min çî heba genim dîtiye, elah wekîl wek cewahir e!’

Simirmirê kawik dide dûv serçe û tê li heba genim mêze dike ku babo birra jî çî heba genim di nava zibil de dibiriqîne! Simirmirê ku çûz çûz bi çîla wî dikeve berê xwe dide serçe û dibêje:

– ‘Birako te ji bo çî vî pariyê wûsa xweş, nexwariye?’

Serçeyê mukruh dibêje:

– ‘Birako tu dizane tu li ber dilê min delali ye. Bi serê te, kîjan çûkê hat û çav li vê heba genim ket, xwe lê rakişand lêbelê min nehişt kesek ji wan devê xwe jî pê bike. Pariyekî wûsa xweş nabe nesîbê lawê her bavî’

Simirmir basikê xwe li hev xist û li dora heba genim çû û hat li serçe mêzekir û got:

– ‘Birako binehere, bi min neleyize û te dî qaşo em destbirakê hevin jî. Ma ev, benikê qula çavê te ye! Ma ev ne fen be ev çî ben e? Kuro ma ez henekçiyê ber devê bavê te me!’

Serçe xwe bir û anî û got:

– ‘Kero ez ji bo te dibêjim! Ez dizanim tu bi ser genim de direhele!’

Simirmir peyv li wî veğerang:

– ‘Te dî tu bibêje-nebêje hûn serçe hebekî mukruhin! Aminî bi we nayê!’

---

<sup>22</sup> Elênce: Şivantîya ku ji serê sibehê heta nîvroyê ye. Piştî elencê ji nîvroyê heta serê sibehê şevîn dest pê dike.

Simirmir bi fikar bû lê dikira ji ber çîla heba genim ber biavêta û hema got:

– ‘Ez di vî ruhînim!’ Ku çawa niklê xwe li heba genim xist feqê got tereq û ket sitû û simirmirê min û we, perpitî, bi ser de jî zelqê di qûnê re avêt. Rebeno him xwe lewitand him hetikand.

Simirmirê serê wî ketibû feqê, ji destbirakê xwe re got:

– ‘Ûcax kwîrbûyo te pariyek nan danî ber me, taji yê xwe berda ser me!’

Serçeyê destê xwe di hev dida û li dora simirmirê serê wî ketibû feqê diçû û dihat, got:

– ‘Êêê min ez nizanim birako. Bi serê dê û bava, vaye em ê rabin serê te bikin mîrkut. Rêviyê te bikin werîs. Baskê te bikin kon. Lingê te bikin sing û sitûn û em ê vê havînê dakevin berriya Mêrdînê.’ Çîroka min xweş wek dîlimek şebeş”

Ji cerga simirmir bi ser wan de bariya bû çîroka serçe û têtî, kiribûn çîroka serçe û simirmir.

## Firavîn

Rojekê ji wan rojên herkes bi simirmira daketibû xirm xirma bezê Mihemedelî bû, diçerîya. Mehemedelî jî rahiştibû xilçanê xwe û çavê xwe li kerenga digere. Gavekê du gava çû-neçû li kerengê rast hat. Bi kêf xilçanê xwe rada sînga erdê û lingê kerengê bi ser serê wî xist. Wexta rahişt kerengê xwe, yê lingê wî bi ser serê wî ketî, lê neherî ku nava axê mişt hebê sîpi ye. Bi saw rahişt hebek ji wan hebana û li wê mêze kir. Ev heba spî him dişibiya heba zîpikê him jî wek maşikek nîska ya li ber çînîne bû. Wê heba dişibiya maşika nîska ya wek heba zîpikê, di nava tiliyê xwe de bir û anî, eciqan dawîya dawî jî teqand û devê wî çû paş guhê wî. Yarebî star! Ev çi tofan bû bi ser serê meriv de hatibû! Mîratê kulliyekî di nava wê ava di hundirê wê maşika wek heba zîpikê de bi sobaniya dilîst. Xwedê hevîrtirşê kullî li nava teştâ arvanê dinyayê xistibû.

Mihemedelî ji daran ketibû. Her serî mezin dibû qûnê ecêb didîtin. Bi xof erd qelaşt, lê neherî ku çî bibîne! Birakê hespa fatma nebiya di sînga erdê de wek hevîrê di teştê de hêdî hêdî hildihat. Mihemedelî her carê digot:”Ya Ellah” û xilçanê xwe di erdê radikir û ax li nava hev diqeliband. Bi qasî dewsa odek li ser deh beştâ erd di ber hev de xilçand. Lê mêze kir; da aqilê xwe... Hema di nava saw, xof û

mahd xelandinê de peyva “bizirê kullî” li dilê wî ketibû û wek kulliyekî ji devê wî pengizîbû.

Gava li xwe hayîl bû dît ku erdê xilçandiye simirmira serê axa wê li binê wê gerandiye. Refek ji simirmira radibû refekî din xwe li axê datanî û bizirê kullî li hev hiltanîn. Mihemedelî wek gulla devê tivingê bazda gund. Piştî dengê haho hahoya wî li nava gund qibe bû, li bayê bezê xwe li deryê odê xist û got:”Agir bi mala we bikeve!”

Ji ber bazdanê zimanê wî bi hostekê ji devê wî kişiyabû, ferek çaroxa wî ji lingê wî firiyabû û destmala wî şemitîbû sitûyê wî. Gundîyên li odê rûniştîbûn tev de hilfiriyabûn ser linga û wek kulliya zimanê wan xwaribe bêdeng, ziq li wî mêze dikirin. Ji derve dengê jin û zarokên li dûv haho hahoya wî hatibûn û li dora odê kom bûbûn dihat. Mihemedeliyê bêhn lê çikiyayî, berdewam kir:”Bizirê kullî...” û ji wan re ta bi terziyê vekir.

Bi peyva “bizirê kullî” re gundî giş rabûbûn ser tapana. “Wexta ecelê bizinê tê nanê şivên dixwe!” Ên çûn bergîr û gayê xwe ji tewlê rakirin û xistin cot, ên ji arodê xwe re dox çêkirin, ên rahiştin merrê xwe, yên berê xwe dan gundên dinê û hewar giyandin wan...

Şêx û ûcaxzedeya xwe diavêtin xwedê, pîr û heciya werd li werdê xwe zêde dikirin; da ku xwedê li wan were rahmê. Dayika nan qewl dikir. Malmezina hespên xwe yên kihêl ku wek qîzên çardeh salî bûn, xistin ber cot. Qîza dev ji miradê dilê xwe, xorta dev ji neqirandina xara berda. Kurtêlxwura fiskirand. Zaroka feq û çeçelastîkê xwe xistin bin kulîna û bi tengala bav û birayên xwe ketin. Kî xal ba ew heval bûn.

Xelk û alem tev de bi wan qilaç û çewlîka bi wan sewade û besta ketin û di ber hev de qalaştin. Wan erd vacî dikir û simirmir li dûv wan difilitî bizirê kullî! Wexta gundiya erd diqelaşt bizirê kullî wek berfê bi ser axê diket. Di nava nifir û xeberê cotvana de simirmir li “bizirê bêşeref” diciviya. “Bizirê bênamûs! Cinsê gawir! Ma morîkê diya we li vir qetiyaye!” Ne bizirê kullî diqediya û ne jî simirmir têr dixwar.

Nava cotvana ket, dest li wan bû girar, bergîr û ga di cot de qetiya, hespên kihêl bûn bergîr, merê wan tê de şikest, devê aroda mihiya lê nebû, xwedê nehêle di ber bizir re negiyaştin. Nanê dinyayê li ser çonga wê bû.

Rojekê gimînî ji binê erdê hat û dûv re erd gelişt, bû wek devê mahra. Ewilî, çend heb kulliyê wek tîtirmoka ji wan qelîştêkê ku bûbû wek devê mahra pengizî,

dûv re kullî ji erdê pijiqî û ji ezmana jî wek ji devê kwîz were xwarê rijîya erdê! Ne yek û ne dido û ne sisê. Meriv ax bavêta li erdê nediket. Li hev dizîvirîn ji hev bela-wela dibûn û carde digiyaştin hev û li ber çavê meriv, xwe dikirn wek gurê manco, wek mahrê heftserî, carna xwe dikirin ayetên ji qur'anê, li hewa. Lîr lîr û şabaş şabaşa xelê bû.

Her çû kullî li hev gewimî. Bû wek çîyaya, wek deryaya. Hindikek mabû ku mirov ji wî re secde bibana. Wî sîpê kullî li hewa giyaşt hev, ezman reş xeniqand û wek hûtekî peyabû erdê. Çarmêrkî rûnişt, xwe çeng kir doxa destê û firîk ji firdoqiya xelê re hêra. Di ber re li teniştê xwe ava serê bolviriyê<sup>23</sup> da ser tifikê û pif kir bizotê êgir.

Ya star ya stara xelk û alemê di feleka re derdiket. Di nava wê icacoka kullî de xelkê rahişt dahs û tirpanê xwe û ketin nava zadê nuh seridî. Hinek ji wan, hinek ji kullî ta li erdê nema. Mîratê kullî wek hacûc û macûca çî ket ber wî li hewa dabeluhand. Ne zad bi meriv hişt ne puş hişt ne rêx hişt, ne guyê paş xaniya hişt. Te digot qey ji ber xelê hatiye. Kullî bûbû kerê xezebê û xela li ser piştê wê suyar bûbû.

Simirmir wek başoke diket nava kullî û guncûrê wî di erdê dida lê bêfêde bû. Xelkê li ser bana, destê xwe xist newqa xwe û li şerê simirmir û kullî temaşe kir, heya kuliyê şamî ku wek perçimoka bûn hat û bû tep-repa wan û li belka guhê pace û deriyê xaniyê wan ket. Kuçik û pisîkê gund her yek bi derekê de terriqî. Jinê bihalekî, hindik mabû, ji tirsê kullî, ber biavêta. Bûbû yabo yaboya zaroka lêbelê kullî çavê xwe li wan soro moro dikir û digot: "Kernooo yabo çûye cem yadê!"

Kesek newêrbû ji mala xwe derketa. Zaroka rolinîvro bi dawa diya xwe digirt û digot: "Yadê, livînê me deyne xewa me tê." Di xewnê wan î rolinîvro de kullîya zimanê wan dixwar. Bi roj û pê de, wek kulliyê berfê ji her derê kullî dihat xwarê.

Kullî ji sibehê heya êvarî wek balafira li ser serê xelkê dikir gumînî. Ji gime gima wan pace dilerizîn. E wê carna xwe kerr bikira dûv re wê carde li hewa bigiyaştê hev û çî têkata ber wî, e wê iyarê wê bazar bikira. Têketa nava çî, wek mendenîqê di hêlek wê re diketê di hêla wê nî dinê re derdiket.

Rojê nivşek kullî dimir û nifşekî dinê ji erdê diza. Serê sibehê gava xelk şiyar dibûn û didîtin ku beratê kullîya wek pûş, ber bê dihere; ji kêfa nedibû ku bifirin,

---

<sup>23</sup> Bolvir: Dijbera xelayê ye. Pîrbûna xurekan.

lê hînê xwe perwaz dikrin, wî serkerê kullî cardin ji erd û ezman dikişiya. Di erd û ezmana de bûbû firêz, wî serqantirê dera hanê.

Wî serkerî, bi wî awayî, roj û şev li belika guhê hev dixist. Ne roj mabû ne jî şev û şevbêrk. Xelk û alem ji tirs û birçîna ji qudûm de ketibûn. Hew destê xwe li ber xwedayê vedikirin û xwe diavêtin rebê xwe.

Xortê gund jî ji şivantiyê xelas bûbûn û êvarî lingê xwe li odê radidan û kuf xufa cixara wan bû, bi zikê birçî, dixan bi ser serê xwe dixistin. Yekî qutiya tûtina Xursê ber yê din de kaş dikir û digot: "Tu napêçe?" Te digot qey merra bavê wan tê de şikestiyê.

Xortekî got:

– "Divê dewlet bi derman û teşkîlat vî tuxumê bênamus biqelîhîne."

Yekî ku ji xwe re cixare dipêça, got:

– "Tu li ku, dewlet li ku xwedê ji te razî."

Yekî dinê xwest li hevalê xwe zêde bike:

– "Dewleta çî halê çî heyran."

Yekî peyv ji devê wî girt û got:

– "Dewlet kîrê xwe û masiya ji hev dernaxe; tewlê îja kullî... Tew lo dilo!"

Yekî di ber xwe de got:

– "Kero nemre, qîvar hat"

Yekî ku wek ba ber guhê wî ketibe, got:

– "Te got simirmirê wek kera hat?"

Yekî xwe qurre kir û got:

– "Ero, belkî dewletê bi destê xwe welat bizar kiribe; kî dizane? Bextê vê dewletê tune. Ji xwe êdî li nava dewletê ejnebî jî dermanê her tiştî heye"

Yekî cansivik xwe di ber wî re rakir û got:

– "Bi wî nanî rast e, ma ji bo çî kullî li binxetê nexist? Ma qey nikarîbû xwe di ser sînore re çeng bikira?"

Yekî bêhnek kwîr li cixara xwe xist û xwest peyva hevalê xwe yê cansivik rast bike got:

– "Na kurro, kullî li binxetê jî xistiye lê ne bi xezeba serxetê"

– Xortekî simbêlboq çeng bû ser xwe, got tereq, destê xwe li qutiya tûtinê ya li ber xwe, xist û got:

– "Bi nod û neh mishefî, e wê rojek bê, em ê gunê vê dewletê li iniya wê bixin!"

Mihemedeliyê ji acizî û ji birçîna pif pif pê ketibû got:

– “Yaw zimanê we çî çepel e! Kullî û dewlet serê we gişî bixwe! De rabin herin li malê rakevin, xewa we tê!” Mihemedelî rabû ser xwe û xortê gund ji odê qewirand.

Herkesî ji xwe re diçande şorbê û wî serkerê serker jî ketibû ser sifra welatê wan û binê mesefa wan dialast. A wî serkerê serqantir singê bolviriyê li cem xelê kuta û şevêk ji şevan teqizî; simirmirê ji xwe re ketibû xêra xwedê jî da dûv wî.

## Şiv

Ji ber xezeba kullî xelk rût ele rût li qûnê rûniştibûn. Wî utrê kullî di tîfika wan de rîtibû. Kurtêlxwure kullî bi emelê hostê pif kiribû wê jiyana wan î li ser pif û nîvekê û fiskirandibû. Nanê wan î di zîkê şêr de li iniya hirçê xistibû. Ger ku çend camêra Hz Yûsîfek dahf dabaya bîra welatê wan, dibe ku berî kullî çahlê wan jî tuje genim biba. Lê tîkes di wan Bîrê Alman<sup>24</sup> de wernebûbû. Camêra, nanê Îso xwaribû lê selewat li Mûso anîbû!

Ji her derê bêhna beratê kûçîk û pisîka dihat. Gur û rêviyên birçî li dora gunda çîrefîtik diavêtin. Wî nanîkê delal ku meriv di ser serê xwe re diavêt nema bi destê tîkesî diket. Di wan rojê nangiran de, e wê mirov biçûna cem necar û xerata û ji îyalê xwe re hinek xeritoka dara bianiyana ji dêvila genimê serzer. Ji xwe yê nanê ceh bi dest wî diket kumê xwe diavêt ezmana. Li welêt nema isma zewade peyda dibû. Axirê pîştî xezeba kullî baranek baş hat. Bi xêra wê baranê li welêt pincar har bûbû û ji xwe mirov bi xêra wî pincarî li ser linga mabûn. Mirova hinek xeritoka dara û tolik li nav hev dixistin, dikelandin û diixwarin; ew jî bi çî halî. Xeritoka dara tahl tahl wek zirav bû. Derxistina wê ji xwarina wê jî diwartirbû. Tolik di zîkê wan de dibû rêsi. De were û wî rêsiyî derxe yabo! Jiyan wan bûbû wek mirovê nanê bêxwê xwaribe.

Mihemedelî xwe li Xeta Alman xistibû û çûbû binxetê, cem diya xwe. Çend roja bûbû mêvanê wê; wan jî, dûv re tûrê wî mişt genim û xurme kirin û avêtin

---

<sup>24</sup> Bîrên Almanan: Zemanê ku rêya trêne ya Stenbol û Hîcazê çêdikirin ku di ber karê xwe ra li Kurdistanê, li petrolê digerîyan, wê demê ew bîr hatine vedan.. Hinek ji wan ji xelkê wir ra man û wan ji xwe ra kirin bîrên avê. Pir kûr in.

ser pişta kerka wî. Wî tîfalî xatir ji wan xwest û berê xwe da hudûd. Hema hudûd derbas kir-nekir cemsa leş-kera got tirt û li pêşiya wî sekinî û bû ûlan ûlana wan keftara. Rebeno nanê wî bêxwê bû. Mihemedelî newq ji wan vala kir û niqûçand kera xwe û berê wê da hêleke din; lê çî fêde leş-ker giyaştinê û bi ser wî de kirin birre birr. Duv re wan keftara tûrê genimê wî zîval zîvalî kirin, gullak di serê kera wî ya bûbû hestî û çerm de sar kirin, çend pihên li devê qûna wî xistin û axirê ji cem wî, welî bûn.

Lawikê belengaz li wan xwurmekê xwe yê ku êdî bûbû malê gêrgêrîka neherî. Genimkê xwe yê ber destkê wî ket xist dawka xwe, di ser milê xwe re li qulla di serê kerka wî de vebûbû û di cîh de bûbû kelmezota moza, neherî û çolbir ket rêka malka xwe. Nan baş dihat cûtin lê nedîçû xwarê.

Mihemedelî wexta giyaşt gundê xwe, gundî giş li ber deriyê mizgeftê kom bûbûn. Rabû wî jî tev genimê di dawa xwe de, xwe li wan girt û çû cem wan. Ew jî li gundiye ku kom bûbûn zê de bû û serê xwe di ser wan re dirêj kir ku mêze bike hela çî mesele ye.

Lê mêze kir ku Simopivo bi terriya pisîkek mirî girtiye, devê wê giyandiye erdê, wê beloqanî kiriye, mele bihêrs bi ser Simopivo de diqîre û gundiye ku çend kulm genimê wan î mabû ew jî berra ser serê pisîka mirî, ya Simopivo bi terriya wê girtibû û devê wê giyandibû erdê, didan.

Simopivo ji birçîna hew debar kiribû û li dora pisîka diya xwe ku pisîkek wek wê gurê mişka tunebû, çûbû û hatibû. Wexta diya wî ketibû ser limêja nîvroj, hema ew jî li pisîka ku li berberojka deriyê malê ketibû xewê, zîvirîbû, rahiştibû doxa bêrê û gotibû pereq, li orta qotê serê wê xistibû. Pisîkê hew gotibû: "Miyaaaw!" û terî li wê bûbû sing.

Wexta dengê teq reqê û pisîka wê, li ser limêjê ketibû guhê wê, li bayê bezê gotibû: "E selam û eleykum we rahmetula. E selam û eleykum we rahmetula." Limêja xwe qedandibû, serê sucada xwe lêvegerandibû û li bayê bezê ber bi deriyê malê ve çûbû. Zanîbû ku carde lawê wê finêsekî pîs, kiriye. Rebenê dîna ku dîtibû, doxa bêrê di destê lawê wê debû û pisîka wê yî ku ne dida bi malê dinyayê gişî, li erdê bûbû berate.

Dahfek dabû lawê xwe yê wek xenzîr serê xwe berra ber xwe dabû, li pisîka xwe neherîbû û bi ser Serxenzîr de qîriyabû: "Tu bi qurbana wê be! Tu li dora serê

wê bigere! Xwîna te li iniya wê bikeve! Law, çi heqê te li vê pisîka ker û lal hebû, ya ya bêîman!” Rebenê, ji qahra, hindikek mabû kirasê li ser xwe biqetanda.

Gundî û cîranê wan, xwe li dengê diya Simopivo girtibûn, li wan û berata pisîkê kom bûbûn û di binçava re li qatilê pisîkê neherîbûn. Kalek, ji cîranê wan, hema çawa hatibû, li ber Simopivo sekinîbû, di nava nirç nirça jina re, tif kiribû ser çavê wî û gotibû:” Ya ya Nemrûtê Nemrût!”

Ji cîranê wan yekî gotibû:”Qetla pisîkekê wek qetla mêrekî xwedîşê e. Tu li vê dinya yê ji ber ayînê wê ti carî têr naxwe û li wê dinya yê jî tu nikare ji ber ezabê gunehê wê bifilite!”

“Li axîretê, wexta tu di ser pira selatê ya ku ji mû ziravtir re derbas bibe, e wê vê pisîka, ji xafil de bibêje miyaaaw û xwe çeng bike ser çavê te û bi navperuşkê xwe herdû çavê te derxe û tê jî ji ser pira selatê teqlo meqlo bibe binê dogehê!” Cîranekî wan li yê berî xwe zêde kirbû.

“Wexta tu ji ser pira selatê ya ji mû ziravtir, teqlo meqlo bibe binê dogehê, li wê dera jî şêr û pilingê ji êgir ên li benda te sekinî, ew ê bifilitin te û iyarê te bazar bikin!” Kalê ku çawa hatibû û tif kiri bû ser çavê Simopivo jî ya xwe bi ser vekiribû.

“Dûv re jî wê zebanî werin bi guncûrê çend felqê hestiyê te yê ji ber şêr û pilingê ji agir, mane bigirin, bavêjin binê heft tebeqê dogehê û bi wan çend felqê hestiyê te, pê yên ji te gunehkartir, bişewitînin!!!” Diya wî jî li wan gişa zêde kiribû.

Rebenê Simaîlê Devlalûte yê ji ber xofa xwedê hindikek mabû ji mêrantî biketa, xwe çeng kiribû terriya pisîkê û berî dabû mizgefta gund û gundî û cîrana jî dabû dûv wî.

Melê gund li ber deriyê mizgeftê zevt kiribûn û ji wî re hal û masela xwe gotibûn. Wexta ji melê re hal û mesela xwe gotibûn, çavê melê fire bûbû, berê xwe dabû Simaîlê Devlalûte û gotibû:” Kurro Simopivo! Ma qey tu ber xwe nakeve! Hema her roj tu ji me re daweteke bi def û zurne li dar dixê!” Diya Simopivo, li melê neherîbû û gotibû:” Seyda, ka em çawa bikin ji vî ekrûtî! Nanê nerm e, zikê çerm e, Siltokê bê şerm e!”

Melê çend cara gotibû:” Estaxfurullah, estaxfurullah” û nahlet li çavê şeytên anîbû. Destê xwe di riya xwe de dabû û gotibû:” Ji ber qetla vê sewala ker û lal e wê fiqurî bi ser gun de bibare û ji xwe va bariya jî. Xwedê tehalala hevza meriv ji mûsîbetê mezintir bike.” Melê bîstikekê xwe giran kiribû û dûv re carde axivîbû:” Ya divê em bi qasî giraniya vê pisîkê, zêr li feqîr û xizana belav bikin ya



jî em devê wê bigêjînin erdê, terriya wê bilind bikin û genim valabikin ser wê heya di nava genim de wenda bibe û wî genimî jî li feqîr û xizana belav bikin.”

Hînê peyva melê di devê wî debû ji gundiya yek rabûbû û ji mele re gotibû:

– ”Xalê Seyda, welleh vê bêxwedîya pisîkê wek betekê ye. Ku em xwe jî bifiroşin em nikarin bi qasî giraniya wê zêr bînin ser hev. Genim jî li gund peyda nabe. Li her malekê hew kulmek-du kulm genim maye. Tu dixwaze em terriya vê bêxwedîyê di ber de jê bikin û devê wê bigêjînin erdê û qûna wê bellot bikin û genim valabikin ser wê, ma nabe? Lêbelê em devê wê bigêjînin erdê û ve terriya wê ya bûye wek singekî, bilind bikin, em bîst olçek genim jî berra ser wê bidin em ji bin barê vê beratê xelas nabin.”

Melê çavê xwe girtibû, dabû û sitendibû... û gotibû:

– ”Nnna!”

Melê, dûv re jî bi hêrs gotibû:

– ”Ma axîret holîka zaroka ye?”

Wexta Mihemedelî, zorbela ji dahfika leş-kera xelas bûbû û vegeriyabû gundê xwe, gundî ketibûn pirrika Simiopivo û çî genimê wan î hebû, li ber deryê mizgeftê, bi ser serê pisîka ku Simopivo devê wê giyandibû erdê û terriya wê bilind kiribû, dadikirin; da ku wê di nava genim de wenda bikin, wî genimê hanê jî li feqîr û xizana belav bikin û ji xezeba xwedê tehalaxelas bibin. Ê wan nas nekira, wê bigota qey ji mala qelewin! Tirê wan ji ciyê germ dihat.

Mihemedelî hînê ji gundiya xwe bûyer dipirsî ku meselê fêmbike, hema mele got:”Hela rê vekin! Va ye Elo jî pêşek genim ji me re aniye. Aferim Elo!” Rebenê Mihemedelî jî ji fediya, genimê di dawa xwe de bera ser berata pisîka ku gundiya çî genimê wan î hebû bi serê wê de dakiribûn; lê hînê jî terriya wê li hewa li ba dibû, da. Mihemedelî bûk dabû bi tûtûkê û tûtûka xwe li ser tahtê li erdê xistibû û wê hûrik hûrikî kiribû.<sup>25</sup>

---

<sup>25</sup> Hebû tunebû serçakî ku sitrîkek ketibû lingikê wî hebû. Vî serçî ji xwe re li yekî ku sitrîkê lingikê wî, ji wî re derxe dîgeriya. Çû çû xwe li ser tenûra pîrek ku ji ber ardûyê şil tenûra wê pênediket, danî û ji pîrê re got:”Pîrê, ger ku tu vî sitrîkê ketiye lingikê min, ji lingikê min derxe û bavêje tenûra xwe e wê tenûra pêkeve.” Pîrê sitrîkê ketibû lingikê wî derxist û avêt tenûra xwe. Birra jî tenûra wê pêketibû. Bû gimîna tenûrê, tenûr sor bû; bû wek piling. Pîrê nanê xwe bi tenûrê veda serçe xwe li ber agirê tenûrê germ kir. Pîrê nanê xwe ji tenûrê rakir û xwest here malê, lêbelê serçe xwe bir û anî û ji pîrê re got:

– “Pîrê! Ya tê heft nan û kilorekê bide min ya jî kanî sitrîkê min.”

Pîrê li serçe vegeran:  
 – “Kuro ma ez ê çawa sitrîkê te bidim te? Ma me sitrîkê te li ber çavkê te neavêt tenûrê û tenûr bi wî pênexist?”

Serçe jî li pîrê vegerand:  
 – Çi ji min re! Ya tê heft nan û kilorekê bide min ya jî kanî sitrîkê min.”

Pîrê got:  
 – “Yabo emirê min ji xwedê re!” Rabû di berdêla sitrîkê wî de heft nan û kulorek da wî.

Serçe rahişt heft nan û kilora xwe got pîrê û firiya. Çû çû, lê mêze kir ku şivanek li guherekê rûniştiye û bi şîr re pişkula dixwe.

Serçe jî şivên re got:  
 – “Şivano! Ji bo çi tu bi şîrê xwe re pişkula dixwe?”

Şivên li serçe vegerand:  
 – “Serçeyo, isma nan peyda nabe.”

Serçe jî li şivên vegerand:  
 – “Şivano dev ji pişkulla berde! A ji te re vî heft nan û kulora, bi şîrê xwe re bixwe.”

Şivên heft nan û kulora ku serçe dabû wî, rûnişt bi şîrê xwe re xwar, zik li xwe kir meşk. Lêbelê serçe carde xwe bir û anî û ji şivên re got:  
 – “Ya tê heft mî û berxekî bide min ya jî kanî heft nan û kulora min.”

Şivanê heft nan û kulora serçe li iniya xwe xistibû, ji serçe re got:  
 – “Yabo ah ji te re vê heft mî û berx a”

Serçe rahişt heft mî û berxa xwe, got pîrê û firiya. Çû çû li gundekî li dawetekê rast hat. Serçe lê mêze kir ku mahzûban berra ser piştî kuçik û pisîka dide û ji berbûk re, serjê dike. Serçe çû xwe li cem wan danî û ji wan re got:  
 – “Mahzûbano! Ma ji bo çî tu ji berbûk re kuçik û pisîka ser jê dike?”

Mazuban li serçe vegeran:  
 – “ Serçeyo, mî û berx qelîhîne.”

Rabû serçe ji mazûban re got:  
 – “A ji we re vî heft mî û berxa ji berbûk re serjê bikin”

Rabûn ew heft mî û berxa ser jê kirin û govend gerandin; û bû lîre lîra berbûk. Lêbelê serçeyê min û we, carde xwe bir û anî û ji xwediye dawetê re got:  
 – “Ya kanî bûkê bidin min ya jî kanî heft mî û berxa min!”

Xwediye dawetê yê heft mî û berxek li iniya xwe xistibûn bi destê bûkê girtin û wê dan serçe.

Serçe rabû bi destê bûkê girt, got pîrê û firiya. Çû çû li itarekî ku bi rê de tûra tûra wî bû li bilûrê dixist rast hat. Serçe bang itar kir û got:  
 – “Mingoo itaro!

Itêr got:  
 – “Bêje serçeyo.”

Seçe got:  
 – “Tu tûtûka xwe nade bi bûka min?”

Itêr li serçe vegerand:

## Şêranî

Di nava nîfirê jinên gund de her kesî, çî genimê wan î hebû bi serê pisîkê de dakiribû, dûv re wî genima, ji bona li feqîr û xizana belav bikin, xistibûn cax û kîsa, berata pisîkê avêtibûn ser sergo û ji ber ku xezeba xwedê ji ser çavê xwe dager kiribûn, bi dilekî rehet çûbûn malê xwe.

Kullî cehemîbû, çûbû. Êdî simirmir di wexta tuya de dihat welêt. Her kes bi kar û emelê xwe daketibû. Mirov hêdî hêdî di nava sala de diçûn û bi ser xwe ve dihatin. Salxelê ber bi salxenê ve diçû lê vê neqlê jî qumil ket ser dilê firîka û serî lê xeland. Rebena bextê wan reş bû.

Welatî, çend sala bi derdê xela qumul daketin û ew jî ser çavê xwe dager kirin. Piştî mûsîbeta qumul êdî simîl jî nema wêrîbû biseridiya. Rebenê simîl her cara xwe xweş kiribû ku biseride, ji xafil de, cunuhek li sera ketibû.

Ahliyên welêt piştî çend salê bi teşqe, nîfçê xwe yê salê danîbûn ser hev. Erdê xwe bîzar kiribûn û ji xwe re cardin li dewsa bêndera bi xar û kaba dilîstin. Qaçaxçiya li gunda lotik diavêtin. Êvara li oda hirboqî kê m nedibû. Qîza dest bi mirada kiribû. Mihemedelî jî ji şivantiya axê xelas bûbû, ji xwe re hinek kulek, bi rastmalî, bi dest xistibû û simbêlê xwe li badida û li dora dotmama xwe diçû û dihat. Nan zuha, dew tîrş bû; lêbelê jiyan şekirê hamidhilo<sup>26</sup> bû.

Simîl di binçava re li dora xwe mêze kir, çavê wî lê bû ku vê neqlê birra jî biseride; lê leş-kerê dewleta hov wek bizirê kullî kişiya welêt. Ifara mabû jî ber icacoka lingê wan dahbê, kesek nizane bê pûrta paş sitûyê bavê wan li kîderê ye, çû. Wî leş-kerê dahbe digiyaşte kê, wî/ê basko dikir.

Xortê baskokirî hevdû girtin û xwe avêtin dextê çîyayên xwe. Çîyayên wan, wan di hêlînê xwe de kir qetel û bi firê xist. Dûv re qetel ji çîyaya peyabûn û hatin.

---

– “Belê, ma ji bo çî tûtûkê nedim bi bûkê.”

Serçe bûk da bi tûtûkê, got pîr û firiya, çû xwe li ser tahtekê danî. Tûtûka xwe ji bin basikê xwe derxist û pif kirê, pif kirê lê ti deng ji bilûra wî derneket. Serçe li wê mêze kir ku tûtûka wî bi kêrî wî nayê. Serçe xwe bi xwe got: “Ka ev tûtûk ji çî re dibe?” Rabû rahişt tûtûka xwe li ser tahtê li erdê xist, hûr hûrî kir û çû. Serçeyê min û we **bûk dabû bi tûtûkê û ew jî li ser tahtê li erdê xistibû; wê hûrik hûrikî kiribû.**

Rahmet li dê û bavê guhdara, ji xeyni yê tahsîldar û muxtara.

<sup>26</sup> Şekirên gilover û hundirê wan qul e, spî û pembe ne. Li vê herêmê “hamidhilo” wekî îdyom tê bikaranîn, bi manaye ku ew tişt pîr tê talebkirin, xwestin.

Simirmir çawa ku wek başoke diket nava kullî û guncûrê wî di erdê dida, wan jî, wek berika<sup>27</sup> bûbe dame, bi guncûrê leş-kerê dewlata hov girtin û wan serapeng di axpînga<sup>28</sup> welatê xwe dan!

**J.B:** Gelo tu motîfên folklorî û himayên zargotinê di nava nivîsên xwe yên modern da bi kar tîni?

**S.Û:** Erê, ez pir bi kar tînim.

**J.B:** Pêwîstiyên herî giring ji bo komkirina çanda devkî û avakirina arşîvên çanda devkî çi ne?

**S.Û:** Fîmansman û organîzasyon.

**J.B:** Problemên herî mezin çi ne?

**S.Û:** Fîmansman.

**J.B:** Fikrên te ji bo çareserîya van probleman çi ne? Pêşniyazên te hene?

**S.Û:** Ji ber ku kesek xebatên folklorê fînanse nake û bîrbirina karê folklorê kême, wekî ku gava din min li jorê jî gotibû ku folklorê kurmancî wijdanê vê dinyayê ye, dê hilê, tune bibe. Li ber dikevim. Rewşa Kurdistanê li holê ye, bi hezaran nakokîyên mêtîngehan di xwe da dihewîne. Û roj bi roj folklorê kurmancî têk diçe. Li Kurdistanê 10 15 salên din kesên ku ji mirovan ra qala folklorê bike dê nemîne. Jixwe nexweşîya *Covid-19*an kal û pîran bêhtir diêşîne. Folklorê kurmancî folkloreka weha ye ku ev folklor di destê polonîyan da bûya dê polonî li dinyayê bibûya paytexta çandê. Cihê ku van tiştan ji we ra dinivîsîm bi çend kîlometreyan ji min wê da, gorên pêxemberan hene. Li Kurdistanê şopên Hz. Îbrahîm heta Hz. Eyûb komek pêxember û komek filozofên mîna Ehmedê Xanî heta Şihabedînê Suhrewerdî hene. Genim li vir hatîye kedîkirin. Nirxên herî azad li vir hatine

---

<sup>27</sup> Berik: Kevirên ku mirov pê listika damayê dileyîze.

<sup>28</sup> Axpîng: toz û dûman.

damezirandin. Xezeba Mongolan li van deran bûye. Jin li vir çûye ber perê ezman jî û ketîye bin heft tebeqeyên binê erdê jî. Mirov binê kîjan peyvê dikole yan jî li kîjan motîf û rengê dipirse dîrokek ecêp an jî tiştêkî pîroz derdikeve. Ji ber wê, jî folklorê kurmançî ne malê kurdan têne ye. Malê dinyayê tevan e û divê دنیا giş weke kurdî zimanê wan be û folklorê kurdî jî folklorê wan be lê xwedî derkevin. Îcar pêşnîyazên min ên makro ev in, divê di Cemîyeta Dewletên Yekbûyî û Unescoyê da çand û folklorê kurdî weke mîrasa dinyayê gişî bê qebûlkirin û ji bo wê jî çî ji destê wan were bê kirin. Pêşnîyazên min ên mîkro jî ev in, divê finansmanekî pir baş bê tedarîkkirin. Li Amed an jî Mêrdînê, Wanê sazîyeka mezîna folklorê bê damezirandin û li hemberî bertekên dewletê bê parastin. Di bin banên wê da folklorîst bînin perwerdekirin. Kesên di perwerdehiyê da bi ser bikevin, di bin banên wê sazîya folklorê da bînin îstihdamkirin. Ji wan koman ra alavên weke erebe, komputer, kamera, drone, dengir û hwd bînin tedarîkkirin. Divê tekez bi qasî zilaman jin hebin. Jin di nava kurdan da nîşana bawerîyê ye û dema ku jinek bi mirovî ra be kurd giş derîyê xwe ji morivî ra vedikin. Ji ber wê jî divê tekez bi qasî zilaman jin jî li wê sazîyê bînin îstihdamkirin. Jinên kurdan ên kalepîr hin tiştên xwe ji zilaman ra nabêjin, ji ber wê jî divê hevalên jin bi wan pîran ra bipeyivin. Ku pere hebe ev tişt giş tînin kirin. Ez nikarim sazîyeka weha, bi rê ve bibim lê kesên ku bi rê ve bibin hene û pir in.

**J.B:** Cih û rola jinan ji bo parastin û komkirina folklorê kurdî çawa dibînin?

**S.Û:** Çand û folklorê kurdan ji terf jinan bêhtir hatîye parastin. Dîya min komek deqên wê hene, û ew deq wateya wan gelek jî nîzane. Lê bêhtir sembolen rojê ne. Motîfên bereketê ne. Ji bo Xweda bêhtir lawan bide wê, wê ew deq bi şîr û kil û derzîyê li canê xwe çêkirîye. Wekî ku min gava din jî got, jin bêhtir xwe ji jinan ra vedikin û ji ber wê jî hin warên folklorê kurdî hene ku hew jî folklorîst kare wan bide hev du. Tiştê ku ez zanîm tona dengên jinên kurd, pir ruhanî ye. Û gelek tişt li cem wan veşartîne.

**J.B:** Di berhemên folklorî da kîjan motîfên jinê û lehengên jin zêde bala te dikişînin an jî îlhamê didin te û li ser karê te bi tesîr in? Tu dikarî nimûneyan bidî û taybetmendîyên wan îzah bikî?

**S.Û:** Hz Meryem herçiqas wekî hêmayeka olî xuya bike jî îro di nava folklorê kurdî da bûye motîfeka folklorîk. Di nava folklorê kurdî da ji sersalê ra dibêjin Meyremok. Sersala kurdan piştî ya mîladî bi 13 rojan e. Yanê 13ê meha kanûna paşîn Meyremok e. Ji bilî wê Xwedawend Kesûma pir tesîrê li min dike. Nizanim Xwedawendeka çawa bû. Îroj hew navê wê maye lê di derheqê wê da min tiştek peyda nekir. Kesûma di romana min a nû da dê serlehenga min be. Kurdan berê navê Kesûma pir li keçê xwe dikirin lê van salan zêde li vî navî rast nayêm. Di folklorê kurdî da pîrebok pir in. Sêhirbaz in. Navê wan zêde tune, hew ji wan ra dibêjin pîrebok. Kêzhatûnê heye, “Kêzê, kêzê kêzhatûnê, xwedîya şimika req reqûnê tu van deran?” Kêzhatûnê bi mişkekî ra dizewice, “Mişko, mişko mişkela, diranqîço guhbela.” Jinên kurd di folklorê da hêmaya erotîzmê ye jî. Heta stranên dîlan û govendan giş erotîzm e. Di van stranên da, her derê jinê dişibînin fêkîyekî ya jî xwarinekê. Lêvên jinê hingiv in, pêşîrên wê sêv in. Ku jin tilîya xwe têxe çayê jixwe dê çay şêrîn bibe û meriv ne hewce ye ku şekir biavêje çaya xwe. Di stranekê da, çîyayê Mêrdînê dişibînin pêşîrên jinê û keleha mêrdînê jî dişibînin qupika pêşîrên jinê. Ji jina hurr lehengên wekî Dewrêşê Evdî çêdibin. Dîya Dewrêşê Evdî dikare berazan şer jê bike. Di mesnewîya Mem û Zînê da lehengên wekî Sitî û Zînê lehengên balkêş in. Bi taybetî jî herçiqas Zînê jineka hêstîyar be, Sitî jî jineka ewqas rasyonel e. Varyantek Leyla û Mecnûnê heye. Di vê varyantê da tiştekî pir stratejîk heye: “Morîka xewê.” Ev varyant weha ye: Leyl û Mecnûn, li koçerîyê dilê wan dikeve hevûdin. Mecnûn dihere ber gola Resûleynê û Leylê jî bi kûzê xwe tê ser golê ku ji mêvanên bin konê bavê xwe ra avê bibe. Mecnûn dil dike ku Leylê rawestîne, lê Leylê ji Mecnûn ra dibê: “Hema sebir bike ez kûzê xwe tijî av bikim û bibim ji konê mala bavê xwe ra. Mêvan li benda avê ne. Ez ê kûzî deynim bin konî û di nig da vegerim cem te. Jixwe malbata mi hazirîya xwe kirine ku koç bikin zozanan. Dê herin zozanan û ez ê jî li germîyanan<sup>29</sup> li cem te bimînim.” Mecnûn nema dikare bê wê bisekine. Leylê dil dike ku kûzî bibe bin konî, lê Mecnûn dev ji wê bernade. Leylê jî morîka xewê ji nav taximê pêşîrê xwe derdixe û ji Mecnûnê ra dibê: “Ez ê vê morîkê tê xim guhê te û tê di xew ra herî. Heta ez herim û werim tu bi xwe dernaxî.” Leylê morîka xewê dixwe guhê Mecnûnê û Mecnûn di cihê xwe da, di xew ra dihere. Leylê berî dide konê mala bavê xwe. Gava digihîje wê derê, dinere ku malbata wê kon dane hevûdin û avêtine ser piştê deveyê ku bi rê kevin, herin

<sup>29</sup> Germîyan: Warê ku koçer zivistanê tînin konê xwe lê vedigirin. Warên germ.

zozanan. Malbata Leylê, wê davên ser pişta deveyekê û bi rê dikevin. Leylê diçe zozanan û Mecnûnê min û we jî dimîne li germîyanan. Mala bavê Leylê, biharan xwe diçêrînin û pîştî şeş meha konê xwe ji zozanan radikîn û tînin, li Germîyana vedidin. Leylêya ku morîka xewê xistibû guhê Mecnûnî û çûbû zozanan, çawa ku ji zozanan vedigere, li bayê bezê, radihêje kûzê xwe û berî dide ser gola Resûleynê. Tê li ser serê Mecnûnî disekine, li wî dinere ku hîn jî xirînîya Mecnûnî ye. Hêla ku Mecnûn li ser raketîye rizîyaye. Leylê morîka xewê ji guhê wî derdixe. Mecnûn şîyar dibe û ji Leylê dipirse:

“Ma mêvanê mala bavê te neçûn?”

Leylê ji Mecnûnî ra dibê:

“Mecnûnê rîkurisî  
gîya di nava rîya te da bû rêşî  
Koçer çûn koçerîyê  
yemilka dûvê xwe gerandin  
tu hîn li mêvanê mala bavê mi dipirsî?”

Mecnûn li Leylê vedigerîne:

“Leylê, gola Resûleynê wek şet e  
Jê difirin qaz û bet e  
Wextê çavê mi li ê te ket  
mi go qey ew gav û ew saet e”

Miradê Leylê û Mecnûnî bi hev nabe. Her yek dibe stêrkek û hildifire esmên. Li esmên yek diçe şerqê yek jî diçe mişextê. Ango yek diçe germîyanan yek jî diçe zozanan. Leylê û Mecnûn her sal, carekê serê biharê û carekê jî serê payîzê bi hev ra dixuricin. Wextê ku stêrka Leylê û Mecnûnî bi hev ra dixuricin nabe qismetê her kesî ku pê bihise. Wextê payîzê bi hev ra dixuricin dinyayê dikin toz û dûman û nahêlin kes wan bibîne. Wextê ku biharê bi hev ra dixuricin dinyayê dikin ewr û baran û cardin nahêlin tu kes bi wan bihise. Carna jî eşq li serê wan dixê û ji bîr dikin ku xwe bi icac<sup>30</sup> û ewran binixumînin û bi hev ra dixuricin. Stêrka Leylê û

---

<sup>30</sup> Icac: toz û dûman.

Mecnûnî sê caran li hev dikevin û agir ji ber wan dihere. Wextê ku Leylê û Mecnûn bi hev ra bixuricin kî çav li wan bikeve, çî ji Xwedayê xwe bixwaze, Xwedayê wan dide wan. Piştî bi hev ra dixuricin, her stêrkek dihere alîyekî esmên û heta şeş mehên din nema dikarin bi hev ra bixuricin.

**J.B:** Kîjan dengbêjên jin an jî jinên kurd ku girêdayî çand û zimanê xwe ne û ew parastine, bandoran wan li ser te heye? Eger hebe tu dikarî bibêjî çawa bandor li te kirine? Ji kerema xwe ra nimûneyan bide û taybetmendiyên wan îzah bike?

**S.Û:** Jinên weke Eyşeşan li ber dilê min delalî ne. Eyşeşan ne bi tenê bi dengbêjiya xwe, bi serhildêriya xwe jî jineka hêja ye. Di zemanekî ku dengbêjiya jinan weke qebhetekê dihat dîtîn ew rabû û strî. Lê esil kêfa min ji dengbêjên jin ên Colemêrgê û Cizîra Botan ra tê. Weke ku di vîdeoyê<sup>31</sup> da jî xuya dike, dengbêjên jin ne tenê bi stranên xwe, herweha bi kofî û gulik, hûçik û govendên xwe jî fenomenên hurr ên kurd in. Dengbêjiya xwezayî (naturel) xweştir e, ne li sahneyan, di nava dar û daristanan da û li serê çiyayan xweştir e. Ev dîmen û stran hevûdin temam dîkin. Kêfa min herî pir ji kofiyên serê dengbêjên Colemêrgê û Cizîra Botanê ra tê. Kofiyên serê dengbêjên jin bermayiyên tacê serê Xwendawenda ne. Ji bo danberhevdanekê ji kerema xwe ra li vîdeoyê<sup>32</sup> binêrin. Di vîdeoyê da jî dengbêjên jin li sahneyê distrên. Tu lê binêrî tê jî bibînî ku dengbêjiya jinan a li sahneyan çiqas ji ya naturel kêmtir e.

**J.B:** Nirxên çanda devkî û rewşa jinan ku behsa çandê dike û wê pêşkêş dike çawa dibînî? Gelo tu pewîstî bi rexnekirinê yan guhartinê heye? Îzah bike û nimûneyan bide?

**S.Û:** Min pîrsa te baş fam nekir lê dikarim vêya bibêjim ku di çîrokên folklara kurmancî da pîr û pîrebok hene. Lehengên negatîf in. Xirabiyê dîkin. Esil jinên zana ne lê nizanim di çîrokên folklorîk da ew pîr û pîrebok tîr reşkirin. Di çîroka “Dîko”yî da pîreka dudîran heye, ji ber ku Dîko diçe hebek dahnê wê dixwe, pîra dudîran diçe çavê Dîkoyî derdixe. Di çîroka “Çima Çima”yê da pîrê, cinan dixapîne. Di çîroka “Eynter”î da jina xerîb xayîn e.

<sup>31</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=xNk5rszE-44>

<sup>32</sup> [https://www.youtube.com/watch?v=i1eyntF\\_6p8](https://www.youtube.com/watch?v=i1eyntF_6p8)



# Surya Humane de roportaj

Surya Human was born in the village of Qumrike in Lice. She moved to Diyarbakir in 1994 when her village was burned down. She finished high school in Diyarbakir and in 2011 she took up her studies in Agirî (Ağrı). She studied in the department of Turkish Language and Literature and graduated in 2015 and then worked as a Turkish language teacher. She learned the Kurdish Kurmanjî dialect in Kurdi-der in Diyarbakir. In 2019, she prepared her own research project on Zazaki folklore in the non-thesis MA programme at Mardin Artuklu University. Since 2015 she has been collecting materials on Zazaki folklore as an amateur folklore collector, and her folklore collection has been published in many Kurdish language journals, such as Folklor Kurdan, Folklor Me, Vate journal, Folklor û Ziman and Kovara Ewro.

Surya Human, dewa Qurmike ya Licê de ameya dinya. 1994'î de badê vêşayîşê dewan ameya Dîyarbekir. Mektebo verên, mîyanên û lîse Dîyarbekir de wanena. Dima 2011'î de Agirî de dest bi wendişê unîversîte kerda. Uca de beşê Ziwan û Edebîyatê Tirkî wenena û 2015'î unîversîte ra mezun bena. Tehsîlê unîversîte ra dima 2015'î de Kurdî-Derê Dîyarbekirî de dest bi musayîşê Kurdkîya kurmancî bena. Bi no hawa kurmancî musena. Heta asta mamostetî qedênena. Mabenê 2016 û 2018'î de mamostetî ya Tirkî kena, 2019'î ra nat Weqfa Mezopotamyaye de û Weşanxaneyê Weqfa Mezopotamyaye de sey mudirîya beşê karanê îdarî xebatêna. Serra 2019'î de Unîversîteya Artuklu de dest bi lîsanso berz yê bêtez kena û babetê folklorî ser o projeya xo yê bi kirmanckî/zazakî hedre kena. 2015'î ra nat sey amatorê kirmanckî/zazakî ser o malzemeyê folklorîkan arê dana. Arêdayîşê û nuştayîşê aye kovara Folklor Kurdan, kovara Folklorame, kovara Vate, kovara Folklor û Ziman û kovara Ewro de weşanîyayî.

**Esat Şanlı:** Keremê xo ra name û peynameyê xo vacê û tayê xo bidê naskerdene (şîma ça/kotî ra yê, çend serre yê, çi karî kenê?)

**Surya Human:** Nameyê mi Surya peynamê mi Human o. Ez qezaya Licê ke girêdayê Dîyarbekirî ra ya. Nameyê dewa mi Qurmike ya. Keye ma vîşayîşê dewan de ame Dîyarbekir. 1994î ra nat ma Dîyarbekir de cuwîyenê. Ez hîris û yew serre ya. Lîsansê mi Ziwan û Edebîyatê Tirkî serî yo. Mi 2015î de universîte qedêna. Mi 2019 in de zî Zazakî/Kirmanckî sero mastero bêtez qedêna. Ez nika Weqfa Mezopotamyaye de sey îdarekerdoxe û verpersê weşanxaneyî xebetêna. Xora Weqfa ma zi standardîzekerdişê ziwan û arşîvkerdişê folklorê sero xebetêna.

**E.Ş:** Şima tradîsyonê fekkîyî ser o xebetîyayî. Şima eşkenê tayê qalê destpêka xebata xo bikerê, senî dest pêkerde û dima senî aver şîye?

**S.H:** Seke mi cor de zî qal kerd. Mi beşa Ziwan û Edebîyatê Tirkî wend. Wexta mi nê beşî wendêni o wext mamosteyî seba dursa edebîyatê şarî sipartekî dênî ma. Ma şîni qezeyan û şaristanê ke nîzdê ma bî, înan de arêdayîş kerdêni. Tabî no arêdayîşê ma bi zimanê tirkî bîni. Zaferî dewî ke eslê xo de tirkê ma înan ra malzemeyê folklorîkî arêdêni. Raya ewilî mi koyê Agirî yo gird û qijî sero efsaneyêke arê dabi. No efsaneke mi arê da, ê ke mi rê qal kerdêni merdimêko 115 serre bi. Wexta mi ey gostarî kerdêni ez zaf kêfweş bîni. Ey maben de mi rê qalê verî zî kerdêni. O wext edebîyatê şarî û folklorê şarî bala mi ante. Dima ra deşîfrasyonê çiyêke ma arêdayêne înan kerdêni. Wextê deşîfrasyonê hîna şênayîn bî. Karêko zaf tîztîz û biqîmet bi. Merdim wexta çeku bi çekû herf bi herf înan derbasê nuştayî keno o wext giranîyê xezîneyê folklorî fam keno. O wext mi biryarê xo da û mi dest kerde nê karî. Qedênayîşê unîversîte dima ez ameya Dîyarbekir mi kurdî-der de dest bi musayîşê dîyalektê kurmanckî kerde. Mi heta astê mamostetî qedêna. Seba asta mamoste mi ganî monografîya dewa xo hedre bikerdêni. Mi dest bi monografîya dewa xo kerd. Tay çî yê folklorîkî zî qeyd kerdê. La rewşa sîyasî ya 2016î ver ez nê resaya amancê xo. La reyna mi fek te ra veranêda. Ez sey amatorî ge-ge zaferî dewa xo ra pîlanê xo ra çîyanê muhîman gêna binê qaydî. Deşîfrasyonê înan kena. Verê darbeya 2016î mi nuştayê ke deşîfrasyonê înan kerdibi erşawitê kovara Folklorî Kurdan. Nê nuştayê werdê dewa ma kayî, dûê usn. bî. Yew arşîvêke min o qij virazîyo. Ez nika nê arşîvê xo ra arêdayîşê ke mi deşîfrayonê înan kerdê ez ge-ge erşawena kovara Folklorî Me û kovara Vateyê. Ez tena Zazakî/Kirmanckî arêdayîş kena. Mi seba mastirê xo yo bêtez zî erşîvê xo ra îstîfade kerd.

**E.Ş:** Çira folklorê Kurdî (bitaybetî yê Zazakî) bala şima anceno?

**S.H:** Bi taybet seba Zazakî/Kirmanckî yew xasasîyetê mi esto. Keye ma keyêko polîtîk o. Ma domanîyê xo ra mîyanê rewşêka polîtîke de bîyê pîlî. Keyê ma hetê sîyasîye ra xeylek darbe werd. Coka wexta mesela bêro ziwanî ser kurdîtî ser ez, keyê mi zaf xasas tê gêreno. Hetê bala ra çîyêko tewr muhîm zî seke ti zî zanê bakur de Zazakî/Kirmanckî dîyalekta tewr dezavantajina. Seba ke hem binê bandorê tirkî de menda hem zî binê bandorê dîyalektê kurmancî de menda. Roj bi roj qiseykerdoxê Zazakî/Kirmanckî kêmi benê. Sewbîna rewşa sîyasî ver Kurdê mayê Zazayî/Kirmanckî ê ke polîtîkî seke vajê ma Zazayê/Kirmancê kurdîtî ra vejênê benê mîletê ka bîni Zazakî/Kirmanckî qal nêkenê, fedî kenê kurmancî musenê. Zaferî bakur de ti vanî qey tena merdim bi kurmancî qisekerdişî beno kurd. Nê sebebana ra xususen zî bakurê kurdistanî de serdestîyê kurmancî virazîya ya. Qiseykerdoxê Zazakî/Kirmanckî roj bi roj kêmi benê. No zî mi dejneno. Domanî ya mi ra bigîre heta nika. Coka mi verê xo da Zazakî coka Zazakî/Kirmanckî bala mi ancena. Ez nêwazena mabenê dîyalektanê kurdî de serdestîyê yew dîyalekte virazîyo. Ez wexta Zazakî/Kirmanckî qal kena ez xo hîna kurd hîs kena.

**E.Ş:** Şima key dest bi xebate kerde?

**S.H:** Mi wexta unîversîte wendêni dest bi arêdayîşê malzemeyê folklorîkî kerdibî. La bi ziwanê xo de yanî Zazakî/Kirmanckî de 2015î de dest xebata arêdayîşî kerde.

**E.Ş:** Şima ça/kotî û kamcîn mintiqeyan de motîfê edebîyatê fekkîyî arê dayî?

**S.H:** Mi seri de dewa xo de, nameyê dewa mi zî Qurmike ya, ge-ge zî qezeyanî bîna sey hêni û pasur de dewê ke Zazayî înan ra motîfê edebîyatê fekkîyî arê dayî. La zaf tayê.

**E.Ş:** Şima xebata xo ya folklorîke bi çi awayî fînanse kerde?

**S.H:** Ez bi îmakanê xo fînanse kena. Xora zaferî zî hetî fînasî ra merdim astengî anceno. Seba xebatanê bi rêk u pêk ganî merdim hetê aborî ra bêro destekkerdiş.

Wexta merdim mintiqa bi mintiqa bi gêro arêdayîş bikero ganî erebêyke ey ya xususî bibo. Materyalê qeydkerdişî yê profesyonelî bibê. Naxun (yoksa) merdim zaf aver nêşino, no kar tena beno sey hobî. Seba ke finansêr çin o tewr malzemeyî folklorîk yê muhîmî vinî benê. Çimkî ma erey manenê seba qeydkerdişî û arşivekrdişî. Seba ke finansê nê karî çin o xezênêyî ma kurdan vinî benê.

**E.Ş:** Kovare/organîzasyon/keyepelê înternetî yê ke kultur û folklorê Kurdî (bitaybetî yê Zazakî) yê ke şima înan dir pîya xebetênê estê, yan zî têkilîyêka şima înan dir esta?

**S.H:** Kovara Folklorê Me, xora na kovare zî Weqfa ke ez tede xebetêna vejena, kovara Vateyê têkilîyê mi esta.

**E.Ş:** Tradîsyono fekkî seba şima yeno çî mana? Şima ey senî pênase kenê?

**S.H:** Ez seba ma kurdan fikîrîyena, mi gore tradîsyono fekkî xezîneyêka dewlemenda. Ez ey sey nasnameya mîletêke pênase kena. Ê ganî na xazîne bêro pawitene seba pawitîşî zî ganî na xezîne bêro qeydkerdene. Ez ey sey nasnameya mîletêke pênase kena.

**E.Ş:** Bi şima kamcîn term seba xebatanê winasîyan hîna raşt o; tradîsyono fekkî, edebîyato fekkî yan folklor? Şima kamcîn şuxulnenê? Eke şima yewna term şuxulnenê keremê xo ra binûsê.

**S.H:** Ez seba xebatanê winasîyan edebîyato fekkî yan zî folklorî şuxulnena.

**E.Ş:** Gama şima folklor arê danê bala şima hîna zaf çiyî ser o ya?

**S.H:** Ez wexta arêdayîş kena hîna zaf çekuyî ke mi qet nêşanawitê bala mi ancenê. Zaferî zî qiseykerdişê înan yo xozayî bala mi anceno. Ê wexta pîlî ma qala çiyêko folklorîk bikerê seke reyna şinê ey wextanê xo yê verinan û kêfweş benê û xo biqîmet hîs kenê nê çî bala mi ancenê.

**E.Ş:** Kamcîn tewirê tradîsyonê fekkîyî hîna zaf bala şîma ancenê? Nimûneyan bidê.

**S.H:** Mîtî (kozmogonî mîtlerî), la mi hema yew nimune peyda nêkerde, efsaneyî, destanî, sanikî, vateyê verênan, îdyomî, liqmatikî (Lakap), hekîmîyê şarî, citkarîye usn. Xususen hema bala mi ancenê.

**E.Ş:** Eceba/Tirêm arêdayîş de şîma versiyonanê orjînalî yê nêorjînalî ra cîya kenê?

**S.H:** Çi heyf ke ez hema nêameya na merhale.

**E.Ş:** Şîma qe berhemêko nêorjînal arşîvê xo ra red kerd û vet?

**S.H:** Ez rasta nê çî nêameya hema.

**E.Ş:** Bi ya şîma tesîrê deyîr/kilam/deyîş û terzê cuya vatoxanê nînan tradîsyonê nûstekî/modernî ser o esto?

**S.H:** Esto. Deyîr/kilam/deyîşan de hîssî tewir tewir estê. Heskerdiş, berîkerdiş (ozlem), vîrameyîş, dej ûsn. Wexta vatoxî deyîrê ke vajê gorê rewşa cuyê xo vanê. Şînan û şahîyan de şeran de deyîrî ke ameyê tesîrî ci tradîsyonê nûstekî/modernî ser o estê.

**E.Ş:** Tirêm ê tekstê ke şîma arê dayê seba cuya şîma hetkariya înan qe virazîyena? Yanî çarçîwaya exlaqîye de paştî danê şîma? Mesela gama cuya şîma de çîyêko taybet (xusûsî) biqewimîyo ê xebatê şîma kewenê şîma vîrî yan zî şîma înan anê xo vîrî? Nimûneyan bidê.

**S.H:** Hetkarîya tewr pîle merdim derheqê kulturî xo de ê baw û kalnê xo beno wayîrî malumatê ke. Zengînîyê zîwanî vejêna werte. Mabenê cuyayîşê nîfşan de yanî ma û pîlanê ma de cîyabîyayîşê ke dîyar beno. Xususen arêdayîşê mi ê ke hekîmîyê şarê ser o ya kewena mi vîr. Nimûne wexta bebikê gijêkek goşan bigro merdim eşkeno senîn mudaxale bikero. Yan zî wexta zerrê cî bidejo çî cirê baş yeno ûsn.

**E.Ş:** Şima berhemê tradîsyonê fekkîyî arê dayî (danê). Şima eşkenê na yewe tayê îzeh bikerê yanî şima bi çi hawayî na xebate kerde (kenê)? Metodê şima çi yê?

**S.H:** Ez ewilî mintiqaya ke ez bieşkî tede arêdayîş bikerî dîyar kena. Dima ra kesê ke bieşkê mi rê nê mintiqan de hetkarî bikerî înan tespît kena. Xora ez zaferî dewa xo ra arê dana zaf problem nêvejêno. La wexta mi unîversîte de kerdêni xususen ê ke bi eşkê mi rî hetkarî bikerî zaf muhîmî bî. Mintiqaya ke merdim tede arêdayîş bikero bi hêsanî ganî yewêko nas bibo. Wexta ez dewa xo de arêdayîş kena ez çend kesan ana têhet. Qiseykerdişêko xozayî dana destpêkerdiş. Wexta merdimî qal kenê o wexta ez persanê xo hêdî hêdî kena. Xora wexta qalê verî bibo ey werbînan de kewnê hemberî (reqabet). Bi no hawa arêdayîş rehet beno. Seba ke ma werbînan nas kenê no zî seba qalkerdişî de beno yew referansêke.

**E.Ş:** Tirê mî şima merdim, kurs, zanîngeh yan zî sazîyêk ra nê warî de perwerde girewto? Kamca? Senî?

**S.H:** Belê. Mi raya ewilî unîversîte ra girewt. Kitabê Ozkul Çobanoglu (Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş) zî kitabê ma yê derse bi. Mi wexta kurdî-der de sey kursî perwerde dî. Dima mi mastiro bêtez de zî perwerde dî.

**E.Ş:** Tirê mî rayîrê/metodê arêdayîşê folklorî yê şima yê nikayênî yê verênan ra bîyê cîya? Senî?

**S.H:** Nê! Metodoke ez xebe tnena karê mi vînenê (îşîmî goruyor). Seke mi vat ez nika arêdayîşanê xo sey amatorî kena. Heta nika zî mi yew astengîyêke nêdî coka eynî metodî ra ez dewam kena.

**E.Ş:** Arşîv seba şima yeno çi mana?

**S.H:** Arşîv hafizayo, vîr o, hiş û îstîqbalî şarî yo. Xususen zî ma kurdan rê no arşîv zaf muhîm o. Ê ganî seba pêşerojê domananê ma bêro pawitene.

**E.Ş:** Tirê m arşîvê şîma esto? Arşîvêko senên o? Ma vacê nûşteyê destî, bandê teypî, kitab, dijîtal (komputer) yan zî keyepelê înternetî, keremê xo ra nimûne bidê.

**S.H:** Arşîvêke min yo qij esto. Vengê ke mi deşîfrasyonê înan kerdê û erşawitê kovaran û qeydê veng, fotoxrafî, cayêke mi tede arêdayîş kerdo na me înan ê kesan ûsn. estê.

**E.Ş:** Arşîvê şîma senî yeno namkerdene (yanî nameyê qeydan/rekordan, dosyeyan, ûsn.). Tirê m sîstemêke şîma yê tesnîfkerdişê xebatanê şîma esto?

**S.H:** Her yew gore kategorîyê xo ameyo namekerdiş. Nê, mixabin seba tasnîfî mi hema çîyêke nêkerdo.

**E.Ş:** Tirê m şîma qe xebatê xo yê folklorîkî sîstemê dijîtalî (komputerî) de zî qeyd kerdê yan zî xebatê ke şîma înternetî ser o pare kerdê estê?

**S.H:** Mi arêdayîşê xo yê ewilî taykene vinî kerdê. La nika heme arêdayîşanê xo komputerî ser qeyd kena.

**E.Ş:** Tirê m şîma arşîvê xo sey “arêdayîşê ercanê/qîmetanê madîyan” yan nê ra zîyadêr sey “arêdayîşê ercanê nêmadîyan” yanî sey ercanê manewîyan vînenê?

**S.H:** Ez arşîvê xo sey arêdayîşê ercanê nêmadîyan vînena.

**E.Ş:** Tirê m şîma arşîvê xo bi rayîrêk muhafeze kenê/pawenê (mesela vindîbîyayîşî ra, tozî ra, polîsan ra, ûsn...)?

**S.H:** Ez hardîsk û komputer de muhafeze kena.

**E.Ş:** Tirê m sazî/organîzasyon/kovare/keyepelê înternetî ke şîma pîya şuxulênê xebatanê şîma arşîv kenê? Tirê m arşîvêke înan bi xo esto?

**S.H:** Ez nûşteyanê xo erşawena kovara Folklor Me û kovara Vate. Ey folklor Me arşîv benê. La ey vate ez nêzana.

**E.Ş:** Tirêm bi ya şîma kovare yan zî keyepelê înternetî zî eşkenê rolê arşîvî kay bikerê?

**S.H:** Miheqeq. Xora no dewir de hendî heme çî dijîtalîze bî. Seba arşîvî zî gore mi înternete yew nîmetêke ya.

**E.Ş:** Tirêm çîyanê ke (berhemanê ke) şîma arê danê, şîma înan çap kenê yan zî weşanenê? Ça/kotî? Senî?

**S.H:** Mi bi xo çap nêkerdê. La kovarê ke mi înan rê nuştayî erşawitî sey matbu çap bî.

**E.Ş:** Şîma ra gore kamcîn metodê weşanayîşî/çapkerdişî seba tradîsyonê fekkî yê Kurdkî (bitaybetî seba Zazakî) tewr rind ê û çira?

**S.H:** Ez gorê nika fikirnenan, nika dewrê dijîtalî yo. Mi gore keyepelê înternetî ser o bêrê weşanyayene tewr baş o. Ganî bireso heme kesan. Seba pêşeroje û seba ke zaferî bêro vilabîyayîş. Xora no dewr sey dewranê verinan nîyo. Heme kes hendî bi telefonan ra çîyan wanenê û temaşe kenê.

**E.Ş:** Wextê weşanayîş/çapkerdişî de şîma berhemanê folklorîkan senî weçînenê? Muhîmîye danê çiyî ser?

**S.H:** Mi heta nika nuştê xo yew bi yew erşawitê kovaran. Wexta ez nuşte erşawena spotane dîyar kena. Mi gore heme muhîm î. Çêyoke mi arê dayo ez wazena arşîvanê kovaran da ca bigêro. Coka wextê erşawitişê nuştayan de ver destê mi de kamcî nuşte deşîfre bîyo ez ey erşawena.

**E.Ş:** Bi şîma amacê çapkerdiş/vilakerdişî çî yo?

**S.H:** Seba ke sey materyalê ver destênê merdiman de bibo yenê çapkerdiş.

**E.Ş:** Şîma wazenê versîyono çapkerde yê xebata şîma qey kamî bo, yanî kesê ke şîma wazenê berhemê şîma biresê înan kam ê, kamcîn dor ê?



**S.H:** Xora her karêke yew hedef kîtleya ci esta. Versîyono çapkerde yê xebata mi zî sere de Zazayê/Kirmancê û heme kurdan bo û xusesn zî ez wazena dewa mi bi kulturê xo arşivan de ca bigêro. Xebata mi zî folklorê kurdan ser o ya. Ê ke bizanistî karê folklorî ra alaqedar benê beno ke xebata mi seba înan biba referansêke, biba amancê cigêrayîşî.

**E.Ş:** Tirêma şima berhemanê folklorîkan yê çapkerdeyan rê vateyo verên yan zî şîrove nûşt?

**S.H:** Mi tena mastirê xo yo bêtezî de yew vateyo verên nuşte.

**E.Ş:** Goreyê şima înternet seba pawitişê edebîyatê fekkî yê Kurdkî (bitaybetî yê Zazakî) eşkeno rolêko senên kay bikero? Seba platformê înternetî ser o pawitiş û averberdişê ziwani pêşniyazî yan zî fikrê şima estê?

**S.H:** Sere de înternet bena arşivêka qeydkerdeyî, kewna verê vinîbîyayîşî û bi saya înternete bena vila. Bitaybet seba Zazakî/Kirmanckî sey yew sanal unîversîte keyepelêke bibo. Uca de heta nika Zazakî/Kirmanckî ser o çi malumatî estê ganî bêrê barkerdene sey kategorîk. Youtube ser o tay çî estê la qîm nêkenê ganî sey profesyonel no kar bêro kerdene.

**E.Ş:** Şima têkilîya mabêna edebîyatê fekkî û kulturê modernî senî vînenê?

**S.H:** Gorê mi bi saya edebîyatê fekkî bingehê kulturê modernî virazêno. Seba averşiyayîşêko modern gere ewilî edebîyatî fekkî ser o cigêrayîşêko baş bibo.

**E.Ş:** Goreyê şima îhtîyacîyê tewr pîlî yê arêdayîşê tradîsyonê fekkîyî û viraştişê arşivê tradîsyonê fekkîyî çi yê? Ê nê wareyî de problemê tewr pîlî çi yê?

**S.H:** Îhtîyacîyê tewr pîlî yê arêdayîşê tradîsyonê fekkîyî û viraştişê arşivê tradîsyonê fekkîyî kadroya ke zanist û ganî kadro wayîrî formasyone ke baş bibê. Ganî bizanê bi çi metod arêdayîş beno, senîn arşiv beno û merdim senîn vejêno saha. Mi wexta unîversîte de mastiro bêtez kerde o wext ruçikê nê kêmanîyan ra wendekaran de yew bingehêko baş nêvirazîya. Mamosteyêke derse dayîne metodê

arêdayîşî nêzanê, nêşkenê qal bikerê. Malumatê zaf kêmi. Wexta mi projeyê xo nuştêni hetê çimeyanê Zazakî ra mi zaf astengî ante. Termê folklorîkan sero yew çime çin o. Mi gore problemo tewr muhîm kemîya zanistan, materyalan, çimeyanê.

**E.Ş:** Fikrê şima seba halkerdişê nê probleman çi yo? Pêşnîyazîyê şima çi yê?

**S.H:** Xususen seba ma kurdan arêdayîşê tradîsyonê fekkî zaf muhîm o. Seba nasnameyêka neteweyî seba vizîrî ma, ewro ma û siba ma muhîm o. Coka ewilî karê arêdayîşî bi rêk û pêk û bi merdimanê zanistan bêro kerdiş. Nê warî de merdimê ke nê karî bikerê zaf kemîyî. Ganî merdimêke no ware de wayîrî potansîyelêke yê bêrê despîtkerdiş, bi kursan yan zî universîteyan de beşanê kurdolojî de bêrê perwerdekerdiş, bêrê fînansekerdiş ke bieşkê nê karî bi serêko rehet bikerê. Arêdayîşî ke benê bi ciddîyet bêrê qeydkerdiş û arşîvkerdiş. Kadroya ke zaniste nê arêdayîşan kategorîze/tasnîf bikero û bi goreyê metotanê modernan teorîyanê ke folklorî ser o yê înan bierjnê. Mukayese bikerê.

# Hevpeyvîna bi Xecê Petekkayayê ra

Xecê Petekkaya comes from Amed (Diyarbakir). She studied Turkish Language and Literature at Osmangazi University in Eskişehir. She teaches Zazaki and Research Methodology at Rojava University, the Kurdish Language Association and a few other centres. During her BA studies, she was inspired by the classes on folk literature and nationalism. In 2010 she returned to her grandmother's village and started collecting oral tradition there; mostly, she recorded folk stories recounted by her uncle and his wife. Her articles and collected texts have been published in the Newepel newspaper.

Xecê Petekkaya ji Amedê ye, li Zanîngeha Eskîşehîr Osmangazîyê lîsansa beşa wêje û zimanê Tirkî xwendîye. Ew li Zanîngeha Rojavayê<sup>1</sup>, Sazîya Zimanê Kurdî û li hin akademî û navendên zanistên civakî dersên zazakî û rêbazên lêkolînê dide. Dema xwendina lîsansê, dersên wêjeya gelêrî bala wê kişandine, naveroka hinek dersên wê li ser têkilîya netewebûn û folklorê bûne, û gelek tesîr lê kirine. Piştî wan dersan, di 2010an da, wê berê xwe daye gundê pîra xwe û dest bi berhevkarîyê kirîye. Bi taybetî, wê çîrokên gelêrî yê jinap û apê xwe qeyd kirine. Ew axêvera zimanê xwe (zazakî) bûye lê nikaribûye bi zimanê xwe bixwîne û binivîse, loma heta 2012 û 2013an da, wê çîrokên ku berhev kirine, nenivîsîne. Piştî ku li Merdînê, li Zanîngeha Artûklûyê, dest bi lîsansa bilind a beşa Ziman û Çanda Kurdî kirîye, wê çaxê ew çîrok nivîsîne. Çîrokên wê di rojnameya Newepelê da hatine weşandin.

**Joanna Bochenska:** Ji kerema xwe ra ji me ra behsa xwe bike. Nav û paşnavê te çi ye? Tu ji ku yî û çend salî yî? Tu çi karî dikî?

**Xecê Petekkaya:** Navê min Hacer (Xecê) Petekkaya ye, ez ji Amedê me û 34 salî me. Ez li Zanîngeha Rojavayê, Sazîya Zimanê Kurdî û hin akademî û navendên zanistên civakî da dersên zazakî û rêbazên lêkolînê didim.

<sup>1</sup> Li Rojavayê Kurdistanê, li bajarê Qamişloyê ye. Malpera wê jî ev e: <https://www.rojavauni.com/en/home/>

**J.B:** Tu li ser çanda dekvî dişûxulî. Dikarî piçekî behsa destpêka wê bikî?

- Çima folklorê kurdî bala te dikişîne?
- Te kînga dest bi vî karî kir?
- Tu bi kîjan rêxistin (sazî) û kovaran ra dixebitî? Herweha pêwendiyên te bi kîjanî ra hene?
- Tu karê xwe çawa finanse dikî?

**X.P:** Min lisansa xwe di Zanîngeha Eskîşehîr Osmangazîyê da li ser wêje û zimanê tirkî fikir. Dema xwendinê, dersa me ya wêjeya gelêrîya ya tirkî hebû ku di vê dersê da ji bo neteweyekê berhemên devkî çiqas bi nîrx in û ew nîşaneyên nasnameyê ne, weha hatin şirovekirin. Ez wek kurdeka zaza, ku li Bakurê Kurdistanê dijî, ji ber qedexebûna perwerdeya zimanê kurdî tenê axêvera zimanê dayika xwe bûm. Ji ber vê jî di dema betlaneya zanîngehê ya 2010an da çûm Amedê, gundê Aynalikoyu (Bistîn)<sup>2</sup> cem pîrika xwe. Min got ji bo ku bi taybetî çîrokên me yê gelêrî ku di zarokatîya me da ji alîyê pîrekên me ve ji me ra hatibûn gotin û me hinekên wan ji ber kiribû, lê êdî me ji bîr kiribûn, ji bo ev çîrok nayên jibîrkirin, min biryar da ku ez wan qeyd bikim. Lê ji ber nezanîbûna nivîsandina zazakî tenê min deng qeyd fikir. Di sala 2012 û 2013an da, dema ku min li Merdînê, li Zanîngeha Artûklûyê dest bi mastera beşa ziman û çanda kurdî kir, wê çaxê fêrî nivîsîna zazakî bûm. Hema çîrokên ku min ji sala 2010an vir ve kom kiribûn, min ew nivîsîn, û ji bo bîr weşandin ji rojnameya zazakî ya bi navê “Newepel”ê ra şandin. Mijûlbûna min a çanda kurdî di sala 2010an da, bi vî awayî dest pê kir. Aniha ez Kovara “Vate<sup>3</sup>” û “Folklorê me”yê dişopînim.

**J.B:** Kevneşopîya devkî ji bo te çî ye? Tu dikarî wê pênase bikî?

---

<sup>2</sup> Navê vê gundî bi tirkî “Aynali Koyu” bi zazakî jî “Bistîn” e. Ev gund girêdayî navçeya Amedê ya bi navê Çermûgê ve ye, û 10 km jê dûr e. Hemû şênîyên gundî kurdên zaza ne û zaravayê zazakî dipeyvin. Ji alîyê bawerîyê ve hemû misilmanên sunî ne. Li gundî, nêzîkî 500 mal hene. Du malbatên mezin hene ku yek ji wan ra “Keyayê Sofîyo (Malbata Sofîyo)” û “Keyayê Hecîyo (Malbata Hecîyo)” dibêjin.

<sup>3</sup> Kovara Vateyê, yekem kovar e ku tenê bi zazakî dest bi weşanê kirîye. Ev kovar di sala 1997an da dest bi weşanê kirîye. Di vê kovarê da nivîsên hem folklorîk (çîrokên gelêrî, stran, lîstok, gotinên pêşîyan hwd) hem modern (gotar, lêkolîn, çîrok, helbest) tî çapkirin, û heta aniha ew 72 hejmar hatîye çapkirin.

**X.P:** Eger em wekî têgeh kevneşopîyê bigirin dest, ew peyvekî hevdudanî ye ku ji du peyvan; kevn û şop pêk hatiye. Yanê tê wateya şopên, tiştên madî û manewîyên kevnar. Kevneşopî ev tiştên madî yan manewîyên ku çandê pênase dikin, ra tê gotin û kevneşopîyên devkî jî dikevin şaxa kevneşopîyên manewî ku ji çîrokên gelêrî, destan, efsane, gotinên pêşîyan, mamik û hwd pêk tê. Yanê ji keresteyên wêjeya gelêrî rê tê gotin.

**J.B:** Li gor te kîjan bêje, kevneşopîya devkî, zargotin, folklor, a herî di cih da ye? Tu kîjan bi kar tîni? Hebe bêjeyeka din?

**X.P:** Di nav van sê têgehên da, tegaha folklorê ya herî fireh e, zargotin û kevneşopîya devkî şaxekê folklorê ye. Li gor navlêkirinê, kevneşopîyên devkî û zargotin di heman wateyê da hatine bikaranîn. Li Rojavayê ji bo keresteyên wêjeya gelêrî têgeha zargotinê tê bikaranîn. Ez bi xwe têgehên “folklor” û “wêjeya gelêrî” bi kar tînim.

**J.B:** Dema tu keresteyên folklorê berhev dikî bala te bêhtir li ser çî ye yan jî kîjan cureyî ye?

**X.P:** Di keresteyên folklorê da tiştên ku herî zêde bala min dikişîne keresteyên wêjeya devkî/gelêrî ne, yanê çîrokên gelêrî, gotinên pêşîyan...

**J.B:** Kîjan cureyên çandê devkî bêhtir balate dikişînin? Tu dikarî nimûneyên wan bidî?

**X.P:** Li gor min dîroka gelên bindest ên ku dîroka wan zêdetir ji alîyê serdestan ve hatiye nivîsandin pêwîst e hin bi guman li çavkanîyên nivîskî binêrin û rastîyê di berhemên gelêrî da bigerin. Ji ber vê jî, çîrok, efsane û stranên gelêrî hin zêdetir rastîyê vedişêrin. Ji ber vê sedemê jî di cureyên gelêrî da herî zêde efsane, destan, çîrokên gelêrî û stranên gelêrî bala min dikişînin.

**J.B:** Gelo tu versiyonên orîjînal ji yê neorîjînal cuda dikî?

**X.P:** Ji bo keresteyên madî fam nakim û ev ji xwe pisporîyek dixwaze. Lê ji bo berhemên devkî ji ber taybetmendîya wan a herî giring di nav nifşan da bi devkî vediguhezîn, ji ber vê jî her versiyona ku tê gotin jî orîjînalbûyina xwe diparêze.

**J.B:** Gelo te qet berhemeka neorîjînal ji arşîva xwe derxist?

**X.P:** Na.

**J.B:** Gelo li gor te, tesîra çanda nivîskî û ya modern li ser gotin û tevgerên dengbêjan heye?

**X.P:** Bingeha hemû wêjeya modern a neteweyan li ser wêjeya devkî ava dibe. Mînak, “Mem û Zîn”a Ehmedê Xanê li ser destana “Memê Alan”î ava bûye, romana “Kilama Pepûk”ê ya Deniz Gundizî li ser serpêhatîyên komkujîya ermenîyan ava bûye.

**J.B:** Gelo ev tekstên ku te kom kirine, ji te ra û ji bo jîyana te dibin alîkar? Yanî di çarçoveya exlaqî da dibin piştgirî? Mesela tu wan bi bîr tînî gava ku tiştêkî taybet di jiyana te da diqewime?

**X.P:** Raste rast nebe jî, car caran dema ku nîqaş li ser ji xwezaya xwe ya derketina jinê û civakê nîqaşek tê kirin, di çîrokên gelêrî da lehengên jin an jî lehengên din, çawa bûne, çawa hatine pênasekirin, çawa şikestine di nav wan da hene yan jî nîne, mînak tîn dayin, Ji bo nimûne, di piranîya çîrokên gelêrî da jinên pîr wekî sêrbaz, cadû û xirab tîn pênasekirin, keçikên ciwan jî saf ên ku hema zû tîn xepandin, hatine pênasekirin.... Ev taybetîyên jinan ên ku di çîrokan da hatine dayin, ji nîşaneyên rola jinê ya civakê te.

**J.B:** Te behs kir ku tu keresteyên çanda devkî berhev dikî. Gelo tu dikarî behsa berhevkarîya xwe bikî? Tu vê yekê çawa dikî? Rê û rêbazên te çi ne?

**X.P:** Di komkirinê da, herî destpêkê bi bêjêran ra têkilîyek tê çêkirin, û sedem û armanca berhevkirinê ji wan ra tê şirovekirin.

- Ji bo qeydgirtina deng an jî vîdeoyan di destpêkê da ji bêjeran destûr tê xwestin, eger destûr bê dayîn, bi destûra wê/wî qeyd tê destpêkirin. Lê car caran hinek bêjer ji qeydê şerm dikin an jî wê guneh dibînin. Ji bo transkripsiyonek bi tenduristî, bi veşartî be jî dengê wê/wî tê qeydkirin, lê tu car bê destûra wê/wî dengê wan li ser cihekî naye parvekirin.
- Di dema gotinê da tu midaxele/destakarî naye kirin. Tiştên ku nehatibin famkirin, cihê ku tê qeydkirin û piştê ku gotina bêjer xelas bû, tê jê tê pirsîn.
- Ji bo tespîtkirina bandora bêjeran, li gor derfetan li eynî herêmê, lê ji cih, zayend û temenê cuda eynî berhem tê berhevkirin.

**J.B:** Gelo ji bo wê tu perwerde bûyî? Li ku derê? Ew perwerde çawa bû?

**X.P:** Raste rast min li ser berhevkarîyê kurseka taybet nedîtîye, lê wekî ku min li jor jî da dîyarkirin, min lîsansa xwe li ser ziman û wêjeya tirkî xwend, û di nava dersên me da, dersên wêjeya gelêrî hebûn û hinek mijarên li ser berhevkarîyê jî hebûn ku dihatin nîqaşkirin.

**J.B:** Gelo aniha rê û rêbazên te yên berhevkirinê li gor ên berê guherîne? Çawa?

**X.P:** Niha ez berhavkarîyê nakim, lê eger bikim tekez dê ne wekî ya berê be. Ji ber ku ya destpêkê tenê xoşewistî bû ku ne bi armancek zanistî min berhevkarî dikir, lê niha bi zanîna sedem, armanc û nirxên berhemê folklorîk û naskirina hin rê û rêbazên zanistî ew ê hin cudabûnan tê xe berhevkarîyê min.

**J.B:** Arşîv ji bo te tê çi maneyê?

**X.P:** Arşîv tê wateya komkirin, mayindekirin û veguhestina berheman di nav nifşan da.

**J.B:** Gelo arşîva te heye? Ew arşîv çawa ye (nivîskî, teyb, kitêb, dijîtal)? Kerem bike hemû nimûneyan bide?

**X.P:** Arşîva min a nivîskî û çapkirî heye. Çîrokên ku min di sala 2010an da kom kiribûn, piştî nivîsîna wan, di Rojnameya Newepelê da hatin çapkirin.

**J.B:** Gelo ew arşîv xwedî pergal? Tu arşîva xwe çawa bi nav dikî? Bi rêya dosyeyan, cureyên keresteyan, hwd?

**X.P:** Li ser komputerê, di nav dosyeyan da, li gor herêm, bajar, navçe, gund, kes, cureyê hatine senifandin.

**J.B:** Gelo te xebatên xwe yê folklorîk qet derbasî sîstema dijîtal (komputer) kirîye? Xebatên te yê ku te li ser înternetê parve kirîye, hene?

**X.P:** Min bi xwe nekirine lêbelê çîroka “Memê Alo”yî ya ku di rojnameyê da hatibû weşandin berê demekê min dît ku ev çîrok li ser malpera Newepelê ya Facebookê da hatîye parvekirin.

**J.B:** Gelo tu arşîveka wisa wekî “komkirina tiştan (şênber)” an bêhtir wekî “komkirina nîrxên ne madî (razber)” dibînî?

**X.P:** Wekî tiştên nîrxên manewî dibînim.

**J.B:** Gelo tu arşîva xwe diparêzî (mesela ji windabûnê, ji tozê, ji polîsan, hwd)?

**X.P:** Na.

**J.B:** Arşîva rexistin (sazî) û kovarên ku tu bi wan ra dixebitî heye? Ew karê te jî arşîv dikin?

**X.P:** Niha nîne, lê demekê bi Rojnameya Newepelê ra têkilîya min hebû, û berhemên gelêrîyên ku min kom dikirin û dinivîsîn, di vê rojnameyê da hatin çapkirin. Ez bawer im ku hemû arşîva çîrokên min ên ku di Rojnameyê Newepelê da hatine weşandin li cem wan hatine arşîvkirin.



**J.B:** Gelo bi ya te kovar an jî malpera înternetê dikare bi rola arşîvê bilîze?

**X.P:** Li gor min her kovar, pirtûk, rojnameyên çapkirî yan jî dijîtal dikare rola arşîvî bilîze.

**J.B:** Gelo keresteyên ku berhev dikî, tu wan çap dikî yan jî diweşînî? Li ku derê? Çawa?

**X.P:** Min berhemên ku kom kiribûn, di Rojnameya Newepelê da weşandin.

**J.B:** Li gor te kîjan metodên weşanê/çapkirinê ji bo çanda devkî ya kurdî yên herî baş in û çima?

**X.P:** Ne tenê ji bo zazakî ji bo hemû çandan pêwîstî bi hem weşanên çapkirî hem jî yên dijîtal heye, da ku bikaribe bi rehetî bigihîje her kesê/î, û mayînde bibe.

**J.B:** Tu ji bo weşanê/çapê berheman çawa hildibijêrî? Giringîyê didî çî?

**X.P:** Li gor min hemû berhemên gelêrî di nirxa çapkirinê da ne.

**J.B:** Tu ji bo çî berheman çap dikî? Armanca te ya çapkirin û belavkirinê çî ye?

**X.P:** Mayîndekirin û veguhestin.

**J.B:** Tevgerên weşanxane û cureyên weşanên kurdî (bi taybetî ji bo zazakî), li gor salên berê li hember berhemên çanda devkî guherîne?

**X.P:** Ji ber qedexeya li ser zimanê kurdî (ji bo zazakî jî) li Bakurê Kurdistanê, fêrbûn, xwendin û nivîsîna zazakî jî tunebû. Ji ber vê jî tenê ne mijûlbûna berhemên gelêrî/folklorî, herweha ya modern jî kêmbû, lê piştî 2010an, di hin zanîngehan da, beşên lîsans û lîsansa bilind ên zazakî hatin vekirin, ev jî kir ku zaza zimanê xwe ji alîyê nivîsîn û xwendinê ve jî fêr bibin, û li ser her cureyên zazakî (wêje û ziman) lêkolînan bikin. Piştî sala 2010an, komkirin û çapkirina berhemên gelêrî jî zêdetir bû, lê helbet mirov tu carî nikare bibêje, hemû keresteyên folklorê civakekê hatine komkirin.

**J.B:** Tu dixwazî versiyona çapkirî ji bo kê be?

**X.P:** Ji bo hemû kesan, lê bi taybetî ciwan û zarokên zaza û kurdên din.

**J.B:** Gelo tu ji bo berhemên çapkirî pêşgotin an şiroveyan dinivîsî? Çima û wan çawa diafirinî/dinivîsî?

**X.P:** Pêşgotin na, lê ji bo şirovekirina hin peyvên herêmî yan jî danasîna hin tiştan, min şewaza jêrnivîsê (dîpnot) bi kar anîye.

**J.B:** Gelo ji bilî çapê/weşanê tu/yan hevalên te bi rêyên cuda yên belavkirina çanda devkî digerin (mesela festîval, şano, pêşkêşên cuda û hwd)? Çi ne ew? Tu dikarî çend nûmene bidî?

**X.P:** Hevaleka min demekê li ser “Facebook”ê malperek çêkiribû û çîrokên gelêrî bi dengî dixwend. Ez aniha li Rojavayê, heftane di “Baxçeyê Xwendinê<sup>4</sup>” da, ji zarokan ra çîrokên gelêrî dixwînim.

**J.B:** Li gor te înternet ji bo parastina edebîyata devkî ya kurdî (bi taybetî ya zazakî) dikare roleka çawa bilîze? Ji bo li ser platforma înternetê, parastin û pêşvebirina zimên fikrên te çi ne? Pêşniyazên te hene?

**X.P:** Di roja me ya îro da, di rêbazên mayîndekirinê da şewaza dijîtalîzekirinê şewaza herî guncan e hem jî bo berhevkarên hem jî bo kesên eleqeder û xwendewanan. Projeyeka me ya amadekirina malpereka berhevkarîyê heye ku di vê malperê da her kesên ku bixwazin dikarin bi nivîskî, deng an jî videoyan berhemên folklorîk parve bikin û komîteyek jî tiştên tîndarîyê, wan li gor cih û cureyan bisenifîne.

**J.B:** Tu li ser têkilîya di navbera zargotin û çanda nûjen çi difikirî?

**X.P:** Çanda nûjen bingeha xwe ji zargotinê digire û berdewama wê ye, lê di salên dawî da, bi taybetî, bi bandora kapîtalîzmê di nava her du çandan da kendalek

---

<sup>4</sup> Ev bername, mixabin, ji ber koronayê çar hefte berdewam kir.

çêbûye, û çanda îro wekî çand neyê hesibandin jî her tiştên heyî nîşaneyên dema xwe ne. Ji ber vê jî çanda îro ji bo nîfşên bê danasîn in.

**J.B:** Tu kîjan motîfên folklorê kurdî di çand û edebîyata modern da peyda dikî/dibînî?

**X.P:** Şopên adet û teqalîdên kurdan di çand û edebîyata modern da hin tînan peyda kirin.

**J.B:** Pêwîstiyên herî girîng ji bo berhevkirina çanda devkî û avakirina arşîva çanda devkî çi ne? Problemên herî mezin çi ne?

**X.P:** Berhemên zargotinê bîgeh û nîşaneyên ziman, çand û dîroka gelan in. Herî zêde zargotin û şaxê wê ya wêjeya gelêrî nasnameya netewebûna civakê îfade dike. Çanda îro li ser adet û teqalîdên bihurî yê gelan ava bûye û berdewamîya wan e. Mirina her gotoxî, mirin û windakirina keresteyên zargotin, çand û civakê ye. Xeteriyên li ser zargotinê û wêjeya gelêrî ya kurdî ev in: Desthilatdarî, Kapîtalîzm, Koçberî, Amûrên Danûstandinê û Korona.

**J.B:** Fikrên te yê li ser çareserîya van probleman çi ne? Pêşnîyazên te hene?

**X.P:** Di çar parçeyên Kurdistanê da, bi rêbazên klasîk an jî modern keresteyên folklorê bînan berhevkirin, senifandin, û transkrîpsiyona wan bê kirin, li ser wan lêkolînên wekî wêje, ziman, cîvaknasî, dîrokî, psîkolîjî bînan kirin. Ev kereste çapkirî an dijîtal bînan arşîvkirin û di heman demê da bînan parvekirin.

Têbînî:

1. Di lêkolînên zanistî da dema ku ji bo rêbazên zanistî anketê bê hilbijartin;
  - a) Di destpêkê da pêwîst e ku ewil navê mijara rapirsînê, sedem û armanca rapirsînê bînan diyarkirin.
  - b) Dîroka bersivdayinê
  - c) Di pirsên rapirsînê da, bi sê şewazan (pîrsên girtî, vekirî û nîvgirtî/vekirî) rapirsînê bê amadekirinê dê baştir bibe.

- d) Dema rêzkirina pirsan, pirsên destpêkê bila ji bo naskirina anketoran bin. Hinek pirsan li ser anketoran bikin. Eger nav û paşnavê anketor ji bo lêkolînê ne pir hewce be, neyê pirsirin, baştir e.
- e) Di her pirsê da tiştekî bê pirsîn dê baştir be. Yanê di eynî pirsê da 2, 3 û 4 tişt bên pirsîn, ew dikare bibe sedema jibîrkirina hin pirsan.



1978 ئەم ھاتینە گومەلگەھا قەدشە ئاکنجیبووین، خواندنا سەرتایی و ناقتجی مە ل ویرئ بدای بیئنایه، پاش سالا 1984 ھەتا 1987 ئامادیا پیشەسازی ل دەوکی مە بدای ئینایه.

پشتی ھینکی دەستپیکچی چەوا مە بەرئ خۆ دا فولکلوری و ھزرا مە دفولکلوری و دکۆمکرنئ دا ھات، چ پئ نەقیبت ھەر ژ زارۆکینی ل گوندا، فەگئیرانا چیرۆک و سەرھاتیا ژ باب و پاپیر و وداپیرا ھەزا مە ل سەر ھەبوو، ل سالا 1984 ل دەمی ئەم قوتابی ل ئامادیا پیشەسازی، مامۆستا ھەجی جەھفەر راپۆرت ل سەر فولکلوری ژ مە خواستن و گۆت ئەز ھەزدکەم نشتین وەک بەر ھەمئین فولکلوری بۆ مە بینن، چ پئ نەقیبت ھەر سالا دەستپیکچی ھەزا مە ل سەر ھەبوو، ھەر ژ بەر ھندئ مە راپۆرتەک 89 لاپەری بۆ ئینا، ژ چیرۆک و ھەیرانوک و سەرھاتیان، ل فیرئ پتر بۆ مە پالدر، کو ئەز پتر گرنگیی ب کۆمکرنئ بەدەم، پشتی ھینکی بەر دەوام بووم ل سەر کۆمکرنئ، ل سالا 1986 ژئ ئیکەم بابەت ھەیرانوکەک درۆژنامیا (ھاوکاری) دا مە بە لافکر، ئەف بە لافکر نە ژئ وەک ئیکەمین بابەتی مە ئیدی پتر بۆ پالدر.

دماوئ دناقبەرا 1984\_1987 ئەم ل دەوکی بووین، پتری رۆژان ئیفارئ ئەم دچووین ئیکەتیا نقیسکاران دگەل وانا پتر پالدر بۆ مە پەیدا بوو، وپتر دان وستاندن و نقیسین ل دەف مە پەیدا بوو، ئەفە بوو دەستپیکا مە، مە پتر بزاف و ھەولان کو ئەز نشتی فولکلوری کۆمبکەم، چ پئ نەقیبت ژ مارەکا یاباش یا بەر ھەمئین فولکلوری ھەبوو، چونکی ئەم ل گوندا دژیان دەلیفە ھەبوو ب تاییبەت داپیرا مە ئەز دشتیم بیژم، گەنجینەکا ھەرا مەزنا فولکلوری بوویە لەورا مە بەر ھەمەک زۆر کۆمەر، ل سالا 1986 مە فەکۆلینەک ھەر ل ئیکەتیا نقیسکاران وەک سەمینار پشکیشکر ل سەر (دەم ناسین دگۆتتین مەزنان دا).

#### فەرەنگیس قادری: ل ئیکەتیا نقیسکارین دەوکی؟

**جەمیل شینلازی:** بەلئ ل دەوکی، ئەف پشکیشکرنا سەمینارئ ژئ پتر بۆ پالدر، کو بەر دەوام ل سەر کۆمکرننا فولکلوری، چ پئ نەقیبت دەستپیکچی بە لافکر وەک پەرتووک کارەکی ب زەحمەت بوو، لئ دکۆفار و رۆژنامادا تشتەکی باش مە بە لافکر، ھەر بەری سەر ھلدانئ و پشتی سەر ھلدانئ ژئ، پشتی سەر ھلدانئ بەر ھەمەکی زۆرئ نقیسی لجم مە ھەبوو یئ کۆمکری، ئیکەمین پەرتووک پشتی سەر ھلدانئ چاپکری (چیفانوکین کوردی) بوویە ل سالا 2003 ئیکەم بەر ھەمە مە چاپ بوو، ژ لایئ دەزگەھئ مۆکریانی چاپکەر، ئەف چاپکرنە، ژ دوازدە چیفانوکین کوردی یئین پالکیش بوون، بەر دەوام ئیدی مە کار و خەباتا خۆ پتر ل سەر کۆمکرنئ و نقیسینئ ژئ دا ل شوینا بەس ئەم ب کۆمکرنئ رابین مە دەست ب فەکۆلینئ ژئ کر، ئانکو ئەم نەیس ل سەر کۆمکرننا تیکستئ راوہستیان، بەلکو مە گەلەک بابەتین رەخنە و فەکۆلین دەبەررا مە گەلەک بەر ھەم ھەبووینە، لەورا ھەر 2004 ھەیفە ھەتا نەھۆ مە زیدەتر ژ 30 پەرتووکان چاپکرنە، ژوان شەش پەرتووک تیکستین فولکلوری نە، ئەو ژئ ھەمی چیرۆکن ئەوین دی جۆرا و جورن، مە بەلگەنامین دەستنقیسین ھۆزانا ساخکرنە و مە ل سەر بابەتین دیرۆکی شوینەواری ژئ نقیساینە و بە لافکرینە، ژ بلی وان 30 پەرتووکین چاپکری، نەھۆ 3 پەرتووک د بەر ھەفئ ژ بۆ چاپکرنئ، و ئەو بابەتین دکۆفار و رۆژنامیان دا پتر ژ 750 بابەتین جۆراوجو ئیت رۆژنامەقانی و فەکۆلین مە بە لافکرنە، ھەر وەسا پتر ژ دەھ سەمینارین جۆرەوجور ل ھەر ئیما کۆدستانئ ئەز دشتیم بیژم نە بەس ل بە ھەدیان بەلکو ھەتا دشتیم بیژم مە بەشداری ل فیسەتەقلا گە لافکیردا کری یە ل سلیمانئ، ل سالتین (2016 و 2018) پشکداری د چالاکیین وەققا میز پۆتامیا ل دیار بەکری دا کری یە، ھەر وەسا پشکداری د کونفرانسین زانینگەھا زاخو سالتین (2018 و 2022) دا کرینە، دیسان کونفرانسئ زانینگەھا وانئ ل باکۆرئ کوردستانئ سالا (2022) یئ، کو مە ل بەرە پشکداری کونفرانسئ زانینگەھا ھەکاریا ژئ بکەین ل (21 – 10/22)

(2022)، کو ههمی فهکۆلینین مه ژى هه ل دور بابەتین فولکلۆری نه، ههروهسا نیزیکی دهه بهرنامهین تهلهفزیونی ل سهر فولکلۆری و سهر کهتواری کوردی و فولکلۆری ههنه، ههروهسا چهندین بهرنامه ل رادیویدین ل ههرمی مه پیشکیشکرینه، چ وهک مبهفانداری و ههتا بۆماوی شهش ههیفان من ل رادیویا (مهتین) ل ئامیدی بهرنامهک ههبوو بناقی (سهۆکانی) هه ههمی ل سهر فولکلۆری بوویه، ژ 24 خهلهک ل سهر بابەتین فولکلۆری بریکا رادیوی پیشکیشکرینه، ههتا نوکه پهيوهندیین مه دگهل برادهرین باکوری بت یان روژهلای و روژناقی ژى مه پهيوهندیهکا خورت ههبوویه، لهورا برادهرین ل بههدینان ژى پتیریا وان ب چاقي هندئ سهدکهن من، کو نهز ژوان کهسین دهستیکی بویمه، بهس من فولکلۆر نه کۆمکرییه، بهلکو دبواری فهکۆلینێ دا چهندین بهرهمین زانستی وهک پهرتووکین فهکۆلین مه ههنه، ههس بۆ نمونه (رهمزئ ئهدهبی فولکلۆرئ ئهدهبی دهفرا بههدینان) پهرتووکهکه زۆر گرنگه، دیسان (میژوویا سالنامی و روژ ژمیرا کوردی) پهرتووکهکه، ههس ل سهر (دهم ناسین دگۆتینن مهزان دا) پهرتووکهکا زۆر گرنگه، و (ههشکافتنا فولکلۆری) پهرتووکهکه ژ ههفت فهکۆلینین جۆراوجور تیدا ههنه، و پهرتووکا چهند فهکۆلینهک دچیرۆکین فولکلۆرئ کوردی دا، و دیسان دبواری فولکلۆری دا مه چهندین فهکۆلینین جودا جودا ههنه، بۆ نمونه مه سی فهکۆلین ل سهر ریبازا پرۆبی و بکارئینانا شوڤهکرنا وئ ل سهر چیفانوکا کوردی مه بکارئینایه، دووماهیك پهرتووکین مهین بهردهست ئیک ژ وانا بهاین چاکی ددیتنا روژهلانسان و گۆتینن مهزان دا، کو نهو ئهنیستیویا کهلهپووری لژیر چاپی یه، دیسان پهرتووکا مه (مامکین دهفرا بههدینان) کو پهرتووکهکه وهک فهرههناک مامکین دهفرا بههدینان ژ لای کومپانیا پالوڤه وهلاتئ ئیرانی بهریا چهند روژمهکان چاپوویه، و دووماهیك پهرتووکا مه، بهری ههفتیهکی بیبلوگرافیا پهرتووکین فولکلۆری ل دهفرا بههدینان ههس ژ سالا 1970 ههتا سالا 2020 بیبلوگرافیهکا گهلهک بهرره هه ههمی پهرتووکین فولکلۆرئ بین دهفرا بههدینان وهک بیبلوگرافی مه بهرهمفکری یه، دگهل وئ ژى مه پشکهک وهک پاشبهند وهرگرتی، نهو پهرتووکین ب پیتین سلاقی یان ژ زمانین دی هاتینه وهرگیران ل دهفرا بههدینان ههس نیت تایهت ب فولکلۆری نهو ژى مه کری یه پاشبهندهک دبیبلوگرافی دا، کو ل پاشهروژئ ببیت ژیدهرهک بۆ قوتایی و ههس فهکۆلهرکئ حهزکته، بزانیته چو پهرتووکین فولکلۆری ل دهفرا بههدینان چاپوویه، و ژبلی بین کوردی کا مه چ دی ههیه هاتبیته فهگوهاستن یان وهرگیران بۆ زمانی مه یی کوری یی بههدینی، نهز دشیم بیژم ب کورتی دبواری روژنامهقانی ژى دا مه گهلهک کارکری یه، نه بنتی دبواری فولکلۆری دا، بهلکو ریپورتاژ و بابەتیت روژنامهقانی بۆ نمونه نیزیکی دوو سالا نهز پهيامنیرئ ناسوی فولکلۆر بووم ل ههولیرئ، کو ل دهوکی نهز پهيامنیرئ وان بووم، دیسان ل سالا 2005 تا 2007 بهری لقئ ئنستیتویا کهلهپووری کوردی ل دهوکی بهیته فهکرن، نهز نوینهئ ئنستیتویا کهلهپووری کوردی بووم ل دهوکی بۆ سلیمانی، بهرهمین برادهران کۆمدرن من دبرنه سلیمانی، پهيوهندیین مه زۆر خورت بوون و وهک پهيامنیر مه کارکری یه دگهلهک بیاقان دا، دیسان دگۆفارا (نۆژین) کو گۆفارهک بوو ل ئامیدی دهات دهرئخستن، ژلای کۆمهکا گهنجان فه، نهز وهک ئهندامی دهستهکا نقیسهرا بووم، و ل سالا 1992ئ بوویمه ئهندامی ئیکهتیا نقیسهرین کورد تایی دهوکی، دیسان ل سالا 2005ئ بوویمه ئهندامی سهندیکا روژنامهقانهقال دهوکی، د ئهقان بوارین جودا جودا مه بهرهمین جودا جودا ههنه، نه بهس وهک کومکرنا تیکستین فولکلۆری بنتی، وهکی مهگۆتی نهقی داوی مهگهلهک گرنگی ب فهکۆلینێ دایه، پرانییا بهرهمین مه بین فهکۆلینێ بووینه پهرتووک.

بهشداریا مه چهندین کۆفرانسین زانستی دا، بۆنموونه نهقا بهری دوو سالان ل زانکویا زاخو مه پهشداری د دوو کۆفرانسین زانکویا زاخو دا بهشداری کری یه، دیسان ههس نهف سالا ل 27 گولانی بهشداری کۆفرانسئ زانکویا وانئ بووین ل سهر (فهقیئ تهیران)، و ههیقا 10 ژى ل زانکویا ههکاریا دیسان ههس ل سهر فولکلۆری یه دئ پهشدار بین،

ئانگۆ بەرھەمئەن ئەم شىيان ب شىومەكى زانستى ئامادە بگەين، ئەم دشين بيزين ئەگەر بکورتى بەحسسى بەرھەم و چالاكىين خۆ بگەين و مە بەرھەمئەن زۆر ھەنەل بەر دەست (وەك تۆ دبيني ئەفە ژمارەکا پەرتووکانن ل بەردەست) کو ھەمى ژى پتريا وان ب ريكين زانستى ھاتينە بەرھەفكرن، چونكە چەندين پەرتووڪين مە ژ لايى دەزگەھين ئەكادىمى وەك (ئەنستيتوتيا كەلەپوورى كوردى و ئەكادىميا كوردى/ ھەولير و سەنتەرى بيشكىچى زانگۆيا دھۆك و... ھتد ھاتينە چاپكرن، ئانگۆ دىوارين جودا جودا مە بەرھەم ھەنە و بشيومەكى ئەكادىمى ھاتينە بەرھەفكرن.<sup>1</sup>

1

## ھەندىك بەرھەمئەن نقيسەر

- 1- چىقانتۆكيت كوردى، فۆلكلور، ژ وەشانين دەزگەھى موكرىانى، چاپخانا خەبات، (دھۆك: 2001).
- 2- پوستە، كۆمەلە كورته چيرۆكين خومالى نە ، چاپخانا زانا، (دھۆك: 2004).
- 3- كوترك و كورئ پيرئ (چيرۆكەكا فۆلكلورى بۆ زارۆكان)، ژ وەشانين بنگەھى ريكخراوا مافى مەدەنى ل كوردستانى، چاپخانا ھاوار، (دھۆك: 2004).
- 4- چەند فەكۆلينەك د چيرۆكين فۆلكلورى دا، ژ وەشانين ئنستيتوتيا كەلەپوورى كوردى ل سلىمانىي، چاپخانا (شقان)، (سلىمانىي: 2004).
- 5- ھۆزانقانى مللى نادرى كانيساركى (1872 - 1948) ژيان و بەرھەم، چاپخانا زانا، دھۆك: 2004).
- 6- ژ چيرۆكين مللين كوردى، فۆلكلور ژ وەشانين ئنستيتوتيا كەلەپوورى كوردى، سلىمانىي، چاپخانا شقان، (سلىمانىي: 2005).
- 7- ژ چيرۆكين فۆلكلورى كوردى، فۆلكلور، ژ وەشانين ئيكەتيا نقيسەرين كورد تايى دھۆكى، چاپخانا ھاوار، (دھۆك: 2005).
- 8- چىقانتۆكا گايى سۆر، چيرۆكەك فۆلكلورىيە، ژ وەشانين ئيكەتيا نقيسەرين كورد تايى دھۆكى، چاپخانا ھاوار، (دھۆك: 2006).
- 9- ميژوويا سالنامى و دەمناسين د گۆتتەن مەزنان دا، فەكۆلين، ژ وەشانين ئنستيتوتيا كەلەپوورى كوردى، چاپخانا ھاوار، (دھۆك: 2007).
- 10- سالۆختە د حەيرانۆكان دا، فەكۆلين، ژ وەشانين ئيكەتيا نقيسەرين كورد تايى دھۆكى، چاپخانا ھاوار، (دھۆك: 2008).
- 11- ھندەك بەيتين كوردى د دەستنقيسين مەلا مستەفا ئورەمارى دا، چاپخانا ھاوار، (دھۆك: 2010).
- 12- ھەلشكاقتنا فۆلكلورى، چەند فەكۆلينەك د فۆلكلورى كوردى دا، ژ وەشانين ئنستيتوتيا كەلەپوورى كوردى، چاپا ئيكى، (دھۆك: 2010).
- 13- گۆندئ شىلازا ژ لايى (جۇگرافى - دىرۆكى - ئابۆرى - جفاكى - راميارى) فە، چاپا ئيكى، چاپخانا ھاوار، (دھۆك: 2012).



فهرهنگیس قادری: گهلهك سوپاس ماموستا، نارمانجا ته ل بهر ههفكرنا فولكلوری و تاییهت فولكلوری كوردی چی به؟ نانكو پروژین ته بو نمونه ل سهر ئهحمهده ئ نالبهند؟

**جهمیل شیلازی:** وهك نارمانج نهگهر وهك پیناسهكا گشتی نهوا پتر فهكولهر ا دایه فولكلوری، ومختی دبیزن (فولكلور ناسنامهیا مللهتایه)، ههلبهت مه ژی نهف چهندا هه زانی كو كۆمكرنا فولكلوری نهو یی ناسناما مللهتی خو ددهینه نیاسین و دپاریزین ژ وندابوون و بهرزهبوون، لهورا ب نهفی تیگههیی مه گرنگی دا كۆمكرنا فولكلوری و پاراستنا وی، ههروهسا نهگهر نهو بیژین وهکی من گۆتی سألین ههفتیان ههتا 2020 پتر ژ 180 پهرتووکین جورا و جور بین فولكلوری ل دهفهر ا بههدینان چاپ بووینه، نانكو نهو دشیم بیژم قوناغهكا باش یافولكلوری بههدینان نهو دشیم بیژم (80%) ههشتی ژ سهدهی هاتییه كۆمكرن و نهرفیكرن، لی نهفرو كۆمكرن بتتی نهههسی مهیه، نهفروكه نهف چهند پیدقی ب كۆمكرنی، نهو هند پیدقی ب فهكولینی نهو ل سهر فولكلوری ژ لایئ دهزگههین نهكادیمی فه بهینه فهكولین، بهلگهژی نهف كۆفرانسئ زانكویا زاخو كو پتر ژ 84 فهكولین ل سهر فولكلوری بین جورا و جور هاتییه نفیسین، نانكو بومه دیار دبت، گهلهك نهركی كهتییه سهر ملیت مه، نییدی كاری فهكولینی ژی ل سهر بکهین، چونكه فهكولین بخو ژی پشهكا میژووا مللهتی مه نهفی بوری هههیی دیار دکت، هه ژبواری مللهتی مه بت و رابوویری وان بت، ههر تشتهکی روویدابت ب ریکا نهفی فولكلوری هه دههیی نهو فهكولینی ل سهر دکهین دیار دبیت، نهو ژبواری مللهتی خو و دیرۆکا

14- سئ بهیترین كوردی ددهستنیسا فهق مههمهدهی توخوبی دا، نهستیتویا كهلهپووری كوردی - دهوك، چاپا ئیكی، چاپخانا كهمال، (سلیمانی: 2012).

15- چهند بهر په رهك فهشارتی ژ دیرۆكا دهفهری، چاپا ئیكی، چاپخانا هاوار، (دهوك: 2013).

16- ریبهری باژیرقانیا قهدهشی، چاپا ئیكی، چاپخانا هاوار، (دهوك: 2014).

17- ژ شوینهوارین دهفهر ا نامیدی، (سه ره دانین مهیدانی و فهكولین)، سهنته ری بیشكچی زانكویا دهوك، چاپا ئیكی، چاپخانا هیقی، (ههولیر: 2018).

18- ره مزئ ماری د نهدهبی فولكلوری كوردی دا (فهكولین). نهنیستیوتا كهلهپووری كوردی - دهوك، چاپا ئیكی، (سلیمانی: 2019).

19- دیوانا مه لا یوسف كنیستهی (ههلبهستین كلاسکی)، چاپا ئیكی، چاپخانا هاوار، (دهوك: 2019).

20- رهنگهههانا نامازه بین دیرۆکی د مهو و زینا خانی دا، چاپا ئیكهم، چاپخانا نهنیستیوتا كهلهپووری كوردی - سلیمانی، (سلیمانی: 2020).

21- چیفانوكتیت كوردی، چاپا دووی، ژ وهشانین پهرتووكخانا گازی، (دهوك: 2021).

22- ببیلوگرافیا پهرتووكین فولكلوری ل دهفهر ا بههدینان (1972 - 2020)، چاپا ئیكی، نهنیستیوتا كهلهپووری كوردی - دهوك، (سلیمانی: 2022).

23- ههلهشكافتنا باغی كوردا (چهند فهكولینهك د هوزانین موخلسیدا)، چاپا ئیكی، ههولیر، نهكادیما كوردی.

24- مامکین دهفهر ا بههدینان، چاپا ئیكی، (تههران - ئیران: 2022).

وی بدهین نیاسین، نایا دهوله مندبیا وی چند بوویه، ئەف فولکلۆری هەنێ ئەفرۆکە هەقیبەر بکەین، بۆ نمونە ئەگەر ئەم بین ریبازا مۆرفۆلۆژییا برۆبی بینین ل سەر چیفانوکا خۆ جێ بەجێ بکەین، وئ گافێ بۆمە دیار دکەت نایا فولکلۆری مە چەندێ دەوله مەندە، ئەم دشین بەراورد بکەین دگەل یێ جیهانی یان نە، هەلبەت ئەفە بۆمە دیار دبت، دەمی چەندین چیروک و چیفانوک مە لێن ریبازا مۆرفۆلۆژییا یابروبی شروەفەکرین، ئەفە بخۆ ژێ دیار دکەت چیروکا مە یان فولکلۆری مە ژ هەر مللەتەکی کیمتر نینە ئەگەر باشتر ژێ نەبیت، کەنگی ئەف چەندە دیار دبت، ل دەمی گەلەک جارا فولکلۆری خۆ دگەل یێ بیانی هەقیبەر دکەین، ئەفجا چ یێ عەرەبی یان یێ فارسی بت یان تورکی بیت، هەر وەلاتەکی دی بیت، و گەلەک تیکستا ئەم یێ دببین، ئەفرۆکە مە هەقیبەر کرنا کری، بۆ نمونە چیروکا زەنگ و بەنگا ئەفرۆکە ل کوردستانی دنیته فهگیران، هەر ل ئەلمانیا هەمان تیکست یا هەمی، ئانکو مە ئەدەبەکی فولکلۆری یێ هەقیبەر دناقیبەر مە جیهانی دا یێ هەمی، ئەف چەندا هەژێ هەمی کەنکی دئ دیار بت، ل دەمی فهکۆلین ل سەر دنیته کرن، دیسان وختێ ئەلکزاندەر کراپ بەحسێ چیفانوکێ دکەت دبیزیت مە دوو جورین چیفانوکێ یێن هەین ئێک یا خۆ جەهی یا خۆمالییا دەفەر یێ، ئێک ژێ یا مشەختکری ئانکو ژ وەلاتەکی بۆ وەلاتەکی دی مشەختکری یە، لەورا ئەف پۆلینکرن و جورێ دایێ، ئەم دشین بیژین ئەدەبی مەژێ ئەف ئەدەب بوویه، مە گەلەک چیفانوکێن هەین خۆمالیین دەفەر مە نە، ئانکو کوردی نە، چیدبیت هەندەکن دی مشەختکری بن ژ وەلاتەکی دی بۆمە هاتبە ناف مە، بۆ نمونە دپەر تووکا من بخودا یا (چیفانوکێن کوردی) مە (مەلیکا کچا مەلیکی) یا هەمی یان چیروکا سلیمان پێغەمبەری (س) هەر چەندە بەحسێ سیمەرخێ دکەت، لئ وئ گافێ ئەم دشین بیژین دبیت ئەفە چیفانوکەکا مشەختکری بیت، چونکی سلیمان پێغەمبەر نە دژیوارێ مەدا بوویه، ئەم دشین بیژین یا هاتیە فهکو هاستن، ب دەهان نمونە مە بیت هەین، ئانکو چەوا چیفانوکا بیانی هاتیە دیارکرن یا مشەخت بووی ژ وەلاتەکی بۆ وەلاتەکی ژ دەفەر مەکی بۆ دەفەر مەکی یا هاتیە دناف مەژێ دا، هەمان تشت چیدبیت بەر هەمی مەژێ هەر مشەختکریبیت ئەفە ژێ گەلەک جاران بیژین دەر ئەنجامین ئەفێ چەوا چێ بوونە؟ ئێک ژ ریکین بازرگانی، کو وختەکی ل سەر ئاستێ جیهانی کو بازرگانی دناقیبەر پتریا وەلاتاندا هەبوویه هاتن و چوونا بازرگانی کری یە، یان هەتا ب ریکا دانەشوویا ژنی و خزمانی دناقیبەر وەلاتاندا چیبووویه، ببیتە ئەگەر ئێک جارا ئەدەب هاتیە فهکو هاستن ژ وەلاتەکی بۆ وەلاتەکی یان ب کۆچەرانیی ژ وەلاتەکی بۆ وەلاتەکی دی، ئەدەب و کەلتووری دگەل خۆ فهکو هاستی و نینای وبری، ئەفە هەمی ئارمانجین مەبووینە کو ئەفرۆکە ئەم بشین پاراستنا کلتووری مللەتی خۆ یێ زارەکی هەمی پاریزین، ئەوئ کو ب هەزارەها سالا هاتیە فهگیران و هەتا نوکە مایە پاراستی و ئیدی ئەرکی مایە پاریزین و تومار بکەین، چونکی هەر پیرمێرەک یا پیرەژنەک وەغەر بکەت چانتکەکی یان پارزینکەکی فی ئەدەبی هە، دئ دگەل خۆ بن ناخ کەتن، ئەرکی مە هەمیایە و پیتیبیە ب ئەرکی خۆ بزانی کومکەین و ژ وان وەرگرن بەری ئەو وەغەر بکەن، ئەم وان جانتک و پارزینک وان ب ئەمانەت ژێ وەرگرن، و ب ئەمانەت ئەم بشین بگەهینن پاشاباب و بەرەباین خۆ، و بۆ وان بەیت پاراستنی، سۆبەهی مللەتی مەژێ و پاشی بەرەباین مەژێ شانازیی بخۆ بەت کو ئەم ژێ مللەتەکی خودان ئەدەب و خودان کلتوورین و خودان شارستانیەتین، چونکی شارستانیەتا هەر مللەتەکی ب چی تیت نیاسین؟ ب ئەدەبیاتا وی دنیته نیاسین ب پاشماویین وی دنیته نیاسین، ئەفرۆکە ئەگەر مە جل و بەرگ و خوارن و تشین خۆیین کەفن نەبیت، مە شارستانیەت نینە، ئەگەر مە ئەدەبی خۆ یێ زارەکی نەبت مەشارستانیەت نینە، ئەگەر مە دیرۆکا خۆیا تومار کری نەبیت، ئەم نەشین بیژین ئەم خودان شارستانیەتین، ئەفرۆکە بۆچی ئەم دبیزین شانازیی دبەین و دبیزین کوردستان لاندکا شارستانیەتی یە، هەر پاشماوئ مروفیت نیاندرتال ل شکەفتا شانەدر و شکەفتا هەزار مێرد و گوندێ چەرمۆ ئیکەمین گوندێ دەر امەت لئ هاتیە چاندن، ئەفرۆکە ئەم وەک کورد شانازیی پی دبەین، چونکی ئەفە بەر دەستی مەنەبا ئەم نەدشیابین شانازیی بخۆ بەین، بەلئ ئەفە هەمی بۆمە شانازی یە کو کلتوورەکی زەنگین و دەوله مەند و دیرۆکەکا

دەولەمەند و پاشمایەکی زەنگین، بەرەبایی مە یی بۆ مە هیلا، نوکە ئەم پاراستنا وی ب ئەرکی خۆ دزانین، هەشکافتن و فەکوئینی ل سەر بکەین، بەر اوردیی ل سەر بکەین، هەگەر دشیان دا بیت هەر چەندە ئەفرۆکە ب دەهان بەر هەمین مە بین وەرگیرانی بۆ زمانەکی دی ئەلمانی بت یان ئینگلیزی بت فەرمسی بت، چەوا بەر هەمین وان بەر هەمین وان بۆ مە تین وەرگیرانی، بەر هەمین مەژی ئەرکە بەین وەرگیرانی و دا بزانیان مەلتی کورد چ هەبە، ئەگەر رۆژە لاتناسا خزمەتا ئەدەب و کلتوری مە کریت، ئەفرۆکە پیدقی یە ئەم ژێ خزمەتا ئەدەب کلتوری خۆ بکەین، ئەم بۆ وانا فەگۆ هیزین و ئەم بۆ وانا وەرگیرین، ئەفرۆکە ئەم ب ئەفی ریکی بشین بێژینە ئەفان مەلتان ئەم ژێ خودان شارستانیەت و ئەدەب و خودان کەسین زانا و شەهر مزاینە، ئەفە دئ ب چ بیت، ئەفە مە ب ئەرکی خۆ زانی یە، لەورا بەردەوام مە بزاف و خزمەتا ئەدەب و کلتوری خۆ بکەین.

**فەرەنگی قادری: گەلەک سۆپاس، پشتهفانی کار و پرۆژەیین تە کینه، ئایا دەزگەهەک بەشەکی حکومی وەک پشتهفانیا ئابوری کری یە؟**

**چەمیل شیلازی: ئەگەر ئەم وەک پشتهفانی بێژین: ل هەریما کوردستانی، دبیت کوردستانی ژێ نە ل هەریما کوردستانی بەلکو هەر چار پارچین کوردستانی هەمی پیکفە، وەک دەزگەهەکی ژیری بیت، ئەم هەر نینه، لی دبیت هەندەک دەزگەهین مە ل دویف شیانین خۆ گەلەک جاران بۆ نمونە هەشت پەرتووکیان مەن ئەنستوتا کەلەپوری کوردی چاپکرنە، ئەفە پشتهفانیەکە، هەر دیسان بۆ نمونە پەرتووکیان مەن دەزگەهە مۆکریانی چاپکری یە، و ئەکادیمی کوردی دیسان پەرتووکیان بۆ مەن چاپکری یە، ئانکو هەندەک دەزگەهە هەنە خۆ ل بەر هەمی مە دکن خودان، بەس ئەم ل قیرە دبیزین هیش رۆژەکی بەری مە ل هندی نینه دەزگەهەکی ژیری بیت بۆمە ژێ دەیت، بەس بەر هەمی ئەم کۆمەکەین بگەهین دەستی خواندەفانی و بەهیت تومارکرن ل دەف مە ئەفە گرنە، ئەفچا گەلەک جارا مە ل سەر حسابا خۆ ژێ تشتی خویی چاپکری، و گەلەک جارا ژێ دەزگەهین هەین، هەندەک جارا پشتهفانیەکا هەمی هەر چەبیت یا رەمزی ژێ بت خۆ ل بەر هەمین مە گەلەک کریبە خودان و بەر هەمین مە چاپکری نە، ئەم هەول بزافی دکەین هەر تشتەکی مە کۆمکری بیت و نقیسی بیت، ب هەر ریکەکا بیت ئەم بگەهین دەستی خواندەفانی بەهیتە قەیدکرنی و چاپکرنی، هەگەر وەکی ماموستا حجی جەعفەر جار مکی گۆتی: ئەگەر ئیکی دقیت دمالا وی دا کۆرییا مشکی ب ئار نەکەفیت، دئ خۆ ب کۆمکرنا فولکلوری فەکەت، ئانکو نەدەرگەهەکی ژیری یە، تو بێژی ئەز دئ ئەفی کاری کەم دئ بیتە بەر هەمەک یان داهاهەک بۆ مەن، نەخیر بەس چی یە، دسەر هندی را ئەم دبیزین بلا چ داهاهە ژێ بۆ مە پێفە نەهیتن، بەس یاگرنەک ئەو ئەم ئەفی ئەدەب و کلتوری پاریزین، لەورا ئەم گەلەک جارا بزافی دکەین، ئەگەر دەزگەهەک یان حکۆمەت بیت یان هەتا دەزگەهەکی یی ئەهلی بیتن، هەر جەهەکی بیتن، خۆ ل بەر هەمی مە بکەت خودان ئەم دچین دکەینە دەستی دا، ئەم دبیزن تو چاپ بکە، گرنە بەهیت چاپکرن و پاراستنی، ئەفەیه ئارمانجا مە، ئەگەر چ دەزگەهین ژیری بۆمە پێفە ناهین، ئەز باوەرنامک ئیک ل کوردستانی بێژیت ئەز دئ پەرتووکیان نامادەکم، بەلکو گەلەک جارا ژبەریکا خۆ سەر مەری زحمەتی و بوراندنا دمی خۆ هەمی ژێ تەرخان کەت بۆ هندی، بەس یاگرنەک ئەو ل دەف مەن ئەم بشین ب پاریزین.**

ئارمانجین مە هەمی ئەفەنە، ئەفچا دەزگەهە ژێ، ئەگەر ئەم هەقیبەر بکەین، مەن دپەرتووکا خویا بیلوگرافی دا رەوشا فولکلوری ل دەفەرا بەهیدیان ژ سالا 1970 هەتا 2020 مەگەلەک ئەوژی بەر حسکری یە، بەری سەر هلدانی رەوشا بەرف کاری کۆمکرنی چەوا بوویە، پشتی سەهلدانی چەوا بوویە، ئیحتیماله ئەگەر ئەز بێژم تە ژلایەکی فە پشتهفانی ل بەری سەر هلدانی پتر پشتهفانی ل بەر هەفکاری دەهاتە کرنی، بۆ نمونە ل بەغدا هەر پەرتووکیان نقیسەری بۆ چاپ

کریایه ل بەری سەر هلدانی، هەر پەرتووکهک 2000 دانه یان 3000 هزار دانه چاپ دکرن، و هەمی ددانه نقیسەری و کۆژمەکی پارە ی زی ددای، ئانکو هینکی 700 دینارا 800 دینارا وەک پارە ی زی ددای، لئ ئەگەر ئەم هەبەرکرنی بەمین دگەل قیگافی نەخیر دبیت پەرتووکهکی چاپ بکەت گەلەک دئ (50) دانەیان دەتە نقیسکاری یان بەر هەفکاری، ئەقین دی بین مابن ی زی بۆ دەزگەهی دەمین، ئەگەر هەبەرکرنی بەمین جیاوازییەک زۆر نەو دگەل بەری سەر هلدانی دا هەیه، دسەر هندی ی زی را ئەم دبیزین قەیدی ناکەت، بۆ نمونە ئەف پەرتووکا (هەشکافتنا فولکلوری) نیک ی زی وان پەرتووکانە تئ (25) دانه دگەل کۆژمەک پارە ی رەمزی یی دایە من، و گەلەک جار ی زی مەیین چاپکرن، تئ (10) دانه ی زی نەدایە مە، مە یا گۆتییی بەس چاپ بکە و بەلاقەبیت، چ بەرامبەری وئ ی زی مە ی زی نەوەرگرتی یە، ئانکو رەوش ل باکور ی کوردستانی یان رۆژ هەلاتی یان رۆژ ئافای یان باشوری بیت رەوش هەمی وەکی نیکە، رەوشا دارایی یا هند بەرفرەهە ئەم بیژین سپونسەری یا پشەقانیەکا یاداری یاش ل نقیسکاری بەیتەکرن، ناهیتەکرن، نقیسکاری مەزی ئەم دبین خەمخورە و دەستا داناھلیت، وەک داھات بۆ بەیت یان نەھیت، بزاقی دکرن ل هەر چار پارچا و پیکفە ی زی هەتا ژدەر فە هەر ب ریکەکا بیت کو ئەف بەر هەمی هە بیت کۆمکرن و تومارکرن یان چاپکرن و بەلاقەکرنی.

#### فەرەنگیس قادری: بارپتر هەول و بەر هەمین نقیسکار شەخسی نە؟

**جەمیل شیلازی:** بەلی، پتر کەسایەتی یە، تو بیژی دەزگەهەکی تاییەتمەند هەبت، بۆ نمونە مە ل قیرە ل باشوری کوردستانی " ئەسنیتویا کەلەپووری کوردە"، ئەو ی زی پشەقانیەک یان گەلەک شیان ل بەر دەست نینە و شیان نینن، بۆ نمونە وەققا میزو پوتامیایی ل دیار بەکری، ئەگەر پارەکی باش ل بەر دەستی وان بیت، باو مە دئ خزمەتا باش کەن، لئ ئەقەزی گەلەک ب ریکا هەندەک کەسین دەولەند و خودان شیان دبیت ئەفە پشەقانیی لئ بکەن، ئەگەر وەک حکۆمەت پشەقانیی پیدقی ناهیتە کەن، لەورا بەرفکاری پتر کەسایەتی یە، چونکی ئەفروکە تو کەسەکی ب کۆمکنا فولکلوری رایی ئەگەر حکۆمەت پشەقانیی تەبکەت، تو پیدقی ب کامیری و پیدقی ب تروومبیلی بی و پیدقی ب پارەکی باش بی ل بەر دەست بیت، ئەفە هەمی پیدقی تە هەتا بشی گوند گوند باژیر باژیر لئ بگەری، هەلبەت ئەف چەندە ی زی نینە، هەر بەر هەفکارەک تاکە کسی ل دویف شیانین خۆ بزاقی دکەت کا دشیت چ کۆم بکەت یان بەر هەف بکەت.

**فەرەنگیس قادری:** تو دکاری پیچەکی بەحسا میتود ی خۆ بکە، نمونە تە نەا بەحسا گوند ب گوند دگەری، تو چەوا تیکستین فولکلوری پەیدادکە و تو چەوا ریکوردکە، هەندەک بەحسی میتود ی خۆ بکە؟

**جەمیل شیلازی:** ئەگەر ئەم سەحکەینی دەمی مە کۆمکنا وان دکر، پتر هەر ژ مە ل هەریما دەردورا دزانیت کا کی کەس فلکوری دزانیت، باو مە کە هەمی ژ بەریکا خۆ بوویە، هەر مسەجلی بکری تو کامیری بکری، هاتن و چوونا تروومبیلی، ژ بەریکا خۆ قەست کەنە وان گوندا و دچووین دەف وان کەسا بتنی دا بشین هەندەک، بابەتان قیچا چ ب تومارکرن بت ب ریکا کاسیتی یان قیدی کەنە بن، هەتا گەلەک جار نقیسین بت، ئەگەر بخوازیت، ریکین جودا جودا مەبزا فکری یە، لئ ئەقەزی مە گۆت ریکین هەمین گەلەک جار تومارکرن ل سەر کاسیتا، هەلبەت نوکە پتر بسانەهی کەتیە، دەمی مە پتیریا وان کۆمکەر ب کاسیتا قەیدکرن بوویە، ژ نو ی ئەف کاسیتە هەمی ئەم دەھاتین مال جارەکا دی فەدگۆ هاست و دنقیسا، نقیسینی ی زی ژنونیکا تو بزاقی بکە کۆمبەکی و بنقیسی و پیدچوونی ل سەر بکە ی فە و بەیت پاراستنی، یا ژمنفە سەر کەقتیرین ریک بۆ پاراستنی تومارکرنە، وەکی دبیزیت بۆتە دەمین، گەلەک جار ئەگەر بچی ئەو چیرۆکی بۆتە بیژیت و پاشی تو ل دویف ئەو تشتی تە ی زی گۆولییووی، ل دویف هزرا بنقیسی فە، ب ئەمانەت ناھیت پاراستنی، دئ گەلەک پەقیین نو ی چن دناقاد، لئ ئەگەر تە تومار کر ب ریکا کاسیتەکی پشتی هینکی لدوویف دەنگی

وگوتنا وی دچی، کا وی چہوا گوتییہ دئ وەسا پاریزی، و ریگا زانستی ژێ یا پاراستنی ژێ یا زانستی دقیت ئەفە بیت، لەمورا میتودیت ئەقیت کۆمکرنی دقیت ئەفە بن، لەمورا ئەگەر دەزگەهەک هەبا کۆ پشتمەفانی لیکر با وەک لژنە چەند کەسەک پینکە و کامیرەفان و تومارکەر و ترومبیل و پشتمەفانیەکا دارای هەبا مسوگەر دا تشت سەرکەفتی تربیت، لێ پتریا مە پشتمەفانیەکا تاکەکەسی بخو بوویە ب ئەفان ریکا بوویە، لەمورا میتودین مە ژێ مە گەلەک جار مەنەشیاپە کونترۆلی ل سەر دەفەرئ بکەن، چونکی دوبر دەستە یا نەشەهر مزایا ل هەر گوندەکی یا هەر دەفەرەکی کیش شەهر مزایە، ئەفە ژێ پیچەک زحمەتە، لێ دەوربەرئ یان نیزیکی مەروفی دبیتن ل دەفەر مەروفی یان گوندین دەوربەرئ مەروفی بزانیب سترانیبژ کی یە، چیرۆک بیژ کی یە، ئەقیت هەنی کەسەکی بزانی فێچا وئ کافی قەستنا دەف وی کەسی بکە، لێ فێگافی پیچەک یا بزحمەت کەفتی، چونکی ئەفەرۆکە بچیە دەف پیرەمیرەکی یان پیرەنەکی بیژنی ئەزئ هاتیم بۆ من چیرۆک یان سترانا بیژنی، دئ تومارکەم، دئ بیژیت ئەو زەمان نەمایە، کی گۆهئ خۆدەنت!! هەندەکا ژێ گەلەک جار ناریشە دوبرئ دا بوو و مەختی دچووێ نەک، قەبویل نەدکر تو دەنگی وی تومار بکە، ئەفەرئ ناستەنگەگ بوو یان تو فیدبو کە یان تو وینە ی بۆ بگری، هەلبەت ئەفەرئ دناف چفاکی مەدا گەلەک جار ناستەنگەکا بزحمەت بوویە، هەمی دەما رێ ب مە نەدەهات دانئ تو بچی دەنگی وان تومارکە، من بخو مامەک هەبوو سترانیبژەکی ناقدار بوو ل دەفەرئ، ئەز حەفتیبەکی مامە پینە بەس دوو سترانین گەلەک گرنەگ بۆ من بیژیت، گوت: "بلا دئ بیژم بەس تو تومارناکە،" و ئەف نەتومارکنا وی ژبەر چ بوو؟ ژبەر کۆ دسألین شینستان دا شقان بوو، شقانەتی دکر، شیخی مایئ دەهاتە گوندئ (شینلازا)، ل چولئ گول دەنگی وی بوو ل چیا ی ل بەر پەزی دەما ستران دگوتن، هندی دەنگی وی یئ خوشبوو، شیخ هاتە گوندی، شیخی گوتئ: "دەنگی تە یئ حەرامە، نابیت تو سترانا بیژنی!!"، پشتی دەنگی وی حەرامکری ئیدی ستران نەگوتن! هەکەر وی هەندەک ستران هەبوون کەسئ نەبوون و کەسئ گولئ ژێ نەبوون، بەس بۆ مەژئ نەگوتن، چونکی ئەفە ببوو بیڕ و باوەر ل دەف، ژبەر کۆ شیخی گوت حەرامە حەرامە، ئەز ئیدی نابیژم لەمورا گەلەک جار کارتیکرنا دینی سەر هەبوویە، مەسەلەن دەما سترانیبژەک بیژیت: ئەز نابیژم حەرامە یان تو تومارناکە! ئەفەرئ گەلەک جار ناستەنگ بوویە، لەمورا ئەفەرۆکە تو نەشیبی بچی هەر پەیفەکا هەمی بنقیسی... بەلئ ب ریکا قەیدکرئئ گەلەک باشە، نایا هەمی دئ ریکئ دەن تو تومار بکە، ئەفەرئ ناستەنگەگ بوویە، و هەتا گەلەک جار ناستەنگین سیاسی بۆ مە چیبوویە، مە بقیت یان نە قیت، نوکەژئ مەگەلەک تشتین دیرۆکی و گەلەک تشتین شوینەواری هەنە لئ رەوشا سیاسی و ئیمناهی ریکئ نادەت تو بچیە وئ دەفەرئ یان وی جە، لەمورا مە گەلەک تشت فێگافی ژێ یئ هەمی ئەم یئ ژ دەست دەهین ژبەر رەوشا سیاسی و نە نارامیا ل دەفەرئ، گەلەک جار نە نینە، د هەمی دیواراندا ئەم دبیین، بۆنمونه: رەوشا هەریمی ژلایئ ئیرانی قە نەیا نارامە، ژلایئ تورکیافە گەلەک دەفەرئ مە نارام نینن، نافخویا مە بخو گەلەک جار... پەیدابوونا گروپەکی تیرۆرستی ل دەفەرئ بخو دینە ئەگەر، ئەف نە نارامیا هەمی ژێ گەلەک جار دبیتە ناستەنگ، مەگەلەک تشتین هەین، لئ ئەم نەشین ب پاریزین، بەلئ هەتا ژنافچوونا گەلەک شوینەواری مەیین دەفەرئ یین ژناف دچن، ژنەگەرئ ئەفان شەرئ پەیدابوون ل دەفەرئ، نانکو خەلکەکی یان کەسئ خەمخور قەست بکەتە وئ یان تومار بکەن، کەتینە دین گەفئین شەری دا، دئ بینی گەلەک جەئین شوینەواری و تشتین گەلەک گرنەگ ل دەفەرئ مە ژناف دچن ژبەر ئەفان ئەگەر.

**فەرەنگیس قادری:** گەلەک سوپاس، ئەو ناستەنگین تو وەک بەر هەفکار گەلەک گرنەگ بەحس لئ بکریت، گاڤا چیرۆک بیژ و دەنگی بۆ نەخواست تو قەید بکە، وی دەمی تە چ دکر؟ بۆنمونه وەکی مامئ تە؟

**جهمیل شیلازی:** من ب دەستی دنفیسی، هەر چەندە دەستتقیسانا چیرۆکی ژێ دئ کاری، بەس سترانی ئەگەر وەکی سترانی لادوویف ریتم و کیشا دەنگی وئ پیدفی یە بەهیت قەیدکرنی، چونگی دبیت گەلەك جارا سترانیبێژ ئەو و مەختی سترانی دبیزیت تو نکاری وەکی وئ بنقیسی.

لئ ئەگەر تە قەیدکر و هات قەیدکرنی، دئ دروست وەکی ئاوازا وئ هیتە قەیدکرنی، گەلەك جارا ئەفە دبوو ئاستەنگ، چونگی و مەختی ئەو دبیزیت: تو قەیدناکە ی تو نەچاری بنقیسی، هەلبەت نقیسینی ژێ گەلەك و مەخت پئ دقیت.

دایبیرا من بو من چیرۆک و ستران گۆتن و من قەیدکر ب (مسجل)ئ، ئەز رۆژەکی مام ل دەف ژنیقرو هەتا دەمژمیری (9) شەقی (6) کاسیت من قەیدکر، هەر ئیک ژوانژی دەمژمیر و نیف بوون، ئەگەر قەیدکرنا ب دەستی بایە دبیت وئ رۆژی هەمی، ئیک چیرۆک بو من نەگۆتبا، ئەوژی چونگی نقیسینی و مەخت پئ دقیا، بەس قەیدکرنی تو دشیی دەمەکی کورت، گەلەك تئتی قەیدبەکی، پاشی ئیدی فەگواستنا وئ ژ قەیدکرنی بو نقیسینی هەر دەمەکی بیت تو دکاری ئیدی ب کەیفە خو بنقیسی. ئەگەر بچی دەف کەسەکی و بیژی بو من هەندەك سترانا بیژە، ئەو بیژیت تو تومار ناکە ی ئیله نقیسین بیت، تە گەلەك دەم پئ دقیت، دبیت گەلەك جارا ئەف دەمی هەنی گەلەك جارا بەر هەفکاری نەبیتن و گەلەك و مەخت پئە بچیتن، چونگی دبیتن هەر ئیک ژمە وەك دەرگەهی ژیارئ فرمانبەر یان ماموستا یان هەر کارەکی دی ژێ بکەتن، ئەو ژێ لایەکی کارئ خو یئ پیدفی بکە ی و لایەکی کارئ کومکر و قەیدکرنا فولکلوری، گەلەك جارا ئەفە ژێ دبنە ئاستەنگ دریکا مرۆفی دا، قەیدکرنا دەنگی سترانیبێژان، نەخاسم ژنا کورد، گەلەك دەفەرین مە ب سەدان ژن مە هەبووینە دەنگی بوبوینە یان سترانیبێژبووینە، لئ بەیچ رەنەکی بەر هەفەبووینە دەنگی وئ بەهیت قەیدکر، حەتا قیگافی ژێ وەك چفافی مە، وەك رەوشت و تینالین وی بیت کەفن گەلەك ئازادی نەدایین هەمی ژنی بشیتن ئەف سترانە ئەف هەمی تئستین ل دەف بەهیت قەیدکر و تومارکر گەلەك ب ز مەمەتە حەتا قیگافی ئەم بیژین سەر مرای ئەف ئاستەنگین کیم بووین، لئ نوکەژی بین مابن، نوکەژی مەگەلەك کەس هەنە سترانیبێژین ب ئاف و دەنگن، لئ رەنگە بەر هەفەمەن، کەس دەنگی وان قەید بکەتن، ئەگەر قیگافی ئامویرین پیشکەفتیتین هەین دئ بسانەهیتەر هیتە قەیدکر، لئ نامادەنێنە بچیت بشوومەکی وەسا هەمی بەهیت قەیدکرنی، حەتا نوکە مە ئاستەنگین هوسا بەر دەوام هەنە، سەر هندی ژێ را دقیت ئەم بو خو ئاستەنگا نەکەمین ریکر دریکا خودا، و ب هەر ریکەکا هەبیتن بزاف بیتەکر بەهیت کۆمکر، ئەفروکە ئەگەر هاتە کۆمکر و چاپکرنی، ژ وئفە پتر دئ بیتە ئەرکی فەکۆلەرا و ب تاییەت زانینگەهین مە، قیگافی پستی دەهیت چاپکرن، زانینگەهین مە ئەگەر کونفرانسین هوسا زانستی بین بەر فرەهل سەر ئەفی بەر هەمی هەنی بەینە ئەنجامدان، دئ بەر هەمەکی زانستی یئ باشتر ژێ تیت بەر هەمینان، ئەفروکە فەکۆلین ل سەر بەینە کرن، ئەگەر فەکۆلەری یان کۆمکەری و خەباتکەری کۆمکر بەر هەمی خو هەمی کۆمکر و چاپکر، ئەرگە ئیدی دەزگەهەك بەهیت خوە لئ بکەت خودان و قافارتی ژێ بو بکەت، بو نمونە: دبیت سیه هزار گۆتتین مەزنا هەبن ئیدی ئەگەر هەمی هاتن کۆمکر و هاتنە چاپکرنی، دبیتن لژنەك ژ چەند کەسان خەباتەکی بکەن ژیکفاییرن و بەهین ژیکجوداکرنی، چونگی هەمی تئستین مە بین فولکلوری هەمی، ئەم زانین ب کیر هەمی دەما نائیتن، هەر هەندەك بو دەمەکی یئ باشە، لئ گرنەگ ئەو فەکۆلین ل سەر بیت کرن، تئستین مە هەمی یئ ئەرینی ژ یئ ئەرینی بەهیتە ژیکجوداکرن، چونکە هەندەك تئتی مەیی ب کیر و مەختەکی دەهات، رەنگە بکیر نوکە ناهیتن، هەر چەندە هەندەك تئتی هەمی ئەو بخو بی ئەم بیژین نامینت و هات قەیدکرنی وەك ئەدەبی مە و دیرۆکا مە بیت رۆژانەدا بو نمونە: ئەگەر ئەم بەحسی گۆتتین مەزنا بکەمین دبیتن مە سەدان گۆتتین مەزنا بیت هەین ئەگەر بو و مەختی خوە دباش بوون، دبیتن نوکە بو ریکین پەروردەیی باش نەبیتن، بەس هاتە قەیدکرنی، لەورا وەك قەیدکر هاتە قەیدکر و ئەرشیفکر، بەس وەکی دی ئەفروکە دژیانە رۆژانەدا ناهیت گۆتتی، ئەز باورنەکم بو

نمونه ئەگەر ئەم بیژین: "دار ب پینا، ژن ب سپینا" ل قیرە (ب پینا) ئانکو رامانا هندی پەرودەیا ژنی ب قوتانی و ب چیفی بیین، ئەگەر بو قوناغەکی دروست بیین، بەلێ ئەقروکە چینابیین بقوتی، لەورا گۆتن هات پاراستنی وەک ئەدەب و کلتور و دیرۆکا مللەتی، هەر تشتەکی هاتی و مەختی قەمۆلین ژێ ل سەر هات کرن دقیت ل دوپف وی ژبواری بیین، ئەری ریکین پەرودە وی دەمی چاوا بووینە ئەم نابیزین هەر تشتەکی پەرودە وی دەمی یی خەلەت بوویە بەلکو قیگافی ئەز دشیم بیژم ب سەدان تشتین پەرودە وی ریکین وانە یین وی دەمی پەرودەیا زارۆکی بیت یان ژنی یان مەزنی بیت یا هەر کی بیین، ب ریکا بیروباومرا بیت یان گۆتنی بیت یا ب ریکا ئەف ئەدەبی فولکلوری بیین، ریکین پەرودە وی هەندەک هەبووینە، بو نمونە: ئەگەر ئەم بەحسی هەندەک کەفە باومرا بەمین وەک دابیزن: "ئەگەر نینوکین تە گەلەک دریز بوو، شەیتان دێ نغیزێ ل سەر کەتن"، چیدبیت هەمال قیرە نینوکی دریز، قریژ و بیساتی بەکەفیتە دین را، دا بیژن: دا شەیتان نغیزێ ل سەر نەکەت، ئانکو دقیا زارۆکی نینوکین دریز پاریزین، یا گەلەک جار وەک ریزگرتن، ئەف خارن و فقیین ئەم دخوون دا نەکەفیت بن دەست و پینا دا بیژن: دندکەکا دناف هەناری دا هەمی دندکا بەحشتی یە، وەلێ دکر و نەکەمی ئیک دندک بەکەفیت، چونکی و مەختی هەناری قەدکە وی دندکین وی بژاله و بەلاف دین یان و مەختی دبیژن ئەگەر نانی سووتی بخوی دێ زەنگین بی، ئیحتمالە ئەگەر ئابوری هەبوویە و کیم خارن هەبوویە، دا ئەف نانی سووتی نەهیتە زەعیکرن و هاقین، یا دابیزن "بلا ب شەفی زارۆک نەدەرکەفن، دێ ئەزمان سورک هینی!" یان "دێ ئەجەنە هەنگیق!"، هەر چەندە وەکی ئەم دزانین ل دەف ئەزمان سورک هەر مەرف ب خوونە، بەس بو زارۆکی ئەو نەبوویە، یان نەچە سەر جەهەکی بلند، ئەگەر شەیتان دێ گۆپالکی خۆ کەتە پی تە، ئەفە هەندەک کەفە بیروباومرن ژێ، بەس ئەگەر ئەم بیژین ریکین پەرودەیی بیین وی دەمی بووینە، دێ چەوا زارۆکی خۆ ژ هەندەک تشتا پاریزی، بو وی دەمی دبیت د باش بوون، لی ئەقرو و مەختی ئەم تین قەمۆلینی ل سەر دکەین، ناچیبیت ئەم ب مێشکی ئەقروکە سەر دەریی دگەل وان بەمین، وەک ژبواری عەقلی هینکی ئەفە بوو، شیانین هینکی ئەفەبوون، ریکین وان بیین پەرودە وی ئەفەبوون، بو وی دەمی دباش بوون، لی بو مە دباش نین، چونکی نابیت، ئەقروکە ئەگەر ب مێشکی خۆ یی ئەقرو بەری خۆدەمە وانا دبیت گەلەک تشتا ژوانا ب کیماتی سەحکەمی بەس ژبواری هەر مللەتەکی نە ل کوردستانی بتنی هەمیان ئەف تشتە هەبوویە، دەستیکی ریکین پەرودە وی ب وی شیوەی بووینە، قوتابخانە و زانینگە هە نەبووینە، دبیت هاتن و چوون ب وی شکلی نەبوویە، هەر ئیکی لدوویف شیانین خۆ هەندە ریکین دەیانین، پەرودەمکرنا زارۆکی بیین، و هەر تشتەکی بیین.

**فەرەنگیس قادری:** وەک بەر هەفکارەک پتر چ بالا تە دکشینە و پتر حەز دکەمی چ بەر هەف بەکی و چ تیکستین فولکلوری؟

**جەمیل شیلازی:** من گەلەک تشت کۆمەر، لی تشتی پتر ئەز ل سەر راوەستیم ئەز ل سەر چیرۆکی راوەستیم، بەر هەمین من کۆمەری، بی گومان گۆتن و حەیرانوکی و ستران و گەلەک تشت کۆمەرن، بەس ئەو من چاپ نەکرن، من پتر خۆ ب چیرۆکی قە گرت، پینچ شەش پەرتووک هەمی چیرۆک و چیفانوکی من کۆمەرن، ژمن وەرە بەر هەفکار ژێ هەر ئیک دبارەکی دا کار بەت دێ خەباتا وی سەرکەفتی تر بیین، ئانکو ئەز چیرۆکی کۆم کەم و ئیک دی سترانی و ئیک دی گۆنتین مەزنا و ئیک دی حەیرانوکا و.. ئەگەر ئەفە هەبایە باشتر بوو، بو نمونە: ئەگەر بیژم ل دەقرا بەهیدیان (کامیران هروزی و شقان هروزی) هەمی تاین سترانا فولکلوری بخۆفە گرتی نە و بزاف کرینە کومەرینە و هەر چەقەک وەک پەرتووکەک بەر هەفکارینە، ئانکو دەمی بوارادا وان ل سەر سترانی گەلەک خەباتکرییە، لەورا ئەگەر ئیک دی بقیت ل سەر سەر هاتی خەباتی بەت و ئیک دی ل سەر گۆنتین مەزنا، دێ کارەکی سەر کەفتی تربیت، باومر دێ باشتربت.. هەر چەندە هەمی تشت گرنگە بیت کۆمەرن، من گەلەک تشت کۆمەر، لی من هەمی بەلافەکر،

بەلکو من ئەو تەشتی کومکری دانە ھندەک کەستین ئەو تا و چەق کومکری، ھەر بۆ نمونە: من ستران دانە (کامیران ھەروزی و...) و ھەیرانۆک دانە (ئەدیب عەبدوللایی و... ھتد، ئەم دشتین ئەفی کاری ژێ بکەین، راستە ل ھەر گوندەکی یان دەقەرەکی گەلەک تەشتی ل ھەیی، لئ مەرج نینە تو ھەمی بەلافکە، سەحکەیی کێ دی ئەف تەشتە کرێبە و ئەف کۆم خەباتە کرێبە، وئ گاڤی تو دشتی بیژی ئەف گۆتن و ستران و ھەیرانۆکین من کومکری دئ دەمە تە، بۆ نمونە: من نیزیکی (70) ھەیرانۆکا ھەبوون، برادەرەکی پەرتووکەک دروستکەر تاییەت ب ھەیرانۆکان ڤە، من ھەمی دانە وی، چونکی ئەو دئ پەرتووکەک تاییەت ب ھەیرانۆکا ڤەبیتن، من دانە وی، یا گرنەگ ئەو ھەمی چاڤکرن و بەلافکەرنی، لەورا دبیتن ھەر کەسەک، چەدبیت ئیکی ھەزا وی ھەر لاسەر سترانی بیتن، ئانکو کەسەکی داوتکەر بیتن و ھەز ژسترانی بکەت، مسۆگەر و مەختی ئەو دجیت سترانی کۆم بکەت، دئ پتر سەرکەفتی بیتن، ئیکی ھەمی ھەز دیوانین چیرۆکیژا دکەتن، و گو ھەداریا چیرۆکی دکەتن، ئەوئ گو ھەدانا چیرۆکی ھەبیتن، و مەختی چیرۆکی کۆم دکەتن، دئ پتر کاری خۆدا سەرکەفتی بیتن، ئەفۆزی گەلەک جارال سەر ھەزا مەروڤی بخۆزی دەبیتن، کا پتر ھەز ل سەر چ ھەمیە؟ بەس دەسەر ڤیژی را ناچبیت ئەم بیژین: (و ھللە) ئەف تایی گرنەگە و ئەفە نەمی گرنەگە؟ ھەر تەشتەکی ھاتبیتە گۆتن و زاردەڤ بیتن پاراستنا وی گرنەگە، ڤیچا تو پاریزی و ڤەدبکەوی و بەدەبیە ئیکی دی، یاگرنەگ ئەو بیتن کومکرنی.

**ڤەرەنگیس ڤادری:** لە چیرۆک بەلکی لە ھەیران و ڤورمێن دن ژێ وسابت، چەند ڤیژن ھەنە و ھک نمونە چیرۆکەک ل زاخو ب شێوازەکی و ل دەوکی ژێ ب ھەمان چیرۆک ب شێوازەک دی، تو چ دکی تو ھەمی بەرھەڤ دکی یان نە؟ یان بەس یەک ڤرژن؟

**جەمیل شیلازی:** ھەلبەت مە ل بەھدینان دوو سالای پێداچوون ل سەر پەرتووکین ئەنستیتوتیا کەلەپورا کوردی ل دەوکی کر و ھک شارەزایەک من پێداچوون دکر، و ھک تە کەرمەکری مە دبیتن ڤیژن چیرۆکەکی ل زاخو ب شێوازەکی تیت گۆتن، و ل نامیدی ب شێوازەکی تیت گۆتن، و ل دەڤەرەکا دی ب شێوازەک دی دەیت گۆتن، یا سەرۆشینیە ئەفە ھەمی یینە پاراستنی ھەتا گۆتتا مەزنا بیتن، من بەرھەڤکاریا مامکین کوردی یین دەڤەرا بەھدینان ل سەر نەھ پەرتووکین چاڤکری، جارەک دی من لیکدانەکا دی بۆ ھەمییان کرڤە، من دڤیا و ھک ڤەر ھەنکەکی لیکدەم، گەلەک جارای پەڤڤەک دەمەکی دال زاخو ب شێوازەکی یا گۆتی و ل نامیدی ب شێوازەکی یا گۆتی، من ھەردوو وەرگرتەڤە، چونکی مانا ئیک پەڤڤا جودا ل دەڤەرەکی ژ دەڤەرەکی یا گرنەگە مەبیتن، بۆچی؟ چونکی گەلەک جارای ئەگەر ئەم بەحسی یین خۆ ل بەھدینان بکەن، ل زاخو (دب، دکت) بکار دینن، دئ زانی ئەف دەڤە یی دەڤەرا زاخویە، لئ دەڤەرا نامیدی یە، (دبیت، دکەت) بکار دینن، دئ زانی ئەفە یا دەڤەرا نامیدی یە، ئانکو شێواز ئی ڤەگنرانا دەڤۆکی جودایە یان ئەم بیژین بۆ نمونە ل ڤی دەڤەرا زاخو (رووڤی، رووبار) بکار دینن، لئ دەڤەرا بەرواری بالا (رووڤی، رووبار) بکار دینن، و دەڤەرا نامیدی و نێروو و ریکان (ریڤی، ریبار) بکار دینن، و ھۆسان، کول ڤیرە سێ شێوہ زارین دەڤەرا بەھدینان ھەنە، لەوما کومکرن ھەمان تیکست ژ ھەمی دەڤەران زۆرا گرنەگە، ژ بەر جیاوازییا دەڤۆکا وان، لەورا ڤیگاڤی پاراستنا ھەر دەڤۆکەکی بلا ئیک تیکستی ژ ییت، بەس مادەم جیاوازی تیدا ھەمیە، بلا مادەم ھندەک پەڤڤین جیاوازی دناڤ وان تیکستان دا ھەنە، دڤیت ھەمی بەڤتە ڤەیدکرن، و مەختی سۆبەھی ڤەکۆلەرەک بەڤت، ڤەکۆلینی ل سەر بکەت، دئ زانیت ئەف تیکست یا کیش دەڤەرن یە. و ئەفە دئ بیتە دەولەمەندییا ڤەر ھەنگا زمانی کوردی.

ھەروەسان رەنگە گۆتتەکا مەزنا ل چار دەڤەرا ھەر ھەمان گۆتن دەیتە ڤەگنران، لئ دبیت دەڤۆکین جیاوازی یین ھەر دەڤەرەکی ژ وان تیدا ھەبن، لەوما کومکرن وان ھەمی تیکستان زۆرا گرنەگە، ژ بووی ڤەر ھەنگا زمانی مە دەولەند



دکهن، دبیت نیک پیف ئەم تشتهکی دبیزنی، ل دەفەرەکا دی ئەو تشتهک دی دبیزنی، و ناهەک دی هەر ئەو ناهە، بۆ نموونه: ل دەفەرا مە دبیزن "قولیک"، و ل دەفەرا زاخو دبیزنی "فاج"، سەحکی هەر نیک تشته لئ دوو دەفۆکن ژیک جیاواز دەیتە گۆتن، ئانکۆ ئەف ناهین جودا جودا بۆ هەمان نشت، دتیکستا فولکلوری دا هەمی، لەورا فەر هەنکا زمانێ مە یا ئەفقی فولکلوری دا هەمی، هەر تیکستەکی بیت و چەوا بیتن، بلا نیک ستران بیتن، ئەگەر دوو پەیفین جودا تیدا هەبن، بلا هەردوو تیکست بەینە وەرگرتنی، دقیت ئەم هەمی فەکۆلەر و بەر هەفکار ب ئەفی شیوازی هە سەر دەریی دگەل بکەن، نەبیزیت: (و لله) ئەف گۆتتا ل دەف مەژی یا هەمی پەیفەکی تەنی جودایە، ئەو پەیفە جودا دەولەمەندکرنا فەر هەنگا زمانێ کوردیە.

### فەرەنگیس قادری: ب بارای تە ئەو تشتین لۆکال تشتین تاییەت ب ناوچەکی دەبیت بپارێزریت؟

**جەمیل شیلازی:** دقیت هەمی بیت پاراستنی، چونکی پاراستنا وی شیوازی دیرۆکا وی دەفەری دیار دکەن، دەفۆکەک بۆ دەفۆکی جودایە، فەگێرانا وی جودایە، پەیفین وی نە ژ دەفەرەکی بەلکو ژ گۆندەکی بۆ گۆندەکی هەندەک تشتی هەمی جودایە، ئەف گۆندە تشتهکی دبیزیت، و گۆندەک ب رەمخە تشتهک دی دبیزیت، پاراستنا هەمی گەلەک گرنگە، ل سالا (2016) ئ دەما کو ئەم ل کوم خەباتەکا و مەقا میزۆپوتامیال نامەدی (د.رەمزان پەکتیف) تشتهکی گەلەک جوان گۆت، گۆت: دەما کو بابەتین فەکۆلینین دەرچوونی دەهین شاگردین خۆ بین زانینگەهێ، ئەم ل دەسپێکی چەند سەمینارا ل دوور شیوازی و چاوانییا کومکرنا فولکلوری دەهینە وان، پاشی ژئ دخوازی، کو فەکۆلینین خۆ ل دور هەر تشتی فولکلوری یی گۆند یان دەفەرا خۆ ژ بۆ مە کومکەن، وەک فەکۆلینا دەرچوونی، ئەگەر زانینگەهین مە بخوازی هەر زانینگەهەکی هەر چ نەبیت سالا نە هەزار قوتابی لئ دەرچن، ئەگەر (10 یان 20) فەکۆلینین هوسا سالا نە هەبن، دیرۆکا هەمی گۆندا دی هیتە فەیدکرنی، چونکی هەر گۆندەکی گەنجینەکا دەولەمەندا دیرۆکی یا هەمی، لەورا ئەگەر بیزتە قوتابی وی گۆندی هەر فەکۆلینا خۆ ل سەر دیرۆکا گۆندی خۆ چ هەمی کۆم بکە، وی دەمی زانینگەهین مە لژنن تاییەت پیکینن، وان فەکۆلینان هەلشاکتن و قافارتنی بۆ بکەت، ئەز باوەرم دی تشتی زوری گرنگ هیتە کەمکر و فەیدکر، و ریکەکا ب سەنەهی ئەو هەمی کەلەپوور و فولکلور دی هیتە پاراستنی، هەر بۆ نموونه: مە پەرتووکا گۆندی شیلازی بەر هەفکار، کو ژ (320) لاپەرا پیکدەیتن و ئەف تەوەرە تیدانە، لایەنی (دیرۆکی، جفاکی، ئابوری، سیاسی) ئانکو هەر تشتی پەيوەندی ب گۆندی فە تیدا هەمی، ئەز باوەردکەم هەر گۆندەکی ل دەفەری نە پەرتووکا هوسا بەلکو سێ چوار پەرتووکی هوسا بێنە نەبیت هەمی تشتین گۆندی و دەفەری دی هیتە کەمکر و فەیدکر، لەورا هەر گۆندەکی گەنجینەکا مەزنا تشتی یا تیدا هەمی، لەورا لای فەکۆلەری بیتن، لای زانینگەهێ بیتن، لای بەر هەفکارا بیتن، ئەرکە پیکفە کارەکی هەفبەش بێتەکر، و ئەف تشتین مای بێتە کۆمکرنی و خەم ژئ بێتە خاری.

**فەرەنگیس قادری:** چ جیوازی بەینا دەق هەنەک بەر هەفکار دبیزن دەقی رەسەن و هەنەک دەقی فولکلوری دبیزن ئەو هاتیە گۆ هارتن، تشتهک یان نەزەریەک هوسا هەمی، تو چاوا دبینی ئایا دباوەریا تەدا دەقی رەسەن و دەقی گۆ هارتی هەمی، تو چەوا دبینی؟

**جەمیل شیلازی:** ئەز بخۆ دگەل وی چەندێ نینم، هەمی دەقین مە دەرەسەن، بەس مە تشتهک دی یی هەمی ئەوژی ئەو کەسین ئەف دەقین کومکرین گۆ هرین و دەستکاری دەندەک دەفۆکین ویدا کرینە، کو ئەو کەسین هە ئەمانەتا زانستی یا پاراستنی ل دەف نەبوویە، بەلکو هەندەک کەس بوویە، هەندەک پەیف وان بین گۆ هارتین، ئەگەر وان دەستکاری تیدا کریت ئەف ژ دەقی خوی رەسەن دەرەسەن، ئەفەژی هەندەک ل دەما کومکرنا فولکلوری دا ئەف چەندا هە کرینە و مە بخۆ

هندەك كەس دیتینە ئەوین فولکلۆر کومکرین هەمی پەیفین بیانی دناف دەقاندا کوهارتینە ب پەیفین کوردی، کو ئەفە بخو خیانەتەکه دکەمن و ئیدی نابیتە کەسەکی باوهر پیکری، من گەلەك نمونە ژ ی هەنە (لئ پیتقی ریزکرنا ناڤین وان نینە)، لەوما دەما مروۆف دزانیت خودانی (فلان پەرتووکێ) دەستکاری د دەفۆکین پەرتووکێ دا کرینە، ئیدی ئەو وەك ژیدەرەك رەسەن ناھیتە هژمارتن، لەوما ناھا وێگافی دئ ژ دەفەکی رەسەن و خومالی بیتە دەفەکی گوهری. تنئ دخوازم گۆتەکا (د.عەبدولرحمان مزوری) دەرابەرە ی ئەو کەسین ب کومکرنا فولکلۆری رادبن، دبیزیت: "ئەز شیرەتی ل هەمی کۆمکرین فولکلۆری دکەم هشیار بن هشیار بن، ب ئەمانەت پەیفی وەکی وئ وەرکرن، و دەستکاری دپەیفەکی ژ ی دا نەکەن، هندی فولکلۆری مەیه کیش و سەروایا وئ می دبەررا ناچیت". کو هندەك برادەرین مە ل دەفەرا بەهدینان پەرتووکین فولکلۆری کومکرینە و چاپکرینە، لئ دەستکاری تیدا کرینە، لەوما ئەز وان ناھژمیرم ژ ژیدەرین ئەدەبی فولکلۆری مە، مادەم دەق ھاتیبە گوهرین، هەکەر ب چەند پەیفەکین کیم ژ ی بن.

لایەنی زانستی بی کومکرنا فولکلۆری ئەو، هەکەر خو ئەو فولکلۆری فەدگیریت ژ ی بان سترانیبێژ سترانا فولکلۆری هندەك پەیف خو ب شاشی ژ ی گۆتن و فەگیران، نابیت کومکەر وان پەیفرا راست فەکەت دەفەقی دا، بەلکو ددەھماندا دشتیت رۆھنکرئ بەدەت وان شایین گۆتووی، بیزیت، چیرۆکیبێژ یان سترانیبێژ ھۆسان گۆتیبە، لئ یا دورست ب فئ شیوہیە، ئەو ژ ی ددەھمانی دا نەك دەفەقی دا. ھەر بۆ نمونە، مە مامکا کوردی یا ھەمی، یاھاتی گۆتن: (ژفیرئ حەتا میسکا، ھەمی شاخین گیسکا)، نیکئ دی یا وەرگرتی یاگۆتی: (ژفیرئ حەتا میسکا، ھەمی شاخیت گیسکا)، یەنی ئەگەر تو سەحکەیی، پەیفرا (مویسکا) ناڤی گوندەکی دەفەرا بەرواری بالایە، و (مویسەکا) دیسان ناڤی گوندەکی فەزا (شێخان)ە، بەلئ نیکسەر سەروا (مویسکا) دگەل (گیسکا) ھاتە گوھارتن و کیش و سەروا ھەردوو تیکچوون و ھەمی کیش و سەروا وئ یاھاتیبە تیکدان، ئەفەژ ی دبیت هندەك جارا نە ژشەھرەزا یا وی کەسی بیتن، ئەو ئ تشتی وەرگرتن هندەك جارا دبیت ب شاشی بیت وەرگرتن، هندەك جارا ئەف تشتی چی بووی ناڤەکی ل دەف وی گولئ نەبوویە، چیدبیت وی ناڤەکی دی یئ گولئ بووی ب وی شیوہی، یان پەیفەك سترانیبێژ یان چیرۆکیبێژ و مەختی وەرگرتی ب ئەفی شیوہی یئ گولئ بووی و وەرگرتی، و چیدبیت یا خەلەت بیتن، ئەز دبیزم حەتا لڤیرە فئ خەلەتی ژ ی دڤین مروۆف وەکی وئ بەیلت، بەس دشتیت ددەھمانی دا ناماژەکی یئ بکت و بیزیت: یا دروست ئەفە. ئەگەر ئەم ب ئەمانەت بەس بەکەن، دڤیت ب ئەفی شیوازی بیتن، ئەما ئەگەر ب کەیفە خو ھەر پەیفرا من بڤیت چ شیوازی بیت یان دەفۆکا وئ بیتن، ئەز بگھورم، ئەفە نابیت ھەئ ئەمانەتا پاراستنا فولکلۆری دئەدەبی دا.

**فەرەنگیس قادری:** پرسیارەك ئەساسیە، داب ونەریتا چەوا پیناسەدکە ی؟ ل دەف تە چەوا یە، چ تاییەتمندیا ئەدەبی دەفکی یئ فولکلۆری ھەیە؟

**جەمیل شیلازی:** ھەلبەت، ئەو بخو ئەدەبی سەردەفکی چەندین تایا بخوڤە دگرت، چ د سترانی دبیتن، د سەر ھاتی و چیرۆکی دبیت، ئەگەر ئەم سەحکەینی، ئەو رەوشت و تینالین مە ھەین، گەلەك جارا ژ دەفەرەکی بۆ دەفەرەکی دئ بینی، ریز و سەروەری بویك فەگوھاستنی ژ دەفەرەکی بۆ دەفەرەکا دی دبیت گەلەك جارا جیاوازی، یان مە گەلەك کەفەنە باوهرین ھەین، کارتیکرن ل سەر بیروباوهرین وان ھەمی کریت، ئەف ئەدەبی دەفکی دەمیت سەر ژیاواری ھەر دەفەرەکی، ل ھەر دەفەرەکی گەلەك تشتی ھەمی یئ تاییەتە ب وئ دەفەرئ فە، بۆ نمونە: چیدبیت ئەگەر ئەم سەحکەینی خو رۆژ ھەلاتناسا ژ ی گەلەك جارا ناماژەیا پیکری، چیدبیت گەلەك جارا ل دەف مە و سەبوویە، ناچیبیت، کچا خو بەدیە نیکئ ژ دەرفە ی عەشیرا خو یان دەفەرین دی، و مەختەکی ھوسا بوویە، چیدبیت هندەك کارتیکرنین ھۆزایەتی و مروۆکانی

و تهخایهتی کارتیکنر یا ل سهر ئهدهبی مهیی دهفکی کری، ئەف داب ونهریتین هه کارتیکنرنا کری، ههر بۆ نمونه: دئ بیینی پینگو هارتی ل دهفهرین مه زورا بهربه لاقه بوویه، یهعنی دبیت ل ومختهکی پتریا شوپکرنا کچین وان پینگهورکاتی بابه، لی دهما نوکه سهحکهیی ههر پینگهورکاتی نهمایه، بهری خۆ بدئ ئەو داب ونهریتی دهمهکی گونجای بیتن، بۆ وی دهمی، لی بۆ دهمهکی دی نه بی گونجایه، یان دئ بیینی دهمهکی کچ ب نهخت ددانه شوی، بهلی قیگافی ههر نهخت نهمانه، یان رهفاندن ومختهکی ومک عادهتهکی بوو، لی نهۆ نیکجار نهمایه، نانکو ئەو تشتین ومختهکی ومک بیروباومر یان رهوش و تیتال نهفرۆ نهماینه، ومک: نهخت نهما، پینگو هورکاتی نهما، رهفاندن نهما، بهلکو ههتا ومک گوتهکا مهزنا ل دور رهفاندن و بهردانی ههیه دبیزیت: "حهفت جارا خوه بده رهفاندنی، جارهکی خونهه بهردانی" سهحکی دهف چفافی مه، بهردان ب چافهکی گهلمک مهزن بوو ژن بیته بهردانی، بهس رهفاندن یا رهوا بوو، بهس قیگافی ههتا رهفاندن نهمایه، بۆچی شتواری ئەف داب ونهریتین دهفهری نه، یین عهشیری و هوزایهتی ههبوویه و کارتیکنرنا وان گهلمک ل سهر فولکلوری مه ههبوویه، لی گهلمک ژ قانا ئەو بخۆ بهرف نهمانی دچینن، چهند پیشکهفتن بیتن، چهند کارتیکنرنا نازادین و رهوشهنبیرییا تاکه کهسی دناف چفافی دا پتر لی بیتن، ئەف تشتین شاش و خهلمت ئەو بخۆ نامینن، و دهینه لادان، مه گهلمک داب و نهریتین شاش و خهلمت ههبوویه، لی قیگافی سهحکهیی هیدی هیدی نامینت، قیچا دگهلمک تشتان دا، بۆ نمونه: ئەگهر بهحسی تازیا بکهین، بههینن مه گهلمک جارا ههتا بهری سالیان نوتان دا، دقایا ههر ژ روژا ئەو کهس دمر ههتا نیفارا نهینی، زیارتهی وی هاتبا گرتن ژ لای چهند مهلا و قورنان خوینان فه، یان ل تازییا چا هاتبا گیران، یان ل عهیدان ههمی زهلامین گوندی پشتی نغیژا عهیدی دچوون ل دور گورستانی دزقرین و فاتحه دخواندن و دگوتی دهورا مهقبهری، و گهلمک داب و نهریتین ب فی رهنگی، مه گهلمک تشتین ههین ومک دیارده بیوونه داب و نهریت، بهس دئ سهحکهیی پیرانییا وان نهۆ نهماینه، ژ بهرکو دیاردین خهلمت بوویه، دئ بیینی ئەو بخۆ هیدی هیدی نامینن، ژ نهگهری کارهکی شاش و خهلمته، هیدی هیدی ل دهفهری ههر تشتهکی شاش یان خهلمت بیتن، پشتی رهوشهنبیرییا چفافی چهند رهوشهنبیرییا چفافی باشت بیتن، ئەف تشتین شاش و کیم ئەو بخۆ نامینن، و یین دهینه لادانی، ئەوژی ب ریکا هندهک بهرنامین تهلفزیونی یان رادیویی و پیشکیشکرنا سمیناران و ریکهستنا کونفرانسان، ههلبهت ئەفه ههمی دبنه ئەگهر، کو گهلمک تشتین شاش ههنه و داب ونهریتین کهفن دناف مه دا ههنه شاشن، دبیتن وی بۆ دهمی خویی باش بیتن، بهلی بۆ دهمی مهیی نهۆ باش نینه، بهلی ئەفه ئەم یی دبیتن دناف ئهدهبی مهدا، دناف فولکلوری مهدا هیدی هیدی یی کیم دبن، ئەو بخۆ ژی نامینن، دئ هینه قهیدکرن دناف لاپهرین ئهدهبییا زاردهقا فولکلوری و هینه قهیدکرن، چونکی قهیدکرن دیروکا بوورییا مللهتی دیاردکهتن و ژبواری وی دیار دکهتن، چی ب ریکا ئەفی فولکلوری زاردهقی ئەفی هاتییه فهگیرانی، چ داب ونهریت بن و رهوش و تیتال بن یان جل و بهرگ بن، ئەفرۆکه تو دئ نیکی کورد ب چ نیاسی ب جل و بهرگین وی، بۆ نمونه: شهل و شهپک و کالک و کراس و فیستان، ئەفین ومختهکی رهش پوشی بکار دینان ئەفه ههمی ناسناما فی مللهتی دیاردکهتن و پاراستنا وئ چهندا گرنگه و ههکمر خۆ نههینه بکار دینان ژی، لی پاراستنا وئ د موزمخانان دا چهندا گرنگه هاتییه پاراستنی، مادهم ئەو تشتی ناسناما مهبیتن، دقیت ههمی بیته پاراستنی چ دهمز مخانان دا بیتن، ههکمر کهل و پهل بن دهمز مخانان دا بهینه پاراستنی، ههکمر ئهدهبی زاردهقه بهینه نفیسینی و چاپکرنی ب ههر ریکهکا بیتن، گهلمک جارا دبیتن مه هندهک تشتی ههی ههتا ب ریکا فیستهقالا، بۆ نمونه: ومک خوارنن کوردهواری، د هندهک فیستهقالین سالانه دا بهینه بکار دینان، دا بهرهباین نوی تشتهکی ژ وان خوارنن کوردهواری بزائن و بهینه پاراستن، نانکو مه گهلمک ریکین ههین، ب ریکا شتوارین فیستهقالا و کونفرانسا و سمینارا و بهرناما و ب ههر شتواری و ریکهکی تو دشتی تشتهکی بیاریزی.

## فهرهنگیس قادری: وهکی به لافهکرنا تشتی بهر ههف دکهی پتر چاپ دکن؟

**جهمیل شیلازی:** ئهگهر مه لژننن تایبته ههبانه، وهك حكومت و دهزگههینن تایبته ههبانه، گهلهك تشته هاتبا كۆمكرنن بهس ههمی تشته نه هاتبا چاپكرنن تشتی ههی بیته پاراستنن و نهچیتته دناف دهستی خواندهفانن نوكه دا، مه گۆت هندهك تشته بۆ دهمی خو یی باش بوو، بۆ نوكه یی باش نینه، لی دهما كو ئهف بهر ههمی فولكلوری ب ریکا تاكه كهسان دهیته كۆمكرن، ههلبته ههس كهسهك ژ وان بزافی دكهت وی بهر ههمی ل سهس ناڤی خو به لافهكهتن، ئهفمژ ی ب ریکین زانستی ناهیته ئهجامدان، لهوما بهر ههمی باش و خراب ههمی دكهقیته بهر دهستی خواندهفان، لی ئهگهر دهزگههكی تایبته مندبیتن و ب ریکین زانستی دی شیت ئهفی تشتی ژنك فاقیریت، و تشتین باش لیکدهت و جودا كهت، كهته پرتووك و چاپ كهت، یی دی ژی بهیته پاراستنن دهرشیفاندا، لی دبیتن ههتا رهوشا سیاسی هندا گونجای نهیبتن ئهف تشته بیتهكرنن، لی ئهفا هاتیبهكرنن ژی ئهف ب چاههكی سڤك ژی ناسهكهی، خو ئهگهر تشتی مه یی خراب ژی هاتیبه به لافهكرنن، یی هاتیبه پاراستنن، لی مه گۆت ئهركی كییه ژیکجوداكن، ئهوژی فهكۆلر ب ریکا زانینهكههین مهیبتن، یان هندهك دهزگههینن تایبته مند بن، ئهف كوفرانسین زانستی دهینهگیران، ههس نها ژی دشین گهلهك تشته فهكۆلن ل سهس بیتهكرن، پاش جار هكا دی بهین ژیکجوداكرن، یان ههتا پرتووكین مه ب سهس پرتووكین مه ههه، ههس بۆ نمونه ل دهفمرا به هدینان پتر ژ (12) پرتووكان یین گۆتتین مهزان چاپ بوینه، دهزگههینن تایبته دكارن لینهین شارزا و بسپۆر پیکینن، وان ههمی پرتووكان بینن، جار هكا دی ژیکفارتن و ژیکجوداكرنن بۆ وان گۆتتین بكن و بین باش دووباره بكنه فهرهنگهك و چاپ كهن و بین نهباش ژی بهینه پاراستن دهرشیفاندا، وهك پاشماین مللعتی، و ئهف دشینن پیتریا ئهدهبی خو یی زاردهف ئهوی هاتیبه كۆمكرن و به لافكرن جار هكا دی ژیکفارتنن بۆ بكهین، ب ریکین لژننن بسپۆر و تایبته مند و شارهزا فه.

## فهرهنگیس قادری: ئهشقی تهیی شهخسی ههیه، ئانكو لیجهم نه ههیبتن و به لافهكری و چاپهكری بیتن؟

**جهمیل شیلازی:** من گهلهك تشتی مای، من گۆته ته من بزافاكری، ئهو تشتی بهر دهستی من پتریا وان یی به لافهكری، لی من هندهك ژی به لافهكرییه، ئهوژی ئهگهر من زانی بیتن، برادرهكی تشتهكی ههی و تایبته ب وی تایی فولكلوریفه، من یی خوژی دایه وان دگهل یی خو به لافهكهن، لی دسهس هندی ژی را گهلهك تشتی ل بهر دهستی من مای دبیت هندهك جارا دهمی نه گونجای بیتن، ئهف ژیکفارتن و بهر ههفكهین بۆ چاپكرنن، بهس یی نه به لافكری گهلهك نهمایه ل دهف من، پتریا وی مه به لافكرییه، و نوكه ئهز پیتر گرنگی ب فهكۆلینن زانستی دهم ل سهس ههمی تا و چقین ئهدهبی فولكلوری ژ كۆمكرنن، لهوما (8) پرتووكین مه ههمی فهكۆلینن زانستی نه ل دوور بابیتن جودا جودا بین فولكلوری.

## فهرهنگیس قادری: ته ئاماژهكر پیتتر ب كاسیت تومار دكر، ئهو كاسیت نها لكیقهنه؟

**جهمیل شیلازی:** من نیزیکی (12 ههتا 15) كاسیتال جهم من ههبوون، ژ ستران و بهیت و چیرۆك و... ههتد، بهریا دههكی ههمی ئهو كاسیت من داینه ئهستیتویا كهلهپووری كوردی ئوفیسا دهوکی، وان ل جهم خو قهیدكرینه سهس (CD)، و دیسان ئهو كاسیت ل دهف منژی دیاراستینه، ئانكو ههس بۆ نمونه، ههكهر ئهز جار هكا دی بخوژم پرتووكین خو بین چیرۆك و چیقانوكان دووباره چاپ بكهمه فه، ئهز دكارم، وهك دهنگ لسهس (CD) ژی دگهل پرتووكان به لافكهك، بۆ نمونه: پرتووكا چیقانوكان كوردی، كو ژ (12) چیقانوكان پیکدهیبتن، ههمی ژی ژ فهگیرانا داپیرا من

(مراری موسسا) نه، کو ژیبی وئ پیتر ژ (90) سالان بوون، دهما کو من چیرۆک ژئ قهیدکرین، ههمی ب دهنگ لسسر کاسیتان مه قهیدکر بوون، نهم دکارم چاپا دووی (CD) ژئ دگهل به لاقههم،

**فهرهنگیس قادری: سیدی دگهل پهرتووکین دن ههمیه؟**

**جهمیل شیلازی:** من نینن، مهنهکر نه دگهل، چونکی نهو دهمی مه چاپکرین وهک پهرتووک هیتنا قوناغا سیدی ل دهف مه نه یا به لاقهبوو، یهلا مهشیايه وهک پهرتووک چاپ بکهین، لی قیکافی گهلهک پهرتووکین تینه چاپکرین، بزافی دکهن دهنگی وان ژئ دگهل دابیتن.

**فهرهنگیس قادری:** نانکو بهشهک ژ نهرشیفی ته، دیجلایتر بوویه لایی نهیستیتوویا کهلهپورئ کوردی؟

**جهمیل شیلازی:** پتریا وان، ب تایبعت نهوین من ل سسر کاسیتا قهیدکرین، پتریا وی من یی دایه وان، بهرییا دوو سی ههقیهکان وان یی ل دهف خو جارمهکا دی یی پاراستی، چونکی نهو کاسیت بخو ژئ یین کهفن بووین نهفه ژ سالآ (1987) ئ وهره هاتینه قهیدکرین، رهنکه گهلهک ژ وانژی ژ کار بکهفن، و هیدی هیدی نامویرئ (مسجل) ئ ژئ بهرهف نهمانی دجیت و کار پی ناهیتنه کرن.

**فهرهنگیس قادری:** نزانم بهلکی هندهک پرسیار ههمیه بهلکی دووباره بیت، ببامریاته بو نهرشیفهکی سهرکهفتی پیدفبا نهرشیفهکی سهر کهفتی ب چ دبت، نهرشیفهکی فولکلوری سهرکهفتی؟

**جهمیل شیلازی:** ژ بووی کو نهرشیفهکی سهرکهفتی بیتن، دقیت دهنگههکی وهکی نهیستیتوویا کهلهپورئ کوردی، بزافی بکهتن ههر تشتهکی هاتییه قهیدکرین و کومکرین ل دهف خو نهرشیف بکهتن، بو نمونه: نهگهر بیژم، سترانا دهفرا بههدینان ب خوشحالیفه ژ لایی کهسین وهک (کامیران هروری، شقان هروری، ریکیش نامیدی و عهبدولعزیز خهیات)، جهننن سالا چافینکهتن دگهل پتریا ستراننژین مهکرییه، نهر باومرم بهس نهو سترانن ل جهم (کامیران هروری) بنتی هاتینه قهیدکرین، پتر ژ (1000) هزار سترانا بن، نهگهر نهفه ههمی ل دهنگههکی بهینه کومکرینی وهک نهیستیتوویا کهلهپورئ کوردی، و وهک نهلبووم بهینه چاپکرین و به لاقهکرین ههر وهک نهلبوومین (محمد عارفی جزیری، عهیشاشانجی، حهسهن عهلی خهجر، کاویس ناغا، حهسهن جزیری و... هتد) کو ههمی سترانن وان هاتینه کومکرین و دهنگین وان پاقر کرینه و تیکستین رهسهنتر و باشتر ژبگرتینه، نهگهر نهفین ههژی وهک وان بهین نهرشیفکرین، ئیدی دکارن هیدی هیدی ب ریکین زانستی و تشتن رهسهن و باش ژئ بگرن، نهفه دئ نهرشیفهکی سهرکهفتی بهر ههم ئینیت و پاریزیت، کو نهفه ههمی نهرکی ل سسر ملین و هزارهتا روشنییری و لایهنن پهوهندیاره، ب فی کاری رابن، خو نهگهر وهک تاکه کهس ژئ نهف کاره کرین، حکومهت دشیت وی بهر ههمی ژ وان بکریت و نهرشیف کهتن و ل جههکی بیته پاراستنی، پاشی ههمی ل ویرئ ژنوی کار وهک لژنهییین بسپور کاری ل سسر چاپکرین و به لاقهکرنا وان بکهتن، جا نهگهر سترانه و نهگهر چیرۆکه نهگهر... هتد، نهگهر مه نهرشیفی سهرکهفتی بقیتن، دقیت ب نهفی شیوازی بیتن، نهفچا نهف پاراستنه چ ب ریکا موزمخانا بیتن، یان دهنگههکی تایبتهمهن بیتن ب نهفی کاری فه یان زانینگههان بیتن، نهو بخو مه هندهک تشتن ههین، نهرشیفی وئ نه ل جههکی بنتی بیتن، نهرشیفی وئ ل جههکی پیتر بهینه پاراست، ههکه رویدانهکا نه چاقریکری ل جههکی ژ وان رویددهتن و نهو نهرشیف ژناف ژئ بچیت، دال جههکی دی بمینته پاراستی. یا ژمنقه نهرشیفی سهرکهفتی دئ ب فی شیوهی بیتن، یهعنی گهلهک بزاف بیتهکرینی نوکهژی نهو تشتی مای و نههاتییه کومکرینی نهگهر هندهک کهس پی بهینه راسپاردهکرین، ههر تشتهکی مای کوم نهیبیتن نهو بزافی بکهتن و بیژی کومکهتن و بیته

ئەرشیفکرئی، ئەرشیفئ سەرکەفتی دقئیت یئ هوسا بیئت، ئەگەر هەر تشتەکی من کۆمکر مال دەف من، هەر تشتەکی تە کۆمکر مال دەف تە، وئگافئ چئدببیت پاراستن ژئ تئدا یا مسوگەر نەببئتن، لئکنئزیکبوون ژئ دببیت مەئگەه ژئ نەببئتن، لئ ئەگەر هەمی ل جەهەکی هات کۆمکرئی دئ ئاگەهی ل سەر هەمی دەقئین وئ هەببئتن، هەر دەقەر مەکی و هەر جەهەکی کا دەقەکی وەکی فی هەبە نینە، وەکی ئئکن بیئن جودانە، ئەفە ئەگەر هەمی ل جەهەکی کۆمکرئی بن.

**فەرەنگیس قادری:** هئچ بئره وەر یەکا خۆش یانەخۆش دکارئ تەدا وەک بەر هەفکار و مەختئ تو دچووئی گوند ب گوند دگەریای هەبە حەز بەکی فەگئیری؟

**جەمیل شیلازی:** مە هئد خۆشی ژئ بیئن دببئتن و هئد نەخۆشی ژئ، لئ تشتئ من دقئیت بئژم، جارەکی من (مسجل) بر و ئەز چوو مە مالا خالی خۆ، نەک داپیرا خۆ، دا چیرۆک و ستران و بەبئتان بۆ من بئزئیت و ئەز قەبەدبکەم، دەمژمئیر ئئکی پشئی نیفرو بوو، من گۆت: داپیر من مسەجلا ئینای بۆ من چیرۆکا بئزە؟ گۆت: بلا، باوەرکە من شەش کاسئیت بر بوون، هەر کاسئیتەک ژ وانژی (دەمژمئیر و نیف) بوون، هەر ژ پشئی نیفرو هەتا دەمژمئیر (9) ی هەمی کاسئیت من خلاس بوون، من گۆتئ: داپیر وەللە کاسئیتئین من نەمان بۆ قەبەدکرئئ، وئ گافئ رابوو سترانەکا رەقاسئ گۆت و دبەررا رەقسی ژئ!! ئینا ژنخالا من ژئ گۆتئ: ژرمام، ئەفە دەمژمئیر ئئکی پشئی نیفرو وەرە ستران و چیرۆکان دببئتی و ئەفە دەمژمئیر (9) ی شەقی یە ما تو نەوسئیا بئیه!! پشئی فی هەمی بئئ ژئ دوو و سئ سترانەکئین رەقاسئ گۆتن و دبەررا رەقسی ژئ!! کو هئد بەر هەفبوو بۆ گۆتئا چیرۆک و ستران و بەبئت هەتا قەسیدەببئین دینی بیئن مەلایئ جزیری و ژئ دگۆتن، باوەرکە ئەز بخۆ چ جاران وئ شەقی وی دیمەنی ژبیرناکم، نەخاسەمە ژبئ وئ ژ (90) سالی بوری بوو، یەعنی کەسەکا (90) سالی دەرباس بەمتن نەبەس چیرۆک و بەبئت دگۆتن، گەلەک جار و مەختئ سترانئین رەقاسئ دگۆتن، دگەل رەقسی ژئ، حساب بەکە دگەل دیمەنی گۆتنئ، یەعنی هەکە هئنکی فیدبو هەبایە و هاتبانە فیدو کرن، چئدببیت دا تشتەک گەلەک بەلکئش بیئن، ئەفە بۆ من بخۆ هئدی من کار و خەباتکری، ئەز ئەفئ شەقی چ جار ژبیرناکم.

**فەرەنگیس قادری:** رەسمئ داپیرا تەهەبە؟

**جەمیل شیلازی:** ئئکی ل فئیرئ ل دەف من هەمی بەس گەلەکئ سافی نینە، چونکە ئەو بخۆ یئ رەش و سببیه و یئ وئ رۆژنیە دەما کو من چیرۆک و سترانئین وئ قەبەدکرئین، (ئەفە وئنی وئ رۆژئ بوو)، و نەبەس تشتئ فولکلوری دزانئ، بەلکو ب دەهان شعرئین مەلایئ جزیری ژبەر بوون، حەتا من رۆژەکی چاڤئیکەتن ژئ یا دگەل کری، من گۆتئ: داپیر ئەف شعرئین مەلایئ جزبی زۆر ب زحمەتن، تە چاوا ژبەر کرئە؟ گۆت: مەختئ مە دەرسئین قورئانئ ب دەرسئینی وەر دگرتن، سەبەدایئ مە دبەررا ئەو شعر بۆ مە دگۆتن مە ژئ ژبەر دکرن.

**فەرەنگیس قادری:** ئەو چیرۆک و چئفانۆک زبەدتر داستانئین چنە؟

**جەمیل شیلازی:** چئفانۆک ل دەقەرا مە یا بەهەدیان، بەر امبەر (خرافە) یا عەرەبی بکار دئبئین، ئانکو دئو، عەفریت، ئەژدەها، مارئین حەفت سەر، سیمەرخ و... هئد، وەک کەسایەتئین خرابکار و شەرخواز تئدا دەئینە بکار ئینان، کو (فردرئیش فون دیر لاین) ژئ پەرتوو کەک هەبە ب ناقتئ (الحکایە الخرافیة) تئدا بەحسئ دیرۆکا پەبەدبوونا فی جورئ حکایەتئ و کەسایەتئین وئ دکەتن. هەر وەسان ئەلکزانەدر هئجراتئ ژئ هەر بە (الحکایە الخرافیة) ناقتئینە، ل دەستئینکا گۆتئا فی جهورئ چیرۆکا چئفانۆکی چیرۆکبئزئین مە دا بئژن: (چیرۆکئ چئفانۆکئ، ختە خەتو کئ، خەت فەگئیری...)، پاشئ دا

دهست ب گوتنا وئ كهتن، و پەرتووكا مە ی ب ناڤی (چیفانوكتیت كوردی) كو ژ دوانزده (0چیفانوكان) پێكد هیتن و هەمی ژ ی ژ گوتنا (داپیرا منن).

**فەرەنگیس قادری:** لئ ئەڤه هەمی گوتنا داپیرا تەیه؟

**جەمیل شیلازی:** بەلێ هەمی گوتنا وێه، نەبەس ئەو، سێ چار جارین دی ژ ی هندی ڤی ستران و گوتن و حەیرانوڪ، بەس ئەڤه ئەوین پتر چیفانوڪ بوونە هەمی من پێگڤه كۆمكرن.

**فەرەنگیس قادری:** كەسەكا بناڤ و دەنگ بوو داپیرا تە؟ یان بەس تو دزان ی هەبی؟

**جەمیل شیلازی:** نە، ل گوندی سترانیژا داوئا بوویه، نەبەس ل گوندی مە، حەتال دەوروو بەرین گوندی مەژی، ئەو گوندین دی گەلەك جارا بو داوئا داخاز دكره ویرئ بو سترانا و بو داوئا، یەعنی سترانین نارینكی هەمال گوندی ئەگەر داوئا چئ ببایه سەر چەمکی دیلانا ئەو بوو، لەورا یا بناڤ و دەنگ بوویه، گەلەك گوند مە هەبوون هەندەك سترانیژ بوون، تاییەت ل دەمی داوئا ڤان داخاز دكرن، چونكی دەنگخوشی وان یان شەهر مزایی وان دسترانی دابوو، گەلەك جاران داخاز دكرنە گوندین نیزیکی ئێك و دوو داخاز دكرنە ویرئ بو ڤهگیرانا وانا.

**فەرەنگیس قادری:** نەها ژ ی هەیه؟

**جەمیل شیلازی:** نەخیر ب وی شیوازی نەمایه، بەس هینكی هەبوویه، مە سترانیژ هەبوویه ل گوندا و ل دەڤەرا، هەمی دەما ژ گوندین دی داخاز دكرن، و مەختی بو داوئا داخاز دكرن، دا بیژنی ئەم حەز دكەین بەییه سەر داوئا مەژی، ژ بەر گوتنا سترانا، چ زەلام بیت، چ ژن بیت، هەردوو ژ ی داخاز دكرن.

**فەرەنگیس قادری:** بەلكیشە گەلەك، گەلەك سۆپاس، تە ژ بو پەرتووكین خۆ وەك مەقەدەمە دئقیسینە وەك دەستپێك دئقیسی؟ بو هەمی پەرتووك وەك دەستپێك دئقیسی؟ وەك شروڤه؟

**جەمیل شیلازی:** من یین نڤیسی، من پێشەكیهك یادایی ئەگەر یاكورت ژ ی بیتن ل سەر رەوشا كۆمكرن یان ناڤەروكا پەرتووكی مە هەمییان پێشگوتنەكا كورت دایی.

**فەرەنگیس قادری:** جگه ب داپیرا خۆ تو كاری ب كەسین دەنكین یان سترانیژین ژن ناڤەرتین دن قەید بكە ی؟

**جەمیل شیلازی:** قەیدكرن من كەسین دی نەقەیدكرییه، زەلاما من یین قەیدكری، بەس ژنا من كەس نە قەیدكرییه، بەس من چاڤ پێكەفتن دگەل هەلالا بەرچی كر، ئەوا بەری حەفتییهكی وەغەر كری، هەلبەت هەلالا بەرچی سترانیژەكا زۆرا ب ناڤ و دەنگ بوو، ئەنستیتویا كەلەپوورا كوردی پەرتووكەك ژ ی ب ناڤی وئ چاپكرییه، پەرتووكەك تاییەتە ل سەر هەلالا بەرچی، ئەز بیژم بەری حەفتییهكی یان دەه رۆژەكا یا وەغەر كری، سترانیژەكا دەڤەرا نەیلیلیایه، زۆرا بناڤ و دەنگ بوو، من كاسیتەكا (1) ئێك دەمژمیری وەك چاڤپێكەفتنەكی دگەل كر بوو، بو كۆڤارا ناسوی فولكلور، ئەوی ژ ی گەلەك ستران و چەندین نمونین سترانا ژ ی بو من گوتبوون من هەمی قەیدكرن، بەس من یین زەلاما، ژبلی داپیرا من، من گەلەك یین زەلاما ژ ی هەنە بەیت و حەیرانوكتین گوتین، بەس ئەڤین ناڤەرتا بو من گوتین، هەما من یین نڤیساين، تاییەت ئەگەر حەیرانوڪ بن تشتین كورت بن، ئەوانا دگوتن، چونكی ئەوانا حەتا رادەكی رێك ب قەیدكرن نەدەدان،

ئەگەر من بىن ھەين، بىن زەلاما سى چار كاسىتتىن ل جەم من بىن ھەين، بەس بىن ئافرەتا داپىرا من و ھەلالا بەھرچى  
بىننى بووينە.

فەرەنگىس قادرى: گەلەك سۆپاس، پرسىيار من نەما، ئەگەر تىشتەك ھەز بكى بىزە؟

جەمىل شىلازى: سۆپاس بۆ قى دەلىقى و دانوستاندى، سۆپاسىيا تە دكەين بۆ كار و خەباتا تەزى؟

فەرەنگىس قادرى: گەلەك سۆپاس.





به‌غدا ل پشكا كوردی، ئەزى مايمه ل ویرى بۆماوى (5) سالا، سالكى ئەزى چوويم ناف ريزين شورەشى دا، دگهل (نومەر مزيرى) ل سالا (1975) من كولىزه خلاسکر، بهشى زمانى كوردی. ل سالا (1970-1975).

پشتى هينگى هاتمه دامەزراندن ل قوتابخانەين سەرنايى، نافنچى، نامادەيى، پەيمانگهه، نامادەيا پيشەسازى ل باژيرى دھوكى، نامادەيا چاندنى ل سيميلى، نامادەيا چاندنى ل زاخو و دەركارى، و ل گەلەك جها نەم گەريابىن، ل سالا (2014) ئى نەم خانەنشين بووين، و مەختى ئەز ل نامادەيا پيشەسازى ل دھوكى، نوکە ژى تو يامەدبيني.

دەربارەى ئەدەبىياتا، ئەدەبىياتا كوردى ل سالا (1977) ئى نيكەمين جار من نقيسى، من د رۆژنامەيا (هاوكارى) دا، ل سالا (1977) نيكەمين گۆتار من يانقيسى، نيكەمين پەرتووكا فولكلورى ژى وەك (گۆتتەين مەزنان ل دەقەرا بەهدينان) ل سالا (1984) ياچاپ بووى، دووماهيك پەرتووك ژى كۆمەكا سەرھاتيا (2021 يان 2022) يە ب دروستاھى بيرى من نائيت.

**فەرەنگيس قادرى:** سەيدا ھەر ژ پەرتووكين تە، ژبلى ئەقا گۆتتەين مەزنان ل بەهدينان، ئەقا سالا (1984) ئى تە كۆمەكا دى ژى يا ھەي، نانكو تشتين كۆمكرين، ھەكو تو مامۆستا ل نامادەيا پيشەسازى، ھەكە تە ھندەك بەحسەى وئ كرابا؟

**مامۆستا جەجى جەغەر:** و مەختى ئەز گەھشتيمە نامادەيا پيشەسازى دھوكى، (ئەقە يە دقيرى دا)، قوتابيين من مەزنى بوون، بالق بوون، ھندەك ب ژن بوون، و دنال ژى بوون، وى و مەختى كورديني و ھەستى كورديني ھەبوو، قيجا ھەما تە چ گۆتبايى ب كوردى و دەرس ب كوردى گۆتبا، يا ژوانقە نيشتيمانپەروەرى بوو، ژ بەر زولما كۆمەتا عيراقى و تەعداديا دھاتەكرن، وەل خەلكەكى دكر، ھەما پەيقەكا كوردى باخقى بۆتە حساب دكر نيشتيمانپەروەرى، ل قيرى من ل سەر فولكلورى خەلكى دخواند، ب تايبەت ژى يى مسرى، مە (دكتورا نەبىلا ئيبراھيم) ھەبوو، يا زيرەك بوو پالېستينا مە دكر، و (ئەحمەد زەكى) ھەبوو يى مسرى بوو، ل سەر فولكلورى دنقيسين، نزا (چ؟ شەوكەت) ھەبوو، ئەقى ژى جان دنقيسى، ئەقە من ل سەر وان دخواند كا وان چاوا فولكلورى خۆ كۆمكرىيە، وان كۆمدر ب ريكاً قوتابيا ل مسرى، بۆ من ژى ھزر ھات، ئەزى دى رابم دى ئەقى بزاقى كەم كا دى سەر كەشم يان نە، ئەو قوتابيين ئەز بۆ دجووم پۆلا شەشى و پينچى و چارى ھەمى زەلام بوون، خەلكى ناكرى، ناميديى و زاخو بوون، مانى پشكا نافخۆبى ل نامادەيا پيشەسازى ھەبوون، من ريكەك نيشا دا، دا بيزمى دى ھوسا فولكلورى كۆمكەن، ب ئەقى رەنگى ھەكو دچنە گوندا ل دەمى بەنقەدانى بۆ راپورتا سەرى سالى، ئەم دى نمرال سەر راپورتى دەين، قيجا ھەر چيى راپورتا وى باشتر بيت، دى پتر نمرال بەت، بۆ نمونە (200 - 300) راپورت بۆ من دمان، ئەز دا چم وان ھەميا فاقيرم و بەرى خۆ دەمى باشترين راپورت، باشترين ستران و چيروك، باشترين گۆتتەين مەزنا كا چاوا بوون، من دەھليژارتىن، ھەر چيا ناقلى من ژى دبرى، كو فعلەن ئەقە فولكلورە، من دگۆتە وان كا وە ژ دەقى كى وەرگرتيە، ناقى وئ ژى بنقيسن، قيجا قى پەرتووكين من وسانە، ئەف سترانە ژ زاردەقى فلان كەسى ھاتيبە وەرگرتن، قيجا ب ئەقى ريكى ئەم شياين نيكەمين پەرتووك چاپ بەكەن، ئەو ژى (گۆتتەين مەزنان ل دەقەرا بەهدينان) بوو، ئەقە دوو ھزار و تشتەك گۆتتەين مەزنانە، ئەقە ھەمى ل دەف من دقيرى دا، ھندەكين ل سەر بانى، مە دەست پيكر، پشتى هينكى مە كتيبەكا دى چاپ كرهفە (ستران و گۆفەنديت كوردان) بين گۆفەندا بين كوردا، بەس بين گۆفەندا، ھوسا بەر دەوام بووين، كو بەر ھەمەكى باشى فولكلورى ل ویرى ب رنيا قوتابيين مە كۆمكر، پاشى ژ ویرى ھاتم، قيجا ئەز بخۆ دگەريام دەف ھەقلا، دەف پیرەمئرا، دەف ژنكا و دەف ھەر كەسەكى تشتەك بۆ من گۆتبا فولكلوربا من دنقيسى ل دەف خۆ، ھەتا قياقايى (12)

پەرتووکین فولکلوری ژ چیرۆک و سەرھاتی و چیقانۆک و گۆتتین مەزنا سترانین شەرا و سترانین پایزۆکی و سترانین ئەقیداری حەیرانۆک، نانکو بوونە (12) پەرتووکین فولکلوری ھەتا ڤیگافی ئەم شیاپن چاپ بکەن، ئەقە رۆلی من یی فولکلورییە کو ئەم شیاپن ئەقەن تشتا کوم بکەم.

**فەرەنگیس قادری: سەیدایی حەجی تە کۆم ژى دکر، ھندەک جارا فەکۆلین ژى ل سەر دکر؟**

**مامۆستا حەجی جەعفەر:** بەلێ من گەلەک فەکۆلین ل سەر کرن، ئەوین من فەکۆلین ل سەر کرین، دگۆفارا (رۆشنیری نۆئ)، گۆفارا (کاروان) و دگۆفارا (بەیان)دا من بەلاقەرینە وەک فەکۆلین، ئەقە ھەمی من کۆمکرە قە، و وەک پەرتووکەک ئەو ژى ئەکادیمیما زمانى کوردی ل ھەولیری بۆ من چاپکر، ئەو تشتین من بەلاقەرین و ب فەکۆلینین فولکلوری قە ھەمی د وئ پەرووکی دا مە کومکرینە قە چاپکرییە، چیدبیت ئەکادیمی نەبن، ژبەرکو کۆمکرنا مەژى ئەکادیمی نەبوو، ژبەرکو ومختی مە کۆم دکر مە بەرلایى کۆم دکر، مە نەخواند بوو ل پەیمانگەھى کو دئ چەوا فولکلوری کۆمکەن، مانە، تشتی وەسا دئ چەوا ل دەقەرەکی کۆپی کەن، نمونە ئەق سالا دئ چم فولکلوری ژ گوندەکی وەرگرم، پشتی دەھ یان بیست سالیان دی بجییە وی گوندی قە، بەرئ خۆ ب دەمی چ گھۆرین ب سەر وان تیکستادا ھاتییە بین من وەرگرتین، ئەق تشتە مەنەبوون، ھەما دا سترانەک تە گۆلی بیتن، چیرۆکەک دا تە گۆلی بیتن، ھەر تشتەکی فولکلوری تە گۆلی بیتن، تو بنقیسە ل دەق خۆ و ناڤی وی کەسی ژى بنقیسە و بیئە دئ نەرا بۆتە دانم، یان ل دیماییی ئەو خۆ بخۆ پێ را دبوون.

**فەرەنگیس قادری: سەیدایی حەجی تو بوویە وەک ئیلامەکی بۆ ھندەکین ل دوپت تەژی دا ھاتن، نانکو دەستەک دی ژى پشت وەرا تەقربییەن ھات، کارکەر بوون ب تە وەبکەن؟**

**مامۆستا حەجی جەعفەر:** ئەو قوتابین من گۆتیئ فولکلوری بینن، ھاری من بکەن ھندەک ژوان قوتابیا بخۆ بوونە فولکلورقان (جەمیل شیلازی) نوکە ژ من زیرکترە قوتابیی من بوو، نوکە ئەزئ ھیلام، (عەبدولرحمان بامەرنی و مەدی بامەرنی و ئەدیب عبدالله نەیلی، کیفی عارف) ئەقە ھەمی قوتابیین من بوون، من زەوق بۆ چێکر و ئەو ژى وەکی مە لیھاتن، ھندەکا ئەم ھیلاين ژ مەزیرەکترن، و ھندەکین دی ژى بیرا من نانینن، ئەم شیاپین حەز و حەزێکرا فولکلوری بکەینە دلێ ھندەکین دی ژى دا.

**فەرەنگیس قادری: مە دگۆت ئەو تشتین خوەندەکارین تە بەر ھەق دکر، تە لی دنیری و باشتترین تە دەھلبژارد، گاڤا تو دبیزى باشتترین؟ چاوا باشتترین پیناسە دکەى؟**

**مامۆستا حەجی جەعفەر:** ئەھا ئەقە خۆش پرسیارە، سەبارەت مە، ئەز مامۆستایی زمان و ئەدەبی کورد بووم، ئەز بخۆەژى ژ گوندا بيم ھەتا ژبئی من بوویە (14) سالی ئەز ل گوندا بووم، بچیکاتی ئەم دچوون دیوانا و مە گوھى خۆ ددا مەزنا، دەما چیرۆک دگۆتن، مالا مەژى باب و دەیکا من ئەزانی بخوینت و بنقیسیت، ھەما بەس وان ژى فولکلور بوو، ھەمی مالىن کوردا ھندەکا فولکلور دزانی، چیرۆک دزانين، سەرھاتی و ھەمی تشت، من بەگرم ھەندەک ھەبوو، من دزانی ئەق دەق و تیکستا فولکلورییە یان فولکلوری نینە، یان شکەستییە یان یاکیمە یان یا زیدەھە.

**فەرەنگیس قادری: تشتی کۆ تو ھاندای چ بوو؟**

**مامۆستا حەجی جەعفەر:** هاندەرئ ئیکێ من گۆته نه، من ئقیسینین ئقیسەزین مسری خواندن، ئەوان وەسا دیارکر کو سەرئ ئقیسینی ژ فولکلۆری دەست پێ دکەت، نانکو ئقیسینا باش فولکلۆری دەست پێ دکەت، فولکلۆر هونەرەکه ژ هونەرین ئقیسینی، ئەفە ئیک. یا دووئ وی ومختی (ترحیل و تعریب)، نانکو کورد ژ جەهئ وان رادکرن و دبرنه باشۆری یان ژێ دا بەلاقەکن، یەعنی حالئ کوردان یئ نەخۆش بوو بەلاقەدبوون، ل قیرئ ژێ من گۆت ئەف فولکلۆرە دئ بەرزەبیتن، بۆ من بیزانین پەیدابوون ژ ئقیسینین مسرییا، کو فولکلۆر بەرزەبیتن، ئیکێ گەلەک شارەزایە دفولکلۆری دا گەلەک چیرۆکا، سەرھاتیا و سترانا دزانیت، بەس دئ مرینن، ومختی دمرینن و تەژئ نەورگر تیبینن، ئەو بەرزەبوو، و ب ھەزاراتا یئ بەرزەبووین، ل قیرئ ژێ ھەیبەتەکی نیشتمانی بۆ من چنبوو، کو ئەز ئەفی فولکلۆری کۆم بکەم، چونکی کەلەپووری مللەتەکی یە، ھندی بشتیم و ل دیف شیانین خۆ دگەل ھەقالین خۆ و دگەل قوتابینن خۆ، من و سا ھزر دکر کو کورد ب دیماھی ھاتن، وەسا کاودانین مە د نەخۆش بوون، ھندی ھند ب سەرئ مەئینا، پەیفأ (کوردستان) قەدەغە بوو، ل قیرئ ریفەبەرئ مە ناغئ وی ( جبرائیل ھەسەن) رەفیق بوو، و کورد بوو.

**فەرەنگیس قادری:** نانکو (بەعسی) بوو؟

**مامۆستا حەجی جەعفەر:** بەلئ دگەل ھندئ ھەژ کوردا دکر، دھناقین خۆدا کورده، بلا بەعسی بیت، ھاری من دکر، وی نەدگۆتە من سەیدا قەدەغەمە ئەفان تشنا بکە، ھەتا جارەکی (مەمەد عەلی) ھاتە بیرا من (مەمەد عەلی نەتریشی) سکر تیرئ پارێزگاری، قوتابیئی من بوو، کەسەک ھەبوو ناغئ وی (زۆھیر) بوو ھونەر مەند بوو، ئەوژئ قوتابیئی من بوو، جارەکی (بەلاقۆکەک) چیکرن، ب لاتینی ئەو بەلاقۆکە چیکر بوو، و نەورۆز و دوو مار و نزا چی؟ و زۆھاک و ئەف تشتین ھۆسا، وی دەمی (دلشاد مەریوانی) ھاتبوو خەندقانن سەرا پیتین لاتینی، کو نیشا قوتابیان ددان، حکومەتا بەعس ئەو گرتن و خەندقانن لەشی وی نەدیارە ھەتا قیگاقئ، خۆ دوی ومختی دا، ئەف بەلاقۆکە چیکرن، و ریفەبەری پەسەندکر بوو، ژبەرکو دقیا یا وی ئیمزاکریا، ژنوی مە بەلاقۆکا خۆ ب دیواری قە دە ھەلاویست، وی ومختی مە نەرادکر، دئ بۆ مە بیتە ناریشە، دئ شک بۆ وان چئ بیتن، دئ بیزن بۆچی راکر؟ ھەما مە وەکی خۆ ھیلا، شانسی مەژئ بۆری و چ ب سەرئ مە نەھات، ئەف ریفەبەرئ مە جامیری، خودئ ژئ رازی بیت، گەلەک ھاریکاری مەبوو، ژۆرەک دابوو من بەس بۆ راپۆرتا بچمە تیقە کاری خۆ یئ فولکلۆری تیدا بکەم، ھندئ گەرم و پشتمەفان بوو بۆ ھاریکاری، ئەفە ئەو خال بوون، کو ئەز پالدايم، ئەز فولکلۆری کۆم بکەم.

**فەرەنگیس قادری:** وی دەمی حکومەت دبوو رێگر کو ھووین ل سەر فولکلۆری کار دکەن؟

**مامۆستا حەجی جەعفەر:** رێگری وەسا نەبوو، بۆ فولکلۆری، ھندی بۆ چیرۆکا ھونەری و بۆ شیعرا ھونەری ھە، بوو قان سانسۆرەکا دژوار ل سەر بوو.

**فەرەنگیس قادری:** سانسۆر گەلەک ھەبوو ل سەر شعری و تشتین داھینان، بەس بۆ فولکلۆری بیچەک مەجال ھەبوو.

**مامۆستا حەجی جەعفەر:** ھەما دا بیژئ فولکلۆرە مەجالئ وی پتر ھەبوو، گەلەک تشتئ ل دەف من ھە (ممنوع الطبع) ختما لی دا، نانکو ھەر پەرتووکەکا دەرکەتبا، دقیت تە پیشکیشی چاقدیریی کربایە ل بەغدا، بتنی ل بەغدا (دائرة رقابة

المطبوعات) هه‌بوو، ئه‌و دا ختما خۆ لێ دهن پسه‌ند كه‌ن، يان دا ختما خۆ لێ دهن پسه‌ند نه‌دكرن، به‌س هنده‌ك جارا هنده‌ك تيكستين سترانان يان هنده‌ك تيكستين چيروكا، دا نقيسن (ممنوع الطبع) په‌رتووكا من (كه‌فته باوه‌رين كوردا) ئانكو (معتقدات كوردية القديمة)، ئانكو به‌رئ خوه دئ هه‌يشئ، كورد بيژن بوچ هه‌يشه‌ غه‌يرى و تبت گوه‌ارتن، يان بوچى ني‌فه، يان ومختئ بيكى فه‌دگو هيزن ناچيببت ومختئ پرچا وئ شه‌دكه‌ن پرچا وئ بكه‌فته وارا پرچا وئ فه‌شيرن، يان ومختئ ماره دكه‌ن، دقيت هه‌مى ده‌ستين خۆ هۆلئ بكه‌نه هه‌نئ، نه‌كو سهره‌كئ لئ بكه‌ن، به‌عنى كه‌فته‌باوه‌رن، ئه‌و بخۆ ل ده‌ف كوردا راستى بو فان نينه و كه‌فته باوه‌رن، به‌س ل ده‌ف حكومه‌تا عيراقئ وه‌ك راستيه‌كئ بوون، له‌وما په‌رتووكا من ژ لايئ سانسورئ فه‌ نه‌ هات قه‌بويلكرن ژ بو چاپكرنئ.

ئه‌مه‌ده‌ك هه‌بوو نوكه ئه‌و ژى ماموستايه، خه‌لكئ زيويه‌يا شيوخ پيراميسه، ئه‌وى چيروكين ئه‌جنا بو من دنيان، ل ده‌ف وى هه‌ر چيروكه‌كا ئه‌جنا سه‌دا سه‌د راستينه، و ئه‌ف بيروباوه‌ره د فان چيروكا دا سانسورئ قه‌بويل نه‌دكرن، هه‌تا (دكتور به‌درخان سندی) سالآ (1992 و 1993) هات بو ريفه‌به‌رئ به‌لا‌فكرن و چاپكرنا كوردى ل به‌غدا (دار النشر والطبعة الكردية بغداد) وى چاپ كر، پشتى كو من كاغزه‌ك بو نقيسى من گوتئ: "په‌رتووكه‌ك هوسا يا ل ده‌ف وه يا ره‌فز كرى، نه‌گه‌ر تو بشئ بئ چاپ بكه‌ئ"، فئچا وى چاوا چاپكر وى چاپكر، ئه‌و ژى فئگافئ يا ل فئيرئ.

**فه‌ره‌نگيس قادري:** سه‌يدا ته‌ل ده‌ستينكئ هوسا ديار كو نه‌وه كوردينه‌كئ و مقاومه‌كئ بوو؟ ومخته تو په‌يفا كوردى كوم بكه‌ئ ئانكو ته‌ ژ وى منته‌لقئ، ئه‌و ژى نيك ژ نه‌گه‌را بوو؟

**ماموستا هه‌جى جه‌عفه‌ر:** من گوت، ئه‌و ژى نه‌گه‌ر كه‌ئ سه‌ره‌كى بوو، خه‌لكئ به‌رئ خوه دا مه، ئه‌فين دنقيسن، خه‌لكه‌كئ ب چاپه‌كئ پيروژ به‌رئ خوه ددا مه، ئانكو مهن ديين، ئه‌م ددبين، نه‌وه‌كى فئگافئ بوو، نقيسه‌ر دكيم بوون، نقيسه‌ر كيم بوون، گه‌لمه‌ك ل ده‌فه‌رئ هه‌ما ته‌ چ نقيسيبا تو دچاقين خه‌لكئ دا بئ مهن بووى، فئچا ئه‌وژى هانده‌ره‌ك بوو، ومختئ خه‌لكئ هاريكاريا ته‌دكر و ريز ل ته‌ دگرت، هه‌مى ره‌خا هه‌ر جه‌هه‌كئ تو چووبايئ ته‌ هه‌ست دكر تو نه‌وه‌ك فان مروفاى، بئ ب چاپه‌ك دئ بئ به‌رئ خوه دده‌نه ته، ئه‌وژى هانده‌ره‌ك بو بئ خه‌لكئ هه‌ميبئ.

**فه‌ره‌نگيس قادري:** پشته‌فانيبه‌كا مادى هه‌بوو بو كارين ته‌؟

**ماموستا هه‌جى جه‌عفه‌ر:** به‌لئ نه‌گه‌ر پشته‌فانيبا مادى نه‌با، ئه‌م نه‌دشيان، تشه‌كئ چاپ بكه‌ين.

**فه‌ره‌نگيس قادري:** هه‌ر حكومه‌تا عيراقئ بخۆ بو وى ده‌مى؟

**ماموستا هه‌جى جه‌عفه‌ر:** به‌لئ پشته‌فانى هه‌بوو، نوكه په‌رتووكين من هه‌مى ل سه‌ر نقيسيه‌ى يه، نه‌گه‌ر ل به‌غدا هاتببت چاپكرن (دار النشر الكردية) يا ل سه‌ر نقيسى ئه‌وان ل سه‌ر حسابا خۆ چاپ دكر و ماده ژى ددا مروفاى ل ديف مه‌لزه‌ما بوو، مه‌ دگوتئ (ملز مه)، نزا هه‌ر مه‌لزه‌مك هه‌فت ديارا بوو ب چهنئ؟

**فه‌ره‌نگيس قادري:** ئه‌فه‌هه‌تا به‌رى (1991) بوو، پشتى هينكئ؟

**ماموستا حەجی جەعفەر:** بەلێ هندی مە تێشەکی چاپکریایە چ ژێ ئەمێندارەتیا گشتیا رۆشنبیری و لاوان هەولێر بوو، ئەوان بۆ مە چاپ دکر ل سەر حسابا خو، پشتی چاپ دکر، پارە ژێ ددان مە.

فێگافی ئەگەر بۆ مە چاپ ژێ بکەن، سەد هێفیا ژێ ژێ بکە، و چ پارە ی ژێ نادەنەمە، هەر تێشەکی چاپ دکهی بۆ وانە، نەز (وەرگیران) ئ ژێ دکه، دکتور دزانیت (مەبەست پێ دکتور یاسر حەسەنە، کو دگەل دکتورە فەرەنگیس ل دیوانا حەجی جەعفەری یە)، وەرگیرانی ژ ئەلمانی دکهە نەه دەه پەرتووک مە وەرگیرانە، پەرتووکا (باغ کویستا کویفی را) (نەوازە دەقا 23:30) ژ ئەلمانی مە نیت کرین کوردی، فێچا ئەف پەرتووکین هە نیزیکی (5) هزار لاپەرانە، ل فێرئ هاریکاری ژ لای مادی قە نینە، ومختی حکۆمەتی و سەدامی هاریکاری پتر هەبوو ژ نوکە، چونکە وان یاسایا چاپکرنی هەبوو، لەورا جوداھیا یێ کورد و عەرەب و تورکمان نەبوو ل دیف یاسایی دچوو، فولکلۆر ب هندییە، شعر ب هندییە، چیرۆکا فولکلۆری ب هندییە، شانۆ ب هندییە... هتە، ئەوان ریفەبەرییەکا تاییەت هەبوو پالێشتیا هەمییا دکر، ل کوردستانی مە دوو ریفەبەری هەبوون، ئەمانەتا رۆشنبیری و لاوان ل هەولێرئ وی ومختی چاپ دکر، و ریفەبەریا بەلاقەکرنا چاپکرن کوردی ل بەغدا، مە ل ئەفان هەردوو جەهان چاپ دکر، هەتا (مەسوم مانی)، نیکەم پەرتووک ل سالی ن حەفتیا چاپکەر، بناقی (عیسی دەلا)، و مزارتەک هەبوو دگۆتتی (وزارە شوون الشمال)، و مزارتەکا کاروباریت باکووری، ئەوئ و مزارتەکا بۆ چاپکەر، یێ نیاس بوو هیشتا (سامی عەبدولرحمان) وەزیر بوو، هەر جەهکی بۆ تە چاپکریا یا دروست بوو، بەس وان پارە نەدا، (دکتور سەلاح سەعدوللا) هەبوو، ئەوئ پەرتووکا (ئەوئ دیلوماسی) پەرتووکەک ژ ئینگلیزی وەرگیرا کوردی، (محەسەد ئەمین) ریفەبەری رۆشنبیری و لاوان بوو، گۆتی: دکتوری ئینا دەف مە ئەها هەندە دەفترک ئینان ل سەر دەفترکا بوو، گۆت: حال و مەسەلە ئەفەیه ل سەر کوردایە، سەر کوردا ژێ یا تێدە، دا بۆ مە چاپ بکەن. مە گۆتی: بلا دئ بۆ تە چاپ بکەن، بەس نەم چ پارا نادەینەتە، چونکی ئەفە گەلەکا مەزەنە. گۆتە مە: بلا. پاشی پشتی مە پەرتووک چاپکری و خلاس بووین، مە جابا وی هەنارت و هات. مە گۆتی دئ بەهرا تە دەینەتە، دوو سەدا یان سێ سەدا، ل وی دەمی گەلەک چاپ دکر، دوو هزار، دوو هزار چاپ دکر، بەهرا مرۆفی دوو سەد سێ سەد دانە ددان مرۆفی. مە گۆتی: قەوڵی مە ئەو، مە و سا ئیتفاقا کری، کو چ پارا نەدەین تە. گۆتی: ئەرئ هەما درستە. مە گۆتی: دئ وێژێ بۆ تە سەرف بکەن. بۆ سەرفکر. و فێگافی چنە چنە بۆ هزار دینارین وئ گافی ییت بۆ سەرف کرین.

**فەرەنگیس قادری:** هزار دینارئ هینکی، هەر دینارک بەرامبەر سێ دولا را بوو. نانکو نیزیکی سێ هزار دولا را بۆ یێ سەرفکری، ئی گەلەک باشە.

**ماموستا حەجی جەعفەر:** گەندەلی یا کیم بوو، خەلک نە دویرا گەندەلی بکەت، یەعنی وئ گافی پتر پشەقانی و پالێشتی هەبوو ژ فێگافی، بەس فێگافی، چاپخانە و نقیسەر پترین لی هاتین، و دەزگایین بەلاقەکرئ پترین لی هاتین و دەزگا پترین لی هاتین.

**فەرەنگیس قادری:** سەیدایی حەجی، ئەگەر فێگافی ئەو تێشەکی بەرئ تە کۆمکری، یەعنی بۆ تە چ جارا شک ل سەر چێنابت، ومکو هەندەک تێشەت بەلکو نەدرۆست ب نە نە ژفی ناحیی قە؟

**مامۆستا حجی جەعفەر:** بەلێ دکتۆرە چ پێ نەفیت، تو نەفرۆ پەرتووکی چاپ بکە، سۆبەھی بخوینی، دئ بیژی خومزی ئەف ریزکە من راکربا، ئەفە من ئینابا، ئەفە ل قیرئ دروستەر، ئەفە قیرئ خەلمتە هاتی، یەعنی چ پێ نەفیت ئەفە تشتەکی عادی یە، ئەرئ چئ دبیبت دکتۆرە، ئەرئ وەللە ئەگەر ل دیف شیانیت قیگافی بن، ئەز ئەفان چاپ بکەم، دئ دەستکاری تیدا کەم، بۆ نمونە گۆتتەکا مەزنا هەمی دبیژیت: "هەفرکت میرا میرن، هەفرکت ماقویلا کرمانجیت تیرن"، من چ نفیسی بوو، بخودئ نزا ژبیرا من چوو!!! مەم من خەلمتییهکا دقیرئ دا کری، قیگافی ئەوا من گۆتی یا دروستە، بەس خەلمتیا وئ ئەز نزانم؟ ئەگەر بینم دەر دئ زانم، ئەگەر دووبارە پەرتووکی چاپ بکەمە فە، دئ وئ خەلمتییی راستفەکەم.

**فەرەنگیس قادری:** چ بەشەکی فولکۆری بالا تە کشاند یان سەرنج راکیشترە بۆ تە؟

**مامۆستا حجی جەعفەر:** بخۆدئ تو دزانی، سترانیت شەفەرۆکا و سترانیت داومتا و شەرا و حەیرانۆک، ئەف کەفە باوەرە هەمی مە کۆمکر، و ھندەکن دئ، ل نک مروۆفی هەمی دحۆش ئەمیزن، بەس پتر ل دەف من زەوقی من دچوو حەیرانۆکا، من دوو بەرگین حەیرانۆکا بین هەین، سترانیت کورتن و دحۆش و دسفن، و سترانیت ئەقینی نە، ومختی تو دخوینی بیچەکی سینگێ مروۆفی پێ قەدبیت چونکە دحۆش.

**فەرەنگیس قادری:** مامۆستا وەک ئەرشیف، ئەرشیفی تە زیدەتر ل ماله؟

**مامۆستا حجی جەعفەر:** ئەرشیف من دانە ئەنێستیتوویا کەلەپۆری کوردی بارا پترئ، بەس پەرتووکی من وەک پەرتووک، ئەو (12) پەرتووک ل مالن، پاش تو دشینی ببینی، بەس من گۆتی ئەرشیف ل ئەنێستیتووی دئ پتر پارێزین، من تشتی خۆ دا وان.

**فەرەنگیس قادری:** ئەو ئەرشیفی تە دایە ئەنێستیتووی چییە؟ دەستقیسە یان دەنگە (کاسیتە)؟

**مامۆستا حجی جەعفەر:** دەستقیس ژێ ئەو گۆتارین من د ومختی خۆدا دگۆفار و رۆژنامەین کوردی دا بەلاقرین.

**فەرەنگیس قادری:** وەک کاسیت و سیدی تشتی و سا هەنە؟

**مامۆستا حجی جەعفەر:** کاسیت نەخیر نین، من ئەداینە کەسێ.

**فەرەنگیس قادری:** کاسیت ل جەم تەماینە؟

**مامۆستا حجی جەعفەر:** وەللە کاسیت ژێ تەقریبەن من کیمین مابن، کاسیت ژێ من ئەماینە، چونکی ئەم چووین و رەفین و هاتین، ومختی (1996) ئ ئەز چوویمە ئەلمانیا دەعوەبەک بۆ من هات، کو ئەز سەمینارەکی ل زانکویا برلینئ پێشکەش بکەم ل سەر ژنا کورد، (1996) ئ بوو، ئەز چوویمە ویدرکی من ل ویرئ دەعوا لجویی کر، من لجو وەرگرت، ئەز هاتم مال" من زارۆک و عەیلئ خۆ هەمی برن، مەکتەبا خۆ من فرۆتە (بنگەھی لالش)، قیچا هەتا رۆژنامە و گۆفار ژێ مادئ چ لئ کەم، چ ئەرد نەبوون بەئلم، هەما من فرۆتتە وان، ئەم چووین مە دەستین خۆ هەژاندن، ل ویرئ ژێ ئەم دشیاين ھندەک پەرتووکا بۆ خۆ کۆم کەین، بەس ھەر مانە ل ویرئ، ومختی ئەز هاتیم قیرئ، ئەو ژێ مانە ل ویرئ، قیچا ئەف تشتی هەمی،

تنتی پەرتوو کخانا من ئەفە یال سەربانی ئەون یین کو پستی (2005) ئی هیرفە من کۆمکرین، ومختی ئەز هاتیم (2006) ئی ژنویکا من سەری دەستپنکر فە، کتیبەک ژفیری و فیراھە، یەعنی ئەو کتیبین بەری من کرین ژ حەزا خۆ، داچینە سلیمانایی و داچینە فەلادزی و داچینە بەغدا، بەس کتیبیا کرین، ئەو کتیب نەمان، من گۆتە تە هەمی من فرۆتن، ئەوین فیکگافی هەمی نە ئەون کو من بیر هاتن دگەل هەین، کتیبی مروفی بیر هاتن یا دگەل هەمی، کتیبەک من یال بەغدا کری، هەکەر مابا فیکگافی، سالی ن حەفتی سەبرا تە ب وئ کتیبی دەیت، ئەفە هەمی یین (1195) ئی و هیرفەنە.

**فەرەنگیس قادری:** ئاستەنگین کۆمکرن و بەرھەفکرنا فولکلوری یین تەیین تاییەتی یین شەخسی چ بوون؟ دئەرموونا تەدا؟

**مامۆستا حەجی جەعفەر:** چ پێ نەفیت، دئ ئاستەنگ هەین.

**فەرەنگیس قادری:** وەکی چی سەیدا؟

**مامۆستا حەجی جەعفەر:** ئەو ئاستەنگین من دیتین، دکۆمکرنی دا، دئ ومختی تە گەلمەک پێفە دچین، تو پیتفی گەلمەک دەمی بۆ وی کاری، یەعنی ومختەکی من قوتابخانە هێلا، ژ لایی دراغی فە ئەم سفر بووین، حەتا من خواندن هێلا، من هەمی تشت هێلا، ئەفە ئاستەنگ بوون، ل سالی (92 و 93) ئ ئەم چووینە گوندا ئەم بووینە جوتیار، ئەز ب عیال بووم، عیالی منی هویر بوو، مووچە نەبوو و تیرا مە نەدکر، من هیلان ئەم چووینە گوندا، وی ومختی هەما ئەز ب ژیا ئی فە مام، و زمحمەتا ژیا ئی، هەما دوو و سێ سالا ئەز ژ فولکلوری دویربووم، کۆمکرنی و ئقیسینی و فلان و بیفان، یەعنی ئاستەنگین ژیا ئی گەلمەک هەبوون، ئاستەنگین ژیا ئی هەندەک جارا هەبوون، نەگەلمەک جارا هەبوون، دا بیژن: بۆچی بتنی تو فولکلوری کۆم دکەمی؟ نەسبەت حکۆمەتی، بۆچی تشتین دی ناکی، بۆچی تو فولکلوری کۆم دکەمی؟! ئاستەنگین دی هەبوون جارەکی ریکانی دا من قووتن، سەرا چی؟ سترانەک من گۆت ل سەر تەلفەزیوونا کەرکویکی، سترانەک گۆت، ناغی شەخسەکی تیدا بوو ناغایی ریکانییا، من نەزانی ناغایە.

کۆرک دبیژیتە کچکی:

تو بیبە حەلاوا عەلبکی دا تە تام ناکەم

تو بیبە گۆل تە بەیناکەم

تو بیبە کچا تەتۆکی ریکانی تە مار ناکەم..

ئەف تەتۆکی ریکانی، ئەفە من نەزانی ناغایە و ناغایی وانە، ئەفنی چیرۆکا خۆ یا هەمی، (ئەز و مزیری و کەریم فندی) چووینە دەف ناغایی وان بابۆ ئەم یی خەلمت بووین، مەعەفو بکەن، مە نەزانی.

جارەکی ژ ی دگەل دوسکییا، مەسەلمەکا هەمی: (پیرۆمەری.... دکەن، گەرماقی خۆ دنیخە ناغی) فێچا گەرماقی ناغانە، گوندی ناغایە، ئەفە تەعەنە بۆ وان، وئ هە یی وئ شۆلی دکەن، ئەفە یی خۆ دنیخە ناغی، ئەفە تەعەنە بوو بۆ وا، دیسا ئەفە ژ ی



دین خو چوون، بەس پەرتووک چاپ نە ب بوو، بەس ڤیگافی هەما پەیفین گەرماڤا یی تیدا وەک فەر هەنگوک پیرۆمەرا یا تیدا، بەس مەنەلە مەژێ بر، ئەم شیاوین ژێ بەین، و حەیرانۆک ژێ ئەوێ من گۆتیه تە، ئەو ژێ و مەختی من پەرتووک چاپکری من راکر، هوسا گەلەک تەشتین هەین، ئاریشین چاکێ بۆ مروڤی ژێ چی دین.

**فەرەنگیس قادری:** مامۆستا تە جیوازی دناڤهرا دەڤی رەسەن و دەڤی گوهارتی تە دەیت؟ ئەو مەسەلە ل دەڤ تە چەوابوو؟

**مامۆستا حەجی جەعفەر:** بخودئ دەڤی رەسەن و گوهارتی هەما ل دەڤ مە ئیک بوو، چونکی دەڤی رەسەن مە نەدیتبوو، کایێ چەوابە، هەما سەری وئ بۆ مەدەت، سەری وئ وەکی مادەیه، ڤیگافی تو دزانی وەکی ئەڤرۆکە نەبوو، ڤیگافی تو دشییی، پەرتووکین چاپ بووین، هەکە تیکستەک بۆ تەبیت، تو دئ هەڤهیرکەهێ دگەل فلان پەرتووکێ، یان بێقان پەرتووکێ، دئ شیی، رەسەنی و نەرسەنی ئینی دەر، یا راست و دروست ئینیە دەرێ یا شاش دئ ئینیە دەرێ، وئ گافی ئەڤ ئەو دیبە مە نەبوو، هەرچی دەت مادی خام بوو، ل دوویڤ شارەزا یا تە تو دا دەڤەکی هەلبێژی هەندەک جارا دوو سێ تیکست دەاتن، هەر سێ من دنفیسین، من رەفر نەدکرن، من گۆتی ئەوێ ڤەکۆلینێ بکەت، ئەو خەما وی، هەتا گۆتین مەزنا گەلەک تەشت هاتن نە گۆتین مەزنا بوون، بەس من دکرن پەرتووکێ دا، من گۆت هەکەر ڤەکۆلەر بێتن، دئ هزر کەت پا ئەڤە چیه؟ وەک ڤی نموونەیی: "صوفي صوفیين نینیتێ کەچکین وان تەگارەک دچیت، هەر دبیژن چ ناچیت" نەگۆتین مەزنا، من کرە تیدا، ژ بەر چی؟ من گۆت ڤەکۆلەر دئ ئیت ژ مە شارەزاتر، وەکی زانکۆ یا زاخو وەکی تەدیتی پشکا فولکلوری ڤەکەن و ڤەکۆلینێ ئەکادەمی تیدا بەینە ڤەکۆلین، دئ بێژیت پا بخودئ ئەڤە نەپەندی پشیا، ئەڤە چیه؟ ئەڤە تەیکە ژ فلان بابەتی و دئ جەهکێ بۆ بێنیتن و ناڤەکی بۆ دانیتن، بەلی ئەڤە ژێ مەیت کرین تیدا.

**فەرەنگیس قادری:** سەرۆبەری فولکلوری ل بەهیدیان چەوا دیبێ، یەعنی گەشینی یان جیگرە ڤیگافی؟

**مامۆستا حەجی جەعفەر:** ڤیگافی خراب نینە، گەنجین هاتین، مە زانکۆ ژێ بین هەین، زانکۆ ژێ خەمی ژێ دحون و ئەو گەنجین ڤیگافی ژێ و ئەنستیتوت بین پەیدا بین، یەعنی د و مەختی مەدا چ تەشت نەبوون، چ زانکۆ ل دەوکت نەبوون، چ دەزگایین ئەنستیتوت ژێ نەبوون، هەما هەر کەسەک شەخسی خو بوو، ل دوویڤ دلسوزیا خو شیانین خو شول دکر، بەس ئەڤرۆکە گەلەکن، بەری وەک تیلین دەستا بوون، مەزانی چەند نفیسەر ددوکت دا هەنە، چەند فولکلوری کۆم دکن و چەند چیرۆکێ کۆم دکن، و چەند رۆمانی دنفیسن، چەند شعرێ دنفیسن، هەمی دناشکەرا بوون، بەس نوکە، ماشەلا، ئیکێ گۆت مە (22) زانکۆ یی ل کوردستانی بتی هەین، ئەڤە هەمی هیز و پالەدەرەکە بۆ کۆمکرنا فولکلوری ئەزێ گەشبینم، هەتا ئەوێ مە کۆمکری، ئەو دشین ڤاڤیرن، بێژن ئەڤە باشە و ئەڤە نەباشە ژێ دەر بیخن، یان مە سترانین شەڤەرۆکا بیت کۆمکرین، چیدیبت سترانەک چوو بیت تیدا ئەیا شەڤەرۆکێ بیت، ل وی دەمی بێژن: ئەڤە نە سترانا شەڤەرۆکانە، ژێ بین دەر، یان سترانین گۆڤەندا و دیلانا، دبیت سترانەک کر بیته تیدا ئەیا گۆڤەندا و دیلانا بیت، ئەڤرۆکە بین ئەڤان تەشتا بین دەر، یەعنی ژ مە زیرەکترن، دڤیت زیرەکترین، چونکی دئ بنە ڤەکۆلەر، مە مادی بۆ کۆمکری، کۆمکرنا یا بەردەوامە، چیدیبت (30%) مە کۆم نەکر بیتن، دڤیت بزافی بکەن یی مای نە کۆمکری ژێ، ئەو کۆمکەن، یەعنی ل سەر ملین وان دەینت، ئەو کۆمکەنە سەر ئیک.

**فەرەنگیس قادری:** گەلەک سۆپاس.



هینگی من حمز دکر بجمه پیمانگه‌ها هونهرین جوان، بملی مالا مه نه‌خواست بجمه پیمانگه‌ها هونهرین جوان، چونکی ومکی شهرمکئی بوو. هه‌کو من زانی نه‌فه جبهه کارمکی هونهری تندا دهیت کرن، من دقیا قالاتیا خو ل قیرئ پر بکهم، نه‌ز هاتم قیرئ دگهل ماموستا (مزهه‌ری خالقی) رووینشتم، گۆتی گریه‌ستا مه‌یا هه‌ی سی هه‌یقیه، من گۆتی هوبن ژمن رازی بن، نه‌ز ژ هه‌وه رازیمه. د کارین کارگیریدا من دهست ب شۆلی کر، شۆله‌کی ساده دا من، بیچ بیچه و سال بۆ سالی من خزمهت کر، ماموستای ژی نه‌ز وک کهسه‌ک نیاسیم، بلا جه‌نابی ته‌ پرسیار ژ ماموستای بکه‌ت، نه‌ز حمزناکه‌م بخو به‌حسئی خو بکه‌م. به‌س ماموستای دیت دکاریدا چهند نه‌کتیف و دلسۆزم، نه‌سه‌که‌کی مزنتر دا من، نه‌ز کر مه‌ ریفه‌بەر ل قیرئ ل سالا ۲۰۰۹-۲۰۱۰ بوو، هه‌کو نه‌ز کریمه ریفه‌بەر، من نه‌زمونا چهندین سالی‌ن کاری لقیرئ هه‌بوو، شارم‌زای شۆلی ئینستیتوتی بووم، لقیره هه‌را پروژین کهلتوری بۆ من په‌یدایوون. هه‌قالین من هه‌می کهسین مزن بوون ب هه‌مریقه، نه‌ز ب سه‌عتان دگهل دروینشتم، بۆ من هه‌زین شۆلی چی بوون، من پتر شیا جه‌ی خو ببینم، به‌رنگه‌کی کو قیگافکی هه‌ر شۆله‌کی دیتر بۆ من پینشیا‌ز بکه‌ن، بۆ نمونه من بکه‌نه و مزیرژی، نه‌ز پتر حمز ژ فی شۆلی دکهم، من پی خوشتره نه‌ز دقیریدا کاربکهم، چونکی عه‌شقه‌ک دناقبه‌را من و کهلتوریدا چی بوویه. سالانه نه‌م راپورتا خو چی دکهم، هه‌زین کار و پروژه‌یین خو دکهم، ته‌ماشنا دکهم کا مه‌ چ شۆل هه‌یه و بۆ سالا داهاتی چ بکه‌ین؟ هه‌کو نه‌ز هه‌ر و پروژه‌یین خو دنقیسم، وه‌ک چاپکرنا نه‌لبوومان، یان کهتیا، یان چیکرنا دوکیومینتاریه‌کی، هاندانه‌ک بۆ من چی دبیتن. نه‌م هه‌ر دکهم، کا چ قالاتی دکتیخانه و میدیا کوردیدا هه‌یه، داکو سالا به‌یت تژی بکه‌ین. نه‌ز پتر حمز دکهم هه‌زین کارین مه‌ ناوازه بن. نه‌و کارین پیویست بن، کو خه‌لکی ده‌ست فه‌ن‌دایی و نه‌م وان کاران نه‌نجام بده‌ین. هه‌تا نوکه‌ژی سوپاس بۆ خودی نه‌م کارئ خو دکهم و دی به‌ده‌وام ژی بین. من پترحمز کری یه‌ سه‌ر پرسین ژنان کار بکه‌ین، ژبه‌رکو پتر ژنی کهلتور یی پاراستی، هه‌کو ژنک زاروک دبیت، هه‌تا زاروکئ وئ دچت پی یا سترانا پی دبیزیت، هه‌تا دبیت زافا سترانی پی دبیزیت و هه‌کو دمريت سترانی پی دبیزیت. هه‌گه‌ر نه‌م ل هونهری کوردی و فلکوری بنیرین، دبیین هه‌می ART ه، ب هه‌می رنگه‌قه‌ که‌قالین هونهرینه، قیچا من ته‌ماشاکر ژنی که‌له‌ک رۆله‌کی مزنی هه‌می، ژنی سترانیت شه‌ری، یی ب کورئ و زه‌لامی خو گۆتین و زه‌لامی وئ د شه‌ریدا شه‌هید بووی، به‌س ژنی نه‌شیا‌یه ل دیوانخانا سترانی بیژیت، یال به‌ر لانکی گۆتی و زه‌لامی ژ وئ گۆلی بووی، چوویه دیوانخانی گۆتی، چونکی بۆ زه‌لامی وی ومختی شه‌رم نه‌بوو، سترانا بیژیت، بارا پتر ده‌نگیژین مه‌یین ژن دقیا بنتی بان دا ستران گۆتبان، وه‌کی دی پی شه‌رم بوو سترانا بیژیت، هه‌گه‌ دیوانخانه‌ خه‌ر ژن بانه بوویک هاتبا دا نارینکی پی بیژن، سترانیت بوویک تالیه‌ت و جودانه، هه‌کو بوویک ده‌یت، دچیت، رادبیت و ژمالبایی دبه‌ن، سی جارا را دکهم، هه‌می رتوره‌سمین کوردا ب ستران ده‌اتنه گۆتن، قیچا ژبه‌ر نه‌ه‌یچه‌ندی من دیت، نه‌ف ستران و هونهر و کهلتورئ زه‌نگین و ره‌نگین، به‌ینه پۆلینکران و پاراستن. مه‌ بریاردا بگه‌ریین و ببیین د کیش قولچه‌کیدا، ژنه‌ک هه‌یه نه‌م بچین ب ده‌نگ و ره‌نگ تۆمار بکه‌ین. چ جارا ده‌نگ نینه، نه‌ز به‌ده‌وام دبیزم هه‌ر ومخته‌کی مروّف ده‌ست پی بکه‌ت نه‌ ده‌نگه، نوکه‌ژی نه‌م گوند گوند دگه‌رین، نه‌م ته‌ماشنا دکه‌ینی کا لکیرئ ژنه‌ک، ستران بیژمه‌ک هه‌یه دا نه‌م خو بگه‌هینیی. بیرا من ده‌یت رۆژه‌کی، من گوه ل دوو ده‌نگیژین ژن بوو، ل رادیویی ستران دگۆتن، ناقی وان (حه‌نیفا) و (کوردی) بوون، د رادیویییدا گۆتن: (نه‌م سۆباهی دی چین) من پیوه‌ندی ب رادیویی کر و من گۆتی: (بیژئ نه‌چن، نه‌و مه‌ه‌فانین مه‌نه‌!) رۆژا نه‌ینی بوو، ب شه‌فی نه‌ز هاتمه‌ قیرئ و مه‌ ده‌نگی وان نژیکی دوو سه‌عتا تۆمار کرن، مه‌ کره نه‌لبووم. ئیکه‌م نه‌لبووما وان ده‌نگه‌ده‌ا، چونکی ده‌نگخۆش بوون. قیچا بۆ کار و پروژین هوسا دقیت مروّف سه‌رگرم بیت، خو پاقیته شۆلی. هه‌قالیت من نه‌فین ده‌ینه جهم مه‌، په‌یوه‌ندیی دگهل مه‌ دکهم بارا پتر په‌رهمیر و دانعه‌مرن، کهسه‌کی هیژا ب ناقی (شیخ تۆسمان) هه‌یه، وی دوختیدا، نه‌رشیفه‌کی زه‌نگین یی کۆمکری، نه‌رشیفی خو ناده‌ته کهسه‌ی، بملی بۆ مه‌ هه‌می

دەرگه‌هان فهدکەت، چونکی متمانه ب مه ههیه. هه‌روسا (ئەلماس خان) ئ گه‌له‌ک هاریکاریا من کر، ئەز د چووومه مالا وئ، من دهنگی وئ تومار دکر، من گوتی دئ کهمه ئەلبووم، گوت: (دروسته، تو یا دەستوویر دای!) قنچا ب ریکا وان پێوه‌ندیین باش، مه شیا گه‌له‌ک ژ ئه‌رشیقی ژنان کۆم بکه‌ین، ژبلی ئه‌رشیقی ژنان وه‌کی دی ژی دگه‌ل مه هاریکار بوو.

**فهره‌نگیس قادری:** زۆر سوپاس. ئه‌رشیقی وه پر بالا من کشاند، هه‌بوونا ئەو ژمارا به‌رز و به‌رچا‌ف و گرنگین به‌رهمین ژنان بوو، ته گوت نیزیکی ۱۰ ئەلبووما به‌س به‌رهمین ژنانه؟

**به‌هار عه‌لی:** گه‌له‌ک ژوانا مه چاپ نه‌کرینه‌ژی، ژبلی ۱۰ ئەلبووما، نیزیکی ۲۰ ئەلبوومین مه‌ین لبه‌ر چاپی، (سیسکا سمۆی) مه چاپ کر، (سیسکا مه‌جیدا) مای. دهنگیژین ژنن کوردین ئیزدی بیت ماین، دهنگیژین (ژن و می‌را)، بین رمخی نامیدی و نه‌یلئ، کو مه پیکه‌ ئینان قیرئ، گه‌له‌کین ماین، هیشتا مه‌چاپ نه‌کرینه و یئ لبه‌ر چاپی.

**فهره‌نگیس قادری:** دیشی بیژی ئه‌وین چاپ بووین کینه؟

**به‌هار عه‌لی:** ده‌یکا جه‌مالی به، مریم خانه، عه‌یشاشانه، گولبه‌اره، فه‌وزیا مه‌مه‌د، ئەلماس خان، بانو شیروانی و ئەفانه و هنده‌کیت دیژی.

**فهره‌نگیس قادری:** تو چه‌وا نا‌فی وان دزانی؟

**به‌هار عه‌لی:** ئەم لیکۆلینی دکه‌ین، مه (ئیرانم خانم) ژی هه‌یه، ئەوژی ل به‌ر چاپینه، مه ته‌واو کره‌یه. مه پرسیار کر ل باکوژی کوردستانی ئیکه‌م ژنا دهنگیژ کی بوو؟ گوتن: (گولی) به، مه پرسیار کر: دهنگی وئ هه‌یه؟ گوتن: دهنگ نه‌مایه. ئەم لیکۆلینی دکه‌ین، لدویف ئه‌رشیفا رادیویا به‌غدا پرسیار دکه‌ین، ئەم دپرسین کا کئ ئیکه‌م جار بوو هاتیه رادیویا به‌غدا ستران گوتینه؟

مه ل رادیویا ئیریقانی هه‌فال هه‌نه، پرسیار ژئ دکه‌ین کی بوو، ئیکه‌م جار هاتی رادیویا ئیریقانی ستران تومارکره‌یه؟ ل شنگالی دهنگیژیت هیناین، مه دیدار دگه‌ل ساز کرین، پرسیار ژئ کرین: د ومختی خو دا ژنا دهنگیژ کی بوویه؟ بو مه گوتین: (مه‌نجی خانم)، (مه‌نجا کۆره) دبیژنی، ئیکه‌م ژن ل شنگالی ستران گوتین، مه‌نجا کۆره بوو، من دوو سترانین وئ بین په‌یداکرین، من هه‌ز دکر بکه‌مه ئەلبووم، مه‌نجا کۆره، کو به‌را هه‌میان ستران دگوتن، سترانین شه‌ری و سترانیت چیرۆک دگوتن، دگوتن د ومختی خو دا خه‌زینا سترانا بوویه! ئەفه بو مه گرنگه، بلا گه‌له‌ک ستران نه‌ین، گرنگه مه سترانه‌ک وئ دبت، ژیاناما وئ هه‌یه، و چه‌ند شایه‌دحال به‌هسی وئ بو مه‌کری و وه‌سفیت وئ بو مه‌گوتین و مه بیت تومارکرین و کره‌یه به‌لگه و مه دۆکیۆمینت کری.

**فهره‌نگیس قادری:** ئەوژی بالکیشه، واتا پرانیا پرۆژه ل سه‌ر پێوه‌ندیین که‌سۆکیی ته چی دبت، وه‌کی لیکۆلین، به‌ر هه‌فکر، په‌یداکرنا به‌رهمان؟

**به‌هار عه‌لی:** ئەو نشته‌کی باشه، ئەزژی بو هه‌فالین خو هاوکارم، قنچا هه‌ر که‌سێ بکه‌ت و فیدایی بکه‌ت.

**فهره‌نگیس قادری:** ناسته‌نگ دقان پرۆژه‌یان دا ل سه‌ر ژنان چنه؟

**به‌هار عه‌لی:** مروّف نه‌شیت هه‌میان د ومخته‌کی دیار کریدا پیکه کۆم بکه‌ت، مه ومخت پێویسته، پرۆژین نه‌نستیتوتی به‌رده‌وامن، پرۆژیا ژنن سهر کرده، پرۆژمیه‌ک به‌رده‌وامه، نه‌ز نه‌شیم بیژم سآله‌ک دی دئ ته‌واو بیت.

#### **فه‌ر نه‌گیس قادری:** پرۆژما ژنن سهر کرده چیه؟

**به‌هار عه‌لی:** پرۆژا ژنن سهر کرده، بریتیه ژ فه‌کولین و تۆمار کرنا نه‌و وه‌ستیا نا ژنن کوردان دیتین. ئیک ژ وان ژنان، (سینه‌م خانم)ه، کچا (جه‌لادت به‌درخان)، د ومختی خۆدا ل روژنافا ژنه‌ک سهر کرده بوویه. قیچا پرۆژا مه لسهر وان ژنان کار دکه‌ت، هه‌تا دگه‌هته ژنن مآژی، نه‌و ژنن هاریکاریا پێشمه‌رگه‌یان دکر، پێشمه‌رگه دچونه چیا، زارۆکیت خۆ بو ژنان ده‌یلان، ژنان کارئ وان زارۆکان ریکده‌یخستن و بخودان دکرن و په‌روم‌ده دکرن. پێشمه‌رگه پستی شمش هه‌یقان دا زفرن و بینین، مآل ریکوییکه و قسوریه‌ک ل مآلی نینه، خوارنی بو پێشمه‌رگه‌ی ناماده‌کهن، زارۆک ده‌نارتنه قوتابخانی، نه‌ف هه‌موو شو له ب کیز ژنی ده‌یت کرن؟! ده‌یت سهر کرده بیت هه‌تا بشیت وان هه‌موو شو لان بکه‌ت! کارین چقاکی و مآل و خیزانی، کاریت ژنی گه‌له‌کن، ژن ژ پێوه‌ندین چقاکی به‌ر په‌ر سه، په‌روم‌ده‌کرنا زارۆکان لسهر ملیت ژنیه، ده‌ما زارۆکه‌ک خراب بیت، نابیژن سوچ ژ بابیه، دبیزن دایکا وی جوان په‌روم‌ده نه‌کریه! قیچا هه‌گه‌ر نا‌ف کوردا زارۆک هه‌بن، جوان په‌روم‌ده ببیت، دبیته سهر کرده! نه‌م ده‌می دچینه گوندان، ژ وان ژنن تاییه‌ت و چالاک دگه‌رین، دا دیداری دگه‌ل بکه‌ین و ناقت و ان به‌ینه نا‌ف ناقت ژنن سهر کرده.

#### **فه‌ر نه‌گیس قادری:** هه‌وه به‌هسی هه‌لاله به‌رچی کر، هه‌وه به‌ر هه‌مه‌ک، یان نه‌لبوومه‌ک دۆکیۆمینتاری لسهر وئ چیکریه؟

**به‌هار عه‌لی:** هه‌لاله به‌رچی ژنه‌کا ده‌نگیز بوو، کۆمه‌ناس بوو، لسهر شاهیان بوو، ل سهر تازیان بوو، پێوه‌ندین وئ بین چقاکی به‌یز بوون، که‌سایه‌تییه‌ک چقاکی بوو، خزینا ده‌نگیزیی بوو، مروّفی هه‌ر چ خواستبا جه‌م هه‌لاله به‌رچی هه‌بوو. هه‌لاله به‌رچی، چیرۆکا وئ گه‌له‌ک تراژیدییه. من کریهه فیلمه‌کی دۆکیۆمینتاری، هه‌روسا مه سترانیت وئ کۆمکرینه، دگه‌ل کتیا وئ مه چاپ کریه. هه‌مه‌ک نه‌رشیقی دیژی هه‌بوو، بکیز به‌لا‌قه‌کرنی نه‌ده‌اتن، مه ل نه‌رشیق وئ هه‌لگرتی، هه‌مه‌ک تشت هه‌مه‌ مروّف نه‌شیت به‌لا‌ف بکه‌ت، به‌لی نه‌م هه‌لدگرین و دشین بو فه‌کولین زانستی مفا‌ی ژنی بین.

#### **فه‌ر نه‌گیس قادری:** بوچی دشیان دانیه به‌لا‌ف بین؟

**به‌هار عه‌لی:** هه‌مه‌ک تشت هه‌مه، نه‌شیت بکه‌ینه به‌ر هه‌م، دشین ل نه‌رشیقی هه‌لگرن، بو ده‌می پێویست ببیت به‌ر هه‌مه‌ک دیجیتالی، به‌لی نه‌م نه‌شیت جاری وه‌ک به‌ر هه‌م به‌لا‌ف بکه‌ین، ره‌نگه سترانه‌ک لسهر شه‌ره‌کی گوتیبت دنا‌قه‌را دوو گونداندا، هه‌گه‌ر به‌لا‌ف ببیت، دوو نینه نه‌شیت نوی وی سترانی قه‌بول نه‌کهن و ژ مه عیجز بین، به‌س نه‌م وه‌ک به‌لگه د نه‌رشیقیدا ده‌یلین، پنتقی ناکه‌ت نه‌م به‌لا‌ف بکه‌ین.

مه پرۆژمیه‌ک لسهر ره‌فاندنا ژنان دنا‌ف نیزدییاندا هه‌یه، ده‌ما ژنه‌کی دره‌قین، چه‌وا سولحی دکهن؟ کی ژنی دره‌قینیت؟ نه‌وی عاشق، یان ب زوری دره‌قینیت؟ مه نه‌فه هه‌موو کریهه دۆکیۆمینتاری و پرۆژا مه به‌رده‌وامه.

**فهرهنگیس قادری:** دوو شت بالا من کشاند، یهك گافا ته بهحسا ههلاله بهرچی كر، ته دگۆت كۆمهلناسه، ئهو پهیفهك بالکیشه، حهز دكهه هندهكی شروقهكهی؟ پرسیارا دن ئهوه ته گۆت دناف قوتابخانه و زانینگههیدا لدۆر (ئهلماس خان) ئ وانه دهیت خواندن؟

**بههار عهلی:** چقاکناس و کۆمهلناس ئیکن، من گۆت ژنهك کۆمهلناس بوو، چونکی ههلاله بهرچی ل گوندی بهرچی بوو، ههگهر ل ئامیدی ژى داووتهك ههبا، دا بیژن ههبن ههلاله بهرچی بینن، دگۆتن ل گوندی بهرچی ژنهك ههیه ههبن بهینه سهه شههیانئ، ههگهر ئاریشهیهك ههبا دگهل زهلامان، ل دیومخانئ دروینیشت، مل ب ملی زهلامان بوو، ژ بهر هندئ من گۆت ژنهكی کۆمهلناس و چقاکناس بوو.

**فهرهنگیس قادری:** تیگهیشتنهكی کوور بۆ کۆمهلهگههئ خو ههبوویه.

**بههار عهلی:** بهلی، من بههسی (ئهلماس خان) بیژی کر، قیگافی قوتابی ل زانکویئ لدۆر وئ دخوینن.

**فهرهنگیس قادری:** ههگهر تو بههسی (ئهلماس خانئ) بکهی ئهو کییه؟

**بههار عهلی:** ئهلماس خان دوتماما (مريم خان)ه، د سألین سیهاندا چوو بهغه، ئیکهه ژن بوو دهنگئ خو ل رادیویا بهغدايي لسهه قهوانان تومار کر. گهلهك زحمهتی کیشان، پاشی ئهلماس خان شوی ب کهسهکی ئینگلیز کر، ئهفسهه بوو، دهیتهه کوشتن و گشت مالا وی بۆ ئهلماس خانئ دمیئیت. ئهلماس خان ژى د ومختی خودا، مالا خو دکهته مهلبهندهك بۆ دهنگیژان. دبیهه مالا هونهه مهند و رهوشهه بییرین وی ومختی، وهك (مههمهه عارفی جزیری) و (حهسهه زیرهك) لدۆر وئ کۆم دیوون و هوزان و ستران دگۆتن، ژ بهر کو د وی ومختیدا چ بنگههین رهوشهه بییری نهبوون، مالا خو کر بوو مالا دهنگیژان، بۆ وی بۆمه گهلهك گرنگ بوو سترانیت وی بکهمه ئهلیووم و دگهل ژیننامهیا وی بهلاف بکهین.

**فهرهنگیس قادری:** ئهف پرۆسه ته چهوا ئههجام دا؟

**بههار عهلی:** بهلی ب رییا دوو کهسان، کهسهك لهباکوړئ کوردستانئ دهاته جهه مه، پرسیار کر کا مه چ لدۆر ئهلماس خانئ ههیه؟ ئهو فهکۆلهه بوو، فۆکۆلین دکر و چ زانیاری بهردهست نهکههتیوون، وی ئیشتابهههك دناقههرا ئهلماس خان و مريم خانئ کر بوو، کهسهك دی ب ناڤئ (ئوسمان سووړچی) کو گهلهك قنجینیت وی لسهه مه ههنه. ههقالئ مهیه و ژیی وی ۸۶ سال تی ههیه، مالا وی مۆزخانهیه، گهلهك قهوانیت کهفن ههنه، من پرسیارا ئهلماس خانئ ژئ کر، من گۆتی ته دهنگئ ئهلماس خانئ ههیه؟ گۆت بهلی من ههیه، بهس نادهمه کهسئ! من ژى نادهیه منژی؟ گۆت نهشیم بیژمهته ته نا؟! و مره مال و ئهز دئ نیشانی ته دهم. ئهز ژى روژهکی چووم و ژیننامهیا وئ و سترانیت وئ مه تومارکر، مه کره ئهلیووم و بهلاف ژى کر.

**فهرهنگیس قادری:** ئهو پیوهه دینیت کهسوکی دگهل مامۆستا (ئوسمان سووړچی) وهکر ئهوی کاری ئههجام بهی؟ ههگهر ئهو برادره نهبا نههشییا بیژیت نادهمه ته؟

**بههار عهلی:** مامۆستا (ئوسمان سووړچی) دبیزیهه من: تو کهسهکی راستی، حهز ژ شۆلی خو دکهی، دزانم ته بهرژهه دینیت کهسوکی تیدا نینه، دزانم تو بازرگانیی ب وان تستان ناکهی، ژ بهر هندئ کهیفا من ب ته دهیت. تو

دلسۆزی بۆ کارێ خۆ، ته دقیت وی کهلهپوور و کولتووری بپاریزی. گهلهک کەس هاتینه جهه من، تشتیت برین، پاشی من ژبیر دکهن و خۆ سلاف ژێ ناکهن! ئەم نه وساینه، بهردهوام پرسیارا وی دکهن، سههدانا وی دکهن، مالا خۆ بگوهوریت یان نساخ بیت ئەمم دچین سهرا ددهین، ههفتیی جارەکی تیلەفونا وی دکهن، ژێ پرسیار دکهن کا چهوايه؟ ساغه یان نساغه؟ ئەم وهفاداریت وینه، پیوهندییا مه و مک کچ و بابی لیهاتینه، دبێژیته من تول جهی کچا منی!

**فهرهنگیس قادری:** دلنیا ئەف پیوهندیه دگهل کەسین دێژی وساین؟

**بههار عهلی:** ئەو بیگومان، ل کوردستانی ژبلی لایهتی کاری، لای کومه لایهتی گهلهک گرنگه، ئەم وهک کەسهکی می نێزیک دیم، چونکی ههگەر وهک ریفههس نێزیک بیم، هیچ نادهنه من، ئەم ژلای کومه لایهتی نێزیک دیم، من مامۆستا نۆسمان سووچی بانگ کریه مأل، ئەم چوویمه مالا وی و مه پیکفه زاد خوارییه، دهمی وسای پیوهندیی چیکه وی، نهشیی بیری، کارێ خۆ تهواو کە وی و پیوهندیی ب دوویماهی پی بینی، نابیت. چونکی گۆت ئەم وان تشتان ب پارژی نادم، چونکی شیخی عهشیرهتی سووچییانه، ل دهۆکی ژێ کەسهکی بنافودهنگه.

**فهرهنگیس قادری:** ئەف تشته گهلهک جوانه، دهمی ته گۆت، پیوهندیی چیکه وی نهشیی بیری، نانکو تشتی خۆ و مربرگی و بیژی تهواو!

**بههار عهلی:** ههگیز نابیت بیژی ب خاترا ته و بچی، نا نابیت.

**فهرهنگیس قادری:** ئەو کەسین کو کارێ فهکولینی دکهن، تو چهوا دبینی؟ ب باوهریا ته وان پیوهندییان لهر چاف و مردگرن، یان نا؟ نانکو کارێ تمام دکهن و پیوهندیی دچیرین؟ ب گشتی تو چهوا دبینی؟

**بههار عهلی:** ب گشتی ئەوین د چوار چۆفیهیا کلتووری خزمهت دکهن، دلسۆزن، ئەوین بۆ فلکلوری کار دکهن نوههت ژ سهدی کەسین دلسۆز و خۆبهخش و پاکن، ههتا نه چ بۆ وان نههاتییه کرن، بهلی ئەو ژ دل شۆل دکهن، ئەم دبێژم ب ریزهیا نوههت ژ سهدی، قیجا نزانم ریزهیا من دروسته یان خهلهت؟ ئەم هندهک جارا ب یهک تیلەفون ههمیان گازی دکمه قیری و بی بهرامهر ناماده دین. خۆبهخش دهین بیکو مه بهستهک ماددی ههبیت، هه و مختهکی پینقی وان بم ناماده دین، ئەفژی ل دلسۆزییا وان.

**فهرهنگیس قادری:** چ ته هان ددهت کو تو وسای ئینهژی بی؟ دوهی رۆژا پشوو بوو، من تیلەفونا ته کر، ته زحمهت کیشا و ئەفۆ ته کۆمبوون ریکخست، ئەم بخۆ دقیا ته کار نهکریا، چ ته هان ددهت وسای ئینهژی و حهز و قیان کار بکە وی؟

**بههار عهلی:** ئەگەر ههمی تشتا ئیرادیه، ههگەر ته ئیراده نهبیت نهشیی شۆل بکە وی، دوو ههم عیشه. ههگەر ئیراده و عیشه نهبیت نهشیی ههچ شۆلهکی بکە وی. ههگەر مروق بۆ پارا کار بکەت، ئەفه دی بۆ ماوهیهکی بیت و راوهستیت، نهشیی داهینانی بکە وی، هزرین ته دراوهستن، بهلی ههگەر عیشه و ئیراده ههبیت، کەس نهشیت ته راوهستینیت. قهیران ژێ ته ناراههستین. ل سالا ۲۰۱۴ ژ بهر کو رهوشا دارایی خراب بوو، مه بۆ ماوهی شەش ههیفان خۆبهخش کار کر، نه من بتی، ههموو کار مه ندین ئینستیتیوتی دلسۆز بوون، کار مه ندیت مه وسای دلسۆزن هندهک جارا ئەم شهرم ژێ دکهم، ئەم سامانهک مروی مەزن بۆ ئینستیتیوتی، ئەو کەسین کو لقیه پەرورده بوون، ماوهیهک درێزه لقیه شۆل دکهن، ئەم بخۆ ئەفه نێزیک سیزده بۆ چوارده سالانه لقیه کار دکهم. هندهک دهه سالا لقیه دگهل من شۆل دکهن، هندهک ههفت

سأل و ههشت سلن لقیره کار دکهن. ئەز گەلەک جارا دبێژمە مامۆستا (مەزھەر خالقی)ژی، ئەف کادری سامانەکن بۆ ئەنستیتوتی و بۆ قی مللەتی دقیت ئەم وان بپاریزین و زیاتر خزمەتی بکەین، بەلێ ھندەک جاران بارودۆخ دەنێنە گوھورین، ئەم ل جھەکی سەقامگیر نینە، رەنگە سالای پار ژ ئەف سالە باشتر بووبیت، رەنگە سالای بەیت خراپتر ببیت، چونکی ئەم ل ھەرمەکی، دەر دووریت مە ھەموو دوژمن، گەلەک جاران دبێژم دقێ رەوشیدە، دناقبەرا وان دەولەتین دراوسیدا مە ھەرمەک و حکومەتەک ھەبیت موعیزە! ژ بەر قیچەندئ دقیت ئەم کولتور و کەلەپور و تشتین خۆیین رەسەن و گرانبھا بپاریزین، دقیت خۆراگر بین، ھیزا کوردا ئەفەیه.

**فەرھەنگیس قادری:** زۆر سوپاس. ھەز دکەئ بەھسی پرۆژەیین تۆمار کرنین ئەف سالە بۆ مە بکەئ؟

**بەھار عەلی:** پرۆژین مە بۆ ئەف سالە دانابوون، مە بەشەک ژئ تۆمار کرین. ئەز دەنگیژ و چیرۆکیژان دینم، چیرۆکیژ کەف تۆمار دکەین، چیرۆکیژ رەدووکەفتنی کو ژ کەفتا ھاتیبە باسکر، چیرۆکیژ بۆ من دبێژیت، یان سترانەکی لۆر رەدووکەفتنی دبێژیت. گەنگە ئەم دیاردا رەدووکەفتنی د ناڤ ئیزیدییان و موسلمانان تۆمار بکەین، دا بزانیین رەدووکەفتن چیبە؟ بۆچی چیدبیت؟ چەرا چارە دکەن؟

دناڤ موسلماناندا ب دوو شتوازان چیدبیت، دوو جاران دچنە مالا بابی کچی، جارا سیی کور و کچ پیکفە بریار ددەن کو بچن ئانەکو (بەرھن)، پیکفە بچن جھەکی ئازاد بین.

دناڤ ئیزیدیاندا بەک جار دچنە خازگینیان، ھەگەر ئەدا دەرھین، ناکەنە دوو جار، ھندەک جارا ژ بەر پرسین ماددی چیدبیت. ل سالای ۲۰۱۴ من دیدارەک سازکر، من دیت دوو مائیت ئیزیدی دناڤ قوتابخانەکی دا ئاکنجی بوون، دوو خیزان ھەر ئیک ل ژقرا قوتابخانەکی بوون، بڕەخ ئیکفە، ھەر ژوورەک مالەک بوو، کورئ ئەفی ژوورئ ھەز ژ کچا ژوورا دی کر بوو، ژ ئەفی ژوورئ رەفاندبوو ژوورا دی. ئانکو ژ ژوورەکی بۆ ژوورا دی بر بوو، رەنگە ئەفە روودانەک کۆمیدی بی، بەلێ ئەفە رەفاندن بوو، جەم وان ئەف روودانە بساناھیبە و پیکھینانیش ب ساناھیبە، جەم موسلمانان چونکی عەشیرەتن، بز محمەتترە ھەتا پیکدھین.

**فەرھەنگیس قادری:** ھوین وان بابەتان تۆمار دکەن و دکەنە چیرۆک و ھەقایەت و سەرھاتی؟

**بەھار عەلی:** ئەو سترانین بەھسی رەدووکەفتنی دکەن، ھندەک جاران بەھسی ژنن ب مێر دکەت کو خۆ دانە رەفان، د وان فەکۆلینادا جورئەتا ژنی دیر دبیت. کچ ھەرچەند دلئ وئ ب کورکی فەبیت، ھەگەر گەلەک نازا نەبیت، نەشیت بڕەفت. سەختە دلئ مال و باب و برا و دایک و عەشیرەتی بەلیت و سەر خاترا زەلامەکی؟ ئەفی چەندئ نازیەتی و جورئەت پیددیت.

**فەرھەنگیس قادری:** پاشان پلاناتە چی یە؟ چاوا کتیبیا چاپ دکەئ؟

**بەھار عەلی:** پلان ئەو ئیکەم جار وان چیرۆکا بنفیسین، سترانان بنفیسین، پاشی فەکۆلینەکی لۆر چیکەین، جوگرافیا کاریگەری ھەبە، ل باکوورئ کوردستانئ ھیسایە، ل باشوورئ کوردستانئ تۆزەک شەر مە، ناف ئیزیدییان نۆرمالە، ئەز نەشیم وت بابەتی دیار بکەم، دقیت فەکۆلەر بابەتان ل سەر وان تیکستا ئامادە بکەن، فەکۆلینئ ل سەر وان چیرۆک و سترانان بکەن، چونکی نفیسین بتنی بەس نینە. رەدووکەفتن ژ چ ھاتیبە؟ ژ ناڤی وی دیارە ئانەکو رەفاندن، واتا دەرھین،



د ومختیدا هه‌بوویه کو پینشمه‌رگه‌یه‌ک حمز ژ کچه‌کی دکه‌ت، دا بیژیتنی ئەف شه‌فه‌ خۆ به‌ره‌ف که! پینشمه‌رگه‌ دگهل ده زه‌لامان دا هیت و ژنه‌کی ره‌فینیت. ئەفه‌ژی بالکیشه‌ کو ژنی هند جور ئەت هه‌بیت دگهل ده زه‌لامان بچیت.

**فه‌ره‌نگیس قادری:** ته‌گوت تو بخۆ هه‌فه‌یه‌فین چی دکه‌ی، یه‌عنی له‌ناو ئەو پرۆژه‌ی به‌شیکه‌ کاره‌؟

**به‌هار عه‌لی:** بۆ ره‌دووه‌که‌قتنی هه‌تا قه‌گافی ئەز پرسیارا دنقیسم، هنده‌ک جارا هه‌گه‌ر ده‌لیفه‌ هه‌بیت، ئەز حمز دکه‌م بخۆ برووینم و پرسیارین کوورتر بکه‌م، به‌س ئەم هه‌رده‌م د کارین مه‌یدانیدا، به‌ری هینگی پرسیارا به‌ره‌ف دکه‌ین و دنقیسین، ئەم دنقیسینی ئەم وان پرسیاران دکه‌ین، هوین ژنی ئازادن! مه‌ چ پرسیار هه‌بیت دئ ژیکه‌ین. باشتره‌ژی مرۆف به‌هلیت ده‌نگیژ و سترانیژ بی پرسیار و به‌رسف بخۆ باخفت! ئەو یا دلێ خۆ بیژیت چیتره‌! پاشی هه‌گه‌ر پرسیار بۆ مرۆفی چیبوون، آیه‌که‌ت باشتره‌! بۆ فه‌کۆلینی ئەف میتوده‌ باشه‌، بلا ده‌سپیک ده‌نگیژ باخفت، پاشی مرۆف پرسیارا ژنی بکه‌ت.

**فه‌ره‌نگیس قادری:** ته‌گوت هه‌ر سال پرۆژمیین سالی به‌ره‌ف دکه‌ی، هزرین پرۆژه‌یان چه‌وا دین؟

**به‌هار عه‌لی:** هزرین پرۆژه‌یان بریکا خواندنی ده‌ین، هنده‌ک جارا ئەم ده‌بین هنده‌ک بابته‌ گرنگن و که‌سه‌ی کار لسه‌ر نه‌که‌ریه‌، هه‌گه‌ر مرۆف حمز ژ شۆلی خۆ بکه‌ت و گرنگیه‌ پێ بده‌ت، هزر په‌یدا دین. حمز زیکرن گه‌له‌ک گرنگه‌، هه‌م کاری و هه‌م هزری ریکدیخت! قه‌گافی پینچ هه‌تا شه‌ش هه‌یفانه‌ بوودجه‌ و موچه‌بیت مه‌ گیرۆبووینه‌، بۆ من نه‌خۆشه‌ و ژلایه‌ی ده‌روونی ئەزی په‌ریشان کریم!

کاری مه‌ ماینه‌ راوه‌ستای، ئەم نه‌شیین کاری مه‌یدانی بکه‌ین، بۆ وی ئەم پلانی ددانین جاری ئەفی ماوه‌ی لسه‌ر ئەرشیقی شۆل بکه‌ین، هه‌تا پاشی ئەم به‌شیین کاری مه‌یدانی بکه‌ین، ئەم چ جارا ناراه‌ستین، قه‌گافی ئەم هنده‌ک بابته‌تان دۆکیۆمینت دکه‌ین، به‌ری ماوه‌یه‌کی مه‌ شۆل کره‌بو، قه‌گافی دۆکیۆمینتاری دکه‌ین، وان هه‌یفان ئەم وان شۆلا دکه‌ین، د ئەرشیقیدا مه‌ ده‌نگ هه‌نه‌ هه‌می ئەفسانه‌نه‌، من دانه‌ (بژیان خان) و من گوت وان ده‌نگان بنقیسه‌، هه‌م کاری کارگیری دکه‌ت و هه‌م نفیسینی. من گوت ئەفی ئەفسانه‌ی بۆ کتیبی به‌ره‌ف بکه‌. (کاک و ملبید) ئەرشیقی ئەنستیتوتی پۆلین دکه‌ت، هنده‌ک بابته‌ هه‌بوون سالا ۲۰۲۱ مه‌ شۆل لسه‌ر کره‌بون، من گوت وان وینه‌یان توماربه‌ک و ناغان لسه‌ر بنقیسه‌. شوقیری ئەنستیتوتی کاری رۆژانه‌ نه‌بوو، من کۆمپیوته‌ره‌ک بۆ دانا، من گوتی بابته‌تین فولکلوری ل ئینته‌رنیتی کۆم بکه‌ و داوئۆد بکه‌، قه‌گافی دوو تیرا ئەرشیف بی کۆم کری! ئەفه‌ بۆ مه‌ ده‌بته‌ ژنده‌ره‌ک، چونکی گه‌له‌ک جاران بابته‌تین ئینته‌رنیتی نامین و ئەم نه‌شیین په‌یدا که‌ینه‌فه‌. قه‌جا ئەم وان بابته‌تان پۆلین دکه‌ین و دکه‌ینه‌ ژیدهر.

**فه‌ره‌نگیس قادری:** تو هه‌موو کاران ب ستوی ستافی ئەنستیتوتی دکه‌ی، هه‌موو کار و شۆلان دکه‌ن؟

**به‌هار عه‌لی:** هه‌گه‌ر وسا نه‌بینن، مرۆف نه‌شیت کاری کۆنترۆل بکه‌ت. قه‌گافی ئەز دزانم دناف کارین مه‌دا چ هه‌یه‌ و چ نینه‌؟ ریفه‌به‌ری وسایه‌ ده‌یت، به‌رده‌وام دناف کاریدا بی، بزانی چ پێویسته‌ و چ ئەرکه‌، چ بکه‌ی و چ نه‌که‌ی؟ هزرین کاری ژنی وسا په‌یدا دین، هه‌گه‌ر مرۆفی های ژ هه‌می کاران هه‌بیت، هزرین کاری بۆ مرۆفی ده‌ین، هه‌گه‌ر بتنی کاری کارگیری و مه‌ه‌فانداری و به‌ره‌فکرنا راپورتان بکه‌ی، هزر بۆ مرۆفی په‌یدا نابن.

**فه‌ره‌نگیس قادری:** به‌هار خان هه‌گه‌ر بگشتی ته‌ماشای کوردستان بکه‌ین، ل کتیبین دیرۆکی بنترین، ئەده‌بیاتا کوردی، ئەنتۆلۆژی ژن هونه‌ره‌مه‌ندی ژن کیمه‌، ئەو کارین تو دکه‌ی ئەو ناقتین تو زیندی دکه‌یه‌فه‌، ب بۆچوونا ته‌ ئەو بۆشاتی ژ

چیبه؟ بۆچی دهنگی ژان نیهه؟ چونکی کاری ته نیشان ددهت دهنگیژنی ژن ههبوونه، هونرمهندی ژن ههبوونه، چما نههاتینه ناسکرن؟ ئەفە پرسیارا یهکهمه، پاشی پرسین دن لسه وان ههه.

**بههار علی:** هه بۆ چۆنکی دزقیرین، ژنی یی شرم کری بچیت ناف دیوانا سترانا بیژین، یان خۆ دیار کهت. ههتا جهم زالامان ژنی یی شرم بوویه سترانا بیژن، دایژنی (موترب)! واتا خهلی بچاقهکی کیم بهری خۆ ددانی، بهلی فی دوماهیکی ئەف چهنده هاتییه گوهورین، فیکافی دایژنی دهنگیژ و هونرمهند، پینشکهتهک پهیدا بوویه، د ئەفی پینشکهتنیدا ژنی هاته پیش، ئەگەر ژنی بهری فیکافی دهنگیژ بوویه، بهس شرم کریه، بهلی پشتی ئەفی پینشکهتنی، سالین ههشینیان ل دهۆکی ژنی و زهلامان پیکهه، بی شرم ستران دگوتن، تیا موزیکیا دهۆک ب سهپرشتیا هونرمهند (دلشاد محهمد) هاته دامهزراندن، باشترین تیپی هونری بوو ل دهۆکی. بهس پشتی هینگی ئەف تیه بۆچی نهما؟ ئەز بخۆ وسا دبیم، دقیت کهسی ههژی بدانی جهی ژ ههژی! دا بهای دهنه ئەفان کهسان دا بشین بهدهوام بن، ههگەر مرۆف بهایی نهدهته وان کهسان، نهشین بهدهوام بن. بۆ نمونه هونرمهندهکی وهک ههلاله بهرچی، چ بۆ نههات کرن. راسته مه کتیهک بۆ چیکر. بهلی بهس نینه. دقا کهسین وسا ژلای ماددی و مهعهوی هاریکاریا وان بهیت کرن. ئەم نهشین ژلای ماددی هاریکاریا وان بکهین، گهلهک جاران چیدبیت، هونرمهندهک ل دهرقی کوردستانی بهیت و ماددییهن هاریکاریا وی بکهین، بۆ نمونه (پینچ هزار دۆلاران دهنی)، بهلی لقیه دهنگیژمی دهین، دوو سهعاتا سترانا دایژیت و هاریکارییهکی بۆ نمونه ب (دوسه دۆلاران) بۆ دکهین، کو گهلهکه کیمه! تیرا هاتنووچونا وی ناکهت! ئەفە دلی دهنگیژنی هونرمهند سار دکهت. مرۆف نهشینت ب ناشکراییی وان بابنهان لسه تیلهفزیوان بههس بکهت، بهلی ئەفە هۆکارهک سهرمکیه کو نه هه دهنگیژنی ژنی، بهلی دهنگیژنی زهلام ژنی ژ گوتنا ستران و دهنگیژنی دوو بکهفن، ههتا بۆ فۆلکلورناسا ژنی چ نههاتییه کرن.

**فهرهنگیس قادری:** پرسیارا دووهمین: چاره چیهه؟ هوین چهوا دکارن دهنگی ژن پيشانیدهن؟ ئەوا ته بههسکری ریکهک بوو؟

**بههار علی:** ئەز ههز دکهم ئەف دهنگیژنی هههه بینه نمونەک بۆ نقشین داهاتی، ل زانینگهها بریکهکا ئەکادیمی بینه خواندن، ههگەر ژن سهرکرده، دهنگیژنی مه ل زانینگهها هاتن خواندن، د پاشهروژدا کهس شرم ناکهت، دایژین ئەفە نمونه و پینشکهتیه مه بوون؟! دقیت زارۆکیت کوردا ل قوتابخانیت سهرمتایی بخوین و بزانی ئەلماس خان کیه؟ بلا ئەف دۆکیۆمینهتیهه ل قوتاغین خواندنی نافتچی ههین، فیکافی قوتابین قوتاغیت ناومندی و نامادهی وان دهنگیژ و هونرمهندان نانیاسن، دقیت ئەف بابته بچه دناف میتودین خواندنی و ئەم شانازیی پی بهین. چهوا ئەم شانازیی ب (حهپسه خانی نهقیب) و (لهیلا قاسم)ی دبیم، دقیت ئەم شانازیی ب هونرمهندی و هونرمهندی خۆزی بهین، ههگەر وان شۆرشهکا سیاسی کریت، وانهژی شۆرشهکا هونری ئەنجام دایه.

**فهرهنگیس قادری:** ههوه پلان ههیه چ بکهین، یان دشین چ بکهین؟ دا ئەو نافتین هوین زیندی دکهنهفە بچه دناف قوتابخانان؟

**بههار علی:** ئەز ههز دکهم ئەفی پرسیارا ژ ماموستا (مهزهری خالی) بکهی، چونکی من بهری نوکه دگهل ناخفت بوو، من گوتی: باخچهیین ساقایان میتود نینه، مه گهلهک داوهت و یارییت کوردهواری هههه قوتابی زانن، مهگهلهک یارییت کوردهواری هههه قوتابی دشین مفایی ژنی وهرگر و فیره ژماره و رۆژیت ههفتی بی. داوهت و شههیان بۆ

زاروكان همم خووسيه و همم ياربيه بو زاروكان، پيوسته ل باخچين ساقايان نيشانى زاروكان بدن، ماموستا مهزهر خالقي گوت، ئهم دئ دگهل و مزارنا پهروردئ ناخفين سهر في بابته.

**فهرهنگيس قادري:** زور گرنگه مفايئ ژ نهموونا هممه وهر بگرن، چهوا بشين نهفي كاري بكهن؟ بو نموونه هممه گوت فيگافي ئهلماس خان ل هونهرين جوان دهيت خواندن، هممه چهوا نهف پرۆسه زيده كر؟ هممه چهوا نهف بابته ريخست؟ دگهل ماموستايين هونهرين جوان رووينستن، يان هممه پيشنياز دا وان؟

**بههار عهلي:** يهكهم ژنا دهنگبزه، مه ب ديارى بو وان بر، وانژى وفا ژئ وهرگرت، مه پيوهندي دگهل زانكوپي هممه، بهس ژ بهر كو مه گهلهك كاريت همين، مه ستافهت تاييهت دقيت دگهل زانكوپان كار بكهن، چونكي گهلهك قوتابيهت ماستهرئ دهينه جهم مه و مفايئ ژ كتيب و ئهرشيف و ژيدهرنيت مه وهر دگرن، مه قوتابيهت ماستهرئ لسهر موزيك و كلتورى هممه، مه فايهك تاييهت هممه سالانه 6-7 قوتابيهت ماستهرئ دهينه جهم و مه و مفايئ ژ ژيدهرنيت مه دببين.

**فهرهنگيس قادري:** چونكي نهموونا كتيب و ئهلبووما (ئهلماس خان) سهر كهفتى بوو، ل زانينگههئ دهيت خواندن، بو وى ئهو تيگههستن كو نهموونا هممه سهر كهفتيه؟

**بههار عهلي:** ئهدهبي زاروكانژى بوويه كتيب، ههر مهنهجهئ مه بوو، ل زانكوپي بهشي ئهدهبيات كوردى دهينه خواندن، نهف فهكولينه ژلايئ (مهممه عهبدوللا ناميدي) هاتبوو ئهجامدان، ئهو كسه نهوه كو دكومبوونيدا لسهر ئههربانئ روونيشتوو، نزانم ته ديت يان؟ ههگهر ته نهديتت، تو روخسهئى بدهئ ئهم دئ نيشانى ته دم، ئهدهبي زاروكان(مهممه عهبدوللا ناميدي) چيكر، ههروسا فيگافي ئهم كتيبكه دى بو چاپ دكهين، ههروسا دوو دهستنهفسييت دى بيت وى جهم مهنه ئهم شول لسهر دكهين، نساخه و جهلتهين لئيداي، نهشيت باخفيت، بهس هزر دكهت، ئهو هاته فيرئ و من دناف توموبئلى ديت، من دهستنهفسييت وى ژئ وهرگرتن، ئهم تينهگههستم چ دببزيهت؟ كورئ وى ئهم تيگههاندن كا وى چ دقيت؟ بهرى وسا نهبوو ساغ بوو، ومك ههر دوو مروقيت هيسايئ ئهم دئاخفتين، ههروسا دياريهك بو من هينابوو، وينهيهكى (شاهين) بوو، گوت نهفه دياريه بو ته. من ل ژورا خو يا داناي، مه ب زووترين دم دهستنهفسيين وى كرن كتيب و چاپ كرن، چونكه مه ههز كر زوو بهرهميت خو ببينيت، دترسييت دهست و زمانئ وى راههستياينه بهس دلئ لالى كلتورى، نهفه بو من گهلهك گرنگ و بالكنشه!

**فهرهنگيس قادري:** نافي وى (مهممه عهبدوللا)يه؟

**بههار عهلي:** بهلى (مهممه عهبدوللا ناميدي) ناكنجبي ئاميديه، نهفه نيكه ژ نمونهيت فهكولهرين دلسوز بو فولكلورى.

**فهرهنگيس قادري:** دزانم بيرههريين خوش و بهلكى نهخوشژى لجهم ته ههبيت، ههز دكهئ تشتهك د ههزرا ته دايه بو من ببزيهت؟ تشتهك گرئيداي كار و پرۆژين هممه بيت؟

**بههار عهلي:** تشنتى بو من نهخوش شهفهكئ، ئهو چهند ههيف بوو من تيلهفونا دهنگبزهكى دكر بهينه فيرئ بو من سترانا ببزيهت، دهنكي وى تومار بكهين. گوتى من نشتهرگهرييا چافيت خو بيت كرين، شهفهكئ من تيلهفونا وى كر، من گوتئ: ما تو ناھيئ؟ گوتئ: بهلى باشه سهر خاترا وه دئ سوبههئ هيم، بلا بينه لدويف من را. ژفانئ مه سهعات نههئ سيديئ



**به‌هار عه‌لی:** به‌س فوتۆبۆل دیجیټالی مه‌ هه‌نه، مه‌ ده‌سخت نینه، قیگافی من هه‌ول دایه‌ ئه‌و ده‌سختی ئه‌وین لقیری رووینیشتی، ده‌سختی خو‌ بینن و ئه‌م هلگراین. ئه‌و بابەتین یه‌که‌م جار نقیسای من ییت پاراستین. ل سلیمانینی وان ئه‌ر سیفه‌کی هه‌ی به‌ری سه‌د سالان وان ده‌سختیت هه‌ین، به‌س لقیره‌ کیمه‌ و هه‌تا نه‌ها بو‌ مه‌ نه‌هاتینه.

**فه‌ره‌نگیس قادری:** به‌ار خان زۆر سوپاسیا ته‌ دکه‌م، چ پرسیاریت دی ناهین بیرا من، هه‌گه‌ر جه‌نابی ته‌ تشته‌ک هه‌بیت زیده‌ بکه‌ی؟

**به‌هار عه‌لی:** ئه‌ز چه‌ز دکه‌م ل ده‌رقه‌ی کوردستانی کلتوری مه‌ بیته‌ نیاسین، بو‌ نیاسینا کلتوری ژیم دقیت ئه‌م و مرگیرانی بکه‌ین، ئه‌فه‌ ریکه‌که‌ دا کلتوری خو‌ نیشانی خه‌لکی بده‌ین، نه‌ بیتی دناف خو‌دا وی کلتوری بیاریزین. باش دبیت هه‌گه‌ر کلتوری مه‌ ب ریکا زانینگه‌ها به‌یته‌ و مرگیران، هه‌گه‌ر نه‌ هووین پشتگیر بیا مه‌ بکه‌ن، دا ئه‌م بشین و مرگیرانی بکه‌ین و پاشه‌کی بو‌ هه‌وه‌ به‌نیرین، ببیته‌ کاره‌کی هاوبه‌ش و ئه‌م پیکفه‌ به‌لاف بکه‌ین، بو‌ هه‌وه‌ مه‌ بیته‌ به‌ر هه‌م، دی گه‌له‌ک باش ببتن تو‌ دشنی ئه‌فی پرۆژه‌یی پیشکیشی زانکۆیی بکی، و مرگیران گه‌له‌ک گرنگه‌.

**فه‌ره‌نگیس قادری:** پاشی دگه‌ل مامۆستا مه‌زه‌ر و زانکۆی دناخقم.

**به‌هار عه‌لی:** وه‌کی دیژی ئه‌و دوکیۆمینته‌رین مه‌ هه‌ین، ئه‌گه‌ر بشیی هاوکاربی ئه‌فه‌ ل ده‌رقه‌ی کوردستانی، ب تایتلین نینگلیزی به‌لاف ببین. ئه‌م دی گه‌له‌ک که‌یفخۆش ببین. ئه‌فه‌ دبیته‌ ده‌رگه‌هه‌ک هووین ل ویژی کلتوری مه‌ بده‌نه‌ نیاسین و کاری مه‌ ببینن.